MANÎFESTOYA CIVAKA KOMÎNAL A DEMOKRATÎK

PÊŞEK

Manîfestoya Civaka Komînal a Demokratîk bi komîsyoneke wezîfedarkirî hatiye amadekirin. Komîsyonê ji bangawaziya Aştî û Civaka Demokratîk a 27'ê Sibata 2025'an a Rêber APO û tehlîlên wî yên di demên cuda de sûd wergirtiye. Ango fikir û tehlîlên di manîfestoyê de bi awayekî bingehîn ên Rêber APO ne. Lê belê komîsyon di dema pêdaketin û nirxandina rast a fikirên Rêber APO de dibe ku ketibe kêmasî û şaşiyan. Helbet di rewşeke wisa de berpirs komîsyona amadekar bi xwe ye. Çawa ku tê zanîn, ev ji ber rewşa tecrîdkirî ya Rêber APO ye. Em bawer dikin ku wê her xwendekar vê rewşê li ber çavan bigire.

Herçendî wisa be jî Manîfestoya Civaka Komînal a Demokratîk ji pirsgirêkên civakî re yên sîstema modernîteya kapîtalîst û şaristaniya dewletdar rê li ber wan vekirine çareseriyên ciddî yên demokratîk pêşniyaz dike, eşkere tezên teorîk ên nû û bi îddîa datîne holê, di serî de jin, ciwan û kedkar ji tevahî beşên bindest ên ji aliyê sîstema modernîteya kapîtalîst a global têne pelixandin re rêya rizgariyê nîşan dide. Sîstema modernîteya kapîtalîs mirovatiyê ber bi felaketekê ve dibe. Manîfestoya Civaka Komînal a Demokratîk ji bo jiyaneke nû ya civaka komînal a demokratîk rêyeke nû destnîşan dike. Di vê çarçoveyê de, Manîfestoya Civaka Komînal a Demokratîk ji bo wan kesan ku li dunyayeke nû digerin, li jiyaneke xwe disipêre azadiya jinê digerin û aşiqê jiyaneke wekhev in, ji bo kesên ku dixwazin sosyalîzmê ji xwe bidin destpêkirin, ji bo tevahî komînalîst û sosyalîstên rastî xwedî naverokeke rasteqîn a rêberiyê ye.

Hêvî û daxwaza me ew e; ev berhem ji meşa mirovatiyê ya aştî, demokrasî, azadî û wekheviyê re xizmet bike. Bi vê hêvî û daxwazê, em berhemê pêşkêşî xwendekaran dikin!

KOMÎSYONA AMADEKAR
ÇILE 2026

Werger: Rêşad Sorgul
Redaksiyon: Dr. Luqman Guldivê

MANÎFESTOYA CIVAKA KOMÎNAL A DEMOKRATÎK

NAVEROK

DESTPÊK
Beşa Yekê
XWEZA Û MANE (WATE)
1-Diyalektîka Xwezayê

2-Diyalektîka Têkiliyê
3-Mirov
4-Mirov Hebûneke Eko-Civakî ye
Beşa Diduyan
XWEZAYA CIVAKÎ Û RÛDANA PIRSGIRÊKÊ (PROBLEMATÎK)
1-Xwezaya Civakî û Têgînîbûna wê
2-Civakîbûn Etîk (Exlaqî) Û Polîtîk e
3-Di Civakîbûnê de Pêkhatina Pirsgirêka Pêşî û Rastiya Jinê
4-Sîstema Kastîk
Beşa Sisiyan
DI CIVAKA DÎROKÎ DE KOMÎN Û DUALÎTEYA DEWLETÊ
1-Kujerê Kastîk ê Civakê
2-Heta Kujerê Kastîk Neyê Fêhmkirin Sosyolojî Çênabe
3-Êrişa Kujerê Kastîk û Xistina Jinê ya Nava Malê û Girtina Wê Li Nava Malê
4-Ji Klanê heta bi Komînê Berxwedana Bindestan
5-Qebîle Rêxistineke Parastinê ye
6-Di Warê Çînî De Rexnekirina Marksîzmê
7-Serdema Arîstokratîk
a) Erebeyên Şer ên Tûnc ên Arîstokrasiyê
b) Formulasyona Îdeolojîk a Sîstema Arîstokratîk
8-Serdema Mîhwerê (Tewere)
9-Demokrasiya Atînayê
Beşa Çaran
MODERNÎTE
1-Modernîte Payeberzbûna Tevahî Nirxên Mirovatiyê yên li Ewrûpayê ye
2-Kapîtalzîm û Sosyalîzma Pêkhatî
3-Modernîteya Kapîtalîst Û Sê Suwarên Mehşerê
A-Kapîtalîzm
B- Îndustriyalîzm
C-Dewleta Netewe
4-Modernîteya Demokratîk
A-Civaka Komînal a Demokratîk (Civaka Exlaqî û Polîtîk)
B-Civaka Eko-Îndustriyal
C-Civaka Konfederalîst a Demokratîk (Neteweya Demokratîk)
Beşa Pêncan
PIRSGIRÊKÊN ROJHILATA NAVÎN Û ÇARESERIYA MODERNÎTEYA DEMOKRATÎK
1-Dîroka Gerdûnî û Rojhilata Navîn
2-Dîroka Gerdûnî û Berxwedana Klan û Qebîleyan
3-Di Sîstema Şaristaniya Dewletparêz de Berxwedana Dînî
A-Rêûresma Zerdeştî
B-Derketina holê ya Dînê Brahîmî
C-Xiristiyantî
D-Îslamiyet
a) Bipêşketina Îslama Dijber
b) Ehlîbeyt û Xaricî
c) Di Cîhana Îslamê de Hegemonya dikeve destê Elîtên Tirk û Fars
4-Modernîteya Kapîtalîst û Rojhilata Navîn

5-Hin Nakokiyên Aktuel-Dîrokî yên li benda çareseriyê
6-Hewldanên Jinûvedizaynkirina Herêmê û Şerê Cîhanê yê Sêyemîn
7-Çareseriya Modernîeteya Demokratîk
Beşa Şeşan
RASTIYA KURD Û KURDISTANÊ
1-Hebûna Kurd û Dema Wê
2-Rastiya Kurd û Kurdistanê di Navenda Dîrokê de
3-Kurd di Serdema Mîhwerê de
4-Di Dîroka Ereb de Dîroka Kurd A Sergirtî
5-Di Dîrokê de Têkiliyên Kurd û Tirkan
6- Rastiya Kurd
7- Vejîna Kurd
Beşa Heftan
DI DÎROKÊ DE ROL Û CIHÊ PKK'Ê
1-Bi PKK'ê Gavavêtina Hebûna Kurdan
2-PKK Li Dijî Înkarê Tevgera Vejîn û Misogerkirina Hebûna Kurd e
3-PKK û Modernîte
4-Destketiyên PKK'ê
Beşa Heştan
ERK Û XISLETÊN DEMA NÛ
1-Bername
a) Armancên Siyasî
b) Armancên Civakî
c) Li Rojhilata Navîn Pirsgirêka Kurd û Çareseriya Entegrasyona Demokratîk
d) Yekîtiya Demokratîk a Kurdistanê
e) Li Rojhilata Navîn Krîza Civakî û Çareseriya Modernîteya Demokratîk
f) Armancên Enternasyonalîst
2-Stratejî û Taktîk
ENCAM

DESTPÊK

Civak ji bo cureyê mirov şêweyekî jiyan û hebûnê ye. Xwe naspêre hejmareke diyar, bêhtir şêweyek e ku ji hêza afirandin û nirxên çandî pêk tê. Ji bo hewcedariyên jiyanê xwedî têgihiştineke hevpar e. Ango exlaqî (etîk) û polîtîk e. Civakbûna cureyê mirov ji Rîfa Efrîkayê destpê kiriye û li hilala Toros-Zagrosê bi gewde bûye, gihiştiye heqîqeta xwe.

Cureyê mirov di xwezaya fizîkî de hebûna herî qels û lawaz e. Di heman demê de bi qasî ku weke fizîk heye, bi hebûna xwe ya metafizîk bi xwe numûneyeke nadîde ye. Bi van xisletên xwe divê weke civak bijî û hebe. Bi kurtî, em dikarin cureyê mirov weke hebûneke eko-civakî ya xwezayê pênase bikin.

Bêguman klan qurmê civakê ye, ango şaneya esas e. Klan civaka dayikparêz e, yanî li dora dayikê çêdibe. Yanî 'kom'ek e, têde têkilî di navbera zarok, xal û xaltiyan de xurt e. Eşkere ye,

civaka dayikê piştî demûdewran û rojgarên dirêj cureyê mirov ji cureyê meymûnwaran cihê kiriye. Dîroka civakê ji sedî 98 jiyana klanê ye. Ango dema herî dirêj a cureyê mirov e.

Şêweyê komîn an jî kombûnê şêweyek e ku civak pê heye û pê hebûna xwe didomîne. Komîn têgînek e, çand û zimanê civaka dayikê pênase dike. Biwêja 'Civak komînal e' rastiyeke yekpare pênase dike, yanî ji bo rastiya yekparebûna diyalektîk tê gotin.

Bi tevahî qebîle û eşîr, komên îdeolojîk ên mezin û ne famîle yên Serdema Mîhwerê (Serdema Tewere) –Achsenzeit -[1] (Zerdeştîtiya dînî-felsefî ya li Zagrosan, felsefeya li Îyonyayê stewiyayî, Bûdatiya li Hindistanê, Konfuçyustî û Bûdatiya li Çînê, dînên yekxwedayî), di serdema navîn de şax û komên ji dînan cihê bûn (di Îslamê de terîqet, di Xiristiyantiyê de keşîşxane) û utopîstên Serdema Nû ji klanê derketine, û hemû di nava komînalîteyê de têne qebûlkirin.

Kengî ref û revdeyên nêçîrê yên mêran çêdibin, hingê li cem civaka klan a dayikê pirsgirêk destpê dike. Civaka klanê, weke jiyana komîn a dayikê û revdeyên nêçîrê yê mêr dibe du şeq. Revdeya nêçîrê ya mêr di asta herî jor a hovîtiyê de li dijî jiyana komîn a dayikê dikeve nava tevgerê û êriş dike. Ev êrişa ku em qal dikin û işaret pê dikin, destpêka pirsgirêka civakê ye ku heta roja me ya îro tê. Revdeya nêçîrê ya mêr vediguhere kujerê kastîk ê civakê û êrişa wî ya me qal kir her mezin kir û her dewam kir.

Kujerê kastîk û civaka dayikê dibin du şeq û ev dibe bingehê şaristaniyê. Li gorî têkoşîn û yekîtiya diyalektîk, sîstema kujerê kastîk di her qadê de êrişên xwe zêde dike û civaka komîn a dayikê jî li hemberî van êrişan li ber xwe dide. Li ser vî bingehî, liberhevdan û têkoşîna herî dijwar di serdema neolîtîk de pêk hatiye. Kujerê kastîk dixwaze bibe xwedî û hakimê her tiştî, li hemberî vê, civaka dayikê jî dixwaze nirxên afirandiye biparêze û ji bo vê li ber xwe dide. Di encamê de pergala dayik-xwedawendê (pergala pîran)[2] bi bin dikeve, kujerê civakê yê kastîk sîstema xwe ya desthilatdarî û dewletdariyê ava dike.

Ev cihêbûn û duşeqbûna B.Z. bi 15000 salan destpê kir di salên 3000 B.Z. de bi desthilatdarbûn û dewletdarbûna kujerê kastîk êdî digihîje qonaxeke nû. Dewletbûn li cem Sumeran bi bajarbûn û bi çînîbûnê pêk tê. Çînîbûna arîstokratîk ji vê pêvajoyê re pêşengiyê dike û dibe kujerê kastîk ê serdemê. Bi hêza xwe hemûyî hewl dide civakbûna komînê lawaz bike û bêhtir bixe bin zora xwe û mêhtingeriyê. Ji bo di vê de bi ser bikeve, xwe hewce dibîne serdestiya mêr a li ser jinê misêwa bişidîne. Ev qelşa li civakê dikeve û wê dike du şeq êdî weke dualîteya komîn û dewletê, weke nakokî û pevçûnê di çarçoveyekê de bi cih dibe.

Li dijî êrişên kujerê kastîk ê yekdestdarê nû ku xwe weke desthilatdarî û dewletê hûrûkûr bi rêxistin dike û berfireh dibe, ji bo parastina nirxên civaka komîn berxwedaneke ciddî tê meşandin.

Berxwedana ku qala wê tê kirin, di serdema mîhwerê de ji Zagrosan heta bi Çînê, ji Hindistanê heta bi Yewnanistanê li gelek qadan di asteke giring de serketinan bi dest dixe, lê

[1] Têgîna Serdema Mîhwerê (Achsenzeit) dîroknas û fîlozofê Elman Karl Jaspers bi kar aniye. Ji bo pênasekirina serdema di navbera salên 800-300 B.Z. de bi kar aniye. Ango di navbera van salan de li Mezopotamya, Pers, Çîn, Hindistan û Yewnanistanê de guhertinên berfireh ên di qada fikir û jiyanê de rave dike. Mirovatî ji fikira mîtolojîk derbasî fikira rasyonel-felsefîk dibe yanî li hebûna xwe serwext dibe. Di vê serdemê de têgînên weke exlaq, etîk, berpirsiyariyên ferd û dad têne guftûgokirin û sîstematîzekirin. Li gorî Jaspers di vê serdemê de mîhwera çarenûs û koka hevpar a mirovatiyê diyar dike nuqteyek e. Bi kurtî, di Serdema Mîhwerê de bingehê fikira mirovê hemdem tê danîn, di dîn û felsefeyê de bi awayekî hemwext hem li rojava û hem li rojhilat pêngaveke mezin diavêjin û nuqteya şikestinê ya werçerxeke dîrokî ye.

[2] Di Serdema Neolotîkê de jiyan li dora jin-dayikê çêdibe. Pêkan e ku pîrejin an jî pîredayik di nava civata xwe de bi sedema rola xwe ya pirzarokanîn, xwedîkirin, strandin, dermankirin, berhevkarî, deribandin û hwd. payeya pîrbûna bi temen di heman demê de weke payeya pîr (pîl) a mezinbûnê ango xwedawendiyê bi dest xistibe. Di zimanê kurdî de jin pîr dibin û mêr kal dibin. Heye ku paşê pîrbûna jinê ji aliyê mêr ve dewr hatibe girtin. Lewma îro jî li tevahî Kurdistanê rêûresma pîrtiyê didome. (nota wergêr)

tevî vê jî di encamê de ji ber êrişên zêde ji têkçûnê rizgar nabe. Fena ku civakbûna komîn li jor wê dewlet, li jêr jî malbat di navbera herduyan de asê bûbe û ketibe feqê. Ev herdu ango dewlet û malbat misêwa komînê di nava xwe de dihelînin, diherifînin.

Çawa ku tê zanîn, rejîma kujerê kastîk ê dawî, sîstema modernîteya kapîtalîst e ku weke desthilatdarî û dewleta dawî heye. Ev şêwe pêkhatin, revdeya nêçîrvanê mêr weke sîstema kujerê kastîk bingehê wê daniye û arîstokrasiyê jî wê kiriye sîstemeke desthilat û dewletê, bûrcuwaziyê jî ji her alî ve ew kiriye yekdestdarî û gihandiye ast û karakterekî hegemonîk global. Bêguman, eger bi giştî zor û bi taybetî jî zora dewleta netewe nebûya, rejîmek kujer a kastîk mîna kapîtalîzmê ya dawiyê li mirovatiyê tîne, wê nikarîbûya û nepêkan bû ku xwe weke rewşa bivênevê ya mirovatiyê û rewa nîşan bida.

Helbet sîstema modernîteya kapîtalîst a pêncsed salên dawî jî di nava xwe de gelek qonax buhurandine. Dema kapîtalîzmê ya derketina holê û pêşketinê û dîsa dema wê ya hilweşînê ji her alî ve ne xwedî heman xisletan in. Piştî hilweşîna sosyalîzma pêkhatî, ketiye rewşekê di 35 salên dawî de bi Şerê Cîhanê yê Sêyemîn hema bêje gef li dunyayê dixwe. Têkoşîn, liberhevdan û xwelihevrakişandina li ser çavkaniyên enerjiyê û xetên wan, hevrikî û şerê komên yekdestdar (monopolî) û dewletên cuda, tehlûke û gefa heyî bêhtir giring dike. Di vî warî de pêşketinên teknîk-zanistî yên bi lez çêdibin jî rahend û asta tehlûkeyê bêhtir zêde dikin.

Di rewşa heyî de mêtinkariya nirxê zêde û kara herî zêde li gorî berjewendiyên kulmeke yekdestdarî derfet têde nemaye were kontrolkirin û gemkirin. Êrişa îndustriyalîzmê li dijî çavkaniyên xwezayî ji mêtinkariyê buhuriye, hema bêje gihiştiye astekê çavkaniyan hemûyan tine dike. Dewleta netewe di êrişa xwe ya li dijî civakê de, ferd dike dewlet û dewletê jî li tevahiya civakê belav dike, di çarçoveyê de mînakê wê nîne. Sîstema modernîteya kapîtalîst, bi sê suwarên mahşerê hema bêje, dawiya civak û xwezayê amade dike.

Roja me ya îro krîza di vê sîstemê de rewşeke giştî û domdar e; êdî qala vê qadê yan jî qadeke din nayê kirin, dîsa qala vê astê yan jî asteke din nayê kirin. Şerê Cîhanê yê Sisiyan îsbata herî eşkere ya vê yekê ye. Bala xwe bidinê, şerê li vê dunya me êdî bi çend salan ne bi sînor in; Şerê Cîhanê yê Sisiyan 35 sal in ku dewam dike û hê jî kes nikare pêşbîniya dawiya wî bike. Ji vê jî zêdetir, şerê em qalê dikin, ji bilî şax û rahendên wî yên ekonomîk, siyasî û eskerî, rahend û şaxê wî yê îdeolojîk jî her diçe tûj û domdar dibe. Rejîma kujer a kastîk, hema bêje, êdî weke rêveberiyeke krîzê ya domdar e, û li ser vî bingehî şerê taybet di her qadê de kûr dike, bi pêş dixe û bi vî awayî hewl dide temenê xwe dirêj bike.

Divê mirov rejîma kujerê kastîk ê îro bi sîstemên berê yên mêtinkar û zordest tevlîhev neke. Lewma mirov nikare têkoşîn û cudabûna çînî ya raboriyê weke îro bibîne û analîz bike. Yanî mirov nikare weke berê qala diyarkeriya têkoşîn û mêtingeriya çînekê bike. Rejîma kujer a kastîk a kapîtalîst, ne tenê civak û xwezayê dikoje û li ser wan mêhtingeriyê dike, hema bêje wan tine dike; ne tenê hebûna civaka komînal dikeritîne, dirizîne û lawaz dike, ji vê wêdetir hebûna civaka komînal tine dike, civakê ji alî çand û maneyê ve jî ji holê radike.

Dema ku civak û xweza ji aliyê çand û wateyê ve têne qirkirin, pir eşkere, ev awa herî zêde xwe di qirkirina jinê de nîşan dide. Ya rastî, di kapîtalîzma roja me ya îro de sîstem û zêhniyeta mêrê serdest li asta herî jor e. Serdestiya ku qala wê tê kirin, di serî de li nava dewlet û malbatê di her qada jiyanê de heye û xwe bi rêxistin kiriye. Êriş û mêhtinkariya li dijî jinê ne tenê bi qadeke jiyanê bi sînor e; di her warî de ji alî ruh, hest, fikir û gewdê xwe ve jin hertim di hedefê de ye. Jin ew mal û meta ye ku pir bi erzanî tê bidestxistin û gelekî kêrhatî ye; ji mirov re karê tîne ango mal û milk e. Gewdê jinê di reklamkariyê de kirine amûra herî bi bandor. Ji bo vê rastiyê rûkêş û maske bikin jî derewek xwe çêkirine û navê “azadiya ferdî” lê kirine. Çima ev xapandin û derew. Ji ber ku rola diyarker û pêşeng a jinê ya di parastina

civaka komînal de tê zanîn, ji her alî ve hewl didin wê qir bikin. Lewma lîberalîzma modernîteya kapîtalîst a cinsperest, milletperest, dînperest û zanistîperest bi êrişên xwe herî zêde jinê dikin hedef.

Ya rastî, modernîteya kapîtalîst sîstemek e, ji destpêkê ve rê li ber krîzan vedike û bi xwe di nava krîzan de ye. Dawiya salên 1800'î û sala 1929'an krîzên wê yên mezin rûdan. Şerên cîhanê hem encamên van krîzan bûn, hem jî ji bo buhurandina wan hewldanên lêgerînê bûn. Sîstem ji bo van û krîzên weke wan ên mezin û navîn li dawiyê bihêle di nava xwe de gelekî hewl daye, lê bi ser neketiye. Ji salên 1970'î ve ketiye nava krîzeke sîstematîk a domdar. Krîza sîstemîk ji awayê avabûna sîstemê ye. Ji ber ku stûnên felsefî-fikirî, zanistî, ekonomîk û polîtîk ên modernîteya kapîtalîst li ser wan hatibû avakirin hilweşiyan krîza sîstemîk ket rojevê. Tevgera Ciwanên Şoreşger ên 1968'an binketina ezmûna sosyalîzma pêkhatî ragihand, vê jî kir ku hilweşîna sîstemê tevî çep û rastê wê xuya bike.

Serê 1990'î Yekîtiya Sovyetê hilweşiya. Wexta ku Sovyet Hilweşiya, cîhana Rojava bi bangeşeya weke "Sosyalîzm têkçû, lîberalîzm bi ser ket û wê herûher bijî" serketina xwe bi qîr, halan û helemanan îlan kir. Teoriya "dawiya dîrokê ye" çêkir. Ango ji bilî modernîteya kapîtalîst sîstemeke din nîne, heq û heqîqet ev e. Lê rastî ne wisa bû. Ma ne, hê salên 1990'î neqediyabûn, li hin deverên cuda yên dunyayê (weke Asyayê), di warê aborî de krîzên mezin ên ekonomîk rûdan û van krîzan jî nîşan dan ku sîstema kapîtalîst li ber hilweşînê ye.

Sîstemê bi polîtîkayên globalbûnê hewl da ji krîzê derbas be, polîtîkayên xwe yên ekonomîk-polîtîk restore bike, sîstema xwe ya mêhtinkariyê nû bike.

Salên 1980'î van polîtîkayên xwe bi lez kirin, salên 1990'î bi bandora hilweşîna Sovyetê re derketin asta xwe ya herî bilind. Bi salên 1990'î re bêhejmar pirtûk-rojname weşandin û pesnê globalîzmê dan. Lê li ber mîlenyûmê krîza ekonomîk di serî de Asya li gelek deveran nîşan da ku siyaseta globalbûnê li sînorê xwe yê dawî ye û çûna wê ber bi felaketê ve ye. Jixwe paşê krîz nesekinîn.

Globalbûnê mêhtinkariya kapîtalîst û xizanî zêde kir, di serî de civakên Asya-Efrîkayê li her devera dunyayê rê li ber texrîbkariyeke mezin a ekonomiyê û sefaletê vekir. Li Ewrûpayê jî dawî li polîtîkayên demokratîk anî. Ev polîtîkayên ku em dibêjin demokratîk jî di warê rasteqîn de îzafî (nisbî) ne, lê tevî vê jî garantî û xizmetên civakî û yên raya giştî weke 'dewleta xweşhaliyê' û 'dewleta civakî' qels kir, hema bêje bi dawî kir. Hikûmetên dewleta netewe kirin karmendên bi mûçeyan ên şîrketên global. Herçendî şîrketên global hêz bi dest xistin, belkî hin dewletên Rojava bi hêz bûn, lê civaka kedkar û demanên civakî û xweşhalî qels bû, keda gelan bêhtir bi hêsanî hat xwarin, dewlemendiyên binerd û sererd bêhtir bêperwa hatin desteserkirin.

Globalbûn polîtîkayek bû ji jor ve hat meşandin, lewma hêmanên bûn asteng kir hedef û jiholêrakirina wan ferz kir. Gelek herêmên cîhanê kir qada şer, rê li ber malwêraniya ekonomîk vekir, xweza xira kir û rê li ber hilweşandina ekolojiyê vekir. Bi mîlyonan mirov neçar kir ku ji cih û warê xwe yê lê ji dayik bûbûn koçber bibin, çanda xwe terk bikin û bi vî awayî rojeva wê ya koçberan çêbû. Cîhana Rojava ya mîmarê globalbûnê ye, li ber vê encama ku bi xwe rê li ber vekiriye, veciniqî û velîst. Îca kengî tirsa ji koçberan û dijberiya wan bi rewşa nexweş a ekonomîk-civakî re bû yek, cîhana Rojava deriyên xwe li derve girt, meylên milletperest bi pêş ketin, di qada polîtîk de lîderên populîst-nasyonalîst zêde bûn û ji xwe re alîgir jî peyde kirin.

Ya rastî, ev hemû nîşanî me didin sîstem diperpite û van hewldanên wê yên qaşo ji bo çareseriyê pirsgirêkan bêhtir asê dikin. Ewrûpa cografyayek e ku êşa rejîmên faşîst dîtiye. Tevî vê jî meyla wan a ji bo van qaşo çareseriyan encama bêçaretiya wê ye. Îro jî krîza modernîteya kapîtalîst bi awayekî domdar û misêwa kûr dibe. Lewma pirsgirêkên di asta

global, herêmî û neteweyî de çareser nabin. Ji salên 1990'î ve şerê li Rojhilata Navîn, rewşa bi pevçûn û pirsgirêkên bi temamî bêçareserî mane, encama vê krîzê ne. Heta ku krîza sîstemîk li dawiyê neyê hiştin wê ji bo pirsgirêkên xwecihî û herêmî jî çareserî peyde nebin. Di rewşa heyî de hema bêje, sîstemê di vê krîzê de derfet û îmkanên xwe yên çareseriyê qedandine. Tenê bi pêşketinên demokratîk pêkan e ku vê krîza evçend giran a sîstema modernîteya kapîtalîst li dawiyê bimîne. Tenê û tenê pêşketinên demokratîk dikarin mirovatiyê ji tehlûkeyên bi vî rengî rizgar bikin.

Sosyalîstan di serê sedsala 20'an de sîstema kapîtalîst analîz kirin û gotin, "Yan sosyalîzm yan jî hovîtî" û bi vî awayî destnîşan kirin ku sîstema kapîtalîst ji bo paşeroja mirovatiyê tehlûke ye, û divê ji sedî sed li dawiyê were hiştin. Bi vê tesbîtê, di çaryekê sedsala 20'an de pêngaveke mezin a tevgera sosyalîst derket holê û herçendî ev rewş li Rûsyayê bi Şoreşa Cotmehê ya 1917'an bi encam bû jî çawa ku tê zanîn negihişt wê astê rê li Şoreşa Ewrûpayê veke. Di encama Şerê Cîhanê yê Dudiyan de bûyerên li qada Rojhilatê Ewrûpayê û Çînê di warê siyasî û eskerî de tevgera sosyalîst kir sîstemeke cîhanê; li ser bingehê blokbûna DYE-Sovyetê û di encama têkoşîna jêre şerê sar hatî gotin de Yekîtiya Sovyetê bi awayekî esasî ji ber sedemên hindurîn di serê salên 1990'î de ji hev de ketiye û hilweşiyaye.

Di sedsala buhurî de li dijî kapîtalîzmê têkoşîna sosyalîst bi ekolên cuda hat meşandin, tevî wan tevgerên ekolojîst û femînîst jî heta asteke berbiçav gav avêtine. Ekolên ku em qala wan dikin, bêhtir di nava tevgerên sosyalîst de bûn û di teşhîrkirina kapîtalîzmê de roleke wan a nayê înkarkirin heye, lê di encamê de bi qasî ku tê xwestin, nebûne xwediyê serketinê. Bi hilweşîna sosyalîzma pêkhatî re gelekî lawaz bûne û paşê jî belawela bûne.

Şoreşa Rûs a Cotmeha 1917'ê û pêkhatina sosyalîzma reel di asta beynelmîlelî de ji bo kedkar û gelên bindest bû hêviyeke mezin; herweha kir ku bindest, kedkar û sosyalîst ji paşerojê piştrast bin. Êdî bîrûbaweriyeke xurt çêbûbû wê sîstema mêhtinkariyê û zordestiya kapîtalîst li dawiyê bimîne. Fikirê lîder û pêşengên sosyalîst ên weke Marks, Engels û Lenîn belav bûbûn û hema bêje, ji dînên heyî zêdetir girseyî bûn. Berevajiyê van hemûyan jî di serê salên 1990'î de hilweşîna sosyalîzma pêkhatî li tevahî dunyayê di heman astê de rê li ber reşbînî, bêhêvîbûn û revê vekir. Bi vê re, sîstema modernîteya kapîtalîst têrê xwe bi hêvî bûye. Pêvajoya 35 salên dawî hinekî jî li ser bingehê van hemûyan meşiyaye.

Bêguman li ser sedemên jihevdeketin û hilweşîna sosyalîzma pêkhatî asteke giring a guftûgo û hizirînê heye. Di vî warî de herçendî hin hewldanên fikirî hebin jî di wê astê de nînin ku ji sosyalîzma pêkhatî derbas bikin û ne xwedî kapasîteyeke yekpare ne ku ji kapîtalîzmê re bibin alternatîf û herweha nekarîne tezên teorîk çêkin. Para bêhtir ev hewldan reva ji sosyalîzmê ne, û di wan de nêzîkatiyên dogmatîk serdest in. Beşek ji wan bi zêde lîberalîzbûnê tevlî nîzama heyî bûn, nêzîkatiya dogmatîk jî bi dubarekirina hin pîvanên teorîk ên ku di rastiyê de çi berdêla wan nîne, bêbandor bûne.

Ji destpêkê ve yê bi awayekî ciddî, afirîner û rexnegîr nêzî hilweşîna sosyalîzma pêkhatî bû Rêber Abdullah Ocalan bû. Her cure meyla revê ji sosyalîzmê, weke "Gumana ji sosyalîzmê, ji mirov û ji hebûna wî ya civakî" pênase kir û bi gotina "Di sosyalîzmê de israr, di mirovbûnê de israr e" ev meyl rexne kir, bi fikir û têgînên nû hewl da rêxistinê bi rê ve bibe. Piştî komploya navneteweyî, li ser sedemên komployê û rêyên ji wê buhurînê gelekî mitale kir, di heman demê de van analîz û tehlîlên xwe bi rexne û mitalekirina li ser hilweşîna sosyalîzma pêkhatî re kire yek, û bi vî awayî di şexsê xwe de şoreşeke zêhniyetê di asta dîrokî de pêk anî.

Rêber Abdullah Ocalan, cara pêşî analîzên xwe yên yekpare derbarê sosyalîzma pêkhatî de bi parêznameya xwe ya bi navê **Ji Dewleta Rahib a Sumer Ber Bi Şaristaniya Demokratîk ve** kir. Paşê qîma xwe bi vê jî neanî û got, "Em di warê îdeolojîk de pêxîrtengî bûne" û bi vê,

navguhertina PKK'ê xist rojevê. Piştre bêhtir ponijî, analîz û tehlîlên xwe kûr kirin, parêznameya xwe ya bi navê **Parastina Gelekî** nivîsî û bi vê, di paradîgmayê de guhertin çêkirin. Bi vî awayî destnîşan kir ku nabe PKK partiyeke bi mîhwer dewlet û xwedî navend desthilatdar be, lewma jinûveavabûna PKK'ê xist rojevê û ev yek li ser bingehê paradîgma "Civaka Demokratîk, Ekolojîk û Azadîxwaziya Jinê" danî ber rêxistinê. Piştre paradîgmaya ku em qala wê dikin, weke alternatîfê modernîteya kapîtalîst bi têgîn û teoriya **"Modernîteya Demokratîk"** bi awayekî berfireh analîz û rave kir. Di parêznameya xwe ya bi navê **Sosyolojiya Azadiyê** de bi sernavê "Li dijî Modernîteya Kapîtalîst Modernîteya Demokratîk" rahend û şaxên modernîteya kapîtalîst, îndustriyalîzm, dewleta netewe û kapîtalîzm eşkere kir û li hemberî van, rahendên modernîteya demokratîk weke civaka exlaqî-polîtîk, civaka eko-ekonomîk û civaka konfederalîst a demokratîk pênase kir. Tevî analîzkirina sedemên hilweşînê, ji her alî ve ji sosyalîzma pêkhatî buhurî, li hemberî modernîteya kapîtalîst ji bo bindestan rêya rizgariyê nîşan da û ji bo vê, teoriyeke nû ya sosyalîst-demokratîk, stratejî û bername danî holê.

Teoriya Modernîteya Demokratîk a Rêber Abdullah Ocalan, her cihê gihiştiyê nexasim jin û ciwan tevahî kedkar û gelên bindest pir bi heyecan û eleqe pêşwazî dikin û li cem her kesê ku kapîtalîzmê wî-wê pêxîrtengî kiriye, hêviyê çêdike. Li ser vî bingehî guftûgoyên derbarê jinûvesosyalîzm û lêgerînên nû yên enternasyonalîzmê dikevin rojevê. Xeta modernîteya demokratîk û çareseriya wê ya neteweya demokratîk di derketina ji bin xirbên sosyalîzma pêkhatî de weke kilîda rizgariyê tê qebûlkirin.

Bêguman weke alternatîf derketin û pêşketina modernîteya demokratî li Rojhilata Navîn gelekî manedar e, û mirov dikare vê fêhm bike. Ji ber ku Rojhilata Navîn dergûşa civaka komîn a dayikê ye, di heman demê de ew cih e ku bûye navenda sîstema dewletdar û dîsa li vir kujerê kastîk ji civaka komîn a dayikê şeq bûye û derketiye holê. Yanî Rojhilata Navîn ew cografya ye, şaristanî lê derketiye û bi pêş ketiye. Modernîteya Ewrûpayê di serî de ev şaristanî, gelek pêşketinên li çar aliyên dunyayê li cem xwe hewandin û bi vî awayî derket holê, lê sîstema kapîtalîst xwest nirxên vê modernîteyê li gorî berjewendiyên xwe bi kar bîne. Li dijî modernîteya kapîtalîst alternatîf modernîteya demokratîk e. Baş e, ev modernîta atlternatîf herî baş dikare li kû derkeve holê, bêguman ev cografya Rojhilata Navîn e. Ji ber ku çanda wê ketiye ser hev, ezmûnên wê têra xwe hene û ev çand gelekî bi hêz e.

Li aliyekî din, modernîteya kapîtalîst di dema xwe ya bi krîz de ye. Di vê demê de Şerê Cîhanê yê Sisiyan diqewime. Navenda vî şerî Rojhilata Navîn e. Di çarçoveya vî şerî de hêzên hegemonîk hewl didin rêyên nû yên enerjiyê diyar bikin, di heman demê de girêdayî Peymana Brahîmî li Rojhilata Navîn Îsraîl hewl dide hegemonya xwe ango zirhêziya xwe pêk bîne. Îsraîlê di vê pêvajoyê de Erebistana Suûdî û Misir jî kirine binçengê xwe û kiriye hedef li herêmê bibe hêza hegemonîk; û bi vî awayî hewl dide hegemonya dîrokî ya Tirk û Farsan bişikîne, van hêzan bixe rêza dudiyan. Ev jî dike ku şer û nakokiyên li Rojhilata Navîn zêde û kûr bibin, pozîsyona Kurdên ku sedsaleke têne înkarkirin û îmhakirin derkeve pêş.

Mezopotamya bi Dîcle û Firatê tîna xwe dişikîne û çawa navenda civaka komîn a dayikê bû di heman demê de navenda pêşketina şaristaniyê bû. Lewma Kurdistan tevahiya dîroka şaristaniyê qada şer û cengên giran bû, cihê pîkola dagirker û êrişkaran bû.

Ji serdema Hûriyan ve, komên li vê erdnîgariyê her tim komên resen û orjîn Kurd bûn; gelek li şaristaniyê zêde kirin û di pêşketina civakê de têra xwe bi kêr hatin. Ji ber rewşa şer, ji ber dagirker û êrişkaran, ji ber sedemên cografîk û debarê xwe weke komên nîv-koçer ên qebîle û eşîran bi rêxistin kirine. Her tim pişta xwe dane çiyayan û li ser vî bingehî xwe parastine û bi vî awayî jiyaneke ewle kirine armanca xwe.

Kengî rêveberiya navendî ya Osmanî li hemberî kapîtalîzma Ewrûpayê bi paş ket û di serê sedsala 19’an de bi ser Kurdistanê de hat, hingê dîroka Kurdan jî destpê kir serberjêr çû. Împaretoriya Osmanî berxwedanên begên Kurdan şikand, lê di Şerê Cîhanê yê Yekê de bi bin ket û ji hev belav bû. Bi vê rewşê re Kurdistan jî weke çar parçe hat dabeşkirin. Li ser kavil û xirbên Osmanî tevgera Kemalîst derket holê û hêza xwe ya esas ji Kurdan û Yekîtiya Sovyetê wergirt. 24’ê Temmûza 1923’an li Lozanê tevî Ingilistan û Franseyê di berdêla dewletbûnê de parçekirina Kurdistanê û înkara Kurdan qebûl kir û peymana di vî warî de îmze kir. Bi vî awayî jî dîroka Kurdan a serberjêrçûyî gihand asta înkar û tinekirinê. Li ser vî bingehî, ji 1925’an heta bi 1940’î berxwedanên Kurdan pelixand û bi vî awayî Kurdistan bi temamî xist nava pencê qirkirinê.

Bi awayekî ji awayan Tevgera PKK’ê li dijî vê rewşê ji sala 1973’an ve derket holê û bi pêş ket; li dijî qirkirina li ser gelê Kurd dihat ferzkirin têgihiştina xweparastinê û çalakiya wê li cem gelê Kurd çêkir. Li dijî darbeya eskerî-faşîst a 12’ê Îlona 1980’î bi Berxwedana Zindanan û Pêngava Gerîla ya 15’ê Tebaxa 1984’an di serê salên 1990’î de rê li ber serhildanên gel vekir û bi Şoreşa Vejîna Neteweyî hebûna gelê Kurd a dijmin xistibû pêvajoya înkar û îmhayê derxist holê, bi giştî da qebûlkirin û ev hebûn misoger kir. Ji 1993’an ve hewl da hebûna Kurd a misogerbûyî azad bike û ji bo vê têkoşîneke mezin meşand. Lê ev têkoşîn li gelek keleman aliqî û di meşa xwe de asê ma, pir xwe dubare kir, keta nava zahf kêmûkurtî û kêmasiyan. Zeman li guhertin û çareyê digeriya, wexta ku ev nebû, xwedubarekirin û xweneguhertinê rê da Komploya Navneteweyî. Li dijî êrişê, Rêber Abdullah Ocalan bi Paradîgmaya Modernîteya Demokratîk gavek avêt û PKK’ê bi vê hewl da xwe biguherîne û veguherîne; bi vê xwest xwe bike hêza çareseriyê.

Kengî ku Rêber Abdullah Ocalan dît ev hewldan hemû têrê nakin, bandora siyasî û eskerî yê şerê 7’ê Cotmeha 2023’an ê Xezeyê li ser Tirkiyê analîz kir, bi **Bangawaziya Aştî û Civaka Demokratîk** a 27’ê Sibata 2025’an fesixkirina PKK’ê û dawîanîna li stratejiya têkoşîna çekdarî xist rojevê. Li ser vê bangawaziyê, PKK’ê di navbera rojên 5-7’ê Gulana 2025’an de Kongreya xwe ya 12’an pêk anî. Di Kongreyê de biryara fesixkirina PKK’ê û bidawîkirina stratejiya têkoşîna çekdarî da. Bi vî awayî, ji bo li ser bingehê Yekîtiya Komînên Demokratîk ên Kurdistanê gaveke nû li ser esasê teoriya Modernîteya Demokratîk, bernameya civaka demokratîk û stratejiya siyaseta demokratîk biavêje PKK li nava rûpelên dîrokê hişt. Ji bo hebûna gelê Kurd li ser xeta neteweya demokratîk bê azadkirin, divê li her qadê komînên demokratîk bêne rêxistinkirin û azadî bi vê pêkan e.

Modernîteya demokratîk alternatîfa modernîteya kapîtalîst e. Rêber Abdullah Ocalan gelê Kurd rohnî û rêxistin kiriye, lewma gelekî giring û manedar e ku gelê Kurd li Rojhilata Navîn pêşengiya modernîteya demokratîk dike. Ji ber ku sîstema kapîtalîst li Rojhilata Navîn a ku gelekî pelixandiye, dîsa li heman cografyayê herî zêde gelê Kurd pelixandiye û kiriye bindest. Tiştek li kû wenda bibe divê mirov li wir lê bigere û her tişt li ser koka xwe hêşîn dibe. Reh û rîşên civakbûna komîn li Kurdistanê ye û şêweyê vê jiyanê herî zêde li Kurdistanê bi bin ketiye. Li ser vî bingehî, tişta wenda yê dîtî û heqîqeta wê peydakirî Rêber Abdullah Ocalan e, wî ev bi Teoriya Modernîteya Demokratîk kiriye. Ya rastî, çareseriya teorîk û stratejîk hatiye peydakirin; ya mayî ew e, çalakî, rêxistin û bicihanîna wê ye.

Di serê sedsala 20’an de tesbîtek sosyalîstan hebû, digotin “Yan sosyalîzm an jî hovîtî”, îca eşkere ye ku ev tesbît bêhtir ji bo kapîtalîzma ku di serdema hilweşînê de ye, di cih de ye. Ji ber ku kapîtalîzm bi rastî jî bûye çerxeke qirkirinê ya xweza, civak û jinê. Eger sedsal berê ev sîstema kapîtalîst li dawiyê hatibûya hiştin civakê evqas ji hev nehatibûya parçekirin, jiyana komîn û hevpar evçend derb nexwaribûya. Maddiyatperestî û ferdperestiya modernîteya kapîtalîst wê evqas bi pêş neketa û belav nebûya, jiyana komîn a civakê wê

evqasî neçilmisiya. Krîz û kaosê evçend kûr nebûya, hebûna xweza û civakê neketibûya tehlûkeyê. Yanî modernîteya kapîtalîst wê evçend bi bandor nebûya.

Eger teorî û pratîka ku ji sîstema modernîteya kapîtalîst a kansêrbûyî bubuhure neyê bipêşxistin, hingê felaketên heyî wê mezintir bibin, hema bêje, mirovatiyê bi çavên serê xwe qiyametê bibîne. Bêguman ji bo vê sîstema felaket û bobelatê li dawiyê were hiştin, beriya her tiştî divê di zêhniyetê de li dawiyê were hiştin. Ji ber ku ev rewşa bi krîz û kaotîk bi awayekî bingehîn di zêhniyetê de pêk tê, sosyolojiya pozitivîst a heyî jêder û çavkaniya krîzê bi xwe ye. Sosyolojiyên heyî bûrjûwaziyê bi xişir xemil dikin û ji bo wê bikin desthilatdar hatine çêkirin. Wezîfeya pêştir ew e, divê mirov li hemberî vê zêhniyetê şoreşeke entelektuel bi pêş bixe û berfireh bike; û li ser bingehê şoreşa zêhniyet û wijdanê di rêya şoreşa heqîqetê de gav biavêje. Sosyalîzma nû divê civaka komîn a berê bi ruh bike, hewl bide xencera li pişta wê hatiye xistin derxe û ji bo vê, divê civaka etîk û polîtîk a bêxencer bike armanc.

Guhertin û veguherîna li Kurdistanê pêk tê, dîsa gava nû ya li ser vî bingehî tê avêtin bi qasî ku neteweyî ye, ewqas jî herêmî û global e. Tevî ku yekîtiya gelan a konfederal a demokratîk dike hedef, di heman demê de li asta global jî pêkanîna komîna enternasyonal dike hedef. Hemin ti tişt bi xwe û bêtêkoşîn nabe, pêk nayê. Têkoşîna bi şêwazê afirîner û uslûba serketin kirî armanc her tim û li her derê pêşketina pêşbîniya wê hatî kirin teqez wê biafirîne.

Di çarçoveya van hemûyan de analîz û tehlîlên teorîk bi awayekî berfireh di bin heşt sernav û beşên sereke de li jêr bêne kirin. Sernav û beşên sereke ev in: Xweza û Mane, Xwezaya Civakî û Problematîk, Di Civaka Dîrokî de Dualîteya Dewlet û Komîn, Modernîte, Problematîka Rojhilata Navîn û Çareseriya Modernîteya Demokratîk, Kurdistan û Rastiya Kurd, Di Dîrokê de Cih û Rola PKK'ê, Xislet û Erkên Serdema Nû.

Beşa Yekemîn
XWEZA Û WATE

1-Diyalektîka Xwezayê

Ji bo mane û manedanê beriya her tiştî "hebûn"ek divê. Mirov nikare bêyî hebûnê qala maneyê bike. Em xwezayê di çarçoveya tesewirên xwe yên zêhnî de nas dikin, lê ev tesewirên me jî bingehên xwe çavdêrî û ezmûnên me yên têkildarî xwezayê ne. Di çarçoveya vê pênasekirinê de hêmanên weke hebûn, wate û ramanê derdikevin pêş ku ew pêkhateyên sereke yên wê diyalektîkê ne ku em qala wan dikin.

Beriya her tiştî divê em qebûl bikin ku mirov zêde fêr nebûye ku têgînên "xweza" û "maneyê" li cem hev û di zikhev de bi kar bîne. Li gorî civaknasiya hemdem xweza, xwezaya fizîkî ye, û mijara zanistên pozîtîvîst e. Wate, mane jî sosyolojîk in, ango babeta civaknasiyê ne, yanî herî zêde dikarin bibin dabeşeke civaknasiyê. Ew jî di çarçoveya hin şert û mercan de. Ango li gorî vê îdraksaziyê xweza û mane du peyv in, xwedî cîhanên cuda ne. Bi vê îdraksaziyê, zêhnê mirov ji rastiya civakî û xwezayî tê qutkirin û ev jî dike mirov hem bibe xerîbê wan û hem jî xerîbê xwe. Bêguman ev di heman demê de dibe encama vê îdraksaziyê. Çawa ku tê zanîn, beriya modernîteyê mirovan bawer dikir ku di şikil û teşegirtina insan de

roleke giring a xwezayê heye, lê modernîteyê di şekilgirtin an jî şekildana mirov de ne xweza lê hawîrdor derxist pêş, hewl da bi perwerde û polîtîkayên çandê ji nû ve şekil bide mirov.

Têgînên xweza û maneyê di zikhev de ne. Ji ber ku wate berhemeke beridandina fizîk û biyolojiyê ye. Eger ev awayê beridandinê nebûya, mirov nikarîbû qala fikir û maneyê bikira. Têkiliya xweza û maneyê bivênevê ye. Mirovê ku li meşa diyalektîkê û dînamîkên beridandinê rast serwext nebe, wê nikaribe li hebûna xwe û cihê hebûna xwe ya di nava diyalektîka xwezayî de jî rast serwext bibe. Friedrich Engels li ser "Diyalektîka Xwezayê" hûrûkûr fikiriye, nivîsiye û bi vî awayî bingehê yekê ji mijarên giring ên hêza fikirê daniye. Giringiya cihê vê di dîrokê de hewceyî nîqaşê nîne. Engels bi van mitale û hûrûkûr fikirîna xwe, analîza metodolojiyeke xurt kiriye.

Çawa ku tê zanîn, du teoriyên sereke hene, bingehê îdeolojiya marksîst pêk tînin. Ya yekê, materyalîzma dîrokî ye. Ev teorî, analîza derbarê civak û dîrokê de ye, teorîsyenê wê Marks e. Ya din jî teoriya materyalîzma diyalektîk e, yê ev teorî jî bi pêş xistiye, Engels e. Materyalîzma diyalektîk, di esasê xwe de teoriya hebûn û zanînê ye. Materyalîzma diyalektîk dibêje, bingehê hebûnê ango zanînê madde ye, yanî dibêje, madde ne statîk e, xwedî liv û lebat e, lewma guhertin û veguherîn li ser bingehê diyalektîk e. Di vê çarçoveyê de em dikarin bibêjin, materyalîzma diyalektîk, hem tevgera maddeyê, hem jî bi vê ve girêdayî çêbûna fikirê li ser bingehê diyalektîkê dimeşe, dibîne. Xala giring a ku em dixwazin balê bikişînin ser ew e; ev encamên ku em işaret bi wan dikin, di encama lêkolînên diyalektîka xwezayê û zimanê wê de hatine bidestxistin.

Hîmên zanistî yên têgihiştina diyalektîka Marksîst li dawiyê man. Di çarçoveya daneyên zanistî yên wê rojê de qebûlkirina maddeyê weke bingehê hebûnê ji aliyê ontolojîk ve tê fêhmkirin. Daneyên ku îro mirovatî gihiştiye wan, qebûla wê demê pûç kirine. Ne nakokî bi xwe, lê mirov dikare balê bikişîne ser hin guhertinên di kareketerê wê de bûne. Li vir tişta giring ew qonaxa mezin e, ya ku Engels di mitale û ponijîna li ser "Diyalektîka Xwezayê" de li warê fikirî derbas kiriye. Engels bi xebata Lewis Henry Morgan a bi navê "Civaka Berê-Kevin" gelekî eleqedar bûye. Li ser "Malbat, Milkê Xusûsî û Koka Dewletê" nivîsiye. Ev hemû jî eleqedar in bi wê hayjêbûna wî ya li warê fikirî. Bêguman mirov nikare vê rastiyê paşguh bike.

Di cîhana îro ya zanist û felsefeyê de bersiva pirsên derbarê "xwezayê" de giring in. Pirs jî ev in: Xweza tiştekî çawa ye, û çawa pêk hatiye. Ji ber ku her tişt bi çîroka xwe heye û bi wê wateya wê çêdibe. Ji bo pênasekirina xwezayê bi awayekî giştî mirov dikare bibêje, ew gerdûna fizîkî ye, li derveyî xwe pêkhatina ti avabûneke din a duyemîn di nava xwe de nahewîne. Weke hebûn mirovan jî di nava xwe de dihewîne, lê bi awayê ku em dizanin awayê wî yê pêkhatina polîtîk û çandîbûna civakî di nava xwe de nahewîne. Civak di nava xwezayê de û bi wê ve girêdayî çêdibe, lê hingê jî weke xwazeyeke duyemîn çêdibe.

Zanist bi giştî hemfikir e ku gerdûna bi mirov a weke kêliya afirandinê tê qebûlkirin û bi gotina Big Bangê tê pênasekirin ango teqîna mezin qederê 13.8 mîlyar sal berê pêk hatiye. Big Bang teqîna enerjiyeke ketîserhev a bêserûbinî ye; li qadeke pir pir piçûk, li qadeke mîkro pêk hatiye. Enerjiya ketîserhev-kombûyî û bi teqîna wê re enerjiyek di asta dûrî aqilan de bi lez belav dibe; pê re qada mîkro berfireh dibe, di encamê de meydaneke makro pêk tê. Ji vê berfirehbûna makro ya ku di neqebeke zeman a mîkro de pêk tê, gerdûn tê gotin. Roja me ya îro jî hin zanyar hene ku dibêjin, gerdûn hê jî berfireh dibe. Lê hinek jî li ser îhtîmala tengbûna gerdûnê disekinin, axir guftûgoyên di vî warî de hê jî dewam dikin.

Li gorî vê teoriyê, di qonaxa pêşî ya gerdûnê de weke madde tenê kuark û gluan tezahur dikin. Ew jî tenê perçikên jêr madeyê ne. Di demekê de ku ji saniyeyê pir kêmtir e, êdî

berfirehbûn sist dibe û germa jî kêm dibe, kuark û gluan dibin yek, proton û notron pêk tên. Piştî çend deqîqeyan germa bêhtir kêm dibe û dadikeve qederê mîlyarek pileyan. Beşekî mezin ê protonan weke sîsik an jî pirtikên hîdrojenê serbixwe dimînin. Beşekî proton û notronan jî digihîjin hevdu sîsik-kakilê doteryûm û helyûmê pêk tînin. Di encama vê pêvajoyê de protonên pozîtîf barkirî elektronên negatîf barkirî dikişînin û atomên pêşî pêk tînin. Ha ev atomên besîd, hîmên bingehîn ên pêkhatina stêrkan in. Bi gotineke din, stêrk ji van atomên besît pêk hatine.

Fikira derbarê atomê de li serdema pêşî weke têgîneke mucerred (abstract) û besît derdikeve holê. Bi demê re xwezaya atoman ji hev hat derxistin. Îro roj jî kes bêyî zanista atoman li tiştekî nafikire. Gelek amûrên rojane têne bikaranîn ên weke radyo, TV û komputer bi saya vê zanistê hene.

Pêkhatina galaksî û stêrkan ji atoman, piştî teqîna mezin bi sedsal mîlyonan e. Pêkhatina sîstema rojê û pêkhatina dunyayê jî piştre bi neh mîlyar salan e. Baş e, ev çawa pêk hat? Dema ku gerdûn berfireh bû, madde bi awayekî wekhev li fezayê belav bû. Lê dema ku di ketina serhev û kombûna maddeyê de hin kêmasiyên piçûk çêbûn û hin tişt durist nemeşiyan, hêza kişandinê ya girseyê dikeve dewreyê û vê rewşê jî kir ku li hin qadan madde-enerjî bikevin serhevdu. Bi vî awayî jî bi piranî ewrên gazê yên hîdrojen û helyûmê çêbibin. Ha stêrk, ji van ewrên gazê yên ji wan re nebûla dibêjin, çêbûn. Herêmên ji nebûlayê mezintir, bi sedema hêza kişandinê ya girseyê, dibe ku van ewrên gazê ber bi xwe ve bikişînin. Ev herêm dibe ku bi demê re rê li ber fuzyonên nukleer vekiribe. Reaksiyona fuzyonê dike ku hîdrojen veguhere helyûmê û di encama vê reaksiyonê de mîqdareke mezin rohnî û germahî çêdibe. Roj jî di navê de sedema stêrk ewqasî dibiriqin, ev teqînên reaksiyonîk in. Hêza kişandinê ya girseyê hem stêrk pêk anîne, hem jî ew di çerxeke felekê de ragirtine, ew xistine weznê, pê re jî bi vî awayî galaksî pêk anîne.

Fîlozofên Yewnan, ji şaneya herî piçûk a maddeyê re atom digotin. Çawa ku xuya dike, pêvajoya pêkhatina atoman gelekî wext girtiye. Beriya wan kuark û perçikên jêr atoman pêk hatine. Beridandina xwezaya fizîkî, pêkhatina rêya kadizê, çerxa felekê ya rojê, dunya û serhatiya wê, çêbûna zindiyan û beridîn ji wan mijaran in ku divê mirov hûrûkûr bi wan dakeve û ev jî li derveyî sînorên mijar û babetên me ne.

Em para bêhtir hewl didin li xwezayê, zimanê wê û diyalektîka wê bihizirin. Em bi vî awayî li meseleyê kûr dibin û pê dadikevin. Çawa ku tê zanîn, zanista klasîk a ku Newton sertacê wê bû, li cem me têgihiştinek çêkiribû; tê de gerdûneke bêcan, bêruh û mirî hebû. Lê kengî Einstein bi formula xwe ya navdar a $E = mc^2$ diyar kir ku madde û enerjî di cewherê xwe de heman tişt in, û rûyên cuda yên heman rastiyê ne, hingê têgihiştina gerdûna mirî di dîrokê de li paş ma. Ya rastî, wexta ku mirov li herikbarî û rewanbûna enerjiyê dinêre, li hêza wê ya afirêneriyê difikire, ne pêkan e ku mirov li zindîbûn û rewanbûna gerdûnê serwext nebe. Têgihiştina li gerdûna zindî, ne tenê fikira me ya li dunya maddî guhert, wê em neçar kirin ku em fikira xwe ya derbarê her tiştî de biguherin.

Fizîka kuwantûmê têgihiştina gerdûna mirî hilweşand û îsbat kir ku gerdûn zindî ye. Di awayê fikirînê yê pêşî de ango di anîmîzmê de, di cewherê wê de têgihiştina "xweza zindî ye" heye. ‘Anîme’ maneya xwe can-ruh e. Li gorî awayê vê fikirê, di xwezayê de her tişt can û ruhekî xwe heye. Mirovê ji xwezayê qutnebûyî û bi awayekî ku wê his bike dijiya, ne bi zanistê, lê bi hestên navxweyî yan jî bi hiskirinê bi zindîbûna xwezayê derdixist. Ev awa, têra xwe balkêş e. Keşfên zanistî yên zanyarekî mîna Newton bi qasî tevahiya 200-300 salan mirov li hemberî gerdûnê kor kirine. Ev jî tê wê maneyê, zanist jî dikare mirovan fêhmkorî û çavkorî bike.

Eger gerdûn zindî be, ev zindîbûn tiştekî çawa ye? Vê pirsê kir ku zanist bikeve nava lêgerînê; wê berê xwe da lêkolana perçikên jêratoman, fizîka kuwantûmê, analîzên gerdûnên mîkro-makroyê û teoriyên tevlîhev ên di zikhev de (*Complexity Theories*). Di encamê de vê jî kir ku nuqteya me ya di zanînê de em lê disekinin û li gerdûn û xwezayê temaşe dikin, biguhere û pê re dunya me ya maneyê guherî. Axir, di nêrîna me ya li gerdûn, xweza, civak û mirov de asoyên nû çêkirin.

Di fikiriyata rojhilat (şerqê) de gelek awayên bi vî rengî hene. Tiştên zanistan îro îsbata wan kirine, hema bêje, mufekîrên Rojhilat beriya niha bi 2-3 hezar sal berê bi hest û hisên xwe dîtine, têderxistine. Eger mirov fikira Rojhilat bi şoreşên îro yên zanistî re bixwîne, wê gelekî balkêş be, û heye ku mirov gelek tiştan jê hîn bibe.

Zindîbûn çi ye, çawa çêbûye? Li rûyê zemînê peydebûna zindiyan û çêbûna wan hema bêje ji bo mirovan mûcîzeyek e. Belkî ji vê be, piraniya insanan çêbûn û afirandina mirov disipêrin Xwedê û wisa bawer dikin. Lê wexta ku mirov li xwezayê binêre bê ka çawa beridiye, mirov dikare bibîne mesele ne mûcîze ye. Eger em ê qala mûcîzeyekê bikin, ew jî di diyalektîka gerdûnê de ye. Xweza bi xwe di nava liv û lebatê de ye, zindî ye, diyalektîk e, û ya esas veguherîn e. Ya hewcedariya wê bi fêhmkirinê heye, ew jî çawabûna wê ye. Ango ev çawa pêk tê. Ya giring û esas ew e; mirov li diyalektîka veguherînê serwext bibe.

Di dîrokê de cara pêşî Charles Darwîn sala 1859'an bi pirtûka xwe ya bi navê "Koka Cureyan" tevî daneyên jeolojîk îddîa kir ku çêbûn û belavbûna nebat û heywanan li rûyê zemînê bi rêya guncavbûna xwezayî (*natural selection*) bûye û bi demê re beridîne.

Ji ber ku teoriya wî li gorî dema xwe bû û xwe disipart daneyan, bawerî pê hat û cihê xwe girt. Dem ew dem bû ku zanist li rewacê bû, qedrê zanistê hebû. Paşê Darwîn bi berhema xwe ya bi navê "Zêdebûna Mirov" fikira xwe ya di Koka Cureyan de li ser beridandina mirov tetbîq kir. Bi gotineke din, lêkolîna xwe ya derbarê heywan û nebatan de li ser beridîna mirov tetbîq kir.

Heta wê demê çêbûn û afirandina mirov li gorî pirtûkên pîroz ên dînî hatibû ravekirin. Ji lewra Darwîn pir hişk hat rexnekirin û bertekên dijwar li dijî wî çêbûn. Piştî teoriya Darwîn a 'Beridînê' (*evolution*) jî gelek hat rexnekirin û teoriyên wî yên mîna guncavbûna xwezayî (*natural selection*) dibe ku aliyê wan ên bi pirsgirêk û kêm hebin, û bêguman hene. Eşkere ye ku têkiliya vê teoriyê bi sîstema kapîtalîst re heye. Ma ne, kapîtalîstan teoriya beridînê ji bo berjewendiyên xwe baş bi kar anî. Lê tevî van hemûyan jî Darwîn werçerxeke giring a dîrokê ye. Ya em işaret pê dikin û qala wê dikin ew e ku ji awayê fikirê yê xwe disipart dogmayên dînî gav ber bi fikira zanistî-aqlî (rasyonel) ve hat avêtin.

Wexta ku em bi babeta zindîbûnê dakevin rahend û şaxekî giring ê em nikarin paşguh bikin, mirin e. Zindîbûn, yanî biruh û bêruhî bi mirinê re di zikhev de ne. Guherîn-veguherîna di xwezayê de tê wê maneyê, hertim hin tişt li dawiyê têne hiştin an jî hin tişt ji hin tiştan dibihurin. Afirînerî û hilweşandin di zikhev de ne. Di vê çarçoveyê de tişta ku maneyê dide zindîbûn-biruhbûnê, mirin bi xwe ye.

Li gorî teoriyê, berê zindiyên yekşane hebûn, piştre pircure û celeb çêdibin. Rêzbendiya şaneyên nû çêdibe û pê re cureyên nû çêdibin. Rêzbendiya şaneyan li cem insan, mirov dikare weke xwerêxistinkirina şaneyan bibîne. Rêzbendiya şaneyan a herî tevlîhev û pêkhatina wan, di mejiyê mirov de bi gewde bûye. Di mejiyê mirov de bi trîliyonan şane hene. Rêzbendî û têkiliyên şaneyên li vir enerjiyeke balkêş çêdikin. Tişta ku jê re 'mirina mejî' jî tê gotin, bi herhalî wexta ku ev rêzbendî û têkiliya di navbera şaneyan de bi dawî dibe, pêk tê. Ev tê wê maneyê; zindîbûn an jî bicanî, ne tenê meseleya rêzbendiya şaneyan e, bi têkiliya di navbera vê rêzbendiya şaneyan de her awa hilberîna enerjiyê ye.

Sedsala 21'ê derbarê esasê hucreyê de hûrûkûr hatiye lêkolan. Li gorî vê lêkolînê, her kêliyê di mejî û gewdê mirov de bi mîlyonan şane çêdibin, dîsa bi mîlyonan şane dimirin. Ango çêbûn û mirin, zindîbûn û tinebûn li cîhana şaneyan bi hev re û di zikhev de pêk tên. Her şaneya nû, bi kapasîte û qabîliyeta xwe ya têkilîdanînê re çêdibe. Şane vê potansiyela xwe bi kar tînin, bi şaneyên din re têkiliyê datînin û eger karibin bi wan re kombînasyonê çêkin, dikarin bijîn. Eger nikaribin têkiliyê deynin an jî daneynin, bi ser xwe de hildiweşin û dimirin. Jixwe, ne xwedî zemanekî bêserûbinî ne, zemanê wan ji bo vê têkilîdanînê bi sînor e. Ya rastî, zemanekî wan ê diyar heye. Yan wê di nava vî zemanê diyar de bi şaneyên din re têkiliyê deyne û bijî, yan jî wê bimire, tine bibe.

Ev tê wê maneyê; mesele ne tenê rêzbendiya şaneyan e, heta hebûna wan e, ji bo şane bijîn pêdiviya wan bi têkilîdanînê heye, ya rastî, hewcedariya wan bi rêxistiniyê heye. Gelo têkiliya vê xisleta şaneyê, dibe ku bi sosyolojiya mirov re hebe? Belkî ji vê be, mirov hebûneke civakî ye û nikare li derveyî civakê bijî ango belkî ji vê xisleta şaneyê be, ji vê xisleta genetîk be. Babeteke balkêş e, hêja ye ku mirov li ser bifikire û serê xwe pê biêşîne.

Berî ku em derbasî mijara maneyê bibin, hewce ye ku em li ser beridîn û awayê çêbûna mejî rawestin. Ji ber ku ew navenda hilberandin û çêkirina maneyê ye. Mejiyê mirov di warê fikir, hest û jiyanî de xwedî sîstemeke navendî ya mûrehkan e. Ev fonksiyonên mejî yên fikir, hest û jiyanê, her yek ji wan li qadekê mejî bersiva xwe dibînin û mejî bi demê re dibe xwediyê van fonksiyonan. Jixwe, ev pêşketineke welê ye, bi demê re diberide.

Di tebeqa pêşî ya mejî de beşê pêşî yê çêdibe mejiyê jiyanî ye. Ji vî re "mejiyê jêr", "mejiyê kevin", "mejiyê bertekî", "mejiyê xuşende" (*reptilian brain*), "mejiyê pêşî" jî tê gotin. Mejiyê bertekî fonksiyonên zindîbûnê yên klasîk sererast dike; mînak germbûna bedenê, hilavêtina dil, hilmgirtin û dayîn, sîstema xwarin û vexwarinê. Ev xisleta mejî têkiliya xwe bi man û nemanê re ye.

Qatê dudiyan ê mejî qatê hestyar e. Ev mejî bi zindiyên xwedî guhan re heye. Lewma jê re mejiyê bi guhan jî dibêjin. Mejiyê lîmbîk e (*limbic*). Ev qatê mejî şêweyê biryarên hestî bi gewde dike û bi agahiyên hestî rê dide ber wan. Xwedî bîrekê ye, dikare dost û dijminan ji hev derxe, lewma ev qatê mejî tê perwerdekirin.

Di qatê sisiyan de mejiyê fikirê heye. Ev mejî tiştan ji hev derdixe. Ji ber ku ev mejî tenê bi mirov re heye. Xisleta wî ya bingehîn mucerredbûn e. Mirov dikare wisa rave bike; biryarên li qatê pêşî hatine girtin û di qatê dudiyan de bi gewde bûne û rêya xwe dîtine, li qatê sisiyan hem kontrol dike û hem jî bi pênase dike. Lewma li gorî qatê pêşî qatê sisiyan, ne qatê navenda biryarê, lê qatê bêbiryarbûnê ye. Biryar çendî zû were girtin, mejiyê fikirê ewçend li derveyî dewreyê dimîne.

Di mijarên jiyanî de herçendî mejiyê xuşende li pêş û beza be jî mejiyên din jî wî dixin weznekê. Li gorî diyalektîka xebitîna mejî, mejiyê navî yan jî mejiyê hestî yê xwedî sîstema lîmbîk xwedî kêrhatineke krîtîk e. Ev mejiyê bi guhan tevî ku bi serê xwe jî dixebite, di heman demê de bi mejiyê li ser xwe bi mejiyê fikirê û bi mejiyê li binê xwe bi mejiyê xuşende re di nava têkiliyê de ye. Bi pênasekirineke rast û durist mirov dikare bibêje, sîstema têkilîdanînê ye.

Mejî ji sedî 25ê glukoza gewde digire, ji sedî 20ê oksîjenê bi kar tîne û ji sedî 18ê xwîna di gewde de digere ber bi xwe ve dikişîne. Di paşxana beridandina mejî de ji bo pêşdebirina hêza fikirê bertek nîne yan jî armanca xwe tineye. Berteka wî ya bingehîn ji bo domdarkirina jiyanê ye ango armanca xwe zindîhiştina gewde ye. Raboriyeke xwe ya 500 mîlyon sal heye. Tebeqeya mejiyê mirov jî 200 hezar salî ye. Di mejî de qederê 100 mîlyar noyron (şaneyên hêrsê) hene, 80 mîlyar ji vê di mejiyê xuşende de ne. Erka van noyronan ew e, gewde zindî bihêlin. Tevgera van 80 mîlyar noyronan ji sedî 8'ê enerjiyê xerc dike. Mejiyê difikire û

sîstema lîmbîk ê xwedî 20 mîlyar noyron jî ji sedî 17'ê enerjiyê bi kar tînin. Ev enerjî, li ser rêya bi mîlyaran têkilîdanînên ku bi ponijîna di navbera noyronan de derdikevin holê, tê xerckirin, ji van rêyên têkilîdanîna di navbera noyronan de sinaps tê gotin.

Mejiyê kevin ê em jê re mejiyê xuşende jî dibêjin, namire, naweste, bêhna xwe venade, her tim bi liv û lebat e, dibeze û jêhatî ye. Mejiyê kevin ji sedî 83 bi dîtinê hîn dibe. Çi dibîne jê bawer dike. Xwedî xisleta domdariyê nîne. Bala xwe li serî û dawiya meseleyê ye. Tiştên kin, besît û berbiçav hîn dibe û di bîra xwe de digire. Tiştên ji bo xwe qenc û xirab dikare ji hev derxe. Dost û dijminan ji hev derdixe. Tiştên derbarê jiyanê de yanî tiştên ku ji bo ruhber li jiyanê bimîne lazim in, kontrol dike, weke xwarin û vexwarinê, xweparastinê, zuriyetê. Di vî warî de rêzan e. Li vir xisleta herî giring awayê rêveçûna mejî ye.

Mejî weke ruhberan di nava pêvajoya dîrokî de gav bi gav beridiye û sîstemeke mûrehkan a ji beşên cuda pêk aniye. Mejî weke mejiyê xuşende **(reptilian brain)**, mejiyê bi guhan **(limbic system)** û mejiyê modern an jî mejiyê bi fikir **(neokorteks)** di nava sîstemeke hevpar û têkiliyan de li ser bingehekî diyalektîk bi hev re dixebitin. Ango mirov dikare bibêje, mejiyê hestî bêyî mejiyê analîtîk nabe. Eger bibe jî ew jî ne mejiyê mirov e, belkî mejiyê makîneyekê be. Li cem aqlê çêkirî (AI) dibe aqlê hissî nebe. Erê em wisa dibêjin, lê niha hewldan û xebat hene ku aqlê çêkirî hînî hestan dikin. Xulase, aqlê çêkirî xwedî mejiyekî entelektuel e, dibe ku ji mejiyê hissî qut be, jixwe wisa ye. Lê ji bo mirov mejiyekî wisa tineye. Mejiyê mirov hem ji aliyê biyolojîk ve hem jî ji aliyê xebitînê ve diyalektîk e.

Gotina "diyalektîk" reh û rîşên wê Aryenî ne, ango Kurdî ne. Ev gotin, dualîteyê îfade dike. Dualîteya tarî û ronahiyê ya Zerdeştiyê ji fikira diyalektîkê re zemînekî felsefî çêkiriye. Ewrûpayê, ev girtine û awayekî nû yê vegotinê daye wan. Diyalektîk bi awayekî xwezayî ji xwezayê tê. Lewma mirov dikare ji pênasekirina Engels a "Diyalektîka Xwezayê" xweş hîn bibe. Diyalektîka civakî jî ji diyalektîka xwezayê ne qut e. Ev diyalektîk xweseriyên xwe hene, lê di heman demê de pê re di nava têkiliyê de ye û bi vî awayî pêk tê. Di vê nuqteyê de felsefeya Hegel giring e. Li cem Hegel wate, ango civak derdikeve pêş. Mirov dikare "Fenomenolijiya Can-Ruh" weke xweza û wateyê tercûme û şirove bike.

Xweza, diyalektîk, karakterên xwe yên nakok hene. Di felsefeyê de ev weke tez, antî-tez, sentez tê pênasekirin. Tez, antî-tez a li cem Hegel jî diyalektîka vê xwezayê ye. Hegel wisa dibêje, lê Engels ji vê re 'nakokî' dibêje. Heta Engels vê nakokiyê, vê dijberiyê weke 'tinekirin' fêhm dike. Têkoşîna çînî, pevçûna çînî ya di Marksîzmê de weke tez, antîtez bingehê wê Hegel datîne. Hegel vê weke tez, antî-tez diyar dike. Marks ji vê re "nakokiya çînî" dibêje, jê re dibêje, "Dîrok têkoşîna çînan e". Bêguman ev maneyeke xwe ya diyar heye, lê ew vê ji hedê wê zêde dibe, ji eyarê wê derdixe. Sedema ku ew di vê de zêdegaviyê dike, ew pêşbîniya wî ye ku dibîne, proleteryayê bûrjûwaziyê tine bike. Lewma dîktatoriya proleteryayê ji xwe re dike esas û teoriya wê datîne holê. Bi vî awayî îdealeke kominîzmê derdikeve holê.

Em ê li şûna teoriya "Dîrok têkoşîna çînan e" teoriyeke nû çêkin. Guhertin an jî sererastkirina em bikin ev e: Di gerdûn û civakê de çînek çîneke din tine nake. Nabe ku diyalektîk bi vî awayî were şirovekirin. Ji ber ku Stalîn wisa şirove kir bi mîlyonan welatiyên xwe kuştin. Mao şoreşa çandî kir, ew jî bi ser neket. Ji ber ku di xweza û gerdûnê de tiştekî wisa tineye. Tişta heyî veguherîn e, veguherîneke bi nakok e. Jixwe veguherîn bi awayekî nakok dibe. Eger nakokî nebe, veguherîn çênabe. Fena serma û germayê. Kakilekî germ ê dijwar heye, û xwezayeke sar a dijwar heye. Eşkere ye, du seriyên dijber in. Ev çîrokeke meşhûr a gerdûnê ye, û ev hê dewam dike.

Fikira dibêje, gerdûn berfireh dibe heye. Dîsa teoriyek heye dibêje, gerdûn wê raweste û bicemide. Hinek dibêjin, wê enerjiya navê piştî demekê kêm bibe, teqîna enerjiyê ya berfirehbûnê pêkan dike, wê bi dawî bibe. Kengî enerjiya kunên reş biqede, îca wê berevajî wê, xwe biguvêşe, bi nava xwe ve hilweşe, berfirehbûn wê raweste, tengbûn wê destpê bike û weke beriya teqîna pêşî wê biçilmise û bi vê re hilweşîn wê çêbibe.

Mirov dikare pirseke wisa jî bike; gelo em niha di qonaxeke wisa de ne? Li gorî tesbîtên giştî berfirehbûn hê dewam dike. Pêvajoya hilweşînê hê dest pê nekiriye, lê dibêjin, dibe ku destpê bike. Yanî bi vî awayî nêrîn û fikirîna li gerdûnê heye. Ev fikir hemû qala çilmisîn, xweguvaştin û kumişînê dikin. Jixwe wexta ku enerjî xwe biguvêşe dibe madde. Ew ê li ser bingehê perçik mezinbûnekê jî çêke. Wexta ku sarî belav bibe misêwa perçikên maddeyê wê çêbibin. Û ew perçik wê enerjiyê dahf bidin. Ji ber ku enerjî heye, çavkaniyeke mezin wê çêbibe. Hingê hin stêrk û galaksî wê derkevin holê. Îca wê galaksî hevdu dahf bidin. Ev hê didome, nesekiniye. Li vir pirsa esasî ev e: Wexta ku enerjî biqede wê çibibe? Bersiv jî wisa ye: “Her tişt wê biqede, bitemire. Wê gerdûneke sar a mezin pêk bê”.

Li hemberî vê tişta ku em bibêjin ev e: Eger tiştekî wisa rast bûya wê heta niha ji zû ve qewimî bûya. Eger îhtîmaleke wisa hebûya, niha ev gerdûn wê tinebûya. Eger em hê di nava gerdûneke wisa de ne, em dikarin maneyê bidin teoriya hilweşîn û berfirehbûnê. Eger teoriya rawestîna mezin rast bûya -jixwe fikira ezeliyetê heye- lewma lazim bû di nava qonaxeke wê ezeliyetê de rawestandina mezin pêk bihata. Û eger ev îhtîmala rawestînê hebûya ev ê ji zû ve pêk hatibûya. Hingê em ê nebûna, roja me wê nebûya, zindî û ruhber wê nebûna. Seba vê, wexta ku em pîvana ezeliyetê li ber çav bigirin, divê ev îhtîmal şaş be. Dibe ku mirov li berfirehbûnê, li tengbûn û hilweşînê bifikire, lê ev tez pir zêde bi isbat xuya nake.

Xulase, ev teoriyên nîvco ne. Hinek tişt têne ravekirin, lê belkî gerdûn ne wisa ye. Jixwe têgînên “maddeya tarî” û “enerjiya tarî” hene. Tişta ku galaksiyan li ser piyan digire enerjiya tarî û maddeya tarî ye. Diyar nîne, ev çi ne. Tiştekî din jî tê gotin, gerdûna xuya dike ji sedî 6 e, gerdûna xuya nake ji sedî 94 e ku ew jî madde û enerjiya tarî ye. Hê kesî nikariye vê jî pênase û rave bike.

Bi van teorî û doktrînan, eşkere bûye ku fikira materyalîst a cîhanê û têgihiştinên heyî yên derbarê gerdûnê de nikarin her tiştî rave bikin û têrê nakin. Pêdivî bi bêhtir fikirîn û ponijînê heye. Her ku lêkolîn û lêgerîn kûr bibin, eşkere ye ku wê sirr û razên nû bipişkivin. Perçikekî herî piçûk ê ku derkeve holê, dibe ku were maneya her tiştî. Fikireke bi vî rengî bi xwe jî raman û hizra tijî sirr û raz wê sor bike, mirovan dahf bide ber bi ponijandinê ve. Em jî bêyî ku bibin êsîrê dogma û qaliban her bifikirin.

Tişta ku mirovbûnê dike pêkan, mejiyê analîtîk ê xwedî qabîliyeta mucerredkirinê ye. Mirovbûn an jî civakîbûn li ser bingehê hilberîna maneya mejiyê analîtîk xwe çêdike û pê dibe heyîn. Bala xwe bidinê, xweza hebûneke zindî ye, bi afirêneriyeke diyalektîk her tim xwe nû dike, pir celeb û cure dibe. Ev awa heta bi beridîna mirov û şikilgirtina mejiyê wî diçe. Weke encama vê beridandinê mirov li xwezayê vedigere, diyalektîka wê lêdikole, hewl dide xwe nas û pênase bike. Bi vê hewl dide maneyê bide xwe. Eger wisa be, em nikarin mirov weke xwezaya li xwe difikire pênase bikin? Ango wate, bingehê ontolojîk û hêmana damezirîner a civakîbûnê ye. Ji bo vê jî hebûn pêwîst e.

Ji roja ku fikira felsefî destpê kiriye, mijareke neguher a guftûgoyê ye. Çi tişt hene, hebûn çi ye, bi awayekî berbiçav weke rewşa pêkhatî ya kirinekê gelo mirov dikare hebûnê bibîne, em çawa dikarin bibêjin tiştek heye? Bi qasî ku xuya dike, ev guftûgo besît e, lê ya rastî mijareke têra xwe tevlîhev e, li dora xwe gidîşeke pirsan diafirîne. Ev guftûgo li cem fîlozofên hebûnparêz (*existentialist*), nexasim li cem Martin Heidegger dibe mijareke hûr û

kûr. Fîlozofên weke Leibniz, Bergson û Deleuze bi analîzên xwe yên rohnîker di felseya li ser HEBÛN'ê de li pêş xuya dikin.

Têgîna maneyê jî weke têgîna hebûnê, heta jê wêdetir, bi awayekî pir giran bûye yek ji mijarên zor û zehmet ên guftûgoyê. Tevî ku gelek sedem hene, têgîna maneyê zehmet dikin, lê ya giring têkiliya di navbera diyarde û maneyê de ye. Ji ber ku di navbera diyarde û maneyê de îdrak heye û îdrak jî xwedî wê potansiyelê ye ku dikare tiştan xwaromaro bike. Em diyardeyan dikarin weke rastiyan pênase bikin; em bi têgînan û ziman derbarê wan de difikirin. Lê tişta ku em bi têgînan pênase dikin, temamê rastiyê di nava xwe de nahewîne, tenê beşekî derbarê wê de ji me re bi sînor pêşkêş dike. Ma ne, her tişt her kêlî diguhere, vediguhere û xwe nû dike. Ev jî dike ku rastiya diyardeyê û têgîna wê ya ku hewl dide wê pênase bike, ji hev dûr bibin. Û ev seyrûsefer dûrûdirêj dibe, diçe.

Tevî zor û zehmetiyên bi vî rengî jî, ji bo çêkirina maneyê ji bilî têgînan, bi wan û bi têgînafirandinê mucerredkirina rastiyê rêyeke din tineye. Lê giring û lazim e ku mirov derbarê têkiliya têgîn-mane-rastiyê de hay ji xwe hebe. Naxwe têgîn dikarin me ji mane û rastiyê dûr jî bixin. Mane hêmanê damezirîner ê civakîbûnê ye.

Maneya xwezayê di diyalektîka wê de ye, lê meqseda me ji 'maneyê' mûtlaqiyet nîne. Têgîneke ekonomîk heye, jê re dibêjin "Qatjimara Gînî"[3]. Bi vê, qala rewşa nirx a di navbera 0 û 1'ê de tê kirin. 0 rewşa mutleq a wekheviyê pênase dike. Wexta ku rewş ber bi 1'ê ve diçe rewşa newekhev a mutleq çêdibe. Mutleq di 0'ê de nepêkan e, mutleq di 1'ê de ye. 1 û 0 hejmarên ferazî ne (*imaginary numbers*). Mirov dikare ji bo wan maneya mutleq, geista mutleq û bêwatebûna mutleq bifikire, lê ew pêk nayên. Têgîna "1" û "0" vê pênase dikin.

Di fizîka kuwantûmê de pîvanek bi navê "pîvana nediyariyê" heye. Xisleta vê pîvanê wisa ye: Eger tu leza diyardeyekê teqez bizanî, tu yê cihê wê, lê tu cihê wê teqez bizanî tu yê leza wê nizanibî. Pîvana lezê ya ji bo diyardeyê bandorê li ser cihê wê dike. Berevajiyê wê jî dibe. Ango di vê çarçoveyê de zanîna mutleq, ne maneya mutleq e. Zanîn û nezanîn di zikhev de ne. Li cihê zanîn hebe, nezanîn jî wê hebe. Tu tiştekî teqez zanibî tu yê teqez jî nizanibe. Lewma zindîbûna mutleq û miriniya mutleq nabin.

Ha ji bo vê, ceribandina li ser pisîkê ya Erwin Schrödinger mînak e. Vê ceribandina sala 1935'an hatiye kirin, di mentiqê de çi nûbûn çêkiriye? Pirs ev e: 'Gelo pisîka di qutîkê de zindî ye yan mirî ye?' Tu nikarî bersiva 'yan Zindî ye, yan jî mirî ye' bidî. Bersiva rast ev e: 'hem zindî ye, hem mirî ye'. Ji bo zindîbûnê mirin, ji bo mirinê jî zindîbûn divê. Li cihê mirî hebe, zindî wê hebe, li cihê zindî hebe jî mirî wê hebe. Li vê gerdûnê di her tiştî de ha ev pîvana "hem-hem jî" heye. Li şûna têgihiştina "yan-yan jî" têgihiştina "hem-hem jî" ya xwe disipêre nêrîneke paradoksî bêhtir nêzî heqîqetê xuya dike.

Di diyalektîka xwezayê de mirov dikare li ser têkiliya obje-subje (tişte-kirde) yan jî hevsengiya wan çi bibêje? Bêguman wê di xwezayê de hevsengî û duserî jî hebin. Û ev di nava livûlebatê û pevçûnê de ne. Dibe ku rewşên wan ên pevçûn, hevsengî û wekheviyê hebin. Lê tişta ku qala wê tê kirin, newekheviya mutleq e, hevsengiya mutleq jî nîne. Eger mutleqiyet hebe, gerdûn nabe, çênabe. Em qala diyalektîkê, fikira diyalektîk dikin. Fikira diyalektîk zor e, nazik e, mîna kefika teraziyê ye, radibe û dadikeve, dike nake hevseng-wekhev nabe, gelekî hasas û nazik e. Teqil, rîtm û pêla gerdûnê jî wisa ye. Hevsengiyeke

3 Statîstîkvanê Îtalî Corrado Gînî sala 1912'an têgîna "qatjimar a Gînî" bi kar aniye. Bi vê, di aboriya welatekî de rewşa neadil û newekhev nîşan dide. 0 wekhev be 1 jî rewşa newekhev pênase dike. Rewşa di navbera 0 û 1'ê de jî rewşa nisbî nîşan dide.

mutleq, teqez tineye. Eger hevsengiyeke teqez hebûya cihêrengî, pirbûn û pircuretî wê çênebûna, em ê nebûna, çênebûna. Ev pircuretiya dewlemend a li ber çavên me, ev gerdûna bi heybet û balkêş, bi saya bêhevsengiya ku me ji bo diyalektîkê behsa wê kir, pêkan bûye.

Me qala 'Qatjimara Gînî' kiribû, di wê mînakê de jî me bal kişandibû ser mutleqiyetê. Eger em li wekheviya mutleq bigerin, maneyê vê wê rawestîna mutleq be. Wekheviya mutleq, hemanbûna mutleq e. Di wekheviya mutleq de gerdûn disekine, jiyan nabe. Gerdûn di nava livûlebatê de dipişkive, berfireh dibe. Gelo sedema pişkivîna wê dibe ku ji meyla wê ya cudabûnê be? Bi teqîna enerjiya hişk-kombûyî û xweguvaştî re perçik çêbûne. Roja me ji mîlyar stêrkan tenê yek e. Ji gerstêrkên di nava çerxa feleka rojê de jî tenê li dunya me jiyan heye. Ev jiyana ku em qala wê dikin jî ji şaneyeke piçûk derketiye holê û ev şaneya piçûk ji mîlyonan zindiyî re bûye mak û jêder. Ji heywan û nebatên zindî jî bi mîlyonan cure û celeb zêde bûne. Mirov jî ji van cureyan tenê yek e.

Cihêrengiyek heye. Hêz û dînamîkek rê li cihêrengiyê vedike heye. Ango ji bo cudabûn çêbibe dahf dide. Cudabûn çêbûna cureyan e. Her cureyek rê li ber çêbûna cureyên nû vedike. Tişta ku rê li ber vê jî vedike diyalektîka di gerdûnê de ye. Cudabûn û cihêrengî neçar e ku pêk bê, ji ber ku cudabûn nebe ti pêşketin çênabe, jiyan çênabe. Ji bo pêşketin çêbe divê cudabûn çêbe. Gerdûn bi cudabûnê çêdibe, berevajiyê wê jî ne pêkan e, wekî din jî nabe mirov lê bifikire.

2-Diyalektîka Têkiliyatiyê

Di têkiliya xweza û maneyê de sê têgînên bingehîn derdikevin pêş; fikir, beridîna biyolojîk û diyalektîka xwezayê. Ji bo mirov xwezayê fêhm bike, divê teqîna mezin a bi navê Big Bang fêhm bike. Divê mirov Big Bangê bi berî û paşiya wê fêhm bike. Bêguman a herî giring jî fikir e. Fikir têkiliya xwe bi mejî re heye. Li quncikeke mejî liveke elektrîkî çêbe, heta rê dide ber hestan jî. Maneya his û hestan zindîbûn e. Fikir û zindîbûn têra xwe pabendî hevdu ne. Tişta xwedî hest, xwedî fikir e. Tişta bi fikir, bi hest e. Têkilî û pabendiya di navbera hest û fikirê de jî mirov dikare fêhm bike. Lê derbarê naveroka wê de û tişta di nava xwe de dihewîne hê aqlekî vebirrî çênebûye. Hê jî weke mesele û pênaseyeke bi sirr û raz e. Divê mirov li ser van sirr û razan hûrûkûr bifikire. Ji bo dîndar, zanyar û fîlozofan ev elzem e. Mirovekî ehlê ilmê dînî, mirovekî zanyar û fîlozofek divê van sirrên mezin keşif bike û fêhm bike. Divê mirov hertim ji xwe bipirse "gelo ez çawa dikarim van sirr û razan fêhm bikim" û divê li ser wan bifikire û bi wan dakeve. Belkî mirov nikaribe wan bi temamî rave bike, lê dibe ku di warê fikirî û ruhî de hûr bi wan dakeve. Bi kêmanî, belkî bi vî awayî, mirov nehêle ku ev fikirên çor ên materyalîst û dogmayên dînî yên bêbingeh insên bicurkî bihêlin û pergala mejiyê wî belawela bikin. Hemin ev jî bi serê xwe gelekî hêja ye. Eger dîn û madde mirov razî û têr nekin, hingê ya hêja ew e; mirov bi van qadan dakeve. Lewma em van xebatan li rêza pêş a rojeva xwe datînin û divê sedem û nirxê wan were fêhmkirin.

Em dikarin ji bo "Ez û yê din" jî gotareke dişibe vê bi pêş bixin. Em ji bo gerdûnê hemûyî, ji xwezayê re û heta ji her tiştî re dibêjin, yê din. Li vir, hêja ye ku em li pêkhatina 'ezîtiyê' bikolin. Fransewî ji ber ku gelekî zanistperest in , têgîna "ez" û "kirde" (subje) çêkirine. Descartes kirdeyê esas dibîne. Paşê zanyariya Fransiyan vê meseleyê heta bi felsefeyê ango hikmetê ve dibin. Kirde ne tenê bi mirov re têkildar e. Kirde têgîneke giştîtir e. Wexta ku li vê cîhana fenomen û diyardeyan tê kolan, kirde têgînek e, bêhtir nêzî enerjiyê xuya dike. Kirde "ez" têgînek e, enerjî wê bêhtir pêkan dike ango aliyê wê enerjiyê

bêhtir li pêş e. Di têgîna “yê din” de jî aliyê wê yê xwezayê, aliyê wê yê maddî û aliyê wê yê diyardeyan li pêş e. Dema ku mirov vê pîvanê li mirov tetbîq bike encama derdikeve holê ev e: mirov yan jî kirdeyê herî aktîv ew e, ‘ez’ a wî bi hêz e, kirde (xwe) ya wî bi hêz e, û mirovekî bi vî rengî dibe pêşeng. Pêşeng dibe civak, pêşeng dibe netewe, pêşeng dibe çîn, pêşeng dibe walî. Ev hemû dikevin kategoriya kirdeyê. Ev jî têkiliya xwe bi enerjî û maneyê re heye. Yanî şiroveyeke cuda ye. Diyalektîka xweza û maneyê mîna şiroveyeke Fransî ye.

Di çarçoveya diyalektîkê de divê mirov li ser têkiliyê bisekine. Di tevahiya dîroka gerdûnê de pîvan ev bû; enerjî vediguhere maddeyê, madde jî vediguhere enerjiyê. Ji vê re têkiliyetî digotin. Bivênevê ev wisa bû. Heta, perçikek bi navê ‘perçikê Xwedê’ tesbît kirine, ev perçikê Xwedê di dîroka têkiliyan de bingeh e. Navê vî perçikî kirine “perçikê higgs” û weke enerjiya bi qasî serê derziyê ya xwe komkirî serhev û xweguvaştî pênase dikin.

Di vê rewşa pêkhatinê de pîvana ‘hêza kişandinê ya erdê’ dikeve dewreyê. Di atomê de têgîneke bi navê hêza lawaz û hêza dijwar heye. Cîhana atoman bi van herdu hêzan sererast dibe. Pergala hêza kişandinê jî bi molekulan pêk tê. Ha tişta jê re têkilî tê gotin, çîroka vê danûstendinê ye; ji enerjiyê veguherîna maddeyê. Di psîkolojiyê de jî wisa tê ravekirin, heta di sosyolojiyê de wisa tê gotin, û ev heta bi xwezaya civakî diçe. Xwezayek jî weke xwezaya sisiyan tê pênasekirin. Lê ev hemû encama vê qewimîn û pêşketinê ne.

Tişta ku jê re diyalektîk tê gotin, pabendî û têkilî ye. Jixwe yekparebûna gerdûnê jî bêyî pabendî û têkiliyê nabe. Ti perçikê gerdûnê ji yê din ne serbixwe ye. Ji vê re pîvana lihevalandî tê gotin. Her çi perçikekî piçûk li çi devera gerdûnê dibe bila bibe, guhertina di wî de pêk tê, li seriyekî din ê gerdûnê dîsa heman guhertin tê de pêk tê. Yekîtiya Xwedê ango Wehdet-ul-Wucûd bi her halî hinekî jî ev e. Li wir her tişt digihîje hevdu, dibe heman tişt, dibe xwedayî. Bi hev ve girêdayî ne, û girêdana di gerdûnê de tiştekî wisa ye. Lewma hebûna Xwedê di çarçoveya vê maneyê de weke bingehê her tiştî tê destnîşankirin. Perçikekî piçûk bandorê li her tiştî dike. Pîvana lihevalandî beraqil e. Bûyerên di nava mejî de hemû diyalektîk in. Vê navenda fermanê ya di şaneya mejî de, hest hemû, dîtin, hiskirin û tevahiyên wan têkildarî vê şaneya hestyar in, û ji wê re “dendrît” tê gotin. Ketine zikhev du. Têkilî û pabendî ye. Jixwe şaş e, mirov bibêje, ‘perçik bi tena serê xwe ye’. Ango gerdûneke wisa bi tena serê xwe di valatiyê de serbixwe avjeniyê dike, tineye. Perçik hemû têkildar û pabend in, yek bêyî yê din nîne. Yek perçikê tenê yê bi tena serê xwe tineye.

Xweza zindî ye, bi ruh û rewan e. Timî vediguhere, diberide. Baş e, zimanê xwezayê, meşa wê, pişkivîna wê bi çi awayî ye? Di encama guherîn û veguherînê de mirov li ser karakter û rastiya diyardeyan dikare çi bibêje? Wexta ku mirov guh dide zimanê xwezayê û li meşa wê ya pêşketinê temaşe dike, mirov xweştir dibîne ku rewşa hebûnê li ser bingehê têkiliyê ye û ev rastî her ku diçe baştir tê fêhmkirin. Pêşketin û çêbûna gerdûnê li ser bingehê pirrengî-pircuretiyê jî bi vê re têkildar e. Her ku pircuretî zêde dibe, îhtîmala têkiliyên dewlemend jî pêkan dibe û li ser vî bingehî diyalektîka jiyan û pêşketinê jî bi lez dibe. Her ku ev diyalektîk bi lez dibe pirrengî-pircuretî jî zêde dibe û bi vê re, pergaleke bêhtir tevlîhev û nû çêdibe. Fizîka kuwantûmê û teoremên kaosê ji bo em vî karakterê rastiyê bibînin û fêhm bikin, ber li me vekirin da ku em pêşiya xwe bibînin, û hê jî bi vê rola xwe radibin.

Ji tevgerên perçikên jêratoman, ji atoman derbasbûna molekulan li gerdûn û xwezayê her tişt li ser bingehê têkiliyan bi gewde dibe. Di qada biyolojîk de bi heman rengî ye. Di vî warî de me bi kurtî qala lêkolînên dawî kiribû, me qala rêzbûna şaneyan û pêkhatina wan kiribû û ya giringtir zindîmayîna şaneyan bi vê têkilîdanînê ye. Lewma mirov dikare bibêje, têkilîdanîn ne tenê di gerdûna fizîkî yan jî xwezayê de li qada biyolojîk û civakî jî hêmanekî karakterîstîk e.

Em vê jî bibêjin, wexta ku em qala têkilîdanînê dikin, em bi temamî dev ji şêweyê fikirê yê diyalektîk bernadin. Berevajî, tişta ku em jê re diyalektîk dibêjin formulasyonek e, em ji sînorên teng ên têgihiştina diyalektîka klasîk bi pêşketinên nû yên zanistî û felsefî derbas dibin. Bi gotineke din, ew diyalektîk e, kûr e. Ji ber ku zimanê xweza, gerdûn û civakê têkilîdanîn e, divê awayê analîz, şirove û nêrînê jî li gorî vê be, û divê ev awa di ber çavan re were derbaskirin. Wexta ku mirov diyardeyê weke têkilîdanînê pênase bike, hingê şert e ku her cure analîz vî karakterî li ber çavan bigire. Eger diyarde têkilîdanîn be, ji bo rastiya wê were fêhmkirin; kirdeyên tevlî têkiliyê dibin û têkiliyên di navbera wan de şert e ku bêne dîtin. Ev helwesta rêbazê ku dihêle diyarde hûrûkûr were fêhmkirin, ne bi daneyan tenê li aliyekî yan jî encamê dinêre, li pêkhateyan hemûyan dinêre. Bi nêrîna têkilîdanînê û bi analîza têkilîdanînê bi meseleyê dadikeve. Têkilî bi peywend û bihevdudanîneke bibandorlihevkirina pêkhateyên cuda çêdibe û ji bo ev were fêhmkirin, şert e ku rola kirdeyên di meseleyê de alî bêne dîtin.

Em dikarin vî awayê nêrîn û analîzê weke nêrîna bihevdudanînê pênase bikin. Têkilî peywendek e. Di analîza bihevdudanînê de bihevdudanîn giştiyê pênase dike, di heman demê de hêman û beşdarên diyardeyê jî yekeyên cuda jî pênase dikin.

Lewma analîza bihevdudanî diyalektîka yekeyê-gerdûnê jî di nava xwe de dihewîne. Her pêkhate weke yekeyeke bihevdudanînê di nava têkiliyê de ye. Li gorî vê nêrînê, her pêkhate çawa ku bandorê li bihevdudanî dike ji wê jî bi bandor dibe. Diyalektîka guherînê yekalî nîne, û jixwe wisa nabe.

Şêweyê nêrîn û analîza bihevdudanînê ya xwe disipêre têkilîdanîn-têkiliyatiyê, xwedî paşxaneke felsefeyê ye ku ji şêweyê felsefeyê yê klasîk ê xwe disipêre cudakirina obje-subjeyê derbas kiriye. Ji ber ku her pêkhateya ku bandorê li têkiliyê dike, hemwext hem subje û hem jî objeya wê ye. Bi vî awayî, nêrîna diyalektîk a xwe disipêre nakokiyên hevdu tine dikin û tengasiyên wan li dawiyê tê hiştin.

3-Mirov

Tişta ku wê ji bo nêrîna diyalektîk a têkilayetiyê û şêweyê analîza peywendîtiyê herî baş bibe nimûne pênasekirina mirov e. Pênasekirina mirov, fikira îdeolojîk-felsefî ya li ser cîhanê ya aliyekî qebûl kiriye jî herî baş nîşan dide ango kaxiza tûrnûsol e. Yan jî kevirê mihekê ye.

Em hay jê hebin; fikira dunyayê ya îdealîst mirov li gorî îdeayan pênase dike. Fikira dunyayê ya materyalîst jî li gorî maddeyê pênase dike. Lê ya rastî, nabe ku mirov tenê weke hebûneke maddî û ne jî weke hebûneke îdealîst a manewî were dîtin. Ya ji vê jî giringtir ew e, nabe ku mirov weke ji tevahî aliyên maddî û manewî pêkhatî were pênasekirin. Ew awayê nêrînê yê ku mirov weke hebûneke giştî ya maddî û manewî dibîne, hewl dide ji kêmasiyên nêrînên îdealîst û materyalîst bibihure, bi xwe nêrîneke mekanîk e. Ev awa pênasekirin, hem fikirên îdealîst hem jî fikirên materyalîst qebûl dike û ji tevahiya encama wan, dixwaze xwe bigihîne encamekê.

Wexta ku analîza bihevdudanînê yan jî awayê nêrînê yê diyalektîka têkilîdanîn-têkiliyatiyê mirov pênase dike, aliyên wî yên maddî-manewî ji hevdu cihê nake. Ji ber ku awayê wî yê nêrînê destûra vê nade. Tişta ku ji hevdu neyê cihêkirin, nabe ku tu bînî cem hevdu, bidî ser hevdu. Mirov bi awayekî wisa çêbûye, aliyên wî yên maddî û yên manewî hene, lê manewiyeta mirov ji aliyê wî yê maddî ye; bi awayekî giştî sîstema wî ya mûrehkan, mejî û kapasîteya wî ya afirandina maneyê encama beridîna wî ye. Bi heman awayî, mirov her ku cîhana xwe ya maneyê bi pêş xistiye hebûna wî ya maddî jî guheriye-veguheriye û ji

nû ve bi teşe bûye. Lewma mirov dikare bibêje, aliyê mirov ê maddî di bin bandora aliyê wî yê manewî de ye. Ango di bin bandora aliyê manewî yê şikil û teşedanê de ye.

Fizîka kuwantûmê, wexta ku xwezaya rastiyê pênase dike weke "madde û ne yên madde" diyar dike. Bi gotineke din, xwezaya rastiyê ji madde û nemaddeyan pêkhatî diyar dike û wan weke pêkhateyên ji hev nayên cihêkirin ên rastiyê destnîşan dike. Mirov jî bi awayekî wisa çêbûye weke vî awayê têkiliyê ye, û ji têkiliyeke maddî û manewî pêkhatî ye. Ev çêbûn an jî biserhevdehatineke nemekanîk e, di zikhev de ye, hevdu çêdikin û diafirînin ango rûyên cuda yên rastiyê ne.

Kengî bêmanetî hebe, hebûna maneyê pêkan e. Li cihê ku bêmanetî tinebe mane jî çênabe. Mane li gorî bêmanetiyê ye. Meseleya Kurd jî wisa ye. Bêmanetiya mezin a di meseleya Kurd de, kir ku Rêber Abdullah Ocalan maneya mezin çêke. Ji ber ku bêmanetiyeke pir mezin, rewşeke serperdekirî, rewşeke nediyar hebû, maneyeke mezin hat çêkirin û perdeya bêmanetiyê hat çirandin. Tevahî rewşên nediyar ên dîrokî û rojane hatine neşterkirin, bi vê re maneyeke mezin derbûye, teqiyaye. Rewşa ku îro ro li ber çavan e, weke rahend û şaxekî vê teqîna mezin e.

Têgînên "ez" û "yê din" ji aliyê felsefî ve di çarçoveya îdeolojiya Fransî de ne. Bêguman pênasekirina wan giring e.

Tişta ku em li vir li meseleyê zêde bikin ew e, li ser bingehekî zanistî, çi derbarê xwezayê de, çi derbarê diyalektîkê de xurtkirina şiroveyê ye. Di navberê de bi kêmanî bi qasî du sed salî dem û wext derbas bûye, di vê babetê de zanistê di gelek qonaxan re derbas bûye. Teoriya îzafîtiyê (nisbiyetê) û teoriya kuwantûmê hene. Û di warê kîmya û biyolojiyê de veguherîneke mezin a zanistî heye. Bêguman, di heman demê de li qada civaknasiyê jî gelek qonax li dawiyê hatine hiştin. Xebatên Hegel ên bi navê "Xweza û Mane" û dîsa "Fenomenolojiya Can-Ruh (geist)" hê jî xwedî giringiyeke aktuel in. Hegel ne ji wan fîlozofan e ku mirov bibêje, li raboriyê maye. Mirov dikare vê çawa li teolojiya Îslamê tetbîq bike? Gelo teolojiya Îslamê û fenomenolojiya ruh heman tişt in? Gelo di navbera wan de paraleltî û wekhevbûnek heye? Hz. Mihemed wexta ku bingehê felsefeya Îslamê datîne, maneya ku didiyê û datîne holê hema bêje, awayekî pêş ê diyalektîka Hegel e. Hz. Mihemed gelekî bi yekîtiya Xwedê daket û pîvana wî ya ji bo pênasekirina vê yekîtiyê "tewhîd" bû. Pîvana wî ya tewhîdê hema bêje, pêşnûmeyeke destpêkê ya fenomenolojiya ruh e. Di vê mijarê de encama herî giring û balkêş a berdest ev e. Misilman hemû, hê jî ji vê pîvanê hem bawer dikin hem jî pêk tînin. Fenomenolojiya ruh ji bo Elmanan pîvaneke îmanê ye. Wexta ku mirov van bîne cem hevdu, mirov ê bibîne, ev pîvan di warê dînî û felsefî de, bi qasî ku dîrokî ye ew qasî aktuel e, heta pîvaneke rêûresmê ye.

Derbarê têgîna Ellah de nodûneh sifet têne gotin. Nodûneh sifetên li têgîna Ellah hatine barkirin, hema bêje, pir bi awayekî balkêş mirov di Fenomenolojiya ruh de dibîne. Di vê çarçoveyê de mirov dikare bibêje, Hz. Mihemed proto-fîlozofek e. Ango ji pêxemberekî zêdetir, mirov dikare wî weke proto-fîlozofekî bibîne. Elî Şerîatî xwest şiroveyên bi vî awayî bike, şiroveyên bi vî rengî xurt bike. Di cih de ye ku mirov sosyolojiyeke wisa xurt bike, bi pêş bixîne. Li Îranê jî di vî warî de gav hatine avêtin, mitale û felsefe hatiye kirin. Mirov dikare Mela Sadir di nava van kesan de bibîne. Çi Mela Sadir û çi Elî Şerîetî xwestine û hewl dane Hz. Mihemed bi aqlekî wisa yê felsefî rave bikin. Ev ne şaş e, ev rast e. Jixwe, hêza meleyan a di rêveberiya modern a Îranê de jî ji vê tê; karîbûn Îslamê bi vî awayî şirove bikin. Komara Îslamê ya Îranê pênaseya berbiçav a vê yekê ye. Mirov hê jî dikare di vî warî de pênase û şiroveyan bike. Pîvana tewhîdê şertê îmanê ye. Dibêje, 'Ji bilî Xwedê ti Xwedayekî

din nîne.' Bi navê Xwedê ango bi "Bismillahê" dest bi her karî dike. Ev qalib û stûnên sereke yên jîn û jiyanê ne.

Ka em binêrin, Hz. Mihemed çawa li Xwedê têdigihîje û pênase dike. "Ellah xaliq û afirênerê her tiştî ye. Li her cihî hazir û nazir e. Ji reha stûyê we nêzîktirî we ye. Ellah nayê dîtin..." Eger mirov têgîna enerjiyê deyne serê hevokên bi vî rengî hemûyan maneya van hevokan wê li enerjiyê bê. Hema bêje, Hz. Mihemed di bin hêma Ellah de ku fena subje-afirêneriya mutleq a Îslamiyetê daniye, fena ku enerjî di binê wê de bi cih kiriye. Pir balkêş û seyr e ku pênasekirina hêza afirîner a Mihemed û pênasekirina enerjiyê ya fizîka kuwantûmê li hev tên. Ev tê wê maneyê ku Ellah enerjiyeke biserhevdebûyî ye. Hema bêje, ti tişt nîne ku enerjiya zêde û biserhevdebûyî bandorê lê neke. Kêliya ku enerjî biqede, her tişt diqede. Jixwe mirov nikare bêyî enerjiyê li tiştekî bifikire. Pênase û karakterekî enerjiyê yê nayê dîtin heye. Ev pênase jî pir nêzî Elllahê Mihemedî ye. Xuya nake, nayê dîtin, lê hukim li her tiştî dike. Mîna ku li cem Mihemed jî heqîqet bi rêya his û îdrakê tezahur kiriye. Analîzeke sosyolojîk pir bi hêsayî dikare wekhevbûna vê rewşê bibîne. Ji bo dîtina vê, divê mirov piçekî xwedî nêrîna diyalektîk a têkilîdanînê û baldariyê be. Balkêş e, çawa heta roja îro ev yek nehatiye dîtin û ev jî ji awayekî din ê dogmatîzmê ye. "Eger mijar dîn be, hûn ji dogmayan pê ve nikarin tiştekî din bibînin" ev awa gotin û nêzîkatî ne zanistî ye, berevajî wê, dogmatîkiyeke hişk e. Pênasekirina Ellah weke enerjiyekê pir giring e, û tiştekî nû ye. Kesekî serê xwe biêşîne, pir bi hêsayî wê bibîne ku meqseda Hz. Mihemed enerjiya gerdûnî ye, hûk û ruhê gerdûnî ye. Lewma hêjayî lêkolînê ye, Mihemed di vî warî de li felsefeyê çend kûr û waqif bûye, çend li mijara enerjiya gerdûnî haya xwe hebûye, çend sosyolojîk û felsefî fikirî ye, û li ser vî bingehî pût şikandine.

Suhreverdî ji bo Hz. Mihemed dibêje, ew "pêxemberê rohniyê" bû. Mele Sadir vî awayê nêrînê hê xurtir dike. Li Îranê ev fikir bi hêz e. Ya rastî, xeta Xezalî ber li vê digire. Kuştina Suhreverdî jî yek ji encamên neyênî yê fikira Xezalî ye. Suhreverdî bi fermana Silhedînê Eyûbî yê kurd tê kuştin. Ya rastî, Suhreverdî rêûresma Zerdeştî xurt dike û bi pêş dixe. Doktrîna Zerdeştiyê dike felsefe. Tişta ku ew dike, bi awayekî felsefî, xwedî li doktrîna Zerdeştî derdikeve. Mutesewifekî serketî ye, têra xwe bi bandor e. Lê meleyên hişk û muhafezekar ên li ser xeta Xezalî, giliyê wî dikin û wî didin kuştin. Xulase mesele ev e.

Fikira muhafezekar û hişk bi demê re hinekî din xwe gurçûpêç dike û vediguhere dogmaya dînî. Mirov ji vê re dikare bibêje, şêweyê fikirê yê hestyarî. Li cem Kurdan bi temamî şêweyê fikirê yê serdest fikira hestyarî ye. Em ji vî şêweyê fikirê re dikarin bibêjin, qonaxa navî ya mejî. Li cem Kurdan ji dogmaya dînî wêdetir felsefe tineye. Ya heyî jî di şexsê Suhreverdî de hatiye kuştin. Ya îro dijberiya wê tê kirin jî ev şêweyê fikirê ye.

Mirov maketeke piçûk a gerdûnê ye. Dîrokeke 13.8 mîlyar salî di mirov de xulase tê ziman. Daneyên zanistî hemû vê nîşan didin. Di vê çarçoveyê de mirov gerdûnek e, heta mirov dikare jê re bibêje, gerdûna navîn e. Ya rastî, hem di gerdûna kuwantûmîk de hem jî di xwezaya din de her tişt di mirov de xulase hatiye cem hevdu. Haya Hz. Mihemed ji çêbûn û zêdebûna mirov jî çêbûye û ew wekî "Eşref el-mexlûqat" destnîşan kiriye. Dîtiye ku mirov ji afirîndeyên din cuda ye, û ev rast e. Darwînîst mirov weke "her hebûnekê" bi nav dikin. Lê mirov ne her hebûnek e, hebûneke cuda ye. Ev tehlîla felsefîk a Hz. Mihemed belkî ji analîza Darwîn payeberztir e. Hebûna bi tenê ya cîhana fikir û uslûbê derxistiye holê, mirov e. Hê jî hebûneke din a ji vê buhurî tineye, çênebûye.

Fenomenolojiya Ruh a li Elmanyayê ev yek hinekî din nêzî zanistê kiriye. Pozîsyona bingehîn a Hegel ew e, wê valatiya mezin a di navbera dîn û zanistê de tijî kiriye. Ev şiroveya me bi xwe ye. Pozîsyona dîrokî ya Hegel ji wê yekê ye ku di serî de Xiristiyantî bi giştî valatiya

mezin a di navbera dîn û zanistê de tijî kiriye. Ev karekî pir zor e, û Hegel ji wan fîlozofan e ku herî baş kiriye û tê de serketî bûye. Jixwe ji vê ye ku ji Hegel re dibêjin, "pêxemberê hemdem ê serdema xwe". Pêxemberê modernîteyê û serdema modern e. Hem Fîlozof e, hem jî pêxember e. Eger em têgîna Geistê wergerînin Erebî yan jî Îslamê maneya xwe Ellah e. Maneya vebirrî ev e. Fenomenolojiya Ruh a veguheriye xwezayê, berbiçav û xuya bûye, bi maneya ruh-enerjî-maneyê ye. Bi gotineke din, maneya xwezayê ye. Hz. Mihemed bi nodûneh sifetên Ellah heman tiştî dibêje.

Li vir hebûnek heye. Em îro her tiştî bi enerjiyê rave dikin. Hz. Mihemed vê bi Ellah rave dike. Ellah jî enerjî ye. Mirov Ellahê Hz. Mihemed weke enerjî bi nav bike, rastiyeke vebirrî ye. Gotina wî ya weke "Ellah ji reha stûyê me nêzîktirî me ye" mirov tenê dikare bi têgîna enerjiyê rave bike. Em nizanin ka wî çawa bi vê derxistiye û pê hisiyaye, lê rast e ku ev weke enerjiyê were ravekirin. Her kes dipirse "Ellah heye, yan tineye", Ellah bi maneya enerjiyê heye û nabe ku weke madde were pênasekirin. Tê gotin, "Ellah naşibe ti tiştî." Ev jî destnîşankirineke di cih de ye.

Enerjî diyardeyek e ku her tişt bi wê ve girêdayî ne. Enerjî nebe, madde çênabe. Hem li cem Platon hem jî li cem Hz. Mihemed madde xwezayeke duyemîn a negiring e. Li cem Platon îdea esas in. Arîsto jî têgîna form bi pêş xist û bi vî awayî ya Platon temam kiriye.

Felsefeya Arîsto li ser bingehê form û sûbjeyê ye. Wekî din jî pîvana wî ya entelektueliyê heye. Bi vê jî dixwaze maneyê pênase bike. Arîsto ji bo tişta ku maddeyê dixe nava livûlebatê û weke ruhê wê têgîna "entelekhia" bi kar tîne û hemin ev jî enerjî ye. Haya Arîsto ji dînamîzma ku enerjiyê pêk tîne, çêbûye. Arîsto jî bi vî awayî li vê têgînê zêde kiriye. Li cem Platon ruh esas e. Îdea ruh e. Pir balkêş e, Hz. Mihemed ev kiriye civakî û sosyolojî. Bi navê şerîetê pergala yaseyên civakî çêdike û dibêje, "Hûn ê ji vê bawer bikin û li gorî wê bijîn." Ew bi xwe jî bawermendekî temam e, û wan pir baş pêk tîne. Bi vî awayî meseleyê civakî dike.

Li cem civakên Rojhilata Navîn jê re çi "geist" bê gotin, çi "Ellah" û çi jî "felsefe" bê gotin, axir çi were gotin jî bingehekî wisa yê felsefîk heye. Îslam, hêza xwe hinekî ji vê civakîkirina ruh werdigire. Vê yekê, hêza pêngavên mezin daye Îslamê. Eger Îslam hê jî li ser piyan e, ev hinekî bi saya vê ye. Bingehekî wisa yê felsefîk heye. Ji ber ku dînên din xwedî bingehekî wisa yê pîvanan nînin li hemberî Îslamê bi bin dikevin. Bibinketin û têkçûna Îslamê jî ji aliyê dînên din ve nîne. Îslam bi zanistê hatiye têkbirin. Îslam li hemberî Xiristiyantiyê mutleq serdest e. Ji Balkanan heta bi Viyanayê Îslam eşkere serdest e. Ewrûpayê ji her serdemê kirtik û bermahiyên zanistê wergirtiye; zêhniyeteke zanistî çêkiriye. Pêşketina zanistî di sedsala 17'an de ye, sedsala 18'an ber lê vedibe diteqe, sedsala 19'an bi şoreşa pîşesaziyê re li cîhanê dibe zirhêz, dibe hegemon. Îslam di şexsê Osmaniyan de heta bi nava Anatolyayê paşve xistin. Ji Nîvgirava Îberê jî wê dahf didin û wê diavêjin Efrîkayê. Niha jî alema Îslamê hemû xwe bike yek bi qasî Îsraîlekê nake. Ev tê wê maneyê, serdestiya hegemonîk a zanistê, îmana Îslamê ya xwe spartî îdeayan bi erdê re kiriye yek. Êdî îman têrê nake, zanistê serdestî bi dest xistiye.

Eger em di çarçoveya sernavê de mirov pênase bikin, em dikarin wisa bibêjin: mirov bi awayê çêbûna mejiyê xwe û bi organên xwe yên din ên bingehîn hebûneke bi heybet ê organîzasyonel e. Mejî, bi trîliyon şaneyan û têkiliyên danîne, xwe kiriye hebûn. Hema bêje ew organ e, yê ku mirov bi rê ve dibe. Mirov nikare jê re bibêje, madde jî, ji ber ku di mejiyê tijî fikir de şane û dûvikên wan ên têkiliyan ketine zikhev û fikirê çêdikin. Em qala hebûna fikireke din dikin a ku hê nehatiye pênasekirin û bi serê çavan nayê dîtin. Tê zanîn ku fikir tiştek e, ji maddeyê wêdetir e; wêneyê wê nayê girtin, nayê îsbatkirin. Hê jî derbarê naveroka fikirê de pênaseyek nîne ka çi ye û ne çi ye. Gotina Descartes a dibêje, "Eger ez

difikirim, hingê ez heme" heye û bi vê hewl dide hebûna xwe destnîşan bike. Hebûn heyîna fikirê ferz dike. Lewma divê em ravekirina derbarê perçik de di ber çavan re derbas bikin. Ya giringtir jî ew e, divê mirov bi vegotina organîzasyonel rabe û qîmeteke payeberz bidiyê. Ji ber vê, ji gotina "Eger ez difikirim, ez heme" wêdetir gotina "Tu çendî bi rêxistin bî, tu ewçend heyî" ji bo ravekirina heqîqeta mirov bêhtir di cih de ye.

Pratîka Kurdan heta rastiya Rêbertiyê û hebûna rêxistinî, mirov dikare di bin vê têgînê de xulase diyar bike. Tu çendî bi rêxistin bî, tu ewçend heyî. Wexta ku me bi xwe hewl da em bi şaneyên hebûna Kurd dakevin, me ev rastî dît; me çendî xwe bi rêxistin kir, em bûn hebûn; rêxistiniya me çendî ji hev belav bibe, em tine dibin. Eşkere ye, bi rêxistinbûnê hebûn pêkan e. Tişta jê re Kurd were gotin ji bo hebe, divê bi rêxistin be. Wexta ku ji rêxistinbûnê derkeve, dibe hîç û dibe sergov. Rêxistinbûna di civaka Elman de bi awayekî bi heybet heye. Lê di rastiya Kurd de hebûn-tinebûna organîzasyonekê nediyar e. Ev tê wê maneyê, ji atoman heta bi molekul û têkiliyên di nava mejiyê mirov de organîzasyonek heye û bi vî awayî pêdaketina li meseleyê pênaseyeke xurt datîne holê ya ku para heqîqetê tê de heye.

Di navbera vî şêweyê fikirê û pênaseya xwezaya civakî de çi têkilî heye? Sembolîzekirin têkiliya xwe bi cureyê mirov re heye. Şêweyê mîmetîk (teqlîd) ê serwextbûnê têkiliya xwe bi sembolîzekirinê re nîne. Her tiştê ku di çarçoveya sembolîzekirinê de tê kirin çand e. Şêwe dide kevirekî, gopalekî çêdike, bi lev û lebat dibe. Li vir fikirek heye û bi saya vê fikirê cudahî çêdibe, bi pêş dikeve. Difikire, dimeşe, xeyalan dike. Mirov tenê ji kar û xebatên insan ên bi sembol û remzan dikare çand bibêjî. Baş e, têkiliya vê bi yaseyan re çi ye? Navê wê li ser wê ye, fikira sembol û remzî ango fikireke plan, tesewir û xeyal dike. Li vir yase tineye, mirov nikare qala hebûna yaseyan bike.

Di fizîk û kîmyayê de yaseyên temam lazim in. Jixwe li cîhana fizîkî jî li gerdûna jor a atoman yase hene, lê di gerdûna jêr a atoman de, li cîhana kuwantûmîk bi temamî rewşeke nediyar serdest e. Nediyarî pîvan e, û tê de yase tinene. Di cîhana kuwantûmîk de gelek tişt hene bi yaseyan re li hev nakin. Lewma Einstein, Bohr û Heisenberg di vê babetê de guftûgo dikin. Einstein di meseleyê de li hebûna qanûnan digere. Lê yên din difikirin ku wê di babetê de qanûn-yase tinebin. Heta du cot perçik li hev dikevin tine dibin. Tişta ku jê re "Kêlîka herî kurt" tê gotin di vir de veşartî ye. Perçik çêdibin, tine dibin û ev veguherîna nasnameyê di cîhana kuwantûmîk de her xwe dubare dike. Ev hemû, di nava sînorê perçikê Xwedê de pêk tê. Perçik dibe enerjî, enerjî jî misêwa vediguhere perçikan. Ev, pirrengînî û pircuretiya mezin a di gerdûnê de nîşan dide. Di têgihiştina Xwedê ya Hz. Mihemed de jî gerdûn her kêlî tê afirandin. Bi tesbîta xwe ya dibêje, "Ellah li her derê hazir û nazir e" qala vê rastiyê dike. Ev hemû bi awayekî vebirrî têkiliya xwe bi fizîka kuwantûmê re hene. Mirov vî awayê têgihiştina li Xwedê, tenê dikare bi kuwantûmê rave bike.

Çand afirêneriya mirov e, nerm e. Ev rewş xwezaya yekemîn ji holê ranake. Ev cîhanek e, cîhana fizîkî, kîmyewî û kuwantûmîk di nava xwe de dihewîne. Lewma her tiştê li wir di mirov de jî heye. Di afirêneriya çandan de ji aliyê genetîk ve îzah hene. Çêlik dişibin dê-bavê xwe û ev bi genan tê ravekirin. Ji vê re 'veguhestina bi rêzegenetîkan' tê gotin. Mînak, ji şêran şêr, ji roviyan rovî, ji çeqelan çeqel çêdibin. Ev rewşek e, bi genan tê ravekirin û ev tê fêhmkirin. Di çandê de ev tineye. Di çandê de zêdebûn bi genan çênabe. Wexta ku em dibêjin "Çanda Kurd" em qala tiştekî xweser dikin. Hêmanên çandî ji nifşan derbasî nifşan dibin û em ji van re dikarin bibêjin, perçikên çandî yan jî atomên çandî jî.

4-Mirov Hebûneke Eko-Civakî ye

Di çarçoveya nêrîna têkilîdanîn-têkiliyê de pênasekirina mirov nabe ku tenê di aliyê têkilîdanîna maddî-manewî de were dîtin. Ev tenê yek ji karakterên wî yê bingehîn e. Ji bo

rastiya mirov baştir were fêhmkirin û ji bo mirov qenc lê serwext bibe, ji bo pênasekirina wî têkûz were cîbicîkirin, divê mirov gaveke din pêşde biçe û pêkan e ku bi çavkaniyên ontolojîk dakeve.

Dema ku em li pênaseyên zanistên civakî yên modern ên derbarê mirov de hûr bibin, em dibînin ku mirov weke "hebûna difikire", "hebûna dikare aletan çêke", "hebûna dimire, lê ji bo nemirinê hewesdar e", "hebûna dikare bibe xwedî çand" yan jî "heywanê polîtîk" tê pênasekirin. Bi vî awayî hewl dane, cudahiya mirov ji zindî û ruhberên din ên di xwezayê de diyar bikin. Lê pir zehmet e ku mirov analîzekê bibîne mirov weke hebûneke ekolojîk pênase bike. Heta di cîhana fikirî ya modern de mirovbûn bi qutbûna ji xweza û ekolojiyê tê pênasekirin. Li gorî vê fikirê, mirov çendîn ji xwezayê qut bibe ewçend dibe mirov.

Aqlekî ku mirovbûnê bi qutbûna ji xwezayê pênase bike, bûye xerîbê xweza û civakê ango ji rê derketiye. Lewma aqlê modern ji binî ve bi pirsgirêk e. Ev aqlê bi koda rohnîbûnê, ji diyalektîka xweza û mirov re xerîb e, berhemê çanda serdest e.

Mirov timûtim weke "hebûneke civakî" tê pênasekirin. Bi vê pênaseyê, işaret bi têkiliyên civakî yên navbera mirovan dike û ji ber vê, ev awa pênasekirin teng û kêm e. Ev awa sosyalîteyê, heta sosyalîzmê teng dike. Mirov berî ku bibe sosyal hebûneke ekolojîk bû. Îca ji ber ku ev xisleta wî ontolojîk e, nabe ku mirov jê bibuhure. Bi gotineke din, sosyalîteya mirov, ji karaktera ekolojîk ne qut e.

Heqîqeteke gelekî eşkere ye, hebûna maddî ya mirov berhemê beridandina xwezayî ye. Sîstema mûrehkan û mejiyê mirov, pêşketina kapasîteya wî ya çêkirina mane û fikirê jî di navê de hebûna mirov a maddî encameke beridîna xwezayê ye. Ji ber vê ye, bêyî xwezayê, mirov nikare bijî û bimîne. Mirov nebe jî xweza her dikare bijî, lê xweza nebe mirov nikare bijî. Eger wisa be, mirov ne tenê berhemê beridîna xwezayê ye, di heman demê de ew hebûneke wilo ye ji bo bimîne û domdar be jîna wî girêdayî xwezayê ye. Mirov nikare ji xwezayê qut bibe. Eger bibe, em nikarin qala "mirov" bikin.

Xulase, mirov beriya her tiştî hebûneke ekolojîk e. Kapasîteya mirov a çêkirina maneyê û hêza wî ya fikirê yaku ji xisleta wî ya civakîbûnê ye, ji hebûna wî ya maddî-ekolojîk bi pêş ketiye. Li vir, em ê derbarê bipêşketina fikirê de binê xusûseke pir krîtîk xêz bikin. Sîstema mirov a mûrehkan û mejiyê wî, fikira wî û pê ve girêdayî çêkirina wî ya maneyê bi qutbûna wî ya ji xwezayê pêk nehatiye û civakîbûna wî jî wisa çênebûye. Li paşxana pêşketina sîstema mûrehkan û mejî, niqurçokên dahfdanê yan jî bertekên livûlebatê bivênevê ne. Cureyê bi navê mirov, ne ji bo ji xwezayê qut bibe, berevajî ji bo di nava wê de, ji bo bi wê re bijî, ji bo di nava wê de karibe bimîne, sîstema xwe ya mûrehkan û mejiyê xwe bi pêş xistiye. Pêşketina fikirê encama vê yekê ye.

Ev dane hemû, eşkere işaret bi rastiyekê dikin, ew jî ev e; mirov hebûneke eko-civakî ye. Ev têkilayetî, bingehê vê rastiyê datîne. Di pênasekirina mirov de weke eko-civakî, eko xwezaya yekemîn e, têgîna civakî jî qala xwezaya duyemîn dike. Mirov weke hebûneke eko-civakî di navbera xweza û civakê de bi rola pirê radibe. Lingekî pirê li xwezayê ye, lingê dudiyan jî li civakê ye. Jinûveavakirina civakîbûneke bixweşî tenê bi rêyekê pêkan e, ew jî ew e ku ev pira ji rastiya civakî û ekolojîk qut bûye, ji nû ve were avakirin. Şertê herî bingehîn ê sosyalîteya mirov ew e, divê rastiya ekolojîk di nava xwe de bihewîne, bihebîne. Bi gotineke din, divê mirov bibe ekolojîk, ango ekolojîkbûna wî ne tercîhek e, mecbûriyeteke ontolojîk e. Xweza weke hebûneke eko-civakî li ser mirov xwezaya dudiyan ferz dike, ango rê li civakîbûnê vedike.

Beşa Duyemîn
XWEZAYA CIVAKÎ Û RÛDANA PIRSGIRÊKÊ (PROBLEMATÎK)

1-Têgîna Xwezaya Civakî

Bi têgîna "xwezaya civakî" işaret bi wê yekê tê kirin ku civak pêkhateyek e, bi hemdê xwe li dora pîvan û rêzikên diyar bi gewde dibe, reng werdigire. Ango meqsed û meram ji vê gotinê ew e, bi awayekî sernixumandî tiştên derbarê civakê de hatine qebûlkirin. Wexta ku em "xwezaya civakî" dikin têgîn, beriya her tiştî em dibêjin, civak girêdayî xwezaya yekemîn e, û weke pêkhateyeke xwezaya yekemîn bi pêş dikeve û çêdibe. Ji ber ku em mirov weke hebûneke eko-civakî pênase dikin, ev hem sedem û hem encama pênasekirina me ye.

Em bi pirsekê bidomînin. Pirsa me ev e: 'Xwezaya civakê çi ye?' Xwezaya civakê, bi awayekî din, aliyê wê yê fizîkî, rewşa xwezayê ya fizîkî û diyalektîka wê ye. Aliyê wê yê civakî jî bi aqil û îradeya wê bi gewde dibe, bi xisletên xwe yên xas û xusûsî ji xwezaya yekemîn cuda dibe û bi karakterê xwe yê xweser xwezaya duyemîn e.

Mirov kengî li xwezaya xwe vegere, dibe civakî û ev çalakiya mirov a xweafirandinê ye. Ji ber ku li pey vê çîrokeke çêbûnê heye; beridîna xwezayê, dîrok û çêbûna zindiyan, jihevcudabûna nebat û heywanan, çêbûna sîstema mûrehkan û mejî ye. Ji bo ev çalakiya civakîbûnê rast were pênasekirin, çîroka ku em qala wê dikin û işaret pê dikin gelekî giring e. Awayê çêbûnê yê diyalektîkê di nava xwe de cih dide qevaztin, bertek, lixwevegerîn, lez û sistiyan, lê destûr nade qutbûnên vebirrî û teqez.

Civak ne ew pêkhatin e ku ji hatina cem hev a mirovan pêk tê. Civak pergaleke nirxan e, mirovên hatine cem hev, li dora berhemên afirandî dicivin; hevpar dibin û bi awayekî kolektîv wê pêk tînin. Di tevahiya çêbûn û pêkhatinên civakî de hêmana damezirîner, pêşdebir û veguhezîner, mane ye. Civak ji bilî xwe kirdeya xwe nîne. Di çêbûna civakê de subje jî obje jî ew bi xwe ye. Û ev awayê çêbûnê, timî deriyekî xwe yê derketinê heye. Bi gotineke din, civak awayekî wisa yê kirin û bûnê ye, ava dibe, hildiweşe û ji nû ve ava dibe.

Di dawiya dawîn de yê xwezaya civakî pêk tîne, mirov e. Xwezaya civakî rastiyek e, li dora cureyê mirov pêk tê. Heywan jî bi komî dijîn, lê cîhana heywanan cuda ye. Heywan bi awayekî mîmetîk tevdigerin, bi teqlîd û ajoyan dixebitin. Erê, di mirov de jî ajo û meyla teqlîdê heye. Jixwe meyla teqlîdê ya em behsê dikin ji qonaxa heywanbûnê maye. Tebeqeya herî jêr a mejî ji serdema heywanbûnê maye. Mejiyê kevin ji ajoyan berpirsiyar e. Fikira mîtîk ji xwe dibihure. Ew jî di nava mejî de li beşê navîn cih digire. Mirov bi vî beşî dibe mirov. Mirovê li cemê fikira mîtîk pêşketî, ya rastî bi mejiyê navîn bû insan. Bêguman ev hemû di zikhev de ne. Yanî ev ne ew mesele ne, mîna tu bi kêrê ji hev qut bikî ji hev cihê bin, yan jî ne ew mesele ne, gav bi gav pêpelûk pêpelûk bilind bibin. Hemû di zikhev de ne, gerdûneke bi heybet û bi îhtîşam e.

Baş e, di cureyê mirov de ji çêbûna xwezaya civakî kî berpirsiyar e? Ha li vir weke cins jin dikeve dewreyê. Tiştekî din ê pir balê dikişîne, derketina holê ya nêrtî-mêtiyê ye. Ango nêrtî-mêtî çawa derketin holê? Bi qasî ku em dizanin, hebûnên berê tek-şane bûn, di çarçoveya dabeşbûna mîtozê de her şaneyek dabeşî du beşan bûye û bi vî awayî zêde bûne. Ji yekê du derketine. Şêweyekî zêdebûnê yê bi vî awayî tê zanîn. Hê li naverastê cudabûneke bi navê nêr û mê tineye. Û ev bi mîlyonan salan didome. Li gorî zanista heyî, dabeşbûna zindiyan weke nêr û mê beriya bi 300 mîlyon salî ye. Gelo dabeşbûneke bi vî awayî çima çêbû? Wexta ku em bersiv bidin vê pirsê, em ê bibêjin, ji ber xwezaya diyalektîkê ye.

Her tişt dualîte ye. Gelo ji enerjiyê madde çawa çêbû, perçik çawa cuda bûn? Erê, di atomê de perçik hene, jixwe perçik nebin atom li naverastê nabe. Madde çawa vediguhere enerjiyê? Ew tiştên ku xuya dikin, ew stêrk ji enerjiyê veguherîne maddeyê. Ji bo mirov bikaribe li mijarê serwext bibe, giringiya formula Einstein li vir derdikeve holê. Meseleya nêrtî-mêtiyê jî dewama vê yekê ye. Ne tiştekî li dijî pêşketin û çêbûna gerdûnê ye. Weke dewameke wê, êdî hêdî hêdî li şûna dualîteya di tek hebûnekê de hebûnên cuda têne cem hev. 'Yek' dabeşî diduyan dibe, weke hebûn nêr û mê çêdibin, dîsa têne cem hev du ango du 'yek'ê pêk tînin. Her ku diçe nêrtiyeke reh û rîş berdayî, mêtiyeke reh û rîş berdayî kûr, çêdibe.

Li vir, hêja ye, û gelekî manedar e ku em bi rola jinê dakevin. Cudabûna nêrtî-mêtiyê tiştekî mûcîzewî nîne, pêdiviyeke diyalektîka xwezayê ye. Ne tiştekî wisa ye ku aliyek di ser aliyekî din re be. Cudabûneke bi vî rengî nîne. Nêrtî ne serdestî ye yan jî mêtî ne tiştekî pîroz e. Ev ne diyardeyên wisa ne ku mirov bi wan bigihîje encamên taybet. Li gorî diyalektîka xwezayê ev ê bibin û dibin. Jixwe me ji vê re cudabûn got. Eger cudabûn nebe, jiyan nabe. Maneya jiyanê têkildarî cudabûnê ye. Eger xweza te bike du beş, divê tu vê dabeşbûnê weke derfet û îmkaneke azadbûn û cudabûnê bibînî. Ew cudabûn maneyeke xwe heye; maneyeke mêtiyê jî heye, ya nêrtiyê jî heye. Di civakê de jî ev rastî bi gewde bûye, ya giring ew e; mirov van herduyan neke dijberê hev du. **Dijberkirin jî destpêka pirsgirêkê ye.**

Civakbûn û qutbûna cureyê (dûnde) mirov ji xwezayê jî bi vî awayî bûye. Li gorî lêkolînên antropolojîk, di pêvajoyên pêşî de cureyê mirov jî weke komên din ên di xwezayê de ji heywanên din cuda najî û tevnagere. Awayên jiyanê yên pêşî bi şiklê klan piranî bi vî rengî ye. Her ku civakbûn bi pêş dikeve, têkiliyên di navbera xweza û mirov de rengekî nû digire.

Civak weke pêkhateyeke ji mirovan bigewdebûyî tê dîtin. Bi vî awayî gotin rast e, lê civak ne tenê hatina cem hev a hejmareke serî ye. Civak pêkhateyeke wisa ye, mirovên têne cem hebûna xwe li ser tesewir û maneyê çêdikin. Hemin hatina cem hev a mirovan di warê fizîkî de şert e. Mane jî vê civakbûnê karakterîze dike û hêmanek e ku naveroka wê çêdike. Lewma di çalakiya civakbûnê de mane hêmana damezirîner û bingehê ontolojîk e.

Em hinekî din kûr bi pirsa xwe dakevin: Maneya ku bingehê ontolojîk ê civakê pêk tîne çi ye, çawa çêdibe, tiştek li gorî çi weke 'bimane' yan jî li gorî çi 'bêmane' tê pênasekirin? Hewce dike ku mirov hûrûkûr bi van pirsan dakeve, li wan bikole û serê xwe li ser wan biêşîne. Ji ber ku di nava xwe de mijar û babetên giring dihewînin.

Mane ji ber pêdiviyekê derdikeve holê. Sedema ku li paşxana wê, yan jî sedema wê ya herî li jêr û kûr, daxwaza manê ye ango mana li jînê. Her tişta ku ji bo mirov manedar e, hewce ye ku bijî û bimîne. Tiştên bingehîn ên zindiyan ji bo man û jînê dahf didin û wan diajon mirovan jî diajon û dahf didin; li gorî rêza giringiyê jî ew xwexwedîkirin, xweparastin û xwezêdekirin in. Tişta ku van hemûyan bi cih bîne, bicihanîna wê hêsan û bi pergal bike, manedar e. Her vedîtin û zanîna ku nêçîrê û berhevkirina nebat û fêkiyan hêsan dike, manedar e. Di warê maneyî de weke gava diduyan jî, piştî hewcedariyên jînî, bedenî û peywendîdarî debarê, çand tê. Bi gotineke din, piştî ku beden têr bû, ji bo têrbûna ruh û can, pêdivî heye bi maneyê û tiştên wê pêk tînin. Ji bo mirovê pêşî mane pîroz e, û gelek tişt bi pîrozbûnê re ketine zikhev. Her tişta ku bi mane tê dîtin têkiliya xwe bi jiyanê re, bi domdariya jiyanê re heye. Badilhewa nîne, di gelek çandan de roj, av, heywan, ax, nan û genim pîroz in.

Yek ji xisletên din ên giring ên têgîna maneyê ew e ku di nava wê bi xwe de cewherekî wê yê têkilîdanînê heye. Têgihiştin bi xwe têkiliya xwe bi manedana 'tiştekî' re heye û ji bo vê, pêdivî bi têkilîdanîna bi tişta manedayî re heye. Ji ber vê xisleta xwe, mane di nava

mirovan de qada hevparbûn-lihevkirinê çêdike. Eger mane nebe, afirîneriya tesewirî nebe, mirov bên cem hev du jî civakî nabin.

Rêxistinbûna klan forma pêşî ya civakîbûnê ye, û di vî warî de mirov dikare gelekê jê hîn bibe. Maneya li dora klanê çêbûyî, totem e. Her klanek totemekî xwe heye. Totem, hem baweriya klanê ye, hem cîhana wê ya maneyê ye, hem jî nasnameya wê ye. Jiyana mirovê klanê heta tu bibêjî besît e, di heman demê de besît jî difikire. Klan pêkhateyeke kolektîf e, komîn dijî û di nava klanê de ferdbûn nîne. Lê tevî van hemûyan jî mirovê klanê hewcedariya xwe bi afirandina cîhaneke maneyê heye. Cîhana wî ya maneyê jî heta tu bibêjî besît e, sade û hêsan e. Tişta ku klanê weke totem diyar kiriye, gelek caran yan heywanekî nêçîrê yê ji bo jiyana klanê giring e, yan dareke fêkiyan e, yan jî dayik e. Axir, totem tiştekî besît e, lê bi sedema rola xwe ya di jiyanê de manedar e.

Li vir, bi qasî xisleta maneyê ya têkilî, têkilîdanîn û rêdana têkiliyê, xisleteke wê ya din jî pabendiya wê ya bi jiyanê re ye. Di fikira berê ya Şerqê de, di hozanî û zanyariya Şerqê de, nirxa zanînê bi pabendî û têkiliya wê ya jiyanê re bû. Zanîn û zanista poz bi jiyanê nedikir, xwe nêzî wê nedikir, bi kêra wê nedihat, ti qîmeta wê tinebû. Ev ji ber têkiliya xwezaya civakê û maneyê wisa bû; herçendî ev awa têgihiştina li zanîn û zanistê qels û lawaz bûbe jî heta roja me ya îro hatiye.

Bîrewer û mutefekirên mîna Michel Foucault zanîn-agahiyê weke desthilatdarî dibînin û analîzên wan ên di vî warî de hene. Analîzên wan bi awayekî ji awayan têne fêhmkirin. Herçendî mirov ji xwezayê ji civakbûna azad qut bûne û bi pey desthilatdariyê ketine, zanîn-agahî jî di çarçoveyê wê de bi kar anîne.

Agahî-zanîna nêçîrvanan a ji bo nêçîrê di warê xweza û mirov de jî bi kar anîn û mirov dikare vê mijarê jî di vê çarçoveyê de bibîne. Xulase, mirov çendî ji civakîbûnê qut bûye ew qasî jî xira bûye, pê re agahî-zanîn û mane jî xira bûye, xirab hatiye bikaranîn. Li dijî civakê veguherandine sîlehekê û ev jî dekûdolabeke desthilatdariyê ye.

Civakbûn li ser bingehê maneyê bi gewde dibe. Mirovê maneyê çêdike, yek ji xisleta wî, ya ku wî ji yên din cihê dike, karaktera wî ya fikirînê ye. Serhatiya mirov a di warê beridîna fikirê de, di heman demê de serhatiya wî ya li ser bingehê maneyê mirovbûn û civakbûna wî ye. Çawa ku sîstema mûrehkan û mejî beridiye, fikira mirov jî ji awayê besît ber bi awayê tevlîhev ve çûye. Û her awayê fikirê xwedî formekî civakîbûnê, awayekî ekonomîk-polîtîk e. Wexta ku em qala pabendiya maneyê bi jiyanê re dikin, meqsed û merama me ev e.

Em bi kurtî li beridandin û qonaxên fikirê binêrin.

A-) Fikira Mîmetîk: Herçendî di lîteraturê de cihê wê hebe jî bi awayê ku em wê nas dikin, pir zehmet e ku mirov wê weke awayekî fikirê pênase bike. Giringiya vî aqlî ew e, di pêvajoya mirovbûnê de rola wî çêbûye. Aqlê mîmetîk, di nava sînorên ajoyan de ye, aqlê pêşî ye, bi bertek û ajoyan tevdigere. Weke tevahî heywanan bi ajoyên dahfdanê yên bingehîn ên weke birçîbûn, parastin û zêdebûnê dimeşe. Ev zêhn tiştan diceribîne. Lê şêweyekî besît ê ceribandinê ye. Rêbaza wî ya bingehîn teqlîd e, bi teqlîdkirinê hîn dibe. Bi qasî ku dibîne, bi qasî ku pê dihise û bi qasî ku teqlîd dike, jiber dike. Ev ew aqilê mirov e, yê wê dema ku hê mirov ji cureyê heywanan bi temamî veneqetiyaye. Aqilê mîmetîk aqlê pêşî ye, lê tine nabe. Li cem mirovê hemdem jî heye. Ev têgîn di qada hunerê de jî tê bikaranîn. Li gorî têgihiştineke mîmetîk a hunerê, di xwezayê de jixwe huner heye, tişta ku bi navê hunerê jî tê kirin bi temamî teqlîda xwezayê ye.

B-) Fikira Mîtîk: Mît di cewherê xwe de sembol e. Mirov dikare fikira mîtîk weke fikira xwe disipêre remz û sembolan pênase bike. Di dîroka mirovîbûn û civakîbûnê de qonaxek e, ji şoreşê wêdetir e. Diyalektîka veguherînê bi xwe ye. Fikira pêşî ya mîtolojîk e ku bi awayekî mucerred pêk tê, û derfetê dide pêkhatina civakbûnê. Ji ber ku forma pêşî ya fikira mucerred a fikira mîtolojîk e, û ji ber ku bûye sîstemeke fikirê ya demeke dirêj a dîrokê rê daye ber zêhnê mirov, bandoreke giring li ser şêweyên felsefî, dînî û zanistî yê fikirê kiriye. Di vê çarçoveyê de, mirov şopên kodên fikira mîtolojîk li ser fikira cîhana îro paşguh neke û ji nedîtî ve neyê.

Fikira mîtolojîk, di dîroka mirovatiyê de, forma fikirê ye ku di dîroka mirovatiyê de herî zêde bi rola sereke çalak bûye. Ji totemê herî besît ê di çanda klanê de heta bi rewşên civakî yên dîrokî yên gelekî tevlîhev; ji mîtolojiyên Sumer-Akad, Med-Pers heta bi yên Yewnan-Rojava, mirov dikare bandora vê fikirê li bereyekî gelekî fireh bibîne.

Hin analîz hene totemtiyê ji fikira mîtolojîk cuda dibînin, dibe ku hin wisa bibînin, lê ya rastî totem remzek e ku derbasbûna qonaxa fikira sembolîk pênase dike. Fikira mîtolojîk ji rêxistiniya pêşî ya mirov a weke klan pêk anî û bi pêş xistî, ango ji vê serhatiya wî heta bi pêvajoya neolotîkê û heta bi pêvajoya Sumeran a dewletbûnê formeke sereke ya fikirînê ye. Di vê çarçoveyê de mirov dikare bibêje, fikira mîtolojîk, hişk nebûye, li pey desthilatdar û otorîteyên polîtîk ên mutleq neçûye û li gorî wan zêhnê civakbûna azad pêk aniye.

Hinek dikarin fikirên mîtolojîk weke dûrketina ji rastiyê bibînin. Erê rast e, aliyên wan ên hestyar û bertekwarî li pêş in; lê ev nayê wê maneyê, rasyonel-aqilane nînin. Mîtolojî jî hema bêje weke zanist û dînan ji xwe re efsaneyên afirandinê çêdikin. Çîrok û çîvanokên wan ên afirandinê xwe disipêrin tevneke beraqil a gelekî asayî û besît. Mirov li ber rewşên nediyar nikare xwe bigire. Lewma bi pirsên weke “Ez kî me, ez çi me, ez ji kû ve têm, ez bi kû ve diçim” ber bi nediyariyê ve dikeve rê, çawa bi pey pêdiviyên xwe yên bingehîn dikeve, bi heman awayî bi van pirsan bi pey hebûna xwe dikeve, li xwe digere, hewl dide maneyê bide hebûna xwe û vê bi awayekî ji awayan berbiçav dike. Di tevahiya pêvajoya beridîna mirov de pirs diguherin, lê pirs her mayînde û baqî ne. Yek ji xisletên giring ên fikira mîtolojîk ew e ku li ser xeteke dûz an jî bi quncik bi meseleyan danakeve, bêhtir nerm û sist e. Zimanê mîtolojiyê jî nerm e, û pê re helbestwarî ye. Ziman û şêweyekî fikirê yê jiyanê ye, tê de xweza serdest e, lê bi xwezayê re di zikhev de ye. Ji ber vê nermî, rewanî û herikbariya wê jî herî zêde nêzî fikira azad e.

C-) Fikira Dînî: Mirov dikare fikira dînî weke fikira mîtolojîk a ketiye qaliban û bûye dogma, pênase bike. Şêweyê fikira bingehîn a niha fikira dînî ye. Fikira mîtolojîk a nerm, rewan û dînamîk di dîn de ketiye qalibên hişk ên cemidandî. Ew zimanê wê yê helbestwarî vediguhere zimanê fermanê. Fikir hişk û camid dibe, ziman dibe zimanê fermanê, ev hemû veguherîn badilhewa nîne. Ev veguherîn hemû têkiliya xwe bi rêxistinkirina qada civakî re heye. Rêxistiniya civakî di warê hejmar û naverokê de çiqasî mezin û tevlîhev dibe, pêdivî bi aqilekî civakî çêdibe da ku karibe li rastiya rewşa nû ya civakî serwext bibe. Di vê çarçoveyê de dîn dibe aqlê nû yê civakbûnê; xwe li ser bingehê desthilatdariya navendî yê civakbûnê bi rê dixe. Ji bo desthilatdariya navendîbûyî bingehê rewakar, îdeolojîk û fikirî yê civakbûnê ye ku xwe ji nû ve bi rê dixe. Lewma li bin sembolên dîn û Xwedê, ya ku rêxistî dibe, deshilata nû ya tekperest e, û ya jê re serşor dibe civak e.

Fikira dînî jiyanê li gorî jiyana pîroz û nepîroz dabeş dike. Pîrozbûn di heman demê de modela civakê ya tesewirkirî ye û divê ew were pêkanîn, ango argumantasyona rewakirina desthilatdariyê ye. Fikira dînî, ji afirandinê heta bi mirinê, di her qada jiyanê de hûrûkûr

gotinan rêz dike û pîvanan destnîşan dike. Armanca wê ew e; ji bo desthilatdariya dixwaze tehkîm bike; ji bo berjewendiyên wê, civakê disiplîne bike û di kontrolê de bihêle.

Tevna dînî, tişta ku li awayê fikirê yê mirov zêde kiriye, rêbaza fikirê ya sîstematîk e. Civakên dînî xwedî jiyaneke bi disiplîn in. Sedema wê, ev şêweyê sîstematîk ê fikirê ye. Baş e, zirara xwe çi ye? Ji ber vî şêweyê sîstematîk dogmatîzm xurt dibe. Dîn, mejiyê mirov ê lêbipirse, lêbigere û bipirse têk dibe. Dîn, ne tenê îddîa dike ku ew her tiştî rast dizane, di heman demê de wî tiştî dîkte dike. Di fikira azad û îradeya azad de kelama Xwedê nuqteya dawî datîne.

Fikira dînî heta roja me ya îro hebûn, mayîndebûn û zindîbûna xwe dewam kiriye. Eşkere karîbûye vê bike, sedemên vê hene, sedemek jê psîkolojîk e. Bawerî ji aliyê psîkolojîk ve mirov ji rewşa nediyar rizgar dike wî bi hêzekê ve girê dide û bi vî awayî pêdiviyeke wî ya bingehîn pêk tîne. Mirov di nava rewşeke nediyar de nikare bijî. Fikira dînî, maneyê dide hebûna mirov; wî bi vê ve girê dide û bi vê derfetê jiyanê didiyê. Fikira dînî, bi sedema aliyên wê yên dogmatîk û aliyên wê yên bi vî rengî, di gelek meseleyên mezin ên zanîn-zanistê de valatiyê dihêle û van valatiyan hemûyan bi baweriyê tijî dike. Di gelek qadên fikir û fikirînê de ango di qadên fikirê yên zanîna dînî kêm mayî de bawerî dikeve dewreyê. Tiştekî tesaduf û xweber nîne ku li cem civakên asta wan a serwextî û zanistê kêm, fikira dînî bi hêz û kûr e.

Çawa ku fikira mîtolojîk bandor li fikira dînî kiriye, fikira dînî jî bandor li fikira zanistî kiriye û di çarçoveyeke bêhtir berfireh de mirov dikare bibêje, bandoreke bi kok li têgihiştin û fikira civakî kiriye û hê jî vê bandora xwe didomîne.

D-) Fikira Zanistî: Dîroka fikira zanistî diçe heta bi têkiliya pêşî ya dest û zêhnê kevir bi teşe kir. Lê di çarçoveyeke giştî de wexta ku qala fikira zanistî yan jî serdema zanist tê kirin, meram zanista hemdem e. Ev jî têgihiştina zanist û felsefeya bi Bacon dest pê kiriye û bi Newton derketiye asteke payebilind e.

Zanista modern sîstemeke hilberîna zanînê ye, bi rêbazên ceribandin û çavdêriyê xwe disipêre diyardeyan, wan dipîve û diwezinîne. Bi daneyên zanistî yaseyan çêdike; sifetên weke gerdûnî û objektîv bi yaseyan vedike û bi vî awayî analîzan dike. Li tevahiya warên weke fizîk, kîmya û biyolojiyê bi heman rêbazên zanistî yên pozitîv bi zanînê dadikevin. Zanistên civakî yên modern jî weke heyî radihêjin van zanistên pozîtîv û wan li warê civakî tetbîq dikin û ji vê re jî dibêjin, ev zanist e.

Fikira zanistî, şêweyê fikirê yê dogmatîk ê ku xwe disipêre dogmayên dînî û qebûlên metafizîk, hilweşandiye. Ev, ji bo cîhana fikirê şoreşeke mezin e. Ji ber vî aliyê wê tê gotin, fikira zanistî tariya di serdema navîn de rohnî kir û jê bihurî. Kengî bi şoreşa zanistî re di teknolojiyê de, di pîşesaziyê de gavên mezin hatin avêtin û tiştên nû çêbûn, hingê di sîstema hilberînê de jî bi carekê gavên mezin ên di asta şoreşê de çêbûn. Hilberîna bi makîneyan, sîstema ekonomîk a civakî ji binî ve guheriye. Ekonomî-Polîtîka sîstema ekonomiya kapîtalîst û dewleta netewe ya modern li ser vî bingehî bi gewde bûne. Felsefeyên pozîtîvîst-determînîst ên xwespartî fikira zanistî, zanistên civakî yên li ser bingehê van felsefeyan hatine avakirin, gelekî hatin rexnekirin. Yase şûna Xwedayê ku di dîn de diyarker, digirin. Şûna Xwedê yase digirin, lê determînîzm weke heyî dewam dike, ango cewher naguhere. Li şûna pûtên îdealîst pûtên sekuler ên materyalîst bi cih dikin. Lewma em dibêjin, 'pûtperestiya herî mezin pozîtîvîzm e.'

Herçendî zanista klasîk di çarçoveyeke makro de hukmê xwe hê bidomîne jî fizîka kuwantûmê nîşan daye ku yaseyên zanista klasîk di gerdûna mîkro de hukmê xwe nînin, û ji vê jî giringtir di warê krîterên yaseyên zanistî de hiştiye ku em ber xwe bibînin û em li tiştên

nû serwext bibin. Di cîhana zanistî de guhertineke bi vî awayî ya paradîgmal çêbûye û çêdibe. Ji bo em pênasekirina xwe ya zanistîbûnê rast bikin, divê haya me ji van hebe.

Çi di zanista klasîk-modern de, çi jî di kuwantûmê de be, giring e ku mirov di nêzîkatiya zanistî de her tim pareke gumanê bihêle. Di tevahî zeman û zemînan de tiştekî weke zanîna mutleq, rastiya mutleq tineye û jixwe nêzîkatiyeke bi vî rengî bi awayê zanistî re li hev nake. Xwezayek heye, her tim diherike; her ku diherike vediguhere. Bêguman zanist, fikira zanistî giring in. Teoremên kuwantûm, kaosê ber li mirov vedikin, asoya mirov rohnî dikin. Di her rewşê de pêdiviyeke zanistî civakî ye ku mirov bi hinek guman nêzîk bibe. Û divê em ji bîr nekin, li gorî tehlîla dawî, her awa agahî-zanist berhema zêhnê mirov e. Lewma civakî ye, û ev karakterê agahî-zanînê, îddîaya objektîvtiya mutleq a zanînê red dike.

E-) Fikira Felsefî: Mirov fikira felsefî di pêpelûkên pêşketina fikirê de nikare li her çi qonaxekê bi cih bike, nikare bi zemanekî diyarkirî bi sînor bike. Felsefe têkiliya xwe bi hebûnê heye, ji wî mirovê pêşî yê pirsî "hebûn çi ye" yan jî "Ez kî me" ev awa şêweyê fikirînê heye. Zanist jî li hebûnê dikole û di biwarê wê de pirsan dike. Lê zanist di biwarê hin aliyên hebûnê de pirsan dike. Cudahiya bingehîn a felsefeyê ew e, ew bi xwe bi hebûnê re têkildar e. Felsefe, bi hebûna hebûnê re agahiyên mirov ên derbarê jiyan û cîhanê de hem çêdike, hem jî dixe ber lêpirsînê.

Felsefe xwe disipêre aqil. Du xisletên wê yên bingehîn hene: Sîstematîk e, û rexnegir e. Fikira felsefî li şûna bersivên baş, pirsên hûrûkûr dike, rê li ber lêpirsînê vedike, ango awayekî fikirê yê rexnegir e. Fikira felsefîk, bingehên sîstemên fikirê û pirsgirêkên di vî warî de bi awayekî rexnegir analîz dike. Para bêhtir, bi têgînên weke rast-nerast, fonksiyon, pêşniyaz, işaretpêkirin û neçarbûnê re mijûl dibe.

Cudahiyek felsefeyê ji zanistên pozîtîv ew e, di mijarê de berfireh e. Zanist, ya heyî lêdikole; lê felsefe bi ya heyî qîma xwe nayîne, derdikeve derveyî sînoran û bi ya ku divê hebe, mijûl dibe. Bi vî aliyê xwe, mirov dikare fikira felsefî bi qasî lêgerîna xwe ya heqîqetê, weke şêweyekî fikirê yê xwedî naveroka cewherê exlaqî pênase bike. Ji ber ku ji bilî muhakemeya aqlî xwe nasipêre tiştekî din, heta tu bibêjî nerm e, û afirîner e.

Bi giştî dîroka felsefeyê bi Yewnanan didin destpêkirin û ev berevajîkirineke bi zanebûn e. Rast e, çanda Yewnanî di felsefeyê de qonaxek e, lê fikira Yewnanî di warê fikira dînî de ji Misrê, di warê fikira felsefî de jî ji Medyayê sûd wergirtiye. Wexta ku em vê pênase dikin, em nabêjin, 'Med çavkanî û jêdera felsefeyê ne', lê Yewnan di felsefeyê de weke destpêk têne destnîşankirin û em di vî warî de tesbîtekê dikin û dibêjin, ev ne bi vî awayî ye.

Fîlozofên pêşî yên Yewnanan Thales, Anaksîmenes û Anaksîmandros di heman demê de weke fîlozofên xwezayê jî dihatin naskirin. Thales Mîletosî bû. Li Misir û Medyayê geriyaye. Felsefeya Yewnan a li peravên Egeyê xwe bi Rojhilata Navîn xwedî kiriye. Li Medyayê dînê Zerdeştî nîvbinîv felsefe ye. Baweriya Zerdeştî ya xwe disipêre têkoşîna di navbera rohnî û tariyê de bi xwe fikireke diyalektîk e. Yewnanan ev fikir girtine û bi pêş ve birine. Platon di dîroka felsefeyê de dahênerek e. Beriya wî Thales û yên din bi mijarên xwezayê re mijûl bûne. Wexta ku Herakleitos got, 'her tişt diguhere' haya wî ji diyalektîkê hebû û felsefeya wî giring e. Sokrates bi mijarên têkildarî civakê re mijûl bûye. Herçî Platon e, bandora wî bêhtir bi hêz e. Felsefeya îdeayan bi pêş xist. Paşê taca felsefeya Yewnan, Arîsto tê. Mentiq û argumantasyona felsefeyê ya wî bi pêşxistî, bi sedsalan rê da ber felsefeyê. Arîsto di heman demê de mamosteyê Skender bû û bêguman para Arîsto di serketinên eskerî yên mezin ên Skender de hebû.

Li rêza pêş, yek ji dahênerên felsefeya serdema modern, Hegel tê. Fikira diyalektîk beriya Hegel jî heye. Zerdeştîtî ji bo vê mînak e. Lê tişta ku Hegel kirî ew e; bi fenomenolojiyê, wî li

diyalektîka xwezayê deriyên nû vekirin. Engels encamên ji 'Diyalektîka Xwezayê' bi dest xistî di zanistên civakî de tetbîq dike û bi awayekî serketî analîzên felsefîk ên civakî dike. Eger Marksîzm di nava civakê de evçend bi hêz hatibe qebûlkirin sedema wê diyalektîka Engels e. Ber bi roja me ya îro ve rêûresma felsefeya Elman bi fikirdarên weke Heidegger, Ekola Frankfurtê dewam dike, dîsa di dema me ya nêz de fîlozofên Fransî bi guftûgoyên xwe yên li ser 'kirde-subje, ez-yê din' hene.

Mirov serhatî û çîroka fikirê ya mirov xulase dikare bi vî awayî bîne ziman. Şêweyên fikirê yên me ew vekolan û weke mîmetîk, mîtîk, dînî, zanistî û felsefî qala wan kir, kodên wan ên xweser hene. Li vir, hêja ye ku em bi giringî bibêjin, ev şêweyên fikirê hemû di zikhev de ne. Mirov nikare wan bi temamî ji hev cuda bike. Fikir diyalektîk e, ya wê ya Rojhilatî yan jî ya wê Rojavayî, ya zanistî yan jî ya felsefî, hemû pêkhênerê pêwendiyekê ne. Em îro jî aqlê mîmetîk bi kar tînin. Em ji mîtolojiyan hîn dibin û ya giring ew e ku haya mirov ji vê diyalektîka fikirê hebe. Mirov çendî ji diyalektîka fikirê dûr bikeve, mirov ê ewçend xerîb bikeve. Heke civakîbûn manedarbûn be, fikira xerîbketî jî mirov ji civaka xwezayî dûr dixîne.

2-Civakîbûn Etîk (Exlaqî) Û Polîtîk e

Di cîhana zanistê de, yase pîvana zanistîbûn û objektîvbûnê ye. Di zanista klasîk de, yase tiştekî wisa ye, mirov wê naxe ber lêpirsînê û weke heyî tê qebûlkirin. Yaseya zanistê, weke kelam û lefza Xwedê ye, kes nikare bixe ber lêpirsînê, ji ber ku jixwe bi ceribandin û çavdêriyê hatiye îsbatkirin. Dûrî aqilan e ku mirov li ber tiştekî rabe, rastiya wî hatiye îsbatkirin, ev yek nabe, nayê qebûlkirin.

Di rewşa xwezaya yekemîn de, dibe ku mirov qebûl bike ku li cîhana fizîkî rewşa yaseya zanistî lê ye. Bi rastî jî hêza erdê ya kişandinê, diyardeyek e. Sêva ji çiqilê xwe tê xwarê, dikeve erdê. Qanûna hêza kişandina erdê, rastiyek e. Yaseyên derbarê tevgerê û pêkhatina kîmyewî de rast in.

Zanista kuwantûmê li ser rewşa xwezayê û nexasim li ser cîhana mîkro fêrî me kir ku nabe yase weke rewşekê bêne mutleqkirin. Û ne tenê ev, di gelek waran de ber li me vekir û asoya me rohnî kir. Di rewşa xwezayê de jî yaseyên hişk ên zanistî her tim ne lê ne.

Zanistên civakî yên modern dibêjin, ew dikarin yaseyên zanistên pozîtîv weke heyî li ser civakê tetbîq bikin û hewl didin vê bikin. Li gorî vê, civakê dikin her çi hebûneke maddî ya xwezaya yekemîn. Li gorî vê perspektîfê, ji bo azadî û xweşhaliya civakî divê civak li gorî pîvanên zanista pozîtîv ji nû ve were tenzîmkirin. Xwediyên vê têgihiştinê yan jî ev têgihiştin bi xwe îddîa dike ku ew ji bo civakê bi ya herî baş dizane, lewma hewl dide ji jor ve bi endezyariyeke civakî, wê ji nû ve tenzîm bike. Îca, wexta ku di vê de bi ser nakeve, mîna modela dewleta netewe dike, bi zorê û bi şiddetê hewl dide nasnameyeke nû û tekperest li civakê bike. Bi vî awayî jî pîvana civakê ya etîk-polîtîk, karakterê wê yê heterojen û cudahiyên wê yên maneyê çêdikin, bi navê zanistê tine dike. Di bin navê civaknasiyê de civakbûn tê tinekirin. Zanistên civakî yên modern di vê çarçoveyê de ji zanistbûnê wêdetir tevnên îdeolojîk in. Wezîfeya wan ew e, civakê li gorî modela dewleta netewe tenzîm bikin. Armanca wan ne azadiya civakê ye û ne jî bikêrhatina wê ye; armanca wan ew e, civakê bikin girseyeke bênasname, bikin bêmane, bikin ku bi hêsayî were mêhtin û kotin, bikin ku hilweşe.

Di çarçoveya ast û tora civakî bi xwe de jî hin pîvan hene. Pîvana exlaqî-polîtîk, karakterê heterojen û cîhana maneyê, hin ji van in. Me mirov weke hebûneke yekpare ya maddî-manewî pênase kir. Civak bi fikir-maneyê çêdibe û dibe heyî; ango pêkhateyeke nerm û piralî ye, ji gelek nasname û mirovên cuda pêk tê, bi gotineke din, pêkhateyeke pirkirde ye. Ya din jî civak diyardeyeke wisa ye, weke halê xwe yê heyî di xwezayê de namîne, pêkhateyeke wisa

ye; deriyên wê misêwa serpiştê li guhertinê vekiriye. Ji vê jî wêdetir, pêkhateyeke wisa ye, hebûna wê bi saya guhertinê ye.

Gelo yaseyên xwezaya yekemîn li cem xwezaya civakî jî qebûl in? Hebûna yaseyên xwezaya yekemîn, babetek in, hêjayî guftûgokirinê ne. Ji bo xwezaya civakî jî yase dibin awayekî meyldariyê. Yek ji şaşiyên bingehîn ên Marks ew e, yaseyên beridînê yên Darwîn di biyolojiyê de tesbît kirin, hema bi lez li ser civakê tetbîq kirin. Marks got, "Di civakê de jî yase hene", navek jî li wan kir û got, "yaseya materyalîst a diyalektîk-dîrokî". Lê ya rastî, di civakê de ne yase, meyl hene. Meyl bi xwe ne yase ye. Di civakê de dibe ku meylên qebûlbûyî hebin, lê yase tinene. Civak xwe disipêre zêhnê mirov. Di zêhnê mirov de yaseyên hişk tinene, meyl û fikir hene. Ji ber vê sedemê, civakên ku azadiya fikirê qebûl dikin, civakên herî tekûz in.

Pozîtîvîzm bi awayekî ew sosyolojî ye, ya ku Marks jî xwe spartiyê. Pozîtîvîzm dibêje, "ez ji metafizîkê dibihurim"; dijberê metafizîkê ye. Ew jî civakê bi qanûnên zanistê pênase dike. Dibêje, "Qanûnên di xwezayê de ji bo civakê jî dibin" û ev hem li cem Marks hem jî li cem Durkheim jî heye. Li gorî nêzîkatiyên metafizîkê, pozîtîvîzm pêşketineke mezin e. Lê pozîtîvîzm di halê biserxweveçûyî de ku halekî pir bi tehlûke ye, heta bi faşîzmê û komînîzmeke sexte ve diçe.

Mirov bi pabendî xwezaya yekemîn çêbûye û zêde bûye. Ango mirov ji maddeya xwezaya yekemîn derketiye holê. Ya rastî, xwezaya civakî jî vê rave dike. Mirov civakê diafirîne, civak jî mirov diafirîne. Zêhniyetên bingehîn ên xwe disipêrin xwezaya civakî mijara xwezaya duyemîn in. Di xwezaya duyemîn de yase tinene. Cudahiya bingehîn a di naverokê de ew e; di xwezaya duyemîn de yase tinene, meyl hene.

Jinûvepênasekirina sosyolojiyê mijarek e ku bi temamî wê bi xwezaya sêyemîn bibe. Gelo mirov dibe metafizîk? Ev jî bi xwezaya duyemîn û sêyemîn ve têkildar e. Mirov bê metafizîk nabe û ev mijarek e, nabe mirov gumanê jê bike. Etîk, huner û heta zanist jî di navê vê de ne. Mijara zanist û metafizîkê balkêş e. Zanist yeqîn dike ku bi temamî xwezayê nîşan dide û rave dike. Metafizîk jî hûnandin û pevbestin e. Ya rastî, fikira metafizîk fikireke pevbestî û hûnandî ye. Fikira zanistî jî jixwe navê wê li ser e, berevajî fikira pevbestî û hûnandî ye.

Civak li gorî yaseyên hişk nameşe, ango li gorî yaseyên hişk nayê analîzkirin. Di çarçoveya tor û pabendên civakê de ji yaseyan zêdetir rola meylan heye. Eger em qala yaseyan-yaseyetiyê bikin, em ê bibêjin, rewşeke nerm a yaseyetiyê heye. Ti yase, nikare rewşa diyardeya pê re di nava pabendiyê de paşguh bike. Heke civak, karakterê xwe yê pêkhatinê piralî û nerm be, nabe ev bi yaseyên hişk were pênasekirin û ev awa ne zanistî ye. Di vê çarçoveyê de civaknasên modern, ji ehlên dîn bêhtir dogmatîk in, û lewma ji pûtperestiya modern wêdetir naçin.

Yaseyên xwezaya fizîkî nabe ku li civakê bêne tetbîqkirin. Di tevn û pabendiya civakî de yase nerm in. Ango karakterê wê yê civakî nerm e. Li ser navê çi dibe bila bibe, rewşek yan jî ferzeke berevajiyê vê, wê zirarê bide civakîbûna azad.

Mirov bi hêza fikirê ji xwezayê cuda dibe û bi tevnên maneyê (pattern) yên bi hêza fikirê afirandî civakî dibe. Bi çêkirina mane û tesewirê (imagination) bingehê civakîbûnê datîne. Baş e, ev mane û çêkirina wê çi ye? Di jiyanê de ev çawa çêdibe û pêk tê? Ji bo em bersiva vê pirsê bidin, divê em li ser pêdiviyên pevrejiyanê bifikirin. Ji bo bihevrejiyanê konsensuseke hevpar a nirx û berpirsiyariyan, şert e. Çarçoveya vê konsensusê pênase dike jî etîk û polîtîk e. Ev tevneke maneyê ye, red-qebûlên tevahiya pêkhateyên civakê di nava xwe de dihewîne. Ev pîvana etîk-polîtîk, ne tenê aliyê manewî yê jiyana mirov, yekîtî, psîkolojî û serwextbûna wî ya hevpar jî pêk tîne, di heman demê de şêweyê tedarikê yê pêdiviyên jiyana pratîk diyar dike, bi gotineke din, rê dide ber çalakiyên wî yên ekonomîk-polîtîk. Ji bo jiyana hevpar,

pêdivî bi sîstemên kolektîf ên hilberandin-serifandinê û mekanîzmayên biryarê hene ku ev naveroka polîtîk nîşan didin.

Manewya vê ew e, heke ne etîk û polîtîk be, mirov nikare qala civakê bike. Di warê naveroka van têgînan de dibe ku guhertinên nuansê yên piçûk hebin. Lê li her cihî û her tim bi heman rengî ne. Lewma mirov dikare pîvana bingehîn a civakê weke pîvana etîkî û polîtîkî deyne.

Li vir, tişta ku divê em paşguh nekin, diyalektîka têkilîdanîn-peywendê ye. Têkiliyeke exlaq-etîk û ekonomî-polîtîk a ji hev du nabe heye. Di zikhev de çêdibin, hebûna wan bi hev re heye, ji hev du nabin. Têgînên weke mane, exlaq, ekonomî û polîtîkayê hemû di çarçoveya têkilî-pêwendê de me derbarê xwezaya civakê de ber bi heqîqeteke din ve dibin. Têkilîdanîn-pêwend, pabendiyek e wisa ye ku kirdeyên cuda di navê de hene. Bi gotineke din, eger hebûnên cuda, nasnameyên cuda û kirdeyên cuda nebin, ne pêkan e ku mirov qala polîtîka û exlaq bike.

Em bi van tesbîtan digihîjin vê encamê: Civak pêkhateyek e, ji nasname û mirovên cuda pêk tê; ango pêkhateyeke heterojen e, û ber lê vekiriye. Cihêrengbûn ji bo civakîbûnê pîvaneke îcbarî ye. Cudabûna civakî nebe, ti nirxê maneyê yan jî exlaq çênabe. Ji vê jî wêdetir, kirde û nasnameyên cuda nebin, civak jî nabe. Eger bibe jî wê kerî û col bin. Lewma mirov li ser civakê hemanrengî û yeksaniyê ferz bike, ev dibe faşîzm. Heta ji faşîzmê jî wêdetir e, derketina ji mirovbûnê ye, civak dibin col û kerî.

Xwezaya civaka azad pabendeke raya gişti ye; tevna xwe ya etîk-polîtîk diparêze, cudahiyên xwe di nava yekîtî û berjewendiyên hevpar de digire, derfetên xwebipêşxistinê pêşkêşî her kirde û nasnameyê dike. Naxwe em dikarin binpêkirina her yekê ji van pîvan û prensîpan an jî tinebûna wan weke pirsgirêka civakî yan jî problematîkê pênase bikin.

3-Di Civakîbûnê de Rûdana Pirsgirêka Pêşî (Problematic) û Rastiya Jinê

Tê zanîn, xwezaya civakî bi giranî jin e. Jin dizê, jin bi keda xwe civakê çêdike; dibe damezirînera xwezaya civakê. Ji ber ku jinê zarok dianî û rola mêr di vê de hê diyar nebûbû, fikira jin xwedawend e, çêbû û vê jî kir ku rola jinê ya avedanî, pîrektî û pêşengtiyê bi pêş bikeve. Jixwe, mirov bi têgîn û awirê îro li bûyer û qewimînin dîrokî binêre, ne mumkin e ku meseleyê fêhm bike. Ji bo mirov dîrokê rast bixwîne, divê mirov têkiliya di navbera zeman, mekan û çandê de paşguh neke. Di erdkolanên arkeolojîk de heykelên piçûk û pir kevnar ên bi fîgurên jinan têne dîtin û ev tiştekî xweber nîne. Ev daneyek e ku işaret bi cih û rola jinê ya di civakbûna pêşî de dike. Heykelên piçûk ên ku em qala wan dikin, hemû bi heman perspektîfê hatine çêkirin: zikmezin in, pêsîr girs in û organên wan ên zarokanînê, li pêş berbiçav in. Ev hemû işaret dikin bi xisletên jinê yên weke dayika ku zarokan tîne û şîr dide. Bi van xisletên wê, jîn û jiyan çêdibe.

Di vê rewşê de, em dibînin jin dizê, zarokan tîne, jîn û jiyan jê peyde dibe û ev jî wê dike hebûneke ‘pîroz’, lewma mirov fêhm dike ka çima organê wê yê pê zarokan tîne (vajîna-zikê mezin) û yê pê şîr dide bi awayekî beloq derdikevin pêş û xuya dikin. Pîroztî, ji ber rahendên maneyê yên di nava xwe de dihewîne di civakbûnê de cihekî xwe yê pir giring û krîtîk heye. Lê rola jinê ya di civakbûnê de tenê bi zarokanîna wê bi sînor nîne. Tevî vê, hûn ji kîjan aliyî ve li meseleyê dinêrin binêrin, civakbûna pêşî bi têkiliya di navbera dayik-zarokê de pêk hatiye û ev heqîqetek e, nayê guftûgokirin. Ma ne, ya neh mehan zarok di zikê xwe de, di malzarokê de hildigire, piştî ku tîne bi şîrê ji bedena xwe diniqutîne wê xwedî dike û tevahiya zarokatiyê wê diparêze û lê dibane, jin e. Ya hînî zarok dike ka ew ê çawa li jiyanê bimîne, ji bo vê, agahiyan didiyê û perwerde dike, û ya wê tevlî civakê dike, jin e. Tiştekî bi navê “bavtiyê” tineye. Eger mirov vê rewşê jî li ber çav bigire, mirov dikare bifikire ku rola jinê ya

di jiyana klana dayikê de ya civakîbûnê çêdike, hîn û perwerde dike, naveroka rola wê tevahiya emrekî dewam kiriye. Mêr di vê civakîbûnê de li derve nîne, lê li navenda wê jî nîne. Li dorbera wê ye, rola wî di dereca diduyan de ye.

Li gorî gotinê, jin û mêr di nava xwe de kar dabeş dikin; mêr diçin nêçîrê û jin jî diçin giya û pincaran kom dikin; dîsa jin heywanên hûr û biçûk kedî dikin. Ev awa ravekirin gelekî tê gotin. Lê mirov nikare bibêje, bi awayekî kategorîk ev li cem civakan hemûyan bi heman rengî pêk tê. Ji ber ku hin civak hatine keşifkirin; jinên wan civakan nêçîrvanên baş bûne û berevajî vê jî heye. Lê rast e, bi giştî dabeşbûneke bi vî rengî heye. Axir, li gorî zeman û mekan, mirov dikare fêhm bike ka di dabeşbûna kar de çima nêçîr para mêr dikeve.

Jin ji aliyekî ve giya û pincaran berhev dike, ji aliyekî din ve jî pîr û mezina klanê ye; divê li serê klanê be û jê re rêzaniyê bike; ango hem bi xwezayê re hem jî bi mirovan re di nava têkiliyê de ye û ev hemû damezrêneriya civakê pêşkêşî wê dike û heta vê li ser wê ferz dike. Jin li dora xwe zimanekî bi pêş dixe, çandekê û civakekê çêdike. Jin di vê çarçoveyê de bi motîvasyoneke têkildarî jîn û jiyandinê dibe, çand û tevna xwe çêdike.

Mêr, di rêxistinkirina klanê de li navenda civakbûnê cih nagire, li dorbera wê ye. Di dabeşbûna kar de bêhtir nêçîrvanî para wî dikeve. Nêçîrvanî karek e, xwedî şert û mercên taybet e. Ji bo nêçîrê divê tu bi riyên dûr ve biçî. Divê tu li deverên nêçîrê tu bi şev bimînî. Ya ji van hemûyan jî giringtir ew e ku divê tu bikujî. Lewma ev yek di têgihiştina nêçîrvanên pêşî de wisa çêdibe; “Ji bo tu bijî, divê tu bikujî”, bi vî awayî kuştin rewa dibe, exlaqî dibe. Ji bo nêçîrê pêdivî bi sîlehan heye û ji bo vê jî hewcedarî bi pêşxistina sîlehê heye. Pêdivî bi pîlan û feqan heye. Ji bo nêçîra heywanên mezin, pêdivî bi plankirina gelek kesan heye. Bala xwe bidinê, di vê cîhanê de tenê mêr hene. Bi hev re didin ser rêyên dûr, li hin waran bi hev re bêhna xwe didin, bi hev re pîlanan çêdikin û dafikan datînin, û ev hemû, dihêle revdeyên mêran çêbibin. Em ji bîr nekin ku ev awa têkilî, danûstendin û jiyan bi deh hezarê salan didome û ev bi xwe re çandekê, zêhnekî û xûyekî çêdike. Revdeyên mêran yekîneyên xwe yên xas hene, nêçîra heywanan dikin û eger di nêçîra xwe de bi ser bikevin, şahiyê li dar dixin. Li ser vî bingehî revdeya mêran a ji çend kesên destbirak pêk tê.

Bi vî awayî mêr taktîk û stratejiya kuştinê hîn dibe, hîn dibe sîlehên pêşketî çêke; zend û bendên wî bi hêz dibin û li cem wî, psîkolojiya kuştinê normal bibîne, çêdibe. Ev hemû, di heman demê de dihêlin ku mêr li dijî civakbûnê bibe xwedî derfet û îmkanên bi tehlûke.

Li Girê Keçel (Quça Keçel) ê li navçeya Xelîliyê ya Ûrfayê, hin heykel hatin dîtin; li ser van heykelan fîgurên mêraniyê yên tazî pir li pêş in û ev li ser tehtan jî hatine qewartin. Mîna ku mêr dibêje, “Êdî yê serdest ez im ne tu yî”. Li wir çandek heye, tê de serdestiya li dijî jinê eşkere xuya dike, çanda mêrê xwe Xwedê dibîne derketiye holê. Li vir ji cinsa mê tol hatiye hilanîn, cinsa mê hatiye tepisandin. Çanda li Girê Keçel vê nîşan dide. Pir bi xurtî pêkan e ku ev heykelên li Girê Keçel nîşana tepisandin û qirkirina jinê bin. Jixwe, beriya vê, bi hezarê salan çanda ku di navenda wê de jin pîr û xwedawend, hebû.

Li ser asarên vedîtî yên li Girê Mirazan yê raboriya wî 12 hezar sal, organê mêr ê cinsî, pir li pêş e. Ewqas derxistine pêş, ew pîroz kirine, ji erdê ber bi jor ve bilind kirine, hema bêje, serdestê erd û ezmanan ragihandine; ew pîrozbûna jinê ya ji ber anîna zarokan dewrî organê mêr ê cinsî kirine. Li Girê Mirazan fîgurên derbarê jinê de tinene. Jin bi erd û axê re wekhev dîtine, û bi vê jî ew kêm-tine hesibandine.

Di vê nuqteya dîrokê de ji bo mêr rewş xulase wisa ye: Bi hêza kuştinê, teknîk û stratejiyên wî ji nêçîrvaniyê bi dest xistine, li cem wî aqil û çandek li gorî van çêbûye. Îca li vê, bidestxistina pîrozbûnê jî zêde dike. Remz û nîşanên li Girê Mirazan didin xuyakirin ku mêranî hatiye pîrozkirin, pêkhateyeke li dora mêr û li pey wî çêbûye. Pêkhateyên li vir, li ser esasê dijberiya klana jin-dayikê û jinê derketine holê. Di vê çarçoveyê de em dikarin bibêjin, mêr ji

jinê re gotiye “ya pîroz ne tu yî, ez im”. Bi vî awayî jî ew pîrozbûna jinê ya heta wê rojê, ji destê wê girtiye; civakbûna bi dest û keda jinê çêbûye jî xistiye bin destê xwe.

Çanda civakbûnê ya jinê dikeve bin serdestiya mêr û ev jî cara ewil li Mezopotamyayê pêk tê. Lewma di vê serdema destguhertinê de qala têkoşîna di navbera jin û mêr de, herî baş di mîtolojiyên Mezopotamyayê de hatiye kirin.

Mîta Înanna-Enkî yek ji wan e ku herî zêde tê naskirin. Enkî, serdestiya mêrê xasûk temsîl dike û Xwedayê Erûdayê ye. Enkî yê dizek û xasûk, kengî nirxên civakî yên jinê desteser dike, Xwedawenda Ûrûkê Înanna li dijî wî têdikoşe. Me, yaseyên civakî ne. Înanna ji Enkî re dibêje, “Te Me’yên min dizîn”, û hewl dide wan paşde bistîne. Ev têkoşîna ku li dora berxwedana jinê bi gewde dibe, heta bi Babîlê diçe, û di destana Enûma Elîş de cih digire. Pêvajoya diziya nirxên civakî yên jinê bi Tewratê jî dewam dike. Tewrat jî li Babîlê hatiye nivîsandin. Ibrî çanda mêran a li Girê Mirazan ji Ûrfayê dibin Babîlê. Ev çand ji wir jî derbasî Mekke û Qudsê dibe. Ev çand, 15 hezar sal berê, ji van kolik û girikên bi kevir dadikeve Mezopotamya Jêr, ango Ûrûk, Ûr, Babîl û Erûdayê; ji vir jî xwe berdide Misrê, geliyên Îndûsê û diçe heta Harappayê.

Êdî zelal bûye ku meş û herika dîrokê bi vî awayî ye. Ev tê wê maneyê, mijara “Çanda MA ya Xwedawendan” ne mijarek e ku mirov paşguh bike. Bêguman li ser vê mijarê gelek tişt têne nivîsandin û gotin, lê vegotineke serketî ya dilê mirovan bixe cîh, çênabe. Belkî zimanekî wisa sosyolojîk vê rave bike, derfet û îmkan bide vegotinê. Di dîrokê de qala tiştên cara pêşî çêbûne û qewimîne, tê kirin. Hem navenda çanda klan a mîhwer jin-dayik, hem jî navenda çanda mêrê serdest ev cografya ne. Li vir, ji maka xwe dibin. Li vir çêdibin. Heta bi salên mîladê ango salên jidayikbûna Îsa jî navend ev der e. Emerîka, Ewrûpa û Asya li naverastê nînin, navend ev der e.

Şerê herî mezin li dijî jinê, bi mîtolojiya Yewnan dest pê dike. Ji bo vê vegotineke sembolwarî heye. Çanda jinê şikesteke mezin dixwe. Serdem B.Z. 1000 – B.Z. 500 e, serdema hakimiyeta Zeûs e. Zeûs, çiqas jin hebin, dest diavêje wan, destdirêjiyê dike. Balkêş e, gelek çîrokên wisa têne gotin; qala wan tê kirin, lê kes qala esasê meseleyê nake. Her tişt ji bo sosyolojiyeke sexte hatiye kirin. Ev jî nîşan dide ku derd û mesele ne heqîqet e.

Di dîrokê de şikestina pêşî û binpêkirina pîvana civakî cara pêşî di têkiliyên jin û mêran de pêk tê. Bi awayekî esasî, pevçûn bi pevketina hêmanên nêr-mê yên civakî dest pê dike. Ew fîgurên jinan ên 30 hezar salî, nîşan didin ku serdemeke xwedawendan pêk hatiye. Ji tevahiya Ewrasyayê heta bi Ewrûpaya Rojava, ji Rojhilata Navîn heta bi Efrîkayê tesbît bûye ku serdemeke bi vî rengî pêk hatiye. Baş e, xwedawendîtî tê çi maneyê? Di cureyê mirov de li cem jinê zarokanîn, zayîn cuda ye, divê mirov vê baş fêhm bike. Lêkolîn hemû nîşan didin ku zêdebûna nebatan, dabeşbûna şaneya pêşî bi hêsanî çêbûye. Heywan jî çêlikan dikin û çêlikên wan di nava bîstûçar saetan de radibin ser xwe. Hin ji wan demkurt û hin ji wan jî demdirêj in, lê pir hêsan çêlikan tînin, pir hêsan mezin dibin. Lê zarokanîn li cem cureyê mirov balkêş e, zarokanîn pir bi zehmetî dibe û zaroka mirov heta pênc-şeş salan bêyî alîkariyê nikare rabe ser xwe û heta nikare bijî. Bîstûçar saetê li cem heywanan li cem mirovan derdikeve heta heft salan. Ev jî li dora jinê civakbûnekê ferz dike. Hê nediyar e, mêr çi ye? Nayê zanîn ku zarok di encama têkiliya jin û mêr de çêdibe. Gelo jin û mêr cara ewil çawa hev du dîtin û li hev du rast hatin? Li cem mirov jî, li cem heywên jî ajoyên cinsî hene. Ajoya cinsî weke ajoya birçîbûnê yek ji ajoyên bingehîn e. Ajo nîşaneyên zindîbûn û serwextiyê ne. Eger hissa birçîbûne tinebe têrbûn çênabe, yanî jiyan çênabe, ajoya cinsî nebe zêdebûn çênabe, zêdebûn çênebe jiyan çênabe. Dayika zarokê tîne diyar e, lê bav tineye, bavtî hê diyar nebûye. Heta diyar nîne têkiliya cinsî bi kê re hatiye danîn, têkilî çawa çêbûye, di vî warî de jî mirov hê serwext nebûye, tenê ajo heye.

Çand têgihiştin û serwextbûneke li cem cureyê mirov çêdibe. Ji ber ku ya zarokê tîne jin e, pêşî çand li dora wê çêdibe û bi pêş dikeve. Mîtolojiya Sumeran jî dûrûdirêj qala vê babetê dike. Paşê jî di dînên yekxwedayî de tê gotin, "Hawa ji parsûyê Adem hatiye afirandin." Cihûyan jî ev xistiye Tewratê. Ji Tewratê jî derbasî Quranê bûye. Jina ku zarokan tîne, neçar e wan xwedî jî bike; ji bo vê jî mecbûr e ku berhevkariya tov, nebat û heywanên hûr bike. Ji bo vê jî hewldan û kedeke mezin divê. Em qala dîrokeke yek-du mîlyon salan dikin. Çîrok û serhatiya vê, li Geliyê Rîf ê parzemîna Efrîkayê dest pê kiriye, paşê jî li Rojhilata Navîn bêhtir xurt bûye. Çandeke rastî jî li geliyên Toros-Zagrosê pêk tê. Mirov li vir dibe mirov, jin li vir weke jin-dayikê dibe damezirînera civakê. Jinê zarok anîne û mezin kirine. Zarokên kur û keç ên ji dayikekê çawa hev du nas dikin û bi hev re mezin dibin, jin-dayik jî xuşkên xwe, çend xal û xaltîkên xwe jî nas dike. Bi vî awayî komên ji 10 yan jî 15 kesan pêk tên û bi vê re çandek çêdibe. Ev komên ku em qala wan dikin, hejmara wan ji 20 kesan nabihurin, komên pêşî yên klan in.

Klan di dîrokê de formê pêşî yê rêxistiniya civakbûnê ye. Klan, çandek e, li dora jinê çêdibe. Kengî qirik ji bo dengan guncaw dibe, qederê 300 hezar sal berê, tişta ku em jê re ziman dibêjin çêdibe ango cureyê mirov ji zimanê işaretan gav diavêje zimanê sembolan. Axir, di encamê de fikira mîtîk û zimanê bi sembolan jî li vê cografyayê, ya ku em jê re Hilala Bibereket dibêjin, derketiye holê. Pîvana klanê ya ji bo man û jiyanê qalib digire. Ew jî ev e; ji bo man û jiyanê divê klana hember yan tine bike yan jî heta dawiyê li dijî wê li ber xwe bide. Bi hezar salan jiyan li gorî vê pîvanê bi gewde dibe. Weke çandeke mezin, vediguhere şaristaniyê. Gund û bajar, pê re dewlet û çîn derdikevin holê.

Şaristaniya bi dewlet li Xirabreşkê derdikeve holê. Şaristaniya li Xirabreşkê li cografyayeke pir berfireh belav dibe û bi hezarê salan dewam kiriye. Şaristaniya bi dewlet û pir bi kok li vir hilatiye. Qurbankirina mirovan û dahfdana wan ber bi neolîtîkê ve berhema wê ye. Di vê serdemê de mirov bi şêweyê klanan dijîn û mêr wekî koleyan têne bikaranîn; jin jî li keviyên Qerejdaxê ji bo debarê neçarî hilberînê tên kirin. Koletiya jinan heta bi wê demê diçe. Heta ku ew dem neyê fêhmkirin, em ê nikaribin fêhm bikin ka koletiya jinê çawa dest pê kiriye. Weke tê gotin an jî weke ku hinek bawer dikin, gavavêtin an jî derbasbûna neolîtîkê bi rizadilî yan jî di encama pêvajoyeke xwezayî de pêk nehatiye. Bi temamî bi zora kastê pêk hatiye ango dijşoreşek e. Ti kes jiyaneke azad û tê de xweşhal naterikîne; û li şûna wê jiyaneke wisa zor û zehmet tercîh nake.

Koçer çi wextê bixwazin, dikarin bi gelek şiklên heywan û nebatan xwe xwedî bikin û ji bo vê ji xwezayê tedarik bikin, hewce nake zêde bixebitin. Lewma derbasbûna jiyana dêmanî û akincî; gavgavêtina jiyana cotkariyê; hebûn û bereketê, ne li ser bingehê rizadilî, lê bi zorê pêk tê. Kevirên tîk ên li Girê Mirazan paşê li Mekkeyê dibin xwedayên qebîleyan. Girê Mirazan di dîrokê de perestgeh û mekanê pêşî ye; lê mêr hatiye pîrozkirin. Pûtên li Kabeyê versiyoneke pûtên xirab û riziyayî yên Girê Mirazan e.

Xwezaya civakî li dora jinê çêbûye. Çanda xwezaya civakî ya li dora jinê çêbûye, heta bi civaka Sumeran, heta bi salên 2000 B.Z. bi rola sereke rabûye. Bi vê çandê re têgîna Xwedawenda Dayik derketiye holê. Mirov dikare vê rastiyê di heykelan de, li nava xirbeyên perestgehan bibîne. Afirînerî karekî xwedayî ye. Afirîneriya jinê, afirîneriyeke xwedawendî ye. Mirov bi bermahiyên vê afirîneriyê vê rojgara qewimî dibîne. Ji Ewrûpaya Rojava heta bi Sibîryayê, ji Rojhilata Navîn heta bi Anatolyayê fîgurên vê rojgar û dewranê li her deverê derdikevin holê. Fîgurên ku em qala wan dikin, perestina xwedawendiyê nîşan didin. Di vê serdemê de mêr hîç tineye. Navê her tiştî pîrek lê dike, weke dayik li zarokên xwe miqate ye, wan xwedî dike û wan diparêze. Ya diyarker dayik e. Her tişt bi wê çêdibe. Her tişt ji wê çêdibe. Fikir bi ziman pêkan e; fikir ziman, ziman jî fikirê bi pêş dixe. Ya ziman jî afirandî jin-

dayik e. Ango hebûna afirîner xwedawend-dayik e. Ev bûyer û pêşketin hemû li Mezopotamyayê derdikevin holê. Perestgehên pêşî perestgehên xwedawendan in ku li dora jinê çêdibin. Perestgehên ku em qala wan dikin, di çêkirina civaka nû de bi rola sereke radibin. Perestgehên xwedawendan hem pîroz in, hem jî cîwarên afirîneriyê ne. Ji xwedawendiyê kaşkirina jinê ber bi fahîşetiyê ve (orûsipîtiyê) yan jî ji çanda xwedawendiyê kaşkirina wê ber bi çanda fahîşetiyê ve di dîrokê de cihekî gelekî giring digire.

Di destanên mîtolojîk ên weke Gilgamêş û Babîl Enûma Elîş de vegotinên gelekî zelal hene. Em bi wan digihîjin encamekê; civakbûneke navend-jin hebûye. Pirsgirêka xwe disipêre nêrtî û mêtiyê çêdibe. Bingehê vê problematîkê jî pir bi hêz li vir tê danîn. Berhemên arkeolojîk hemû nîşan didin ku nebat û heywan destpêkê li ser van erdan hatine kedîkirin. Di dema Marks de lêkolînên bi vî awayî nehatibûn kirin û derbarê civaka Sumer de jî lêkolîn nehatibûn kirin, lewma mirov nikare wî tawanbar bike. Marks, dîrokê bi çînîbûnê dide destpêkirin. Lê ya rastî, pirsgirêk bi çînîbûnê dest pê nake, dîrok bi çînîbûnê dest pê nake. Dîrok li dora civakbûna jinê pêk tê. Pirsgirêk jî bi şaristaniyê, bi çêbûna bajêr çêdibe û li vir jî mohra jinê heye.

Ûrûk dewlet-bajarê pêşî ye, çîna pêşî ye. Destana Gilgamêş daneyên di vî warî de hemûyan dide. Ji ber ku şerekî mezin qewimiye bûye destan. Destana nivîskî ya pêşî ya mirovatiyê ye, û di nava vê destana nivîskî ya pêşî de bi sedan bûyerên cara pêşî hene. Yek jê afirîneriya çînî ye, afirîneriya dewletê ye û afirîneriya erkê ye. Ev hemû destpêk û cara pêşî ne, bi xurtî bandor li meş û seyra dîrokê kirine. Ma ne, damezirînera bajarê Ûrûkê xwedawend Înanna ye. Peyva Nînhûrsag (Jina Çiyê) “Nînna” (Jina ezman) jî ji wir tê. Ango ev xwedawendiya navend-jin, dînê xwedawendan, mezinbûna li ser bingehê civakbûna jinê pênase dike û nîşan dide.

Xwedawend naxwaze şûna xwe ji xweda re bihêle, dike ku mêrê “têkiliya pîroz” pê re datîne, were kuştin. Lêkolîn diyar dikin û dibêjin, ev li gorî “zewaca pîroz e.” Ango zewaca pîroz vê ferz dike. Ev pîrozbûn jî li ser bingehê dînê xwedawend jinê ye. Xwedawenda dayik naxwaze bi rêya zewacê mêrekî hemtayê wê yan jî mêrekî bibe xweda çêbe. Dûmûzî, evîndarê Înannayê ye, lê tevî ku evîndarê wê ye jî wî dikuje û dixe bin erdê. Pîvan bi vî awayî ye. Pîrek dizane ku heke cihê xwe ji mêrekî xweda re bihêle wê çi were serê wê. Jixwe em di destana Babîl de dibînin ku ev yek pêk tê. Dema ku xwedawend Înanna 4000 sal B.Z. li sîteya Ûrûkê hêzeke di ser xwe re ye, xwedawendiya wê temam e, û bi zewaca pîroz a pir bi heybet ditamije, Gilgamêş direve, nizane xwe di kîjan qulê de veşêre. Pîrozbûna wê ewçendî bi hêz e, yekî mîna Gilgamêş li ber dilerize, diricife.

Di merasîmên bereketê de eşkere merasîmeke têkiliyên cinsî jî heye. Mîtolojî van zewacên pîroz weke merasîmên bi heybet pênase dike. Û mêrê bi hêz ê di vê têkiliya cinsî de cih digire, roja din tê kuştin. Gera nemiriniyê ya Gilgamêş têkiliya xwe bi vê re heye. Mêr dixwaze canê xwe rizgar bike. Li gorî vî dînî, Xwedawenda Ûrûkê gelek rahibên xwe yên mêr hene. Rêvebera jin a em jê re dibêjin ‘xwedawend’, gelek rahibên girêdayî wê li perestgehê hene û ji wan kê dixwaze ji xwe re ji nava wan digire, pê re zewaca pîroz dike û roja din jî wî dike qurban.

Gilgamêş, ji ber ku dizane wê bibe qurban, direve, dibêje, “min hilnebijêre”. Planên wî yên yekê û diduyan hene. Ya ku mirov jê fêhm dike, her cara direve wî digirin û tînin. Lê tiştekî balkêş heye ku di destanê de eşkere nehatiye gotin, dema ku ew tişt diqewime, ji nişkê ve wî dibexşînin û nakin qurban. Çima bexişandine, lê borîne, nediyar e, divê mirov li vê meseleyê bikole. Ji ber ku bexişandina canê wî di çarçoveya meş û seyra dîrokê de bûyereke mezin e, destana Gilgamêş bi gewde dibe. Cudahiya Gilgamêş ew e, êdî mêrek e, nayê kuştin.

Piştî ku ew dibe mêrekî nayê kuştin, destan çêdibe, bi gewde dibe. Li ser keviran tê kolan, li ser qermîtan tê nivîsandin û bi vî awayî serdemeke mêrtiyê ya heta îro bê, dide destpêkirin.

Ji salên 4000 B.Z. ta bi salên 2000 B.Z., rola sereke ya çanda pîrekê, heta bi serdema hukimraniya Babîlê hêdî hêdî dikeve dest mêr. Mêr perestgeha mezin a jinê jê distîne. Gilgamêş ji Enkîdo re fahîşeyekê (orûsipiyekê) dişîne. Bi îhtîmaleke xurt, Enkîdo yek ji pêşiyên Kurdan ê çiyayî ye. Erê, destanek e, lê qala çandekê dike, çawa bi fahîşeyekê mêrekî bi dest dixîne. Jinê bi xemil û xêz dikin. Li perestgehê jinên herî neqane hene. Ev perestgeha jinên neqane dikeve bin destê mêran û paşê vê perestgeha pîroz vediguherînin kerxaneyê, umûmxaneyê. Li Ûrûkê perestgeheke jinê heye, mirov dikare wê bişibîne kerxaneyên, umûmxaneyên roja me ya îro. Em dibînin, perestgeh vediguhere kerxaneyê. Wê demê navê "musaqettîn" lê kirine, û ev awa xwe disipêre civakîbûna mêr. Hê jî ev awa di her rewşê de xwe diyar dike.

Li gorî destanê Enkîdo ji Zagrosan hatiye anîn, gelekî pesnê wî tê dayîn û bi kêmanî bi qasî Gilgamêş bi hêz bûye. Heta ew nebe, Gilgamêş nikare bijî. Peyayek e, bajêr diparêze. Wexta ku ew dimire, Gilgamêş jî xwe mirî dihesibîne û dibêje, "Tu çawa mirî, ev bobelat çawa bi serê te de hat".

Perestgeha jinê veguherandine musaqettînê, bi jinê mêrekî çiyayî xistine kontrolê. Gilgamêş gav diavêje miqamê qralbûnê. Heta hem dibe qral û hem xwe dike xweda. Ango dibe qral-xweda. Te dît, çawa ku ji Kurdan eskeran çêdikin û pê artêşan ava dikin, bi vî awayî wî yê çiyayî tînin û dixin perestgeha fahîşeyan. Mêrikê tînin, di nava du-sê rojan de ji hev bela wela dibe, dibêje, "Ez careke din naçim çiyê." Ha ji wê rojê heta îro, saziya civakê ji rê derdixe; ya jinan dike fahîşe û mêran jî dixe rewşa herî xirab, bingehê wê bi vî awayî tê danîn. Xulase, naveroka destana Gilgamêş ev e.

Xwedayê mêr ê bavikanî (patrîarkal) ji hev hatiye derxistin. Li vir a giring ew e, mirovatî çawa ji çanda xwedawendiyê derbasî çanda mêr-xweda bûye. Vegotina bi heybet a Destana Babîlê û Tewratê giring e. Serdestiyeke xeternak a mêr heye. Tiştên di Incîlê de têne gotin hene, Meryem heye, tiştên di Quranê de têne gotin hene, lê koka wê di vir de ye. Eger mirov bi giranî bi sosyolojiya zanistî bi meseleyê dakeve, mirov ê karibe van tiştan bibêje. Di encama vê de dualîteyên weke ruh-madde, ev dunya û dunya din çêbûne. Ew jî bi çanda vir re têkildar e. Bi zanebûn ji Efrîkayê hin tişt anîn, lê esas zimanê sembolî li vir pişkiviye. Em vê jî bi awayekî berbiçav di çanda xwedawend-xweda de dibînin. Dualîteya madde-mana, can-beden li vir çêbûne.

Mirov rûdana pirsgirêkê, bi awayekî esasî dikare li bin sernavê 'Jin û Problematîkê' ango jin û rûdana pirsgirêkê analîz bike. Seba ku bandora vê meseleyê gelekî mezin e, mirov nikare rastiya wê înkar bike. Mêr çawa bû mêrê serdest? Çanda xwedawenda dayik çawa veguherî dînê xwedayê mêr? Piştî serdema xwedawendîtiya jinê kujerê kastîk cinsê jinê tepeser kir û serdestiya mêhtingeriyê ya li ser cinsê jinê sîstematîze kir. Ha ev di Tewratê de heye, diyardeya mal-malbatê ya di Cihûtiyê de kokên wê di Tewratê de ne. Em berê xwe bidin Tewratê û binêrin ka jin çawa di malê de hatiye girtin? Bingehê girtina jinê di malê de Zerdeşt datîne, Cihû jî li Babîlê vê ji Zerdeşt digirin. Hîmê saziya malbata pîroz bi vî awayî tê danîn. Girtina jinê di malê de û zewac maneya xwe yek in. Jinê, bi xemil û xêz dikin bûk, dixin malê û wê di wir de digirin. Di Incîlê de ev weke rahib-rahibe heye. Di Îslamê de jî saziya haremê bi Muawiye pêk hatiye û di dema Osmaniyan de têra xwe berfireh bûye.

Em bi kurtî ji van vegotinan hemûyan fêhm dikin ku jêder û sedema rûdana pirsgirêka civakî ji ber dabeşkirina kar a cinsan derketiye holê. Dabeşkirina kar a di navbera cinsan de piştî qonaxeke diyar dibe du şeq û çetelî dibe. Baş e, ev çi ye? Çandeke xwedawendîtiyê bi pêş dikeve. Çandek e, hem ji aliyê maddî ve, hem jî ji aliyê manewî ve têra xwe bi hêz e.

Salên dûrûdirêj didome, divê mirov wê hîç piçûk nebîne. Revdeyên mêran ên nêçîrê jî rê li ber çandekê vedikin ku bi giranî mohra mêran li ser e. Her tim nêçîrê dikin û bi vî awayî debara xwe dikin. Nêçîrvanê mêr, tevahiya karê wî nêçîr e. Bi demê re hînî vê rewşê dibe, şexsiyeteke nêçîrvaniyê çêdibe û ev bi xwe re çandekê çêdike. Piştî qonaxeke diyar, mêr dilê xwe dibijîne daneheva çandî ya li dora dayikê çêdibe. Jin-dayikê zarok dane dora xwe, holika xwe jî heye, zarokan dixebitîne, pel û pincaran têra xwe berhev dike. Hinek xort, parêzvaniya klanê dikin. Ev mêr ne ji aliyê bav e, ev mêr 'xal' e, û bi xwînê bi dayikê ve girêdayî ye. Wekî din jî xaltîk heye. Ev awa çand, piştî qonaxekê disitewe, û revdeyên mêran ên nêçîrvan jî li ber serê wê ne, hema bêje di nava hev de ne. Li ber çanda jin-dayikê xwe kêm dibîne, pirnisî ye. Nêçîr ne her tişt e, û tenê bi wê nikare xwe bide qebûlkirin. Jiyan tenê bi goştê nêçîrê nameşe. Ya din jî revdeyên nêçîrê, tenê dikujin. Bûne mîna artêşên neteweyan ên roja me ya îro. Taktîk û amûrên kuştinê ji wê demê ve tên. Ev xisletên kujerê kastîk e. Her roj heywanan dikuje. Gelekî goşt dixwe, teknîkê bi pêş dixe; teknîkên kuştinê dikin ku ew gelekî bi hêz bibe. Yê dikuje, bi hêz dibe. Tew, dema ku dibe revdek, kastek, pîroz dibe û dibe ku kes nikaribe destê xwe bidiyê ango li ber rabe.

Kast, ew civak in ku li cem wan, li ser zemînekî huqûqî newekhevbûn hatiye erêkirin. Kujerê kastîk "xwediyê mutleq, efendiyê mutleq e."

Em niha baştir dibînin ku revdeyên nêçîrê yên mêr di nava civaka neolîtîk de ku weke bûyer û qonaxeke şoreşgerî ya dîroka mirovatiyê tê dîtin, bi pêngaveke mezin a dij-şoreşê ya derî li koletiya jinê veke, dest bi şerekî mezin ê cinsî dike. Niha xuya dike ku mîna Gordon Childe behsa wê dike, nebûye. Ji bo neolîtîk pêk bê, teqez hewcedarî bi êrişa revdeyên nêçîrê yên mêr heye. Û ev revde ji kujerên kastîk pêk tên.

Heta revdeya nêçîrê ya kujerê kastîk li dijî civakbûna jin-dayikê darbeyê neke, dij-şoreşê neke, civaka neolîtîk pêk nayê. Ji bo vê, mînaka herî baş Girê Mirazan e. Heta çanda kujerê kastîk nebe, Girê Mirazan û Girê Keçel ava nabin. Cihekî mîna Girê Keçel tenê tiştekî mîna mêrê pîrozkirî, çanda bavikên pîrozkirî dikare ava bike. Jixwe wekî din ne pêkan e.

Jin pel û pincaran berhev dike. Mêr nêçîrê dike, zindiyan, heywanan dikuje. Şer, kuştina zindî û ruhberekî ye. Kuştina heywanan, cinayet û qetl e. Civakbûna jinê ya li dora tovên nebatan bûyereke nadîde ye. Yek ji wan veguherî civaka tevkuj, ya din jî hê hewl dide civakê li ser piyan bigire. Ango çanda li dora jinê çêbû, sosyolojiyek e, civakê li ser piyan dihêle. Civaka şer dike esas, xenîmetê dike esas, bi giranî civaka mêr e. Ji ber ku karûbarê wî bi destxistina nirxê zêde ye. Li cihekî nirxekî zêde hebe, pel û pincarekî zêde li dora jinê hebe yan jî tiştekî zêde hebe, mêr çav ber vî nirxî dide. Mêr hem nêçîra heywanan dike, hem jî dest datîne ser xurekên jinê. Hem dest datîne ser xurekan, hem dest datîne ser jinê. Çîrok bi vî awayî dest pê dike.

Mêr bi ezmûn û tecrûbeya xwe ya ji revdeya nêçîrê bi dest xistî êrişî civakbûna jinê dike. Ha pirsgirêk bi vî awayî dest pê dike. Rewşa ku em qala wê dikin, di serî de li Ûrfayê bi awayekî giştî li gelek deveran pêk tê. Mêrê bi hêz, bi zewacê re her roj dikuje. Kengî aciz bibe, jinê dikuje û ev bi awayekî pirbelav diqewime. Di vê meseleyê de gund an jî bajar ferq nake. Stenbol û Ûrfa jî ferq nake. Belkî li Stenbolê bêhtir pêk tê. Di vê astê de hebûna pirsgirêkên malbatê ji zewacê û şêweyên zewacê ye. Gotina 'malbat pîroz e', çîrok e, tewş e. Malbateke wisa tineye. Jina ku dixin malê, di wexmeke giran a koletiyê de radigirin. Jina ku di vê wexmê de û pêsîrtengî dibe, diteqe, mêr jî li wê dide. Di rojnameyan de gelek nûçeyên bi vî rengî hene. Ji hezarî yek jin, derbê li mêr nade, lê ji sedî nodûneh mêr li jinê dide. Ma kî dikare vê înkar bike? Hewce nake mirov durûtiyê bike, her tişt eşkere li naverastê ye.

Weke encam, em dikarin bibêjin, pirsgirêkê ji ber rolên jin û mêran ên guherî rûdaye, ne ku ji ber çînîbûnê derketiye. Pirsgirêka bingehîn, ev e. Di destana Gilgamêş de, em li delîlên

vê geriyan, di civaka Sumeran de em li bingehê wê geriyan. Îca paşê di cudabûna dewlet, bajar û çînê de mesele di asta herî jor de sîstematîze bû. Mînakên vê di Tewrat û Quranê de gelek in. Sergirtina Girê Mirazan jî mirov dikare weke çalakiya mêran bibîne. Em weke fikir, dikarin diyar bikin ku heye ev lîstikeke mêrê serdest be. Çanda li Girê Mirazan çandeke pirbelav e. Di navbera Dîcle û Firatê de ji 200'î zêdetir bermahî hene. Serdestiya mêr li Girê Keçel bi serdestiya organê cinsî yê mêr pir bi awayekî eşkere hatiye nîşandan. Ev heykelên mêran derbasî Hindistan û Misrê jî bûne. Ji civakbûneke li dora jinê ya bi kêmanî 30 hezar salî serdestiyeke mêr tê.

Di warê cureyên heywan û nebatan de Mezopotamya Jor pir dewlemend e. Nexasim dorbera Qerejdaxê bi vî awayî ye. Dora Qerejdaxê ji bo ceh û genim guncav e. Bizin û mîh têne kedîkirin. Herêmek bi baran e. Li deverên din ên dunyayê ev kêm e. Li vir, erd û av ango ax û baran pir li hev in. Û dewlemendiya cureyên heywan û nebatan rê li bereketê vedike. Nebat û heywan têra xwe hene. Heta tu bixwazî tu dikarî nêçîrê bikî, heta tu bixwazî tu dikarî nebatan, pel û pincaran berhev bikî. Li vir, berhevkirina nebatan li dora jinê, nêçîrvanî jî li dora mêr çêdibe, bi pêş dikeve. Di encamê de bi hev dikevin. Mêr nêçîrvan e, û di destan de sîleh heye. Sîlehên şer ji kevirê çeqmeq-heste ne, ji obsîdyen in. Ev sîleh hê jî li dora Girê Mirazan li Xerabreşkê hene. Obsîdyen sîleheke tûj e, û di heman demê de amûrekî bi nirx ê bazirganiyê ye. Ev kêra tûj di destê mêr de amûreke nêçîrê ye, û dikare bi vê sîlehê her kesî serjê bike. Eşkere mêr bi vê serdest e, û jin li hemberî vê serdestiyê bi bin dikeve. Mêr revdeyên nêçîrê bi rêxistin dike. Kêra ji obsîdyenê di destan de heye û biçe kîjan deverê dikuje.

Di vî beşî de tişta ku ji bo me giring dabeşbeşbûna kar e, û bi vê re cihêbûna mêr û jinê ye. Dibe ku em kûr bi vê têgînê dakevin, û em bigihîjin encamên giring. Belkî divê em bi awayekî felsefîk bi vê meseleyê dakevin. Tê zanîn, xwezaya civakî bi giranî bi destê jinê ye. Divê wisa be. Ji ber ku meseleya zarokanînê heye. Herçendî zarokanîn an jî zayîn bi genetîkê were ravekirin jî giring e. Bûyereke cuda ya zayîn û çêbûnê heye. Cudabûn jî ev e: Ji hev du cihêbûna du lingan û çêbûna lebatên din ên fizîkî bûyera zayînê bêhtir zehmet dike û pirsgirêk giran dibe. Li cem hebûn û ruhberên din, bûyereke bi vî awayî ya bibe pirsgirêk, tineye. Nêr û mê sêsed mîlyon sal berê ji hev cihê bûne. Nebat jî bi heman rengî ji hev cihê bûne. Dema ku mesele dibe mirov, ev jihevcihêbûn pir cuda diqewime. Mirov kengî radibe ser xwe û dibe xwedî fikira sîmgeyî êdî weke cure teqez cuda dibe, û her ku diçe xwe ji xwezaya fizîkî cuda dike. Jin bi destê xwe civakê ava dike û dibe damezirînera xwezaya civakî.

Klana ku li dora jin-dayikê çêdibe, koma pêşî ye. Ango civakîbûn bi destê jinê ye. Jixwe wexta ku em bala xwe didin tevahiya klanan, em mînakên vê rastiyê eşkere dibînin. Mirov mînakên vê, dikare li daristanên Brezîlyayê, li daristanên Endonezyayê bibîne. Heta li Anatolyayê jî mînakên vê hene. Pirsgirêk ev e: Jin civakê ava dike, bi pêş dixe, nirxan çêdike, lê her ku diçe, zehmetiyên ji ber zarokanînê û tengasiyên ji ber debarê xwe ferz dikin. Her ku diçe deng bi ziman dibe, berhevkarên nebatan navan li tiştan dikin, pîvan û rêzikên ziman çêdibin; xulase ziman jî bi bandora sereke ya jinê bi pêş dikeve. Mêr hê ji vê gelekî dûr e. Ziman komikê bi pêş dixe û mezin dike. Kengî deng dibin peyv, lihevkirin û hevdufêhmkirin hêsan dibe û ev yek komê mezin dike, bi pêş dixe. Civaka jin-dayikê, civakek e, mîlyonan sal raboriya wê heye.

Revdeya nêçîrvanan êdî bingehê koletiyê daniye, dest pê kiriye, di serî de jin, dest daniye ser nirxên afirandî. Revdeya nêçîrvanan çima dest datîne ser jinê? Jin hem objeyeke cinsî ye, hem jî berhevkar e. Wekî din jî zarokên wê hene û dersa berhevkariyê dide zarokên xwe. Jin hertim li dora xwe diafirîne û rê li dewlemendiyê vedike. Axir, revdeyên nêçîrvanan ên mêr dest datînin ser jinê û tiştên wê afirandine. Serekekî revdeya nêçîrvanên mêr heye.

Nêçîrvanê herî baş, serek e, reîs e. Her tişt bi reîs ve girêdayî ye. Reîs gelekî bi bandor e, wî bi xwe peyayên xwe bi rê xistine. Peyayên wî dikarin dest deynin ser her tiştî. Jixwe, bi vî awayî dest datînin ser jinê. Û bi vî awayî rewşa girtî ya jinê dest pê dike. Zanyaran ev dîtiye, lê analîz nekirine û ev kêmasiyeke mezin e.

Di civakbûnê de pirsgirêkê çawa rûdaye. Ji bo vê, divê mirov dîrokê rast bixwîne ango rast pê dakeve û ev jî bingehê meseleyê ye. Teoriya Marksîst, di analîzên xwe yên dîrok û civakê de rûdana pirsgirêkê û nakokiya bingehîn weke nakokiya çînî qebûl dike. Li gorî vê, azadî û wekheviya civakî bi vê nakokiya çînî xira bûye, qonaxa pergala mêhtingerî û serdestiyê dest pê kiriye. Analîza civak û dîrokê ya li ser bingehê nakokiya çînî, gelekî hatiye rexnekirin û bêguman mirov dikare rexne bike. Lê, li gorî lêkolînên dîrokî, pir gelekî beriya nakokiya çînî, têkiliyeke mêhtingeriyê ya li dijî exlaqê azadiya civakê derketiye holê. Ev têkiliya mêhtingeriyê ya bi jinê re ye, yan jî mêhtingeriya cinsê jinê ye. Bi gotineke din, pergalek e, tepeserkirin an jî qirkirina jinê kiriye armanc. Wexta ku mirov vê dibêje, mirov giringiya nakokiya çînî kêm nake. Tenê bi vê, gotin û meqsed ev e; nakokiya çînî, ne nakokiya pêşî û ne nakokiya tenê ye.

Wexta ku em bi rûdana pirsgirêkê dakevin, tiştên ku me heta niha diyar kirine, dikarin ji bo destpêkê bibin hîm û bingeh. Bingehê rûdana pirsgirêkê li cem Marks cudabûna di warê çînî de ye. Lê ya rastî, rûdana pirsgirêkê li ser bingehê cudabûna cinsan pêk hatiye. Ango rûdana pirsgirêkê ne li ser bingehê çînîbûnê, li ser bingehê çandeke xwe disipêre cudabûna cinsan e. Pir berî cudabûna li ser bingehê cinsan, nakokî û cudabûnek li ser bingehê cinsan çêbûye. Civaka klan a komîn a pêşî ya li dora jinê çêbûyî û civaka mêr a nêçîrvan pevdiçin û pirsgirêk bi vî awayî rûdide. Rewşeke eşkere ye, lê di sosyolojiyê de vegotineke bi vî rengî nîne.

Di çarçoveya civakbûnê de ji bo rûdana pirsgirêkê were dîtin, divê mirov li pîvanên civakbûna azad binêre. Yanî nakokî di van pîvanan de çêbe, pirsgirêk rûdide. Ev jî, çawaniya heterojen û pîvana exlaqî-polîtîk e, ya ku xwe disipêre bingehê parastina mane û cihêrengiyan. Pîvana nirxan a derbarê wekhevî, dad û azadiyê de têkildarî vê ye. Ji ber ku pîvana exlaqî, wekhevîxwazî û dadperweriyê ferz dike. Karakterê polîtîk jî civakbûna xwedî çalakiyên azad û tevlîbûna azad e.

Pirsa ku divê em bikin ev e: Tevn an jî şaneyên civaka azad kengî û çawa xira bûn? Cins cuda ne, lê wekhev in. Jin hêmana bingehîn a civakbûnê ye. Civak li ser ked û nirxên jinê hatiye avakirin.

Ji ber ku berhemên jinê têne desteserkirin, pozîsyona wê ya kirde ya civakî, cudabûna wê û tevlîbûna wê, tê astengkirin. Desteserkirina berhemên jinê û mêhtingeriya cinsî, du aliyê xwe hene. Bi desteserkirina berhemên jinê, mêhtingeriya çandî pêk tê; ev mêhtingerî êrişî nasnameya jinê ya insanî, rola wê ya damezirîneriya civakê û hebûna wê dike. Jin xwedî cîhaneke pîroz e, yanî di cîhanekê de ye; cîhanek afirandî ye, ew tê de pîroz e. Jinê ji vê cîhana pîroz derdixe, li derveyî wê dihêle. Ha êriş bi vê dest pê dike. Paşê jin li derveyî civakbûnê tê hiştin û di qada têkiliyên cinsî (sexsualîte) de tê girtin. Ew têkiliyên cinsî yên jinê ku wê bi zarokanîn û civakbûnê payeberz û pîroz kiribûn, bi destê mêr, bûn zindana jinê. Bi vê, tevn û şaneyên civaka exlaqî-polîtîk û civakbûna azad piralî hatine tinekirin. Lewma eşkere ye ka divê em çi dersê ji dîroka civakî bigirin: Nakokiya bingehîn a dîroka civakî li ser bingehê dabeşbûna kar a mêr û jinan çêbûye; mêhtingeriya pêşî jî li ser jinê hatiye kirin.

Di klana dayikê de birayê dayikê weke xal cihê xwe xurt e. Îro jî li Kurdistanê xal û xaltî li hin herêman li pêş in, û nêzî malbatê ne, bi sedema vê xisleta civaka dayikê ye. Di vê dij-şoreşê de civaka klan a dayikê derbeke mezin dixwe. Hem nirxên pêşî û hem jî zarok ji dayikê têne girtin. Di encamê de jin weke kole tê xebitandin. Jin ji bo ber li vê bigire, piştî merasîma

bihevrebûnê ya pîroz mêr dikuje. Bi kurtî esasê vê meseleyê ev e: Jina ku dizane wê çi were serê wê, yar û evîndarê wê be jî bi çalakiya pîroz, wî dikuje. Ji bo ev felaket û bobelat bi serê wê de neyê, divê bikuje. Materyalîzma dîrokî ev e. Tişta ku herî bi feyde ya ku em ji Marksizmê bigirin, ev fikir e. Materyalîzma diyalektîk vê wisa rave dike.

Mêr, di dema civaka Sumeran de vê çalakiya jinê bi dawî dike. Bi kolekirina jinê, derbasbûna vê qonaxê temam dibe. Piştî derbasbûna ji vê qonaxê, ev rewş di destana afirandinê ya Babîlê Enûma Elîş de pir bi awayekî balkêş tê gotin. Yê naveroka van destanan kir rewş û hewayeke dînî, civaka Ibrî ye. Civaka Ibrî, rahiştiye destana Enûma Elîş û ew veguherandiye Tewratê. Veguherîna destanê di nava qebîleya Ibrî de hem maddî ye, hem jî manewî ye. Ji Tewratê hem Incîl, hem jî Quran derdikeve. Kes nikare berê xwe ji vê rastiyê bade. Encam, jinê dixin malê û tê de digirin. Pir pêkan e ku pareke mezin a Zerdeşt jî di vê de heye. Tişta ku pêk tê, fallokrasî[4] ye. Mêr organê xwe yê cinsî pîroz dike û dixe şûna Xwedê. Ev awa hê jî li Hindistanê heye, dibêje, "Ne tenê ez, organê min ê cinsî jî Xwedê ye, û divê tu jê re taetê bike." Û jixwe ev wisa ketiye kitêbê û di Tewratê de ev eşkere hatiye gotin.

Ya giring sîstema xwedawendiyê ye ku beriya vê serdemê pêk hatiye û bûye têgîn. Ji ber ku mesele dibe têgîn, ev meseleyê vediguherîne û dike dîn. Qonaxa paşê qonaxa mulkiyetê ye. Jixwe xistina jinê ya malê û tê de girtin, pirsgirêkeke mezin e, û îdeolojiyeke bi tehlûke ye. Jixwe di civakê de jî pirsgirêka esas ev e. Ev rê li ber çînîbûnê û dewletbûnê vedike. Jixwe mêr van hemûyan dike. Mêr 'şoreşa' arîstokratîk pêk tîne, 'şoreşa' bûrjûwayê pêk tîne, lê van hemûyan bi kolekirina jinê pêk tîne. Piştî ku mêr dibe dewlet, êdî ti hêz nîne ku karibe wî gem bike û rawestîne. Mohra mêr li ser dewletê heye û hêzeke bêsînor pênase dike.

Li Kurdistanê, yê bingehê azadiya jinê daniye Rêber Abdullah Ocalan e, ji bo rêz û hurmeta ji jinê re gotina wî ya "divê azadî pêşî bi fikirê dest pê bike" weke pîvana bingehîn a gavavêtina ewil hatiye diyarkirin. Di rewşa heyî de ji her aliyî ve dor li jinê hatiye girtin. Biçe cem kîjan mêrî bila here, wexta ku li ser bingehê zewacê destê xwe bide mêr û ji ber ku hesta milkiyetê pir bi hêz e, rewşa wekhevbûnê wê çênebe û jê dûr be. Jin di nava van têkiliyan de teqez wê ji mêr derbekê bixwe. Ji mêr veqete jî pirsgirêka ka ew ê çawa bi tena serê xwe bijî, derdikeve holê. Jina ku hîmê ekonomiyê danî, niha hewceyî nan e, çavên wê li destên mêr e. Wexta ku mêr nexebite, jin birçî dimîne. Lê ya rastî, ya hîmê ekonomiyê danî, jin e. Ekonomî peyveke Helenî ye, maneya xwe "yaseya malê-debara malê" ye, û ev bi xwe karê jinê ye. Di serdema nêz de têkiliya jinê bi ekonomiyê re hema bêje, nemaye. Em dikarin bibêjin, halê hazir di destê jinê de tiştekî bi navê ekonomiyê nemaye. Niha ekonomî bi awayekî mutleq di destê şirîketan û mêran de ye.

Gavavêtina ekonomiya bi serdestiya mêr, koka xwe li Rojava ye. Berê, di serdema navîn de heta di serdema destpêkê de têra xwe ekonomî di destê jinê de heye. Lê bi kapîtalîzmê re ev derfet û imkana wê ji holê radibe. Ekonomî dikeve destê şirîketan. Şirîketên pere û fînansê di bin yekdestdariya mêr de ne. Ti giranî û bandora jinê li ser pere û ekonomiyê namîne û bi temamî bi mêr ve tê girêdan. Navendên zanistê, tevahiya teknîkê û pere, hemû di destê mêr de ne.

Jin ketiye çi rewşê? Loma jê re gotine "bilbila di qefesê de dixwîne" yan jî "xemla mêr a li malê". Îro roj gewdeyê jinê ne tenê mijareke milkiyetê ye; di xizmeta kapîtalîzmê de, ji tayên porê serê wê heta bi neynûka lingê wê, çîp û hêtên wê, ruhê wê, dengê wê, tevahiya hebûna

4 Fallokrasî: Civak û desthilatdarî li dora sexsualîteya mêr (fallus-penîs) û serdestiya mêr teşe digire. Nîzama siyasî û civakî ya xwe disipêre sexsualîteya mêr fallokrasî ye.

wê ketiye ber milkbûnê. Li ser gewdeyê jinê reklamkarî tê kirin û ev bi rastî mijarek e, mirov li hemberî wê diricife, vedilîze. Divê jin li gewde û bedena xwe xwedî derkeve. Gewdeyê ku bi temamî mêr kontrol dike, gewdeyê jinê bi xwe ye. Tevahiya sînorên jinê, hema bêje her saeta wê, mêr diyar kiriye. Mêr pereyan nediyê, wê ji birçîna bimire.

Hewce nake ku em rewşê bêhtir li ber çavên hev du reş bikin. Rêber Abdullah Ocalan dibêje, "Sosyalîzm bi azadbûna jinê dibe". Lê ya rastî, ti şoreşgerê pêşeng ê sosyalîst, ne azadbûna jinê pêk aniye û ne jî li ser bingehekî azad bi jinê re têkiliyek daniye, heta teoriya vê jî çênekiriye. Heyf û mixabin e, zanista civakî heta îro bi vî awayî bû. Ji ber ku weke dîn jê re taet kirin û pêşengên wê jî weke pêxemberan dîtin, têkoşînên sosyalîst gelekî xisirîn. Bi tehlîl û analîzên niha têne kirin, hewldan heye, ev rewşa ku em işaret pê dikin, li dawiyê bimîne. Divê mirov li ser vî bingehî li Marks, Lenîn, Mao û Stalîn temaşe bike. Lenîn di vê mijarê de xwedî hewldaneke mezin e, em wî sûcdar nakin. Stalîn jinê dike milk, di malê de digire, nekuje jî ji kuştinê xirabtir dike. Rêber Abdullah Ocalan bi tehlîla xwe ya "Kuştina Mêr" bersiva van hemûyan daye; rast bi civaka dîrokî daketiye û bi vê jî gaveke giring avêtiye.

Yê jinê bikuje, qatil e, hov e. Ji kujerekî, ji hovekî sosyalîst çênabe. Pir giring e ku mirov xwedî îmkan û derfetên fikira azad be. Yek ji xisletên herî giring ên mirovan dike mirov, fikira azad e. Tişta ku jinê li ser piyan digire jî ev e. Heke fikira azad ji destê jinê biçe, jin wê biqede. Lewma ev gavavêtina nû, sosyalîzma nû, hebûna Kurd a nû, nasnameya Kurd a nû û azadiya Kurd wê li ser vî bingehî bi pêş bikeve.

Hem rexnegirtina li şaristaniyê, hem rexnegirtina li modernîteyê, hem jî rexnegirtina li koletiya jinê, di nava Tevgera Apoyî de gelekî bi pêş dikeve. Jixwe herî baş bi vî awayî mirov dikare bi kêra sosyalîzmê bê, û tiştekî lê zêde bike.

4-Sîstema Kastîk

Çawa ku tê zanîn, jiyana nêçîrvanên mêr a di nava xwe de rê li ber hin hewisînan û çandekê vekiriye. Nêçîrvanên mêr bi hev re wext derbas dikin, hevkariya hev dikin û ev dike ku bibin revdek ango di navbera wan de têkiliyên xurt çêdibin. Ha ev çanda nêçîrvaniyê ya mêr e ku di mêhtinkariya cins de rol lîstiye û jin tepeser kiriye, qir kiriye. Ev revde, bi hêza zend û bendan, bi zanîn û teknolojiya kuştinê, hîn bûye bi awayekî rêxistinî tevbigere û van hemûyan kiriye ku bi demê re bi hêz bibe. Bi êrişa mêr a li dijî jinê, qirkirina cins pêk hatiye. Jin ji warên pîroz hatiye derkirin û piştî ku mêr cinsê xwe pîroz kiriye; mêrê nêçîrvan hêza maddî û pîrozbûn gihandiye hev du. Vê jî kiriye ku revdeya mêran hem bi hêz û kujer bibe, hem jî pîroz bibe. Piştî ku ev hêza maddî û îdeolojîk digihîjin hev du, di dîrokê de cara pêşî pêkhateyeke nû çêdibe û ev pêkhate xwe ji civakê cihê dike. Ha em ji vê pêkhateyê re dibêjin, kujerê kastîk an jî pêkhateya kastîk.

Bi têgîna kastê ya em dixwazin bibêjin, "Hebûneke pîroz e, kes nikare xwe nêzî wê bike". Ji ber ku hem bi hêz e, hem jî kes nikare xwe nêzî wê bike. Ev pêkhateya kujerê kastîk ne tenê jinê dike mêhtingeh. Ji bo kujerê kastîk jin hedefa pêşî ye, qad û warê mêhtinkariya pêşî ye. Lê di nava komê de her ku diçe bi hêz dibe. Çawa ku li ser jinê mêhtinkariyê dike, dest pê dike komê jî dimije û mêhtinkariyê dike. Ji vî aliyî ve jin di warê mêhtinkariyê de dibe modelek. Û kujerê kastîk, her çi dixwaze bi civakê dide kirin. Kes nikare qudret û hêza wî bixe ber lêpirsînê.

Kast pêkhateyeke ji çînê bêhtir hişk e, tiştek tê re derbas nabe. Di têkiliyên çînî de kes dikare derbasî navê bibe yan jî dikare jê bibihure, lê sînorên sîstema kastîk hişk û şidiyayî ne, qebûl nake kes derbas bibe. Mirov tenê li mînaka wê ya li Hindistanê binêre, mirov ê cudahiya wê bibîne û nîşan bide. Bi demê re di nava sîstema kujerê kastîk de hin guhertin

çêbûne. Çi lêpirsînên fikirî-felsefî, çi jî mîna arîstokrasiyê pêkhatina modelên nû yên desthilatê yên polîtîk, veguherînek ferz kirine.

Sîstema kastîk hîmê xwe li ser têkilî-peywendiya du hêmanên sereke datîne: Hêza zorê ya berbiçav û îdeolojiya nêr a tê pîrozkirin. Di çarçoveya sîstemîk de li pişt her cure têkiliyên serdestî û mêhtinkariyê ev pêkhate heye. Xwebirêxistinkirina vê pêkhateyê heta bi beriya Girê Mirazan ve diçe. Eger pêkhateyeke kastîk nebûya mîmariyeke mîna ya li Girê Mirazan jî nedibû. Eşkere ye, ji bo mîmariya Girê Mirazan gelek mirov bi darê zorê hatine seferberkirin. Li pişt vê zorê, roleke giring a pîrozbûna afirandî, heye. Hema bêje, ev pir eşkere ye û xuya ye ku li cem vê zorê, pîroziyeke fizîkî hebûye. Mirov ji bo pîramîdên Misrê jî dikare heman tiştî bibêje. Em vê, weke sîstema kujerê kastîk pênase dikin.

Heta niha, gelek derdoran, jiyana neolîtîk weke pêşketineke şoreşgerî didîtin, wisa analîz û şirove dikirin, lê ya rastî, êdî bi awayekî zelal eşkere bûye ku sîstema jiyanê ya neolîtîk bi zora sîstema kastîk bi pêş ketiye. Di vê çarçoveyê de, em dikarin bibêjin, neolîtîkê derî vekiriye li sîstematîzebûna mêhtingeriya li ser jinê. Eşkere ye, dîrok li gorî Gordon Childe gotî, nemeşiyaye. Eger li dijî civakbûna li dorbera jinê, mêrê nêçîrvan û sîstema kastîk dij-şoreş nekirabûna, şoreşa neolîtîk a xwe sipart kedeke mezin a mirov, wê pêk nehatibûya. Me jî ev yek di dema xwe de nedît. Ya rastî, têra xwe eşkere ye, eger mirov bi riza dilê xwe kedê nedin û bi derekê ve ne girêdayî bin, nikarin şêweyekî wisa yê jiyanê pêk bînin. Di wî wextî de şert û merc hem ji bo jiyaneke azad û ji bo jiyaneke hêsan heta tu bibêjî guncav in ku mirov bi berhevkariyê û heta bi nêçîrvaniyê debara xwe bikin, hem jî bi berhevkirina pel û pincaran, bi çandin û bi çinînê, û heta bi nêçîrvaniyê, mirov bi awayekî azad û bêyî ku bikevin tengasiyê, dikarin bijîn. Ya rastî, hema wisa bi xwe ango bi riza dilê xwe û bi xwesteka xwe, mirov derbasî neolîtîkê nebûne.

Wexta ku mirov kom in, weke gerokan bi awayekî azad û wekhev virde wirde diçin, nişтecihbûna kolewarî ya li ser erdê êşkenceyeke mezin e. Jiyana girêdayî axê pir zehmet e. Eger zoreke mezin nebe, mirov xwe naxe koxikekê. Teqez hinekê bên, li mirov bidin û bixin wê koxikê. Cihekî mîna kampan tenê bi zorê dibe mirov lê bêne komkirin. Ha li vir, di warê cins de kar têne dabeşkirin û ev hêmana sereke ya sebebê ye. Ango di bingehê pirsgirêkan de dabeşkirina kar a li gorî cins heye. Ha bi vî awayî pirsgirêka civakî rûda ye.

Neolîtîk weke şoreşeke mezin tê pênaskirin û dibe ku di vê vegotinê de bandora çanda rojava hebe. Bandora ekonomî-polîtîka Ingilîz a li ser Marks jî jêdera wê heman çavkanî ye. Eger dîrok hûrûkûr were lêkolan û bi baldarî were xwendin wê têkiliya vê serdemê bi koletiyê re were dîtin. Lê esareta zêhnî ya çanda Rojava bi gelek vegotinên afirandî ber li vê girtiye.

Di destanên Sumeran de gelek vegotin hene dîrok bi wan dest pê dike. Ev metnên pêşî yên nivîskî ne. Gelek tiştan ji mirov re dibêjin. Kitêbên dînî yên yekxwedayî bi van tijî ne. Mînak bi tiştên weke “Tu yê wê çawa bixî malê û di wir de bigirî, rojane tu yê çend şîmaqan lê bidî, tu yê çawa lê bidî, tu yê çawa bişikînî...”. Îca li cem sosyalîstan, Marks jî di navê de, li cem wan vegotinek wisa tineye, mîna ku nakokiyeke bi vî rengî di dîrokê de çênebûye; ya rastî bi vî awayî tehlîlkirina dîrokê kêmasiyeke mezin e. Analîza dibêje, nakokiya dîrokî li ser bingehê cins çêbûye, li ser vî hîmî bûye du şeq û bi vê re pirsgirêka civakî rûdaye, di encama nêzîkatiya sosyolojiya dîrokî ya Rêber Abdullah Ocalan de ye.

Weke encam, **jêdera pirsgirêka civakî, têkoşîna çînî nîne, ew ne cihêbûna bajar-gund a bi derketina dewletê yan jî beriya dewletê dest pê kirî ye jî; gelekî beriya arîstokrasî û bûrjûwaziyê, bi newekheviya li ser bingehê cins û pevçûna ji vê newekheviyê, jêdera pirsgirêka civakî ye.** Em dikarin qala civakeke veguhêz a ji civaka dayikê derbasî civaka bi serdestiya mêr bikin. Di mîtolojiya Sumeran de eşkere qala vê civaka veguhêz tê kirin. Her weha di hersê dînên yekxwedayî de, di Hîndûîzmê de, di Konfuçyûstiyê de, heta di trajediyên

nîv-felsefe û nîv-dîn ên Yewnan de jî qala wê tê kirin. Mirov dikare jêder û derketina koletiyê di vir de bibîne û bisipêre vê derê. Li gorî hinekan şaristanî bi nivîsê dest pê dike. Erê, di bingehê nivîsê de ziman heye, di bingehê ziman de jî huner heye. Dibe ku nivîs ji aliyê mêr ve bi pêş ve hatibe birin, lê objeyên ziman ji aliyê jinê ve hatine çêkirin. Mêr, dema ku milkiyetê bi pêş ve dibe bêhtir pêdiviya xwe bi hêza teknîkê çêdibe. Li perestgehan jimartina koleyan, xwarina bidin wan, çend kole û wê bişînin kîjan deverê, ha gelek mijarên bi vî rengî yên teknîkî, pêdiviya bi nivîsê derdixin holê. Nivîs ne pîroz e, amûrek e; armanca xwe teknîkî ye, û bi mêhtinkariyê re bi pêş ketiye.

Cudahiya kastê ji çîn û dewletê ew e, otorîteyek e, ne kes dikare wê guftûgo bike û ne jî dikare bixe ber lêpirsînê. Eger mirov bala xwe bide ser kastên li Hindistanê, mirov ê bi hêsanî bibîne ku têkelî hev nabin; ji ber ku zêde hişk in, yek derbasî ya din jî nabe. Lê çîn wisa nîne. Mirov dikare ji çînekê derbasî çîneke din bibe, lê di kastê de mirov nikare qala rewşeke wisa bike. Ya rastî, kast bi xwe bingehê têgîna xwedê ye. Kengî awayê kastîk xwe cihê kir, gotina "Nabe tu Xwedê bixî ber lêpirsînê" derdikeve holê. Kengî mêr ji bo zewqa xwe ango ajoyên xwe têr bike û ji bo berhemên pîrekê desteser bike, jinê dike kole û kengî vê dike, teqez xwe dike hakim û serdest. Hingê koletî dibe bobelateke ku mirov berê ew hîç nas nakiriye û berê bi serê mirovatiyê de nehatiye; û di vê çarçoveyê de ev cara pêşiye lê diqewime. Bobelat û felaketeke wisa bi serê jinê de tê, ji qirkirinê xirabtir e. Ji vê şûn ve, gotinên weke "tu kêm î, ma bi te ketiye" wê ji jinê re bêne gotin, û jêdera van hemûyan xwecihêkirina awayê kastîk e. Ji pîrekê re tê gotin, "Tu kêm î, tu nikarî bipeyivî". Jixwe bipeyive jî kes guh nadiyê û qîmet nadiyê. Jin jî wê kelogirî bipeyive. Zimanê jinê yan jî zimanê pîrekê yê berê, zimanê xwedawendan bû, êdî zimanekî kêrnehatî, kêm û ne li ya wê ye. Ya ji vê jî xirabtir, her ku diçe jin di hunerê de dibe objeyeke cinsî, xeml û xêzê. Jin weke objeyeke nêçîrê tê dîtin. Roja me ya îro jî jin bi temamî objeyeke lîstikê ye, yan jî bi temamî kirine pêlîstok. Zimanê wê bi temamî bûye zimanê koleyan. Zimanê berê yê dayika xwedawend zimanekî sereke bû. Ma çawa çêdibe, dayika ziman afirandî bikeve rewşeke halo? Lê di bin koletiyê de ewçend pelçiqiye û xwe guvaştiye ser hev du, tenê di çarçoveya destûra mêr de dikare dengê xwe derxe.

Rewşa jinê ya îro çi ye? Roja me ya îro, bi giranî jin kirine objeyê zewq û sefaya mêr. Xelekek li bêvil, guh, stû û lingê wê xistine û ev xelekên koletiyê ne. Xelek hemû, beşek ji zincîra koletiyê ne. Ji ber ku bi hezarên salan e, bi vî awayî ye, asayî xuya dike. Kirine ku jin bi riza dilê xwe van xelek û xirxalan hilgire. Êdî jin bi giranî objeyeke cinsî ye. Ziman, reng, şêwe, çand û nasnameya wê hatiye tinekirin; li gorî objebûna wê ya cinsî ji nû ve hatiye hûnandin û edilandin. Li Ewrûpayê di pêvajoya serdema lîberal û serdema azadiyê de weke berhem objebûna jinê hatiye kûrkirin. Ekolên femînîst nikarîbûne vê dorgirtinê bişikînin. Tevî ku jin afirînera ekonomî, ziman û gelek pêdiviyên civakî ye, zimanê wê lihevgeriyayî ye, û di ekonomiyê de jî cihê wê nemaye hema bêje, cihê wê sifir e. Jixwe ne pêkan e ku mirov karibe qala pergaleke wê ya xweparastinê bike. Ev, encameke xerîb û meşa civaka dîrokî ye; bi awayekî vebirrî, ne encameke xwezayî ye. Koletî kirine bi rizadilî. Niha, ev rewş ji jinê re were gotin an jî jê were pirsîn, ew hemû wê vê koletiyê asayî bibînin û ew ê guh nedin ên ku berevajiyê wê bibêjin. Naxwazin zanibin û bifikirin ku rewş bi vî awayî ye. Jixwe, kujer hatiye jibîrkirin. Ew rojên azad ên jinê, berhemên xwedawendan di dema Înanna de mane.

Tevî van hemûyan, maneya wê ne ew e ku tehlîlên me berê derbarê Neolîtîkê de kiribûn, hemû şaş û xelet bûn. Serdema Neolîtîkê, pêvajoyeke şoreşgerî ye; veguherîna civakê bi lez kiriye. Wekheviya jin û mêran hê bi temamî ji holê ranebûye, cihê jinê yê di ekonomî û civakîbûnê de hê giring e. Di vê çarçoveyê de, em dikarin bibêjin; tehlîlên nû yên derbarê serdema Neolîtîk de, tehlîlên berê temam kirine.

Xulase, rewş û bingehê pêşî yê rûdana pirsgirêka civaka dîrokî; kolekirina jinê û mêhtingehkirina wê ye. Bi vê mêhtingehkirinê re, mirovatî ji çanda civakî ya jin-dayikê derbasî pergala desthilat a bi serdestiya mêr a xwe disipêre pêkhateya kujerê kastîk dibe ango hîmê vê derbasbûnê tê danîn. Ji vir û pê ve, pêvajoya civakîbûnê di şexsê jinê de serberjêr diçe. Di şexsê jinê de nirxên civakî hemû têne dejenerekirin, rizandin. Di çanda bi serdestiya mêr de mêr tê mezinkirin û bilindkirin; nirxên jinê û yên li dora wê çêbûne, têne desteserkirin. Xulase, mesele ev e. Ji bo ev heqîqet derkeve holê, jin xwe nêzî meseleyê nakin an jî hin ji wan bêzar dibin ku bi vê rastiyê re rûbirû bibin. Lê ya rast ew e, mirov ji zarokatiyê ve çanda bi serdestiya mêr bixe ber lêpirsînê û bi xeyalên xwe yên zarokatiyê re dilsoz bimîne.

Bingehê rûdana pirsgirêkê ev e. Kesek dikare gelek pirtûkan bixwîne, dikare bibe civaknasekî gelekî serwext jî. Lê belê rizgarbûna ji koletiyeke bi vî rengî bi gavavêtina azadiyê mumkin e. Ji bo vê jî divê daxwaz û arezûya mirov a seba azadiyê gelek be. Pîvana azadbûnê nirxê xwe heye û têkiliya vê pîvanê bi kapîtalîzm û sosyalîzmê re giring e. Heke tu dixwazî bibî antî-kapîtalîst divê tu vê pîvanê bixî hîmê xwe; heke tu bixwazî bibî sosyalîst divê tu vê pîvanê bikî esas û armanc. Naxwe wekî din mirov nikare bibe antî-kapîtalîst, nikare bibe sosyalîst. Heke tu dixwazî civakîbûna roja îro bibînî, divê tu rewşa jinê ya ku ew ajotine navê, bibînî. Ji ber ku di şexsê jinê de ya hatiye tinekirin, ya piçûk hatiye xistin û ya kirine obje, civak e. Ji lewra, jin civak bi xwe ye.

Beşa Sêyemîn

DI CIVAKA DÎROKÎ DE DUALÎTEYA DEWLET Û KOMÎNÊ

1-Kujerê Civakî yê Kastîk

Şerên çînî yên dîrokî ne dîrokî ne, dîroka şerên dewlet û komînê ne. Gelek danehev û agahiyên ketine ser hev du hene ku nîşan didin dîrok bi vî awayî ye û ev yek têra xwe manedar e. Teoriya şerê çînî, tevî teorî û pratîka xwe bi temamî bi bin ketiye. Sosyalîzma pêkhatî mînaka vê ya berbiçav e. Ji vî alî ve, komînarên ku di ber sosyalîzmê de têdikoşiyan xwîna wan hê li erdê ye. Lê lêgerîn jî hê didomin.

Cinawirê bi navê kapîtalîzmê di vê qonaxê de bindestên ku ji sedî nodê civakê ne, weke ‘ya avêtinê’ ragihandiye; wan weke gemarî bin, diavêje ser sergo, çopê û qedimgehê. Ev bi xwe pirsgirêkeke mezin e. Êdî mesele ne mêhtinkarî ye, yan jî zordarî ye; civakê dixe rewşeke li derveyî mirovatiyê, bi vê mirovatiyê diqedîne û tîne qonaxekê, wê tine dike. Yê ku ev kir, cinawirê bi navê kapîtalîzmê bû. Sosyalîzma pêkhatî ji bo ji vî cinawirî re bibêje ‘rawest e’, rê li krîzekê vekir û divê mirov bi awayekî rast ji vê krîzê derkeve. Jixwe tevahiya hewldana me jî ji bo wê yekê ye; em meseleyê tevî bingehên wê yên dîrokî analîz bikin û heqîqetê derxin holê.

Rûdana pirsgirêka bingehîn a xwezaya duyemîn wisa ye; li dora jin-dayikê civakek çêbûye, revdeyên kujer ên kastîk ên xwedî desthilata mêr, êrişî vê civakîbûnê dikin. Bi van êrişan re di dîrokê de civak dibe du şeq. Bi vê duşeqbûnê re civak bi pirsgirêkeke mezin re rûbirû dibe. Ev pirsgirêkeke mezin e, mirovatî dibe du şeq, tê serê duriyanekê. Du rê, du mil derketine holê. Yek ji wan ‘civakîbûneke’ xeternak e, kujerê kastîk ferz dike. Milê din jî berxwedana li ser bingehê komînê li dijî cinawirê kastîk e. Ji ber vê duşeqbûn an jî cihêbûnê,

tevahiya dîrokê, di navbera peyrewên komîn û kujerê kastîk de şerekî xeternak qewimiye. Vedîtin û daneyên arkeolojîk ên li Girê Mirazan ê warê Xerabreşkê dihêlin ku dîrok li ser vî bingehî careke din ji nû ve were nivîsandin.

Di çarçoveya pêşketina şaristaniyê de teza pirnavendan rast nîne. Delîl û îsbat hemû nîşan didin ku pêşketin ji yek navendê çêbûne. Vedîtinên li Girê Mirazan yê Xerabreşkê jî vê îsbat dikin. Vedîtinên li Girê Mirazan işaret bi rewş û hebûna şaristaniyekê dikin. Li vê derê, cureyê bi navê Homo Sapiens diberide û li ser rêka mirovbûnê di gelek qonaxên giring re derbas dibe. Cografyaya ku em qala wê dikin, beşekî giring ê vê erdnîgariyê ye. Rewşa li Girê Mirazan, nîşan dide ku koletiya orîjînal li vê derê derketiye holê. Mirov dikare bibêje, di vê qonaxê de mirovan qonaxa mirovxweriyê li pey xwe hiştiye. Di vê pêvajoyê de kolekirina mirovan, di serî de ya jin û zarokan, dest pê kiriye. Warê ku kast lê stewiyaye û xwe kiriye pergal, Girê Miraza ye. Kast pergalek e, di civakê de koletî û newekhevî li zemînê huqûqî hatiye erêkirin. Ha ev revdeya kastîk jêdera çîn, dewlet û bajar e.

Girê Mirazan çandeke perestgehê ya civaka kastîk e. Mînaka pêşî ya vê çandê li Girê Mirazan derketiye holê. Vê gavê li dora vir ji sedî zêdetir perestgeh hatine dîtin. Ev şaristaniyeke mezin e, li navbera salên 15000-8000'î ye. Em jê re dikarin bibêjin, 'Kujerê Kastîk ê Civakê'. Vî kujerê kastîk beriya her tiştî destdirêjiya jin û zarokan kir, lê destê xwe dirêjî her deverê kir heta destê wî gihiştiyê û mirovatiyê dikişîne nava koletiyeke hişk û req. Taristaneke koletiyê ya wisa afirandine; nikare guftûgo bike, nikare bipeyive, zimanê xwe nîne. Civakê di tariyê de dihêlin û bi vî awayî perestgehên xwe li ser wê lêdikin, ava dikin.

Kolekirina pêşî, xebitandina zarok û jinan, di suxreyên perestgehê de bikaranîna mêran, li vir pêk hatiye. Jêdera fikira kole-xwedî, dualîteya evd-xweda û teoriya afirîner, ev war e. Fikir û baweriya 'Xwediyê mutleq, efendiyê mutleq' karê vê kastê ye. 'Jin û zarok bêxwedî nabin' fikirek e, ji wê demê maye. Ji amûrên hilberandinê yên wê demê obsîdyen û kevirê heste di yekdestdariya vê kom û revdeyê de ye. Bi van amûrên kevirî li Girê Mirazan kevirên mezin ên tîk çêdikin. Revdeya nêçîrvanan afirînerê têgihiştina xweda-dîn-mîtolojiyê ye. Jêdera zêhniyeta evdîtî-xwedatiyê Girê Mirazan e. Rahibên Brahman û Sumeran dewama wan in. Divê mirov arîstokratên Aryen jî weke dewama wan bibîne. Revdeya kast-nêçîrvan di çarçoveya rêxistiniya civakî de dihêle mirov ji klanê derbasî qebîleyê bibin, ji koçeriyê derbasî jiyana dêmanî bibin. Ya li Girê Mirazan a Xirabreşkê diqewime, dij-şoreşa revdeya kasta nêçîrvan e.

Revdeya kastîk pêvajoyê ji mirovxweriyê derbasî koletiyê dike û bi vî awayî pergala Girê Mirazan a Xerabreşkê pêk tîne. Difikire ku li şûna kuştinê, weke kole bikaranîn bêhtir sûdewar e. Tevî vê, ji bo serweriya xwe ya li ser kedê mayînde bike, têgîn û têgihiştina 'pîroz' çêdike. Êdî çîna kastîk dibe xwedî xisleta 'pîroz' û wisa tê dîtin. Bi vî awayî di warê têkiliya evd û xwedê de gava pêşî ya ciddî tê avêtin. Carl Schmitt îddîa dike ku polîtîka dewama teolojiyê ye û ji teolojiyê derketiye. Lê ya rastî, seyr û meşa di dîrokê de berevajiyê vê ye. Nexasim vedîtinên li Girê Mirazan vê yekê îsbat dikin. Kast ji mîtolojî û xwedayan re meydanê vedike û ev bi temamî bi sedemên polîtîk in. Hêman û zimanê wê demê yê polîtîka meşandinê jî mîtolojî ye.

Ji bo mirov stûnên kevirî yên bi tîpa 'T' yên mezin ên mîna li Girê Mirazan çêke, wan di weznekê de tîk deyne, avahiyeke mîmarî pêk bîne, hewcedarî bi organîzasyoneke mezin heye. Li vir, em dikarin qala karkeriya kevirên mezin bikin. Kevirên bi tîpa 'T' weke stûnan bi awayekî çember-xelek danîne û ev ji kanên keviran ên dorberê anîne. Ji bo şikildana van keviran, ji bo bicihkirina wan, hewcedarî bi xebitandina gelek mirovan heye. Ev kevirên bi şiklê 'T' yên monolîtîk, yekker, şeş metro bilind û giraniya wan li dorbera bîst tonî, ji bo bêne çêkirin, pêdivî bi plansaziyeke demdirêj û helbet hakimiyeta li ser kar heye, naxwe wekî din

ne pêkan e. Tew, mirov derfetên teknîkî yên wê demê li ber çavan bigire, mirov ê rewşê çêtir fêhm bike.

Li ser vî bingehî, mirov dikare bibêje, pêkhateya kastîk di warê sazîbûnê de xwe li ser bingehê zorê organîze kiriye. Heye ku revdeya nêçîrvanan a mêran, veguherîbe kasteke zordaran û ev organîzasyon bi rê ve biribe. Eşkere ye, ev koma ku Girê Mirazan ava kiriye, evçend mirov di nava pergalekê de xebitandine û avahiyên lêkirine bikaranîne, ne komeke ji adetê ye. Bi her halî, resim û fîgurên li ser stûnên kevirî yên bi tîpa 'T' maneyek û armanceke wan heye. Dibe ku hêmanên kastê pîroz dikin li ser keviran hatibin xêzkirin û niqirandin. Ev fîgur, remz û nîşan in ku pê kast tê pîrozkirin û mezinkirin. Di hin fîguran de mirovên kemerbest xuya dikin û ev yek, bala mirov dikişîne ser xwe. Tevahiya dane û vedîtin nîşan didin ku vê sîstemê xwe li dijî civakîbûna klanê ya li dora jin-dayikê, bi gurçûpêç kiriye. Bi qasî ku xuya dike, civak li ser bingehê dewlet, çîn û şaristaniyê li vir bi gewde bûye. Ev avahiya bi şiklê perestgehê hatiye avakirin, navendek e, tê de kast hatiye pîrozkirin û pergala civaka serdest hatiye dîzaynkirin.

Pîramîtên Misrê, perestgehên mezin ên tijî raz û hê mirov li wan serwext nebûne, qebrên qral-xwedayan û mînakên li Ewrasyayê jî bi heman rengî ne. Hîmên van perestgehan li ser koletiya mutleq a mirovan bilind bûne. Jixwe, arkeolojiyê li dorber û li ber serê van perestgehan gelek hestiyên mirovan peyde kirine. Xuya ye ku hestiyên li dorberê yên qurbankiriyan in. Jixwe tê zanîn, pîramîd bi keda koleyan hatine çêkirin. Zordariyeke bi vî awayî, tenê dibe ku karê kujerê kastîk be.

Di vê qonaxa tarî ya dîrokê de mirovxwerî ji bo kujerê kastîk şêweyekî pirbelav ê debar û ekonomiyê ye. Yek ji rastiyên ku kaşifên Spanyol li cem Aztekan P.Z. di salên 1500'î de lê rast hatibûn, ev bû. Mirovxwerî weke rêûresmekê heta wê rojê tê. Eşkere bûye ku salê heta bîst hezar mirov kirine qurban. Di dîroka mirovatiyê de, hem jî di perestgehên pîrozkirî de qonaxeke bi vî awayî heye. Ev despotiyek welê ye, xwe li ser her tiştî teqez serdest dibîne. Wateya wê ew e ku xwe dike Xwedê. Kujerê kastîk xwe pîroz dike. Kujerê kastîk êdî li astekê ye; kes nikare xwe bigihîniyê, kes nikare destê xwe pê bike û kes nikare li ber rabe. Roja me ya îro jî li Hindistanê sîstema kastê hê domdar e. Di vî warî de li Lubnanê ji Fenîkiyan şop mane, dîsa li Asya û Endonezyayê jî nîşan hene. Ev kujerê kastîk ê civakê li dijî mirovatiyê derbeke mezin e.

Sîddargha Gaûtama (Bûdha) wexta ku dibêje, "Dema ku xencer di pişta te de, te gerdûn, dunya û malbat wisa xweş pîroz kiriye, şirove û xeyal kirine, lê ti qîmeta van nîne. Tenê tiştek heye tu bikî, xencera di pişta xwe de derxî." Ya rastî, bi van gotinên xwe Bûdha tesbîteke gelekî rast û di cih de kiriye. Lê Bûdha ne di wê rewşê de bû sosyolojiya vê bikira. Ji bo sosyolojî bihata rohnîkirin, pêwîst bû ku duşeqkirina civakê ya ji aliyê kujerê kastîk ve tesbît bikira. Heta ji bo analîza dîroka civakî, pêwîst bû ku sosyalîzmê bi kujerê kastîk ê civakî dest bi pênasekirina xwe bikira. Lê tiştekî pir xweş û bêhempa ye ku Bûdha bal kişandiye ser vê yekê. Divê mirov, vê bike pîvana bingehîn a sosyalîzmê jî. Divê sosyalîzm, beriya her tiştî destê xwe bide ser rastiya civaka kastîk, wê rohnî bike û bi bermahiyên wê re şer bike. Çawa ku em ê di dema bê de nîşan bidin, di qonaxa dawî de kujerê kastîk kapîtalîzma heyî bi xwe ye.

2-Heta Kujerê Kastîk Neyê Fêhmkirin Sosyolojî Çênabe

Mêrê di nava revdeya nêçîrvanan de hingî heywanan dikuje, talî dibe kujer û qatilek. Li dora jin-dayikê klan çêbûye, ew êrişî vê klanê dike ango nirxên li dora jin-dayikê çêbûne dike armanc û êriş dike û heta mirovan dike nêçîr û bi vê debara xwe dike. Bi demê re dibîne, li şûna mirovxweriyê bike, mirovan bi kar bîne bêhtir li feydeya wî ye, lewma jinê weke

objeyeke cinsî bi kar tîne û ji bo civakîbûna xwe jî bidomîne zarokan dike kole. Li gorî wî, êdî li şûna kuştinê, bikaranîna jin û zarokan bêhtir bikêrhatî ye. Ji ber ku mirovên dikuje, berhevkarên baş in, hoste ne, xweş xaniyan û perestgehan lêdikin, pir baş dizanin genim û ceh biçînin. Çawa ku li şûna heywanan zû serjê bikin, dotina wan û xwedîkirina çêlikên wan, kêrhatîtir dîtin, bi heman awayî kolekirina jin û zarokan ji kuştina wan bêhtir kêrhatî dîtin. Ha kolekirina jinê heta wan deman diçe. Heta mirov li wê demê jî serwext nebe, kolekirina jinê wê neyê fêhmkirin. Lewma gavavêtina Neolîtîkê ango gavavêtina jiyana dêmanî û bi pergal weke hinek yeqîn dikin û dibêjin, çênebûye. Gavavêtina Neolîtîkê bi ti awayî bi xwestek û rizadilî nebûye. Her weha gotinên derbarê belavbûna neolîtîkê de jî rast nînin. Çawa ku tê gotin, “erd bi bereket bûn, lewma jiyaneke dewlemend û bi deman derket holê, mirovan bi riza dilê xwe jiyaneke hilberîner hilbijart”. Axir, ev awa pênasekirin û tesbît rast nînin. Gavavêtina Neolîtîkê bi temamî bi darê zorê û zordariyê bûye. Ji ber êrişa koleker a kastê û ji ber ku wê şiddet bi awayekî karîger bi kar anî, cureyê mirov derbasî qonaxa Neolîtîk bû. Komên berhevkar û nêçîrvan pir di demeke kin de dikarîbûn pêdiviyên xwe yên xwarinê ji xwezayê tedarik bikin. Ji bo xwe xwedî bikin, gelek pel û pincar, gelek qût û zad hebûn. Bi awayekî azad tevdigeriyan. Nexweşiyên di jiyana dêmanî de tinebûn. Gelek wextê wan ê vala hebû. Hem di dema gavavêtina neolîtîk de, hem para bêhtir di dema belavbûna wê de zor û zordarî xwedî rol û rist bûn û ev encama belavbûna pergala kastîk bi xwe bû. Lewma ne rast e ku mirov bibêje, bi riza dilê xwe, bi sedema bereket û hatina zêde, mirov derbasî jiyana dêmanî û çandiniyê bûne, na xêr, bi darê zorê gav avêtine. Jixwe, pêwîst e ku mirov jêder û esasê meseleya qurbankirina mirovan di vê de bibîne.

Eşkere ye, şiroveya sosyolojîk a vê meseleyê bi vî awayî ye. Jixwe ne bi awayekî sîstemîk û qels be jî, hin zanyaran bi vî rengî şirove kirine û divê mirov malavahiya wan bike. Yanî, çawa ku Bûdha jî diyar kiribû, heta mirov xencera li pişta mirov hatiye xistin nebîne, ne pêkan e ku mirov bi awayekî rast û durist li dîroka civakî serwext bibe.

Li hemberî pratîka bi hijmet û bi saw a kujerê kastîk, di serî de jin, tevahiya civakê bizdiyaye û şaşomaşo bûye. Ji kole heta bi proleter û gundiyên roja me ya îro, ev rewşa bi hijmet, bi saw û matmayî hê jî xuya dike. Ji ber ku cezayê liberrabûna serdestiya kujerê kastîk yekser di cihê cih de kuştin bû. Kujerê kastîk mîna nêçîra çivîkan bike, nêçîra mirovên klanan dike, tişta ku bixwe, texsîr nake dixwe, ya mayî jî dike kole. Jinên dike kole, hem heywanan didoşin, hem jî pel û pincaran berhev dikin. Ya din jî mêr xwe li ser serê jinê dike mîr û nîr. Têgînên weke “mêr” û “mêranî-bavikanî” wisa derdikevin holê. Roja me ya îro jî dilsoziya mutleq a bi mêr re hê jî esas e. Pîreka xwe ji girêdana bi mêr hinekî rizgarkirî hema yekser tê kuştin. Cinayet û kuştinên jinan ên roja me ya îro jî ji ber zêhniyeta bermahî ya kujerê kastîk e. Ev cinawirî ta ji wê rojê ve tê.

Revdeya nêçîrê ya mêran, mirovxweriyeke wisa li dijî cureyê xwe dike, li cem heywanan jî tineye. Dibin yekîneyên taybet û xwînrij. Dikevin her kiras û dirûvî. Roja me ya îro, hin yekîne xet û xêzên seyr li rûyên xwe çêdikin. Ev hemû, ji kujerê kastîk mane. Di dema Osmaniyan de “Yekîneya Dînan” heye, kincên seyr li xwe dikin. Komeke kastîk e, gelekî taybet e, û dorbera xwe dibizdîne, bi saw û bi xof e. Wexta ku ev yekîne li Ewrûpayê xuya dike, her kes ji tirsa diricife, diqutife. Li cem Îtaliyan biwêjeke navdar heye dibêjin, ‘mamma mia’ ango ‘Wa diya minê!’ ango yadê wa hatin. Şopên bi vî rengî yên revdeya kastîk hene û ta ji kûrahiya dîrokê tên. Roja me ya îro jî mafya, çete û kontrayên ku ji bilî kuştinê li tiştekî nafikirin û karûbarê wan kuştin e, bermahiyên kujerê kastîk ên li kolanan in.

Roja me ya îro, mîrateya kujerê kastîk bi dehşeta bombeyeke atomê dikare mirovatiyê tine bike. Ma ev hemû normal in? Çawa ku Bûdha gotî, wexta ku xencer di pişta mirovatiyê de çikandî be, mirov dikare çi guftûgo bike û li ser çi bipeyive? Heta ku ev kujerê kastîk neyê

fêhmkirin, bela xwe ji avakirina sosyalîzmê vekin, mirov nikare sosyolojiyê bike, mirov nikare qala exlaq û heta dîn bike. Li naverastê kujerê kastîk heye û heta ku ev kujer ji hev neyê derxistin, zanist jî nabe.

Bêguman şaş e ku mirov dîrokê bi derketina holê ya nivîsê bide destpêkirin. Ji ber ku beriya nivîsê jî mirov û jiyana wî ya civakî, rastiya civaka dîrokî heye. Di vê çarçoveyê de em dikarin bibêjin, beriya nivîsê û piştî wê jî dîrok e. Xala ku em bi israr dixwazin balê bikişînin serê, ev e, di pêşketina civaka dîrokî de qonaxa destpêkê ya rûdana pirsgirêka civakê çi ye û kîjan xusûs e. Di dîroka sîstema dewletdar-desthilatdar de rûdana pirsgirêka civakê weke destpêk derketina kujerê kastîk e. Divê mirov dîroka sîstema mêrê serdest, dewletdar-desthilatdar bi kujerê kastîk bide destpêkirin û ev divê hem jêdera sereke ya sosyolojiyê be, hem jî ya sosyalîzma bi wê ve girêdayî be. Heta, divê bingehê zanistên civakî be. Derketina holê ya kujerê kastîk di pêşketina civakî de şikestina pêşî ya mezin e. Bi vê re, civaka dayikê şikesteke mezin dixwe. Belkî jî di dîrokê de dij-şoreşa herî mezin e. Eger mirov bipirse, piştî derketina holê ya kujerê kastîk 'dîrok çi ye', divê mirov wisa bersivê bide: Kujerê kastîk civakê dike du şeq û qelşê lê dixe, civakê dixe bin pergaleke koletiyê ya mezin; bi vê, hem mudaxeleyî sîstema fikirê ya civakê dike hem jî mudaxeleyî jiyana wê ya pratîk dike û li hemberî vê berxwedaneke civaka dîrokî ya li ser bingehê komînê heye. Dîrok ha ev e.

Pir giring e ku mirov bi vî awayî bi dîrokê dakeve, ji ber ku çi bobelat bi serê kedkaran, azadîxwazan û bindestan de hatibe, ji vê revdeya kastîk hatiye. Erê, brûsk li mirovan dide, dikuje. Çiyayên volkanîk diteqin, mirov di bin lehiya agirê wê de dimînin, dimirin. Erd diheje, mirov dimirin. Baran nebare, dibe hişkesalî û xela, mirov dimirin. Ji nexweşî û şewbê mirov dimirin. Ev bûyer hemû ji ber xwezaya yekemîn diqewimin û gefê li mirovan dixwin. Ji bo mirov van bûyeran fêhm bikin û bandora wan a neyînî li ser jiyana civakê kêm bikin, dikarin fizîk, kîmya û biyolojiyê bi pêş bixin. Zanist bi biyolojî, kîmya û fizîkê dikare zanibe ka fizîka mirov çawa ye, çawa bêhnê dike, çawa dibîne, dilê wî çawa hildiavêje, organên wî yê cinsî çawa ne û hestiyên wî bi çi awayî ne, û heta bi awayekî dikare beşekî bi psîkolojiyê lêkole û qala wî bike. Di vê mijarê de pir zêde pirsgirêk çênabin. Lê dema ku mesele dibe sosyolojî, divê mirov bi awayekî pir cuda bi meseleyan dakeve.

Em hewl didin "pirsgirêka civakî" yan jî rûdana pirsgirêka xwezaya duyemîn rohnî bikin. Pirsgirêka bingehîn bi kujerê kastîk derketiye holê û dest pê kiriye. Bi gotina Bûdha, ji bilî vê nabe ku mirov bi tişktekî din re mijûl bibe. Ji ber ku xencer bi awayekî wisa li pişta mirov xistiye, yekser wî dike kole. Lewma pirsgirêka herî mezin ev e. Jina ku derxistiye holê, teqez kole ye. Paşê harem bi cariyeyan hatine tijîkirin. Ev bi temamî rewşeke tirsnak, bi saw û bi xof e. Di rewşeke wisa de saxmayîna koleyan mûcîze ye, ji ber ku berê ew dixwarin ango mirovxwerî dikirin.

Cureyê mirov li hemberî şêr û pilingan parastineke xwe çêkiriye. Ji bo nexweşiyan gelek bijîşk û dermançêker gihîştine. Li hemberî van hemûyan, mirovan karîbûye xwe biparêzin û bimînin. Ji vê jî wêdetir, mirov dikarin di nava sînorên mirovî de êriş û pirsgirêkên bi vî rengî qebûl bikin an jî serî bi wan re derxînin. Lê tenê tiştek heye serî pê re nayê derxistin û nayê qebûlkirin, ew jî kirina kujerê kastîk e.

Bermahiyên kujerê kastîk vê nîşan didin. Serdema qala wê tê kirin, serdemek e; bi kêmanî şeş hezar salan pêk hatiye. Revdeya nêçîrvanên mêr, pir berê li Efrîkayê dest pê kiriye, paşê jî weke sîstema kujerê kastîk li tevahiya dunyayê belav bûye û mohra xwe lêdaye. Qonaxa wî ya dawî kapîtalîzm û dewleta wî ya netewe ye. Heta niha zanist û felsefeyan hemûyan, ev awa pênasekirin qebûl nekirine. Ji ber ku zanist-agahî, li cem hêzê cihê xwe digire. Ji ber ku zanist di bin fermana despot û kujerê kastîk de ye, kes nikare tiştekî jê re bibêje. Hêza xwe nîne gotineke bi tenê bibêje. Mirov dikare vê meseleyê bibe heta bi rahibên

ku nûnerî û qasidiya kujerê kastîk dikirin. Rahibên Sumer û Misiriyan di bin fermana qral-xweda û Firewnan de bûn. Firewn hewcedarî wan bû, ew hewcedarî Firewn bûn. Nemrûd ew li ser piyan digirtin, wan Nemrûd û wisa dijiyan.

3-Êrişa Kujerê Kastîk û Xistina Jinê ya nava Malê û Girtina Wê ya li nava Malê

Xistin û girtina malê ya jinê bi tesfiyekirina komînê re têkildar e. Kujerê kastîk, xwe xweda-qral ragihandiye, li dijî civaka dayikê dest bi şer kiriye, perestgeha xwedawendê veguherandiye 'musaqattînê' yanî kerxaneyê. Komîna jin-dayikê li ber kujerê kastîk radibe, li ber xwe dide, lê rêûresma Zerdeştî û Brahimî, jinê ji komînî qut dikin û dixin mala taybet, ango malê. Ev mesele di nava qebîleya Ibrî de gelekî balkêş e. Di Tewratê de gelek pênasekirin hene, jinê piçûk dixînin. Kujerê kastîk jinê dike kole, arîstokrasî jî jinê dixe haremê û di wir de digire. Harem karê arîstokrasiyê ye, jinê dike cêrî. Şensekî din ê jinê nîne; Yan cêrî ye, yan jî kole ye. Jin bi tena serê xwe nikare li hemberî van li ber xwe bide. Hypatia[5] li ber xwe dide, lê nikare xwe ji lînc û recimandinê rizgar bike.

Yên ku bi îdeolojî û dîroka jinê re eleqedar dibin, divê bi van meseleyan dakevin. Ji bo dîrokeke rast û durist, divê rastiya jina komînê were eşkerekirin. Baş e, wê ev yek çawa pêk bê, wê jina komînê çawa çêbe? Hemin divê jin kirasê "jinkokiyê", mêr jî kirasê "mêr, mêrtî, zilamtî û bavtiyê" ji xwe bikin û biavêjin. Heke ev bibe, wê ba û bahozeke mezin a şoreşgerî rabe. Zarok milkê kesî nînin û divê ev awayê xwedîderketina li zarokan were terikandin. Zarok ên komînê ne. Platon di kitêba xwe ya bi navê 'Dewletê' de bi vê meseleyê dadikeve. Zarokên ji keç û xortên herî baş çêdibin ji bo dewletê digihînin. Hemin Hîtler jî ev mesele ceriband, lê rêbaz û armanca wî şaş bû. Zewaca li ser bingehê milkiyetê ango milkkirinê nabe û çare tesfiyekirina wê ye.

Jin bi xwe, bi cewherê xwe ne milk e, hebûneke azad e. Lê jin niha bi vê rewşa xwe milk e. Li gorî civakê yan keça hinekan e, yan jî pîreka hinekan e. Jin nikare vî kirasî ji xwe bike, wexta ku hewl bide ji xwe bike, wê navê wê bikin 'jina xirab'. Keçek hatibe çaxê zewacê û nezewicî be, jê re dibêjin, di mal de maye. Diya wê xemgîn dibe, li ber xwe dikeve û dibêje, "me nekarî serê wê girê bidin", "Kesî ew nexwest." Ax û wax dikin, tepika li xwe dixin û dibêjin, "belangazê wê niha çi bike, mêrê wê tineye, wê kî wê xwedî bike?" Ji vê jî xirabtir, bi xirabî wê qala wê were kirin û ew ê weke fahîşeyan were dîtin.

Eşkere ye ku îdeolojiya bavikan rê li felaket û bobelatê vedike. Diyardeyên weke têkiliyên cinsî, zarok û bav bi temamî nayên înkarkirin. Lê jin û mêrên ku hêvî dikin, kurekî wan hebe, hejmara wan ne kêm e. Gelek mêrên psîkopat û nexweş hene, dibêjin; "Heke kurekî min çênebe, ez ne mêr im." Antî-komînalîzm, dij-komintî ev e. Bi dêtî û bavtiyeke wisa komîn hatiye kuştin. Roja me ya îro, gelek malbat hene ji bo zarokan bûne cinawir û mînakê vê ne kêm in. Her kes dibîne, malbat çi tînin serê zarokan. Ev hemû bermahiyên kujerê kastîk in ku heta roja me ya îro hatine.

Rastiya komînê cuda ye. Hêza pêşeng a civaka komîn, jin e. Civaka xwedawend-dayikê civaka pêşî ye. Xisleta bingehîn a mirov ew e, hebûneke civakî ye. Civakîbûn, bi komînbûnê bi pêş dikeve, ango bi rewşa zêhnî ve têkildar e. Di civakîbûnê de rûdana pirsgirêkê, bingehê xwe cinsperestî ye. Revdeya nêçîrvanan a mêran an jî komika serdest a mêran, klana navend xwedawend-dayik duşeqî kir û ev jî bû destpêka rûdana pirsgirêka civakê. Li aliyekî hêzên serdest ên xwe disipêrin bajar, çîn û dewletê hene, li aliyekî din jî li derveyî bajaran, li

5 Têbîniya wergêr: Fîlozof, matematîkvan û astronoma yewnan a li Skenderiyê (teqrîben ji 355 ta 415'an jiyaye) bû. Wê li dibistana Neoplatonî ya Skenderiyê ders didan xirîstiyan û paganan. Komeke weke cerdê ya xirîstiyanan, sala 415'an êrişî wê kir û bi awayekî hovane ew qetl kir.

çolteran, li daristanan, li çolan kesên zilm li wan tê kirin hene, ew jî ew in; komîn, klan û qebîleyên azad in, li ber xwe didin.

Ya giring mirov komînê bi pêş bixe û wexta ku mirov roja me ya îro vê bike, divê li ser bingehê rastiya wê ya dîrokî pê dakeve. Eşkere ye ku xebateke bi vî rengî wê bi qasî 'Welatê Rojê' (La città del Sole) hêja be. Divê mirov pêşengiya dayikê ya di serdemên berê de îro li gorî demê pêk bîne. Mînak li Rojava gundekî komîn ê bi navê Jinwar hatiye avakirin. Ev Jinwar çi ye û naveroka xwe çi ye? Jinên ketine tengasiyê, ji zilma mêr, ji heqaretên wî bêzar bûne, dixwazin bêhna xwe bidin, êdî naxwazin bibin amûrên çîrokên mêrtiyê, li vî warî kom bûne. Ji ber ku gelek jin hene, mêr zilm û heqaretê li wan dikin. Li malê cihek nîne jin lê bêhna xwe bide. Çiqas jinên bi tenê ne, ji mêr veqetiyane, heqaret li wan hatiye kirin, yên nexweş û hwd. hebin divê mirov wan bike komîn. Di vê mijarê de pêdivî bi helwesteke radîkal heye.

Li ser vî bingehî, em dikarin bibêjin, divê komînên bêne avakirin di çarçoveya rastiya wan a dîrokî de bi rastiya roja îro re yekpare were dîtin. Di dema avakirina komînê de divê jin mîna serdema klanê weke hêmaneke damezirîner a civakê were qebûlkirin. Di nava komînê de divê rola jinê sereke be. Di vê çarçoveyê de, heke em li ser babeta avakirina komînê ya roja me ya îro bisekinin, em ê vê bibêjin: Mirov komînê bi hêza xwe ava dike, lewma divê mirov projeyan çêke. Ji bo çêkirina komînê, hewce nake ku mirov komikên pispor ji derve bîne. Hewce ye ku civak were perwerdekirin, di serî de keçik divê ji heft salî ve zarok hemû bêne perwerdekirin. Bi perwerdeya komînê, jin û mêr wê ji çembera 'mirina reş, dozên namûsê...' xilas bibin. Di warê zêhnî û rûhî de wê xwe gurçûpêç bikin û bibin kesayetên komînê. Hingê jinê bibe jina komînê, ne jina malbatê. Mêr jî wê bibe mêrê wekhev ê komînê. Her ku komîn wisa biçe, malbat jî wê bibe ya komînê. Bi vî awayî rêxistiniyeke têra xwe dike û bi hêza xwe radibe, wê çê bibe.

Kesê/a sosyalîst komînal e, komînalîst e. Karê wî/wê yê pêşî birêxistinkirina komînê ye. Ji ber ku civakîbûn bi xwe komîn e. Lewma divê di her warî de mînak di qada spor, perwerde, çand, jîngeh, warê civakî, ekonomî, huner û warên din de komîn bêne çêkirin. Her tişt, her gav, her polîtîka divê di mîhwera komînê de bê kirin; ji ber ku komîn paradîgma bingehîn e, û fikira esas e. Ji bo vê jî hewcedarî bi daneheveke ciddî, hêza fikirî, felsefe û etîkê heye. Ji bo vê babetê, pêdivî bi sê pîvanên bingehîn ên helwestî heye: Demokrasî, azadî û sosyalîstbûn. Komîn tenê bi vî awayî pêkan e ku çêbe û bi pêş bikeve.

Ji bo komînê, tora têkiliyên federatîf ên xwe disipêrin xwerêveberiyê, hewce dikin. Komîn bêdemokrasî nabe. Demokratîkbûna wê, ji xwerêvebirina wê tê. Demokrasiya komînê sosyalîzm e, neteweya demokratîk jî neteweya sosyalîst e. Ji bo ku xelk bibe civaka neteweyî, divê di rastiyê de bibe neteweya demokratîk. Têgîna dîktatoriya proleteryayê, bi pirsgirêk e. Ji ber ku dîktatorî bi xwe zor e. Li vir, cudabûneke radîkal tê kirin. Dewrgirtina rêveberiyê nayê maneya demokrasiyê. Komîna ku were avakirin, divê demokratîk be, ango divê karibe xwe bi xwe bi rê ve bibe.

Desthilatdarî-dewlet û rêveberî cuda ne. Heta ku ev neyê fêhmkirin, tehlîla sosyalîzma pêkhatî jî wê rast neyê kirin. Sosyalîzma pêkhatî çareyê di 'fetihkirina desthilatê' de dibîne. Anarşîst bi dijwarî li ber vê radibin. Anarşîst li dijî desthilat û dewleta mutleq in. Lê di dawiya dawî de ev herdu ekol jî bi bin ketine. Ji ber ku desthilat a mêran e. Rastiyeke dewletê heye, ya mêran e. Têgîna otorîteyê jî ehwen-î şer e ango ji du xiraban xiraba baş e, yan jî ya mirov dikare xwe lê ragire ye. Çi mêr û çi jin, her du dikarin bibin otorîte. Lê ya herî rast, têgîna 'rêveberiyê-xwerêveberî' ye. Ev têgîn tevî ku notr e, bêhtir zanistî ye. Têgîna rêveberiyê di têkiliyên bi civakê re bêhtir pozîtîv e. Mirov civakê li ser bingehê desthilat an jî dewletê tehlîl bike, ev yek wê bike ku mirov şaşiyê bike. Di demokrasiya komînê de bêguman wê ji bo

‘rêveberiyê’ pîvan hebe. Lê ev pîvan wê ti carî neyê maneya desthilatdariyê. Rêveberî, pêşengiyê dike. Di cîhana nebatan de jî mînakên rêveberiyê hene. Şaneya ku tevahî zindî jê çêdibin, heye. Mînak atoma hîdrojenê atoma rêveber e. Elementên din, hejmarên ji wê ne. Civak jî wisa ne. Çêlik bi rêveberiya dayikê yan jî ya makê, mezin dibin. Zimanê mirov, amûrê rêveberiyê ye û bi vî awayî ji dayik dibe. Dema ku dewlet û desthilat çêdibin, hêza rêveberiyê ya jinê tine dibe. Maka nirxan jin, dibe dûvikê mêr. Lê ya rastî, rêveberî bi şaneya kok re têkildar e. Komîn xwedî demokrasî û disîplîneke navxweyî ye. Di nava komînê de ku her kes wekhev e, yên bi xizmet û tecrûbeya xwe derdikevin pêş hene. Di nava komînê de şef û sekreterya tinene.

Komîn ne tenê rêveberî ye jî. Komîn rêxistiniyek e, bi qasî ku pirsgirêkan çareser bike, her weha şêweyekî enerjî û jiyanê ye.

Komîn weke matrûşkayê ye. Mînak meclîseke bajêr komîna giştî ya wê derê ye. Li jêr, ango ber bi jêr ve dibe ku komînên deh kesî jî hebin. Li bajarekî wisa pêkan e ku bi hezaran komîn bêne avakirin; ev ji bo jiyana komîn û rêxistiniyê lazim e.

Komîn têgîneke hilberîner e. Tevî îdeolojiya wê, divê ekonomiya wê jî hebe. Komîn seraya ekonomiyê ye. Her komîn divê warên wê yên hilberîn-bikaranînê hebin.

Zêhniyeta komînê neteweya demokratîk e. Şaneya bedena neteweya demokratîk, komîn e. Di nava vê de millet, cins û tebeqeyên cuda dikarin cih bigirin. Cudahiyên civakî di yaseyên yekîtiya komînal de têne naskirin. Komîn ne malbatperestî, ne jî dewletperestî ye. Komîna Civaka Demokratîk, komîna komînan e.

Ji komîna klan heta bi komînên roja me ya îro, komîn hemû mîhwerjin in, yanî mîhwera wan jin in. Civakên ku jinê ava kirine, hemû komînal in. Jin ji civaka klan a pêşî ve di warê komînbûnê de serketî ne. Lewma divê roja me ya îro jî komîn bi giranî bi jinê were çêkirin û bipêşxistin. Divê her kes fêhm bike ku jina azad bêyî komîn nabe. Nirxa jiyanê ya bivênevê, komîn e. Ya jinê bike jîn û bike ku bijî, jiyana komînal e. Cewherê vê jiyanê jî li Zagrosan heye. Sîstema xwedawend Înannayê, Xwedawend Mayê ye. Mirov bi avakirina bêhejmar komînên jiyana azad, dikare bîranîn û xeyalên bi hezaran şehîdî pêk bîne, bi gewde bike.

Ji ber ku niha civak bêyî komîn e, bûye arode û bêkar. Mêr bêyî rêxistin in, û ji çayxaneyan dernakevin. Lê ya rastî, mirov “çendîn bi rêxistin be, ewçendî xwedî hebûn e”. Mirov ne bi rêxistin be, ji mîhwera rêxistinbûnê derkeve, wê demê pirsgirêka mirov a manûnemanê çêdibe. Civakên ku pirsgirêka wan a hebûnê yan jî manûnemanê tinebe, ew civakên xwerêxistinkirî ne. Tişta ku diyardeya Kurd temam bike, rêxistinî ye. Ji bo vê jî pêdivî bi veguherîneke mezin heye. Em ê li dîroka xwe ya komînê xwedî derkevin û wê modernîze bikin.

4-Ji Klanê heta bi Komînê Berxwedana Bindestan

Xusûseke din heye, divê were zelalkirin û ew jî têkiliya komîn-civakê ye. Berî duşeqbûna komîn û dewletê, civaka klan hebû ku em jê re dibêjin ‘civaka dayikê’. Civaka Dayikê di sîh hezar salên dawî de gelekî bi pêş ve çûye û bi pêş ketiye. Civaka klanê li cografya û çandên cuda dibe ku bi awayên cuda hatibe binavkirin, lê awayê pêkhatin û naveroka wê ya civakê, her heman tişt e. Klan ji 20-30 kesan pêk tê, li dora dayikê dicive, di warê civakî de têra xwe hestyar û berpirsiyar e, û di berhevkariyê de gelekî jêhatî ye. Bi pel û pincaran xwe xwedî dike, nêçîra heywanên hûr dike û hêkan berhev dike.

Serdemeke bi vî rengî di dîrokê de demeke dirêj pêk hatiye û hê jî pêk tê. Ev civaka dayikê ye. Dayik zarokan tîne û wan xwedî dike. Di civaka dayikê de zarokên keç û kur hene,

xal û xaltîkên zarokan hene, û eger nemiribe, pîrika wan heye. Û paşê telş li vê civakê dikeve û dibe duşeq. Kujerê kastîk, xalê di nava civaka dayikê de dikuje, yên din jî dixwe, mirovxweriyê dike. Piştre li şûna wan bixwe, xebitandina wan bêhtir bikêrhatî dibîne û wan dike kole. Ji bo koleyên nû bizê û wan bixebitîne, jinê dike kole. Di vê serdemê de hê têgîna bav an jî mêrê malê çênebûye. Hê malbat saz nebûye. Di serî de ji bo kujerê kastîk, hê têgînên weke mêrê malê, hevjîn, malbat û wekî wan çênebûne û jixwe zêhniyeteke wisa ya kujerê kastîk tineye. Kujerê kastîk, wan li cem xwe digire, ne ku wan weke malbat dibîne, ji bo wan weke kole bixebitîne li cem xwe wan dihêle. Zêhniyeta koledariyê, jiyana koletiyê divê wisa be. Çanda li qûntara çiyayên Zagrosê, bi Zerdeşt re malbatê çêdike, Brahîm jî malbata pîroz çêdike. Têgîna malbatê li ser bingehê dînên yekxwdayî çêdibe û nexasim dibe yek ji xisletên bingehîn ê Tewratê.

Li vir, xusûsa ku divê em balê bikişînin ser duşeqbûna civaka klanê ye. Tişta ku bi serê jinê de hatiye, koletiya mutleq e. Yên dixwazin ji koletiyê jî rizgar bibin, derdikevin serê çiyan û dibin qebîle. Di dîrokê de dema wê jî diyar e; li cîwarê girê Mirazan a Xirabreşkê li dorbera 10000 sal B.Z. duşeqbûna mezin pêk hatiye û vê, derî li şaristaniyekê vekiriye. Ji bo ev bibe jî avhewa û şertûmerc têra xwe guncav in. Bermahiyên dîrokî û vedîtinên arkeolojîk vê piştrast dikin.

Tê gotin, qebîle li dorbera 12000 sal B.Z. derketine holê û ev rast e. Ya rastî, qebîle komîn e. Wexta ku kujerê kastîk ber bi dewletbûnê ve diçe, qebîleyên komînal jî xwe vedikişînin cîwarên ewle û hewl didin xwe biparêzin. Ev tê wê maneyê, li wan cîwaran civakeke pir cuda pêk tê, û bi pêş dikeve.

Em xwe şaş nekin, hê bi maneya ku em îro pê dizanin, çîneke civakî tineye. Jixwe ji nava klanê çîn dernakeve. Ji koleyan re jî mirov nikare bibêje, ew çînek in. Nakokiya bingehîn di navbera kast û komînê de ye. Tişta ku em jê re dibêjin çîn, ji arîstokrasiyê dest pê dike û heta roja me ya îro dewam dike. Çîna civakî bi awayekî esasî, kasta bêmaske û bêrûpoş e. Kast navê mirovxweriya bimaske ye. Çîn jî ew rewşa nû ya kastê ye ku maskeya xwe derdixe; kirasekî bi xeml û xêz li xwe dike. Koma kastîk bi gund an jî bi cotkariyê di encama çînîbûnê de vediguhere arîstokrasiyê û çînîbûna wê ya li bajêr jî vediguhere bûrjûwaziyê. Sumer gavên pêşî yê vê yekê diavêjin, lê li bajar-dewletên Atînayê bûrjûwazî bi pêş dikeve û Atîna dibe modela herî îdeal a bajêr. Koma kast, arîstokrasî û bûrjûwa ji wan hêmanên bingehîn in ku em hewl didin wan analîz bikin.

Kast li Girê Mirazan ê Xirabreşkê derket holê, paşê awayê wê yê siyasî û dewletî bû arîstokrasî û dawiya dawî, pêşî li deverên weke Attîka, Kartaca û Girîtê bi pêş ket, piştî Ronesansê bû bûrjûwaziya bazirgan a ku li Rojava dunyayê bû desthilatdar.

Di destê kastê de çanda obsîdyen û kevirê çeqmaqî (heste) hebû, lê di destê arîstokrasiyê de teknîka misê zer (bronz) ya ji paxir (sifir) û qilê hebû û bi van erebeyên şer ên bi tekerik, rim, bivir, mertal, tîr û kevan bi awayekî pêşketî çêkirin û li çar aliyê cîhanê belav bûn. Erebeyên şer û sîlehên ji misê zer di dema xwe de weke tankan in. Bûrjûwaziyê jî bi zanist û teknîkê sîstema kapîtalîst saz kir.

Tevî ku rastî bi vî awayî ye, mixabin Marks şaşî kir û dîrok bi şerê çînî da destpêkirin. Tişta ku jê re karker tê gotin jî ya rastî kole ye. Baş e, vî koleyî ti şoreş kirine? Na xêr, nekirine. Marks dixwaze şoreşekê diyarî vî koleyî bike. Fikiriye ku wê 'çîna karker hişyar bibe, hejmara xwe zêde bibe û wê şoreşê bike.' Lê şoreşeke wisa pêk nehatiye. Yên şoreş kirin, piraniya wan zarokên malbatên bûrjûwaziyê bûn. Marks kurê parêzerekî bû, Lenîn jî ji malbateke nîv-bûjrwazî bû, Mao jî wisa bû. Yanî em bibêjin, çîna karker xwe bi rêxistin kiriye û şoreş kiriye, na xêr, şoreşeke tenê ya bi vî rengî nîne. Ev utopya ye, fikireke xeyalî ye û rastiya wê tineye. Hem di serdema pêşî de û hem jî di serdema navîn de pir zêde komên koleyan hene. Di

destpêkê de jî jin û zarokên kole hene, lê mirov nikare ji wan re bibêje çîn in. Ev weke dûvik û dewama kujerê kastîk ê mêr in. Ew, ew kole ne yên ku objeyên cinsî û organên kujerê kastîk in; suxreyên wî dikin. Perestgehan ava dikin, hildiberînin. Bihêlin ku heqekî wan hebe, jiyana wan jî di destê efendiyê wan de ye. Li Misirê Firewnan bi qasî zikê koleyan bixebite xurek didan wan. Karekî bi tenê yê koleyan hebû, ew jî bîstûçar saetên rojê xebat bû.

Baş e, çîn tinebû çi hebû? Komînên ku li dijî sîstema kujerê kastîk li ber xwe didan, hebûn. Mirov nikare ji qebîleyê re bibêje çîn e, qebîle komîn e. Komîn bi kurdî "kombûn" e. "Kombûn" jî tê maneya civîn, civatê. Gund hê jî weke "kom" têne binavkirin. "Kombûn" di warê etîmolojîk de peyvek e, civîna xweparastin û bergiriyê pênase dike.

Li vir, bûyereke giring pêk tê. Civaka klan şeq dibe, civaka kujerê kastîk jê derdikeve. Di dewama vê pêşveçûn û seyrê de ji kujerê kastîk jî şaristaniyeke dewletdar pêk tê û em dikarin vê qonaxê weke dîroka nivîskî pênase bikin. Nivîskarên bûrjûwaziyê, bajarbûnê dikin bingehê teza xwe û ji vê re dibêjin şaristanî, lê ya rastî, şaristanî dêmanîbûna kujerê kastîk e.

Tişta ku jê re şaristanî tê gotin; lêkirina perestgehên mezin e, û li dora wan çêbûna ekonomî, ziman, nivîs, huner, ehram û yên weke wan in. Yanî, bajarê kujerê kastîk û li dora vî bajarî civaka wî ya kole ye. Tevahî endamên perestgehên Sumeran koleyên karker in. Rahib li perestgehê li qatê jor cihekî çêdike û wir dike cihê xwedê. Ya rastî, yê ku rahib jê re dibêje, xwedê, serekkujêrê kastîk e. Ew li jêra wî ye û bi rola pêxember radibe. Li qatê jor xwedê, li qatê navîn rahib û li qatê jêr ê zîggûratê jî di mezel û odeyan de têra wan kole hebûn. Kole erx û cihokên avê vedikin, genim diçînin. Di encamê de ekonomiyek çêdibe. Heke li civaka Sumeran a ku em dibêjin, dîroka nivîskî ye, rast were kolan, wê were dîtin ku ji serî heta binî bi vî awayî ye.

Baş e, ji bilî van koleyan civakeke din heye? Erê, heye. Di Destana Gilgamêş de qala civaka 'kovî'[6] tê kirin. Devera ku bûyerên destanê lê diqewimin, bajarê Ûrûkê ye. Li Zagrosan, ji Dîcle û Zêyê wêdetir, qala hin qebîleyan tê kirin û weke 'kovî' têne pênasekirin. Pêşengekî van qebîleyan an jî pîrekî wan ê bi navê Hûmbaba heye. Enkîdo Qral Gilgamêş razî dike û dixwaze vî pêşeng û pîrî bikuje. Yanî em di dîrokê de Enkîdo weke bêbext û xayînê pêşî dibînin. Kolekirina kesên li deştê temam kirine û berê xwe dane çiyê; dixwazin wan jî bikin kole. Ev şerê pêşî ye ku tê zanîn, ya rastî nakokiya pêşî ye ku di destanan de cih girtiye. Tişta ku tê gotin şerê çînî ye, ev dualîte bi xwe ye. Vê dualîteyê, cara pêşî li ser van erdan dest pê kiriye. Delîl hene ka çawa çêbûye û çawa dewam kiriye.

Ya seyr ew e, ev bûyer li civaka proto-Kurdan qewimiye, yên ku îro navê wan ji nava dîrokê hatiye birin û welatê wan ji aliyê endamên civaka wan bi xwe ve tê înkarkirin. Ev nakokiyeke ecêb û xerîb e ku divê mirov hûrûkûr û bi baldarî serê xwe li serê biêşîne.

5-Qebîle Rêxistineke Parastinê ye

Bermahî nîşan didin ku sîstema kujerê kastîk demeke dirêj di dîrokê de xuya ye, û şopên wê li her devera dunyayê derdikevin holê. Ser van bermahiyan jî bi tebeqeyeke stûr a axê hatiye girtin. Ji ber ku tiştekî ciddî qewimiye, bi vî awayî ser hatiye girtin. Vê sîstemê bi kêmanî şeş hezar salan dewam kiriye. Yanî destpêka wê, pêşketina wê û dawiya wê heye.

Bi pêkhatin û pêşketina sîstema kujerê kastîk, ma ji mirovahiyê tiştek maye? Ya giring jî ev e. Dualîteya rastî, dîroka rastî û şerê rastî bi vî awayî dest pê dike. Sîstema kastîk xwe bi rêxistin dike, xwe ava dike, xwe gurçûpêç dike û pir zehmet e ku mirov xwe li ber rabigire. Baş e, hingê klanên li dora jinê çêdibin, çi dikin? Eşkere ye ku wê nikaribin li deşt û berriyê xwe biparêzin, bergiriya xwe bikin, lewma derdikevin serê çiyan û baniyan, warê kes hê

6 Têbîniya wergêr: Hov û kovî -muhtemel e ku ji kohhovî bûbe kovî- îro jî ji wan navan in ku şaristaniyên navendî yên desthilatê li wan civakan dikin ên ku li dijî wan li ber xwe didin.

neçûyê. Vedikişin dever û warên ji bo bergiriyê guncav, û li dijî kujerê kastîk hin rêbaz û amûrên xweparastinê çêdikin. Lê ya ji hemûyan giringtir, li serê çiyayên asê yên şop pê neketî, qebîleyên xwe çêdikin. Ji ber vê yekê, divê mirov qebîleyan li ser bingehên wan ên çêbûnê, weke rêxistinên parastin û bergiriyê bibîne. Pêkhateyên etnîsîte, qebîle û eşîran bi awayekî esasî li dijî êrişên koledariyê, pêkhate û yekîneyên bingehîn ên berxwedanê ne. Yekîneyên pêşî yên siyasî ne; di heman demê de yekîneyên xweparastinê yê klanê ne; girêdayî jiyana azad in, û parêzvanên azadiyê ne. Îdeolojiya wan jî li ser bingehê xweparastinê ye.

Qebîle rêxistineke parastin û bergiriyê ye. Tevî ku ev şop û xisletên kûr ên civaka qebîle li cem me hene jî nedîtina me ya van xisletan, em tenê dikarin bi çavkoriyê rave bikin. Tu yê hewl bidî evçend civakê fêhm bikî, lê tu yê nebînî ku qebîle rêxistineke parastin û bergiriyê ye!

Lêkolînên etnolojîk nîşan didin ku rêxistiniya qebîleyê beriya her tiştî rêxistiniyeke parastinê ye. Hîmê vê jî li vê cografyayê hatiye danîn. Ev rastî hem di kitêbên pîroz de hem jî di dîrokê de cih digire. Hîmê wê li Hilala Bibereket, ango li Mezopotamyaya Jor û Navîn hatiye danîn. Sumerî, Asûrî û Yewnanî navan li vê deverê dikin. Ji ber ku afirînerên şaristaniyên mezin in; ew navan li deveran dikin.

Asûrî nûnerên dawî yê kujerê kastîk in. Tiştên ku li qesrên Asûran hatine kirin û bermahiyên li Nînovê xeternak, bi saw û xof in. Ew kesên pêşî ne, ji serê mirovan kelhan ava dikin. Ji qralê Ûrûkê Gilgamêş vir ve, kesên dikirin nêçîr, qebîleyên Naîrî bûn ku ew jî qebîleyên Botanê bûn ango proto-Kurd bûn. Naîrî konfederasyonek bûn: Konfederasyona qebîleyên Botanê. Bi vê konfederasyonê, bi sed salan li hemberî êrişên Asûran li ber xwe didin. Med jî li hemberî Asûran bi qasî sêsed salan li ber xwe didin. Jixwe, êdî her kes qebûl dike ku Med konfederasyon bûn. Dîsa Dewleta Ûrartû ya navenda wê Wan bû, bi qasî sêsed salan li dijî Asûran şer dike. Li dijî êrişên kujerên kastîk ên Asûran weke qebîle hatina cem hev bi temamî awayekî bergiriyê yê numûne yê Kurdan e. Ji vê jî ya giringtir ew e; sala 612'an B.Z. li Nînovê, Medan derba dawî û kujer li Asûran da. Yên ku şerê li vir kirin û meşandin konfederasyonên qebîleyan konfederasyona Naîrî û konfederasyona Medan bûn. Mînakeke mezin a xweparastinê ye. Ev sîstema xweparastinê bi awayê qebîleyan heta sedsala 20'an hatiye. Seyîd Riza û Şêx Seîd jî parastin û bergiriya xwe li ser vî bingehî kirine. Ev hemû rastiyên eşkere û berbiçav in. Ji ber ku me dîroka xwe rast şirove nekir, me nedît ka ev çiqasî sîstematîk e, û ev jî pirsgirêk e.

Me weke Kurd xwe bi xwe got, "Çima li cem me jî çîna karkeran tineye, ev rewşa me paşvemayîneke mezin e. Çima bûrjûwaziya me tineye û ev jî paşvemayîneke mezin e." Lê ya rastî, ji roja ku ev kujerê kastîk çêbûye û vir ve, em bi awayê parastinê yê qebîleyan li ser xwe mane û hê jî Kurdbûn bi saya qebîleyan li ser xwe ye. Dema ku tu wekî Kurd dadikevî berriyê tu dibî Ereb, dibî Samî, dema ku ber bi bakur ve diçî tu dikevî taristanê. Tenê awayekî li ser xwe mayînê heye, ew jî bi awayekî serketî pêkanîna parastina qebîleyê ye. Jixwe vî awayî pêk tînin jî.

Şervanên qebîleyên Hûrriyan bêhempa ne, têra xwe bi tecrûbe û ezmûn in. Ji bo Enkî leqeba, "Xwedayê xasûk ê Sumeran" tê bikaranîn. Ev awa pênasekirin ji bo serdestekî despot e, û ev rast e. Xasûkî û fêlbazî xisleta sereke ya Enkî ye. Di yek ji nivîsên belgeyî de qala "roviyê xasûk ê Hûrriyan" tê kirin. Ev jî tê wê maneyê, Hûrrî têra xwe xasûk bûne û lewma di belgeyên nivîskî de cih girtine. Qebîleyên Kurdan hemû li hemberî Aqad, Babîl û Asûran ku hemû hêmanên kujerê kastîk in, awayê berxwedan û têkoşînê yê qebîleyê bi pêş dixin. Li ber xwe didin û şer dikin, ji neçarî Hûrrî weke rovî dibin xasûk û fêlbaz. Çawa ku tê zanîn, rovî bi hêsanî nabe nêçîr û bi rêbazên gelekî xasûk xwe li jiyanê dihêle. Ev jî xisleteke Hûrriyan bûye.

Kurtûkurmancî, em dikarin bibêjin, li dijî kujerê kastîk xweparastina li ser bingehê etnîk û qebîleyan heye û ev jî ji bo civakeke mîna me, weke rastiyeke bingehîn derdikeve holê.

6-Di Warê Çînî de Rexnekirina Marksîzmê

Me got, “Dîrok ne dîroka şerê çînî ye, ya komîn û dewletê ye.” Divê ku em vê jî bikin pîvana bingehîn a sosyalîzmê. Beriya her tiştî, divê sosyalîzm bi rastiya civakî ya kastîk dakeve, meseleya wê rohnî bike û bi bermahiyên wê re şer bike. Ma ne, em dibînin, kapîtalîzma heyî, qonaxa dawî ya kujerê kastîk e. Bihêlin kapîtalîzm ekonomiyeke bi bereket, têkilî û hêzên hilberînê bi pêş bixe, dunyayeke wisa çêkiriye, ji bo mirovan têgîna “yê avêtinê û bermahî” bi kar tîne. Em eşkere bibêjin, civak ne tenê di tehlûkeyê de ye yan jî gef lê tê xwarin, hatiye qedandin. Jixwe hinek fîlozof û ehlê hikmetê jî tesbîta “mirina mirovatiyê” dikin. Di serî de M. Foucault, hin fikirdar ji tesbîtên weke “mirina xwedê” wêdetir diçin û di çarçoveya pabendiya meseleya xwedê-mirov de tesbîta “mirina mirov” dikin û radigihînin. Li gorî Foucault mirov bi kapîtalîzmê re miriye. Bêguman tesbîteke têra xwe giring e. Heke sosyalîzmê were nûkirin divê di çarçoveya vê têgînê de were nûkirin. Ji bo jinûvevejîna mirov divê civaka antî-kapîtalîst çêbe ku navê vê jixwe sosyalîzm e, û divê bersiva pirsên “wê çawa were avakirin?” li ber rohniya heqîqeta dîrokî were dayîn.

Marks kapîtalîzmê weke diyardeyeke zanistî destnîşan dike û dibêje, pêkan e ku mirov wê bi awayekî zanistî lêbikole. Erê rast e, kapîtalîzmê xirab nîşan dide, gelek sifet û rengên cinawiriyê pê ve dike, lê di encamê de wê li ser xeta dîrokê weke serdemeke pêş destnîşan dike. Kapîtalîzmê li gorî dema wê weke ya li pêş û ji bo derbasbûna sosyalîzmê jî weke qonaxeke hewce ya civakî dibîne. Lewma divê mirov di vir de rexneyeke hûrûkûr bike û ji vê xwe qut bike. Jixwe, sosyalîzma pêkhatî jî xwe ji vê meseleyê qut kir. Bi pratîka xwe gihişt wê yekê ku sosyalîzmeke wisa nabe sosyalîzm. Divê em ji bîr nekin ku teşxîsa şaş, ti nexweşî rizgar nake. Mûcîze jî bibe, di teşxîsa şaş de nexweş wê bimire; ji ber ku teşxîs şaş e. Teşxîsa Marks a di warê civakî de şaş e. Divê Marks li şûna pirtûka Kapîtalê, pirtûk li ser civaka kujerê kastîk binivîsanda. Divê navê wê jî ne Kapîtal, weke me gotî danîbûya, hingê wî yê encamên cuda bi dest xistibûna û sosyalîzma tesewirkirî jî wê cuda bûbûya. Wê demê dunya jî wê dunyayeke bi vî rengî nebûya.

Ji bo materyalîzma dîrokî dibêje, “dîrok dîroka şerê çînan e.” Lê li naverastê civakeke kujerê kastîk heye. Ya rastî, divê mirov di vê babetê de Marks sûcdar neke, ji ber ku di wê demê de weke roja me ya îro hê arkeolojî tinebû. Marks li gorî daneyên zanistî tevdigere û ev rêbaz kiriye bingehê lêkolînên xwe. Lewma mirov dikare bibêje, Marks li ser bingehê daneyên dema xwe, sosyolojiyeke kêm û teng kiriye. Bi pirtûka xwe ya Kapîtalê dixwaze gav biavêje, lê nabe serî. Bi ser nakeve. Ji ber ku derbarê dewleta netewe de pir zêde tiştek negotiye. Bêguman, nabe ku mirov ji niyeta wî ya qenc bikeve şikê, lê ji ber ku rastiya koletiyê hûrûkûr nehatiye fêhmkirin û li dawiyê nehatiye hiştin, sosyalîzma ku wî bingehê wê daniye, mixabin bi ser neketiye. Çawa ku jinên di civaka klan-qebîleyê de hatin kolekirin û tenê weke obje xistin xizmeta sîstemê, ya Marks kirî jî bi kêra sermayeyê hat. Di vê çarçoveyê de ‘Das Kapital’ bi kêra sermayeyê hat. ‘Kapîtal’ bi rastî jî bû kapîtal hem jî li ser utopyaya kominîzmê ya Marks. Sosyalîzma pêkhatî jî bû ekolek ku kapîtalîzm tevahiya sedsalekê li ser piyan hişt.

Li cem Marks, dîktatoriyeke proleteryayê mîna ya bûrjûwaziyê heye. Lenîn jî xwe bi vê ‘dewleta sosyalîst’ digire û li cem Stanlîn jî tam pratîka wê bi gewde dibe. Lenîn û Mao nikarin demokrasiyê bi pêş bixin û bi ser nakevin. Li Çînê, Deng Chiao Pîng dewleteke kapîtalîst a temam ava dike. Stalîn jî bi heman awayî kapîtalîzmeke dewletê ya temam ava kir û lewma demokrasî rûyê royê nabîne.

Marks 1858'an nameyan ji Ferdînand Lassalle û Engels re dişîne û di wan nameyan de dibêje, ew dixwaze hin pirtûkan binivîsîne û navê wan wisa rêz dike: 1- Sermaye 2- Milkiyeta erdê 3- Keda bi heqdest 4- Dewlet 5- Bazirganiya navneteweyî 6- Bazara cîhanê.

Ji van şeş pirtûkan yek **Das Kapital** e. Cilda yekê ya pirtûka yekê dikare 1867'an biqedîne. Ev pirtûkên ku Marks fikirî wan binivîse, rêzecildên du û sisiyan jî Engels amade dike. Jixwe ji bo cildên mayî Marks hîç dema wî çênebû û bihêlin ji bo vê dema wî çêbibe, nekarî pêşnûmeyên wan jî amade bike. Vê jî sosyalîzm û Marksîzm bi qusûr û kêm kiriye. Çimkî pirtûkên li gorî vê plansaziyê wê bihatina nivîsandin û kulliyat temam bikirina, nehatin nivîsandin. Bi vî awayî gelek analîz û tehlîlên ku bi qasî manûnemanê giring, nehatin kirin. Marks di saxiya xwe de nikare van pirtûkan temam bike. Lenîn, Dewlet û Şoreş nivîsandiye, lê nikarîbûye ji navê derkeve. Timî xwe bi xwe gotiye, "kendal û her kendal". Jixwe ew kendala ku timî qala wê kiriye, 1922'yan bûye dawiya Lenîn bi xwe. Mao jî gotiye "şoreşa çandê", û bawer kiriye ku wê bi vî awayî bi ser bixe. Encam bûye 'şoreşa' kapîtalîst a Deng Chiao Pîng.

Ya rastî, tehlîl û analîzkirina 'kastîk' hem li cem Platon hem jî li cem Marks heye. Lê tam giraniya xwe nedane serê. Ne ku bi temamî ji bîr kirine, ji ber ku bi temamî lê serwext nebûne û li gorî wê analîzeke dîrokî, siyasî û sosyolojîk a ciddî nekirine.

Di pirtûkên din de jixwe pir zêde qala civaka dîrokî nayê kirin. Mirov vê jî têra xwe fêhm dike, ji ber ku wexta qala civaka dîrokî bikin wê di neynikê de rastiya xwe bibînin. Zanist di xizmeta hêzê, qesran, serdestan û desthilatdaran de ye. Mirov ji zanisteke bi vî awayî nikare li benda xêrê be. Wan zanyar kiriye koleyê mutleq û serdest bi saya xizmeta wî li ser piyan dimîne. Ji serdema pêşî heya roja me ya îro, zanist di xizmeta hêzê de ye. Hêz zanistê, zanist jî hêzê derdixe holê. Wexta ku rastî bi vî awayî be, akademî jî mîna ku tiştekî wisa tineye tek gotin û peyvekê nake. Heke bike jî pê danakeve yan jî mîna agahiyeke di nava kevanê de qala wê dike. Lê çawa ku me eşkere kir, rastî pir cuda ye. Di dîroka civakî de serdemek heye tê de mirovxweriyeke mezin heye. Li Ûrfayê dîrokeke 15 hezar salan heye, ya ku li ser gelek girên li wan mirovxwerî pêk hatiye, xwe nîşan dide.

Di dema Marks de agahiyeke bi vî rengî derbarê mirovatiyê de tinebû. Ji ber ku arkeolojî di vê astê de hê bi pêş neketiye. Marks paşê pirtûkên Morgan dixwîne, li civaka Ûris dikole, dibêje, "Qebîleyên prîmîtîf dikarin ji sosyalîzmê re bibin bingeh." Ya rastî, Marks di taliya temenê xwe de li hin kêmasî û şaşiyên xwe hayil dibe û dixwaze wan sererast bike. Gelek reşnivîsên wî û têbîniyên wî hene. Piştî Komîna Parîsê hûrûkûr bi peyva komînê dadikeve, hem jî peyva komîn û dewletê ji hev du cihê dike. Heta dawiya temenê xwe bi xwebexşiyeke mezin dixebite. Tişta ku em jî li vir dikin, divê weke dijberiya Marks neyê şirovekirin. Berevajî em hewl didin Marksîzmê ji nû ve bi ruh û gewde bikin. Ji ber ku ew endamekî şerê mezin ê komînalîzmê ye, em vê dikin.

Li gorî heqîqeta ku rastiyên civakî dîrokî derxistine holê; dîrok xwe nasipêre şerê çînî, xwe disipêre şerê kujerê kastîk ê civakê û komînên parêzvan. Lewma me ji civaka xwe, ji pêşiyên Kurdan mînak dan. Hê jî têra xwe bermahiyên berxwedana xweparastinê ya li dijî kujerê kastîk û dewletê hene û mane.

7-Serdema Arîstokratîk

Vere Gordon Childe (1892-1957) têgîna 'Şoreşa Neolîtîk' çêkir ango ew maka vê têgînê ye. Di kitêba xwe de ya bi navê "Di Dîrokê de Çi Qewimî?" hem li neolîtîkê hem jî li destpêka şaristaniyê dikole û bi ser hin nakokiyan ve dibe. Dipirse, gelo "Arîstokrasî li kû derket holê?" û hewce dibîne ku li bersiva vê pirsê bigere.

Wexta ku teza xwe amade dike, hin pirs dikevin ber wî û bi pey bersiva wan dikeve. Ji xwe dipirse, dibe ku arîstokrasî li deşta Tûnayê derketibe holê. Hûr dikole û digihîje wê encamê ku Ewrûpa ne xwedî wan şert û mercan e ku lê arîstokrasî derkeve holê. Li Ewrûpayê neolîtîkeke dereng pêk tê. Komeke koçber a bi navê Kelt heye, lê navenda wan û cîwarê wan ê bingehîn ew der nîne. Kelt şaxekî Aryanî ne, ber bi rojavayê dunyayê ve çûne. Gordon Childe vê carê berê xwe dide bakurê Derya Reş û bala xwe hûrûkûr dide ser Skîtan. Pêşî difikire û dibêje, dibe ku arîstokrasî li Ûkraynayê derketibe holê, lê dibîne ku ew cih jî ji bo vê guncav nîne. Ji vir jî berê xwe dide Bakurê Kafkasyayê, lê li wir jî zêde tiştekî nabîne. Di taliya temenê xwe de dihizire ku arîstokrasî li Başûrê Kafkasyayê ango li wê devera ku em jê re dibêjin, sîstema Zagros-Torosê derketiye holê.

Yewnanî jî kengî bi qebîleyên Zagros-Torosê re şer dikin, haya wan ji vê sîstema li Medyayê çêdibe û dereng pê dihesin. Bi piranî ji tecrûbeyên li Medyayê û beşek jî ji ezmûnên Misrê digirin û teorîze dikin.

Li Mezopotamyayê ji bilî şoreşa neolîtîkê, wekî din şoreşa bronz (misê zer) çêbûye. Amûr, sîleh û aletên ji bronzê li vê herêmê hatine dîtin û ev jî vê rewşê piştrast dike. Ji bo pêkhateya arîstokratîk sîlehên bronzî xwedî roleke giring in. Sîlehên ji misê zer pergala arîstokratîk diafirîne. Erebeyên hespan ên şer hema bêje mîna sîstema tankên îro ne. Wexta ku erebeyên hespan û bi sîleh çêbibin, ma kî dikare xwe li ber wan bigire. Ev rewşa ku em qala wê dikin jî bi giranî li Mezopotamyayê derketiye holê. Cografyaya Mezopotamyayê ji her alî ve ji bo rewşeke wisa derkeve holê, têra xwe guncav e. Roja me ya îro jî kanên dewlemend ên binerd û sererd li vê derê ne. Ev der ji bo bûyer û pêşketinên civakî û çînî makeke bingehîn û pêşeng e.

Şoreşa bronz (tûnc) di dawiya serdema neolîtîkê de li ser bingehê teknolojiya bronzê pêk tê. Di vê demê de hin qabîliyet û aletên teknîk ên mîna tekelik û tevrik giring in ku asta pêşketina vê serdemê nîşan didin û pênase dikin. Herçiqasî vedîtina tekelik kevintir be jî vê serdemê, di erebeyên şer ên bi hespan de bikaranîna wî serdestiyeke giring a teknîkî dide xwediyên xwe. Li şûna sîlehên ji obsîdyen û kevirên çeqmaqî (heste) êdî sîlehên ji bronzê, erebeyên şer ên bi tekelik û bi hespan pir bi bandor dibin. Çawa ku roja me ya îro teknolojiya hewayî û tank çarenûsa şeran diguherin, di wê demê de jî teknîka ku em qalê dikin, qedera şeran diguherin. Qesrên Misriyan misêwa dixwazin sîlehan û erebeyên şer ji Mîtaniyan bikirrin. Mirov dibîne, Misriyan û Mîtaniyan gelek caran erebeyên şer ên bi hespan û zêr bi hev guhertine. Dîsa, em ji belgeyên nivîskî yên wê demê fêhm dikin ku çûna qesrên firewnan a Nefertîtî weke bûk jî bi bandor bûye.

a) Erebeyên Şer ên Bronz ên Arîstokrasiyê

Ji bo çûna Çînê û heta Îrlandayê hewceyî bi erebeyê heye. Çawa ku roja me ya îro balafirên bi lez û xwedî qabîliyet îmkanê didin sîstema global ji bo fetihkirina cîhanê. Teknîk evqasî diyarker e. Çîna arîstokratîk li ser vî bingehî derdikeve holê. Misê zer ango tûnc dibe firaq, dibe qir û qaf, dibe gelek pêdiviyên jiyanê. Ev li cem Ûrartûyan gelekî bi pêş ketiye. Beriya vê, teknîka li ser bingehê obsîdyen bi pêş ketiye, lê di vê demê de em dibînin amûrên ji madenên weke zêr, zîv û tûncê hene.

Sîstema arîstokratîk di dîrokê de navê wê weke “şoreşa tûnc” tê hildan. Di serdema tûnc de beşekî arîstokratîk ê diyar, îmkanê sîlehan bi dest dixe. Ev sîstem bi xwe hinekî dewletê tîne bîra mirov. Bi şoreşa tûnc re bêhtir erd têne ajotin, ango pê re aletê cot û amûrên barhilgir têne bipêşxistin. Teknîka herî diyarker jî erebeyên şer ên bi hesp in. Ev erebeyên şer serdestiyeke bêhempa didin xwediyên xwe. Erebeyên şer ên ji tûnc, B.Z. bi 2000 salan di

dîrokê de xuya dikin û bi roleke mezin radibin. Ev yek, rê vedike li ber serdemeke arîstokrasiyê ya ku tê de arîstokrasiya ji B.Z. 3000 salan ve bi pêş dikeve, di warên ekonomîk, siyasî û eskerî de bi temamî bi ser dikeve. Ev rewş û bûyereke mezin e. Divê mirov rêûresma arîstokratîk piçûk nebîne. Ev pêkhate bi xwe kastîk e. Ji vê serdemê re dibêjin, serdema qral-xwedeyan. Li cem Sumeran jî Serdema Xanedaniyên Yekê, Diduyê û Sisiyê bi vî rengî ye; li Misrê heta bi Xanedaniya 15'an hemû qral-xweda ne. Awayên bi heman rengî li Hindistan û Çînê jî hene.

Erebeyên şer ên ji tûnc, B.Z. salên 1700'î derbasî Misrê dibin û wir bi tememî desteser dikin. B.Z. di navbera salên 1700 û 1600'î de Aryen diçin Hindistanê û çi tiştên kevin hebin, hemûyan ji holê radikin. Li Çînê bermahiyên erebeyan ên B.Z. salên 1600-1500 hatine dîtin û bi qasî ku tê fêhmkirin, ev erebe ji derve hatine anîn. Erebeyên şer ên ji tûncê kirine ku Xanedaniya Shangê pêk bê. Ev erebe şaristaniya dawî ya Sumeran ango Babîlê B.Z. salên 1600'î bi erdê re dikin yek. Li Anatolyayê Hîtîtî heman tiştî dikin, dîsa wexta wan B.Z. li dorbera salên 1700 û 1600'î ye. Yewnanî li Atînayê B.Z. salên 1200'î li 'dem'an bingehê tîpîk ê arîstokrasiyê datînin. Latîn li nîvgirava Îtalyayê, Kelt li nîvgirava Spanyayê, li giravên Îrlanda û Ingilistanê rê li ber bûyerên bi heman rengî vedikin. Ev hemû, nîşan û îsbat in ji bo wan serûbinîhevbûnên ku di warê arîstokratîk de qewimîne. Van bûyerên mezin, mohra xwe li Efrîka, Asya û Ewrûpayê dane. Ev bûyerên hevgirtî ne, û li dorbera salên 2000'î B.Z. dest pê dikin û heta salên 1000'î B.Z. bi bandor in. Serdema beriya wan, serdema qral-xwedeyan e, û afirînerê vê serdemê tebeqeya kastîk e.

Salên 1700-1600 B.Z. Hîksos diçin Misrê, Hîtît dikevin Anatolyayê, Mîtanî li Sûrî, li beşekî mezin ê Mezopotamya û Babîlê Kassîtî, li Yewnanistanê Mîkenî û li Hindistanê Arî tevî pêkhateya xwe ya îdeolojîk û xwedayên xwe diçin û bi cih dibin. Milê Shang diçe Çînê, Kelt jî diçin Ewrûpayê. Yên şaristaniya Ewrûpayê afirandine Kelt in. Arîstokrasiya Aryen pêl bi pêl ji Bakurê Hindistanê, ji Çînê heta bi peravên Okyanûsa Atlas a Ewrûpayê her deverê fetih dikin. Tişta ku ev tevgera belavbûn û dagirkeriyê ya arîstokratîk kir ku li xêra Aryenan be û ew ber bi serketinê ve birin erebeyên du tekelik ên bi hesp, sîlehên ji tûnc û koma şervanên arîstokratîk ên xwedî qabîliyet bûn. Lewma em ji vê serdemê re dibêjin, serdema arîstokratîk a erebeyên şer ên ji tûncê.

Civaka dayikê bi pêkhateya arîstokratîk derbeke xedar a kuştinê dixwe. Di mîtolojiyan de qala vê pêvajoyê tê kirin. Mîtolojiya afirandinê ya Babîlê qala wê yekê dike ka Mardûk dayika xwedawend çawa ji hev du perçe perçe kiriye. Ji aliyê etîmolojîk ve peyva Mardûk di kurmancî de ji koka peyva 'merdo' û di Kirmançkî de ji koka peyva 'merde' ye. Li Babîlê xwedayê herî mezin Merdanûs an jî Mardûk e. Dema vê mîtolojiyê salên 1600'î B.Z. ye. Di vê demê de Kassît hukim li Babîlê dikin. Mardûk jî peyvek e, ji orîjîna proto-Kurdan e. Mer, mêr e, merdo jî mêranî û egîdiyê pênase dike. Mîtolojiya xweda Mardûk heta bi Hindistanê belav dibe. Di Sankirîtî de têgînên wisa hene ku bi koka xwe Aryenî ne.

Di serdema arîstokratîk de livûlebateke bi vî awayî pêk tê. Hem li cem jinê hem jî li cem mêr rê li veguhertinê vedike. Bi sîstema arîstokratîk re êdî serdestiya mêr vebirrî dibe. Xwedawend ango jin-dayik, jina pîr a xwedî tecrûbe û ezmûn ketiye dereca diduyan. Têgîna xwedawenda jin ji holê radibe, li şûna wê têgîna xwedayê mêr çêdibe. Êdî jin xwedawend nîne, jina qesrê ye. Ango rewşa wê serberjêr diçe. Ev rewşa jinê ya serberjêrçûyî tevahiya dîroka şaristaniyê dewam dike.

Jina qesrê ya serdema arîstokratîk, bi dînê yekxwedayî yê Zerdeşt jê re pêşengtî û pêxemberiyê dike, dixin malê û wê di malê de digirin. Xistina malê û tê de girtin, bi vî awayî pêk tê û jixwe têgîna zewacê bi vî awayî çêdibe. Di Zerdeştiyê de malbat bûyereke mezin e. Paşê di dînên yekxwedayî de Hz. Brahîm malbatê bêhtir bi kok û esas dike. Rêûresm û koka

Zerdeştîtiyê ji Hûrriyan e, û heta bi salên 3000'î B.Z. diçe. Bi salên 1500 B.Z. re Hz. Brahîm kirasê dînî li malbatê dike. Bi vî awayî, bingehê malbata ku îro em nas dikin, tê danîn. Di pêvajoya pêşî ya derketina holê û bi pêşketina dînê Brahîmî de Îshaq û Yaqûb weke malbat li qesrên Misrê bi cih dibin.

Di van pêvajoyan de li cem jinê veguherîneke mezin çêdibe û ev veguherîn bi malbatê bi encam dibe. Saziya malbatê ya di serdema arîstokratîk de derdikeve holê ber bi salên 2000'î B.Z. derdikeve asta herî jor û li çar aliyê cîhanê belav dibe. Di navbera salên 2000-1500'î B.Z. de bi awayekî global bi pêş dikeve. Ev hemû bi lêkolîn û vekolanên arkeolojîk eşkere bûne. Alet, amûr û erebeyên wê demê ji me re qala van hemûyan dikin.

b) Formulasyona Îdeolojîk a Sîstema Arîstokratîk

Her ku diçe saziya qasidiyê dikeve dewreyê. Heke xweda hebin, divê qasid û nûnerên wan ango pêxemberên wan yanî peyamberên wan jî hebin da ku peyamên wan ragihînin. Bingehê dînên Brahîmî ev sazî ye. Çîna arîstokratîk bi afirandina saziya peyamberiyê yan jî qasidiyê dibêje, "Temam, dibe ku hûn xweda bin, lê divê hûn qasidî û pêxemberiyê jî bidin me." Ev rewşa ku em qala wê dikin, di Xirîstiyantî û Îslamiyetê de jî bi vî awayî dewam dike. Papa nûner û qasidê xwedê ye; pêxemberên Îslamê jî peyamber û nûnerên xwedê ne.

Tebeqeya arîstokratîk bi saya qasidiyê yan jî pêxemberiyê, nabêje ez xwedê me, lê bi pêxemberiya xwedê payeya herî bilind bi dest dixe. Ev giring e. Pir berê, mirov ji pîsî, parsû yan devereke din a kujerê kastîk dihatin afirandin. Li Olîmposê jî heman çîrok û çîvanokên mîtolojîk bi temayên cuda dewam dikin. Li vir, tîtan koma alîkar in, û bi awayekî ji awayan nûnerên arîstokrasiyê ne.

Saziya qasid û nûneran, di dema civaka Babîlan de pêngaveke mezin diavêje û bi pêş dikeve. Li Babîlê rahib ji kastê vediguherin tebeqeya nûner û qasidan. Rahib dibin alîkarê xwedê. Li odeya qatê jor jî xwedê heye û tenê alîkar li wir dikare bi xwedê re hevdîtinê bike. Li cem Yewnanan, ev kes dibe despot. Maneyekê didin hêzên xwezayê jî û wan îlahî dibînin. Xwedayê rojê, xwedawenda heyvê û komên stêrkan her yek ji wan weke xwedayekî bi gewde dibin. Li Mezopotamyayê ji tavê re dibêjin 'ROJ', li Misirê weke Amon-Ra dibe xweda, rahib jî dibe alîkarê wî. Ha ev hemû, arîstokrasiyê pênase dike. Bi temamî rewşeke îdeolojîk e. Arîstokrasî di çarçoveyeke îdeolojîk de saziya rahibtiyê hinekî bi pêş dixe, xisletên nûner-zana lê bar dike û ev jî ji hewcedariya wî ye. Ev diyarde di rastiya dîrokî de jî tê dîtin û ev herî zêde di warê dînî yê Rojhilata Navîn de xuya ye. Di vê çarçoveyê de rewşa Brahîm berbiçav e. Ji Xwedê lava dike û ev rewşa wî balkêş e. Xwedayê li ber digere û jê lava dike, Firewn e. Li Misrê hakimiyeta Firewnan heye. Dixwaze kurê xwe Simaîl bike qurban. Di wê demê de her kes salane neçare kurekî xwe bike qurban û Simaîl jî kole ye. Ev rêûresm heta bi Kartacayê ve belav bûye. Salane bi hezaran zarok têne qurbankirin. Brahîm li ber digere, lava dike. Axir ew bi xwe jî kole ye. Sara, Hacer û Simaîl diçin Kabeya îro, belkî ev çûna wan jî reva ji kujerê kastîk be. Dixwazin xwe jê xilas bikin. Diçin Nîvgirava Ereban û bi vî awayî xwe jê rizgar dikin. Ev çîroka serdemekê ye.

Brahîm bi xwe jî encama sîstema arîstokratîk e. Peyva Îsraîlê tê maneya 'Gulaşa bi Xwedê re'. 'El' maneya xwe xwedê ye, 'îsra' jî maneya xwe gulaş e. Etîmolojiya Îsraîlê bi vî awayî ye. Ev tê wê maneyê, ew di rewşeke welê de ne, bi xwedê re dikarin gulaşê bigirin. Xwedê jî Firewn e. Pirtûka Pîroz bi awayekî berfireh qal dike, ka Mûsa çawa bi Firewn re şer kiriye û di Derya Sor re derbas bûye. Dîsa çîrokên pêxember Yûsiv li qesrê gelekî balkêş in.

Li vir, rêûresmeke qasid, nûner û peyamberan di dîrokê de derdikeve holê. Pêxember Brahîm bavê pêxemberan e; bi Yûsiv, Yaqûb, Mûsa, Îsa û Mihemed dewam dike. Ev pêxember hemû pêxemberên rêûresma Brahîmî ne. Dîn di sîstema arîstokratîk de maneya

xwe îdeolojî ye, derketina holê ya arîstokrasiyê weke tebeqe jî bingehê civakî yê dîn e. Bi vî awayî, em dikarin bibêjin, dîn bi arîstokrasiyê dest pê kiriye. Stûna wî ya sereke ya xwe sipartiyê, saziya qasid û nûneran e, maneya vê ya civakî jî ew e, ev tebeqe alîkarê koma kastîk e. Arîstokrasî ji nava koma kastîk derdikeve. Koma kastîk bi arîstokrasiyê re dibe çîn û bi vî awayî hebûna xwe ya siyasî dike dewlet. Yanî dewletbûn bi arîstokrasiyê dest pê dike. Ji Çînê heta bi Misrê, ji Mezopotamyayê heta bi her deverê, ji serdema kastîk derbasbûna serdema arîstokratîk, qasid û nûner dikevin dewreyê. Di Zerdeştiyê de û di dînên Brahîmî de jî ev her bi vî awayî ye. Di navbera Zerdeştîtî û dînê Brahîmî de biratiya dîn heye. Ev rastî, bi awayekî zanistî jî îsbat dibe ku Tewratê ji sedî pêncî ji Zerdeştîtiyê wergirtiye. Ev bûyer jî li derbora salên 500 B.Z. li Babîlê pêk hatiye.

8-Serdema Mîhwerê (Tewere)

Kujerê kastîk an jî koma qral-xwedayan, sîstema ku li Mezopotamya, Hindistan, Çîn û Ewrûpayê derketiye holê û dîsa li van deveran bi gewde bûye, pênase dike. Her weha ev kom, dîsa li ser heman erdan ji hev de ketiye. Di heman demê de li ser van erdan bajar û komîn çêbûne, bi pêş ketine.

Şaristaniya kastîk weke bûyereke mezin derdikeve ser dika dîrokê. Yên ji hebûna wî nerazî û dijberên wî jî xwe bi gurçûpêç dikin; li dijî wî li ber xwe didin. Baş e, yên nerazî kî ne, dijberên wî kî ne?

Serdema mîhwerê ji pêkhateya kastîk-arîstokratîk pir zêde nerazî ye, li vê hebûnê rexne digire. Ango serdema mîhwerê li hemberî pêkhateyên kastîk-arîstokratîk nerazîbûn û rexnegiriyeke mezin e. Herçiqasî aliyê wê yê dînî-mîtîk hebe jî aliyê wê yê civakparêz û aliyê wê yê heqîqetê dike armanc, li gorî teoriya sosyalîzma pêkhatî, xwedî kapasîteyekê ye ku mirov nikare piçûk bibîne.

Rêûresma Zerdeştî li dijî sîstema kastîk berxwedaneke bi vî rengî ye. Divê mirov Zerdeştîtiyê jî bi awayekî teng an jî muhafezekar şirove neke. Em qala rêûresma berxwedêr a Zerdeştîtiyê dikin, ji ber ku di dîroka civakî de bi roleke pêşverû rabûye. Ev rêûresmeke demokratîk û komînal e. Zerdeştîtî rêûresmek e; pişta xwe daye sîstematîka Zagrosê û pir bi hêz heta roja me ya îro hatiye. Rêûresma Zerdeştîtiyê li dijî sîstema kastîk li ber xwe daye û ev mijar hêjayî lêkolanê ye.

Ji rêûresma Zerdeştî çend versiyon derdikevin holê û ev pêşketineke gelekî giring e. Zerdeşt weke pêxember li dorbera salên 500'î B.Z. li ser dika dîrokê xuya dike. Salên 500'î B.Z. li Çînê jî Konfuçyûs di sîstema dewletê de reformên mezin dike. Salên 500'î li Hindistanê Bûdha weke doktirîneke exlaqî ya nipînû bi pêş dikeve. Îdeolojiya Bûdha li dijî sîstema kastîk bi berxwedana xwe ya exlaqî şoreşeke mezin dike. Salên 500'î B.Z. li dijî argumanên îdeolojîk ên sîstema kastîk afirandî, Sokrates di danîna hîmên felsefî de navê berxwedanekê ye. Ji rêûresma felsefîk a Sokratîk gelek ekolên mezin derdikevin holê. Jêder û çavkaniya wan jî rêûresma Zerdeştî ya li Rojhilata Navîn e. Ji rêûresma Zerdeştî pêşî Tewrat derdikeve holê. Divê mirov Tewratê weke reform û veguherîneke mezin a di rêûresma Zerdeştî de bibîne û ev awa pêdaketin û dîtin wê bibe ya herî rast.

Dîrok û raboriyeke ciddî ya komînalîteyê heye. Li sîstema çiyayên Zagros-Torosê federasyoneke pirbelav a eşîran çêbûye. Konfederasyonên Med-Naîrî weke komînên komîna bi pêş dikevin. Ev jî rewşek e ku bi arîstokrasiyê re pêk tê. Qebîle û komînên prîmîtîv ên berê, bi konfederasyonên qebîleyan re gelekî bi pêş dikevin. Divê mirov vê demê weke serdemekê bibîne ya ku bi derketina holê ya arîstokrasiyê re hemwext bi gewde dibe. Çawa ku arîstokrasiyê mîtolojî li aliyekî hiştiye û weke îdeolojî bi dîn dewam kiriye, komînalîteyê jî di dema pêşketina xwe de weke bingeh xwe li ser xeta Zerdeştî pênase kiriye. Zerdeştîtî ne tenê

dîn e, nîv bi nîv felsefe ye. Bîrûbaweriyek e, li dorbera salên 1000'î B.Z. rengê xwe yê berbiçav digire. Li dorbera salên 1500'î B.Z. li wê dema ku arîstokrasî di çaxa xwe ya herî payeberz de ye, derfet û îmkanên wê yên pêşketinê hene, lê pêşketina xwe ya esasî di dema Konfederasyona Medan de dike.

Esil û esasê pevçûn û şerê di navbera arîstokrasiya Med û Persan de li ser bingehê dualîteya 'demokrasî yan jî qraliyet'ê ye. Guftûgoya li ser dewletbûn û komînbûnê ye. Awayê herî berbiçav ê vê rewşê jî şerê di navbera Astiyages û Harpagos de ye û kêliya şikestinê ya dîrokî jî ev e. Dema ku em qala wê dikin, ji bo dîroka me gelekî giring e. Meyla dewletbûnê dixwaze û meyla konfederasyonê dixwaze pev diçin û şer dikin. Rêûresma Kyros rêûresma Elamê ye, û ji herêma Sumeran tê. Kyros serkêşê meyla dewletbûnê ye. Bi xiyaneta Harpagos kirî re pevçûn û şer li qezenca Kyros bi encam dibe. Ji ber ku Astiyages serekê konfederasyonê bû, dewletbûn qebûl nekir, lê Harpagos pê re xiyanet kir. Ew gotina Astiyages a navdar di dîroka Herodot de heye. Astiyages ji Harpagos re dibêje; "Hey rezîlo, madem te konfederasyon hilweşand, qe nebe tu biketa şûna min. Li şûna ku te yê radestî koleyê me Kyros bikira, qe nebe te yekî Medî bianiya. Te ev xiyanet çima kir?" Ji wê rojê ve xiyaneta Kurd li kar e. Ji wê rojê ve rêûresma Harpagos di nava eşîrên Kurd de dewam dike. Îro jî mirov dikare navê çend Harpagosan hilde. Balkêş e, dijminên herî sondxwarî yê Kurdan ji nava vê rêûresma Harpagos derdikevin. Rêber Abdullah Ocalan van kesan weke 'Komîteya Judenrat' pênase dike. Hemû jî heman taîfe ne. Vê rewşê, xiyaneta van kesan di dîrokê de pir bi dijwarî civaka me şikandiye, civakê şikest xwariye.

Di vê serdemê de ku em weke Serdema Mîhwerê bi nav dikin, pênc îdeolojiyên mezin ên komînal derdikevin pêş. Di pozîsyona navendî de Zerdeştîtî heye. Li pey wê, li Çînê Lao Tse, li Hindistanê Bûdha, îdeolojiya Cihûyan û li Yewnanistanê felsefeya Sokrates tên. Ev her pênc îdeolojî jî xwedî bingehekî komîn in.

Ev her pênc şax û mil tezahurên komînîstîk û komînal in. Lao Tse nûneriya komînalîteyê kir, lê Konfuçyus ew kir dewlet. Li wir dîroka komînekê, komînalîteyekê heye. Lao Tse komînalîteyeke rastî ya bindestan pêk tîne. Konfuçyûs wê dike arîstokratîk û wê dike îdeolojiya dewletê. Li cem Grekan komînalîstê rastî Sokrates e. Platon, a ku ji Sokrates digire, weke avahiya 'dewletê' pêşkêşî arîstokrasiyê dike. Avahiya 'dewletê' îdeolojiya dewletê ye. Konfuçyûs revîzyonîstekî mezin ê dewletê ye. Çîna niha rola Konfuçyûstiyê dilîze. Konfuçyûs dike ku Çîn ji kastê derbasî dewletê bibe. Çawa ku Platon jî wê paşê bike. Li cem Cihûyan jî Silêman-Dawid ji serî heta dawiyê dewletperest bûn, lê Samûel heta tu bibêjî komînalîst bû. Li cem Cihûyan ev duşeqbûn li qesrê dest pê dike. Yûsiv li qesrê li cem Firewn e, lê lawên din ên Yaqûb komînalîst in. Pêxember Yûsiv qebîleya Ibrî dike duşeq, duperçe. Ji vir û pê ve, serdema Mûsa û Harûn tê. Serdemek e, têra xwe balkêş e. Dawid û Silêman rêûresma dewletê, Samûel û pêxemberên din jî rêûresma komînal temsîl dikin. Ev herdu alî yan jî dualîte şikestina dîrokî pênase dikin. Ev dualîte di dîrokê de şikestinekê nîşan dide.

Hilweşîna serdema koletiya klasîk li dorbera salên 500'î B.Z. dest pê dike û bi hilweşîna Romayê re diqede. Ev qonaxa derbasbûnê bi qasî hezar salî didome. Bi vî awayî, ji koletiyê derbasbûna feodalîzmê pêk tê; serdema koletiya klasîk bi dawî dibe û serdema serftiyê ya ku em dizanin dest pê dike.

Rêûresma pêxemberan komînalîst e. Hz. Mihemed komînarekî prîmîtîv e. Mezinahiya Hz. Mihemed ew e, di rêûresma dînên yekxwedayî de komînalîstê mezin ê dawî ye. Koletiya klasîk bi dawî kiriye. Li Efrîka û Erebistanê qebîle li pêşiya pêşketina civakî êdî bûne asteng û kelem. Mihemed vî kelemî û vê astengiyê bi hêvî û îlhameke mezin radike. Dema Mihemed a Mekkeyê ya propagandayê, dema wî ya Medîneyê jî ya komînbûnê ye. Ev komîna Îslamê ye. Li Ewrûpayê ji şaredariyan re dibêjin komîn. Destpêka vê Medîneya Mihemed e. Bala xwe

bidinê, Mihemed tevî koma bawermendên li cem xwe, xwedî jiyaneke hevpar e. Ji van re tê gotin, Eshabî Kîram ango hevrê û hevalên hêja yên pêxember. Mihemedî muhacirîn ango kesên bi Hz. Mihemed re koçberî Medîneyê bûn, komeke bêhempa ya komînal bû; xwedî jiyaneke hevpar bûn. Komîna ku em qala wê dikin, demokrasiyek xwe jî hebû. Peymana Medîneyê peymaneke komînê ye, û pêşnûmeya demokrasiyê ye. Yên vê xira dikin, Ebû Sufyan û Muawiye ne; ji ber ku ew xwedî têgihiştina desthilatdarî û seltenetê ne. Ango, ya wan dij-Îslam e. Elî Şerîetî hewl daye hinekî qala vê bike, lê ji ber ku ne xwedî zêhniyeta komînalîst bû, di vegotina vê de qels û kêm maye.

Li cem Medan, li dorbera salên 500'î B.Z. guftûgoyên li ser demokrasiyê, guherîn û veguherîna komînalîteyê, babetên ciddî yên berbiçav ên guftûgo û pevçûnê ne. Di navenda van bûyeran de kesayeta Zerdeşt heye. Ew ji Hindistanê heta bi Çînê, ji Misrê heta bi Yewnanistanê bandoreke giring dike. Zorê dide îdeolojî û felsefeyê. Di navbera felsefeya wî û guftûgoya demokratîk de têkiliyeke bi hêz heye. Kurtûkurmancî, di komînalîteyê de şoreşeke mezin a îdeolojîk dike.

Persî Zerdeştîtiyê ji bo împaretoriyê bi kar tînin. Piştî ku Kambîses diçe Misrê rahibên Magî ji valatiyê sûd werdigirin û desthilata xwe ya ji dest dabûn, dîsa bi dest dixin. Ev, di împaretoriyê de demeke navberê ya bi qasî heft salan e. Dema ku Darîûs ji seferê vedigere û Heft Xanedanan îmha dike, Zerdeştîtiyê bi kar tîne. Di encamê de împaretorî dibe du perçe; Zerdeştîtiya fermî ya dînî, dibe îdeolojiya Persan, Zerdeştîtiya ne fermî weke îdeolojiya komînalîteyê dimîne. Ha ev, dibe bingehê rêûresma îdeolojîk a Kurdan. Hê jî bermahiyên wê li Dersim, Çewlîk û Xorasanê bingehê îdeolojîk ê bîrûbaweriyên li van herêman e.

Di hemwexta Zerdeşt de Bûdha jî derketiye holê û bêhtir balkêş e. Bûdha di dînê Hindê de şoreşeke mezin dike. Teqez tevgereke komînê ye. Dîroka civak û baweriyên li Hindistan û Çînê derketine holê, diyar kiriye. Bûdîzm ne îdeolojiya qebîleyekê ye û bi vê xisleta xwe yekemîn e. Lewma îdeolojiyek e ku ji qebîleyên cuda kes li pey diçin. Ji ber ku îdeolojiya wê nêzî felsefeyê ye, bandora wê jî zêde ye.

Bûdatî, Zerdeştîtiya gel û felsefeya Yewnan îdeolojiyên komînê ne. Hem jî xwe bi guftûgoyên gelekî dijwar danîne holê. Dualîteya dewlet-komînalîteyê ya li vir dest pê kiriye heta roja me ya îro hatiye.

Serdema Navîn a Ewrûpayê jî encama vê ye. Serdema Navîn a Ewrûpayê bi komînalîteyê dest pê dike. Ewrûpayê herî zêde Rojhilata Navîn ji bo xwe kiriye bingeh. Atîna û Romayê bingehê baweriyên xwe yên îdeolojîk ji Rojhilata Navîn girtine. Roma huqûqê li vê zêde dike, îdeolojiya arîstokrasiyê ya di karakterê dînî de vediguherîne huqûqê. Mîna Qanûnên Hammûrabî yên li Babîlê. Lê ya li Romayê huqûqa arîstokrasiyê ye. Pagan, tîpîk komîn in, û li serdema navîn a Ewrûpayê li ser bingehê komînan bi gewde dibin. Piştre serdemeke arîstokratîk tê.

Felsefeya ji Zerdeşt heta bi Sokrates, ji Lao Tse heta bi Bûdha felsefeya komînê ye, îdeolojiya komînê ye. Lê arîstokrasî vê felsefeyê dike dîn û berxwedanên li dijî vê dînîkirinê vê felsefeyê derbasî serdema navîn dikin. Lewma serdema navîn serdemeke giring a komînbûnê ye.

Navenda van bûyer û pêşketinan Rojhilata Navîn e. Kok, reh û rîş li vir in. Gordon Childe neolîtîk pênase kiriye, lê nekarîbûye tam rave bike ka li Mezopotamyayê çi qewimiye û nekariye tesbît bike ku jêder û çavkaniya wê qûntara çiyayên Zagros-Torosê ye. Hemin Mezopotamyaya Jêr giring e, lê Mezopotamyaya Jor û Navîn, Mezopotamyaya Jêr xwedî kirine. Li keviyên Nîlê pêşketineke bi vî awayî çênabe, ji ber ku dora Nîlê çol e. Rewşa avhewayê û cografyayê ji bo vê guncav nîne. Li tejaneya Besrayê nebat çênabin, lê ji bo avdaniyê xweş e. Sumerî li tejaneya Besrayê erx û cihokan çêdikin; genimê ji

Mezopotamyaya Jor anîne, li wir diçînin. Erdên beyar ên xam bi avê tîna xwe dişikînin. Ji libeke genim, sed lib tên. Bereketeke nedîtî çêdibe û hatin dibe çirrik. Mayeya di destê wan de dibe sermayeyeke pir mezin. Tişta ku Înannayê jê re digot, "ME'yên min" hemûyan ji Zagros-Torosan tînin. Avhewaya vê herêmê gelekî xweş û bi bereket e, gelek cureyên heywan û nebatan lê hene. Di vî warî de qûntara çiyayê Qerejdaxê jî navendeke diyarker e. Pêdiviyên bingehîn ên debarê yên weke genim, ceh, mîh û bizin li vê derê hemû hene.

Ji Çînê heta bi Hindistanê, ji Rojhilata Navîn heta bi Yewnanistanê, li dorbera salên 500'î B.Z. li cografyayeke berfireh şikestineke mezin çêdibe. Di şexsê Zerdeşt, Lao Tse, Bûdha, îdeolojiya Cihû û felsefeya Sokrates de cografya bi îdeolojiya komînalîteyê şad dibe. Ev pir giring e, û bi temamî pêşketineke şoreşgerî ye. Berê qebîle û komîn hene, lê îdeojiya wan tineye. Komîn digihîje îdeolojiya xwe. Rêûresma pêxembertiyê jî îdeolojiya komînê temsîl dike. Mihemed bi xwe komînalîstek e. Jixwe, wexta ku Quran tê, jê re dibêjin, "Tu helbestvan î, tu şair î." Li rêûresmekê vedigerin. Ji ber ku helbestvanê komînalîteyê ye. Ev tehlîl û awayê pêdaketina me gelekî giring e, ji ber ku em bi vî awayî sosyolojiya dîrokî dikin. Bi vî awayî, cara pêşî îdeolojiya komînalîteyê tê ragihandin.

Xiristiyantî bi temamî komînal e. Sêsed salên wê yên pêşî ewqasî komînal e ku belkî jî li cem ti dînê din ewqasî komînalîte pêk nehatiye. Keşîşxane, dêr komîn in, meclîs in. Hê jî li Anatolya Navîn bermahiyên wan hene. Belkî jî bi qasî Xiristiyantiyê komînal, ti dînekî din nîne. Pir berê, arîstokrasiyê û paşê bûrjûwaziyê rê li duşeqbûna wê vekir; bi Katolîktiyê ew dejenere kirin, bi Kalvînîzma Protestan jî bi navê reformê komînalîte belawela kirin. Bi vî awayî, dibe îdeolojiya dewletê. Piştî hilweşîna Romayê jî Papa dibe împaretor.

Zerdeşt bala Nietzche jî dikişîne. Ew xwe weke "şagirtê Zerdeşt" pênase dike. Elman jî gelek xisletên xwe ji vir digirin. Yên ji Marks nerazî ne, hemû ji rêûresma Nietzche ne. Sartre jî di navê de gelek ji wan dixwazin wê ya ku Marks kêm hiştiye, temam bikin. Dîsa hemû dij-Hegel in.

Mirov dikare bibêje, li beramberî şikestina ku pênc ekolên Serdema Mîhwerê rê li ber vekir, şikestina Marks rê lê vekir, pir piçûk e. Di dîroka sosyalîzmê de ji sosyalîzma utopîk ber bi sosyalîzma zanistî ve jî şikestinek çêdibe. Ev şikestineke piçûk e. Şikestina herî berfireh û dorfireh komînalîzma li dora pênc ekolan pêkhatî ye. Hemû komînalîst in, jiyana wan jî komînalîst e. Sosyolojiya dîrokî vê meseleyê bi awayekî berfireh zelal û eşkere dike.

Fikira Yewnanan sentezeke rêûresma Zerdeşt û Misriyan e. Fikira Rojava vê sentezê bêhtir bi pêş ve dibe. Fikira Rojava senteza fikira Zerdeşt û fikira Hermes e. Atîna ji Medyayê û ji Misirê digire û senteza xwe çêdike. Serdema Ronesans û Rohnîbûnê vê hinekî din jî bi pêş ve dibe û bi vî awayî hîmê zanistên Rojava datîne. Felsefe û zanist ji wir derdikevin holê.

9-Demokrasiya Atînayê

Çi têkiliya pêşketina arîstokratîk bi kastê re heye? Arîstokrasî pir dereng li cem Yewnanan bi pêş ket. Yewnanî di dema şerên li dijî qebîleyên Zagros-Torosan de hînî vê sîstema li Medyayê bûn. Hinekî ji Misriyan, bi piranî jî ji Medyayê hîn bûn û ezmûnên xwe yên ji van herdu navendan, teorîze kirin.

Tişta ku Yewnanan li vê pêvajoya dîrokê zêde kiriye, giring e. Yewnanan awayê pêkhateya arîstokratîk û pêşketinên piştî wê ji Misriyan girtin, şopên Mezopotamya û Skîtan li cem wan hene, lê van hemûyan bi şirove û awayekî cuda bi pêş dixin. Li cem Yewnanan bi xwe, tiştekî kastîk tineye, lê li cem Mîkenan heye ku ew jî ji derve çûne. Serdema Akayan jî mirov dikare qismî weke şaristaniyekê şirove bike. Şaristaniya Mînos a li Girîtê şaristaniyeke kastîk e. Piştî Mîkenan nûnerê herî dawî yê şaristaniya kastîk Akayî ne. Homeros di destanan

de qala vê yekê dike. Bûyerên Homeros qala wan dike, versiyona sisiyan a Destana Gilgamêş in. Versiyona diduyan Hîtîtî ne. Koka van her sê versiyonan jî Destana Gilgamêş e.

Yewnanî, daneheva Skîtiyan, ya Medyayê û Fenîkeyiyan û ji vê jî giringtir a Misriyan digirin. Îonya li Egeya Rojava navendeke giring e. Dîsa demokrasiya Atînayê navendeke gelekî giring e. Ya rastî, ya li Atînayê diqewime, ji sîstema kastê derbasbûna demokrasiyê ye. Nûnerê bermahiyên Mîkena kastîk jî Sparta ye. Kasta serdema Spartayê ye. Civaka Atînayê li hemberî kastê li ber xwe dide û li dijî Spartayê 'Şerê Sîh Salan (431-404 B.Z.)' dike. Ev şerê ku em weke 'Şerê Peloponez' pê dizanin, şerê demokrasiyê yê Atînayê li dijî sîstema kastê ya Spartayê ye. Di dema vî şerî de Sokrates û Platon jî hene.

Persan zora Medan biriye û ew heta ber deriyê Atînayê çûne. Pers weke çandeke mezin li Egeyê û peravên wê belav bûne. Salên li dorbera 500'î B.Z. serdema keya û şehînşahê Persan Kîros e. Wê demê li Misrê jî pergala kastîk heye. Li sala 525'an B.Z. wexta ku Persan Misr dagir kir, li wir hê jî serdestiya kastîk dewam dikir. Bandora van şeran hemûyan li Atînayê jî dibe û Yewnan qudûmşikestî dibin. Lewma Atînayî guftûgo dikin û dibêjin: "Gelo em ê sîstema demokratîk a qebîleyên Medan esas bigirin an jî şêweyê kastîk ê li qesrên Babîlan?" Ji ber ku li cem Yewnanan hê bermahiyên kastîk ên Mîkenan dewam dikin, rewşeke têra xwe bi nakok heye.

Egeya Rojava warekî têra xwe berhemdar e. Civaka Atînayê li cografyayekê ye; bazirganiya deryayê û cotkarî lê digihîjin hev du. Civaka Atînayê jî li gorî vê rengê xwe digire. Beriya wê jî Sumerî li ser Tengava Besrayê, Misrî jî li ser erdên çiravî yên Newala Nîlê bi gewde bûbûn. Sparta bajarekî çolterî û bejî bû, lê Atîna bajarekî deryayî bû û xwedî bender bû. Giravên Egeyê hemûyan xwe spartibû avê. Herçî dorbera Menderesa Mezin û Gedîzê ne, ew çandeke ber çeman çêdikin.

Weke encam, li vir cara sisiyan di dîrokê de qutbûn pêk tê. Ango şaristaniyek navika xwe dibirre. Malzaroka wê jî sîstema Toros-Zagros e. Malzarok, jêder û çavkaniya şaristaniyan hemûyan, ev der e. Şoreşa neolîtîk a li Mezopotamyaya Jor û dij-şoreşa wê ya li Mezopotamyaya Jêr, dadikevin başûr û sîstema Sumeran derdixînin holê. Pêşketina şaristaniyê li Harappa ya li nîvgirava Hindê û Geliyê Îndûsê jî mak û jêdera xwe ev der in.

Xaleke giring a ku em balê bikişînin ser ev e; Yewnanan modela Medyayê weke sîstematîk wergirtin û dewlet di nava wê de bi cih kirin. Têgîna dewletê ya ku îro em bi kar tînin, kêm zêde di wê demê de dibe teoriyeke berbiçav. Modela dewletê ya Plato di kitêba xwe de qala wê dike jî ev e.

Platon kitêbeke bi navê 'Dewletê' dinivîse. Kitêba ku em qala wê dikin, hê jî di dersên siyasînasiyê de tê xwendin. Platon li sîstema kastîk a li Misrê dikole û hewl dide li dijî zêhniyeta wê zêhniyeteke cuda çêke.

Dema ku li Îonyayê Fîlozofên Xwezayê li ser bingehê zanistî li xwezayê dikolan, li Atînayê Sokrates jî li Yewnanistanê bingehê fikira felsefî datanî. Sokrates rê li derketina holê ya Platon vekir. Sokrates ew kes e ku rêûresmeke pir bi hêz a felsefî da destpêkirin. Wexta ku wî ev rêûresm da destpêkirin, jêder û çavkaniyên wî bi giranî Medya û Misir bûn. Sokrates cara pêşî fikira felsefîk sîstematîze kir, lê di heman demê de bi vê yekê, wî pêvajoya ku wî bibe kuştinê jî da destpêkirin. Atîna wê demê weke kopiyayeke demokrasiya Medan derdikeve holê. Wexta ku Platon li ser dewleta arîstokratîk dinivîse, li sîstema kastê ya Misrê dikole û serê xwe li ser modeleke dewletê ya ji modela Misrê bibihure, diêşîne. Atîna reforma xwe ya bingehîn bi rexnekirina sîstema kastîk a li Misrê dike.

Koletî li Atînayê derdikeve asta herî jor, dewleta koledar jî bi heman awayî li Atînayê derdikeve asta herî jor. Demokrasiya li Atînayê çêdibe, li hemberî sîstema dewleta kastîk bi bin dikeve. Kuştina Sokrates yek ji encamên trajîk ên vê rewşê ye. Dewleta Atînayê ya ku

demokrasiyê xwe li ber negirt, weke dewleteke koledar bi pêş dikeve, lê dewleta koledar a esas, Roma ye. Di heman demê de Roma di serdema pêşî de dewleta dawî ya koledar e.

Em li Atînayê dewletê bi temamî bi awayekî xwe gurçûpêçkirî dibînin. Giringiya kitêba Platon a bi navê 'Dewletê' ji vê tê. Hêjayî lêkolînê ye. Tê de bersiva hin pirsan heye, mînak dewlet çawa tê avakirin û divê çawa were birêvebirin. Ji bo rêvebirina sîstema dewletê jî 'fîlozof-qral' û 'qral-fîlozof' cara pêşî di vê pêvajoyê de derdikevin pêş. Ev sîstema Platon sîstemeke dewletê ye, ji şêwazê rêvebirinê yê sîstema kujerê kastîk dibihure.

Fîlozofê mezin û esas ê vê qonaxê Sokrates e. Sokrates di dema navberê ya ji kujerê kastîk derbasbûna arîstokrasiyê de bingehê fikira felsefîk datîne. Platon jî herçiqasî fikirên xwe ji Sokrates girtibin jî bi temamî teoriya dewleta arîstokratîk çêdike. Sokrates di nava lêgerîneke mezin de ye. Felsefeya xwe li ser bingehê pirsên weke "Tu kî yî? Tu ji kû ve têyî?" datîne û ev awa gelekî giring e. Ji ber ku civakê tehlîl dike. Hinek dixwazin wî li aliyê arîstokrasiyê nîşan bidin, lê ev wisa nîne. Di navbera şikestina kastîk û dewletê de, Sokrates fîlozofê derbasbûnê ye. Bi awayekî heqkirî weke fîlozofekî serketî di dîrokê de cihê xwe girt. Lê pêşketina ku wî rê lê vekir, di çarçoveya civaka Atînayê de bû.

Ezmûna demokrasiya Atînayê hê jî di tevahiya dersên siyasetê de tê guftûgokirin. Ezmûna demokrasiyê ya Hannah Arendt herî zêde dieciband û esas didît, demokrasiya Atînayê bû. Arendt gelekî pesnê vê demokrasiyê dide, heta ewqasî pesnê wê dide, nizane wê li kû derê bi cih bike, û di vê de mafdar e. Dema ku mirov li ser vê babetê rast û durist bifikire, mirov ê bibîne, tişta ku jê re demokrasiya Atînayê tê gotin, demeke navberê ya di nava civaka kastîk û dewletê de ye. Heke em hinekî din hûrûkûr pê dakevin, em ê bibînin, civaka navberê ya di nava civaka kastîk û komînalîteyê de ye. Demokrasiya Atînayê di heman demê de komîn e. Jixwe, xwe disipêre deh komînên weke 'Dem' têne binavkirin. 'Dem' qebîle ne, û şêniyên Atînayê xwe disipêrin van deh qebîleyên li dora xwe. Li aliyê din jî Sparta heye. Atîna li ber xwe dide li dijî Spartaya ku gelekî nêzî sîstema kastê ye û bûye arîstokrasî. Ya rastî, yên li ber xwe didin 'dem' in. Ev pêvajoyeke derbasbûnê ye. Perîkles weke rêveberê herî giring ê vê pêvajoyê nûnerê herî hêja yê Atînayê ye. Ew lîderê demokratîk ê demokrasiya pêşî ye.

Sîstema li Atînayê ya xwe disipêre komînê, nîv bi nîv demokrasî ye. Civakeke tîpîk û emsal a derbasbûnê ye. Li aliyekî demokrasiyeke xwe disipêre komînê heye, li aliyê din jî rêveberiyeke xwe disipêre arîstokrasiyê heye. Lewma di dîrokê de şop û guftûgoyeke mezin dihêle. Platon modeleke tekûz a dewleta arîstokratîk derdixe holê. Modela fîlozof-qral û qral-fîlozof encama vê ye. Arîsto hê bêhtir hûrûkûr û berfireh qala vê dike. Herî dawî guftûgoyên di vê çarçoveyê de derbasî Rojava dibin. Li Rojava li ser bingehê mîrateya Atînayê têgîneke weke 'demokrasiya bûrjûwayê' tê çêkirin. Tişta ku îro li ser sîstema siyasî ya cîhanê serwer, mîrateya ji serdema Atînayê mayî ye. Ewrûpa di demokrasiyê de Atînayê dike esas, lê tişta ku li Atînayê pêkhatî bi temamî ne ezmûneke demokrasiyê ye.

'Dem' navê herêmeke cografîk, erdekî li dora Atînayê ye. Li dora Atînayê deh herêmên dem hene. Nûnerên 'Dem'an diçin Atînayê û rêveberiyê pêk tînin. Ev rêveberî ya qebîleyan e. Her 'dem'ek qebîleyek e. Arîstokrasî heye. Spartayî hene. Nûnerên 'dem'an û arîstokrasî li ber hev didin û di encamê de arîstokrasî bi ser dikeve, komîn ango gel bi bin dikeve. Tişta ku Arendt jê re dibêje, "pir balkêş e, bi heybet e" ev e. Li vir arîstokrasî û komîn pev diçin. Li Medyayê jî heman pevçûn heye. Li Medyayê jî pevçûn di navbera arîstokrasiya Pers û gelê Med de ye. Di encama xiyaneta Harpagos de arîstokrasiya Persan dibe serdest. Li Atînayê jî heman rewş heye û komîn têne tesfiyekirin.

Çawa ku me li jorê jî hewl da rave bikin, serdema navîn a Ewrûpayê bi giranî komîn e. Li Ewrûpayê bi mezinbûna bûrjûwaziyê re komînên li wir têne şikandin. Di Şoreşa Franseyê de

kesên ji wan re digotin “bêderpî” (Sansculottes) Komîna Parîsê ava kirin. Li Rûsyayê jî ‘Sovyet’ heye. Ya rastî, şaredarî ji komînê maye. Lê ew jî û Komîna Parîsê jî li cem Sovyetê hatine tepisandin.

Di dîrokê de 3 şêweyên bingehîn ên şiddet-terorê hene:

Ya yekê, terora kastîk e. Ji bo berjewendiyên xwe xisleta klanê ya komînal têk dibe û li şûna wê li gorî xwe formekî civakê pêk tîne. Ji bo pêkanîna vê jî terorê bi awayekî eşkere û bêrehm bi kar tîne. Gavavêtina cotkariyê û jiyana dêmanî bi darê zorê pêk tînin. Li wan perestgehan mirovan bi darê zorê dixebitînin. Wexta ku hewce dibînin, mirovan dikin qurban. Jixwe di avakirina dewletan hemûyan de mirov têne qurbankirin. Ev weke rêzik û pîvanekê di organîzasyona dewletan hemûyan de hatiye bikaranîn. Kastê li Girê Mirazan a Xirabreşkê dest bi desteserkirina mejî, dil û keda mirov kir û heta roja me ya îro jî vê yekê dewam dike. Ew beş e, herî zêde bêrehm teror bi kar aniye. Gotina “Xwedê can dide, can disitîne” işaret bi kastê û xisleta wê dike.

Ya diduyan terora arîstokratîk e ku ji salên 3000’î B.Z. ve derdikeve asta xwe ya herî jor. Bi vê terora xwe, pêşî li gund û paşê li dunyayê hemûyî belav dibe û hukimraniya xwe ava dike. Ev beş, bi teolojiyê hewl dide kirinên xwe rewa bike. Ji ber ku xwedî sîleh û teknolojiya herî bi bandor e, dikare terorê bi awayekî berfireh pir bi dijwarî û bêrehm bimeşîne.

Ya sisiyan zêhniyeta bingehîn a bûrjûwa û esilzadeyên bajaran e ku piştî Serdema Mîhwerê weke nerazîbûneke mezin li dijî arîstokrasiyê derket holê. Bi vê zêhniyetê re, di vê demê de, temamê civakê dikeve ber çerxeke mezin a cercereyê, teror bi awayekî herî berfireh û hûrûkûr li dijî mirov, xweza û ruhberan hemûyan tê bikaranîn.

Li ser vî bingehî, em dikarin bibêjin; di nava sîstema kastîk de şikestina pêşî bi arîstokrasiyê, ya diduyan jî bi bûrjûwaziyê bûye. Bûrjûwa bi xwe çênabe, ji nava arîstokrasiyê derdikeve. Ango arîstokrasî dibe bûrjûwazî. Pêşketina wan di zikhev de ye. Ev rewş û bûyer li Amsterdam û Londonê pêk tê. Serfan ji holê radikin wan dikin karker. Bi vî awayî derbasî pergaleke nû ya mêhtinkariyê dibin ya ku ji bo mêhtinkaran berdartir e.

Li Rûsyayê her ‘Mîr’ek komînek e. Ji Marks dipirsin, “Gelo mirov dikare ji Mîr’an yekser derbasî sosyalîzmê bibe?” Marks bi awayekî erênî nêzî vê dibe. Ev jî balkêş e. Ji ber ku diyar dike; bêyî kapîtalîzm pêk bê, mirov dikarin ji Mîr’an derbasî sosyalîzmê bibin. Tesbîta Marks rast e, lê kêm e. Ji ber ku nekariye ji çînê bibihure û di çarçoveya çînî de bi meseleyê daketiye. Engels hewl dide hinek tiştan bike, lê bi ser nakeve. Ji bo Lenîn Sovyetê belav neke, hema bêje Kropotkîn li ber wî digere. Lê Lenîn berê xwe dide dewletê û bi vî awayî Sovyetê belav dike. Gundiyên ku Stalîn bi wan dikeve jî ev in. Çawa ku monarşiyê komînar tine kirin, ew jî bi ser wan de diçin.

Beşa Çaremîn
MODERNÎTE

Zanistên civakî yên navend Ewrûpa, rêyên alternatîf ên heqîqetê bi du rêbazên bingehîn hema bêje asê kirine: Yek ji van rêbazan, ya gerdûnparêz monîst e. Li gorî wan, heqîqet ‘tek ’

e. Ya diduyan, rêbaza îzafî (nisbî) ya bêsînor e[7]. Her kes li gorî xwe qala heqîqetekê dike, lê ya rastî, ya qal dike ew e, dibêje heqîqet tineye. Eşkere ye ku her du rêbaz jî di warê reduksiyonizmê de digihîjin hev du. Çi rêbaza gerdûnparêz a her tiştî dike ʻtekʼ û çi jî rêbaza îzafî ya bêsînor ku ew jî her heqîqetê dike ʻtekʼ, karakterê hegemonîk ê rêbazên lêkolîna heqîqetê ya zanistên civakî ya navend Ewrûpa, nîşan didin.

Li piştvan rêbazan, tovê serdestiya pêşî ya yekdestdariya şaristaniyê heye û vê meseleyê bi wê derba ku kujerê kastîk li komîna jinê daye, dest pê kiriye. Zêhniyeta ku em qala wê dikin, li dorbera Girê Mirazan a Xirabreşkê bi gewde bûye û heta bi dema rahibên Sumeran ve diçe ku wan weke xwedayê herî mezin ʻEnʼ çêkir. Xwedayê Sumeran ʻEn ʾtê mezinkirin û bi vê, yekdestdariya dewlet-çîn-bajar û hiyarerşiya xurt dibe tê rewakirin û li ser zêhniyeta civakî tê ferzkirin. Di felsefeya Yewnan de her tim Xwedê weke sedema pêşî û vedîtina herî mezin ji heman jêder û çavkaniyê ye. Têgihiştina li Xwedê ya Platon û Arîsto bi vî awayî ye. Di dînên yekxwedayî de ʻEn ʾbi dirûvê rebê alemê Xwedê ye. Di dema mezinbûna Romayê de weke ʻJupîter ʾderdikeve pêşiya me. Rejîmên qral-xwedayan û împaretorî, li ser her civaka têne avakirin bi têgînên dînî yan jî mîtolojîk têne rewakirin û bi vê hewl didin hegemonya îdeolojîk ava bikin. Ji ber ku heta hegemoniyeke bi vî rengî nebe, pir zehmet e ku ev rejîm mayînde bibin.

Têgîna modernîteyê tê maneya çax û serdemê, dema ku em ê wê rave bikin, divê em vê rêbazê û pêkhatina heqîqetê li ber çav bigirin, ji ber ku ev têra xwe hewce ye, û mirov dikare gelekî jê hîn bibe. Gotin ji peyvika ʻmodaʾyê tê. Çawa ku mesele bibe moda û pir zehmet e ku mirov xwe ji bin bandora vê diyardeyê rizgar bike, bi heman awayî pir zehmet e ku mirov xwe ji zêhniyeta serdest a modernîteyê azade bike. Ewqasî bi bandor e, wexta ku li gorî wê bibe, wê wextê hissa ʻez heme ʾya di nava sîstemê de temam dibe. Ev, têkiliya xwe bi zirhêziya îdeolojîk a modernîteyê re heye.

Ji modernîteya Sumeran heta bi modernîteya Romayê, heta pir beriya wan û piştî wan, gelek mînakên modernîteyê hene. Em ji vedîtinên arkeolojîk dizanin, Mezopotamya Jor derbarê dem û berfirehbûnê de mînakên herî bi heybet ên modernîteyê nîşanî me dide. Rexneya Nietzsche li modernîteyê giring e. Rexneyên dînî yên li modernîteyê tenê di çarçoveya modernîteya wan de maneyek xwe heye. Gava Michel Foucault dibêje, “modernîte bi mirina mirov bi encam dibe” giring e, lê kêm e. Sosyalîzma pêkhatî, tevî îddîayên xwe yên cuda, ji aliyê teorîk û pratîk ve ti carî nefikiriye ku bibe modernîteyeke cuda.

Em li dijî têgihiştina modernîteya gerdûnî monîst (tekperest) helwesteke alternatîf dikin armanc û bi wê dixwazin rê li ber îhtîmalên cuda û fikira azad vekin. Hertim alternatîfa modernîteya serdest hebûye, tevî hemû hewldanên tepisandin û sernixumandinê hebûna xwe dewam kiriye, weke serê dijber ê dualîteya diyalektîkê bi tevahî şêweyên xwe û berfirehbûna xwe hebûna xwe dewam kiriye.

Wexta ku mirov naveroka civaka dîrokî li ber çav bigire, hem jî mirov tevgerên kom û komikên weke klan, eşîr, qebîle, qewm û cemaetên dînî li ber çav bigire, -hema bêje dîrok bi tevgerên van kom û komikan têrûrijî ye-, mirov ê bibîne, herçiqasî ev kom û komik weke ʻbarbar ʾyan jî ʻpaşverûtiya dînîʼ hatibin pênasekirin jî ji vê wêdetir a rast ew e ku mirov wan weke “Şaristaniya Demokratîk” pênase bike.

Şaristanî bi pêşketina dîroka mirovatiyê re têkildar e. Wexta ku mirov şaristanî dibêje, meqseda wê, mirovbûn û civakîbûn e. Şaristaniya dewletdar di dîroka mirovatiyê de

[7] Têbîniya wergêr: Jê re bi giştî radical relativism yan jî extrem relativism jî tê gotin û wê helwêsta ku dibêje ti standardên gerdûnî yên rastî, aqil û exlaqî nînin.

jirêderketin e. Ji ber vê, wexta ku em şaristaniyê analîz dikin, em wê weke şaristaniya demokratîk û şaristaniya dewletdar cihê dikin. Şaristaniya dewletdar bi sîstema kujerê kastîk dest pê dike, di dema Sumeran de awa û form dide xwe û weke şaristaniyeke bi mîhwer dewlet-desthilat heta roja me ya îro tê. Şaristaniya demokratîk jî ji forma civakîbûnê ya pêşî ji çanda klan-komînê dest pê dike û heta roja me ya îro tê; nirxên civakî-komînal pênase dike. Roja me ya îro kedkar, çandên têne înkarkirin, nasnameyên bindest, cinsên mezlûm û hwd. yên ji aliyê sîstemê ve têne pelixandin hemû, pêkhênerên şaristaniya demokratîk in.

1- Modernîte li Ewrûpayê Payeberzbûna Tevahiya Nirxên Mirovatiyê ye

Modernîte, beşekî dîrokê ye bi sedsala 16'an re li Ewrûpaya Rojava mezin bûye, şaristanî ye, ji sedsala 16'an heta roja me ya îro navend Ewrûpa Rojava bi pêş ketiye. Sê hêmanên bingehîn ê vê şaristaniyê hene: Ronesans, Reformasyon û Rohnîbûn. Ewrûpaya Rojava di çarçoveya van têgînan de hegemonya Rojhilata Navîn dewr girtiye. Ewrûpaya Rojava bi vî awayî serdema Îslamê bi dawî dike û ji aliyekî din ve Îslama Endulusê bi awayekî fizîkî tesfiye dike, û ji aliyekî din ve jî li dijî Osmaniyan Peymana Karlofçayê (1699) mohr dike; ji serê sedsala 18'an ve Osmaniyan ji ber deriyê Viyanayê dahf dide û heta bi Balkanan û ber bi Anatolyayê ve dibe. Encam, modernîteya navend Ewrûpa vebirrî pêk hatiye. Serdem êdî serdema Ewrûpaya Rojava yan jî rasterast a Ewrûpayê ye. Bi Ronesansê ya tê maneya ji nû ve bûyîn an jî vejînê, bi Refermasyonê ya tê maneya di dîn de kirina reforman, bi Rohnîbûnê ya tê maneya şoreşa di warê zanist û felsefeyê de, serdema modernîteyê bi gewde dibe û rengê xwe digire.

Modernîteya Ewrûpayê, bajarbûn, endustrî, teknîk, zanist û rohnîbûnê hemûyan di nava xwe de dihewîne, lê ti carî kapîtalîzmê di nava xwe de nahewîne. Heke mirov modernîteyê bi têgînên kapîtalîzm û bûrjûwaziyê re wekhev bike, ev yek wê bibe sedema tevlîheviyeke ciddî ya maneyê. Ji ber ku têgînên din hemû bi têgînên sereke ji rastiyên wan hatine dûrkirin di warê zanistên civakî de kêşmekêşî û geremoliyeke mezin çêbûye. Ji bo mirov vê kêşmekêşî û aloziyê ji holê rake, divê mirov van têgînan ji nû ve pênase bike.

Modernîte ne kapîtalîzm e, û nabe ku mirov wê bi bûrjûwaziyê re bike wekhev. Modernîte, tevahiya danehevên dîroka mirovatiyê ye, û beşê Ewrûpayê vê pênase dike. Dêhnê xwe bidinê, modernîteya li Ewrûpaya Rojava dîroka mirovatiyê hemû ji nû ve nivîsand, hem jî felsefeya ku bi giranî zanistî ye, hûnand, ji vê jî wêdetir felsefe hemû nisilandin û xulaseya wan xist destê xwe, teknîk ji nû ve bi kok pêk anî, zanist ji nû ve li ser bingehê paradîgmayekê danî û bi pêşketineke xurt gavên mezin avêtin.

Têkiliya navbera bazar û kapîtalîzmê hatiye belovajîkirin û hema bêje kirine wekhev. Beriya her tiştî divê em bibêjin, bazar-piyase kapîtalîzm nîne, rastiyek bi navê bazara sosyalîst heye. Tevahî hêmanên bûrjûwaziyê pêk tînin pêkhateya kastîk pênase nakin, ji ber vê jî bûrjûwazî kapîtalîzm nîne. Nabe ku mirov beşên weke zenaetkaran, dikandaran, xwediyê milkên piçûk û burokrasiyê yên bûrjûwaziya piçûk pêk tînin mîna hêmanên kastîk ên kapîtalîzmê pênase bike. Li vir a giring ew e, kujerên kastîk çawa bûne çîn. Hêmanên kastîk, dema ku xwe dikin çîn û xwe bi sazî dikin, hîleyeke mezin dikin. Ev zûrbeya piçûk a olîgarşîk ji sedî 1'ê nufûsa cîhanê ye, lê ji sedî 99'ê hatina wê dixwe. Ev her tiştî rave dike, lê sosyolojî vê pênase nake. Tişta ku em dixwazin bikin ev e, em dixwazin pêkhateya kastîk pênase bikin û diyardeya çînî rast analîz bikin.

Platon jî dîtiye ku hêmana kastîk di bin arîstokrasiyê de bi gewde bûye yan jî li şopên kastîk ên di nava arîstokrasiyê de hayil bûye. Pirsa ku divê em bikin ev e; "Hêmana kastîk çawa vediguhere arîstokrasiyê?" Platon bi pirtûka xwe ya bi navê 'Dewlet'ê bersivê dide

pirsê. Dibêje, kast vediguhere arîstokrasiyê, li şûna rêveberiya kastîk rêveberiya dewletê tê danîn. Destnîşankirina van detay û hûrgiliyan giring in. Sosyalîzma pêkhatî têgînên çîn û proleteryayê têra xwe bi kar anîn, lê ev têgîn di ravekirina rastiyê de qels in. Dibistana Frankfûrtê di warê çînî de hin rexneyên heq kirine. Bi vê manîfestoyê, qevdeke têgînên nû tê danîn, ev têgîn hem wê di pratîkê de xuya bikin, hem jî wê rewşa şîlo ya di dîrokê de ji holê rakin. Em bi van têgînan, hewl didin, pirsgirêkên Gramci û Negrî nikarîbûn ji navê derkevin, ji fîlozofên hemdem Zîzek û Badiou li çareya wan digerin, bersivê bibînin.

Bûrjûwaziya kastîk kapîtalîst civak ji komînalîteyê dewr girt. Ji ber vê, em dikarin bibêjin, komîna serdema navîn jî ne bûrjûwazî ye. Heta civaka sivîl a paşê li Ewrûpayê derket holê jî bûrjûwazî nîne; berevajî gel e, û piştre ji nava vî gelî netewebûnek derketiye holê. Hê li naverastê bûrjûwazî û kapîtalîzm tineye. Jixwe yek ji şaşiyên giring ên sosyalîzma pêkhatî kirî ew e; derketina netewe bi temamî bi bûrjûwaziyê ve girêdaye û weke encameke sîstema kapîtalîst lê fikiriye. Bûrjûwazî xisletên rastî yên komînê perçe dike, belovajî dike û bêdadiya di nava civakê de vedişêre. Têgihiştina li netewe ya bûrjûwaziyê amûreke îdeolojîk e, têkiliyên mêhtinkariyê vedişêre. Bi gotina "berjewendiyên hevpar" civakê dixapîne. Ev tê wê maneyê, netewe bi xwe ne bûrjûwazî ye, berevajî bûrjûwazî rastiya netewe belovajî dike. Kapîtalîzm vê yekê heta bi faşîzmê dibe.

Netewe, civaka demê ya modern e. Formasyona civakî ya modernîteyê civaka netewe ye. Forma serdema navîn a netewe, milliyet e. Bi şoreşa Îslamê re li Rojhilata Navîn milliyet bi pêş ketiye. Ji civaka qebîleyê derbasbûna ummetê, bi gotineke din, derbasbûna milliyetê bi Îslamê pêk hatiye. Di erebî de "millet" tê maneya "dîn", bi awayekî ji awayan meqsed Îslam e. Di serdema navîn de ji gavavêtina Mihemedî heta bi sedsala 16'an li dorbera hezar salê serdema hegemonîk li beşekî mezin ê dunyayê awayê hakim ummet e. Di serî de Ereb, Tirk, Kurd, Fars, Çîn û heta bi Ewrûpayê ya mohra xwe li forma civakî dayî ummet e. Xulase, serdema milliyetan dest pê kiriye.

Ji milliyet derbasbûna netewe berhema şaristaniya Ewrûpayê ye. Şaristaniya Ewrûpayê ji sedsala 16'an û pê ve weke civak karakterê hegemonîk wergirtiye. Formê civakî yê nû yê ji millet veguherî netewe, ekonomî, zanist, hest, wêje û felsefeya wê bi giranî li Ewrûpayê çêbûye û bi pêş ketiye. Mînak Hegel gavên mezin avêtine. Nîşanên wî yên di wêjeyê de bi awayê xwe yê herî baş di wêjeya Ûris de xuya dikin. Netewe dest pê dikin wêjeya xwe dinivîsin. Çawa ku netewe ne kapîtalîzm e, herweha bazar jî ne kapîtalîzm e, bi vî awayî em dikarin bibêjin, wêje jî ne berhemê bûrjûwaziyê ye. Em dikarin heta destpêka xwezaya civakî biçin û bazarê li wir bibînin. Di nava van bûyer û pêşketinan de netewe derketiye holê. Lewma şaşiyeke mezin hatiye kirin û ew jî ev e; bûrjûwazî û kapîtalîzm wekhev hatine dîtin. Bi vê têgînê re, derbasî modernîteya kapîtalîst dibin.

Em modernîteya Ewrûpayê û modernîteya kapîtalîst ji hevdu cihê dikin. Em dikarin derketina holê ya modernîteya kapîtalîst bibin heta bi derketina holê ya şaristaniyê. Şaristanî li qûntara Toros-Zagrosan derket holê, lê warê jê re bû dergûş Mezopotamya Jêr bû. Nûnerê mezin û pêşî yê şaristaniya dewletdar Sumer bûn. Bi awayekî bingehîn şaristanî li Mezopotamya Jêr rabû ser xwe û meşiya. Ya giring jî dewletbûn li Mezopotamya Jêr pêk hat, lê tevahiya hêmanên ku ew derxistin holê, li qûntara Toros-Zagrosan çêbûn.

Di serdema pêşî de para bêhtir bandora Sumeran heye. Lê eşkere xuya ye ku çanda li Girê Mirazan a Xirabreşkê bandor li Sumeran kiriye. Ev çand di heman demê de destpêka şaristaniya dewletdar e. Ji nivîsê heta bi tekel, çerx, avdanî, çîn û dewletê kîjan vedîtin û afirêneriya Girê Mirazan an jî Sumeran e, ev cihê guftûgoyê ye, û hêja ye ku mirov pê dakeve.

Çanda Girê Mirazan a Xirabreşkê li dorbera salên 15000-12000 B.Z. pêk hatiye. Qonaxa şaristaniyê ya Sumeran li dorbera salên 5000-4000 B.Z. pêk hatiye û li dema Med-Persan a weke destpêka serdema şaristaniya klasîk tê qebûlkirin bi dawî dibe. Bi gotineke din, Girê Mirazan a Xirabreşkê û Sumer şaristaniya serdema antîk, Med-Pers jî destpêka derbasbûna şaristaniya serdema klasîk pênase dikin. Şaristaniya serdema antîk, salên 612 B.Z. kengî Med-Pers Asûran hildiweşînin bi dawî dibe. Di navbera herdu şaristaniyan de cudahiya bingehîn ew e, li şaristaniya serdema antîk bi giranî mohra pêkhateya kastîk heye ku xwe disipart sîstema qral-xwedayan, lê Med-Pers ew şaristanî ne, mohra arîstokrasiyê lê heye. Împaretoriya Med-Persan jî kengî şaristaniya Grek bi pêşengiya Skender heta bi Hindistanê dagir kir, bi dawî bû.

Qonaxa serdema pêşî ya şaristaniyê têra xwe giring e, û di vê qonaxê de ji cihê maka xwe ji Mezopotamyayê hatiye. Wekî din, şaxên wê, Misir, Hindistan, Girît, Hitît, Îskît û Çîn hene. Şaristaniya serdema pêşî bi kêmanî dîrokeke wê ya 3000 salî heye. Xisletên kastîk ên şaristaniya serdema pêşî diyar in. Li dorbera salên 3000-2000'î B.Z. "sîstema arîstokratîk" weke dij-şoreşekê derdikeve holê. Çawa ku neolîtîk û şaristaniya kastîk li qûntarên Toros-Zagrosê derketin holê, sîstema arîstokratîk jî maka wê Toros-Zagros in. Ev jî şoreşa qutbûnê ye, qutbûna ji Mezopotamyayê ya ku bi giranî dîroka mezin da destpêkirin û mak e. Yê di şaristaniyê de gav avêt û ji serdemekê qut bû, Skenderê Mezin e ku li nîvgirava Grek derket holê û şagirtê fîlozofê mezin ê Arîsto ye. Ji Şerê Granîkosê heta bi şerê dawî yê li Hindistanê hewldanên Skenderê Mezin her dewam kirine.

Ya rastî, pêvajoyeke derbasbûnê heye. Ji vê pêvajoyê re pêvajoya Helen dibêjin. Têkelbûna medeniyetên Rojhilat-Rojava pênase dike. Skender li tişta ku dike, ewqasî serwext e, deh hezar eskerên Helen bi deh hezar jinên Persî re dizewicîne. Ew bi xwe jî zewaceke bi heman awayî dike. Dema Helen, qonaxeke derbasbûnê ye, û weke senteza Rojhilat-Rojava bi kêr tê. Şaristaniya Helen bi qasî sêsed salan dewam dike û bi vê re Rojava mezin dibe. Roma vê mezinbûn û bilindbûnê hezar salan didomîne.

Roma, hîmên bingehîn ên şaristaniya Rojava ya îro yek bi yek datîne. Ronesans, bi pêşengiya Îtalya îro li Ewrûpaya Rojava bi pêş dikeve. Ji vê re, Cenova, Venedîk û Floransa pêşengiyê dikin. Paşê derbasî Amsterdamê dibe; herî dawî salên 1500'an bar dike Londonê. Bi vî awayî, dibe şaristaniyeke li keviyên Okyanûsa Atlasê hiltê. Beşekî wê li Rojhilatê Derya Spî, bi giranî jî li Ewrûpaya Rojava bi gewde dibe. Berê, çawa ku li Misrê, li geliyê Îndûsê, li tejaneya Dîcle-Firatê û li Tengava Besrayê şaristanî bi gewde bûn û bi pêşketin, li Ewrûpaya Rojava jî şensê pêşketinê bi dest dixe û salên 1500'î P.Z. vê vebirrî dike.

Baş e, jêder û çavkaniyên ku şaristaniya Ewrûpaya Rojava xwedî dikin çi ne?

Divê em ji bîr nekin ku tevahiya mîrateya şaristaniya Rojhilat, birine Rojava, ango derbasî parzemîna Ewrûpayê kirine. Mînak seyah û gerokê navdar Marco Polo salên 1270'î çûye Çînê, ji xanedanê Çînê re wezîrtî kiriye û tiştên ku ji wir girtine, bi xwe re birine Îtalyayê. Seyah û gerokên bi heman awayî têra xwe li Anatolya û Mezopotamyayê geriyane û tiştên ku ji van deran girtine, bi xwe re birine Îtalyayê. Seferên Xaçiyan jî bi roleke heman rengî rabûne. Ji teknîkê heta bi rêbazên deryavaniyê, ji zanistê heta bi bajarbûnê, ji ekonomiyê heta bi felsefeyê, û heta bi dîn, çi dîtine ji Rojhilata Navîn birine Rojava ango Ewrûpayê.

Xiristiyantî dînekî Rojhilata Navîn e. Mûsewiyan bi Romayê re têra xwe daye û stendiye û wan pê re bazirganî kiriye. Tew Misilmanan ji salên 700'î ve li dorbera 750 salan li herêma Endulus a Spanyayê şaristaniyek afirand. Ewrûpa yekser ji Endulusê sûd werdigire. Nirxên şaristaniyê hemû bi Osmanî û Selçûqiyên Anatolyayê derbasî Balkanan û Ewrûpayê dibin. Cengizxan, di ser Derya Reş re derbasî Polonyayê, ji wir jî derbasî Ewrûpayê kiriye. Gelek nirxên şaristaniyê yên li Ewrûpayê bi temamî ji Rojhilat hatine veguhestin.

Ji Rojhilata Navîn yek ji berpala herî bi hêz a sîstema şaristaniyê ya derbasî Ewrûpayê bûye şaristaniya Îslamê ye. Şaristaniya Îslamê medenîbûn e. Medîne bi erebî maneya xwe bajar e. Bajarê Medînê yê îro, beriya Îslamê navê xwe Yesrîb e. Ji ber ku medenîbûna li nîvgirava ereb mezin kiriye, navê wê ji Yesrîbê kirine Medîne. Ev jî Ereban dike pêşengê demê. Ev serdem, di navbera serdema pêşî û serdema nû de dibe pir û wan bi hevdu ve girê dide. Lewma jê re serdema navîn tê gotin. Ji sedî sed serdema navîn mohra Îslamê lê ye. Ji salên 600'î P.Z. heta bi salên 1600'î bi qasî hezar salan, di asta kurewî de mohra Îslamê lê ye. Ev qonaxek e. Giring e ku Hz. Mihemed ji aliyê dînî heta bi aliyê xwe yê felsefî rast were tehlîlkirin.

Dînê Îslamê ji serdemên pêşî heta bi Xiristiyantî û Mûsewîtiyê senteza deman hemûyan e. Pêxember bi xwe gotibû, "Ez pêxemberê dawî me ango pêxemberê axirzeman." Maneya van gotinên wî ev e: Serdema dîn diqede. Û li cihê ku dîn diqede, Îslam heye. Pêxemberê dawî jî Hz. Mihemed e.

Serdema şaristaniya dînî û fikira dînî ya rastî temam dibe. Qonaxa herî bilind a şaristaniya dînî, dema Emewiyan a bi pêşengiya Muawiye ya navend Şam bû. Di heman demê de felsefeya Îslamê herî zêde di vê demê de payeberz bûye. Bi pêşengiya Muawiye, Îslam têra xwe mezin bû û sala 1492'an li Spanyayê bi dawî bû. Di xelek û rêza dînên Brahîmî de Îslam pêngava dawî ye. Ji bo Osmaniyan jî mirov dikare qala heman rewşê bike. Îslamê bi Osmaniyan xwestiye temenê xwe dirêj bike. Ya rastî, têkçûna Osmaniyan a li ber Viyanayê têkçûna Îslamê ye. Û ya ku vê dibe serî, modernîteya Rojava ye. Çawa ku serdema pêşî bi felsefeya Yewnan, teknolojiya sîlehan û zanistê bi dawî bû; felsefe û zanista li Rojava Xiristiyantiya di bin bandora Îslamê de reforme kir û bi vî awayî serdema navîn a Îslamê bi dawî kir. Dema ku Nietzsche dibêje, "Xwedê mir" meqseda wî mirina fikira yek xwedayî ye. Û encam têkçûna Îslamê ye. Ya ku ev kir jî fikira felsefî, serdestiya zanistî û teknîkê ye.

Şaristanî cara yekemîn li Rojhilata Navîn veguherî, û cara dudiyan jî li Atîna û Romayê veguherî. Cara sisiyan ango veguherîna mezin li Rojava ye. Nexasim, Rojavayiyan çanda ku di ser Îslamê re wergirt, nû kirin û xweş veguhertin. Bi vê, şaristaniya Rojava derket holê û em ji vê re dibêjin, "modernîte".

2-Kapîtalîzm û Sosyalîzma Pêkhatî

Modernîteya kapîtalîst aktîvîteyeke cerdevanî û çetetiyê, talankerî û şêlandinê ye; Hollanda û Ingilistanê pêşengiya wê kir. Korsan û cerdê bi navê Gambot ê Ingilîz bi keştiyên xwe sermayayê dibe Ingilistanê û ev jî bi xwe re rê li sîstema kapîtalîzmê vedike. Dema ku em li dîrokê dinêrin, em dibînin ku sîstemek e; ji sedsala 16'an ve heta roja me ya îro serdestî di destê wê de ye. Çetetiya ku em jê re dibêjin sîstema Anglo-Sakson roja me ya îro jî dewam dike. Gava ku hûn dêhna xwe baş bidinê, hûn ê bibînin ku ev sîstem a talan û şêlandinê ye. Lê ji bo ku xwe rewa bike, kirasê modernîteyê li xwe kiriye. Bi vî kirasê rewakirinê yê serdema modern xwe veşartiye. Derketina xwe ya holê weke vejînê, weke jinûvebûyînê nîşan dide. Çetetî û cerdîtiya kapîtalîst, maskeya modernîteyê daye ber rûyê xwe. Pêvajoyên Ronesans, Reformasyon û Rohnîbûnê weke maske bi kar anîne û xwe bi wan veşartiye. Dibêje, ne talanker û cerd e, berevajî îddîa dike ku Ronesans, Reform û Rohnîbûn berhemê wê ne. Tevî ku cewherê wê ne wisa ye jî maske li rûyê xwe xistiye û daketiye meydanê.

Di beşên berê de me qala sîstema kujerê kastîk kiribû. Roja me ya îro kujerê kastîk sîstema kapîtalîst e. Ev tesbîteke giring e, tesbîteke bi îddîa ye, û hêja ye ku mirov wê guftûgo bike. Pirsa ku divê em bikin ev e; 'Gelo hêmana kastîk li dorbera salên 15000 B.Z. li Girê Mirazan a Xirabreşkê xwe bi rêxistin kir û şaristaniya xwe afirand?'. Ev babetek e, hêjayî

guftûgokirinê ye. Şopên kastê li naverastê xuya ne. Ji Hindistanê heta bi Çînê, ji Emerîkayê heta bi her deverê şopên wê hene.

Rewşa li Sumer, Misir û Çînê, divê mirov weke serdemên piştî pêşketina li Girê Mirazan a Xerabreşkê bibîne. Pêşketina li Girê Mirazan û piştî wê, li Sumer û Misrê veguheriye nivîsê, sîstemê û dewlet-bajêr. Ev ên ku me qala wan kir, bi qasî ku hewce nake, divê mirov rol nede wan. Qonaxa dawî ya arîstokratîk qonaxa Greko-Romen e. Qonaxeke gelekî mezin, giring û bi bandor e. Bi pêşketina aqil û şêwazê fikirê yê felsefîk, mirov dikare vê qonaxê weke pêşketina dewleta ku xwe disipêre aqil bibîne. Bi vê qonaxê, têgihiştina li dewletê ya xwe disipêre zêhniyeta kastîk li dawiyê tê hiştin. Vê pêkhateya kastîk bi hezar salan li peravên Dîcle-Firatê dewam kir. Li tejaneya Nîlê herî kêm sê hezar salan hebû. Li Çînê ji salên 1500 B.Z. heta bi salên 500'î B.Z. dewam kir. Li Hindistanê jî rewş bi heman awayî bû û hê jî şopên kastîk lê xuya ne.

Li cem şaristaniya pêşî sîstem, li cem Sumeran qral û xanedan jî kastîk in. Ev sîstemeke wisa ye, wexta ku yek ji wan dimire, tevî wî berdestiyên wî jî dixin bin erdê û vedişêrin. Arkeolog Leonard Woolley li sîteya "Ûr"ê erd kola ye, û di vê erdkolanê de dîtiye; qralên mirine tevî berdestî û suxrekarên wan hatine veşartin. Cariye hemû bi saxî li cem qral xistine bin erdê. Tew hin qralan tevî xwe erebeya xwe jî xistine qebrê. Wexta ku arkeolog vê dibîne, vediciniqe, tesewir bikin, 600-700 kesan bi saxî dixin bin erdê! Qral an jî serek, dema ku dimire, suxrekar û berdestiyên wî, malê wî û cariyeyên wî, pê re bi saxî dixin bin erdê. Ha tişta ku em jê re dibêjin, kujerê kastîk ev e, sîstemeke bi vî awayî ye. Canê berdestî heye tineye ev giring nîne, jixwe bi nirx jî nîne. Ew beşek ji qral in. Ji ber ku canê wan tineye, ew nabêjin, "canê min diêşe" û jixwe nikarin bibêjin jî. Li qesrên Osmaniyan jî bira bira dikuje û ev jî têkiliya xwe bi vê rastiyê re heye. Padîşah kurê xwe jî dikuje. Mihemedê III. tevî kurê xwe 18 merivên xwe bêperwa dikuje. Piraniya kuştiyan zarok in, lê wan hevparê deshilatê dibîne. Qanûnî Silêman, şehzade Mistefa bi awayekî pir bêrehm dikuje. Ev hemû, kirinên kujerê kastîk in.

Li qûntara Toros-Zagrosan derketina holê ya arîstokrasiyê pir balkêş e. Vê babetê bala me jî kişand û em pê daketin û me dît, li cihê neolotîk derketiye holê arîstokrasî jî li qûntarên hundir ên Toros-Zagrosê yan jî li girên wê yên jor derketiye holê. Em îro jî şopên vê rastiyê dibînin. Baş e, wexta ku ji vê kastê çîn zêde bibe wê çi bibe? Em bi sîstema arîstokratîk dikarin bersiva vê pirsê bidin. Erê, arîstokrasî bi sazîbûneke dîrokî ye, nûbûnek e, lê em baş dizanin ku pêşiyên wan tim kujerên kastîk bûn, qral-xweda bûn. Em bi kîjan awirî li meseleyê binêrin jî em ê vê rastiyê bibînin.

Çima pêkhateyên kastîk hewce dîbînin ku bibin çîna arîstokratîk? Sedema pêşî zêdebûna nufûsa wan bû, sedema diduyan jî zêdebûna derfet û dewlemendiya wan bû. Em dikarin ji kastê re 'elît 'jî bibêjin ango kesên bijarte û neqane. Ya rastî, ji têgîna elîtê meqsed kast bi xwe ye. Nivîskarê teoriya navdar a "bijarteyan" Parettoyê V. bi têgîna elîtê qala dîrokê dike û dibêje, "Dîrok ji şer û pevçûna elîtan a navxweyî pêk tê." Li şûna têgîna şerê çînî, têgîna şerê elîtan tîne. Li gorî me jî ev pênasekirina wî bêhtir rast e. Lê ew weke me jê re nabêje, kujerê kastîk, ew dibêje, elît û bi vî awayî wan mezin dike. Çawa ku Marks çîn mezin kir, wî jî elît mezin kir û ev jî me ji wan cuda dike.

Elît hê jî heye û di nava kapîtalîzmê de berbiçav xuya ye, heke mirov binê vê têgînê bikole, mirov ê komeke kujeran bibîne. Li vir, divê em bersiva pirsekê bidin, ew jî ev e; em ê cudahiya di navbera kast û çînê de çawa fêhm bikin? Sosyolojiya dîrokî divê bersiva vê pirsê bibîne û bersiva wê li guftûgoyê vekiriye. Kast pêkhateyeke xwedî pîvanên hişk e, nerm nîne, hîmên xwe bi xwedabûnê datîne û hêza xwe ji vê digire, eşkere şiddet û zorê bi kar tîne, xwedî şêweyekî wilo yê hiyarerşiyê ye ba di ber re naçe. Çîn ji nava pêkhateya kastîk pir paşê

derketiye holê; ji wê nermtir e, ba di ber re diçe, ango ji çîneke din digire nava xwe û normên xwe çêkirine. Heke sosyolojî ji vê rastiyê dûr bi dîrokê dakeve û weke şerê çînan pênase bike, wê demê wê ser rastiya civakî binixumîne.

Yê ku herî zêde ev şaşî kiriye Marks e. Marks di dîrokê de pêkhateya kastîk têra xwe nedîtiye û nekarîbûye pênasekirina çînî di çarçoveya rastiya dîrokî de bike. Di teoriya Marksîst de têgînên weke "nirxê zêde (mayeyê zêde), "heqdest, rant" gelekî têne bilêvkirin û ev têgîn vedîtinên ekonomîk-polîtîka Ingilîz in. Bi van, dixwazin desteserkirin, destavêtin û mêhtinkariyê bi têgînên zanistî rewa bikin. Tişta ku em dikin pirsgirêk jî ev e. Jixwe kapîtalîzm bi desteserkirin, talan, mêhtinkarî, şêlandin û şeran derket holê. Dewleta netewe ji serî heta binî şer e. Hema bêje, dewleteke netewe tineye ku bi şer nehatibe avakirin û bi şer hilneweşiya be. Dewleta netewe ji ser ta pê berhemê şiddetê ye, û beşekî kêm ê ku şiddet ji xwe re kiriye pîşe, weke elît tê binavkirin. Ma ne, ew jî hêmanekî kastîk in. Elîtên ku em qala wan dikin, bêyî şiddetê hîç nikarin li ser piyan bimînin, lewma kujerê kastîk ê modern kapasîteya xwe ya mêhtinkariyê bi rêbazên eskerî zêde dike. Çi seyr e, sosyologan çawa nekariye vê heqîqeta dîrokî rast bibînin. Sedema vê, têkiliyên navbera zanist-desthilatdarî û hiyerarşiyê ne. Li gorî vê hiyerarşiyê 'zanîn-agahî hêz e, zanîn-agahî wê li cem hêzê be, xizmetê ji wê re bike. ʾDi çarçoveya modernîteya kapîtalîst de ev îro jî bi vî awayî ye. Kî xwediyê akademiyê be, xwediyê zanîn-agahiyê jî ew e.

Em ê cudahiya navbera arîstokrasî û kastê çawa diyar bikin? Arîstokrasî li gorî kastê sazîbûneke bêhtir bi organîze ye, û tebeqebûneke pirberfireh temsîl dike. Koma kujerê kastîk bi dizî tevdigere, bi maske ye û mîna mar bi hedefa xwe vedide. Ya din jî bêhtir nêzî mirovxuriyê ye. Di arîstokrosiyê de mirovxurî tineye, lê hêmanên kastîk mirovxur in. Cinawiriyên bi vî awayî yên kujerên kastîk hene. Yanî wekî din jê re elît tê gotin, lê her serdem elîtên xwe hene. Kast û elît bi temamî wekhev nînin. Entelektuel jî elît in; û mirov dikare xanedan, perwerdekar û bijîşkan jî elît bihesibîne. Lewma têgîna elît ji bo vê kêm dimîne. Ji ber vê, em li têgîna rast digerin, loma em navê wê nakin sermaye, em jê re dibêjin, kujerê kastîk an jî koma kastîk; bi vî awayî em vê têgînê, vê babetê li guftûgoyê vedikin. Teqez, ev mijar wê rê li ber gelek guftûgoyan veke. Ew ê gelekî giring be ku sosyolog bi taybetî jî Marksîst li ser mijarê guftûgo bikin.

Maka tevahiya pirsgirêkên ku civak ji civakbûnê derxistine, pêkhateya kastîk e. Marks vê bi sermayedariya kapîtalîst ve girê dide. Tevî ku gotiye, "ez nakokiyan eşkere dikim", lê ser vê rastiya dîrokî girtiye, heta ji polîtîkayê şuştiye û wisa rave kiriye. Hemin ev bi zanebûn nekiriye. Anarşîstan jî ev yek gotiye, û di gotina xwe de hîç ne neheq in. Hewce ye, û gelekî manedar e ku ev vegotin xurttir bibe û vegotineke bi vî rengî ya materyalîzma dîrokî çêbe.

Em li kapîtalîstekî bifikirin, ew bi şev û roj çi dike? Bi giranî, ew şer plan dike û dide destpêkirin. Şerê Cîhanê yê Yekemîn, encama tengasiya ku sermaye ketibûyê û pêxîrtengiya kapîtalîzmê bû. Çawa ku di tengasiya 1929ʾan û şerên din de hat dîtin. Divê sosyolojî vê rave bike. Em sosyolojiya dîrokî dikin û em bi vê hewl didin ku heqîqetê bidin rastiya dîrokê. Bûdha dibêje, "heta tu xencera di pişta xwe de dernexînî, tu nikarî bi tiştekî din re bilebikî." Hema bêje, sosyolojiya me jî tiştekî wisa ye. Heta xencera ku kujerê kastîk di pişta civakê de çikandiye neyê derxistin, ti pirsgirêka civakî çareser nabe. Jixwe sosyolojî nikare her tiştê derbarê civakê de binivîse û îmkanê vê jî nîne. Jixwe, ji ber vê, eleqe ji bo sosyolojiya heyî çênabe. Gelek tiştan derbarê civakê de dibêjin, lê ya rastî bi awayekî cewherî ti tiştî nabêjin.

Ji serî heta binî, hêza ku her tiştî dike, kujerê kastîk e. Ev awa pênasekirin, dibe ku xirab were bikaranîn, lê em bi awayekî serwext misêwa wê bi kar tînin û têkiliya wê bi têgîna çînî re datînin. Rastiya çînî heye, lê ew jî awayekî kastê yê bêhtir bi sazî bûyî ye, hovîtiyên wê gelek in, lê awayekî kastîk e, bûye sazî û şaristanî. Ji ber vê sedemê, 'şoreşa ʾarîstokratîk

gelekî giring e. Bi pêkhatina arîstokrasiyê re, bi temamî motora serdema pêşî û navîn pêk hatiye. Tesbîta "şerê çînî" şaş nîne, lê ji ravekirinê dûr e. Hêmana kastîk, di şexsê arîstokrasiyê de şiklê xwe guhertiye û xwe kamûfle kiriye. Arîstokrasî xwe disipêre daneheva dîrokî ya kastê, lê wê cihêreng û berfireh dike. Ev çîn, dike ku kast bêhtir bi tehlûke bibe û bêhtir karibe bi awayekî giştî hukim bike. Ji koma kastîk ne cuda ye, ji wê ye.

Ev sîstema arîstokratîk bi awayekî berfireh û bi kok li tevahiya cîhanê belav bû û gelek rastiyên civakî çêkirin. Dînên yekxwedayî, sîlehên ji misê zer, erebeyên şer ên bi du çerxan û gelek pêşketinên din ên teknolojîk, ji wê rojê heta roja me ya îro berhemên dema arîstokratîk in. Weke koleyê wî serf jî çêbûn. Hemin van hemûyan rê li ber şeran û bûyerên mezin vekir. Kujerê kastîk weke nêçîrvanekî ye, arîstokrasiyê ew bi sazî kiriye, hem îdeolojiya wî hem jî pêkanîna wî xurt kiriye.

Di nava arîstokrasiyê de zêhniyet û îradeya kastîk bi awayekî veşartî heye. Ya rastî, arîstokrasî rewşa nû ya kastîk e. Em hewl didin, kujerê kastîk bi awayê wî yê îro pênase bikin û nîşan bidin ka çi reng e. Heye ku kujerê kastîk ê roja me ya îro jî kujerek be. Dibe ku di hin rewşan de bi vî awayî nebe, lê ji destpêka dîrokê ve di cewherê wî de kujerî heye. Ji dema revdeyên nêçîrvanan ve, hovîtî û xeternakiyeke wî ya dijwar heye heta roja me îro tê, naqede û mohra xwe li tevahî serdemên dîrokê xistiye. Yan na, hûn nikarin evçend şeran, talanê; vê koletiya xeternak û rewşa heyî ya jinan rave bikin. Hûn ê nikaribin gelên neçar, gundiyan û proleteran rave bikin. Em dikarin van rewşan hemûyan tenê bi kujerê kastîk bi nav bikin û bi şirovekirina wî rave bikin. Tevahî şerên di dîrokê de bînin ber çavê xwe; hûn ê bibînin li cem ti cureyê heywên talan û şerên bi vî awayî tinene.

Wexta ku Marks qala vê dike weke pêşketineke dîrokê qal dike, lê ya rastî ev pêşketin nîne. Koma kujeran bi vê, pir bi awayekî kûr civakê bi şêweyekî cinayetwarî diqelêşin û dikin du şeq ango parçe dikin. Ev mesele di dîn de weke meseleya Habîl-Qabîl cih digire. Dîn dixwazin bi vî awayî qala vê meseleyê bikin. Dîn bi awayekî eşkeretir qala şiroveya kujerê kastîk dike. Dînên yekxwedayî çavên xwe li vê rastiyê negirtine. Dînên yekxwedayî saziya pêxemberiyê mezin dikin û bi vê, hewl didin kujerê kastîk bi sînor bikin. Lê dîsa jî nikarin kujerê kastîk têra xwe bi sînor bikin, tenê dikarin reforme bikin. Lê mirov vê ji bîr nakin. Hê jî dibêjin, pêxember û tiştekî din nabêjin. Mûsa, Yûsiv, Yaqûb û Hermes, ev hemû li qesrên Misrê pêxember bûn û kirina wan a sereke bi sînorkirina Firewnan bû. Ev nîşane ji me re eşkere dikin ku mezinkirina arîstokrasiyê, armanca wê bisînorkirina hêmanê kastîk e.

Divê eşkere bibe ka kujerê kastîk çawa derketiye holê. Girava Ingilistanê berê giraveke korsanan (çete-cerdevan) bûye û koma kastîk a li vir bûye kapîtalîst, eşkere ye ku teknolojiya herî baş bi kar aniye. Korsan her tim di nava giravê de tevdigerin; hemin sîlehên herî baş di destê wan de ne û ev herdu jî li Ingilistanê hene. Ev kapîtalîzm ji çîna modern bûrjûwaziyê çêdibe. Çawa ku arîstokrasî ji kujerên kastîk çêbûye, bûrjûwazî jî hinekî ji arîstokrasiyê, lê bi awayekî bingehîn ji kujerên kastîk ên xwe nixumandî yan jî veşartî çêbûye. Bûrjûwazî jî çîneke afirîner nîne. Ev serketinên zanistî û teknîkî berhemên bûrjûwayê nînin. Bûrjûwazî ji kujerên kastîk ên xwe nixumandî û veşartî çêbûye. Çîroka Marks a derbarê bûrjûwayê de, mesele berevajî û belovajî kiriye, nehiştiye mirov rast meseleyê bibînin. Bi giştî kapîtalîzmê kiriye meseleyeke zanistî; bi taybetî jî 'çîn' û 'nirxê zêde ʾweke zanist bi nav kiriye. Eşkere ye, bi vê nêzîkatiyê korsan û kujer veşartine, û qaşo li ser esasê zanistîbûnê ketiye xefika ekonomî-polîtîka Ingilîzan. Divê mirov tesbîta Rêber Abdullah Ocalan a ʿzanistperestî nexweşiyek e ʾdi vê çarçoveyê de bibîne.

Îca, eger em meseleyê di vê nuqteyê de rexne bikin, em ê vê koma xiniz a kapîtalîst baştir pênase bikin. Çawa ku Marks gotiye, ʿdaneheva sermayeyê', yan jî weke Lenînî gotî, ʿqonaxa dawî ya emperyalîzmê têra me nakin, binavkirinên bi vî rengî jî têra xwe meseleyê rave

nakin. Lewma me dewleta netewe xist rêza pêşî û em ê ji wê dest pê bikin. Ev kujerê kastîk hewcedarî dewleta netewe ye, û mirov ji vê hewcedariyê têra xwe hîn dibe. Vê carê, kujerê kastîk bi kirasê dewleta netewe derketiye ser dikê û vê lîstika wî ya li ser dikê encam girtiye. Ji pêncsed salî ve wekî axtepotekî (heştpêyekî) şax vedaye û ev bi saya dewleta netewe pêkan bûye.

Di navbera dewleta netewe û modernîteyê de têkilî û pabendiyeke xurt heye. Tam jî di vê nuqteyê de, divê têgîna modernîteya kapîtalîst şaş neyê fêhmkirin; ji ber ku sifetê ‘çîna kapîtalîst a modern ’dibe sifetekî xweşbexşiyê yan jî binavkirina ‘modernîteya kapîtalîst ’ku me jî gelekî bi kar anî, lê ji bo kapîtalîstan sifetê herî guncav ‘kujerê kastîk ’e. Dibe ku modern bin, lê ev sifetê wan ê kujerê kastîk ji holê ranake. Kujer kincên normal li xwe dikin û li nava civakê digerin, ev kes jî bi vî awayî ne. Heta niha bi vî awayî qala kapîtalîzma modern nehatiye kirin û bifikirin, bi modernîtiyê sernixumandina kapîtalîzmê çiqas bandoreke mezin li zanyaran kiriye. Kujerê kastîk entelektuel bi qesrên xwe ve girêdane û hêja ye ku mirov lêbikole ka ew çawa li ber deriyê xwe girêdane. Ango divê mirov têgîna modernîteya kapîtalîst li ser bingehê vê şiroveyê qebûl bike. Ji bo ku mirov nekeve şaşiya Marks, divê mirov çarçoveya modernîteya kapîtalîst rast deyne û bi kar bîne.

Sîstema arîstokratîk a li tejaneya Dîcle-Firatê bi xisleta xwe ya dij-şoreşê derket holê, ji pêkhateya kastîk veqetiya. Jixwe pêkhateya kastîk jî li vê cografyayê derketibû holê. Bi sîstema arîstokratîk pêkhateya kastîk neçarî veguherînê bûye. Herçiqasî bermahiyên pêkhateya kastîk di dema Împaretoriya Persan de dewam bikin jî piştî şoreşa felsefî ya li cem Grekan bi bandora teoriya dewletê, modeleke dewletê ya rasyonel û arîstokratîk derdikeve holê. Şopên pêşî yên kapîtalîzm û bûrjûwaziyê li vir hene. Lê li vir rewşek heye, hê nû ji dergûşê derketin, belavbûn û berfirehbûnê pênase dike. Van bûyeran serdema navîn a Îslamê bi temamî xist bin bandora xwe. Bazirganî, zanist, fikira dewletê, bajarbûn, deryavanî û pêşketinên din hemû derbasî Rojava hatine kirin. Ev tişt hemû, senteza wan çêdibe û ev sentez rê li ber modernîteyê vedike; kapîtalîzm jî nava vê dikeritîne, pûç dike.

Rola van bûyer û pêşketinan hemûyan di rêveçûna dîrokî ya kujerê kastîk de heye. Împaretorên Romayê bi giranî xwedî xisletên kastîk in. Sezar û Skender dikin nakin, nikarin biryarê bidin ka divê insan ji wan re bibêjin mirov an jî xwedê, ev rewşa wan mînaka herî berbiçav a îdeolojiya kastîk e. Sezar dikin xwedê, jixwe muhafezekarî, tiştekî bi vî awayî ye. Moxol bi piranî kast in. Çarên Ûris û Împaretorên Çînê jî kastîk in. Li Efrîkayê jî rejîmên kastîk ne kêm in. Li parzemanî Emerîkayê Înka eşkere kastîk in. Mirovan dikin qurban. Li gorî ku tê gotin, salê 20 hezar mirovî dikin qurban û ev kirineke kastê ye.

Îslamê derb li pêkhateya kastîk daye. Derketina holê ya Îslamê antî-kastîk e. Herçiqasî bermahiyên Yewnan û Romayiyan li nav hebin jî antî-kastîk e. Tevî ku li cem damezirîneran xisletên kastîk hene jî li cem pêkhateyên jêr zanist, siyaset û felsefe bi pêş ketiye û vê yekê çanda qral-xwedayan a îdeolojiya kastê hilweşandiye. Jixwe Hz. Mihemed ev şoreş kiriye. Gotiye, “Kes nikare bibe şirîkê sifetê Xwedê.” Derba herî xedar li pêkhateya kastîk daye. Kî şirîkiyê bi Xwedê re bike, divê kuştinê li ber çav bigire. Li gorî Hz. Mihemed qanûna bi tenê ya nabe were nîqaşkirin ev e. Li ser vî hukmî hem bandora kastê heye hem jî kastê tine dike. Ellah bi temamî mucered e, nayê dîtin. Heta kesê xwe qral-xwedê ragihîne yekser têk dibe. Îslamiyet derba kuştinê li têgihiştina qral-xwedê dide. Di vê çarçoveyê de, em dikarin bibêjin, Îslamiyetê derbeke xedar li pêkhateya kastîk daye û pir bi xurtî zêhniyeta wê şikandiye.

Bermahiyên kastê kapîtalîstên Rojava ne. Kasteke ji mirovxurên panzdeh hezar salî zêde bûyî heye û nûnerê wan ê dawî kapîtalîzma Rojava ye. Hûn wisa nenêrin, nav di wan de hil didin û dibêjin “kapîtalîstên afirîner”, ev hemû çîrok in. Marks di vê mijarê de şaşiyeke mezin kiriye û lewma em wî rexne dikin. Li şûna ku mirov kapîtalîzmê weke afirînerê dewletê,

pîşesaziyê û zanistê pênase bike, rasttir e ku mirov wê weke nûnerê dawî yê kujerê kastîk pênase bike.

Mînakên dawî yên kujerên kastîk kapîtalîst in. Ew kujer in. Pêşengên pêşî yên kapîtalîstan Ingilîz in. Ingilîzên kapîtalîst bi Gamgotan re korsaniyê dikin û bi wan sermayeyê kom dikin. Sermayeya pêşî jî bi vî awayî ango bi talana ku bi Gambotan re dikin, tînin girava Ingilistanê û bi lez xwe dikin çînek. Navê vê çînê jî bûrjûwaziya fermî ye. Ya rastî, di her serdemê de karîbûye xwe bike çîn. Ev pêkhateyên nîv-kastîk û kujer in; korsan û cerdevan in. Li kê rast tên dikujin û serweta wan desteser dikin. Hin rêbazên wan ên din jî hene. Mînak li dora erdan çîtan datînin û qada jiyanê li gundiyan teng dikin. Bi vî awayî dest datînin ser cihûwarên ku gundî pê debara xwe dikin. Dest datînin ser erd û zeviyan; li gorî xwe bi darê zorê bi kar tînin. Bi vî şêweyî gundiyan ji erd û zeviyan qut dikin. Gundiyên li naverastê dimînin, neçar ji bo wan şivantî yan jî gavantiyê dikin û yan jî karên bi vî rengî dikin. Mînak yek ji van karan jî tekstîl e. Kesên li naverastê mane di tekstîlê, tevnê û cawkariyê de têne xebitandin û bi vî karî têra xwe sermayeyê kom dikin. Tevî ku tevn û cawkarî ji karên berê yên rêûresmê bûn jî wan ev kir amûrekî mezin ê kara zêde. Naxwe teknîka tevn û cawkariyê wan venedîtiye, teknîka di vî warî de pir berê di serdemên kevin de heye.

Van kapîtalîstan bi darê zorê nirx û hilberînên şaristaniyê desteser kirine. Di warê şaristaniyê de pêşketinek heye, lê ronesans û modernîte ji aliyê kapîtalîzmê ve nehatin afirandin, berevajî kapîtalîzmê ew desteser kirin. Rastî ev e. Reformasyon jî ne ku kapîtalîstan kir, ehlê dîn rahiban kir. Pêşengên mîna Luther, Munzer û Kalvîn ne kapîtalîst in, rahib û komînalîst in. Ji aliyê dînî ve jî yên rê li modernîteyê vekirin, ev kes in. Vedîtinên zanistî-îdeolojîk, keşfên zanistî ne berhemên kapîtalîzmê ne; berevajî ev hemû, hema bêje, bi hewldanên esnafên xizan û zanyaran derketine holê û berhemên wan in.

Dewlet û dewleta netewe derdikevin holê û mezin dibin, di şeran de sîlehên bi barûtê û diteqin têne bikaranîn û bi lez bi pêş dikevin, ji van hemûyan jî giringtir modeleke nû ya dewletê derdikeve holê. Em pir bi dengekî bilind dikarin bibêjin, medeniyeta Rojava bi dewleta netewe dest pê dike. Dewleta netewe nebûya, kapîtalîzm bi ser nediket. Encama em gihiştinê ev e; kapîtalîzm dewleta netewe dernaxîne holê, dewleta netewe wê derdixe holê. Dewleta netewe diyardeyek e, li dora modernîteyê çêdibe. Komînên Ewrûpayê vediguherin civaka sivîl, civaka sivîl jî vediguherin dewleta netewe. Kapîtalîstan jî ev desteser kiriye, wan ev kiriye bin yekdestdariya xwe û wan ev yek heta bi faşîzmê biriye. Mixabin di şexsê Stalîn de sosyalîzm kirin qurbanê kastê. Dewleta netewe têra xwe nehatiye fêhmkirin. Heke hêzeke gurçûpêçkirî û yekdestdar mîna dewleta netewe nebûya ti hêzê nikarîbû cinawirekî mîna kapîtalîzmê derxista holê.

Em jî tam di vê nuqteyê de Marksîzmê rexne dikin. Diviyabû Marks li şûna pirtûka xwe ya bi navê ‘Sermayeyê’ pêşî pirtûka ‘Dewletê’ binivîsanda û ev şaşiya wî ye. Sermaye di serdema pêşî de li cem Sumeran hebû. Ango keşifeke nû nebû. Lê dewleta netewe modeleke siyasî ye, cara pêşî bi teknîk, ekonomî û îdeolojiya Rojava derketiye holê. Û vê modelê jî kapîtalîzm derxistiye holê.

Hêmana kastîk li Rûsya û Çînê bi êrişên ji derve sosyalîzm neqedand, mixabin ji hundir ve desteser kirin. Sedema bingehîn a hilweşîna wê ev e. Stalîn hêmanekî kastîk e, ji zarokatiya xwe ve wisa hatiye perwerdekirin, ti têkiliya xwe bi demokrasiyê re tineye. Stalîn xwe hişk li têgînên ‘hêz-zor’ê girtiye û ev ji xisletên wî yên kastîk in. Ev felsefe, di encamê de felsefeya kastê ye, û di taliyê de sosyalîzm qedandiye. Îro jî kes li Rûsyayê xwedî li vê dernakeve. Kapîtalîstbûna Çînê jî bi destê çend hêmanan ve pêk hatiye. Sosyalîzm ji hundir ve hatiye fetihkirin. Ev hemû kastîk in, tew arîstokratîk jî nînin. Çarên Ûris kastîk in, lê li dorbera wan hêmanên arîstokratîk hene. Ewrûpa jî bi vî awayî ye.

Weke encam, em dikarin wisa bibêjin; em çawa li meseleyê binêrin bila em binêrin, modernîte şaristaniya nû ye. Bingehê wê yê çîn, zanist û dewlet-desthilatdarî heye. Lê di demeke pir kurt de şaxên berê yên kastê bi navê kapîtalîzmê hundirê modernîteyê dikeritînin, pûç dikin û bi kar tînin. Kara zêde ango mayeyan kom dikin û wê dikin sermaye. Mixabin, Marks jî ev weke "pêşketineke mezin, pêşverû" pênase kiriye û kiriye mijara lêkolînê. Li şûna ku ji kujer re bibêje kujer e, hewl daye sîstematîka kapîtalîzmê ji hev derxe û li ser vî esasî gotiye, kapîtalîzmê teknîk û ekonomî bi pêş xistiye. Ma em van hemûyan çima bikin berhemên kapîtalîzmê. Ya rastî ew e, kapîtalîzmê ev hemû dizîne û desteser kirine. Çi di destê kê de hebûye, kapîtalîzmê ji wan girtiye, dest daniye ser erdê wan û sermiyanê wan. Ev hemû jî bi şer kiriye. Kastê bi kuştinê qestî canê xelkê kiriye, hebûna wan desteser kiriye û bi vê xwe kiriye heyî. Heke mirov vê rastiyê nebîne, nikare bi awayekî temam teoriya sosyalîzmê jî bike.

Şaşiya Marks ew bû, nikarîbû modernîte û kapîtalîzmê ji hevdu derxe, nikarîbû cudahiya di navbera wan de bibîne. Mîna ku kapîtalîzmê zanist, Ronesans, felsefe û huner afirandibin, bi meseleyê dadikeve, lê rastî bi vî awayî nîne. Bi vî awayî pêdaketin pir bi tehlûke ye, jixwe yek ji sedemên hilweşîna sosyalîzma pêkhatî jî ev awa pêdaketin bû. Destpêka modernîteyê Ronesans e, lingê wê yê din Reformasyon e. Bi Reformasyonê şêweyê Xiristiyantiyê yê Katolîk ji binî ve tê guhertin. Lingê wê yê sisiyan jî şoreşa felsefî û zanistî ye. Bi van her sê pêşketinan her tişt ji binî ve diguhere. Encama van hemûyan jî "ekonomiya kapîtalîst" e.

Herçiqasî kapîtalîzm weke sermaye û ekonomî derkeve holê jî di esasê xwe de modernîteyê di nava xwe de diqedîne, dirizîne. Kapîtalîzmê nava wê pûç kiriye. Marks ev jî nedîtiye û pêkanîna modernîteya dijber nekiriye armanc; nekariye tiştekî wisa bi sîstem bike. Li gorî me, kapîtalîzmê modernîte ji hundir ve keritandiye û pûç kiriye. Nexasim Ronesans li gorî berjewendiyên xwe xirab bi kar aniye. Reformasyon, zanist û felsefe xistine xizmeta kapîtalîzmê. Hêmanên kapîtalîst, her yek ji wan mîna dizekekî, talankerekî û cinawirekî tineker e. Kapîtalîzmê modernîte neafirandiye, berevajî vê nava wê vala kiriye, pûç kiriye.

Divê mirov jêdera şaşiyên mezin ên di teoriyê de di van babetan de bibîne. Marks jî paşê hay ji vê şaşiya xwe dibe. Bi dersên ji Komîna Parîsê wergirtî, hewl dide şaşiyan sererast bike, lê di vê de bi ser nakave. Engels jî hewl dide, Lenîn bi berhema xwe ya bi navê "Dewlet û Şoreş" dixwaze hinek tiştan bike. Ezmûna Sovyetê pêk tînin. Tevî rexneyan hemûyan, serketinên li hundir û derve jî got, "Êdî ez hatim keviyê kendal." Ev hemû, ji ber şaşanalîzkirina pêkhateya kujerê kastîk e. Sedema hilweşîna sosyalîzma pêkhatî, ji analîza wê ya seqet a kapîtalîzmê ye. Lipeyxwehiştina vê şaşanalîzê zor e. Ji bo vê gelek ceribandin hatine kirin, lê bi ser neketine. Axir, piştî ezmûna 70 salî, bi hilweşîna mezin re kêmasiya di teoriyan de xwe daye der. Li Çînê jî rewşeke bi heman awayî pêk tê. Heke kapîtalîzm rast neyê analîzkirin, encama pêkhatî bivênevê ye. Di ser de jî wê ev yek bi fedabûna mîlyonan mirovî pêk bê.

Bi qasî serê derziyê şik û guman nîne ku nûnerê herî dawî yê kujerê kastîk kapîtalîst in. Li vir, divê mirov modernîteyê hê bêhtir bi pêş bixe. Me diyar kiribû ku modernîteya kapîtalîst sê lingê wê hene. Lingê wê yê yekê, tinekirina civakê ye. Kapîtalîst bi xwe nabe civak. Civaka dîrokî ji aliyê kapîtalîzmê ve hatiye tinekirin. Diyardeya hatiye tinekirin civak e, wê demê çawa çêdibe ku sifetê civakê ji bo kapîtalîzmê were bikaranîn? Ev jî yek ji sedemên herî giring ê hilweşîna sosyalîzma pêkhatî û bêçaretiya Marksîzmê ye. Çi qirkirin, çi şer, çi felaketên jîngeh û hawîrdorê, çi jî bajarên mîna ûr û girêka kansêrê mezin dibin hemû têkildarî kapîtalîzmê ne. Ev hemû, rewşa civakê û tinekirina wê pênase dikin. Lewma em dikarin li şûna têgîna "civaka kapîtalîst", têgîna "kapîtalîzm antî-civak e" bi kar bînin. Tişta ku kapîtalîst dikin, jihevbelavkirina civakê ye. Ji klanê heta bi dewleta netewe her tiştî ji hev belav dike.

Kapîtalîst, xwînmijek e ku ketiye nava civakê. Dewleta netewe dike dewleteke kujer, di serî de li warê çand, huner, exlaq û perwerdeyê, di her warî de karûbarê civakê dikeritîne, pûç dike. Ango antî-civakî ye, heta qirkerê civakê ye. Kapîtalîzm ne civak e, qirkerê civakê ye.

Dema ku mirov tiştekî pênase dike, divê mirov gelekî baldar be, û bi berpirsiyarî tevbigere. Lewma ya rast û durist ew e ku mirov di çarçoveya van pênasekirinan de têgîna "modernîteya kapîtalîst" bi kar bîne. Têgîna modern a ku em weke "hemdem" bi kar tînin sê lingên wê pûç dike, armanc û meqsedên xwe yên kujer û qirker li wan bar dike. Li şûna ku mirov ji vê re modern bibêje, divê mirov bibêje, xwînmij e, û bibêje, diyardeyek e ku hundirê modernîteyê vala kiriye û xwe tê de bi cih kiriye. Ev jî nuqteya esas a meseleyê ye. Ya ku dibe sifetê kapîtalîst modernîte bi xwe nîne, kurmikê di nava wê de ye. Kurmê nava darê wê dikeritîne û taliyê wê dirizîne, tine dike. Modernîte tiştekî baş e, lê kurmikê bi navê kapîtalîst ê ketiye navê, ew keritand û da erdê. A niha modernîte ketiye sekeratan, hatiye ber ruh danê. Jixwe, wexta ku em dibêjin, "modernîteya kapîtalîst" jî mebesta me ev e. Ji her alî ve hildiweşe. Di serî de li Ewrûpayê, li navendên kapîtalîst. Kapîtal fînans manewraya wê ya herî dawî bû. Li sedsala 19'an lingê endustriyê xist dewreyê û bi vê gaveke mezin avêt, lê vê jî rê li talaneke mezin a xwezayê vekir û vê jî bi xwe re binê civakê vala kir. Roja me ya îro fînans kapîtalê binê modernîteyê jî vala kir. Niha jî pergaleke din a qirker amade dike; bi wê qala, teknolojiyên nû yên weke aqlê çêkirî (AI), madenên bi nirx, elementên nadîde û yên weke wan ên kara zêde tînin û wê bi vê, tişta di erdê de mayî jî tine bike. Ji bo kulmeke zêr çiyayekî tine dikin, tiştekî bi navê erd û axê nahêlin.

Lingê dudiyan ê modernîteya kapîtalîst endustriyalîzm e. Endustriyalîzm ew teknîk e ku kapîtalîzm bi xwe û dewleta wê ya netewe jî derxistiye holê. Li vir, dabeşa xeternak a ku em dixwazin balê bikişînin serê ew e, ji ber ku kareke zêde tîne, naxwazin bibînin ku endustriyalîzm çawa jîngeh û hawîrdorê tine dike. Di warê jîngeh û hawîrdorê de felaketeke ewqasî mezin heye ku ket pêşiya tevahî nakokiyên çînî. Jixwe wisa dewam bike, dunya wê bibe sergoyekî mezin. Niha çav li rê ye ku bobelat û felaketa mezin di warê avhewayê de be. Yê ji vê jî berpirsiyar kujerê kapîtalîst e. Endustriya wî dahf dide bi vî awayî bi pêş dixe. Aqlê çêkirî (AI) bi pêş dixe. Li ser guftûgo tê kirin, tê gotin, heye ku aqlê çêkirî mirov bêkêr bike; mirovê ku aqlê çêkirî wî çêke, wê canê mirovê xwezayî bisitîne. Ev jî têkildarî endustriyalîzmê ye. Jixwe, tew em qala atomê, nukleerê û hezar cureyên sîlehan nakin. Ji hemûyan giringtir jî ev meseleya plastîkan e. Okyanûs bi plastîkan mişt bûne, tevlî her tiştê ku mirov dixwin û vedixwin bûne, tevahiya ruhberên di deryayê de ûrê wan bi plastîkan tijî bûne. Ev rewşa xeternak a ku em qala wê dikin, her ku diçe mezin dibe. Her der bûye çop, zibil, ting û sergo. Rojane, plastîkên ku malbatek diavêje çopê dikare temamê taxekê tijî bike. Çalakiyên ekolojîk ên heyî jî nikarin ber li vê felaketê bigirin. Mirov dikare li ser endustriyalîzmê gelek tiştan bibêje. Wê ser erdê jî, bin erdê jî tine kir, hewa bi karbondîoksîtê tijî kir, okyanûs bi çop û zibaleyê mişt kir. Bajar bandoreke kansorejen li jiyanê dikin. Li hemberî qanûna kara zêde ya kujerê kastîk, kes nikare xwe bigire. Tevî vê, qada çand-hunerê, jiyana civakî bi temamî di tehlûkeyê de ne. Modernîteya dewleta netewe, qirkirin afirandiye. Endustriyalîzm li dijî jîngehê, dewleta netewe jî li dijî mirovan hê jî sûcê qirkirinê dike.

Lingê sisiyan ê modernîteya kapîtalîst, îro lingê herî diyar û diyarker ê modernîteya Rojava ye. Şêweyê dewleta netewe ji şêweyên din ên dewletê cihê ye. Dewleta netewe ji dewleta kole ya serdema pêşî yan jî dewleta serf a serdema navîn, bi gotineke din ji dewleta xanedan, ji dewleta qral-xweda ku mirov dikare jê re bibêje dewleta kesekî ye, û ji dewleta arîstokratîk di hin waran de cihê dibe. Teoriya dewleta arîstokratîk Yewnanan kir. Dewleta arîstokratîk bi şoreşekê ketiye şûna sîstema kastîk an jî ketiye şûna otorîteya kastîk. Kast

qral-xweda ye, arîstokrat jî alîkarên xwedê ne. Herçiqasî di nava dewleta nû de gelek hêmanên kastîk hebin jî dewleta nû dewleta xanedan e, dewleta çînî ye.

Şaristanî li Rojava li ser bingehê Ronesans, Reformasyon û zanistê vediguhere û bi vî awayî, em şaristaniyeke Rojava li ber xwe dibînin. Salên 1500'î em vê rewşê bi temamî bi awayekî berbiçav li ber xwe dibînin. Navê vê jî dibe dewleta netewe. Bi derketina holê ya dewleta netewe re dewleta qral-xwedê, dewleta xanedan, dewleta dînî û heta dewleta mîtolojîk li dawiyê dimînin. Hemû, heman tiştî pênase dikin û fîlozofê wê jî Hegel e.

Hegel têgihiştin û serwextbûna li vê afirand û di heman demê de fîlozofek e ku pêxemberê wê ye. Çawa ku fîlozof û pêxemberê rastî yê dewleta serdema navîn Hz. Mihemed e, pêxemberê dewleta modern jî Hegel e, û ya rastî heqê wê jî daye. Felsefeya dewletê ya Hegel bi dewleta netewe re heye. Analîza wê, ji dewletên bajêr ên Grek heta bi împaretoriya Napolyon tevahiya pêkhate û fikirên desthilatdariyê di nava xwe de dihewîne. Napolyon weke "xwedayê daketiye ser rûyê erdê" pênase dike. Bi taybetî, ji vê pênasekirina wî mirov dikare gelek tiştan hîn bibe. Esas, tişta ku dike xwedayî, dewleta netewe ye. Roja me ya îro di şexsê dewleta netewe de ev xwedakirin di asta herî jor de ye. Ji vê felsefeyê hesabpirsîn yek ji erk û berpirsiyariyên bingehîn ên hêzên modernîteya demokratîk e. Heke ji vê felsefeyê rast hesab were pirsîn, dewleta netewe wê li dawiyê were hiştin.

Îdeolog û pêxemberê dewleta serdema pêşî Platon e. Di serdema modern de jî Hegel fîlozofê dewleta netewe ye. Xisleta bingehîn a vê çi ye? Dewleta xanedanê tineye, dewleta dîn tineye, dewleta şah-siltan tineye, dewleta qral tineye, dewleta çar tineye. Hemû qediyane, çûne. Li hemberî vê, dewleta netewe heye ku ferdên civakê hemû kirine bin rêveberiya xwe û hemû jî yên wê û welatiyê wê têne hesibandin. Dewleta netewe jî di vê çarçoveyê de tê pênasekirin. Ango çend welatî hebin, hemû endamên dewletê ne. Netewe cuda, dewlet cuda ye. Lê dewleta netewe navê yekkirina herduyan e. Çend ferdê netewe hebin, hemû endamên dewletê ne. Bêguman gelek kes hene ji heman neteweyê nînin, lê ev hemû endamên dewletê têne hesibandin û ji ber vê, navê dewletê dibe "dewleta netewe".

Dewleta Osmanî bi giranî xanedaniya Osmanî eleqedar dikir. Endamên xanedaniyê endamên dewletê bûn. Yenîçerî kole û xizmetkarên dewletê bûn. Maneya "Yenîçerî" evdê nû, koleyê nû bû. Lê dewleta nû, cuda ye. Em damezrandina Komara Tirkiyê bînin bîra xwe. Welatî hemû weke welatiyê vê dewletê hatin qebûlkirin, lê hemû weke "Tirk" hatin pênasekirin. Ango gotin, "Em bûn dewleta netewe, yên din jî bûn mîna me". Rewşa ku jê re dibêjin, Meseleya Kurd jî ji vê nêzîkatî û têgihiştinê derket holê.

Wekî din jî pênasekirina ummetê heye. Ummet, nijad û milliyetên din hemûyan di nava xwe de dihewîne. Di dewleta netewe ya Tirk de tiştekî wisa tineye. Îca, wexta ku nijad û milletên din hatin înkarkirin, di encamê de pêkanîna desthilatdarên xwe disipêrin têgihiştina ummetê, xistin rojevê. Îro li Tirkiyê desthilatdariya heyî, bingehekî xwe bi vî rengî yê îdeolojîk heye. Û vê weke heyî, xwe di meseleya Kurd de nîşan da. Bi vê, li rêyekê digerin da ku ji îdeolojiya dewleta netewe derkevin. Her kesê Boşnak, Arnawût û Çerkes "Tirk" hesibandin û ji bo pênasekirinê ev kêm e, têrê nake. Kurd nufûsa xwe zêde ne, û endamê şaristaniyeke kevnar in, lewma qebûl nekirin ku ji wan re Tirk were gotin. Xwediyên dewleta netewe dibêjin, "tu Tirk î, û divê tu wisa qebûl bikî". Ji vê re jî dibêjin, "Kurdê Tirk" yan jî dibêjin, "Tirkê bi koka xwe Kurd". Çawa ku tê zanîn ev nêzîkatî jî nehat qebûlkirin. Çanda şaristaniyeke mezin çawa dibe ku xwe înkar bike? Tu ji mirovê Kurd re bibêje Tirk mirovê Kurd nabe Tirk û têkoşîna pêncî salên dawî ev yek eşkere nîşan daye.

Dewleta netewe, ji bo kapîtalîzma ku paşê derkeve holê, esas û bingeh e. Mirov mat dimîne ka ev çawa nayê dîtin û fêhmkirin. Kapîtalîzm ji bo bi pêş bikeve weke amûrekî zorê pêdiviya xwe bi dewleta netewe heye. Sîstemeke talanker û şêlanker mîna kapîtalîzmê,

zehmet e ku bi pêkhateyên dewletên berê bimeşe. Hewceyî bi amûreke zorê ya gelekî berfireh heye. Ne tenê kapîtalîstek, ne tenê çarek, ne tenê qral-xwedayek heye; hejmara wan zêde ye. Hezar dewlet nabin; dibe ku tenê çendek dewletên netewe hebin, ew jî divê di binê yekdestdariya hêzekê de bin.

Dewleta hemdem dabeşî neteweyên weke Elman, Îtalî, Fransî û Ingilîzan bûye. Êdî navê dewletan ne bi kesan, lê bi neteweyan tê hildan. Pêdivî pê çêdibe. Derketina neteweyan bi xwe jî ji pêdiviyê ye. Pêdiviya ku qala wê tê kirin, ya kapîtalîst-sermayedaran e. Yên dixwazin talanê bikin, bişêlînin ev in. Ji bo talan û şêlandinê jî hewcedarî bi hêzê heye. Osmaniyan xwest vê bi xanedaniyê bikin. Lê Mistefa Kemal derket got, "ez li ser navê netewe şer dikim", wexta ku wî netewe bi rêxistin kir, xelîfe, Osmanî û feodalên Kurd têk birin. Li Ewrûpayê jî bi heman awayî bû. Lenîn jî bi îdeolojiya dewleta netewe ya Ûris zora Çar bir, lê ji ber ku sosyalîst bû ya derb xwar, sosyalîzma pêkhatî bû.

Divê mirov hinekî bi mijara faşîzm û sosyalîmê jî dakeve. Di vê çarçoveyê de divê mirov qala şoreşa sosyalîzmê, îdeolojiya sosyalîzmê, pêkhatina sosyalîzmê, realîzasyona sosyalîst û bi giştî bi têkiliya sosyalîzm û faşîzmê dakeve. Sovyetê ev da destpêkirin. Heta Komîna Parîsê bûrjûwaziya wê demê pir bizdand. Divê em di vir de li jêdera meseleyê bigerin. Sedema bingehîn a derketina faşîzmê ev e. Wexta ku sosyalîzm di jiyanê de weke alternatîfekê diyar dibe, faşîzm dikeve dewreyê. Dema ku sosyalîzm weke alternatîf derdikeve holê nûnerên kujerên kastîk ên kapîtalîzmê dest pê dikin li sîstemekê digerin û sîstema derdikeve holê jî navê wê faşîzm e. Di destpêkê de hewceyî bi vê nabînin, ji ber ku li hemberî wan tiştekî gefê li wan bixwe tineye. Rewşa li girava Ingilistanê ji bo vê mînak e. Korsantî hewceyî bi faşîzmê nabîne. Korsan berra gundiyan didin; dest datînin ser erdên wan; qada debarê li wan teng dikin û bi vî awayî erdan ji xwe re bi kar tînin, gundiyan li ser wan erdan dikin karker dixebitînin. Ango dema ku li hemberî xwe tehlûkeyê nebînin hewceyî bi faşîzmê nabînin. Dema ku rewşên ciddî û kujer li dijî sîstemê diyar bibin an jî tengasî pir mezin be; kujerên kastîk kapîtalîst nikaribin bi şêweyên talanê yên mêhtinkariyê sîstemê bidomînin û ya esas, wexta ku bibînin weke tehlûke pêkhatina sosyalîzmê pêkan e, faşîzm dikeve rojevê.

Çawa ku tê zanîn, sembola faşîzmê "bivir" e. Eşkere ye, îlhama xwe ji eskerên serdema Romayê yên bi bivir girtiye. Faşîzm sîstemek e, kuştina mirovan bi bivir rewa dike. Bi bivir mirovan hûr dike, tirs û sawê belav dike. Peyv ji wir tê. Navê wê çi Nazî be yan jî tiştekî din be, cewherê wê naguhere, heman tişt e. Çima faşîzm piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn ket dewreyê, ha ev mijarek e, divê rast were fêhmkirin. Çawa ku tê zanîn, di dema Şerê Cîhanê yê Yekemîn de sîstema Sovyetê derket holê. Hêza hegemon û şefê kapîtalîzmê Ingilistanê bi Mistefa Kemal re tifaq kir, bi Şahê Îranê û Efxanistanê re tifaq kir, li Çînê bi Çan Kay Şek re tifaq kir destek dayê û li dijî Mao da şerkirin. Japonya weke welatekî faşîst derket holê, faşîzma Japon bi kêmanî bi qasî ya Elmanyayê heye. Ingilistan ji bo 'tehlûke'ya sosyalîst a li ser bingehê Sovyetê derket holê asteng bike, ev rejîm hemû derxistin holê û destek da wan. Li Endonezyayê jî hewldaneke sosyalîst hebû û Partiya Komînîst a herî bi hêz li wir bû, lê di şevekê de pêncsed hezar komînîst bi awayekî hovane kuştin. Generalekî bi navê Suharto di şevekê de evçend kes qetil kirin. Faşîzma li Endonezyayê bi vî awayî derket holê. Her em çawa li meseleyê binêrin jî em dibînin Sovyetê hêviyên xwe hemû bi şoreşa Elman ve girêdabû. Ji bo li Sovyetê sîstemeke sosyalîst a mayînde ava bûbûya, bi çarçavan li hêviya şoreşa li Elmanyayê bûn û bi vî awayî li meseleyê dinêrîn. Ev mijar di nivîsên Lenîn de tê destnîşankirin. Proto-faşîzmê sala 1919'an di serî de Rosa Luxemburg, tê zanîn çi aniye serê şoreşgerên sosyalîst. Li Rûsyayê şoreş pêk hatiye, sîstema sosyalîst wê bi pêş bikeve, sosyalîzm wê weke alternatîfekê bikeve rojevê û li Elmanyayê jî wê bi pêşengiya Rosayê

şoreşa sosyalîst pêk bê. Ev tê wê maneyê, wexta ku ji bo kujerê kapîtalîst kastîk tehlûkeya sîstema sosyalîst xuya dike û mezin dibe, faşîzmê dixin dewreyê.

Ya rastî, Marks tehlûkeya ku em qala wê dikin, dibîne. Sosyalîstên utopîk jî wê dibînin. Dîsa gelên bûne mêhtingeh jî wê dibînin. Lê yek ji wan jî têra xwe nikare li ber xwe bide. Kujerê kastîk bi zanistê, bi hunerê eyarê dide hemûyan û tevahiya wan bêbandor dike. Ya rastî, Marks pir bi xurtî li ber radibe, divê mirov Kapîtala wî di vê çarçoveyê de bibîne. Ji ber ku giring e, dused sal in ku bi bandor e. Lê di dawiya dawî de modernîteya kapîtalîst hundirê wê jî vala kir û li gorî xwe fesiland û ediland. Mixabin, du şoreşên mezin ên sosyalîst; şoreşên navend Rûs û Çîn, di roja me ya îro de ji wan welatan in ku herî zêde can didin kapîtalîzmê. A niha, ne Emerîka û Ingilistan, ev welat kapîtalîzmê li ser piyan digirin. Yanî sosyalîzm evqasî pûç kirine û xistine xizmeta kapîtalîzmê.

Divê em balê bikişînin ser babeteke din. Marks bi xwe jî ji sê suwarên mehşerê ji dewleta netewe re ti tişt negotiye, endustriyalîzm pir mezin kiriye derxistiye ezmanan, rexne nekiriye, weke hêzeke mezin a pêşverû pênase kiriye, têgînek bi navê "civaka kapîtalîst" çêkiriye, dabeşkirineke weke "binesaziya ekonomîk" û "jorsaziya îdeolojîk" kiriye. Kapîtalîzm weke qonaxeke pêşverû daniye ber mirovatiyê. Heta gotine, "sosyalîzm wê li Ewrûpaya Rojava derkeve holê", û gotin di cih de be, bi vî awayî mizgînî dane ku wê sosyalîzma Marksîst li Ewrûpaya Rojava biçe serketinê. Mao jî gotiye, "ev serketin hem li mêhtingehan jî dibe, hem jî li welatên paşvemayî jî dibe" û bi vî awayî sosyalîzm derbasî wan deveran kiriye. Encam, ya ku Mao ava kiriye ne sosyalîzm bûye, mîna ku hem kapîtalîzm biriye Çînê hem jî li parzemîna Asyayê di bin navê sosyalîzmê de ji belavbûna kujerê kastîk re pêşengî kiriye. Encameke balkêş e, Mao û Partiya Komînîst a Çînê ku ewqasî li ser navê sosyalîzmê dipeyivîn, ketin rewşekê, hema bêje bûn berdevkên sereke yên kapîtalîzmê. Çi îroniyeke mezin e, yê ku ev kir jî Deng Chiao Ping bû ku hevalê herî nêz ê Mao bû. Heke îro kapîtalîzma Çîn û Rûsyayê nebe, nepêkan e ku Emerîka li ser piyan bimîne. Emerîka bi ranta ji wan digire, hewl dide kapîtalîzmê bimeşîne.

Rêber Abdullah Ocalan salên 1990'î slogana "Di sosyalîzmê de israr di mirovbûnê de israr e" berz kir û ev vê rastiya dîrokî pênase dike. Çawa ku hinek dibêjin, "Li vir sosyalîzm nabe, li deverên din dibe" rast nîne, û slogana Ocalan berz dike, berevajiyê vê gotinê piştrast dike. Ji ber ku xuya ye, li dever û erdên kapîtalîzm bi pêş neketiye, cihûwarên herî zêde xwedî pirsgirêk, yên weke me hê bi temamî bi ser xwe ve nehatine, kapîtalîzm hîç nas nekirine yan jî di kapîtalîzmê de hê bi çarpîkan dimeşin, sosyalîzm pêk tê û bi pêş dikeve.

Li van welatan, teoriya şoreşa sosyalîst pêk anîn, bêyî ku qala sêlingên modernîteya kapîtalîst bikin û di ser de jî kapîtalîzm mezin kirin. Lenîn û Mao ev pêkanîn. Encam felaket bû. Herçiqasî Lenîn serketin bi dest xistibû û di şerê navxweyî de bi ser ketibû jî gotibû, "ez li ber serê kendal im". Tişta ku diqewimî, derbxwarineke mezin a sosyalîzmê bû û bi van gotinan jî ev rastî dihat pênasekirin. Hem jî li cihê ku serketin hatibû bidestxistin û ev jî bi devê rêbertiya wan bi xwe bû. Seyr e, ji bo ji ber serê kendal rizgar bibe NEP[8] pêk anî, ango bernameyeke kapîtalîst a demî vedît û hewl da bi vê ji ber serê kendal rizgar bibe. Lenîn, ji bo ekonomiya Yekîtiya Sovyetê ji hilweşînê rizgar bike polîtîkayeke nû bi navê NEP'ê danî holê û got, "Ji niha û pê ve, em ê ji bo avakirineke sosyalîst têbikoşin" û bi vê gotina xwe bal bire ser heqîqetê jî lê temenê wî têra vê nekir û dema ku wefat kir, Stalîn rabû NEP li tevahiya Rûsyayê pêk anî. Mao got, "De ciwanno! ji bo şoreşa çandê rabin, bila kapîtalîzm bi ser nekeve". Di encamê de sîstemeke kapîtalîzma dewletê vedîtin û bi vê, rewşa wan sosyalîzm

[8] The New Economic Policy (NEP) awayê destpêkê yê sosyalîzma bazarê bû ku Lenin li Sovyetê da tetbîqkirin.

xistiyê darîçav e. Mirov dikare ji vê dersekê bigire. Em ji vê re bibêjin, gavavêtina sosyalîzma pêkhatî û encamên wê. Tê zanîn, li Çînê jî, li Viyetnamê jî sîstema sosyalîst ji ber sedemên navxweyî hilweşiyan. A niha mîlyarderên herî mezin ji Viyetnamê derdikevin. Navekî Kubayê heye, lê hebûna wê bi xwe diyar nîne. Ji ber ku bingeh seqet e, û wê nizanî ka ew ê nakokiyên xwe çawa rave û zelal bike, encam bûye felaket û binketin.

Di kapîtalîzmê de têgîn gelekî qirêjkirî ne. Lîberalîzm yek ji wan têgînan e, û kirine ku serê mirovan gelekî tevlîhev bike. Lîberalîzm maneya wê ya peyvê azadiya ferdî ye. Herçiqasî ev maneya wê bi guhê mirov xweş were jî lê evqas înkar û xirakirina kolektîvîteyê jî ji ber sextekariya lîberalîzmê ye. Di rewşeke asayî de divê mirov ne li dijî lîberalîzmê be. Lê dema ku mirov tevî têgînên kapîtalîst bi wê dakeve, dibe sedema rûdana pirsgirêkan. Ya rastî, lîberalîzm nayê wê maneyê ku bi kapîtalîzmê re wekhev e. Lîberalîzma kapîtalîst, kamûflaja çeteyê ye. Lîberalîzm di cewherê xwe de têgîneke notr e. Di peywenda azadîxwaziyê de sosyalîzm bêhtir li lîberalîzmê, lêberalîzm jî bêhtir li sosyalîzmê tê. Sosyalîzm bêhtir nêzî demokrasiyê ye. Demokrasiya lîberal, ne kapîtalîzm e, yan jî demokrasiya bûrjûwayê ye. Di vê çarçove û peywendê de divê mirov wê rast bi kar bîne. Çi sîstem dibe bila bibe, her sîstem dikare lîberalîzmê weke pênasekirineke azadîxwaziyê bi kar bîne. Kapîtalîzm di cewherê xwe de bi ti awayî bi lîberalîzmê re li hev nîne. Kapîtalîzm talan e, şêlandin e, mêhtinkarî ye, çetetî ye, koletiya modern e, û faşîzm e. Kasta kapîtalîst olîgarşîk e, hindikayî ye. Tevî ku sîleh neyên bikaranîn, xwesipartina şiddet û zorê faşîzm e. Mirov ji sîstemeke xwe nesipêre şiddetê û weke dewleteke huqûqê were rêvebirin nikare bibêje faşîst e. Belkî mirov dikare jê re bibêje, "demokrasiya bûrjûwayê" yan jî belkî guncav be ku mirov jê re bibêje, demokrasî yan jî demokrasiya radîkal. Kapîtalîzm antî-demokrasî ye, dijberê demokrasiyê ye, kirasê demokratîk ê komînalîteyê li xwe dike, nava wê pûç dike û dibe amûrekî zorê yê bi ser hêza serdest a sîstemê, kastê vedişêre, wê dinixumîne.

Modernîteya kapîtalîst, ji bo sê suwarên mehşerê bidomîne îdeolojiya lîberalîzmê li hev aniye. Lîberalîzm di esasê xwe de weke projeyeke dij-şoreşê hatiye lihevanîn û armanca wê ew e; dor li civakê bigire û wê ji cewherê wê yê radîkal ê civakparêz dûr bixîne. Bi helwesteke li dijî demokrasiyê xwedî li demokrasiyê derdikeve; ji bo mêhtinkariyê normalîze bike û kes nikaribe li ber rabe, ji bo berjewendiyên xwe biparêze û desteka girseya civakê bigire, demokrasiyê tîne dadixîne asta lîberalîzmê. Demokrasî rêveberiya demoyê ye, lê lîberalîzm vê dike şiklî, nava wê pûç dike û qala wekheviyeke şiklî dike. Mafên lîberal, newekheviya ekonomîk vedişêrin. Alternatîfên azadîxwaz, wekhevîxwaz, komînal û demokratîk jî bi komkujiyan têne tepisandin. Bi saya lîberalîzmê, kast xwe û sîstema xwe li pişt maskeyeke îdeolojîk vedişêre.

3-Modernîteya Kapîtalîst û Sê Suwarên Mehşerê

Em modernîteya kapîtalîst di çarçoveya sê suwarên mehşerê de pênase dikin ango kapîtalîzm, endustriyalîzm û dewleta netewe. Ev pêkhate ji sedsala 16'an û pê ve bi gewde bû û modernîteya kapîtalîst ji wan pêk tê. Diviyabû sosyalîzm weke alternatîfa van sê suwarên mehşerê derketibûya holê, lê tenê li dijî kapîtalîzmê analîza sosyalîst û têkoşîna wê xistin rojevê, nikarîbûn wê jî bi pêş bixin. Di rewşa heyî de ji ber ku bi belavokekê, bi Manîfestoya Komînîst bi sînor ma, jixwe derfeta pêşketina wê jî wê nebûya. Analîzeke sosyalîzmê li ser bingehê antî-kapîtalîzmê heye û di nava wê analîzê de jî kêmasî hene. Kapasîteya vê teoriya sosyalîst a ku ji bo analîza modernîteyê bibe çavkanî bi sînor e; heta ev teorî beşek ji wê ye, nekariye ji nava sînorê modernîteyê derkeve.

Pirsgirêka vê serdema me ew e; modernîteya kapîtalîst bi sê suwarên mehşerê mirovatiyê ber bi mehşerê ve dibe. Mêhtingerî û mêhtinkariya kapîtalîst li sînorê hovîtiyê ye. Mêhtinkarî mîna kansêr û şewbê li cîhana me belav bûye, xwe lê alandiye. Dewleta netewe jî hêza wê ya derbkar û lêxer e. Di sîstema dewleta netewe de netewe dibe civakeke eskerî. Di hîmê vê sîstemê de şiddet û şer heye. Dewleta netewe, sîstema civaka şer e. Û di van şeran hemûyan de her carê bi mîlyonan mirov têne kuştin.

Li cem Marks, rexnekirin û analîzkirina endustriyalîzmê hema bêje tineye. Endustriyalîzm weke heyî hatiye qebûlkirin û heta wisa pesnê wê dane, bilind kirine û derxistine ezmanan. Ev şaşiyeke mezin e, û di heman demê de vê kêmasiya stratejîk bandor li demên paşê hemûyan kiriye. Dîsa, ji ber ku analîzeke bi hêz a Marks derbarê dewleta netewe de tinebû, ji vî alî ve jî valatiyeke ciddî ya îdeolojîk hate hiştin. Marks paşê li kêmasiya vê analîzê hayil bû. Di pêvajoya nivîsandina Kapîtalê de pirtûka sisiyan a binivîsanda wê li ser dewletê bûna, lê temenê wî têra vê nekir. Ji ber ku li cem Marks perspektîfa analîzê ya li ser dewleta netewe kêm bû, heke binivîsanda jî zehmet bû ku rast û durist bi ser meseleyê ve bibûya.

Endustriyalîzm di serî de jîngeh û hawîrdor, çavkaniyên jiyanê yên sererd û binerd diqedîne û dimeşe. Mirovatî îro ketiye rewşeke wilo, hindik maye, cinawirê ku bi destê xwe afirandiye wê bixwe û daqurtîne. Endustriyalîzmê hem şane û pêkhateyên civakê xirab guherandine, diguherîne, hem jî têkiliyên mirov û xwezayê veguherandine, vediguherîne. Heke mirov endustriyalîzmê tenê weke diyardeyeke li ser bingehê ekonomiyeke aştiyane bibîne, mirov ê xwe bixapîne. Endustriyalîzm ji serî ve bi teknolojiyên şer re di zikhev de bi pêş ketiye. Tişta ku dewleta netewe pêkan dike jî ev e. Bi gotineke din, hatina cem hev a endustrî, teknolojî û şer ji xisletên bingehîn ên endustriyalîzmê ne. Ne tiştekî xweber e ku dewletên netewe yên pêşketî xwedî teknolojiya pêşketî ya şer in.

Têkoşîneke dijberê endustriyalîzmê, heke pêşketina endustriyê weke warekî notr bibîne û di vî warî de têkoşînê paşguh bike, şensê xwe yê serketinê tineye, û wê tinebe. Li ser rewşa berbiçav û li gorî analîzan tê gotin, heke Modernîteya Kapîtalîst neyê sekinandin û bi vî awayî dewam bike, pêncî sal temenê vê cîhana me maye. Em qala diyardeyeke dîstopîk nakin, em qala dawîlêhatineke mehşerî ya rastî dikin. Marks bi vê tehlûkeyê hesiya û dijbera wê jî danî holê, lê nekarî bi pêş bixe. Marks wê şeş pirtûk binivîsandana. Cilda yekemîn nivîsand, lê ew jî kêm hişt. Tevî mijara pêkhateya jêr û pêkhateya jor, bi analîzeke bingehê wê çînî bi sînor ma. Ket meseleya serî-pê û ji Hegel jî zêdetir bi paş de ket. Ya rastî, Engels hewl da kêm be jî Marks temam bike. Yanî armanca wî ev bû. Lewma bi sernavê **Malbat, Koka Dewletê û Milkiyeta Xusûsî, Diyalektîka Xwezayê û Di Dîrokê de Rola Zorê** lêkolîn kirin, lê van hemûyan jî têrê nekir. Lenîn di warê analîzên dewlet û polîtîkayê de hewl da temamker be, lê wî jî tam nikarîbû û serketî nebû. Mao hewl da vê teoriyê di têkoşîna rizgariya mêhtingehan de tetbîq bike, lê ji ber ku li şûna çareseriyeke yekpare ya ku analîza sîstemê bike û alternatîfa wê deyne holê, bi sînor û kêm ma.

Ji bo ku mirov modernîteya kapîtalîst fêhm bike, divê sê suwarên mehşerê weke kapîtalîzm, dewleta netewe û endustriyalîzmê pênase bike û ji bo têkoşîna li dijî wan ev hewce ye, di heman demê de ev ji bo zanisteke civakî ya rastî mecbûriyet e.

A-Kapîtalîzm

Beşekî mezin ji zanyarên civakî yên navend Ewrûpa, xwediyê wê fikirê ne ku kapîtalîzm di dîrokê de cara pêşî li Ewrûpayê derketiye holê. Piştî sedsala 16'an a Ewrûpayê, hêmana herî giring a mirov derbarê tekperestiya şaristaniyê de îdea bike, xisleta wê ya bêhtir bi pêşketî pere-sermaye ye. Yekdestdariya pere-sermayeyê ji vê sedsalê pê ve bi awayekî serketî hegemonya xwe ava kiriye. Lê belê eşkere ye ku mirov nikare bibêje, welatê peydabûna

pere-sermayeyê Ewrûpa ye, û di vê demê de derketiye holê. Tiştên weke pere pir berî vê demê jî hebûn. Pisporên ku derbarê serdema pêşî de lêkolane, hemfikir in ku obsîdyen û maddeyên weke wê bi rola pere rabûne. Tevahiya dîrokê, maden û hin alav sereqet hatine berhevkirin û hilanîn. Li Rojhilat gelek bajar hene, wan beriya Venedîk, Amsterdam û Londonê bi hezarê salan pere-sermaye bi kar anîne.

Tişta ku Ewrûpayê di pere-sermayeyê de dike tekane, ew e; cara pêşî hegemonyayê ava dike û bi lez bi pêş dikeve. Karl Marks bi vî awayî hegemonya sermayeyê û awayê wê yê mohra xwe li modernîteyê dayî erênî dibîne û vê rola wê weke pêşverû şirove dike. Immanuel Wallterstein vê hegemonyayê dişibîne şêrê ji qefesê derketî û hewce dibîne, rola wê ya erênî bi taybetî destnîşan bike. Tew wexta ku sedemên derketina holê ya hegemonyayê bi qelsbûna dêrê û qraltiyê ve û êrişên Moxolan ên li Rojhilat ve girê dide, hema bêje li xwe mikur tê, gelek pirsên mezin li cem wî peyde bûne. Di encamê de tê qonaxekê û dibêje, alternatîfeke qet ji bo dîrokê baş nîne. Jixwe hewce nake ku mirov encama xeternak a serdestiya pêncsed salên pere-sermayeyê deyne holê. Em tenê hejmara şeran û çiqasî dewam kirine, kesên di van şeran de hatine kuştin û birîndar bûne, encamên hilweşîner ên ji ber tengasiyên ekonomîk, bêkarî û rêjeyên xizaniyê li ber çavan bigirin û ya ji van hemûyan jî giringtir, em para şeran di felaketên ekolojîk de li ber çavan bigirin, em ê bi hêsanî bibînin ka em bi hegemonyayeke çawa re rûbirû ne.

Nabe ku em bibêjin, modernîteyê kapîtalîzm derxistiye holê; modernîte weke serdema xweser a xwezaya civakî pêk tê. Lê piştî ku bajar-çîn-dewlet weke yekdestdarên zordestî û mêhtinkariyê pêk hatin, mohra xwe li şêweyê jiyana demê didin û hewl didin wê bikin berhema xwe. Divê mirov qebûl bike ku di rewşên bi vî awayî de piranî serketî ne. Ev serketin a wê bangeşe û propagandayê ye ku heta îro her hatiye kirin. Serdemeke mezin ji heramzadeyan re hatiye hiştin. Dema ku têgîna modernîteya kapîtalîst tê bikaranîn, divê mirov vê rastiyê timûtim li ber çavan bigire. Lê xwezaya civakî ti carî û ti wextî kapîtalîzmê yan jî reng û kirasê yekdestdariyeke din, şêweyê wê yê hebûnê weke nasnameya xwe qebûl nake. Jixwe ji aliyê teorîk ve jî ne pêkan e ku xwezayên civakî bi xwe veguherin torên yekdestdariyê yên zordestî û mêhtinkariyê. Me eşkere kir, çawa ku kapîtalîzm bi temamî nabe kapîtalîzm, şaristanî jî bi temamî yekreng pêk nayên. Heke ji bo mêhtingehî û rêvebirinê civakek tinebe, bajar-çîn-dewlet tenê bi xwe nikarin hebin û nikarin hebûna xwe dewam bikin. Lê wexta ku civakek hebe, dikarin xwezaya wê bikojin û mohra xwe li wê bidin. Lewma nabe ku mirov Ronesans, Reform û Rohnîbûna navend Ewrûpa weke berhemeke kapîtalîzmê bibîne. Sermayedar û desthilatdar ne afirînerên Ronesansê ne, lê bi hêza xwe ya desthilatê û pereyan her tim xwestine mohra xwe li Ronesansê bidin. Ji ber ku pir baş dizanin; heke di vê de bi ser bikevin, wê bêhtir sermaye û pereyan bi dest xwe bixin.

Civaka ku di hedefa desthilatdaran û pere-sermayeyê de jî weke dijber dikare mohra xwe li şêweyê jiyana serdemê bide. Ji bo vê jî gelek rê û rêbaz, û mînak hene. Xwezaya civakî bi xwe jî meyla xwe li ser vî alî ye. Civak rojane di hedefa êrişên yekdestdariya mêhtinkarî û tehekuma sermayeyê de ye, lewma bi piranî antî-kapîtalîst e. Ciwan, jin, karker, gelên bûne mêhtingeh, gelek cemaetên dînî, her koma ku bi keda xwe debara xwe dike, girseya sereke ya civaka dîrokî, bi gotineke din, demos-gel ew beş in ku rengê esas ê modernîteyê û şêweyê jiyanê yê serdemê diyar dikin. Ji xwerêvebirina van beşan re demokrasî tê gotin.

Tişta ku rengê modernîteyekê diyar dike, îdeayên qutbên dijber in, awayê pêkhatinên wan e, asta wan a têkoşîn û serketinê ye. Mirov bi temamî bibêje, kapîtalîst e, yan jî bibêje, demokratîk e, ev awayekî hêsan ê pênasekirinê yê çor û korane ye. Dema ku mirov qala civakan bike, divê mirov di bikaranîna peyva ‘bi temamî’ de pir baldar be. Xwezaya civakî tevlîhev e, û ti carî bi tek rengî û bi temamî bi tek tiştî nayê pênasekirin. Divê em ji bîr nekin

ku ji bo nakokî hebe, pêdivî bi cudatiyê heye. Cudatî maneya jiyanê ye. Dema ku nakokî ango cudabûn bisekine, wê kêliyê jiyan disekine. Mirin bi xwe jî ji pênasekirina jiyanê û pê ve ti maneyeke xwe tineye. Kesên ku timî bixwazin bişibînin hev û wekhev bikin, armanca wan pelixandina dijberan e, naxwe ev înkara jiyanê bi xwe ye. Modernîteya kapîtalîst û faşîzm hewl didin tevahiya cudatî û cihêrengiyên civakê têk bibin û bikin yek reng, û ev hewldana wan mînakeke din e, ya ku dijberiya wan a jiyanê îsbat dike.

Hê jî di çarçoveyeke giştî de kapîtalîzm weke şêweyekî ekonomiyê tê dîtin. Ekonomî yek ji wan aktîvîteyên sereke ye; civak hebûna xwe pê domdar dike. Afirînera wê jî jin-dayik e. Nîşaneya vê yekê ya herî diyar jî civaka dayikê ye. Ekonomiya li dora jinê çêdibe, komînal û kolektîv e. Ne talanker û mêhtinkar e. Di vê çarçoveyê de kapîtalîzm ne ekonomî ye. Kapîtalîzm ew mêhtinkarî û talan e ku kujerê kastîk ew derxistiye holê. Kapîtalîzm kujerê kastîk didomîne. Tevî ku rastî bi vî awayî ye, ekonomî-polîtîka navend-Ingilistan, kapîtalîzmê weke şêweyê ekonomiyê yê herî pêşketî pênase û rewa kiriye. Ev di bin navê zanistê de hatiye kirin û yek ji xapandinên herî mezin e. Yekdestdarî û şêlankariya herî mezin di bin navê ekonomiyê de hatiye rewakirin. Di dîrokê de yekdestdarbûna herî mezin kapîtalîzm e. Mirov heta ku aliyên vê yekdestdarbûnê yên îdeolojîk, eskerî, huqûqî, siyasî, dewleta netewe û desthilatdarî nebîne nikare kapîtalîzmê pênase bike. Kapîtalîzm ne sîstemeke milkiyetê ya xusûsî ye ku hin muteşebîsan bi qabîliyet û afirîneriya xwe bi pêş xistiye. Heta yekdestdariya bi sazîbûyî nebe, ti muteşebîs nikare kapîtalîzmê bi pêş bixe.

Li şûna ku kapîtalîzm weke ekonomiyê were pênasekirin, divê weke bobelateke mezin a bi serê mirovatiyê de hatiye, were pênasekirin. Şerên pêncsed salên dawiyê hemû yekser an neyekser têkiliya xwe bi kapîtalîzmê re hene. Dîsa hejmara kuştiyên di van şerên dema modernîteya kapîtalîst de li hejmara kuştiyên di şerên tevahiya dîroka mirovatiyê de qat bi qat zêde kiriye. Roja me ya îro, Şerê Cîhanê yê Sêyemîn jî têkildarî mêhtinkariya kapîtalîst e. Ya din jî kapîtalîzm tenê bi şeran nakuje, weke sîstemeke kanserojen bi her tiştê xwe zindî û ruhberan tine dike. Herçiqasî sîstemên şaristaniyên dewletdar ên beriya modernîteya kapîtalîst xwedî karakterekî kanserojen bûn jî, lê evqasî tevahiya bunye û gewdeyê giştî nexistibûn tehlûkeyê. Her lebat û şaneya kapîtalîzmê bi kansêr e. Her lebat û şaneya wê kansêrê çêdike. Şêweyên wê yên jiyanê û bajarên wê, her kêlî mirovan dikujin.

B- Endustriyalîzm

Endustrî kengî dibe xwedî naverokeke îdeolojîk hingê weke endustriyalîzm tê pênasekirin. Roja me ya îro, di serî de felaketên ekolojîk, di bingehê tevahiya nexweşiyên modernîteyê yên li dijî mirov, xweza, cotkarî û gund de, dîsa ya li dijî pîşekariya bajêr a ji rêûresmê, endustriyalîzm heye. Endustriyalîzm îdeolojiya yekdestdarên sermayeyê ye. Şêweyê jiyana ʻmodern ʾa serdema me, bi awayekî ti carî nehatiye dîtin girêdayî endustriyê ye. Serê sedsala 19ʾan, bi şoreşa mezin a endustriyê ya bi pêşengiya Ingilistanê, pêngavek dan avêtin. Ev rewş, tevî ku xisleteke giring a modernîteyê ye, tekanetiya wê misoger nake, lê cudahiya wê nîşan dide.

Dema ku mirov hêza rexnekirinê li dijî modernîteya kapîtalîst bi pêş bixe, yek ji diyardeyên divê mirov jê bibihure, endustriyalîzm e. Lewma divê em pêşî endustrî û endustriyalîzmê ji hevdu cihê bikin. Raboriya endustriyê bi qasî dîroka mirovatiyê kevin e. Mirov kengî ji bilî destê xwe —ew lebatekî wî yê biyolojîk e— amûrekî din bi kar aniye hingê dîroka teknîk û endustriyê jî dest pê kiriye. Bi qasî ku tê zanîn, amûrê pêşî yê endustriyê kevir e. Paşê mirovan amûrên cot, tevnê, çûnûhatinê, dîzik û hwd. çêkirine.

Endustrî bi kujerê kastîk re dibe endustriyalîzm ango dîroka endustriyalîzmê bi derketina holê ya kujerê kastîk dest pê dike. Kujerê kastîk çav ber dide civaka dayikê û ji bo hebûna wê

bike ya xwe, di şerê li dijî wê de teknîkê bi kar tîne û bi vê re dîroka endustriyalîzmê dest pê dike. Çîna arîstokratîk li vê rêûresmê xwedî derdikeve û didomîne; endustriyalîzmê gav bi gav mezin dike. Bûrjûwaya kastîk a kapîtalîst ku ji nava çîna arîstokrasiyê derketiye holê, xisleta endustriyalîzmê ya roja îro dayê.

Bi modernîteya Ewrûpayê re di endustriyê de gavên mezin ên di asta şoreşê de hatine avêtin û bi vî awayî şoreşeke pîşesaziyê pêk hatiye. Ya ku kiriye ev şoreşa endustriyê pêk bê, rastiya civaka komîn e. Çawa ku tê zanîn, heta bi serdema modernîteya kapîtalîst, yê hildiberîne civaka komînal e. Civak ji bo debarê hildiberîne û di vê de teknîk-zanîn-ezmûnê bi kar tîne û di encamê de endustrî bi pêş dikeve. Şoreşên pîşesaziyê yên weke dolab, teşî, aş, motorên bi dûkelê û hwd. bi zanîn û tecrûbeya civaka hilberîner pêk hatine. Ti têkiliya modernîteya Ewrûpayê û bûrjûwaziya kastîk a kapîtalîst bi şoreşa endustriyê re tineye.

Têkiliya bûrjûwaziya kastîk bi endustriyê re ji daxwaza wî ya serdestiyê tê. Ew ji bo mêhtinkariyê dixwaze endustriyê bixe destê xwe. Endustriyalîzm, endustriyê ji xizmeta civakê derdixe û wê dike dijberê ekolojiyê. Endustriyalîzm, jiyana civakî û ekonomiyê li ser bingehê endustriyê ava dike. Endustriyê îdeolojîk dikin û bi vî awayî wê dikin pêkhateyek rê bide ber jiyana civakê. Di vê çarçoveyê de bûrjûwaziya kastîk a kapîtalîst dibe hêza îdeolojîk, siyasî, eskerî û mêhtinkariyê. Heta ku endustriyalîzm di vê çarçoveyê de neyê fêhmkirin wê gera li sîstem û jiyaneke alternatîf tewş be, û hewldanên di vî warî de hewante biçin. Ji ber ku bûrjûwaziya kastîk a kapîtalîst bi hespê xwe yê mehşerî ango endustriyalîzmê, bi hêza xwe ya îdeolojîk, siyasî û eskerî hegemonya xwe mayînde kiriye. Endustriyalîzm nebe hegemonya bûrjûwaziya kastîk a kapîtalîst jî ne pêkan e ku bibe.

Hem dewleta netewe hem jî kapîtalîzmê bi endustriyalîzmê re di zikhev de xwe ava û rêxistin kirine. Hêza siyasî, eskerî û mêhtinkariyê ya dewleta netewe û ya kapîtalîzmê, xwe disipêre endustriyalîzmê. Ji bo mirov vê rastiyê bibîne, hewce zêde bi tiştekî nake, mirov tenê lêbikole ka zanist û teknolojî ji kê re û ji çi re xizmetê dike, bi ser vê yekê ve dibe. Di modernîteya kapîtalîst de tevahiya lêkolînên teknolojîk û zanistî, û tevahiya hilberînê berjewendiyên dewleta netewe û kapîtalîzmê li pêş digirin. Teknolojiya bilind bi tevahî di destê hêza eskerî ya dewleta neteweye de ye. Îstîxbarat jî di nava vê de ye, ji ber ku îstîxbarat weke warekî eskerî tê pênasekirin. Heman tişt ji bo kapîtalîzmê jî bi vî awayî ye. Mêhtinkariya kapîtalîst bi teknolojiyeke bilind pêk tê. Navendên lêkolîn-zanist-teknîkê yên weke zanîngeh, NASA û CERN'ê (Navenda Lêkolîna Nukleer a Ewrûpayê) bîstûçar saetên rojê ji bo dewleta netewe û kapîtalîzmê dixebitin. Her teknolojiya bilind û pêşketî pêşî di warê eskerî de tê bikaranîn.

Yek ji maneyên endustriyalîzmê jî ew e ku bi armanca kara zêde zanist û teknîkê hildiberîne û difiroşe. Bûrjûwaziya kastîk a kapîtalîst bi propagandayeke mezin a îdeolojîk-hegemonîk mîna ku teknîk û zanistê ji bo xizmeta civakî hildiberîne nîşan dide. Lê rastî berevajî ye. Hilberîneke zanistî û teknolojîk nîne ku bi armanca kara zêde nebe. Jixwe, ev rewşa ku em qala wê dikin û işaret pê dikin, di jiyana rojane de bi awayekî beloq û balkêş xuya dike. Her diyardeyeke zanistî û berhemeke teknîkî ya di bin navê 'xizmetê 'de tê pêşkêşkirin, mirov di berdêleke giran a pere de dikarin bigirin.

Tevî van hemûyan, endustriyalîzm roja me ya îro weke amûrekî mezin ê kontrol û tepisandina civakê tê bikaranîn. Hêza teknîk-eskerî ya xeternak a di destê dewleta netewe de di dîrokê de weke hêza herî mezin a zor û tepisandinê ye. Teknolojiyên feza, ragihandin û înformatîk ji bo kontrol û şopandina civakê têne bikaranîn. Ji komputuran heta bi înternetê, ji telefonên destan heta bi navîgasyonê, tevahiya teknolojiyê ji bo kontrol û şopandina civakê di xizmeta dewleta netewe de ye.

Endustriyalîzm esas mekanîkeke hilweşandinê ye. Heke mirov li dîroka wê bikole, mirov ê bibîne, di bingehê wê de teknolojiya sîlehan heye. Ji ber ku dewleta netewe rejîmeke şer e, timî hewceyî teknolojiya sîlehan e. Lewma mirov bi hêsanî dibîne ku endustriyalîzm timî teknolojiya şer li pêş her tiştî digire û divê mirov vê xisleta wê paşguh neke. Heke mirov teknolojiya sîlehên nukleer ên roja me ya îro yên ku mirovatî anîn ber tinebûnê li ber çavan bigire, mirov ê bi hêsanî mîsyona esas a endustriyalîzmê bibîne. Divê mirov vî karakterê hilweşîner ê endustriyalîzmê paşguh neke, ji ber ku bi temamî amûreke qirkirina civakê ye.

Di çarçoveya endustriyalîzmê de yek ji pirsgirêkên herî sereke ew e ku wê cotkarî anî ber nemanê. Rewşa cotkariyê ya niha, civak aniye ber tinebûnê. Cotkarî tine bibe, civak jî namîne. Rewş evqasî xeternak e. Her ku diçe zeviyên bêne çandin, namînin. Erd û zevî êdî di destê şirîketên mezin ên endustrayalîzmê de ne. Şirîketên ku em qala wan dikin, korsanên roja me ya îro ne. Hema bêje, dest danîne ser tevahî erdên bi bereket. Yên desteser nekirine jî girêdayî sîstemên wan ên mafyatîk in. Yekdestdariyên endustriyal ên li ser cotkariyê hema bêje, tevahiya cotkariya dunyayê bi rê ve dibin.

Ev yekdestdarî ji bo kara zêde genên tovan û erdê diguherînin û bi vî awayî derbeke mezin li tenduristiya civakê dixin. Hema bêje, berhemeke cotkariyê ya bêyî OGG (Organîzmaya Genetîka wê Guherandî) nemaye. Di vê mijarê de rewşeke hefsarê xwe qetandî heye. Qirêjbûna avê, deryayê û hewayê, roj bi roj çolbûna erd û axê, xweza ket rewşekê êdî nikare nufûsa mirovan xwedî bike, û ev hemû têkildarî endustriyalîzmê ne. Okyanûs û deryayên me tijî zibale û gemar bûye û ev her diçe zêdetir dibe. Bajar jî bûne jêderên konserojen. Remz û nîşane hemû, mîna vegotinên kitêbên pîroz ên derbarê qiyametê de ne; em roj bi roj ber bi wir ve diçin. Bi vî awayî bidome, bivênevê wê xelayeke mezin rabe.

Divê mirov endustriyalîzmê weke sîstemeke aktîvîteyan û fikireke yekpare ya li ser bingehê dijberiya ekolojiyê bi gewde bûyî, bibîne. Çi fikir û çi teknîka endustriyê ya di kirasê zanistî de hatiye kirin û bi pêş xistin, bêpirs û bêîfade hatiye qebûlkirin. Girêdayî hilberîna zêde, civakeke zêdexur û musrîf hevsengiya xwezayê xira kiriye. Teknolojiya bilind bi gazên ku berdaye xwezayê, pêkhateyên atmosferê ji hev xistine, rê li germbûna global vekiriye, germbûna global jî rê li hişkesalî û felaketên xwezayî vekiriye. Endustriyalîzmê mirovatî gihand qonaxekê, ew jî hilweşandina ekolojiyê ye.

Di mijara endustriyalîzmê de babeteke din heye ku divê mirov ji dil pê dakeve, ew jî babeta aqlê çêkiriye. Endustriyalîzm her roj bangeşe û propagandayê dike ka aqlê çêkirî çiqasî jiyana mirovan hêsan dike. Bi vê bangeşeyê robotwarbûna ku wê bi xwe afirandiye, vedişêre. Aqlê çêkirî ji aliyê aqlê mirov ê muhteşem ve hatiye çêkirin û endustriyalîzm hewl dide li şûna aqlê mirov, aqlê çêkirî bi cih bike. Çawa ku tê zanîn, aqlê çêkirî tê programkirin û barkirin. Tu çi lê bar bikî ew ê jî li gorî wê bixebite, ew ê nikaribe tiştekî lê nehatibe barkirin an jî programkirin bike. Tevî ku rastî ev e, ji bo kara zêde mirov bi vê xistine rewşeke bêkêr û netiştek. Lê ya rastî, aqlekî mirov ê muhteşem heye ku ji aliyê gerdûnê ve hatiye afirandin. Ji bo endustriyalîzm bêhtir karê bike, aqlê çêkirî bi kêr tê. Dema ku em wisa dibêjin, ev nayê wê maneyê ku divê civak teknîkê bi kar neyne. Berevajî divê civak teknîkê bi kar bîne, lê divê li gorî civaka ekolojîk bi kar bîne.

Endustriyalîzm, bi giranî weke diyardeyeke notr tê qebûlkirin. Tê gotin, “Ew bi xwe ne pirsgirêk e, fikira serdest a wê bi kar tîne pirsgirêk e”. Marks bi xwe jî pêşketinên endustriyal xweş dîtine, pesnê wan daye. Lê ya rastî, endustriyalîzm ewqasî jî bêguneh nîne. Ji aliyekî ve şikil dide civakê; ji aliyê ekonomîk û sosyolojîk ve heta ji aliyê hêza fikirî ve civakê çêdike û rê dide ber wê. Mirov tenê li encamên bajarbûna girêdayî endustriyê binêre, mirov ê hilweşîneriya endustriyalîzmê bibîne û di vî warî de têra xwe bibe xwedî fikir. Ji ber van

sedeman, divê mirov ji nû ve û li ser bingehê rexnekirinê, bi endustriyalîzmê dakeve û wê pênase bike, ev ji bo wergirtina tedbîrên hewce, şert e.

C-Dewleta Netewe

Ji bo kapîtalîzm civakê fetih bike û wê bike mêhtingeh, dewleta netewe amûra sereke ye. Di aktîvîteyên ji bo kapîtalîzmê de dewleta netewe formeke sereke ya amûrî ye. Lîberalîzm xwe weke yekparebûna tevahiya îdeayên armancan pêşkêş dike, dewleta netewe jî weke formê bingehîn ê desthilatdariyê bi gewde dibe. Civak di dîroka xwe de ti carî evqasî ji derve û hundir ve nebû mêhtingeh û nehat fetihkirin, heke forma dewleta netewe nebûya, ne pêkan bû ku ev pêk bihata. Di dîrokê de cudahiya dewleta netewe ew e ku yekdestdarî hemû bi awayekî pir baş di nava xwe de kiriye yek. Dewleta netewe di asta herî jor de yekparebûna sermayeyê ye û hêza xwe jî ji vê pozîsyonê digire. Amûra herî bi bandor a daneheva sermayeyê ye û ev jî ji vê pozîsyona wê ye. Rêxistiniya dewleta netewe, awayê herî kurtebirr û karakterîstîk ê rêxistiniya dewleta sermayeyê ye. Bi dewleta netewe ne sosyalîzm, lê tenê kapîtalîzmeke temam birêxistin dibe.

Tevî vê, ne pêkan e ku mirov yekdestdariya dewleta netewe ji formê dewletê yê dîrokî qut, rave bike. Herçiqasî ji formên dewletê yên dîrokî cuda bûbe û bêhtir bi pêş ketibe jî ya diyarker daneheva dîrokî ya desthilatdariyê ye. Danehevên desthilatê yên weke yekdestdarî bi hezarê salan nisilîne, ketine serhev û heta roja me ya îro hatine heke nebin, bi giştî dewlet, bi taybetî dewleta netewe, çênabe.

Dewleta netewe ji yeqînan wêdetir bi têgînên îlahî barkirî ye, lewma bi awayekî di dîrokê de hîç nehatiye dîtin xwedî merasîmên pîrozkirinê ye. Xwe disipêre sembol û têgînên weke ‘welat’, ‘al’, ‘uniterî’, ‘serxwebûn’, ‘pîroztî’, ‘sirûda neteweyî’ û ‘çîrokên lehengiyê’. Ev hemû têgîn û sembol ji dema qral-xwedayan zêdetir bi payeyên îlahî barkirî ne. Ti şêweyê dewletê, bi qasî şêweyê dewleta netewe bi zirxê îdeolojîk, huqûqî, siyasî, ekonomîk û dînî nehatiye gurçûpêçkirin. Sedema bingehîn a vê yekê jî ew e ku ji bo burokrasiyeke eskerî-sivîl a gelek qelebalix, bûye çavkaniyeke sereke ya debarê. Ji bo burokrasiyê dewlet meseleyeke manûnemanê ye. Di navbera modernîte, dewleta netewe, nexasim jî ‘yekîtî-unîterî’ û têgîna yekîtiya xwedê de têkiliyeke nêz heye. Çawa ku di dîrokê de hin qebîle û qewmên hatine tesfiyekirin di nava qebîle û qewmên serdest de hatine helandin û ew hemû kirine yek, xwedayên wan jî di nava xwedayê qebîle û qewmên serdest de helandine û kirine yek. Dema ku em di çarçoveya vê rastiya sosyolojîk de li têgîna yekîtiyê ya xwedê binêrin, em ê hêsantir li maneya wê serwext bibin. Di navê de mêhtingerî û asîmîlasyon heye.

Dîroka unîteriya dewleta netewe têra xwe îlahî ye. Civaka ku peyrewê wê ye, bi temamî ji sîlehan dike û sîlehan hemûyan dixe yekdestdariya dewleta modern û bi vî awayî unîteriyê pêk tîne, lê bi vê, ya ku pêk tê di esasê xwe de yekdestdariyeke xeternak a mêhtingerî û mêhtinkariyê ye. Teorîsyenên serdestiyê, dema ku bi navê zanistê dewleta modern pênase kirine, xizmeta herî giring ji yekdestdariya kapîtalîst re kirine. Bi bahaneya “huzûra civakê” sîleh hemû li bin destê pêkhateyeke tekperest civandine û bi vî awayî, civak, bi qasî ku di ti dema dîrokê de nehatiye dîtin ji hêza wê ya polîtîk hatiye kirin ango civak ji hebûna wê ya ekonomîk hatiye mehrûmkirin. Li gorî tehlîla dawî, heke dewlet û desthilatdarî wê weke yekdestdariyekê tevbigerin, bi evqas hêza mezin a sîlehan, ti nirxê civakî nîne ku ew nikaribin bi dest bixin.

Dewleta netewe weke navenda hevpar a yekdestdaran, li ser desteserkirin, fetih û mêhtingehkirina çanda maddî ya civakî ava dibe; di asîmîlasyona çanda manewî de jî bi rola diyarker radibe. Di bin navê çanda neteweyî de bi piranî etnîsîteyeke serdest an jî pîvanên çandî yên cemaeteke dînî fermî dike û li dijî tevahî hebûnên çandî yên mayî dest bi şer dike.

Gelek dîn, etnîsîte, qewm, netewe, ziman û çand bi hezarê salan hebûna xwe parastine; lê bi bahaneya ku "ji yekparebûna neteweyî re zirar in" wan hemûyan geh bi zorê geh bi teşwîqên maddî ber bi tinekirinê ve dahf dide. Bi qasî ku di dîrokê de hîç nehatiye dîtin, dîn, mezheb, ziman, qebîleyên etnîk, eşîr, qewm û netewe bûne qurbanê van polîtîkayan, ya rastî, bûne qurbanê qirkirinê. Di warê fizîkî de tinekirin tê maneya qirkirinê, lê qirkirina fizîkî li cem qirkirina manewî ne tiştek e. Nirxên çandî û zimanên hezarê salan hebûna xwe parastine û heta roja me ya îro hatine, bi çavsorî û bi hovî, van hebûn û nirxan di bin navê afirandina 'yekîtiya neteweyî' de dikin qurban û tine dikin.

Dewleta netewe, li pêkhatinên siyasî yên cuda, li pirrengî û pirdengiyê têra xwe girtiye. Divê sedema vê were fêhmkirin. Pêkhateyên siyasî yên cuda û pirreng, di nava sînorên heyî de li hemberî mêhtinkariya yekdestdariyê asteng in. Civaka exlaqî û polîtîk, li gorî xwezaya xwe, bi pêkhatineke siyasî, nexasim jî bi pêkhatineke siyasî ya demokratîk xwe heyî bike, ev yek wê qadê li yekdestdaran têra xwe teng bike. Têgînên weke, serwerî nayê parvekirin, yekparebûna welêt û pêkhateya unîter çêkirine da ku nirxên welêt bi gel re parve nekin. Di tinekirina çanda manewî de jî ev bahane bi rola sereke radibin. Tevî ku pirrengiya demokratîk a siyasî, di çarçoveya wekheviyê de hem li ser bingehê azadiyê hem jî li ser bingehê cudahiyan rejîma herî guncav e, wê van hemûyan weke aktîvîteyên li dijî 'yekparebûna welêt û rejîmê' bi tehlûke bi nav bikin û dij-qanûnê nîşan bidin.

Dewleta netewe, nasnameya millî pir bi kar tîne û ji vî aliyî ve di dîrokê de nûner û hêza herî hevkar a hegemonyayê ye. Bi maskeya millî hevkarê herî dilsoz ê sîstema kapîtalîst a cîhanê ye. Ti sazî bi qasî dewleta netewe girêdayî hêza hegemonîk, hêza navenda kapîtalîzmê ya cîhanê nîne, û ti hêz bi qasî wê xizmetkarê vê hêzê nîne. Ji ber vî karakterê xwe mêhtinkarên navxweyî ne. Dewleteke netewe çiqasî milletperest be, û xwe wisa nîşan bide jî ewqasî jî xizmetkarê hêza hegemonîk a sîstema cîhanê ye. Hêza hegemonîk, pêncsed sal in; bi taybetî şikil daye dewletdariya netewe û bi destê xwe sîstematîze kiriye, lewma kesê ku dewleta netewe milletparêz bibîne, ev tê wê maneyê, ji şerên hêzê yên hegemînok ên xeternak ên sîstema cîhana kapîtalîst ti tişt fêhm nekiriye.

Dewleta netewe di hegemonya îdeolojîk de çar formên îdeolojîk di zikhev de û bi awayekî eklektîk enjekteyî civakê dike. Ew çi ne; milletperestî, zanistperestî, cinsperestî û dînperestî ne. Dewleta netewe, ji bo bazirganî, pîşesazî, yekdestdariya fînansê, yekdestdariya desthilatdariyê û mêhtinkariyê pêk bîne, hem faşîzmê bi kar tîne ku awayê herî xeternak ê zorê ye, hem jî şert dibîne ku hegemonya îdeolojîk a çar eklektîkan bi kar bîne. Hegemonya îdeolojîk nebe, rejîma faşîst nikare xwe bidomîne.

4-Modernîteya Demokratîk

Ji bo em ji modernîteya kapîtalîst û sosyalîzma pêkhatî ya ku jê re xizmet kirî bibihurin, me hewl da ku em analîzeke nû û teoriyeke alternatîf çêkin, û me navê wê jî kir Modernîteya Demokratîk. Binavkirineke bi vî awayî di cih de ye, realîst e, û dikare bersiv bide pêdiviyên civakê. Me gotibû, sê lingên modernîteyê hene û yek jê kapîtalîzm e. Li şûna vî lingî, lingê modernîteya demokratîk komîn-komînalîte ye ku yekeya herî bingehîn a civaka exlaqî û polîtîk e. Li şûna endustriyalîzmê eko-ekonomî ye. Li şûna dewleta netewe jî neteweya demokratîk e. Me analîza van kir. Me di analîza van waran de têkiliya di navbera wan de jî danî û bi vî awayî me sîstema xwe ya civaka azadîxwaz çêkir û weke Modernîteya Demokratîk bi nav kir û me dît di warê civakî de berdêleke wê ya giring heye.

Di van sê waran de jêrnav hene. Yek ji jêrnavên herî giring, komînalîteya azadîxwaziya jinê ye, wekî din jî exlaq û polîtîka ye. Em vê sîstemê tevde û li ser hev weke Modernîteya

Demokratîk pênase dikin û ev têra pênasekirinê dike. Di dînan de qala roja mehşerê tê kirin û ev pênasekirin ne tenê ji bo dunya din e, ji bo vê dunyayê jî tê bikaranîn. Tişta ku modernîteya kapîtalîst bi serê mirovatiyê de tîne, mehşer e. Tehlûkeya ku kitêbên pîroz qala wê dikin jî bi her halî ev e. Ya ku diviyabû ber li vê tehlûkeyê bigirta sosyalîzm bû, lê bihêlin berlêgirtinê, berevajî vê, aşê wê gerand û bû ardê cinawirê modernîteyê. Sovyet û Çîn ji bo vê yekê bi awayekî eşkere mînak in. Pêşengên Çîniyan, mirovên balkêş in. Wan hewl da kapîtalîzm û sosyalîzmê bi hev re pêk bînin. Ew jî dibe, ango dibe ku mirov lê bifikire, lê Çînê di pêkanînê de sosyalîzm xist xizmeta kapîtalîzmê. Encam, ji kapîtalîzmê re xizmet kirin û temenê wê dirêj kirin. Roja me ya îro, kapîtalîzma Çînê bi Emerîkayê re di warê hegemonyayê de têdikoşe. Heye ku Emerîka pir bi dijwarî bersiva vê bide û ev jî dikare şerekî nukleerî bixe rojevê. Ha mehşer jî wê ev be. Bi pênasekirin û gotina Einstein, "Heke Şerê Cîhanê yê Sêyemîn bi sîlehên nukleer biqewime û di encama vî şerî de hinek sax bimînin, Şerê Cîhanê yê Çaran wê bi dar û keviran pêk bê".

Sîstema şaristaniya cîhanê, ev panzdeh hezar sal in ku li çareyê digere. Di vê çarçoveyê de tevahiya amûrên xwe yên maddî û çanda manewî ceribandine, qedandine. Bi amûrên şer êdî cihekî were fetihkirin û ji nû ve bidestxistin nemaye. Heke mabe jî fetihkirin ji karê zêdetir wê qat bi qat zirar be. Herçiqasî bi yekdestdariyên medyayê, civakê di dunyayeke farazî de bifetisînin, serkorî bikin, bitevzînin û bêkêr bikin jî, bi amûrên desthilatdariyê her şane û çaviyê kontrol bikin jî sîstema modernîte û şaristaniya cîhanê ya bi giştî panzdeh hezar salî, bi taybetî jî di van pêncsed salên dawî de tevî zêhniyet û pêkhateyên xwe hemûyan pêxîrtengî bûye û bi temamî lê şidiyaye. Fînans kapîtal ku bûye hêza global û hegemonîk, ji bo vê rewşê, eşkere li ber çavan e. Fînans kapîtal çerxên vê dunyayê digerîne û ev dunya jî ji pêxîrtengiyê di nava krîzan de diperpite.

Çawa ku pêncsedsalên dawî yên şaristaniya klasîk a modernîteya kapîtalîst bi awayekî xweser weke hegemonya kapîtalîzmê tê pênasekirin, divê pêncsed salên dawî yên şaristaniya demokratîk jî bi awayekî xweser weke modernîteya demokratîk were pênasekirin. Modernîteya demokratîk, li her war û dema ku tevn û torên modernîteya kapîtalîst xwe vegirtibin, ew li wir weke qutbekî dijber heye. Serketî yan jî binketî, azad an jî kole, bişibe yan jî cuda be, ji wekheviyê dûr be yan jî nêzî wekheviyê be, ekolojîk û femînîst, xwedî mane be yan jî ji maneyê dûrketî be, xulase nêz an jî dûrî xisletên civaka exlaqî û polîtîk be, modernîteya demokratîk li her mekan û zemanî di nava modernîteya kapîtalîst de her heye.

Modernîteya demokratîk ji dema ku şaristaniya fermî derketiye holê û vir ve, bi awayekî dualîte li her zeman û mekanî hebû. Em jî dixwazin vî şêweyê şaristaniyê yê li her zeman û mekanê şaristaniya fermî hebû ango vê şaristaniya demokratîk a nefermî bibînin û nirxê ku heq dike bidinê; bi xal û rahendên sereke wê bi awayekî balkêş rave bikin.

Modernîteya demokratîk sîstemek e; xwedî wê xisletê ye, rêya rewa ya guhertinê vekirî dihêle. Di warê exlaqî û polîtîk de xwedî nirxekî payeberz e, û ev bi vî cewherê wê yê sîstemîk ve têkildar e. Rêya rewa ya guherînê hem pir giring e, hem jî ewqasî besît e. Her endamê civakê, çi wext û çi demê dibe bila bibe, dikare bi kêra vê guherînê bê. Endamekî civaka klanê û endamekî wê yê li Moskowê yan jî li New Yorkê xwedî wê potansiyelê ye ku dikare bi kêra guherînê bê. Ji bo vê, hewceyî bi vegotinên mezin ên pîroz û çalakiyên qehremaniyê tineye û şert nîne. Tenê şertek divê: Divê mirov bi awayekî bingehîn weke awayê hebûnê yê xwezaya civakî, bi exlaqî û polîtîk bifikire û xwedî qabîliyet be, li gorî wê tevbigere; em yeqîn dikin ku kêm be jî ev qabîliyet di her ferdî de heye; ya giring ew e ku mirov vê xûypakî û fazîletê bi kêrhatî bike. Di tevahiya civaka dîrokî de vegotinên mezin û pîroz derketine holê û ji bo rêya rewa ya guherînê rohnî bikin di bîra mirovatiyê de cih girtine û ev bêqîmet nînin. Berevajî vê, wexta ku yekdestdarên maddî û îdeolojîk rêya rewa ya guherînê digirin, bar û rol dikeve

stûyê van vegotinan. Dîsa bi heman awayî, çalakiyên qehremaniyê yên li ser rêya diçe azadiyê nirxên pîroz ên bêhempa ne. Ya giring ew e, divê mirov ji bîr neke ku guherîna di modernîteya demokratîk de tevahiya hewldanên civaka dîrokî nebin, pêk nayê. Rola kesayetên giring û rêxistiniyan nayê înkarkirin. Lê heke ev nebin malê şaneyên exlaqî û polîtîk ên civakê û di rêya rewa de neçin, wê maneya vê rolê zêde tinebe.

Guherîna civakî ya bi rêyên rewa pêk neyê û nebe malê şaneyên exlaqî-polîtîk, divê mirov vê guherînê weke ya xwezaya civakî bi xwe nebîne. Civak nayên afirandin, dijîn û pêk tên. Jiyan ji jiyanê ferq dike. Çawa ku jiyanên bêhtir azad, wekhev û demokratîk hene, herweha jiyanên kole yên mirov nikare xwe li wan ragire, newekhev û bi dîktatorî jî hene, û belkî ew zêdetir in. Modernîteya demokratîk, ew pêkhatin û zêhniyet e ku di van şertan de bi rêyên guncav jiyanê bêhtir azad, wekhev û demokratîk dike. Li ber rohniya dersên ku em ê ji têkoşînên azadî, wekhevî û demokratîk ên pêncsed salên dawî bigirin, pêkan e ku em di vê dema pêxîrtengiya hegemonya fînans kapîtalê de modernîteya demokratîk bi hêz bikin û ji nû ve ava bikin. Lewma divê em hûrûkûr bi rahend û şaxên modernîteya demokratîk dakevin û xwe rohnî bikin da ku hewldanên me yên di vî warî de bêhtir serketî bin.

A-Civaka Komînal a Demokratîk (Civaka Exlaqî û Polîtîk)

Civaka Komînal a Demokratîk bi xwe civaka exlaqî û polîtîk e. Civaka exlaqî û polîtîk ji aliyekî ve bi qencî, bextewarî, rastî û bedewiyê re, ji aliyê din ve jî bi azadî, wekhevî û demokratîkbûnê re bi xwe di nava têkiliyê de ye. Qencî û bextewarî cewherê exlaq in. Rastî bi heqîqetê re têkildar e. Tewş e ku mirov li derveyî civaka exlaqî û polîtîk li heqîqetê bigere. Tişta ku exlaqî û polîtîk nebe, nagihîje heqîqetê. Bedewî bi xwe jî armanca estetîkê ye. Bedewiya li derveyî civaka exlaqî û polîtîk, bedewî nîne. Bedewî exlaqî û polîtîk e. Ti civak bi qasî civaka exlaqî û polîtîk xwedî hêza pêkanîna azadî, wekhevî û demokrasiyê nîne.

Di ti civakê de ti kes nikare exlaq û polîtîkayê bi temamî ji holê rake, lê dikare kêrhatina wan pir teng bike. Modernîteya kapîtalîst di tehekuma dewleta netewe de polîtîka û exlaq daxistiye asta herî jêr, hema bêje, daxistiye sînorê tinekirinê; ewqasî qûş lê teng kiriye. Modernîteya kapîtalîst di bin navê homojenkirinê de çanda tektîp çêdike û welatiyan digihîne û wê bi vê yekê guherîn teng kiriye, daxistiye asta dualîteya em û yê din. Bi awayê xuya dike, fena ku civakeke modern a di nava guherîneke bêserûbinî de heye û dîmenekî wisa rengîn tê nîşandan. Lê ev bi temamî dîmenekî medyatîk e, û ji dîmenê propagandayê pê ve tiştekî din nîne.

Civaka exlaqî û polîtîk bi rewşa xwe ya modernîteya hemdem civaka demokratîk e, û tê de cudahî û cihêrengî bi awayekî berfireh dijîn. Divê civaka demokratîk bi çanda tektîp û welatîbûnê neyê mehkûmkirin, berevajî vê, divê kom hemû karibin bi çanda xwe û li dora nasnameya xwe li ser bingehê cudahî û cihêrengiyên pêkhatî bi hev re bijîn. Kom ji cihêrengiya nasnameyê heta bi cihêrengiya siyasî, dikarin hêza xwe nîşan bidin û veguherînin jiyaneke çalak û xweş. Li cem ti kom û komikê wê tirsa homojenbûnê tinebe. Tekrengî wê weke kirêtî, bêzarî û xizanî were dîtin. Pirrengînî jî di nava xwe de dewlemendî, xweşbînî û bedewiyê dihewîne. Di nava van şert û mercan de azadî û wekhevî wê bêhtir pêk bên. Jixwe azadî û wekheviya xwe bisipêre cudahî û cihêrengiyê bi nirx û bi qîmet e. Çawa ku di ezmûn û tecrûbeyên cîhanê hemûyan de isbat bûye, wekhevî û azadiya bi destê dewleta netewe tenê ji bo yekdestdaran e. Yekdestdarên sermaye û desthilatê, ti carî azadî û wekheviya rastî nadin. Azadî û wekhevî tenê bi şêweyê siyaseta demokratîk a civaka demokratîk bi dest dikeve, bi xweparastinê jî bergiriya wê tê kirin. Her ferd û kom, divê di mijarekê de paşde gav neavêje û bi israr be, ew jî civaka exlaqî û polîtîk e. Ji bo cihêrengî, wekhevî û azadiyê tenê

şertek bes e, ew jî civaka exlaqî û polîtîk e. Civaka demokratîk a ku weke rewşa civaka hemdem a dîrokî ye, roj bi roj bêhtir xwe isbat dike.

Civaka exlaqî di şertên modernîteya kapîtalîst de ketiye rewşekê ku di dîrokê de ti carî ewqasî dor lê nehatiye tengkirin, bêkêr nehatiye hiştin û ji qîmetê neketiye. Dîsa, bi awayekî ku ti carî di dîrokê de nehatiye dîtin li şûna pîvanên exlaqî kodên huqûqî hatine bicihkirin. Bûrjûwazî weke çîn exlaqê bêqîmet dike, serdestiya xwe ya çînî di bin navê huqûqê de hûrûkûr bi kod dike û li ser civakê ferz dike. Li şûna civaka exlaqî, civaka huqûqî tê avakirin. Em li vir bi guhertineke gelekî giring re rûbirû ne. Di dîrokê de jî em hewldanên huqûqîkirinê dibînin. Lê huqûq ti demê bi qasî modernîteya bûrjûwaziyê bi hûrgiliyan nehatiye fetisandin. Ya rastî, ya di bin navê huqûqê de tê kirin yekdestdariya çînî ye, afirandina yekdestdariya huqûqî ye. Xwezayeke mîna civakê gelekî tevlîhev nabe ku bi huqûqê were birêvebirin. Bi şertê ku adil be, cihê huqûqê di civakê de heye, di vê çarçoveyê de bêyî huqûqê nabe. Lê di bin navê huqûqa pozîtîv de huqûqa bi destê dewletê li ser civakê tê ferzkirin, ne huqûq e, ew huqûqeke wisa ye ku kirasê huqûqa çîna serdest û yekdestdariya neteweya serdest lê hatiye kirin ango pîvanên dewleta netewe ne.

Dewleta netewe ya modernîteyê civaka polîtîk li hemberî hebûn, yekîtî û yekparebûna xwe tehlûke dibîne. Lê ya rastî, dewleta netewe ne tenê hêmana polîtîk a ku civak pê heye, dorteng dike, ji vê jî wêdetir, wê bêkêr dike û ne tenê burokratîzm û îdarekariya dewleta netewe li ser serê civakê weke şûrê Demokles dihejîne, her saet wê hûrhûrî dike, digurîne. Ev rastî, pirsgirêka bingehîn a felsefeya polîtîk a serdema me ye û weke faşîzmê li pêşiya jiyana pratîk astengiya herî mezin e. Em vê jî bêjin, erê Hîtler weke şexs bi bin ket, lê sîstema wî bi ser ket. Jiholêrakirina civaka polîtîk û li şûna wê serdestkirina dewletdariya netewe bi faşîzma Hîtler re heman tişt e. Herçiqasî Hîtler di serxistina vê yekê de ne kesê yekem be jî lê ew kes e ku bi awayekî fermî ev ragihandiye û xwedî lê derketiye.

Civaka ku pîvana wê ya polîtîk tinebe, bi kêr neyê yan jî ji holê hatibe rakirin, weke meytekî ye; mirov dikare halê wê yê herî baş weke civaka mêhtingeh pênase bike. Ji lewra civaka demokratîk, pîvana polîtîk a civakê kêrhatî dike û ev bi qasî manûnemanê giring e. Weke sîstem, ev delîlê sereke yê serketina wê ye.

Dîroka şaristaniyê bi awayekî ji awayan dîroka dortengkirina civaka polîtîk e, dîroka bêkêrkirin û bêqîmetkirina wê ye. Çînîkirina civakê, di encama têkoşîneke polîtîk a dijwar de çûye serî û tê de dewlet bi ser ketiye. Divê mirov gelekî hay ji vê xusûsê hebe. Yên herî zêde serê xwe li ser têkoşîna çînî êşandin Marksîst bûn, lê wan jî nekarî xwezaya çînîbûnê baş diyar bikin. Çînîbûn weke fazîletekê û weke pêşdebira dîrokê analîz kirin. Di dîrokê de ew weke qonaxekê destnîşan kirin û bawer kirin ku ew qonax pêk neyê nabe mirov derbasî qonaxa din bibe. Li çînîbûnê weke pirekê fikirîn û ev jî weke şertekî materyalîzma dîrokî dîtin. Me di tehlîla xwe ya şaristaniyê de, çînîbûn weke dortengkirin û bêkêrkirina civaka exlaqî û polîtîk diyar kir û bi giringî got, çînîbûn çiqasî bi pêş bikeve civak jî ewqasî dikeve bin hegemonya û desthilatdariya dewletê. Di vê çarçoveyê de mirov dikare bibêje, dîrok bi têkoşîneke dijwar a çînî derbas bûye. Îca bihêlin ku mirov çînîbûnê weke pêşketin û pêşdeçûnê bibîne, berevajî paşketin û kêmketina civakî ye. Ji aliyê exlaqî ve ne pêşketineke qenc lê pêşketineke xirab e. Dibêjin û îddîa dikin ku ji bo pêşketinê çînîbûn qonaxeke pêwîst e, û ev awa gotin bi Marksîstî tê bilêvkirin û ev şaşiyeke ciddî ye ku têkoşîna azadiyê dike.

Yek ji xisletên herî giring ên civaka polîtîk ew e, timî li dijî çînîbûnê li ber xwe dide. Civaka herî kêm xwe çînî dike civaka herî baş û qenc e. Heke têkoşîna polîtîk civaka xwe çînî neke ango civaka xwe bi awayekî yekalî nexe bin zora amûrên dewlet û desthilatdariyê hingê serketina xwe isbat dike. Civakek heta bi qirikê di zora dewlet û desthilatdariyê de bist bûbe, ew civak nikare qala têkoşîneke polîtîk a serketî bike. Yan wê xwe hîç nexe bin zora hundir-

derve ya dewlet û desthilatdariyê yan jî piştî têkoşîneke dijwar bi rizayeke beramber bi dewlet û desthilatdarê re li hev bike, dewlet û desthilatê nas bike; ev ji bo civaka polîtîk a herî îdeal e, guncav e.

Mirov çiqasî karibe xwedî li civakê derkeve, ewqasî dikare azadiyê bi dest bixe û ji bo vê modernîteya demokratîk rêya bi tenê ye. Civaka ku bi siyaseta demokratîk li dijî ferdperestiyê, dewleta netewe û yekdestdaran xwe biparêze, dikare şaneyên xwe yên polîtîk kêrhatî bike û xwe veguherîne civakeke demokratîk. Civaka demokratîk a modern jî li ser karûbarên civakî hemûyan difikire, dipeyive, xwe digihîne pozîsyona biryardanê û bi vê yekê jî civakê çalak dike; li ser vî bingehî wekhevîbûna cudahî û cihêrengiyan, pirrengî û pirdengiyan pêk tîne; bi vî awayî jî payeberziya xwe isbat dike. Bi vî awayî, modernîteya demokratîk li ser bingehekî rast ne tenê têkoşîna çînî dike; di heman demê de şaşiya trajîk-dîrokî ya sosyalîzma pêkhatî nake ango desthilatdariyeke nû yan jî dewletekê ava nake; nakeve feqeke wisa ya dîrokî û pê civaka xwe nafetisîne. Haya xwe jê heye ku çiqasî bibe desthilat û dewlet, ewqasî çînîbûn bi pêş dikeve ango di têkoşîna çînî de bi bin dikeve. Divê ev hayjixwebûn weke yek ji xisletên bingehîn ên modernîteya demokratîk were diyarkirin.

Civaka komînal a demokratîk, formê bingehîn ê berxwedanê yê modernîteya demokratîk li dijî kapîtalîzmê ye. Hebûna civakî-dîrokî li ser bingehê komînê ye. Ji bo kapîtalîzmê civak tineye, ferd heye. Encama vî karakterê kapîtalîzmê yê dijberê civakê, dike ku civak were tinekirin û komên bi ferdan sînorkirî bêne çêkirin. Bingehê felsefeya lîberalîzm xwe disipêriyê, înkara civakê ye. Têgihiştineke ferdperest a xwe disipêre înkara civakê bi pirsgirêk e. Îdrakeke azadiyê ya xapînok a xwe disipêre ferd diafirîne. Lê ya rastî, ferd li dijî civakbûnê çênabe. Ferd tenê dikare bi civakbûnê hebe. Lewma li cihekî civak were înkarkirin, ne azadiya ferd, ne jî nasnameya ferd çêdibe.

Li hemberî vê, komîn jî karakterê avakirina civakê ye. **Komîn, şêwazê hebûna civakê ye; şaneya kok e.** Komîn bi xwe di nava xwe de azadî û wekheviyê dihewîne û di heman demê de xwedî xisleteke demokratîk e. Armanca kapîtalîzmê dejenerekirina demokrasiyê ye; hewl dide wê bixe rewşeke wilo ku dijberiya civakê bike. Li hemberî vê, komîn bi demokrasiyê li ser piyan dimîne. Armanca civaka demokratîk ew e ku pîvanên civakî û xisletên civaka dayikê yên ji klanê heta roja me ya îro, ji nû ve li ser civakê serdest bike. Heke komîn şaneya kok a civakê ye, wê demê ji bo civak hebe, divê ev şaneya kok ji nû ve were aktîvkirin û çalakkirin. Civaka demokratîk weke esas xwe disipêre xwerêvebirin û xweparastinê. Komînalîte navê sîstema civaka demokratîk e; cudahî û cihêrengiyan di nava xwe de dihewîne, ji hev cudakirina etnîk û baweriyan tercîh nake.

Sosyalîzm, bêyî demokrasiyê nabe. Civaka ku sosyalîzm dixwaze ava bike, civaka wekhev û azad e. Civaka wekhev û azad jî ew e, gel bi keda xwe debara xwe dike û bi keda xwe, xwe bi rê ve dibe. Komîn, wexta ku pêşî were avakirin, divê demokratîk be. Demokrasî, piştî ku rêveberî dewr bê girtin, nabe ku were avakirin. Jixwe “demo=gel”, “krasî=rêveberî” ye. Rêveberiya gel tenê di şert û mercên azad û wekhev de pêkan e, naxwe sosyalîzm bêyî demokrasiyê nabe. Heke li cihekî demokrasî nebe, teqez wê olîgarşiya kapîtalîst pêk bê. Ya ku li Rûsya û Çînê pêk hat, ev bû. Tişta ku jê re “demokrasiya lîberal” tê gotin, bi temamî maskeyek e. Olîgarşiya kapîtalîst ti têkiliya xwe bi demokrasiyê re tineye. Heke li cihekî komîn hebe, li wir demokrasî heye, rêveberiya demokratîk heye. Ev jî demokrasiya komînal e. Di çarçoveya netewe de wê demê neteweya demokratîk e. Heke yekeyek an jî komikek be, hingê dibe demokrasiya komînê, dibe sosyalîzm.

Mirov ji neteweya demokratîk re dikare bibêje neteweya sosyalîst jî, di vê de pirsgirêk nîne. Dibe ku gel bibe civaka neteweyî, netewe bibe sosyalîst û weke neteweya demokratîk were pênasekirin. Tevahiya qenciyên demokrasiyê bi kapîtalîzmê ve dikin û layiqî wê dibînin.

Ev nêzîkatiyeke pir bi tehlûke ye, û ev awa gotin derew in, pûç û vala ne. Lenîn ket xefika "dîktatoriya proleteryayê". Bûrjûwazî, jixwe çîneke nediyar, çîneke bêserûber a bêreng e. Ji ber vê teoriyê, Stalîn got, "Em qûlakan paqij dikin, çînê zelal dikin" û bi vê, bi mîlyonan gundî kuştin. Li cem Rûsan ji gundiyên dewlemend re ʻqûlak ʼdihat gotin û kuştina van kesan weke têkoşîna çînî nîşan dan û ev ne sosyalîzm e. Me jî şaşiya vê teoriya çînî kir û me pênaseya "xayînên nava çînê" bi kar anî. Ev têgîn heta tu bibêjî, bi tehlûke ne, şîlo ne, û bi cewherê sosyalîzmê re ti eleqeya xwe tinene.

Divê di nava hêmanên komînê de rewşên cuda û xweser bêne parastin, lê divê asta zêde ya cudahî û xweseriyê nebe. Ji bo komîn bi temamî pêk bê, divê ev asta zêde were safîkirin. Heke qala rewşeke newekhev were kirin jiyana azad, xweşhalî û huzûr çênabe. Jixwe komînalîstbûn jî vê nêzîkatiyê divê. Heke tu komînê pêk neyînî tu nikarî rêveberiya demokratîk jî pêk bînî. Bi komînalîteyê mirov dikare ji pirsgirêkên civakî re çareyê bibîne. Xwerêveberî wê hebe, koma weşan û ragihandinê wê hebe, komikên kolanan wê hebin; li vir a giring ew e; kêrhatin û fonksiyona wan e. Divê di tevahiya karûbarên civakî de mirov bi komînê dest pê bike. Divê mirov her tiştî di komînê de guftûgo bike, bi proje bike û bixe praktîkê. Wexta ku mirov bibîne, desthilatdariya heyî jî bi modela rêxistina komînal xwe bi rêxistin dike, mirov ê li giringiya komînê serwext bibe û fêhm bike ka çima bêyî wê nabe.

Li hemberî sê suwarên mehşerî yên modernîteya kapîtalîst divê mirov sê suwarên modernîteya demokratîk ango azadîxwazî, civakparêzî û demokratîkbûnê amade bike û ev ji bo peydekirina çareyê ji pirsgirêkên civakî re hewce ye. Li hemberî kapîtalîzma hov a dizgîn nabe û ber lê nayê girtin, parastina civakê bi komînên demokratîk ji bo hebûn û heyînê hewcedarî ye.

B-Civaka Eko-Endustriyal

Bingehê rahenda ekonomîk û endustriyal a modernîteya demokratîk ekolojîk e. Têgîna ʻekonomiya kapîtalîst ʼlîstikeke bangeşeyî ye, bêbingeh e, virtûvala ye, derew e. Kapîtalîzm ne şêweyekî ekonomiyê ye, dijminê sondxwarî yê ekonomiyê ye. Bi giştî yekdestdarên şaristaniyê, bi taybetî jî yekdestdarên kapîtalîst (amûrên dewletê yên weke cotkarî, bazirganî, fînans, desthilatdarî û dewleta netewe) tevahiya dîrokê sedema bingehîn a xizanî û birçîmanê, felaketên li ser jîngehê, belovajîkirina ekonomiyê, pirsgirêk û pêxîrtengiyan hemûyan in. Dîsa di çarçoveya van sedeman de her cure çînîbûna siyasî û civakî, tevahiya nexweşiyên ji desthilatdarî, bajarbûneke ji hedê xwe derbasbûyî û hwd. ji vê peyde dibin; her cure dogmayên dînî, metafizîk û zanistî yên ji rê derketî, di serî de çelexwarîkirina hunerê her awa kirêtî, xizaniya exlaqî û xirabûn weke şewbê belav dibin. Pêncsed salên dawî yên modernîteya kapîtalîst ji bo van tesbîtan gelek mînakan dixe nava çavên me.

Bi modernîteya demokratîk re ekonomî jî digihîje maneya xwe ya rastî. Pêkhateyeke sîstematîk e; hem pêdiviyên bingehîn ên qatê jêr weke nirx ê bikaranînê derdixe holê; bi xisleta xwe ya tedarikkirinê pêdiviyên herî giring pêk tîne, hem jî weke ekonomiyeke rastî ya piyase-bazarê nirxê bihevguherînê, rêjeya metayan a bihevguherînê derdixe holê. Li cem modernîteya demokratîk, êdî ekonomî ne meydanek e ku hesabên karê lê bêne kirin. Di vê ekonomiyê de rê li ber çînîbûnê xweş nabe û zirardana ekolojiyê çênabe, rê û rêbazên tedarikkirina pêdiviyên bingehîn bi awayê herî qenc têne diyarkirin. Ekonomî weke warekî aktîvbûna civakî dibe xwedî maneya xwe ya rastî. Ango dibe warekî bingehîn ku civaka exlaqî û polîtîk li ser bi pêş dikeve û bi pêş dixe.

Di rahenda ekonomîk a modernîteya demokratîk de esas e ku nirxên guherîn û bikaranînê bi ekolojî û endustriyê re yekpare bin. Endustrî bigihîje sînorê ekolojiyê û sînorê pêdiviyên bingehîn tedarik dibin, disekine û van herdu sînoran derbas nake. Endustriya bi vî

awayî derkeve holê, em jê re dibêjin eko-endustrî. Endustriya ne ekolojîk, endustriya ne ekonomîk e. Endustiriya ku têkiliya xwe bi ekolojiyê re nemîne, wê bibe cinawirekî makîneyê ku timî jîngeh û hawîrdorê dixwe. Endustriyeke ku têkiliya xwe bi tedarikkirina pêdiviyên bingehîn re nemîne, ji bilî karê wê armanca wê tinebe û wê di vê çarçoveyê de bêkêr be. Ji ber van sedem û rastiyan, divê eko-ekonomî pîvana bingehîn be. Yanî ew pîvana sereke ye ku divê aktîvîteyên ekonomîk hemû pê ve girêdayî bin. Wexta ku wisa bû, aktîvîta ekonomîk wê bigihîje maneya xwe ya rastî; ango wê zemînê bêkarî, hilberîna kêm an jî zêde, herêm û welatê pir pêşketî yan jî kêm pêşketî, nakokî-dijberiya gund û bajaran, cudahiya zêde ya di navbera çînan de, pêxîrtengiya ekonomîk û şerên civakî ji holê rabin.

Ji ber ekonomiya çelexwarî ya armanca wê kar e, bêkarî çêdibe ango bêkarî encama wê ye. Di rahenda ekonomîk a modernîteya demokratîk de rewşeke wisa ya çelexwarî tineye. Ji encamên xeternak ên qanûna kara zêde ye, bajar û gund, cotkarî, destkarî û endustrî palpiştiya hevdu nakin, berevajî dibin dijberê hev û gotin di cih de be hev dixwin. Civaka gund û cotkariyê hema bêje, birin ber tesfiyekirinê û li aliyê din jî bajar û endustrî jî xistine pêvajoyeke mezinbûna kanserwarî. Ne tenê ekonomî, hindik maye civaka dîrokî bi xwe jî têk bibin, wê jî bi bin bixin. Ekonomiya ku xwe disipêre kara herî zêde, bi xwe re her tişt çelexwarî kiriye, rê li ber çînîbûnê û pevçûna polîtîk vekiriye, pêşî li her cure şerê neteweyî û navneteweyî vekiriye.

Modernîteya demokratîk ekonomiyê ji meylên dijber rizgar dike. Xwedî sîstematîkekê ye; bi şêweyê xwe yê jiyanê, bêkarî û xizanî tê de nîne, rê nade hilberîna kêm an jî zêde, cudahiya pir pêşketî yan jî kêm pêşketî ya di navbera herêm û welatan de kêm dike, nakokiya gund û bajar vediguherîne têkiliyekê ku hevdu xwedî û temam dikin. Sîstema modernîteya demokratîk, ne tenê nahêle ku bajarbûn û endustriyalîzm gund û cotkariyê daqurtîne, di heman demê de endustrî û bajêr dixe wê pozîsyonê ku bi wan re jiyaneke rastî bibe. Mekanîzma û çerxên vê, di rahendên bingehîn ên modernîteya demokratîk de bi awayekî yekpare hene. Kom hemû, di aktîvîteyên xwe yên ekonomîk de bi rahenda exlaqî û ekonomîk ve girêdayî ne, pê re bi awayekî yekpare bi hêmanên ekolojîk û endustriyal ve ne.

Divê eko-ekonomî û eko-endustrî di tevahiya karûbarên civakî de li ber çavan bêne girtin. Di vê çarçoveyê de, projeyên xweşkirina jîngehê û geşkirina cotkariyê, ji nû ve avakirina gundan û li wan pêkanîna jiyaneke rast û durist, bi tena serê xwe dikarin dawî li bêkariyê bînin. Bêkarî bi xwezaya mirov re ne li hev e. Keç û kurên mirovan ên xwedî aqlekî evqasî pêşketî çawa dibe ku bêkar bimînin, heke bimînin, ev tenê bi destê mirovê zordest dibe, jixwe ya dibe jî bi vî awayî dibe. Di vê xwezayê de moriyeke bi tenê jî bêkar nîne, îca çawa çêdibe ku xweza vê hebûna xwe ya evqasî pêşketî bêkar û bêzar bihêle? Teknolojî berhemeke bêhempa ya pratîka mirov e, û endustrî jî encama wê ye, îca di serdemeke wisa ya teknolojî û endustriyê de çima bêkarî bibe çarenûsa mirov?

Ekonomî, di tevahiya dîrokê de ji bo civaka exlaqî û polîtîk bûye mijareke hesas û her tê de qirqilîne, nîgeran bûne. Ji ber ku di vê meseleyê de xela, birçîmayîn û mirin heye ango diyardeyên ku civak bi wan bi temamî bikeve tehlûkeyê, hene. Civakan danaserhev û hilanîn jî weke kara zêde ti carî rewa qebûl nekirine, hertim weke maka xirabî û diziyê dîtine. Dema ku dewletê firsend dîtiye, danehev û tiştên ku hatine hilanîn desteser kirine. Eşkere ye ku bi vî awayî ekonomî çênabe. Jixwe, çawa ku me qala wê kir, mirov li ser navê ekonomiyê behsa tiştekî dijberê ekonomiyê bike, ev nakokî bi xwe ye.

Ji bo mirov ji vê nakokiyê rizgar bibe, rêya bi tenê aktîvkirina ekonomiya eko-koman e. Bi hezaran eko-kom, li ser bingehê şertan, dikarin xwe weke yekeyên ekonomîk bi rêxistin bikin. Erdên cotkariyê ewqasî di nava malbatan de dabeş bûne xisleta xwe ya yekebûnê nemane, lewma divê pîvana eko-endustriyê li ber çavan were girtin û ev rewş ji nû ve were

sererastkirin, jixwe çareserkirina vê pirsgirêkê dereng maye û divê bi lezelez were çareserkirin. Divê ji bo cotkariyê eko-kom bêne çêkirin û ev yek ji pîvanên bingehîn ên ekonomiya modernîteya demokratîk e. Bi vê ve girêdayî, şêweyê cotkariyê yê ji koletî û serftiyê mayî jî di hilberînê de cihê xwe nemaye. Di çarçoveya ekolojîk de eko-komên ku weke yekîtiyên cotkariyê bêne çêkirin, wê bibin bingehê modernîteya gundan. Gund an jî gundên modern, weke eko-koman, di çarçoveya yekeyên ekonomîk de dikarin xwe ji nû ve heyî bikin û pêk bên.

Mirov li bajaran jî dikare eko-komên bi heman awayî çêke. Mirov dikare ekonomiyê di plansaziya bajaran de weke parçeyekî giştî di çarçoveyeke ekolojîk de birêkûpêk bike. Ne burokrasiya ku bajêr dadiqurtîne, ne jî ekonomiya ku bajêr dadiqurtîne nabin. Divê li gorî xwezaya her bajarî ekonomî hebe, armanca wê ya karê tine be, û li bajaran weke yekeyên optîmal mezin ên ku armanca wan jiholêrakirina bêkarî û xizaniyê ye, bêne birêxistinkirin. Divê şêniyên bajêr, li gorî qabîliyet û dahêneriya xwe li van yekeyan bêne dabeşkirin. Ev model pêkhateyek e; li gorî biryar û çalakiyên civaka exlaqî û polîtîk pêk tê. Koordînasyoneke ku şertên neteweyî û herêmî, heta navneteweyî li ber çavan digire, hertim hewce ye. Lê ev koordînasyon, divê însiyatîfa biryar û çalakiya civaka herêmê ji holê raneke.

Ekonomî ne meseleyeke teknîkî ya binesaziyê ye; pêkhateyek e, bingehê hebûna civakan e; aktîvîteyeke bi fikir, guftûgo, biryar û çalakiya rêxistinî ya tevahiya civakê pêk tê. Heke mirov ji ekonomiyê qut bibe yan jî were qutkirin, ev dike ku di her warî de bibe xerîbê xwe. Lewma pêwîst e ku mirov ber li vê bigire û ji bo vê jî şert e ku di ekonomiyê de kom hemû pişikdar bin. Divê ekonomî bi koman û li ser bingehê ekolojîk û bereketê (kêrhatinê) teqez were birêxistinkirin, ji ber ku ji bo hebûna civakê ev şert e. Ji bilî koman û civakê ti kes ne xwedî vî heqê hebûn û heyînê ye, ne jî ti kes dikare vî heqî ji holê rake. Yeke (komikên şane) çi bazirganî, pîşesazî, cotkarî û heta bi rola navbeynkar û fînans bin, divê li gorî van pîvanan bin. Di bingehê fabrîkayeke pir mezin de û di bingehê yekeyeke gund-cotkariyê de jî divê ev pîvan hebin.

Rahenda diduyan a modernîteya demokratîk eko-endustrî ye, û li dijî endustriyalîzmê tê bipêşxistin. Vekirina tevahiya xwezayê li bikaranînê ango li talanê û hilberandina nirxê zêde, meseleyek têkildarî kapîtalîzma heyî ye. Endustriyalîzm, rêbaza herî qirêj a şêlankeriya kapîtalîst e. Ev şêlankerî di serdema pêşî de bi obsîdyen, di serdemên paşê de bi şûr û di roja me ya îro de jî bi endustriyalîzmê tê kirin. Ji bo kara maddî, şêlankerî û talankeriyeke mezin tê kirin. Bi teknîkê, bi aqlê çêkirî (AI), bi şer û bi teknîkên din çi di destê civakê de hebe jê distîne; xwezayê talan dike û karê bi dest dixe. Li dijî cinawirekî wisa yê kapîtalîst rêbaza ekonomiyê ya were bipêşxistin ekonomiya “eko” ye, ekonomiya komînê ye. Gelo jiyan wê bi vî cinawirî re be, yan jî wê bi endustriyeke li dijî wî be? Têgîna eko-endustriyê têgîneke giştî ye, lê têgîneke rast e. Ango em qala ekonomiyekê dikin, divê jîngeh û hawîrdor pê qirêj nebe, debara malbatê bike. Ekonomî qanûna malbatê ye, hunerê rêvebirin û xebitandina aşxaneyê ye. Lê ti derfet û îmkan nemaye, jin mala di destê xwe de bi rê ve bibe. Yên ku ev rewş afirandine, kujerên kastîk in. Çawa ku jin panzdeh hezar sal berê kole bû, îro jî kole ye. Hem jî koleyeke wisa ye ya ku bi reklaman bazara wê tê kirin. Her lebata bedana jinê ji bo vê çeteyê amûreke bazarê ye. Ekonomî karê jinê ye, lê niha ti têkiliya xwe bi jinê re nemaye.

Li cem yekeyên ekonomîk ên modernîteya demokratîk, milkiyet giringiya xwe namîne û dikeve dereceya diduyan. Komên li gorî pîvanan, wê xwedî heqê bikaranînê yê milk bin. Ne milkê dewletê û ne jî yê malbatan wê nebin bersiva ekonomiya modern. Milkê xweserî malbatê û dewletê yê ji dema hiyerarşîk mayî tew di dema modernîteya kapîtalîst de jî nikare hebûna xwe bidomîne û nayê qebûlkirin. Heta şirîket jî bi zora sedemên ekonomîk her ku diçe dibin milkê hevpar ên xebatkaran. Lê dîsa jî divê mirov normên milkiyetê bi xetên stûr ji

hev cihê bike. Çawa ku sîstemên du şaristaniyan di zikhev de ne, wê sîstemên milkiyetê jî demeke dirêj di zikhev de dewam bikin. Çawa ku di milkiyeta koman de malbat milkiyeta xwe diparêze, dewlet jî wê bandora para xwe û hebûna xwe bidomîne. Ya giring ew e, normên milkiyetê yên nerm ên ji bo jîngeh, hilberîn û bêkariyê bibin bersiv û li vê vekirîbin. Di milkiyetê de her awayê bikaranînê yê bikeve xizmeta hebûna kes, azadiya wî, qenciya wî û bedewiya wî hêja ye, bi nirx e. Tevî ku wê kom bêyî van nirxan nebin, dîsa jî çareserkirina pirsgirêkan di nava sînorên optîmal de ya herî rast e. Modernîteya demokratîk wê milkiyeta li ser bingehê koman a di tevahiya dîrokê de hebû di nava şertên modern de ji nû ve bixe bingehê civaka exlaqî û polîtîk, û bi awayekî serketî karibe bi vê rola xwe ya dîrokî rabe.

C-Civaka Konfederalîst a Demokratîk (Neteweya Demokratîk)

Formê bingehîn ê dewletê yê modernîteya kapîtalîst dewleta netewe ye, li beramberî vê, şêweyê rêveberiya siyasî yê ne dewlet ê modernîteya demokratîk jî sîstema konfederalîst a demokratîk tê. Dewlet îdare dikin, demokrasî bi rê ve dibin. Dewlet xwe disipêrin desthilatdariyê, demokrasî bi riza kolektîf e. Di dewletan de wezîfedarkirin, di demokrasiyê de hilbijartin esas e. Di dewletan de mecbûriyet, di demokrasiyan de rizadilî esas e. Mirov bi vî awayî dikare gelek cudabûnan nîşan bide.

Konfederalîzma demokratîk, weke hinek yeqîn dikin, ne şêweyekî rêveberiyê yê xweser ê roja me ya îro ye, sîstemek e; di dîrokê de têra xwe cihê wê heye. Dîrok ne ya dewletên navendî, lê konfederal e. Formê dewletê, ji ber ku gelekî fermî bûye hatiye naskirin, naxwe jiyana civakî bêhtir nêzî konfederalîzmê ye.

Konfederalîzma demokratîk ne yekdestdar e, civakê esas dibîne, ji ber ku heta jê tê, ji navendîbûnê xwe dûr digire. Homojen nîne, ji gelek koman, ji sazî û cudahiyan pêk tê. Rêveberiyeke hişk navendî wê bike ku ev rewşa pirreng û pirdeng di bin wê de bipelixin û timûtim rabin, serî hildin. Di dîrokê de gelek mînakên vê hene. Sîstema konfederalîzma demokratîk, ji bo ku her kom, sazî û cudahî xwe nîşan bide guncavtir e. Lewma ev sîstem di dîrokê de bêhtir pêk hatiye, lê zêde nehatiye naskirin û ev jî ji ber îdeolojî û awayê pêkhatina hegemonîk a şaristaniya fermî ye. Herçiqasî bi fermî nehatibe naskirin û pênasekirin, di dîrokê de kom bi awayekî esasî konfederal in. Tevahiya rêveberiyên qebîle, qewm û eşîran ên xwedî xisleteke nerm in, li konfederalîzmê vekirîne. Ji ber ku ne wisa bin, wê xweseriya wan zirarê bibîne. Her rêveberiya qebîle, qewm û eşîrê dikare di nava otorîteyên dînî, qraliyet û heta komar û demokrasiyan de cih bigire. Di vê çarçoveyê de, împaretorî ku hinek yeqîn dikin gelekî navendî ne, lê ya rastî bi awayekî ji awayan konfederalîst in. Bi vî awayî serwextbûna li meseleyê giring e. Modela rêveberiya navendî ne hewceyiyeke civakê ye, modeleke îdarî ya yekdestdariyê ye.

Konfederalîzma demokratîk modeleke siyasî ya bingehîn e, banê siyasî yê civaka exlaqî û polîtîk e. Mirov heta fêhm neke ku xwezaya civakî ne homojen û monolîtîk e, wê zehmet be ku konfederalîzma demokratîk fêhm bike. Pêncsed salên dawî yê dîroka modernîteya fermî, dîroka piretnîsîte, pirçand, pêkhateyên cuda yên siyasî û civakên xweparastî ye ku bi navê neteweya homojen bi giştî ji aliyê çandî ve û car caran bi awayekî fizîkî hatine qirkirin. Dîroka konfederalîzma demokratîk jî dîroka israra xweparastinê ya pêkhatinên siyasî yên cuda yên pirçandî û piretnîsîteyî li dijî homojenkirina modernîteya kapîtalîst e.

Sîstema demokratîk weke sîstema dijber divê xwe berbiçav bike, di van şert û mercan de hebûna xwe bi hêz bike, şêweyê xwe yê çareserkirina pirsgirêkan diyar bike û li vê qonaxê, neçar e ku awayê çareserkina pirsgirêkan bi awayekî serketî pêk bîne. Siyaseta demokratîk, şêweyê avakirinê yê konfederalîzma demokratîk e. Siyaseta demokratîk, derfet û îmkanê dide her nasname û beşê civakê da ku bibe xwedî hêzeke siyasî û xwe pênase bike, herweha

bi vê re civaka polîtîk jî pêk tîne. Heta polîtîka nekeve dewreyê, krîza dewletê çareser nabe. Jixwe ji ber ku civaka polîtîk tê înkarkirin krîz çêdibe. Ji bo çareserkirina krîza dewletê ya roj bi roj kûrtir dibe, siyaseta demokratîk çareya bi tenê ye. Heke li şûna vê çareseriyê dewletên navendî weke çareserî bêne dîtin û timûtim vê weke rê bibînin û bikevinê, wê bêhtir bişikên û wê nikaribin xwe ji vê korxetê rizgar bikin.

Ev sedem hemû, careke din konfederalîzma demokratîk weke alternatîfeke bi hêz dixin rojevê. Tevger û kesên ku xwe hişk bi sîleha modernîteya kapîtalîst ango dewleta netewe ve girtin, yeqîn kirin ku wê kurtebirr di civakê de veguherînine mezin bikin, lê pir dereng têgihiştin ku bi vê sîlehê li xwe dane. Di ezmûna Rûsya Sovyetê de pêşî konfederalîzm li rewacê bû, lê bi navê dewleta navendî konfederalîzm ji holê rakirin û ev, yek ji sedemên bingehîn ê jihevdeketina sosyalîzma pêkhatî ye.

Konfederalîzma demokratîk potansiyela xwe heye ku pirsgirêk û rewşên neyênî yên ji sîstematîka dewleta netewe peyde bûne çareser bike û li pey xwe bihêle, dîsa amûrê herî guncav e ku civakê polîtîk bike. Hêsan e, û pêkanîna wê zor nîne. Her kom, etnîsîte, çand, cemaeta dînî, tevgerên entelektuel û yekeyên ekonomîk dikarin xwe weke yeke û şane bi awayekî xwebûnê pêk bînin û pênase bikin. Divê mirov, pêkhateya federe yan jî xweseriyê, di çarçove û naveroka têgîna xwebûnê de bibîne. Her xwebûn şensê xwe heye, xwe ji xwecihî heta bi asta global weke konfederasyon pêk bîne. Hêmaya herî bingehîn a xwecihî ew e; heqê xwe yê guftûgoya azad û biryarê heye. Her xwebûn an jî yekeya federe, şensê xwe heye, demokrasiya rasterast a weke demokrasiya beşdar, bûye têgîn pêk bîne û lewma ev bêhempa ye. Hêza xwe hemûyî ji derfeta pêkanîna demokrasiya rasterast werdigire. Yek ji rolên wê yên bingehîn jî ji vê ye. Dewleta netewe, çiqasî înkara demokrasiyê be, konfederalîzma demokratîk jî berevajiyê wê ewqasî demokrasiyê pêk tîne û bi kêr hatî dike.

Şert, pêdivî û yekeyên federe ku şaneyên sereke yên demokrasiya beşdar a rasterast in, ji ber ku nerm in, û timî derfetên wan hene veguherin yekîneyên konfedere, bêhempa û îdeal in. Her awayê yekîtiya siyasî, bi şertê ku li ser bingehê demokrasiya beşdar a rasterast pêk bê, demokratîk e. Xebateke kêrhatî ya polîtîk, ya ku li yekeyeke xwecihî bi demokrasiya rasterast pêk bê yan jî di asta global de pêk bê, mirov dikare weke siyaseta demokratîk pênase bike.

Babeteke din a divê mirov bi giringî bala xwe bidiyê, babeta federe û xwebûnê ye. Divê mirov li naveroka yekeyên federe û xwebûnê pir berfireh û dewlemend bifikire. Giring e ku mirov fêhm bike, li her gundî yan jî li her kolana bajarekî pêdivî wê bi yekîneyên konfedere hebe. Her gund an jî kolan bi hêsayî dikare bibe yekîneyeke konfedere. Mînak li yekeya gundekî ekolojîk (bi gotineke din li federeya wê) yekeyên jina azad, xweparastin, ciwan, perwerde, folklor, tenduristî, alîkarî, ekonomî û gelek yekeyên din ên demokratîk dikarin bi demokrasiyeke rasterast di yekeya gund de bigihîjin hev. Ji vê yekeya nû ya yekeyan re, mirov bi hêsayî dikare bibêje, yeke yan jî yekîtiya konfedere (yekeya yekeyên federe). Wexta ku mirov vê sîstemê ji xwecihî, herêmî, neteweyî bigihîne asta global, mirovê bi hêsayî bibîne ku sîstema konfederalîzma demokratîk sîstemeke çiqasî berfireh e, û dikare gelek yekeyan di bin banê xwe de bihewîne. Ji rahendên bingehîn ên modernîteya demokratîk sê rahendên sereke xwedî wê xisletê ne ku hevdu temam dikin û wexta ku mirov li sîstematîka konfederalîzmê serwext bibe, mirov wê vê baştir fêhm bike. Her şax û rahend xwediyê wê hêzê ye ku dikare di nava sîstemê de guftûgoya xwe, analîza xwe, biryara xwe, jinûveavakirina xwe û praktîka xwe bike û bi vî awayî, yekparebûn û rastiya civaka dîrokî ya xwezaya civakî wê bi şêweyekî herî baş pêk bê.

Divê mirov xweparastina civakî jî di sîstema konfederal a demokratîk de bi awayê herî baş pêk bîne û ev pêkan e. Xweparastin weke saziyeke siyaseta demokratîk di nava sîstema konfederal de ye. Xweparastin weke pênase, siyaseta hûrûkûr a demokratîk pênase dike.

Konfederalîzma demokratîk, mîlîtarîzebûnê ya ku jêdera wê dewleta netewe ye, dikare bi xweparastinê rawestîne. Civakên ji xweparastinê mehrûm û bêpar, tehlûke ji bo wan heye ku ji nasnameya xwe, demokratîkbûna xwe û xisletên xwe yên polîtîk bibin. Lewma xweparastin ji bo civakan ne diyardeyeke besît a eskerî ye. Xweparastin diyardeyek e ku civak pê nasnameya xwe diparêzin, polîtîkbûna xwe tekûz dikin û demokratîkbûna xwe pêk tînin. Bi van diyardeyan di zikhev de ye. Heke civakek xwe biparêze, bergiriya nasnameya xwe bike, polîtîka xwe bimeşîne û siyaseta xwe ya demokratîk bike, mirov dikare qala hebûna wê bike. Di çarçoveya van rastiyan de divê hîmê konfederalîzma demokratîk di heman demê de weke sîstemeke xweparastinê were danîn.

Di serdema yekdestdarên hegemonîk ên global de û di van şertan de ku dewleta netewe civak hemû mîlîtarîze kiriye, tenê heke modernîteya demokratîk bi awayekî civakê hemûyî himbêz bike, bi sîstematîka xwe ya tevnên konfederal, di şert û mercên tevahiya zeman û mekanan de li ser bingehê xweparastin û siyaseta demokratîk, ew ê karibe bersiva hegemonyayê bide. Çiqas şebekeyên hegemonîk ên weke yekdestdariyên bazirganî, fînansî, pîşesazî, desthilatdar, dewleta netewe û îdeolojîk hebin, divê modernîteya demokratîk jî ewqasî xwedî tevna konfederal, xweparastin û siyaseta demokratîk be.

Sîstematîka dewleta netewe û sîstematîka konfederalîzma demokratîk bi aştiyên bi pîvan û bi şert dikarin bi hev re bin, lê dema ku ev şert û pîvan bêne binpêkirin, divê neyê jibîrkirin ku wê di zikhev de şerê xweparastinê bikeve dewreyê û ji bo vê, tevî felsefeya siyasetê wê helwestên taktîk û stratejîk jî hebin, û ev li gorî meşa civaka dîrokî ya wekhevîxwaz, azadîxwaz û demokrasîxwaz guncav e.

Neteweya bi armanc dewlet û dewleta bi armanc netewe, sedema sereke ya rastiya xwînrij a serdemê ne. Netewe bi desthilatdarî û dewletê ve kirin û ev sersebeba pirsgirêkên serdema modernîteyê ye. Wexta ku mirov pirsgirêkên ji ber dîktatorî û dewletên xanedan derketine holê bi pirsgirêkên serdema modernîteyê re bide ber hev, mirov ê bibîne, pirsgirêkên modernîteya serdemê ji ber dewleta netewe rûdane û ev rewş di navbera herduyan de cudahiya herî mezin e. Dewleta netewe yek ji pirsgirêkên herî tevlîhev ê zanistên civakî ye, lê tevî vê, weke şivikeke bisêhr ê her pirsgirêkê çareser dike, tê nîşandan. Lê ya rastî, wexta ku pirsgirêk yek be, dewleta netewe pirsgirêkan dike hezar. Sedema vê jî ew e, amûra desthilatê, heta bi mûrehkên civakan belav dike. Desthilatdarî bi xwe pirsgirêkan diafirîne. Ji ber ku sermaye xwedî wî karakterî ye ku dikare bi şêweyê zorê xwe bi rêxistin bike, desthilatdarî bi darê zorê û mêhtinkariyê di civakê de pirsgirêkan diafirîne. Civaka netewe ya homojen ku armanca dewleta netewe ye, welatiyên wekhev ên sexte yên bi şiddetê barkirî û qelp çêdike. Wekhevkirina welatiyan a dewleta netewe weke wekhevkirina bi birrekê ye; organ û lebatên welatiyan hemû bi birrekê têne birrîn û wekhevkirin. Ev welatî, bi gotina qanûnî wekhev e, lê di her warî de weke hebûneke kolektîv û ferdî di asta herî jor de di nava newekheviyê de ye.

Wexta ku modernîteya kapîtalîst weke dewleta netewe bi rêxistin dibe ji yekdestdariya ekonomîk bêhtir bi rola zordestî û mêhtinkariyê radibe. Marksîzmê û bi giştî sosyolojiyê, têkiliya dewleta netewe bi zordestî û mêhtinkariyê re nedîtiye yan jî wan dewleta netewe weke saziyeke li jor pêkhatî ya ji rêzê nîşan daye û ev kêmasiya wan a bingehîn e, berevajîkirin e. Wexta ku tehlîla sermayeya maddî û çînî ji dewleta netewe qut were kirin, wê encameke civakî ya bêber û bêkêr derkeve holê ango tehlîleke gilover a abstrakt û mucerred wê derkeve holê. Yek ji sedemên bibinketina sosyalîzma pêkhatî, ev awayê tehlîlê ye.

Piştî ku klan, qebîle û eşîrên xizmên hevdu xwe weke qewm, gel an jî millet pêkanîn, weke têgîn, netewe derket holê û xwe weke şêweyekî civakê yê di warê çand û ziman de herî zêde wekhev karakterîze kir. Civakên neteweyî li gorî civakên qebîle û qewman bêhtir xwedî gewdeyekî berfireh in, û bêhtir cudabûnê li bin banê xwe dihewînin, lewma ji komên mirovan ên bi têkiliyên nerm bi hev ve girêdayî pêk tên. Civaka neteweyî bêhtir diyardeyeke serdema me ye. Heke em bi awayekî giştî pênase bikin, em ê bibêjin, 'koma zêhniyeteke hevpar'. Di vê çarçoveyê de civaka neteweyî diyardeyeke bi zêhniyetê heye; ango hebûneke xeyalî û abstrakt e. Em jê re dikarin bibêjin, 'neteweya li ser bingehê çandê tê pênaskirin 'ku ji aliyê sosyolojîk ve, pênaseya rast ev e.

Tevî cudahiya çîn, reng, etnîsîte û heta cudabûna netewe ji aliyê kokê ve, têrê dike ku netewe bi çand û zêhniyeteke herî giştî pêk bê. Ji bo ku vî neteweyê bi pênaseya giştî sofîstîke bikin, kategoriyên bêhtir cuda yên neteweperestiyên weke neteweya dewletê, neteweya huqûqê, neteweya ekonomiyê û neteweya eskeran (artêş-millet) têne çêkirin ku bi van neteweya giştî tê zexmkirin. Mirov ji van re dikare bibêje, 'neteweya zor-hêzê'. Neteweya bi hêz îdeal û armanceke bingehîn a modernîteya kapîtalîst e. Ji ber ku neteweyeke bi hêz ji bo sermayeyê cihêwaziyê çêdike, derfetê bazar û mêhtinkariyeke berfireh dide; rê li ber emperyalbûnê vedike. Ji ber van sedeman, giring e ku mirov neteweyên wisa yên hatine dabînkirin tenê weke modeleke netewe nebîne, divê mirov van neteweyên hêzê yên şoven weke neteweyên di xizmeta sermayeyê de bibîne. Jixwe ji ber vê xisleta xwe jêdera pirsgirêkan e. Ji çandê netewe çêdibin, lê modela netewe ya mêhtinkarî û zordestiyê berbend bike modela neteweya demokratîk e. Neteweya demokratîk, neteweya herî zêde nêzî wekhevî û azadiyê ye. Li gorî vê pênaseyê, ji bo gera li wekhevî û azadiyê ya civakan, têgihiştina netewe ya herî îdeal neteweya demokratîk e.

Modernîteya kapîtalîst û sosyolojiya jê îlham girtî, bi kategoriya neteweya demokratîk danakevin, ev ji ber hegemonya wê ya îdeolojîk û awayê pêkhatina wê ye. Neteweya demokratîk qîma xwe bi hevpariya çand û zêhniyetê nayne, endamên xwe hemûyan di saziyên xweser ên demokratîk de digihîne hev û bi rê ve dibe. Xisleta wê ya diyarker ev e. Şêwazê rêveberiyê yê xweser û demokratîk, ji bo neteweya demokratîk pêk bê, şertê sereke ye. Bi vî aliyê xwe, alternatîfa dewleta netewe ye. Li şûna rêveberiya dewletê, rêveberiya demokratîk derfeteke mezin a wekhevî û azadiyê ye. Sosyolojiya lîberal, neteweyê weke esas an bi dewleteke damezrandî re yan jî bi tevgerekê re ku avakirina dewletê kiriye armanc, wekhev dike. Sosyalîzma pêkhatî jî bi pey vê ket û ev jî hêza îdeolojiya lîberal nîşan dide.

Modernîteya alternatîf a neteweya demokratîk modernîteya demokratîk e. Ekonomiya ji yekdestdariyê rizgarbûyî, teknolojiya dostê mirov û xwezayê, û ekolojiya bi jîngehê re lihev, saziyên bingehîn ên neteweya demokratîk in ango yên modernîteya demokratîk in.

Ji bo civakên neteweyî weke şert diyardeyên bazar û welatekî hevpar têne destnîşankirin. Herçiqasî ev ji bo zexmkirinê amûr û hêmanên hewce bin jî xisletên diyarker ên neteweyekê nînin. Welat û bazar ji bo dewleta netewe amûrên bihêz ên dabînkirinê ne. Welat weke milk, bazar jî weke qada kara zêde lê dibe, pir giring in. Gihiştina neteweya demokratîk di welat û bazarê de cuda ye. Neteweya demokratîk ji bo zêhniyet û çanda neteweyî derfeteke mezin e, û welat ji bo vê bi qîmet dibîne; çand û zêhniyeteke di bîra wê de nebe nîne. Modernîteya kapîtalîst têgîna war-welat fetîşîze dike û di ser civakê re digire; divê em ji bîr nekin ku vê bi armanca kara zêde dike. Giring e ku mirov meseleya welat zêde mubalexe neke. Çavkaniya têgihiştina dibêje, "Her tişt ji bo welat" têgihiştina neteweyeke faşîst e. Her tiştê bi mane û xwedî wate, divê bexşî civakeke azad û neteweyeke demokratîk be. Divê mirov vê di asta perestinê de neke. Ya esas, nirxdan û binirxdîtina jiyanê ye. Welat bi xwe ne îdeal e, ji bo jiyana ferd û netewe tenê amûrek e.

Neteweya dewletê li pey afirandina civakeke homojen e, lê neteweya demokratîk bi giranî, cudahî û cihêrengiyan weke dewlemendî dibîne û ji kolektîvîteyên cuda pêk tê. Jixwe jiyan bi xwe jî bi cudahî û cihêrengiyan pêkan e. Armanca talî ya dewleta netewe afirandina mirovên robot e. Dewleta netewe ferz dike ku welatiyên tektîp ên fena ji torneyê derketine çêbin, bi vî aliyê xwe jî li dijî jiyanê ye, û çargavî ber bi tinekirinê ve diçe. Endam û welatiyê neteweya demokratîk cuda ye, û vê cudabûna xwe jî ji komên cuda digire. Hebûnên qebîle û eşîran jî ji bo neteweya demokratîk dewlemendî ne.

Ji bo netewebûnê, tevî ku ziman bi qasî çandê giring e, lê ne şertekî mecbûrî ye. Ji bo mirov bibin ji heman neteweyê hebûna zimanên cuda asteng nînin. Çawa ku ji her neteweyê re dewletek hewce nake, herweha ji her neteweyê re tenê zimanek an jî zaravayek jî hewce nake. Tevî ku zimanê neteweyî hewce ye, lê ne şertekî bivênevê ye. Mirov dikare ziman û zaravayên cuda ji bo neteweyeke demoratîk dewlemendî bibîne. Lê dewleta netewe bi awayekî hişk tek zimanekî ferz dike. Rê û şens nade pirzimanîbûnê, tew fermîbûna pirzimanan bi hêsanî qebûl nake. Ji ber ku neteweya serdest e, hewl dide ji vê cihêwaziya xwe sûd wergire.

Li cihekî ku neteweya demokratîk bi pêş nekeve, dewleta netewe jî nikaribe pirsgirêkan çareser bike, mirov dikare weke têgihiştin û lihevkirinekê qala neteweya huqûqê bike. Çareseriya ku bi welatîbûna destûrî qala wê dikin, di esasê xwe de çareseriya li ser bingehê neteweya huqûqê ye. Welatîbûna huqûqî ya bi Destûra Bingehîn hatiye misogerkirin û demankirin, di warê etnîsîte û millet de cihêkariyê nake. Xisletên bi vî rengî heq nadin mirov. Neteweya huqûqê bi vî aliyê xwe, kategoriyeke wilo ye ku bi pêş dikeve. Neteweyên Ewrûpayê her ku diçe ji neteweyên millet ber bi neteweyên huqûqê ve diberidin.

Di neteweya demokratîk de rêveberiyên xweser, di neteweya huqûqê de jî heq esas in. Di dewleta netewe de jî rêveberiya desthilatdar diyarker e. Şêweyê herî bi tehlûke yê netewe yê bi sazî û zêhniyeta ʻartêş-millet ʼe. Herçiqasî weke nûneriya netewe ya bi hêz xuya bike jî di esasê xwe de zêhniyetek e ku di navê de jiyan pir zehmet e, her tim erka xwe ferz dike û ev heta bi faşîzmê diçe. Neteweya ekonomîk kategoriyek e; nêzî dewleta netewe ye. Ev awa têgihiştina netewe, li cem welatên mîna Emerîka, Japonya û heta li cem Elmanyayê ku ekonomî xwedî rola sereke ye, di raboriya Ewrûpayê de bêhtir bi hêz bû. Kategoriya netewe ya sosyalîst hat ceribandin, lê weke tê xwestin serketî nebû. Em hinekî mînaka vê neteweyê li Kubayê dibînin. Lê ev mînaka netewe jî şêweyê dewleta netewe ya sosyalîzma pêkhatî ye; ango ev awayê netewe dewletê yê wilo ye, li şûna dewleta netewe ya ku bi giranî kapîtalîzma xusûsî ye, dewleta netewe ya bi giranî kapîtalîzma dewletê ye hatiye tehkîmkirin.

Dema ku em qala teoriya netewe bikin, xusûsa ku divê em bi giringî rexne bikin, xusûsa pîrozkirin û îlahkirina netewe ye. Modernîteya kapîtalîst li şûna îlah û dînê ji rêûresmê, dewleta netewe bi xwe, ya ku kiriye îlah, ava kiriye. Ev xusûs û babet pir giring e. Heke em îdeolojiya milletperestiyê weke dînê dewleta netewe şirove bikin, em ê dewleta netewe jî weke îlahê vî dînî bibînin. Dewlet bi xwe, tevahiya têgînên îlahîbûnê yên di serdema modernîteyê de heta yên di serdema navîn û serdema pêşî de hemû di nava xwe de hebandine û hatiye avakirin. Diyardeya ku jê re dibêjin, ʻdewleta laîk ʼew dewlet e; tevahiya îlahîbûnên serdema pêşî û navîn an jî naveroka wan xistine navê û ava kirine; ango wisa bi gewde bûye. Divê mirov di vê babetê de hîç nexape. Wexta ku mirov cîla û şapinêza li ser laîktiyê û dewleta netewe ya modern bikole, mirov ê di binî de îlahbûna serdema pêşî û navîn bibîne. Di navbera dewlet û xwedayetiyê de têkiliyeke hişk û şidandî heye. Di navbera têgîna xwedê û monarkên serdema pêşî û navîn de pir hişk pabendiyek heye. Wexta ku monark piştî serdema navîn weke şexis bandora xwe nema û weke sazî bû monarşî û veguherî dewleta netewe, monark-xwedê jî cihê xwe ji dewleta netewe re hişt. Ango bi

têgînên “welat-netewe-bazar” yên hatibûn pîrozkirin, saziyên dewleta netewe jî bi heman awayî hatin pîrozkirin û di bingehê vê de hegemonya îdeolojîk a modernîteya kapîtalîst heye ku armanca wê kara herî zêde ye. Hegemonya îdeolojîk, têgînên derbarê netewe de çiqasî dînî bike, ewqasî qanûna kara herî zêde rewa dike û dikare pêk bîne.

Di serdema me de, sembol û sloganên weke ‘tek al’, ‘tek ziman’, ‘tek dewlet’ û ‘dewleta unîter ’pir têne gotin û ewqasî têne gotin guhê mirov kerr dikin; herweha alayên ji rengên cuda piçûk têne dîtin, cîhana zêhnî monolîtîk kirine û seqet kirine, di her xwepêşandanê de şovenîzma neteweyî radikin pêdarê nexasim jî di aktîvîteyên spor û hunerî de vê dikin û heta vê şovenîzmê weke rîtuel pêk tînin, mirov van hemûyan dikare ji îbadetên dînî yên milletperestiyê bibîne û wan wisa şirove bike. Ya rastî, îbadetên serdemên berê jî xwedî heman fonksiyonê bûn. Li vir, armanca esasî veşartina berjewendiyên desthilatdarî û yekdestdariyên mêhtinkariyê ye yan jî pîrozkirin û rewakirina wan e. Derbarê dewleta netewe de kirin û nêzîkatiyên ser wê digirin û wê pir mezin dikin hemû, di nava vê paradîgmayê de têne şirovekirin û bi vê yekê jî heqîqeta rastiya civakî tê fêhmkirin.

Neteweya demokratîk li gorî modelên din ên neteweyan, modela netewe ya herî kêm xwedî nexweşî û kêmasiyan e. Rêvebiriya xwe pîroz nake. Rêveberî diyardeyeke sade û besît e, û di xizmeta jiyana rojane de ye. Wexta ku pêdiviyên wan bêne tedarikkirin her kes dikare weke karmend bibe rêveber. Rêveberî bi nirx û hêja ye, lê ne pîroz e. Têgihiştina li nasnameya neteweyî têgihişinek e ku qalib nîne; ango ne weke endametiya dînekî yan jî mumîntiya wê ye. Mensûbiyeta neteweyekê ne îmtiyaz e, ne jî kêmasî ye. Mirov ji yekê zêdetir dikarin mensûbê neteweyan bin. Ya rastî, gelek netewebûnên di zikhev de pêkan in. Neteweya huqûqî û neteweya demokratîk li hev bikin bi hêsanî dikarin bi hev re bijîn. “Welat-ala-ziman” tevî ku bi nirx û hêja ne, lê pîroz nînin. Di meseleya ziman, ala û welatê hevpar de mirov li şûna bibin dijberê hev, bi dostanî di nava hev de û bi parvekirinê dikarin bijîn û ev di heman demê de li gorî jiyana civaka dîrokî ye.

Diyardeya neteweya demokratîk bi van xisletên xwe hemûyan li hemberî dewletdariya netewe ya modernîteya kapîtalîst ku amûreke har ê şer e, weke alternatîfeke bi hêz di dîrokê de cihê xwe ji nû ve digire. Modela netewe ya neteweya demokratîk weke modeleke çareserker, têkiliyên civakî yên ku neteweya dewletdar perçeperçe kirine, ji nû ve demokratîze dike; nasnameyên cuda li hev tîne, wan aştîxwaz û xweşbîn dike. Wexta ku dewleta netewe ber bi neteweya demokratîk ve biberide wê bi xwe re destketiyên mezin bîne. Modela neteweya demokratîk beriya her tiştî têgihiştinên civakî yên bi şiddetê barkirî bi serwextbûneke civakî ya rast nerm dike, bi aqil û hestyar dike, mirovan bi empatî dike ango wan bêhtir mirovane dike. Têkiliyên mêhtinkariyê yên bi şiddetê barkirî nikaribe bi temamî ji holê rake jî têra xwe kêm dike, derfeta civakeke azad û wekhev çêdike û pêk tîne. Vê mîsyona xwe ne tenê bi xweşbînî û aştiya di nava xwe de pêk tîne, di heman demê de li derve ji nêzîkatiyên mêhtinkar û zordest ên li dijî neteweyên din dibihure, berjewendiyên hevpar vediguherîne sînerjiyê. Dema ku saziyên neteweyî û navneteweyî li ser bingehê zêhniyet û sazîbûna neteweya demokratîk ji nû ve bêne avakirin, wê were dîtin û fêhmkirin ku modernîteyeke nû, ango modernîteya demokratîk vê carê ne tenê bi teorî bi encamên kirinên xwe di asta Ronesansê de ye, ji nû ve hilatina rojê ye. Modernîteya demokratîk alternatîfa modernîteya kapîtalîst e, di bingehê modernîteya demokratîk de neteweya demokratîk heye; neteweya demokratîk jî li hundir û derveyî xwe civaka ekonomîk, ekolojîk û aştiyane çêdike.

Roja me ya îro li şûna dewleta netewe ya pûç an jî pûçkirî, li şûna yekîneyên wê yên herêmî û global, nexasim Neteweyên Yekbûyî, divê bi lez neteweyên demokratîk ên nû yên bi karakter û performansa xwe ya bilind a pirsgirêkan çareser dikin, bêne avakirin; divê ev

neteweya demokratîk weke wê şûna dewleta netewe ya tekperest bigire yan jî wê veguherîne neyê fêhmkirin, divê modelên herêmî û global ên weke Yekîtiya Ewrûpayê di zikhev de bêne bipêşxistin û ev jî ji bo derketina ji krîza global a fînans kapîtalê rêya herî rast, polîtîk, û exlaqî ye.

Li Ewrûpayê, ezmûna faşîzmê ya di Şerê Cîhanê yê Diduyan de, modernîte neçar kir ku projeya homojenkirina civakê di ber çavan re derbas bike. Bi projeya Yekîtiya Ewrûpayê weke alternatîf li çanda pirreng û pirdeng vegeriyaye. Post-modernîte di cewherê xwe de li ser bingehê çanda pirreng û pirdeng e, lê ne di wê rewşê de ye ku ji modernîteya kapîtalîst re bibe alternatîf. Tevahiya çandên li derveyî nasnameya çandî ya fermî, di tehlîla dawî de, têne marjînalîzekirin, û bi vî awayî, yan bi xwe yan bi zoreke neyekser, bi rêbazên mêhtinkariyê yên kapîtalîst an jî bi polîtîkayên fermî yên dewleta netewe yên bi armanca afirandina civakeke homojen, bi tesfiye û qirkirinê re rûbirû dibin. Ji bo mirov li dijî vê bisekine, rêya herî rast ew e ku mirov hebûna xwe ya çandî biparêze û ji bo wê azad bike, bibe xwedî têgihiştineke nasnameya çandî ya ber lê vekirî û vê bi çandên din re sentez bike û di asteke hê jortir de projeyên hevpar ên jiyanê pêk bîne. Neteweya demokratîk, welatîbûna destûrî, komara demokratîk, çand û welatekî pirreng û pirdeng hin projeyên sereke yên vê têgihiştinê ne. Siyaseta demokratîk, rêbazên xweseriya demokratîk û rêxistinên civaka sivîl amûrên bingehîn ên pêkanîna van projeyan in. Hem ji bo parastin û azadkirina çandên ji rêûresmê, hem jî ji bo bi çandên hemdem re sentezkirî bijîn, çareseriya modernîteya demokratîk pêdiviyeke bivênevê ye.

Em dikarin xisletên netewebûna demokratîk bi kurtî wisa diyar bikin:

a. Li pêkhatinên siyasî yên cuda û pirtebeqeyî vekiriye. Pêkhateyên siyasî yên cuda yên berwarî (horîzontal) û tîkane (vertîkal) ji ber awayê civakê yê tevlîhev mecbûrî ne. Pêkhateyên siyasî yên navendî, xwecihî û herêmî di weznekê de li cem hev digire. Wexta ku her yekê ji wan di nava şertên berbiçav de bersiv da, pêkhateyên siyasî yên pirreng û pirdeng di çareserkirina pirsgirêkên civakî de herî zêde nêzî rastiyê ne. Çi bi dewleta netewe re, çi bi komarê re, çi bi şêwe demokrasiyên bûrjûwaziyê re be, bi rêûresma dewletê re li ser bingehê entegrasyoneke demokratîk li lihevkirineke bi pîvan vekiriye. Li ser bingehê aştiyeke bi pîvan dikare pê re bijî.

b. Xwe disipêre civaka exlaqî û polîtîk. Projeyên şablonîst ên xwe disipêrin muhendîsiya civakê yên weke kapîtalîst, sosyalîst, feodal, endustriyalîst û musrîfkar di çarçoveya yekdestdarên kapîtalîst de dibîne. Yekdestdariyên ekonomîk, siyasî, îdeolojîk û eskerî amûr in; cewherê civakê yê xwezayî dikeritînin li pey nirxên wê yên zêde ne, û heta li pey xûkîgirtina ji civakê ne. Şoreş jî nikarin civaka nû biafirînin. Heke şoreş şaneyên civakê yên exlaqî û polîtîk ên hatine dejenerekirin û tepisandin ji nû ve kêrhatî bikin hingê dikarin weke operasyonên erênî bi rola xwe rabin. Îradeya azad a civaka exlaqî û polîtîk ya mayî diyar dike.

c. Xwe disipêre siyaseta demokratîk. Li hemberî têgihiştina îdarî û rêveberiya burokratîk, hişk navendî û xeta dûz, tevahiya nasnameyên çandî û komên civakî bi pêkhateyên siyasî re, yên ku wan pênase bikin, rêveberiyên xwe yê civakê çêdikin. Di astên cûrbicûr de erkdarkirin ne bi tayînkirinê, lê bi rêveberên ku bi hilbijartinê bêne diyarkirin wê kar û xebat bêne meşandin. Ya esas ew e, bi meclisê û bi guftûgoyê biryar bêne dayîn yanî qabîliyeta di vî warî de giring e. Rêveberiya bi serê xwe

tevbigere bêhukim e. Ji desteyên koordînasyona navenda giştî (meclis, komîsyon, kongre) heta bi desteyên cihî, li gorî naveroka her kom û çandê, bi qevde desteyên ku li nava pirrengî, pirdengî û pirpêkhatebûnê li yekîtiyê digerin, kontrol û rêveberiya demokratîk a karûbaran wê were kirin.

d. Xwe disipêre xweparastinê. Ne weke yekdestdariya eskerî, lê li gorî pêdiviyên ewlekariyê yên hundir û derve yên civakê, li bin venêriya organên demokratîk yekîneyên xweparastinê hêzên bingehîn in. Erka wan ew e; li ser bingehê cudahî û azadiya civaka exlaqî û polîtîk weke organê biryarê yê wekheviyê, divê îradeya siyaseta demokratîk pêk bînin. Heke ji derve yan jî ji hundir hin hêz bixwazin vê îradeyê bêkêr bikin, asteng bikin an jî tine bikin, hingê divê yekîneyên xweparastinê van hêzan bêbandor bikin û mudaxeleyî rewşê bikin. Pêkhateya fermandariyê ya yekîneyan hem ji aliyê saziyên siyaseta demokratîk ve, hem jî ji aliyê endamên yekîneyan ve wê bi cotkontrolê be, û heke hewce were dîtin, bi pêşniyaz û erêkirinê bi hêsanî têne guhertin.

e. Tê de bi giştî cihê hegemonyadariyê, bi taybetî jî cihê hegemonyadariya îdeolojîk tineye. Li cem modernîteyê û şaristaniya demokratîk ji bo hêzên hegemonîk û îdeolojiyên wan xweşbînî tineye. Wexta ku rêveberiyên demokratîk û pênaseyên cuda ji sînorê xwe derkevin, bi azadiya pênasekirinê û xwerêveberiyê têne bêbandorkirin. Di rêveberiya kolektîf a karê civakê de hevfêhmkirin, rêzgirtina ji pêşniyazên cuda re û biryarên demokratîk esas in, û pabendiya bi wan şert e. Di nava îdeolojî û fikirên cuda de jî piranîparêzî esas e. Pêdiviya xwe bi îdeolojiyên milletperestî, dînperestî, zanistperestî û cinsperestiyê tineye, di heman demê de li dijî avakirina hegemonyayê ye. Her bawerî, fikir û nêrîn dikare bi awayekî serbest xwe pênase bike, heke pêkhateya civaka exlaqî û polîtîk nekeritîne û li avakirina hegemonyayê negere.

f. Li hemberî yekîneyên dewletên netewe yên bi Neteweyên Yekbûyî ve ku di kontrola hêzên hegemonîk ên super de ne, alîgirê Yekîtiya Konfederal a Demokratîk a Dunyayê ye ku ew jî ji civakên neteweyî yên konfederalîzma demokratîk pêk tê. Çi di warê hejmarê de û çi jî di warê naverokê de, anîna cem hev a civakên berfireh li ser bingehê pîvanên siyaseta demokratîk li dora Konfederasyona Demokratîk a Dunyayê ji bo dunyayeke ewle, aştiyane, ekolojîk, adil û bibereket şert e.

Hewce dike ku em careke din bibêjin, em li beramberî dewleta netewe, neteweya demokratîk esas dibînin. Maneya vê ev e: Yek; wê netewe hebe, lê wê ne bi destê dewletê be. Du; otorîteya dewletê ji bo neteweya modern bivênevê ye. Dewletên netewe hemû, netewebûna serdema modern in. Lê ev netewe, bi darê zorê, bi şiddetê, bi desthilatê, bi giştî bi destê dewletê têne çêkirin. Wexta ku desthilat bikeve nava netewe, hingê ew dibe dewleta netewe. Lê wexta ku demokrasî bikeve navê jî hingê dibe neteweya demokratîk. Modernîteya demokratîk di nava hemdemiyê de pêk hatiye. Ji nava vê hemdemiyê, neteweyeke kapîtalîst, wekî din jî neteweyeke demokratîk derketiye. Mesela, Swîsre nêzî neteweya demokratîk e, lê Elman ji ser ta pê dewleta netewe ne. Xulase, dereceyên van hene. Skoçya

neteweyeke demokratîk e. Ingilistan dewleta netewe ye, lê hem dewleta netewe heye hem jî neteweya demokratîk heye. Ev hemû ji bo me jî giring in. Li Tirkiyê jî wê pêvajoyeke bi vî awayî pêk bê. Di warê teorîk û pratîk de hîmê vê têne danîn. Di vî warî de Ingilistan mînakeke têra xwe hêja ye.

Bi van tesbîtan, têra xwe ber li neteweya demokratîk hatiye vekirin. Armanc ew e, em Kurdan li ser bingehê sosyalîzmê ber bi netewebûyînê ve û ber bi neteweya demokratîk ve bibin. Niha jî hinekî zehmet e ku em ji xwe re bibêjin, em bûne netewe, lê pêkan e ku em vê di pratîkê de pêk bînin. Neteweya demokratîk wê weke "Komîna Komînan" were pênasekirin û wê xwe nesipêre dewletê. Tirkiye yan jî welatên din ên cîran wê vê pêkhatinê nas bikin. Em ê nebêjin, "Min tu bi zorê kirî Tirk, min tu bi zorê kirî Ereb, min tu bi zorê kirî Fars". Em ê bibêjin, "Li Kurdistanê cihê we jî heye". Em ê bibêjin, "Tu jî xwe bi rêxistin bike, ez ê jî xwe bi rêxistin bikim". Dibe ku hinek bibêjin, "ma tiştekî wisa dibe?", li gorî me dibe. Formula "dewlet + demokrasî" yan jî çareseriya entegrasyona demokratîk kurt û cewherî pênasekirina vê yekê ye.

Weke encam, em dikarin bibêjin, cudahî û dijberiyên di navbera modernîteya kapîtalîst û modernîteya demokratîk de tenê îdea nînin, nîşan didin ku du cîhanên cuda yên berbiçav hene. Tevahiya dîrokê, van herdu cîhanan li ser bingehê dijberiya diyalektîk carinan li dijî hevdu bi dijwarî şer kirine, lê hin caran di navbera wan de aştî jî çêbûye û roja me ya îro jî bi têkilî û nakokiyên bi heman rengî, hin caran şer dikin û hin caran jî li hev tên. Yên ku ji pêxîrtengî û tengasiya pêkhatî ya sîstemîk a heyî, bi entelektuelî, exlaqî (etîk) û polîtîk bi awayekî rast, qenc û xweşik derkevin, wê encamê diyar bikin.

Beşa Pêncemîn
PROBLEMATÎKA ROJAHILATA NAVÎN Û ÇARESERIYA MODERNÎTEYA DEMOKRATÎK

1-Dîroka Gerdûnî û Rojhilata Navîn

Heke hêmanên dîrokê di serî de weke bûyer, ferd, xanedan, netewe, dewlet, çîn û ekonomiyê bi şêweyekî yek bi yek, bi serê xwe û asayî bêne gotin û analîzkirin, ev tê wê maneyê rastî tê parçekirin û dawiya wê jî kuştina rastiyê ye. Ev awayê vegotinê yê mîtîk ku di bin bandora hegemonyaya îdeolojîk a yekdestdarên kapîtalîst de tê kirin, bi giranî bi rola propagandayê ne. Bêguman beş bi beş an jî yek bi yek bi meseleyan daketin hewce ye, û giring e. Di vê meseleyê de ji kesên ku bi awayê çîna ekonomîst nêz dibin, heta bi kesên ku di çarçoveya huqûq û dewleta netewe de nêz dibin, ji kesên ku bi awayê sîstema hilberîner nêz dibin û heta bi gelek rêbazên din, bi awayekî yekpare bi dîrokê danakevin, ji vê dûr in. Nexasim rêbazên pozîtîvîst ên dîroka mîkro yên ku her diçe bêhtir belav dibin, bi temamî bi roleke tevkujiya maneyê radibin. Rêbaz û vegotinên dîrokê heta bi rêveçûna dîroka gerdûnî re nebin yek, serwextbûna li dîrokê wê bi awayekî yekpare pir zehmet be. Di vê çarçoveyê de beşa Rojhilata Navîn di nava dîroka gerdûnî de, tenê di nava vegotina gerdûnî de dikare bibe xwedî pênaseya xwe. Jixwe, dîroka Rojhilata Navîn di nava dîroka gerdûnî de reha sereke ye, qurmê wê ye.

Bidawîbûna Serdema Qeşayî ya Dawî, di pêşketina dîroka civakî de qonaxeke giring a werçerxê ye. Di dîroka Rojhilata Navîn de, nexasim li qûntara sîstema çiyayên Toros-Zagrosê û li herêmên cîran ên ku wê demê ne çol bûn, rewşeke bêhempa ji bo ewlehî, bereket û zêdebûna cinsê mirov hebû. Van hersê hêmanan ango ewlehî, bereket û rewşa guncav a ji bo zêdebûnê, şensekî bêhmpa yê jiyanê dida cureyê mirov. Ji bo cureyê mirov, yê ku ji Efrîkaya

Rojhilat derketiye û pêvajoya wî ya beridînê bi mîlyonan salan domandiye, ji seranserê Efrîkaya Rojhilat derbas bûye, ji Derya Sor heta bi qûntarên çiyayên Deryaspî ya Rojhilat û heta bi Torosan çûye û ev xet hemû Rîfeke xwezayî ye. Bi qasî ku tesbît bûye, bi qasî mîlyonek sal, mirov di vê rê û xetê de derbasî Asya û Ewrûpayê bûne. Di vê rêwîtiyê de hilala Toros-Zagrosê timî rawestgeha sereke bû. Şert û mercên mayînê yên li vê rawestgehê di dîroka cureyê mirov de rê li serdemeke mezin a xweşhaliyê vekiriye û ha îro em ji vê cografyayê re dibêjin, Rojhilata Navîn. Giringiya herêmê ya jeolojîk, biyolojîk û civakî ji vê rastiya wê ya dîrokî ye. Di vê çarçoveyê de Rojhilata Navîn, ne wek her beşê din ê cografyayê ye, ew mekan e ku dîroka gerdûnî li ser dika wê pêk tê.

Li gorî yeqîna hevpar a zanistî, piştî serdema dawî ya qeşayî cureyê mirov bi komikên homojen ên ji 20-30 kesî xwe bi rêxistin kiriye û heta wê demê ji vî şêweyê rêxistiniyê yê ku jê re klan tê gotin, nekariye bibihure. Di pêkhatina civakê de klan di rola şaneya sereke de ye. Çawa ku di pêkhatina zindiyan de bi hewldana şaneya sereke ya mîlyar salî tîpên bi navê heywan û nebat çêbûn, civaka klan jî bi serhatiya xwe ya jiyanê ya mîlyonan salan, rê li gavavêtina jiyana heterojen vekiriye. Sîstemên qebîleyan di dîroka gerdûnî de yek ji qonaxên sereke ye. Jiyana wan nîv-koçerî, nîv-dêmanî ye; di nava xwe de tiştan serbiser dikin, perestgehên wan ên hevpar hene, ji bo veşartina miriyên xwe cihê hevpar çêkirine û zimanekî wan ê hevpar heye

Di dîroka gerdûnî de, bûyera ku kir civaka dîrokî gaveke mezin biavêje, li şûna ‘zimanê işaretan’ bicihkirina ‘zimanê sembolan’ e. Ji ber awayê beden û qirika mirov, derfeta wî têra xwe heye ku di warê zimanê sembolan de bi pêş bikeve. Ev zimanê sembolan jî wê derfetê bide ku şoreşa fikirê pêk bê ango mirov ê dest bi fikir û hizirînê bike. Bi xebatên antropolojîk, etnîk û çavdêriyên dîrokî isbat bûye ku şoreşa mezin a zimanê sembolan li gorî rewşa jeo-biyolojîk a sîstema çiyayên Toros-Zagrosê ji aliyê komên di sîstema qebîleyên Aryenîk de pêk hatiye ku weke koma Hind-Ewrûpa jî tê binavkirin. Dîsa hin agahiyên antropolojîk, etnîk û çavdêriyên dîrokî hene ku dibêjin, beriya bi şeş hezar salan komên Semîtîk ji warê Sehraya Mezin a Erebistanê heta bi çolên Îranê ku giya û nebatên wan waran dewlemend bûne, li dora zimanê kok Samî ‘sîstemeke qebîleyan ’a berfireh pêk anîne.

Di çarçoveya dîroka gerdûnî de yek ji qonaxên sereke bi Girê Mirazan ê li Xirabreşkê dest pê dike û bi têgîna sîstema kastîk tê sembolîzekirin. Ev sîstema ku gund û perestgehan bi pêş dixe, li qadeke berfireh belav bûye û hê beşekî wê yê mezin di binê erdê de ye. Belkî rojekê axa li ser wê were rakirin. Qonaxa ku weke ‘neolîtîka bê dîzik û bê qafik ’a serdema B.Z. 10000-7000 jî wê paşê li vê derê pêk bê. Divê em bibêjin, vê serdemê di serî de Rojhilata Navîn di karakterê gerdûnî yê berfirehbûnê de rê li pêşketinê vekiriye. Piştî salên 7000’î B.Z. ‘neolîtîka bê dîzik û bê qafik ’wê weke qonaxeke li pêş nêzî bajarbûnê bibe. Ji navenda heman warî belavbûneke bi lez heye, di serî de li Misir, Sumer, heta bi sînorên Hindistan û Pakistana îro, li Pencab, Amûderya Tirkistanê û geliyên Sîrîderyayê li warekî berfireh ê jeo-biyolojîk pêşketinek heye nêzî bajarbûnê ye.

Li gorî dema xwe, bi awayekî ji awayan, cara pêşî sîstema navend-hawîrdorê xuya dike û ev sîstemeke global pêk tîne. Ji Çînê heta bi Ewrûpayê, yanî çanda ku di navbera du okyanûsan de bi roleke sereke rabûye; belavbûnek li ser xeta diduyan di serdema 4000-2000 B.Z. de pêk hatiye û destnîşankirina vê, di çarçoveya dîroka gerdûnî de gelekî giring e. Wexta ku mirov ji vî aliyî ve li meseleyê binêre, mirov ê bibîne, globalbûn ne tenê fenomenek îro ye. Xuya dike ku bimêhtinkarî û bêmêhtinkarî, globalbûn di tevahiya dîrokê de yek ji rastiyên

bingehîn e. Xusûsa ku divê em ji dîroka gerdûnî fêhm bikin, ev e. Pêkhatineke çandî ya hevpar a hem maddî û ya hem manewî, û belavbûneke global ji bo vegotineke bi mane ya dîrokê bingeh e. Tişta ku divê ji dîroka gerdûnî were fêhmkirin jî ew e ku kirin û fikirên tevahiya civakan xelekên bi heman awayî yên tişte-kirde (obje-subje) ne. Di serî de dîrokên neteweyan, vegotinên dîroka mîkro hemû, heke di nava vê dîroka gerdûnî de neyên bicihkirin, tenê wê maneyeke wan a weke çîrok û çîvanokan hebe.

Heke mirov li dîroka gerdûnî serwext nebe û rabe bêje, ez li dîroka civakan a beşekî serwext bûme, ev ê ne tenê kêm be, ji ber ku nedaye ber hev, ti maneya wê jî wê tine be. Qebîle jî weke klanê pêkhateyek e, xwedî xisletên gerdûnî ye. Heke mirov li vegotina dîroka gerdûnî sîstema klan û qebîleyan zêde neke, rabe şiroveyan bike, wê ne bi tenê bi şaşiyan tijî be, wê têra xwe kêm bimîne. Çawa ku di roja me ya îro de bêyî dîroka neteweyî qala dîroka gerdûnî nayê kirin, dîrokên beşekî û gerdûnî jî bêyî klan û qebîleyan nayên vegotin. Jixwe tu rabî dîrokê bi vedîtina nivîsê bide destpêkirin, ev bi temamî tercîheke mîtolojîk e. Ya rastî, mirov bibêje, pozîtîvîst-mîtolojîk rasttir e.

Ev hemû nîşan didin ku Mezopotamya qurmê dîroka gerdûnî pêk tîne. Sîstema kastîk, ya ku bi kêmanî panzdeh hezar sal temenê wê heye û ji maka Mezopotamyayê ye; bênavber heta roja îro tê û divê weke yeke û şaneya bingehîn a dîrokê were lêkolan û di warê metodolojiyê de ev giring e. Êrişa kujerê kastîk li dijî jinan û civaka li dora wan bi gewde bûbû, dibe nakokiya pêşî ya mezin a diyalektîkê. Jêdera nakokiya kole-efendî ya tevahiya dîrokê hatiye dîtin jî ev nakokiya bingehîn e. Ev qonaxa kastîk a dîroka gerdûnî ku di tevahiya dîrokê de dimeşe, şerên li rûyê erdê hemû ji vê nakokiyê diqewimin û dîrok bi dewletên ji ber van şeran tijî dibe ango dîrok bi awayekî ji awayan vediguhere selexane û serjêxaneyekê.

Divê em dubare diyar bikin ku civaka dayikê ya pêşî li vê cografyayê derket holê û di heman demê de ew cîwar e ku pirsgirêkên pêşî yên civakî lê derketin holê. Kengî kujerê kastîk jin kirin kole, hingê problematîka civakî ya pêşî dest pê dike. Kolekirina jinan jî tê maneya kolekirina civaka bi pêşengiya jin-dayikê. Ji ber vê rastiyê, kolekirina jinan bingehê tevahiya pirsgirêkên civakî ye.

Jixwe pirsgirêkên qebîle-etnîsîte-qewm ên li Rojhilata Navîn derketin holê û bi demê re bûn xwedî karakterekî gerdûnî, pirsgirêkên dîn û mezheban, pirsgirêkên bajar û jîngehê, pirsgirêkên çîn, hiyerarşî, malbat, desthilatdarî û dewletê, pirsgirêkên civakê yên exlaq-polîtîka û demokrasiyê, pirsgirêkên civakê yên îdeolojî û ekonomiyê, û pirsgirêkên wekî van hemû, yên civaka mirov bi xwe re mijûl dikin, ji êrişa kujerê kastîk a li dijî jinan û di şexsê wan de li dijî jiyana komînal kirî, pêk tên.

2-Dîroka Gerdûnî û Berxwedana Klan-Qebîleyan

Çanda civakî ya ji maka qûntara çiyayên Toros-Zagrosan di ti dem û dewranê de orîjînalîteya xwe bi temamî wenda nekiriye. Li hemberî pêkhateyên eskerî û siyasî yên ji nava wê derketine, heta li hemberî rahib û hegemonyayên dînî jî ti carî teslîm nebûye. Wê çanda civakî weke dîroka civakî hebûna xwe dewam kiriye. Di tevahiya dîrokê de, tevî êrişên bi armanca dagirkerî û talanê yên ji çar aliyan ve hemûyan, wê karîbû hebûna xwe ya civakî her dewam bike. Mîna ku di vê çandê de du cîhan hebin. Cîhana yekê, ya qebîle û gelên civakî ye, bi reh û rîşên kûr bi erdê ve û bi dîrokê ve girêdayî ne. Cîhana diduyan, ya hêzên bêhedhesab ên dagirker, mêhtinger, mêhtinkar û îmhakeran in, ya şer û pevçûnên dewlet û desthilatdarên wan ên hegemonîk in. Xusûsa ku em jî hewl didin di çarçoveya dîroka gerdûnî de qala wê bikin ew e, di tevahiya dîrokê de heta roja me ya îro pêşketineke diyalektîk heye û di nava van herdu cîhanan de xeteke sor heye û em jî hewl didin balê bikişînin ser vê.

Nîzama zilm, zordarî û talanê li ser bingehê hegemonyaya îdeolojîk a sîstemê bi hezar salan xwe hûrûkûr kiriye, xwe misêwa dubare kiriye, ji yê herî jor heta bi evdê herî jêr xwestiye tevahiya civakê bitepisîne, lê bi temamî nekariye xwe veşêre û xwe bide qebûlkirin. Qewm û eşîrên ku di nava nîzama qebîleyê de û li derveyî sîstemê mane û timûtim bi ʿsefer'ên kolekirin û talanê yên sîstemê re rûbirû mane, isyan kirine. Ev tevgerên isyanan jî mîna sîstema şaristaniyê bi demê re bûne xwedî xisleteke domdar. Sîstem mohra ʿbarbartiyê ʾ li van tevgeran dide û bi vê, hewl dide wan mehkûm bike. Lê berevajiyê vê rast e; sîstema şaristaniyê ʿmakîneyeke barbartiyê ʾye. Ya ku naxwaze ji jiyana mirovane qut bibe, nîzama qebîle-komînê ye.

Di dîrokê de gel hene ku karîbûn xuya bin û bimînin, lê divê em bi taybetî bibêjin, kêm gel di vê de serketî bûn. Dîrok ne weke ku serdestan nivîsî ye. Dîroka rastî ya wan kesan e ku nekarîne xwe bidin xuyakirin û nekarîne xwe bidin nivîsandin. Kirine ku ked, berxwedan, afirînerî û keşfên piraniya civakê xuya nekin û neyên dîtin. Ev tiştek e ku bi zanebûn hatiye kirin. Dest danîne ser destketiyên civakî û kirine ku xwediyên rastî yên van destketiyan neyên zanîn; li ser wan nehatiye nivîsandin û nehiştine ku li ser wan were nivîsandin. Nexasim dîroka jinê nehatiye nivîsandin, qala vedîtin û afirêneriya wê nehatiye kirin. Jin di şexsê Înanna de qala yek bi yek Me'yan dike û tîne ziman ka di şexsê mêrê serdest Enkî de ew Me çawa hatine desteserkirin. Destana ku qala vê bûyerê dike, mirov dikare weke destana dawî ya dîrokê bihesibîne.

Tevî berxwedanên li ser bingehê etnîsîte, qebîle û eşîran, weke meyla diduyan berxwedanên xwedî xisleta dînî hene yên ku bêhtir bi kok îdeolojîk in. Ev berxwedan li ser bingehê eşîran nînin, di ser eşîran re ne. Nexasim Mîtraîzm, Xiristiyantî, Cihûtî û Manîtî ji van ekolan in ku xwestine bi bandor bin. Dîsa Êzdîtî jî milekî din e. Ev tevger jî bêhtir ji wan berxwedanan e ku di nava refên xizanan de bi bandor bûye.

Çanda herêmê di warê kirdebûnê de nefikiriye ku bibe çandeke li keviyê[9] û ev qebûl nekiriye, tew nexwestiye li vê bifikire û her tim di navendbûnê de israr kiriye. Wexta ku em di vê çarçoveya dîroka gerdûnî de li dîroka xwe ya mîkro temaşe bikin, em ê hem serbilindî, hem serşorî, hem êşê, hem coşê, hem komedî û hezar mînakên trajadiyê bi hêsanî bibînin û fêhm bikin. Em ê hem li xwezaya xwe ya civakî û hem jî li xwezaya fizîkî, kîmyewî û biyolojîk a ku yekpare ji wê nequt e, baştir serwext bibin; ji bo em aliyên wê yên neyînî kêm bikin, em ê bi eşq û şewq bi îrade û çalakiya wê rabin.

3-Di Sîstema Şaristaniya Dewletparêz de Berxwedana Dînî

Civak û ferdê mirov, civak û ferdê zêhniyet û baweriyê ye. Civaka mirov, bêzêhniyet û bêbawerî hîç çênebûye. Heke wisa be, babeta zêhniyet û baweriyê babetên li pêş in. Heta ku mirov di vî warî de bi ser nekeve, nikare civakê bixebitîne. Bi afirîneriya îdeolojîk mirov dikare di vê babeta li pêş de serketî bibe. Ji veguherîna serdema dayik-xwedawendê ya mîlyonan salan bi klanê dewam kiriye heta bi serdema Girê Mirazan-Girê Keçel a bi fallokrasiyê tê pênasekirin, ji totemê li erdê heta bi xwedayê li ezmên, ji xwedayê her qebîleyê heta bi xwedayê bajaran, ji xwedayên giştî yên erd û ezmanan ên nûneriya yekîtiya bajaran dikirin hemû veguherînên têkildarî afirîneriya îdeolojîk in. Şêweyê fikirê yê serdemê bawerî û xwedayî ye. Maneya têgîna xwedê bi du çavî û kaniyan xwe xwedî dike: Yek jê Xwezaya Yekemîn e ku li derveyî mirov û civakê ye, ya diduyan jî Xwezaya Civakî ye. Îca ji her tişt, ji her

[9] Li vir mesele behsa li ser têkiliya navend (*centre* weke cihê ku diyar dike) û keviyê (*periphery* weke cihê ku li gorî pêdiviyên navendê tê birêxistinkirin). Ji bo agahdariyeke berfereh binihêre li Immanuel Wallerstein, The Modern World-System I: Capitalist Agriculture and the Origins of the European World-Economy in the Sixteenth Century (New York: Academic Press, 1974).

remz û sembolên bawerî û fikirên têkildarî Xwezaya Civakî yên ji Xwezaya Yekemîn sadir dibin îlham digire. Hêmanên çanda manewî yên berê ji vê re pêşengiyê dikin. Amûrên rewakirinê yên nû ango hêmanên mîtolojîk û dîn xwe bi van jêderan xwedî dikin, bi vî awayî pêdiviyên avakirina civakî datînin holê. Xebatên îdeolojîk, heta ku bi ser bikevin, dewam dikin. Wexta ku bi ser bikevin, bi sazî dibin, bi merasîm dibin, erkdar têne diyarkirin, qurban têne dayîn û perestgeh têne avakirin. Ev karûbar hemû, ji bo civaka nû ya bi bereket û ji bo qezencê kêrhatî têne kirin. En, Enlîl, Enkî, Nînhûrsag, Înanna, Îştar, Mardûk û gelek xweda û xwedawend tên panteonê û derbas dibin. Karûbar hemû bi armanca pêkanîna rewakirina civakî ye. Li vir a giring ew e, ka li şûna pêkhatina îdeolojîk a berê ya nû çi temsîl dike û çi nîşan dide.

Ji têgihiştina pirxwedayan a serdema arîstokratîk, gavavêtina têgihiştina yekxwedayî, eşkere ye ku bi armanca pêşdebirina hegemonyaya nasnameya îdeolojîk e. Herçiqasî bi pêşxistina fikir û têgihiştina yekxwedayî bikin malê Ibraniyan jî jixwe li cem Misiriyan pir berê dînê yekxwedayî hatibû ragihandin. Li cem Babîl û Asûran jî li gorî rêzê 'En, 'Mardûk' û 'Asor ' pir berê navên 'xwedayê mezintir 'girtibûn. Ev têgîn û sembol bandor û otorîteya qral û saziyên qraltiyê nîşan didin ku her diçe bandora wan zêde dibe. Wan dikin pût û li ser navê wan kultan çêdikin, ev hemû beşek ji hewldanên rewakirinê ne. Di tevahiya şaristaniyên bi heman rengî de hewldanên bi vî awayî yên hegemonyaya îdeolojîk hene. Ji ber ku amûrekî bi hêz ê rewakirinê ye, her şaristanî vê rêbazê yan jî rêbaza dînî bêhtir bi heybet dike. Vê rêûresma dîrokî bandor li qebîle yan jî qewmê Ibriyan jî kiriye û lewma hewl daye qraltiya xwe ya piçûk a qewm, rewa bike. Jixwe ya ku mirov jê bipê ev e, û mirov di vê xusûsê de digihîje. Di nava vê rêûresmê de ku em hewl didin qala wê bikin, ev jî ew beş e, para Ibriyan dikeve.

Qralên Misir û Sumeran bi hezarên salan, xwe weke qral-xwedayan rewa kirine. Rêûresma Brahîmî bi awayekî sîstematîk li ber vê rabûye. Mirov di çanda Grek de bi felsefeyê, li Rojhilata Navîn bi rêûresma Zerdeştî û dînên Brahîmî li ber rabûne. Bêguman di binê vê nêzîkatiyê de bûyerên mezin ên civakî, ekonomîk û siyasî hene.

A-Rêûresma Zerdeştî

Di nava îdeolojiyên dijber ên sîstema şaristaniyê de cih û maneyeke taybet a Zerdeştiyê heye. Rêûresma Zerdeştî bi berxwedana civaka exlaqî ya ji sîstema çiyayên Zagrosê, xwest hegemonyaya îdeolojîk a sîstema şaristaniya xasûk vegerîne. Derketina vê tevgerê salên 3000'î B.Z. ye, ji tevgereke orîjînal wêdetir, xisleta wê ya reformê heye. Yek ji xwedayên herî kevin ên qebîleyên Aryen Ahûra Mazda ye; mirov dikare bibêje, vê tevgerê di rêûresma Ahûra Mazda de reform kiriye.

Tevî ku çanda bingehîn a nasnameya Aryenîk e, li hemberî Xiristiyantî û Îslamiyetê nekariye xwe nû bike. Komînalîstên navdar ên weke Mazdek, Hurrem û Babek ku pir xurt li ber xwe dane û serî rakirine, bi hêmanên xwe yên qad û karakterê, mirov dikare wan weke nûnerên dawî yên Zerdeştiyê bihesibîne. Her sê jî hem li dijî monarşîzma riziyayî ya Îran-Sasanî hem jî li dijî siltanên Ebasî yên di nava kêf û sefahatê de bûne sembolên lehengiyê. Dîsa bandoreke xwe ya xurt li ser Manîtiyê heye. Rêûresma Zerdeştiyê yek ji rehên sereke yên nirxên komînal-demokratîk e ku divê mirov di nava çanda Rojhilata Navîn de xwedî lê derkeve û xwedî bike.

B-Derketina Holê ya Dînê Brahîmî

Dînên Brahîmî jî mîna rêûresma Zerdeştiyê di berxwedana li dijî şaristaniyê de cîhekî xwe yê giring hene. Di derketina holê ya Brahîmî de, di navenda wê de çêkirina xweda û dînê

qebîle û qewm heye. Di gavavêtina dîrokî de rola dînên Brahîmî, bi qasî rola berxwedana qebîle û qewmên dijberê şaristaniyê giring e. Tevî ku weke qebîle derketine holê, lê di esasê xwe de dikevin çarçoveya tevgerên çînî. Êriş û berxwedana qebîle û qewmên ku ji aliyê hêzên şaristaniya dewletparêz ve weke ʻbarbar ʼtêne pênasekirin bi sedemên ji derve derketine holê û mirov dikare wan weke berxwedan û hêzên bêhtir xwedî xisletên demokratîk şirove bike. Li hemberî vê, bi giştî dîn, bi taybetî jî dînên Brahîmî derketina wan a holê, tevî xisletên wan ên qebîle û qewm jî ew tevger in ku bi sedemên hundirîn derketine holê û bêhtir xwedî xisletên çînî ne. Herdu tevger jî li dijî modernîteya kapîtalîst ji derve tevgerên neteweyî û ji hundir ve jî tevgerên çînî tînin bîra mirov. Dînên Brahîmî di pêvajoya herî giring a dîroka gerdûnî de li dijî sîstema şaristaniya navendî li ber xwe dane û kengî keysa xwe lê anîne êriş kirine, lewma naveroka dînên Brahîmî di warê çînî de tevlîhev e. Ji proleterê herî xizan heta bi arîstokrasiyê li guhereke berfireh tevdigere. Sîstema şaristaniya navendî di çarçoveya orîjîn Sumer û Misirê de xwe weke ʻgavavêtina xwedayîʼ nîşan dide û ew di vê xala sereke de ne razî ne. Dînên ku xwe weke sîstema îdeolojîk a Brahîmî ava kirine, hertim bi guman nêzî xwedabûna sîstema van qral-xwedayan bûne û gotine, ev ne xweda yan jî xwedayî ne. Û ev ʻîdea ʼkirine bingehê gavavêtina xwe ango bi vê ʻîdeaʼya dijber gav avêtine. Yanî em bi awayekî hê zelaltir pênase bikin, ew dibêjin; ʻmirov nikarin bibin xweda-xwedayîʼ. Ya herî qenc ew e, mirov dikarin bibin qasidê xwedê (pêxember) û evdên wî. Ji vê zêdetir îdea bikin, ew ê bibe gunehê herî mezin. Li ser vî bingehî bi hezarê salan xebateke îdeolojîk hatiye kirin û şerekî mezin ê hegemonyayê pêk hatiye. Li ser tevahiya nivîs û xwendinên dîrokê, şopên vê îdeayê, şer û xwelihevrakişandinên wê hene.

C-Xiristiyantî

Di dîrokê de yek ji tevgerên civakî yên ciddî û pêşî ye ku xwedî bingehekî etnîk nîne, lewma derketina holê ya Xiristiyantiyê giring e. Di derketina wê ya holê de armanca wê ya avakirina şaristaniyê tineye; bêhtir aliyên wê yên azadîxwaz û wekhevîxwaz li pêş in. Li Rojhilata Navîn, sîstema şaristaniya dewletparêz bi hezarê salan tebeqe û çînên jêr çêkirin û ev pêvajoya wê di dema Împaratoriya Romayê de derket asta herî jor û Xiristiyantî weke nerazîbûn û bertekê li dijî wê derket holê. Tevgera dînî di dema Brahîm û Mûsa de ji xisletên çînî zêdetir xwedî xisletên qebîle û qewm bû. Lê dînê Îsewî dînê civakîbûneke nû bû. Hem di ser xisletên qebîle û qewm re bû, hem jî tevî bêkar û xizanan hemûyan, terîqet û qebîleyên êsîrkirî, kesên ji eskerî û gundikên koleyan revî hemû di refên xwe de hewandin. Armanca xwe ya avakirina qebîle yan jî dewletekê tineye. Di nava her qewm û dewletê de cemaet û civateke komîn çêdikin. Di vê çarçoveyê de hêja ye ku mirov dêhn û bala xwe bidiyê. Tevî ku aliyê wê yê komînal-demokratîk xurt e, di vî warî de kêm bi pêş ketiye. Tevî ku di destpêkê de ev aliyê wê bi hêz e, lê di pêvajoya gavavêtina şaristaniyê de ev aliyê wê dikeve dereceya diduyan. Herweha ji xisleta xwe ya derketina holê cuda, bi demê re ber bi neteweperestiyê ve beridiye. Xiristiyantiyê bi naveroka xwe ya îdeolojîk, bi berfirehiya xwe û bi himbêzkirina çînan li ber xwe da û bi van xisletên xwe di veguherandina sîstema şaristaniya dewletparêz de bi roleke mezin rabû. Du zirhêzên mezin ên herêmê Romayî û Sasanî di warê îdeolojîk de pûç bûn, nava wan vala bû û hatin ber hilweşînê, di vê de bêguman rola giring a Xiristiyantiyê ye. Lê bi demê re ketiye xizmeta hêzên şaristaniyê û ev ji bo wê baş nebûye. Paşê hewl daye bişibe wan û vê jî kiriye ku ji cewherê xwe dûr bikeve. Di pêşketina kapîtalîzmê de jî berpirsiyariya wê ne kêm e. Herweha nekarî wan gelên ku ew hebandibûn, li hemberî Îslamiyatê biparêze û vê jî kir ku di nivîsandina rûpelên reş û neyînî yên dîroka Rojhilata Navîn de berpirsiyariya wê mezin be.

D-Îslamiyet

Îslamiyet weke dînê çîna navîn bi gewde dibe. Di navbera arîstokrasiya ji rêûresmê ya hişk paganîst û çîna navîn a bazirgan a nû de, şerek diqewime yan jî ew pev diçin. Herdu alî bi heman awayî hişk îdeolojîk in, û ev dike ku her biçe bikevin nava şerekî yan jî pevçûnekê. Di dema Mekkeyê ya Mihemed de têkoşîn û pevçûn bêhtir îdeolojîk e. Dema Medîneyê li gorî vê gavavêtinê dema pêkanîna peymana civakî û siyasî ye. Peymana nû pêşnûmeya dewleteke nû ye.

Şaristaniyên Sasanî, Bîzans û Hebeşîstanê bi hezarê salan qebîleyên Ereb ên li Erebistanê ji çar aliyan ve asê kirine û hostatiya mezin a Mihemed ew e, bi vê hisiya, fêhm kir û dît. Aliyekî din ê giring ê hostatiya wî ew e, ev rastiya maddî bi vegotineke dînî ya bêhempa veguherand rastiyeke manewî ango veguherand Îslamê û di bin vî navî de komên qebîleyan bi heman hostatiyê çalak kirin yanî ew xistin nava şer, ew dan şerkirin. Qebîle bi bêhna yekdestdariyê ya ku ji wan re hatibû pêşkêşkirin, serxweş bûbûn, bi wê coş û enerjiya qebîleyê daketin ser dika dîrokê û bi vî awayî rijiyan warê şaristaniya navendî, ha şerê Îslamî ev e. Halan, şûr, îman û xenîmet!

Xizanên qebîleyê pir bi bawerî ne ku şerekî pîroz dikin. Bi qasî serê derziyê şik û guman di dilê wan de tine bû, yeqîn dikirin di rêya Ellah de şer dikin. Lê mirov ji bo tevahiya arîstokrasiya qebîleyê û kesên xwedî payeya fermandariyê nikare heman tiştî bibêje. Beşekî mezin ji wan, hê Hz. Mihemed sax bû, bêhna yekdestdariyê kiribûn û fêhm kiribûn ku Ellah di vê meseleyê de beşê propagandayê ye. Jixwe, van kesan wê dewleta nû di demeke kurt de weke Xanedaniya Emewiyan bixistana destê xwe.

Xwedayên li panteona Sumeran, berpirsên payeberz ên dewleta nû eşkere nîşan didan. Di vî warî de organîze besît û bi bandor bû. Ji bo asta çanda manewî ya wê demê organîzeyeke bi vî rengî ji bo bawerî û rewakirinê têrê dikir. Lê ji bo çanda manewî û zêhniyeta civakî ya dema Mihemed organîzekirina xwedayan bi awayekî hişkeber têra rewakirinê nake. Lewma Mihemed şêweyekî vê organîzeyê, pûtên li Kabeyê weke Brahîm ne tenê şikand, bi giştî tesfiye kirin û perestina ji bo wan jî gunehekî mezin hesibandiye. Cezayê wê jî li vê dunyayê kuştin, li dunya din jî hetahetayî cehennem e. Xwedayê nû yanî Ellah panteona ji Sumer û Misiriyan ve didomiya bi temamî qedexe dike. Gelo bi vê, civakê çi bi dest xist û bi çi xisirî, ev mijarek e, hêja ye ku mirov pê dakeve û guftûgo bike. Heke mirov têkiliya civaka pirxwedayî û demokrasiyê, têkiliya civaka yekxwedayî û dîktatoriya monarşîk bide ber hev, mirov ê gelek encamên giring bi dest bixe.

Li gorî Hz. Mihemed peyva Ellah bi temamî û vebirrî nasnameya civakî bi giştî pênase dike. Em ê ji vê gotinê bêne vê gotinê, bi navê Ellah çalakî, têgîneke vala yan jî propaganda nîne, bi rastî jî pênasekirina pratîkeke maneya wê gelekî berfireh e. Nexasim, wexta ku em qala xwezaya civakî bikin, çalakiya bi navê Ellah teqez 'têkoşîna civakî' ye. Têkoşîna civakî ya di Îslamiyetê de weke tîpîk demokrasîxwaziya civakî ya çîna navîn e, yan jî mîna têkoşîna komara demokratîk e ku civaka demokratîk jî di nava xwe de dihewîne.

Li Mizgeft an jî camiya pêşî bi temamî pirsgirêkên civakî dihatin guftûgokirin. Her kesê ji cimaet û civatê derbarê pirsgirêkên bingehîn ên civakî de fikirên xwe beyan dikirin û hesab dipirsîn. Pêkhatin-beşdarbûna civînan û şêweyên wan ên xebatê demokratîk bûn. Ji her koma etnîk û her qewmî, wekî din jin û kole dikarîbûn beşdarî civînê bibin û heqê wan ê gotinê hebû. Mînak, Bilalê Hebeş koleyekî Efrîkî bû. Selmanê Farisî sehabeyekî bi koka xwe Farsî bû. Jinan bi mêran re nimêj dikir. Eşkere ye, di derketina holê ya Îslamê de şovenîzma cins û qewm tineye. Dîsa di warê çîn û qebîleyan de cihêkarî tineye. Beşdarbûna demokratîk a di destpêka Îslamê de rastiyek e ku ne ya guftûgokirinê ye. Herweha di civînên camiyên

pêşî de rêveber û fermandarên muhtemel têne diyarkirin. Ji bo bêedaletî nebe, gelek biryar têne girtin.

Jixwe ev beşdarbûna demokratîk nebûya, ne pêkan bû ku ewqas hêmanên çîna navîn, qebîle û xizan hema yekser biketana nava tevgerê. Rêxistiniya Hz. Mihemed ne li ser bingehê zorê ye, li ser bingehê eşqa Ellah e. Şerê wî jî bi heman awayî ye. Eşkere şoreşeke berfireh a îdeolojîk, civakî, ekonomîk û siyasî tê meşandin. Şoreşa îdeolojîk bi awayekî wisa tekûz tê hûnandin û bi heman qehîmiyê li her asta civakî tê belavkirin, di asta eşqê de bi serwextî û baweriyê tê meşandin, belkî bi vî awayî 'rastiya Mihemed 'were pênasekirin.

Lê tişta bi êş û heyf ew e, piştî şexsiyeteke dîrokî ya mîna Mihemed, ji xiyanetkarên rezîl heta bi her cure munafiq û durûyan, gelek kesayetên sefîh û sefîl karîbûn sextekariyên xwe yên mezin di bin navê 'Îslam 'êde heta roja me ya îro dewam bikin. Tişta ku tirajîk e, ev e, û divê teqez ev bûyera ku di tariyê de hatî hiştin, were rohnîkirin.

a) Bipêşketina Îslama Dijber

Di dema çar xelîfeyan de Quran tê tomarkirin, û tevgerên fethê pir bi lez belav dibin. Di vê demê de derz hê nû li Îslamê dikeve. Arîstokrasiya berê ya Mekkeyê hê xwedî wê hêzê nîne ku pêngava dij-şoreşê bike. Guftûgo hene li ser wê yekê ka çima îmam Elî pêşî nabe xelîfe. Ev guftûgo wê her biçe mezin bibe. Hê li naverastê ji seltenetê tiştek nîne. Rewş û demeke nêzî cumhûriyet û demokrasiyê heye.

Di şexsê Muawiye de arîstokrasiya Qureyşiyan wê ne tenê ji Îslama demokratîk tol hilaniya, wê rejîma seltenetê ya nû ya navend Şam a Emewî jî wê bi lez ava bikira. Êdî, Îslam wê weke dîmen û nav bihata parastin, lê di cehwer de wê xiyaneteke mezin lê bihata kirin. Endamên malbata Mihemed ên mayî, wê di şexsê Îmam Husên de li Kerbelayê sala 681'ê bihata tinekirin. Tolhilanîneke pir bêrehm bi vî awayî wê temam bibûya. Di vê tolhilanîna bi êş de wan ê negotina ev jin e, yan jî zarok e, hemû tine bikirana. Ev ne Îslam, ev Îslama dijber bû.

Heta mijara Îslama Dijber eşkere neyê şirovekirin, ti tevgera civakî ya li ser navê Îslamê hatî kirin û meşandin wê rast û durist neyê şirovekirin. Bi navê Îslamê gelek rêûresm û terîqet derketine holê. Heta li ser navê Ehlîbeytê 'Elewîtî' û 'Şîatî' hatine organîzekirin. Lê van hemûyan nekarîbûne Îslama Dijber a serdest ji cihê wê bikin.

Îslama Dijber di esasê xwe de tevgerek e, li Rojhilata Navîn bi ser rêûresma sîstema şaristaniya dewletparêz ve bûye; wê, Îslama ku bi awayekî komargeriya civakî bû û bi temamî ne dewlet bû, bi nirxên wê re xist pozîsyona xiyanetê, û weke momenteke nû ew kir fenomeneke şaristaniya ji rêûresmê ya hezarê salan.

Ebbasî jî wê di yek ji rawestgehên Îslama Dijber de bûbûna xwedî rol û rist. Li Rojhilata Navîn, Îslama Dijber wê bikirana hêza herî mezin a hegemonîk. Di vê demê de, tevgereke felsefeyê û teolojiya Îslamê dest pê kiriye, lê bi temamî negihiştiye encamê. Li ser aqilê azad guftûgo hatine kirin. Di vê de navên kesên weke El Kindî, Farabî, Ibn-î Razî, Cabir, Ibn Sîna û Ibnî Ruşt giring in. Di dema xwe de ango li derdora salên 800-1200'î di gufgûgoyên felsefeyê de ji Ewrûpayê gelekî li pêştir bûn. Di pêşketinên zanistî de jî gelekî li pêş in.

Îslama Ereb weke Îslama Dijber, karîbû komên qebîleyan ên ereb ên belawela bike Qewmê Necîb ango Qewmê Muşeref. Qebîleperestiyeke hegemonîk û şoven jî hertim di nava xwe de hewandiye. Ev, awayek ji awayan Îslamperestiyeke bi şêweyê proto-faşîzmê ye. Navekî din ê vê Îslamê jî 'Îslama Sunnî' ye. Îslamperestiya rastgir a roja me ya îro yanî hêzên radîkal ên Îslama Selefî vê rastiya faşîst piştrast dikin. Bihevrebûn û yekparebûna Îslamê bi şaristaniyê re, rewşa Xiristiyantiyê ya piştî derketina wê ya holê bi sêsed salî çawa bû îdeolojiya fermî ya Romaya Rojhilat, tîne bîra mirovan. Tenê di vî warî de cudahî ew e, Îslamê

ev pêvajo pir bi lez pêk anî, ne sêsed sal, lê vê pêvajoyê sîh salan dewam kiriye.

b) Ehlîbeyt û Xaricî

Îslam bi ser şaristaniyê ve bû, û wexta ev bû, bêguman vê bi xwe re dabeşbûneke radîkal pêk anî. Çawa ku ev di Xiristiyantiyê de pêk hat, di Îslamê de jî ev pêvajoya dabeşbûnê bi awayekî berfireh pêk hat. Wexta ku xizanên qebîleyan dîtin arîstokrasiya qebîleyê ya xwedî hêza desthilatê xiyanetê bi wan re dike dest bi şerekî navxweyî yê dijwar kirin. Di vî warî de mînaka pêşî tevgera ʻXariciyan ʾe. Ji nakokiya Muawiye-Elî nerazî bûn. Fraksiyoneke mezin û pêşî bû. Yên ku fraksiyon pêk dianîn, hemû bedewî bûn. Tevgera Xariciyan bi aliyê xwe yê antî-şaristanî gelekî balkêş e. Dîtine, beşdarbûn û demokrasiya pêşî ya di dema derketina Îslamê de ji dest diçe, desthilatdarîbûn û dewletbûn serdest dibin, lewma ji vê nerazî bûne û ketine nava çalakî û tevgerê. Ji ber ku ev nîşaneya pêşî ya xwelihevrakişandina demokrasî û desthilatdariya di nava Îslamê de ye, di warê dîrokî de gelekî giring e.

Ehlîbeyt ango malbata Mihemed piştî komkujiya Kerbelayê careke din bi ser xwe ve nayê û nikare pişta xwe rast bike. Tevgera Duwanzdeh Îmaman, Îsmaîlî û Tevgera Fatimî, tevî ku bi navê Ehlîbeytê ketin nava tevgerê jî nikarîbûn Îslama Sunnî ji desthilatdariyê bînin xwarê. Meyla ku em qala wê dikin, bêhtir li Îran, Anatolya û Bakurê Efrîkayê hewl da bi hêz be û demkurt hin dewlet jî ava kirin, lê nikarîbû Îslama şoreşger temsîl bike. Milê wê yê Îranê di serê sedsala 16'an de karîbû di bin navê ʻŞîa ʾde bibe hêza fermî ya şaristaniyê. Mîna Dewleta Fatimî ya li Bakurê Efrîkayê, ev jî bi navê Îslama dewletê û Ehlîbeytê rastgiriyeke jirêderketî bû. Xizan xwedî li Elewîtiyê derdikevin û hêzên din ên bi heman awayî Karmatî, Murabîtûn û peyrewên Hesen Sebah weke berxwedanên radîkaltir dijberiya xwe ya li beramberî desthilatdaran û liberrabûna wan dewam kirine.

c) Di Cîhana Îslamê de Hegemonya Dikeve Destê Elîtên Fars û Tirkan

Ji bo Rojhilata Navîn dawiya sedsala 12'an werçerxeke krîtîk e. Çarenûsa Rojhilata Navîn û Îslamê girêdayî vê werçerxê ye ka wê bi awayekî serketî jê bibihure yan na. Mirov dikare vê muddeta dîroka Îslamê ya heta vê werçerxê weke Îslama Ereb tehlîl bike.

Şaristaniya Îslamê û muxalefeta wê ya demokratîk a piştî sedsala 12'an, êdî ne li ser bingehê qewmiyeta ereb e, xwedî dirûvekî pirqewmî ye. Êdî serdemek dest pê dike tê de arîstokratên qebîleyên tirk bi rola sereke radibin. Di vê pêvajoya giring de ya ku bandora wê heta roja me ya îro didome, gelek bûyerên çînî û etnîk ên serûbinîbûyînê diqewimin.

Li gorî rêzê di dema emîr û siltanên Ereb û Tirkan ên xwedî hêza hegemonîk de, dîrok dest pê dike ji bo Ermen, Asûrî û Helenan serberjêr diçe. Çerxên vê dîrokê hinekî jî li dijî Kurd û Farsan jî digerin. Xelkên Xiristiyan û çanda wan, heta roja me ya îro bi gelek rêbazan li Rojhilata Navîn hema bêje bi temamî tesfiye kirin. Di çarçoveya çanda maddî û manewî ya serdemên pêşî û navîn de ev çand gelekî pêşketî bûn û tesfiyekirina van çandan xiyaneteke mezin a şaristaniya Rojhilata Navîn li gelan bû. Heke Rojhilata Navîn di warê çandê de bûye çol û çolistan, roja îro ketiye krîzê û ber bi întîharê ve diçe, roleke diyarker a vê trajediya dîrokî û bi lanet heye. Kurd bi qasî xelkên Xiristiyan di warê fizîkî de nehatin tesfiyekirin, lê di warê çandî de ji wan xirabtir xiyanet li wan bû. Ev xiyaneta li Kurdan hat kirin gihişt heta bi qirika wan û hew ma wan tine bike.

Piştî Îslama Ereb û Tirk sêyemîn elîta giring a desthilata arîstokratîk a bi koka xwe Îran-Fars e. Li beramberî rêûresma Îslama Sunnî ya Ereb û Tirk, muxalefeta Îranî-Farisî ya bi dilsoziya bi îdea û baweriya bi Ehlîbeyt û Duwanzdeh Îmaman, ji dema Emewiyan ve timî hewl daye pêngav û gavan biavêje. Di nava burokrasiya Emewî û Ebbasiyan de bi bandor

bûn, lewma hem li hundir û hem jî li derve timûtim li ber seltenetên wan rabûne. Piştî gelek ezmûn û tecrûbeyên desthilatên herêmî, Şîa salên 1501'ê bi awayekî fermî weke mezheb tê qebûlkirin, bi vê hewl dane nîzama împaratoriya Îranê ya berê nû bikin. Ev împaratorî bi pêşengiya Azeriyên bi kok Tirkmen û Farisiyên Şîî pêk hatiye, nexasim bi seltenetên Tirk ên Osmanî re timûtim ketine nava şer û pevçûne. Şerê di navbera herdu aliyan de herdu hêz jî hilhilandine û ji taqetê xistine, û bi vê, hiştine ku hegemonya Ewrûpayê di sedsala 16'an û 19'an de bi hêz bibe. Herçiqasî desthilatdarên Şîa xwe xistibin pozîsyona dijberên desthilatdarên Sunnî jî ya rast ew e, mirov wan jî weke şêweyekî din ê Îslama Dijber pênase bike. Di navbera wan de cudahiyeke tenê heye, ew jî ew e ku desthilatdarên Şîa, Ehlîbeyt û rêûresma Elewî zêde îstîsmar kirine. Ya rastî, heta ku Elewîtî dijbertiya desthilatdarê û şaristaniyê neke û herweha nûneriya şaristaniya demokratîk neke, her awayê wê yê desthilatdariyê wê her tim awayek ji awayên Îslama Dijber be.

Di dema Îslama seltenetê de weke hêza miletê çaran, rola Kurdan zêde xuya nake. Lê di nava alimên Îslamê de cîhekî wan ê giring heye. Dîsa tê zanîn, di qesr û sereyan de bi bandor bûn. Di qesr û serayên Emewî, Ebbasî, Selçûqî, Osmanî û Îranî de nûneriya gelek mîrtî û begtiyên Kurdan hebû. Hem weke şexs xwedî rol bûne, hem jî begtî û mîregtî ava kirine.

Eyûbiyan bi Selahedîn re di navbera salên 1171-1260'î de dewleteke navend Şam ava kiriye. Bi xwe Kurd bûn, mîna xanedanên Tirk û mîna Erebên esilzade bi rola xwe rabûne. Xanedaniya Merwaniyan di navbera salên 990-1090'î de hukimdariyek navend Meyafarqîn ava kiriye. Ev pêkhatin, paşê ji aliyê xenadeniyên Tirk ve hatiye tesfiyekirin. Gelek begtî û mîregtiyên bi vî rengî yên Kurdan hatine avakirin. Şerefxaniyên ji Bedlîsê heta sala 1560'î hebûna xwe dewam kirine. Begtiyên Kurdan bi sedema ku piranî bi rêûresma Sunnî ve girêdayî bûn, li dijî selteneta Şîa ya Safewiyên Îranê bi pêşengiya Îdrîsê Bedlîsê bi siltanên Osmaniyan re tifaq kirine. Rewşa begtî û mîrtiyên Kurdan ên di nava sîstema selteneta Osmanî de xwedî otonomiya herî berfireh di sedsala 19'an de xira dibe. Bi isyana Bedirxan Beg re (1835-1860) cara dawî kabên xwe diavêjin û bi bin dikevin.

Di encama xizaniya qebîleyên Kurd de Kurmanc çêbûne. Kurmanc ji qebîleyê qut bûne, hinek ji wan bûne koçer û hinek ji wan jî bûne dêmanî. Ji wan re Kurd tê gotin. Tebeqeya jêr in. Lê bi hebûna xwe Kurd mane. Tebeqeya jor a beşê Kurdên hevkar bi giranî bi elîtên desthilatdariya neteweya serdest ên xwecihî re û hinekî jî bi hêzên hegemonîk ên Emerîka û Ewrûpayê re têkilî danîne, û li ser bingehê Kurdên kedkar li derve bihêlin, hewl dane xwe li ser piyan bigirin. Vê rastiyê, mohra xwe li têkoşîna çînî û neteweyî ya diyardeya Kurd daye. Ango di meseleya Kurd de rastiyeke diyarker e.

Ji serê sedsala 12'an heta bi serê sedsala 19'an, şaristaniya Îslamê, di serî de, di warê bazirganî û çandî de tevahî nirxên xwe yên erênî bi destê Ewrûpayê ve berdide û dibe şaristaniyeke hundirê wê vala ango dibe şaristaniyeke pûç û tenê qalikê wê maye. Danehevên hezar salan di nava pêncsed salan de veguhestin Ewrûpayê. Ev cih û hêzguhertina şaristaniya navendî ya hegemonîk, yek ji veguherînên herî mezin ên dîrokê ye. Heke em vê weke erdhejeke mezin bihesibînin, em dikarin bibêjin, li dunya me erdhejokên li pey vê veguherînê hê jî didomin.

4-Modernîteya Kapîtalîst û Rojhilata Navîn

Civaka Rojhilata Navîn bi sedsala 19 û 20'an re ji aliyê modernîteya kapîtalîst ve hatiye fetihkirin. Di nava van dused salan de dewleta netewe ya jêdera wê derve ye; veguhestine Rojhilata Navîn. Çawa ku gelek kes yeqîn dikin û pir tînin ziman, dewletperestiya netewe ne afirîneriyeke hêzên neteweyî û millî ye. Berevajî, hegemondariya Ingilistanê ew vedîtiye û ji

bo li tevahiya dunyayê polîtîkaya xwe ya ʻdabeş bike û bi rê ve bibe ʼbimeşîne, weke amûrekî bi bandor bi kar aniye.

Bi vê polîtîkayê, Ingilistan weke împaratorî berfireh dibe, lê împaratoriyên hevrikê xwe bi dewletokên netewe parçe dike û wan ji hêzê dixîne, bêtaqet dike. Stratejiya desthilata modernîteya kapîtalîst jî hewceyiya xwe bi van tîp dewletan heye. Ingilistanê, ji aliyekî ve têkiliyên xwe bi elîtên fermî yên împaratoriya Osmanî û Şahtiya Îranê re dewam kiriye, ji aliyekî din ve jî bi eşîr, hindikayî, mezheb û tevgerên piçûk ên netewedewletparêz re ku nakokiyên wan bi van împaratoriyan re hebûn, têkiliyên pratîk û îdeolojîk danîne, destek daye wan û wexta ku hewce kiriye di avakirina wan de weke hêza diyarker tevgeriyaye.

Di van dused salên dawî de Rojhilata Navîn di warê desthilatdariyê de ne tenê hewceyî hegemonyayê bûye, bi dewletokên netewe di parçebûna herêmê de jî ketiye krîzeke kûr. Di vê krîza kûr de Împaratoriya Osmanî hatiye hilweşandin û li şûna wê gelek dewletokên netewe hatine avakirin.

Împaratoriya Ingilistanê ji bo rêya Hindistanê di kontrola xwe de bigire, bibe xwediyê çavkaniyên petrolê û Împaratoriya Osmanî bixe kontrolê, rê li dewletdariya neteweya Ereb vekiriye. Ereb dabeşî bîstûdu dewletokan kirin, rewşa parçebûyî ya bi sedan qebîle û mezheban her di rojevê de hiştin. Dewletokên netewe ku em qala wan dikin, her di rewşa saziyên bingehîn ên sîxur ên hegemonyadariya kapîtalîst a dunyayê de mane, û van dewletokan her xwe mîllî nîşan dane û ev jî ji teknîka desthilatdariya modernîteya kapîtalîst e. Tişta ku neteweya mezin a Ereb û çanda wê diqedîne, ji Îsraîlê zêdetir, hesabên desthilatdariyên bîstûdu dewletokên netewe ne; mesrefên wan dûrî aqilan û fehş in. Xelkên van dewletokan ji nêza dimirin, xizan û belengaz in, lê desthilatdariyên wan ji Nemrûd û Firewnan zêdetir di nava dewlemendiyeke nedîtî de ne. Hema bêje ji zêdexuriyê bitir bûne. Yê ku vê hêzê jî dide wan, xwedayê nû yê sekuler dewletokên netewe ne. Girêdan û dilsoziya wan a bi xwedayên berê sexte ye û qaşo îmanê bi wan tînin.

Tirkên ku elîtên hakim ên Împaratoriya Osmanî bûn, wexta ku li Anatolyayê xwe bi avakirina dewleteke netewe ya piçûk gîro dikirin, li Balkanan, li Kafkasan û li Rojhilata Navîn hindikayiya Tirk û Tirkmen hatibûn terikandin û bi çarenûsa xwe ya bextreş re mabûn. Dewletên din ên netewe yên Turkî tevî hîmayeya Yekîtiya Ewrûpayê û Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê, di nava hegemonya Rûsyayê de bûbûn xwedî hebûn. Xwe kiribûn diyardeyek ku hêzan, xwe li ser wan xwe li hev radikişandin. Tevî ku xwe gelekî mîllî dihesibandin jî bêyî hegemonyayê nikarîbûn li ser piyan bimînin. Ji krîza li herêmê têra xwe para xwe girtibûn, xwedî potansiyeleke kaotîk bûn.

Ermen û Rûmên Anatolyayê, Suryanî û Pontûs di encama qirkirinê de ji cîwarê xwe bûn û ketin rewşekê, ji çanda xwe ya hezarê salan a zeman û mekan hew man bi temamî mehrûm bibin.

Rewşa Cihûyan hem weke gel û hem jî weke dîn, mîna ku dîroka xwe ji nû ve pêk bînin, weke dînamîka kaosê ya desthilatdariyeke din a pir giring a herêmê xwedî rol in. Weke hêzeke avaker a herî li pêş a modernîteya kapîtalîst, wan di veguherînên dused salên dawî yên herêmê de rewşa kaotîk kûr kiriye.

Kurd gelê herî kevnar ê herêmê ye, û timî li ber devê qirkirina çandî hatiye hiştin. Gelê Kurd di pozîsyona ʻmaka xirabiyêʼ de hatiye hiştin, weke qerteke bi deman a polîtîkayên ʻparçe bike-bi rê ve bibeʼ di destê xwe de hiştine. Kirine ku Îran di nava xwe de timî mîna li ser agir be, ango ew navxweyî tengezar kirine û bi vî awayî hewl dane wê bi rê ve bibin. Mîna ku vê jî têrê nekiribe, di tehlîla dawî de du beşên jiyanê yên dînperest û laîk ên muptelayên derve, kaosa siyasî ya li Îranê kûrtir kirine. Modernîstên Îranê ewqas bêşerm û rûşuştîne, pûtê dewleta netewe yê ku berhemê kapîtalîzmê ye, weke manewiyateke mezin bi navê

‘Komara Îslamê’ pêşkêş kirin. Li gorî rewşa îro ya berbiçav, Îran faşîzmeke bi sazî bûyî ye, di nava pençê krîzê de diperpite û xala qels a sîstema kapîtalîst a global e; û em dibînin, ketiye pêvajoyekê, meseleya wê ya hebûnê bêhtir kaotîk dibe û wê bibe jî.

Dewletên hûr û gir ên li herêmê hatine avakirin, çi mîllî bin çi jî dînperest bin, eşkere ye, hemû bi rola fîguran û ajanên dema wan bihurî yên modernîteya kapîtalîst radibin û ji vê wêdetir ne ti tiştekî din in. Dema ku mirov li dîroka wan a kurt binêre, bi hêsayî mirov ê bibîne, dewletên Îslamî û mîllî berhemeke emperyalîzmê ya dused salên dawî ne.

Krîzên dewlet û desthilatdaran ên li Rojhilata Navîn hem dîrokî ne, hem jî aktuel in. Rahenda dîrokî têkiliya xwe bi sîstema kastîk re ye, rahenda aktuel jî jixwe têkiliya xwe bi qonaxa dawî ya sîstema kastîk bi modernîteya kapîtalîst re ye. Modernîteya kapîtalîst di dused salên dawî de xwe cîla kiriye û xwe rûkêş kiriye, lewma şaş e ku mirov bêyî rahenda wê ya dîrokî wê bibîne û pê dakeve, di heman demê de dîsa şaş e ku bi sedema karakterê wê yê dîrokî, mirov tiştên modernîteya kapîtalîst kirî û li yên heyî zêdekirî, nebîne.

Kapîtalîzm bi xwe di nava civaka herêmê de tê naskirin ango ne diyardeyek e ku nayê zanîn. Kapîtalîzmê bi hezarê salan xwe weke beşê bazirgan-selefkar nîşan daye. Vî beşî têkiliya xwe ya bi desthilatdar û yekdestdarên cotkariyê re timî xweş kiriye û parastiye. Beşê ku herî zêde ji krîzan sûd wergirtiye û îstîsmar kiriye, ev beş e. Dînên pîroz hemûyan lanet li vî beşî kirine, pergala civaka komînal jî ew weke bêexlaq dîtiye û ew ji xwe dûr kiriye.

Tişta ku bi modernîteya kapîtalîst re bûyî, beşê ku em qala wî dikin, eşkere derketiye holê. Van beşan li Ewrûpayê pozîsyoneke rewa bi dest xistiye. Paşê wan ev pozîsyon li Rojhilata Navîn jî bi dest xistiye û vê yekê, hevsengiyên civakî xistine tengasiyê. Ingilistan weke nûneriya çîna bûrjûwayê tê li herêmê hevkarên xwe çêdike û bi vê, ji bo desthilatdariya hegemonîk beşekî giring pêk tîne. Yê ku modernîteya Rojava bire Rojhilata Navîn, tevî burokrasiyê ev beşê komprador e. Sîstema modernîteya kapîtalîst, bi awayekî esasî bi van herdu beşên hevkar hewl daye li herêmê bi cih bibe. Yên ku li civaka Rojhilata Navîn herî zêde xerîb ev beş in, û pêxîrtengî û tengasiya civakî ji wan e. Hêmanên ku wan xistin nava çanda herêmê, tenê wê civakê bixin tengasî û kaosê. Jixwe, ji vê jî zêdetir ti rola wan nîne.

Bûrjûwazî, di dused salên dawî de li şitilgeha dewleta netewe gihişt û di avakirina civaka dîrokî ya herêmê de bûye tamandin û qelemkirineke xerîb. Lê ev tamandin xwe nagire. Ji ber vê jî bêperwa yekdestdarên xwe yên li ser ekonomiyê û amûra xwe ya dewletê bi awayekî faşîzan bi kar tîne; ya rastî, weke sermayeya bi desthilatdariyê hatî, ti çareya wê namîne, xwe diavêje bextê faşîzmê. Ev xisleta sermayeyê ya li Rojhilata Navîn û li deverên din ên dunyayê yên bi heman rengî û zordariya wê ya di avakirina dewleta netewe de esas cewherê faşîzmê pêk tîne. Faşîzm ji şêweyê desthilatdariyê yê sermayeyê yê bi dewleta netewe re ketî zikhev pêk tê û weke maka sermayeyê ya ji desthilatdariyê nisilî, maneya xwe çêdibe.

Bi kurtî, em dikarin bibêjin, modernîteya Rojava, bûrjûwazî, sermaye û kapîtalîzm xist Rojhilata Navîn û vê jî krîza civakî ya ji rêûresmê û rewşa kaotîk bêhtir giran kiriye. Bêguman jiyaneke civakî heye. Lê ev jiyan hinekî dişibe heywana serjêkirî yan jî hin lebatên wê qutkirî, virde wirde diçe û tê, diperpite.

Di êrişa modernîteya kapîtalîst de mirov rola hegemonyaya îdeolojîk nebîne, ev ê kêmasiyeke mezin be. Wexta ku tê digihîje serê sedsala 19’an modernîteya kapîtalîst a Ewrûpayê hegemonyaya xwe ya li ser îdrakkirina heqîqetê ji zû ve çêkiriye. Bi vê serdestiya xwe ya di warê îdrakkirina heqîqetê de gav avêtiye Rojhilata Navîn. Pêşî bi mîsyoneran herêm ji nû ve keşif kiriye. Paşê îdrakên seyahan û ‘lêkolînên zanistî’ yên li herêmê weke ‘oryantalîzm ’êveguherandiye ekoleke fikirê. Oryantalîzm hegemonyaya zêhniyetê ya şaristaniya Ewrûpaya Rojava ye. Ji sedsala 19’an û pê ve, zêhniyeta Rojhilat ango Şerqê serxwebûna xwe ji dest dide. Fikirên oryantalîst lê serdest dibin. Elît û ronakbîrên Rojhilatî jî

dikevin bin serdestiya fikirên oryantalîst. Di serî de milletperestî bi tevahî, versiyonên fikirên lîberalîzmê zêhniyeta Rojhilat dagir dikin. Tevgerên Îslamî yên nû û fikirên din ên dînî jî di nava qalib û formên oryantalîst de çêdibin.

Tevgerên dewletparêz ên netewe ku bi sedsala 20'an re derketin holê, bi cewherê xwe xwedî wan xisletan bûn, mirov ji wan re dikare bibêje, saziyên sîxur ên fikira oryantalîst bûn. Damezirînerên dewleta netewe, wekî ku gelek caran îddîa dikin, ne xwedî fikira serxwebûnê ne. Li Rojhilata Navîn, fikira çepgir jî di navê de li ser tevahiya formên fikirê yên sedsala 20'an mohra oryantalîzmê heye. Li ser navê zanistên civakî, fikiran çêdikin û kirasê wan li herêmê dikin; herçiqasî ji van fikiran re heqîqetên zanistî yên gerdûnî were gotin jî di cewherê xwe de hemû oryantalîst in. Li gorî qalib û formên zêhniyeta berê, oryantalîzm bêhtir nêzî heqîqetê ye û hêza xwe jî ji vê digire.

Axir, di dawiya sedsala 20'an de li gorî jihevdeketin û pêxîrtengiya di pêkhatina sîstema giştî de, vê serdestiya bi qasî dused salan dewam kirî jî ji hev de ket û ket pêxîrtengiyê. Li hemberî teknîkên zanistî yên bi praktîk giringiya felsefeyê ya berê nema, zanist bû teknîka lêkolînên bêhedûhesab. Huner jî piştî serdema klasîk nirxê xwe yê ekolbûnê nema, weke lodeke endustriyê kirin metayeke çor a ji mane û estetîkê bêpar. Di encamê de hersê bi hev re bûn amûrên besît ên berjewendiyên kapîtalîzmê, dewleta netewe û endustriyalîzmê. Bi vî awayî felsefe, zanist û huner bêkêr bûn; ji qabîliyetên xwe yên esas bûn; ji ber ku felsefe, zanist û huner di gera li heqîqetê û pênasekirina wê de bikêrhatî ne.

Pêxîrtengiya ku zanist, felsefe û huner li Rojava ketiyê, kengî oryantalîzm li Rojhilata Navîn bêqîmet bûye, maneya xwe çêbûye.

Dema ku em di çarçoveya vê perspektîfa bingehîn de li meseleyê temaşe bikin, xusûsa pêşî ya ku em derbarê rewşa aktuel de bibêjin ev e, hem hêzên ji rêûresmê hem jî hêzên modern ên serdest bi giştî ji bo pirsgirêkên civakî, bi taybetî jî ji bo derketina ji krîz û kaosê, çareseriyeke wan a pêşkêş bikin, tineye. Çi dînperestî be çi jî milletperestî be, ji dîroka rêûresmê bendewariya çareseriyê nabe, ji ber ku dîroka van hêzan, dîroka bêçareseriyê ye. Li aliyê din, hêzên modern jî çareseriyeke wan tineye ku deynin holê. Ma ne, ew bi xwe avakerên sîstemeke herî bi pirsgirêk û misêwa bi krîz in, îca ew ê çawa bi xwe bibin çareserî? Sîstema kapîtalîst a global ku qonaxa dawî ya sîstema kastîk e, krîza wê ya pêkhatin û esasê heye; û nikare rêya derketina ji krîzê bibîne, îca ew ê ji pirsgirêk û krîzên Rojhilata Navîn re çawa çareseriyê bibîne? Bi ser de jî reh û rîşê Rojhilata Navîn heta bi serdema destpêkê ya sîstema kastîk diçe û modernîteyê jî pirsgirêk û krîzên wê wilo kirine ku derketina ji navê zehmettir bibe. Jixwe bûyerên rojane û aktuel diqewimin isbat dikin û nîşan didin ka krîzek û bêçareseriyek çi qasî mezin heye.

5-Hin Nakokiyên Dîrokî-Aktuel yên li Benda Çareseriyê

Em dikarin hin nakokiyên bingehîn ên rewşên rojanebûyî û dîmenên berbiçav ên yekdestdarên dewletê û desthilatdariya îdeolojîk wisa diyar bikin:

1-Li Rojhilata Navîn pirsgirêka herî zehmet a ku mirov wê li dawiyê bihêle, cinsperestî ye û ew astenga herî mezin a li pêşiya azadiyê ye. Diyardeya kok û sîsika problematîk û mêhtinkariya li Rojhilata Navîn, cinsperestî ye. Di vî warî de cara pêşî pirsgirêkê rûda û çanda civakîbûna azad xira bû. Mirov dikare bibêje, ji Sumeran heta îro, her dîn, bîrûbawerî û îdeolojiyê, cinsperestî hem weke felsefî-exlaqî xurt kiriye, hem jî wan ew bi sazî kiriye.

Cinsperestî, ji bo mirovên Rojhilata Navîn ne ya guftûgoyê ye, û ev ketiye rewşekê bi awayekî xwezayî hatiye qebûlkirin. Ji bo lidawîhiştina wê, ev astenga herî mezin e. Ji ber ku ji bo pirsgirêkek li dawiyê were hiştin, beriya her tiştî divê weke pirsgirêk were qebûlkirin.

Mirovên li Rojhilata Navîn nikarin bibînin ku li pişt pêxîrtengiya wan a ekonomîk, polîtîk û civakî pirsgirêka cinsperestiyê heye û ji hizirîna vê gelekî dûr in. Di vî warî de rohnîbûn û serwextî pêdiviyeke bivênevê ye.
Ji bo pirsgirêka cinsperestiyê were çareserkirin gelek zor û zehmetî li pêşiya civaka Rojhilata Navîn hene. Ji ber ku pirsgirêk gelekî bi kok e, û pir aliyên wê hene. Lê li gorî vê, civak berketî nebûye û asta wê ya serwextbûnê qels e. Tevî vê rewşê jî aliyekî erênî heye. Gelê Kurd yek ji gelên herî kevnar ê Rojhilata Navîn e. Kurd, bi giranî ser bi baweriya Îslama Sunnî ne. Tevî vê, Tevgera Azadiyê ya Kurd li ser bingehê azadî û wekheviya jin û mêran xwe bi rêxistin kir û nîşan da ku mirov dikare vê pirsgirêkê li dawiyê bihêle. Yan jî bi kêmanî ji bo li dawiyê were hiştin, wê rê vekir. Herweha me di ezmûna şoreşa Rojavayê Kurdistanê de dît ku jin çi qasî azad dibe, çawa ezmûneke azadiya civakî ya pir bi hêz derdikeve holê.

2-Rojhilata Navîn warekî wilo ye ku lê qebîle bûn xanedan, û bi vî awayî desthilatdarî bi pêş ketin. Di çanda qebîleyan de kîjan qebîle di şer de serketî be, ew qebîle asta pîrozbûna xwe mezin dike. Ango çi qasî serketin ew qasî pîrozbûna mezin.

Kengî xanedan vediguherin desthilatdariyên hê mezintir, hingê ji aliyê dîn ve jî hatine pîrozkirin. Erdên welatê mezin weke mal û milkê xanedaniyê hatine dîtin û qebûlkirin. Ji wê rojê heta îro qebîle, eşîr û xanedan di warê siyasî de xwedî rol in. Wexta ku rejîmên xanedanan hildiweşin jî malbatên mezin û berfireh bandora xwe didomînin.

Dînan malbat, di şexsê malbatê de jî dewlet pîroz kirin. Sîstema kapîtalîst a modern malbata berfireh ji holê rakir û li şûna wê çanda "malbata kakil-piçûk" bi sazî kir; ji ber ku malbata berfireh li gorî malbata kakil bêhtir nêzî komînalîteyê bû. Heke hûn dêhna xwe bidinê hûn ê bibînin, ji roja pêşî ya bigewdebûna desthilatê heta roja me ya îro malbat bi gelek navên cuda her hebû û hertim li navenda desthilatdariyê ye. Ji ber vê, tevahiya sîstemên desthilatdariyan, avakirina dewletê bi avakirina malbatê re di zikhev de pêk anîne. Îro jî jihevbelavbûna malbatê û jihevbelavbûna dewletê wekhev tê dîtin.

Herêma ku herî zêde çanda malbatê lê bi kok e, Rojhilata Navîn e. Ji ber ku hem bingehê modela pêşî ya desthilatdariyê ye, hem ji aliyê dîn ve hatiye pîrozkirin û hem jî her cure desthilatdarî xwedî lê derketiye.

Analîz û tehlîlkirina malbatê tenê di çarçoveya serdestiya mêr an jî mêhtinkariya li ser jinan de ji kêm vîzyonê ye. Malbat, ew sazî ye ku tevahiya endamên malbatê li gorî rejîma desthilatdariyê bi gewde dike, çêdike. Heke mirov hinekî din hûrûkûr bala xwe bidiyê, mirov ê bibîne ku bi kêmanî bi qasî jinê, mêrê malbatê jî saziya navçîn a mêhtinê ye. Louis Althusser, malbat weke "yek ji amûrên îdeolojîk ên dewletê" pênase kiriye û pênasekirin gelekî rast û hêja ye. Bi giştî malbat weke pêkhateyeke civakî, heta weke bingehê civakîbûnê tê qebûlkirin. Lê malbat ji civakê bêhtir saziyeke dewlet-desthilatdariyê ye. Bêguman nabe ku malbat bi temamî ji holê were rakirin. Dibe ku weke formeke têkiliyê, hewce bike di asteke diyar de hebûna xwe bidomîne. Lê derbarê saziya malbatê de hewceyî bi serwextî û ronakbîriyekê heye û şert e ku gav bi gav were demokratîzekirin û were veguherandin li pêkhateyeke komînal a civakî.

Li Rojhilata Navîn heta malbat neyê demokratîzekirin, ne pêkan e ku civak xwe bigihîne çanda demokratîk û bibe azadîxwaz. Divê mirov bîrbiriya derbarê malbatê de û têkoşîna ji bo veguherandina wê, weke têkoşîna azadîxwaziyê bibîne.

3-Nakokiya Ereb-Cihû bi qasî ku dîrokî ye, di heman demê de bi awayekî aktuel jî dewam dike; di dîrokê de ji aliyê sîstema şaristaniyê ve, di dîroka nêz û aktuel de jî ji aliyê modernîteya kapîtalîst ve tê afirandin, lewma bi nêzîkatiyên hegemonîk û desthilatdar

çareser nabe. Heta ku nakokî ji destê dewletê û desthilatdaran neyê xilaskirin, ti carî Îslam û Cihûtî li hev nayên û di nava wan de aştî çênabe. Heta ku herdu alî di dewletbûn û deshilatbûnê de israr bikin weke di dîrokê de jî qewimî wê di roja me ya îro de jî hebûna xwe di tinekirina hevdu de bibînin. Ji ber ku dîroka desthilatdaran bi vî awayî çêdibe. Modernîteya kapîtalîst ev pêvajo bêhtir hişk û dijwar meşand. Li gorî modernîteya kapîtalîst çareserî ew e ku yek alî yê din bipelixîne. Dîroka pêncsed salî ya modernîteya kapîtalîst bi mînakên qaşo çareseriyê yên bi vî rengî tijî ye. Bi qasî sedsalekê ye, herî zêde vê pirsgirêkê pir neyînî bandor li herêmê kiriye, bûye sedema êş û azarên pir mezin û bûye sedema xisareke mezin a maddî û manewî, lewma bi nêzîkatiyên serdest ên heyî rewş wê kambaxtir bibe û bivênevê wê dewam bike.

Ti mînaka çareseriyê bi qasî mînaka Ereb-Cihû nikare rastiya xwînrij a çareseriya şaristaniya dewletdar-desthilatdar nîşan bide. Ji 7'ê Cotmeha 2023'an ve bûyerên li Xezeyê qewimîn, rastiya ku em qalê dikin, pir eşkere nîşan da. Ya seyr û sosret ew e, modernîteya kapîtalîst rê li ber qirkirina Cihûyan vekiriye û ew bi xwe di avakirina wê de bi roleke mezin rabûne.

4-Nakokiya Kurd-Ermen-Asûrî-Rûm-Cihû ya elîtên serdest ên Tirk jî bi awayekî esasî ji ber modernîteya kapîtalîst e. Herçiqasî koka meseleyan heta bi şaristaniyên berê biçe jî li herêmê bi belavbûna sê suwarên mehşerê yên modernîteya kapîtalîst re ango bi belavbûna kapîtalîzm, dewleta netewe û endustriyalîzmê re, di dîroka Anatolya û Mezopotamyayê de bi awayekî berê hîç nehatibû dîtin bêhedûhesab etnîsîte û millet hatin hêran, qirkirin. Modernîteya kapîtalîst di dused salên dawî yên dîroka xwe de kir ku ev gel û çand pir dijwar dijminatiya hev bikin, rikê ji hev bikin, yek koka yê din biqelîne. Bi vî awayî, danehevên çandî yên hezarê salan tesfiye bûn; hin ji van gelan ji herêmê hatin koçberkirin û hin ji wan jî hatin tinekirin. Yên mayî jî yan bûn qebîleyên çiyayan yan jî teriqîn bi çolan ketin. Nakokî bi xwe ne di nava Tirkan û gelên din an jî di nava gelan bi xwe de ye. Yên nakokî çêkirine, hêzên neteweyî yên hegemonîk ên modernîteya kapîtalîst in. Van hêzan, ji bo berjewendiyên xwe yên konjukturel ên li herêmê, xem nexwarine, van gelên herî kevin ên herêmê wan berra pêxîra hev du dane û kirine ku hev du qir bikin. Bi awayê ku ji her kesî xuya dike, ev gel hemû li dijî hev şer dikin, lê ya rastî, hemû qurbanên mêhtinkarî û desthilatdariya kapîtalîzma yekdestdar in. Ya mirov pê diêşe ew e, wexta ku ev gel û millet hev du tine dikin, hûrûkûr nizanin ka xizmeta çi û xizmeta kê dikin. Yanî bi temamî nizanin di ber çi de hev du digurînin. Di çarçoveya vê nakokiyê de bûyerên qirkirin û kokqelandinê bi tena serê xwe isbat dikin ku modernîteya kapîtalîst tevahiya dîrokê di nava sîstemên şaristaniyê hemûyan de ya herî xwînrij û malwêran e. Li gelemperiya Rojhilata Navîn gelek dever demeke dirêj weke 'baxçeyê gelan 'bûn, îro heman dever veguherandine devereke bêdeng a 'qebristana gelan'.

5-Li Rojhilata Navîn dînperestî-mezhebperestî yek ji wan pirsgirêkan e ku divê teqez were çareserkirin. Çi şer û nakokiyên Îslamiyet-Mûsevîtî, çi Îslamiyet-Xiristiyantî, heta Xiristiyantî-Cihûtî di peywenda proto-modernîteyê de dikarin çareser bibin. Beriya modernîteya kapîtalîst form û sedemên şerên dînî weke heyî di dema modernîteya kapîtalîst de jî xwe dane der. Nexasim, divê mirov sê dînên yekxwedayî yên bi koka xwe ji Rojhilata Navîn, weke pêş-milletperestiyê bibîne. Cudahiya van dînan ji milletperestiya modernîteyê ew e, wan maskeya teolojîk dabû ber rûyê xwe. Di encamê de, hem desthilatdarî û dînê dewletê, hem jî vegotina dewleta netewe ya modernîteya kapîtalîst vedibêje, hemû ji berjewendiyên heman yekdestdariyê re xizmetê dikin. Çawa ku di dîrokê de bûye, roja me ya îro jî şerên mezhebî yên li Ewrûpayê û Rojhilata Navîn ji ber modernîteya kapîtalîst û

şaristaniya dewletdar e; û hê jî li ser bingehê heman berjewendiyan bi heman lezê wan didomînin. Di dema şaristaniya Îslamê de, şer û pevçûna di navbera hêzên gel ên civakî û hêzên dewlet û desthilatdarê de hê Hz. Mihemed sax bû dest pê dike. Ji ber van şer û pevçûnan, piştî wefata Hz. Mihemed ji çar xelîfeyan sisê têne kuştin. Di encamê de, cara pêşî di cîhana Îslamê de dewlet, çîn û civak dabeş dibin; Muawiye weke nûnerê çîna jor a arîstokratîk, Ehlîbeyt weke nûneriya malbata Mihemed û Xaricî weke nûneriya beşên radîkal û qebîleyên xizan derdikevin holê. Îslama desthilatdariyê xwe bi gelek dewlet û împaratoriyan bi hev ve dike, bi mezhebê Sunnî xwe bi norm û rewa dike, mezhebên Îslamê yên dijberê desthilatdariyê jî weke Xaricî û Ehlîbeytê derdikevin holê û hewl didin bi vî awayî hebin. Îslama li Îranê bi gewde dibe, Îslama veguher e. Herçiqasî bi giştî weke Şîa were binavkirin jî di esasê xwe de Îslama Ehlîbeytê ya çîna navîn e. Tevî ku bi koka xwe digihîje dema derketina holê ya Îslama desthilatdar jî şiklê nakokî û pevçûnên Şîa-Sunnî yên roja me ya îro têkildarî modernîteya kapîtalîst in. Heke em bi mijara şerê Îran-Iraqê yê dema nêz dakevin û em di çarçoveya forma dewleta netewe û emperyalîzmê de li meseleyê binêrin, wê mesele rast û durist were fêhmkirin. Îslama Îranê ji ber çanda xwe ya dewlemend û bi sedema ku bi awayê împaratoriyê bi pêş ketiye, li gorî xwezaya xwe ji rêûresma desthilatdarî û civaka Ereb cuda bi gewde bûye. Di vê de, rêbazên hişk ên Îslama Sunnî di fetihkirina Îranê de jî bi bandor bûne. Beşê jor ê li Îranê bi sedema tiştên xwe yên ji desthilatdariyê hînbûyî û mîrateya împaratoriyê, hewl dide Îslamê bi lez bike dewlet, beşê jêr jî serwext e ku tevahiya dîrokê çi ji destê desthilatdaran kişandiye, lewma hewl dide Îslamê bi aliyê wê yê dijberê desthilatdariyê û bi şêweyê civaka sivîl pêk bîne. Di vê çarçoveyê de hertim nêzîkatiyên beşên jor û beşên navîn û jêr cuda bûne. Ya ku di dîroka Îslama Îranê de qewimî jî ev e.

6-Li Rojhilata Navîn tinebûna demokrasiyê, rastiya dewlet û desthilatdariyên despotîk, şerên naqedin, mêhtingeriya hêzên hegemon û hevkarên wan li herêmê, xizaniya her diçe zêde dibe, bêkarî û hê ji ber gelek sedemên din li herêmê ji bo derve û hundir koçberiyeke gelekî mezin heye. Her sal li ser rêya koçberiyê ya ber bi Ewrûpa û Emerîkayê ve bi hezaran mirov dimirin. Di vê qonaxê de pirsgirêka koçberiyê bandorê li tevahiya dunyayê dike û bûye yek ji pirsgirêkên bingehîn. Ma ne, di destpêkê de ji bo hêza kar a erzan sîstema kapîtalîst ber li koçberiyê vedikir û ew teşwîq dikir, lê roja me ya îro heman hêz pêşî li koçberiyê digire; hewl dide tedbîran bistîne da ku rêyên koçberiyê asê bike. Bi koçberiyê, xelkên herêmê ji cîwarê xwe ango ji welatê xwe yê dayikniştiman dibin; ji çanda xwe qut dibin û li deverên din ên xerîb û dûr dibin hêza kar a herî erzan; li welatên Rojava yên ku koçber diçine wan jî pêkhatina civakî vediguherînin. Koçberiya pir zêde li navendên Rojava dibe sedem ku dijberiya koçberiyê pêk bê, partiyên faşîst ên rastgir bêhtir bi bandor bibin. Her roja ku derbas dibe baştir tê fêhmkirin ku pirsgirêk ji ber kapîtalîzma global û despotîzma herêmî ye, lewma bi pêşketina demokrasiyê û bi sazîbûna wê ya li herêmê wê pirsgirêk çareser bibin.

7-Endustriyalîzm ji bo metropolên hegemonîk dikare kara herî zêde pêk bîne. Lê di encama vê de wê gund bêne valakirin, erd û zevî wê bibin çolistan. Ango wê pêxîrtengiya civakî û ekonomîk bêhtir kûr bibe. Endustriyalîzm li cografya Rojhilata Navîn û di jiyana wê ya ekonomîk de, teknîkeke îdeolojîk-polîtîk e, belkî jî ji şerên desthilatdarî-dewletê bêhtir encamên xwe yên bi tehlûke hene. Bi qasî qirkirin û kokqelandinê bi tehlûke ye. Di guherîna avhewayê, zuhabûna gol, erdên avgîr û çeman de hêza esas a berpirsiyar e, jixwe zirar û ziyanên wê bi vê lezê dewam bikin wê dunyayeke jiyan lê heye nemîne. Endustriyalîzm berevajî yeqînan, li dijî civak û ekonomiyê amûra bingehîn a êrişê ye. Li dijî pîşesaziya rastî jî hêza hilweşandinê ye. Endustriya ku bi hêrsa kara herî zêde ya kapîtalîzmê radibe, ne ku

welatan xweşhal û dewlemend dike, berevajî vê, ew wan ber bi hilweşîn û xizaniyê ve dibe; ne tenê wan ber bi krîzê ve dibe, ji vê wêdetir wan malwêran dike. Tenê li Efxanistanê endustriya ji bo xaşxaşê tê meşandin û li Iraqê endustriya ji bo petrolê, rastiyê eşkere dikin û nîşan didin ka çawa malik li van waran wêran kirine, xirabmal kirine. Ne tenê welatan xira dike, ew di heman demê de çand û civaka dîrokî jî xira dike. Li Ewrûpayê bi xwe jî endustriyalîzm û kapîtalîzm dibin sedema lêdana naqosên hewarê û tenê bi reforman dihêlin ku ew dewam bikin. Lê li Rojhilata Navîn ji ber pirsigirêkên dîrokî yên di nava civakê de şer û pevçûnên sînornenas bivênevê ne. Li Rojhilata Navîn xurtkirin û kûrkirina kapîtalîzm û endustriyalîzmê, li dijî civakê û hawîrdora wê zêdekirina şer e. Çi kirasî li meseleyê dikin bila lê bikin, modernîteya kapîtalîst a sê suwarên wê yên mehşerê hene û amûrên şerekî stratejîk in, rewşa wê ya berbiçav vî hukmê me piştrast dike.

Dema ku em paradîgmaya oryantalîst parçe bikin, em ê bibînin ku dawiya ‘şerê sar’, li Rojhilata Navîn tê wê maneyê ku ‘şerê germ ’(şerê çekdarî) wê bipeke asta herî jor. Şerê Kendavê yê 1991’ê hema piştî bidawîbûna şerê sar ê cîhanê qewimî û ev lihevrashatin, vê fikirê piştrast dike. Şerê modernîteya kapîtalîst ê ji bo Rojhilata Navîn, serê salên 1800’î bi gavavêtina Napolyon a Misrê dest pê kiriye; di serî de petrol, bi sazkirina acenteyên kapîtalîst û afirandina dewletokên netewe, çavkanî hemû talan kirine û bi endustriyalîzmê ev derxistine asta herî jor. Ji bo herêma me, mirov bi van xetên stûr, bi vî awayî dikare qala modernîteya kapîtalîst bike. Ji vê û pê ve, hûrgilî ne, û gelek çîrokên kurt ên misêwa dubarekirî ne.

6-Hewldanên Jinûvedîzaynkirina Herêmê û Şerê Cîhanê yê Sêyemîn

Di van şertên modernîteya kapîtalîst de ya ku li Rojhilata Navîn diqewime ji krîz û kaosê wêdetir, rewşa şerekî rastî ye. Bêguman şerên roja me ya îro, ne dişibin şêweyên şerên serdema pêşî û navîn, ne jî dişibin şêweyên şerên cîhanê yên yekemîn û duyemîn ên modernîteya kapîtalîst rê li wan vekir. Nexasim bi Şerê Cîhanê yê Yekemîn û Duyemîn re şer girseyî bûne. Piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn jî şer civakî bûne. Bi meşa cinawirê sêling ê modernîteya kapîtalîst re şer qewimîn; dema van şeran bi cihêwaziyên wan ên li hundir û derve bi dawî bûn, modernîteya kapîtalîst dema nû bi şerê li derve û hundir ê di nava civakê de bi awayekî yekpare dimeşîne, divê mirov bi vî awayî meseleyê fêhm bike, naxwe mirov ê nikaribe li cewherê nû yê modernîteya kapîtalîst serwext bibe.

Eşkere ye, em ketine qonaxeke nû û cuda ya dîrokî. Em vê qonaxê jî weke ‘Şerê Cîhanê yê Sêyemîn ’bi nav dikin û vê pêvajoyê bi Şerê Kendavê yê Yekemîn dest pê kiriye. Li gorî awayê meşandin û muddeta wê, ji şerên cîhanê yê yekemîn û duyemîn cuda ye; karakterê wê yê îdeolojîk-çandî li pêş e, tevî ku li deverên cuda yên dunyayê tê meşandin jî lê bi awayekî esasî navenda wê Rojhilata Navîn û Kurdistan e. Hêzên hegemonîk û hêzên sermayeya global ku vî şerî dimeşînin, ji bo bêhtir berjewendiyên xwe yên ekonomîk, ji bo bêhtir serdestiya xwe ya îdeolojîk-siyasî-eskerî pêk bînin çi rejîm, pêkhate û rêxistinên bi wan re hevkariyê nekin û deriyên xwe heta dawiyê li çanda kapîtalîst û sermayeya global venekin, hemûyan hildiweşînin û hewl didin desthilatdarên bi wan re hevkar serdest bikin. Di vê çarçoveyê de li Tevgera Azadiyê ya Kurd û Rêbertiya wê ferz kirin ku ji nasnameya Kurd a serbixwe û xeta azadiyê dest berde. Wexta ku dîtin, Tevgera Azadiyê ya Kurd û Rêbertiya wê serî li ber wan natewîne û xeta azadiyê li gelemperiya Kurdistanê bi bandor dibe, piştî salên 1990’î Gladioya NATO’yê li dijî PKK’ê û Rêbertiya wê şerekî dijwar meşand. Li ser vî bingehî hewl dan dewleta netewe ya Kurd a Proto-Îsraîl weke amûrekî bingehîn ê ewlekariya dewleta Îsraîlê li Başûr pêk bînin. Herweha li dijî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ku nûneriya xeta azadiyê û nasnameya Kurd a serbixwe dike, hêzên hegemonîk bi armanca

tesfiyekirina wî, 9’ê Cotmeha 1998’an dest bi komployeke navneteweyî kirin û di Şerê Cîhanê yê Sêyemîn de ev bû qonaxeke nû.

11’ê Îlona 2001’ê li dijî du bircên li bajarê New Yorkê êriş hat kirin û li gorî xuya bû, êrişa li dijî du bircan bi îhtîmaleke mezin komplo bû. Îca vê êrişê, qonaxa ku em qala wê dikin, bêhtir giran kir. NATO’yê ango sîstema hegemonîk a dunyayê, piştî ku salên 1990’î Sovyet hilweşiya, Îslama radîkal weke dijminê nû ragihand û ya rastî mebesta wê cuda bû; ev weke maskeyeke îdeolojîk bi kar anîbû. Armanca wê ya esasî ew bû ku li Rojhilata Navîn li welatên xwedî çanda misilman hegemonyaya xwe ya kapîtalîst a ku piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn nîvco hiştibû, temam bike. Bi taybetî dixwestin dewletên weke Îran, Iraq, Sûrî, Lîbya û wekî wan ku weke ‘dewletên asî-eşqiya ’bi nav dikirin entegreyî sîstemê bikin, bi giştî jî armanca wan a bingehîn temamkirina hegemonyaya Emerîkayê li dunyayê bû. Bi hilweşîna sîstema Sovyetê re di warê hegemonîk de valatî çêbûbû û wê bi hegemonya Emerîkayê ev valatî bihata tijîkirin. Herweha bi vî awayî rê wê li ber mezinbûna hevrikê nû Çînê bihata girtin. Piştî 11’ê Îlona 2001’ê, Emerîkayê li dijî Efxanistanê bi lez gavek avêt, armanca vê pêngavê ew bû, di warê valatiya hegemonîk a li Asya Navîn de derket holê, nehêle Çîn û Rûsya valatiyê tijî bikin û bibe xwedî înîsiyatîf. Di vê çarçoveyê de El Qaîde û Talîban weke amûrên altax hatine bikaranîn. Li gorî amadekiriyan, pêngava pêşî ya şer serketî pêk hat. Pêngava li dijî Iraqê jî bi serdestiya teknolojîk bi heman lezê gihişt armanca xwe. Armanc hilweşandina rejîma Saddam Huseyn bû. Wan ev armanca xwe pêk anî, lê zor û zehmetiya esas di warê siyasî de derket holê. Piştî ku rejîmeke asî ya weke Iraqê hat hilweşandin, bi temamî xirabiyên ku tevahiya dîroka şaristaniyê ketibûn serhevdu, mîna devê Qutiya Pandorayê vebûbe, yek bi yek rijiyan rûyê erdê.

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li hemberî komploya navneteweyî û bûyerên di çarçoveya Şerê Cîhanê yê Sêyemîn de bersivek xwe hebû. Li gorî vê, Rêber Apo dev ji paradîgmaya dewletparêz berda; bi paradîgmaya civaka demokratîk, ekolojîk û azadîxwaziya jinê, sîstema konfederalîzma demokratîk a xwe disipêre xweseriyên demokratîk li Kurdistan, Rojhilata Navîn û dunyayê bi pêş xist. Çarçoveya vê zêhniyetê ku em weke Teoriya Modernîteya Demokratîk pênase dikin, di atmosfera Bihara Ereb de, 19’ê Tîrmeha 2012’an Şoreşa Azadiya Rojava derxist holê. Ev şoreşa ji bo azadiya jinê û bi pêşengiya wê, ne tenê li Kurdistan û Rojhilata Navîn, li dunyayê jî weke şoreşekê deng veda û li hemberî modernîteya kapîtalîst rêya alternatîf nîşan da.

Zêhniyeta neteweya demokratîk, ya ku tê maneya yekîtiya wekhev a cudahiyan û xwe disipêre xwezaya wekhevîxwaz û azadîxwaz a civakê û awayê wê yê bi gewdebûyî jî sîstema konfederal a demokratîk, her ku bi Şoreşa Rojava re bandora xwe di asta global de zêde kir, hêzên sermayeya global ev pêşketin ji bo xwe tehlûke dîtin. Hêzên hegemon ên modernîteya demokratîk, ji aliyekî ve bi bahaneya têkoşîna li dijî DAIŞ’ê ku berhema wan bi xwe bû, bi navê koalîsyona navneteweyî hewl da bi xasûkî bikeve nava şoreşê û wê ji xeta wê ya xwe disipêre hêza xwe dûr bixe, ji aliyekî din ve jî kir ku dewleta Tirkî bi taybetî Şoreşa Rojava bi giştî êrişî Tevgera Azadiyê ya Kurd bike. Kapîtalîzma global şoreş ji bo xwe tehlûke dît û lewma xwest wê dejenere û tesfiye bike û dewleta Tirkî jî jixwe armanca wê qirkirina Kurdan e; dema ku ev herdu armanc gihiştin hevdu, dewleta Tirkî ya qirker vê armanca kapîtalîzma global û alîkariya wê ji xwe re kir firsendeke mezin; bi vî awayî ji 24’ê Tîrmeha 2015’an ve bi navê ‘Plana Hilweşandin ’ê(Plana Çongşikandinê) dest bi seferberî û êrişeke qirkirinê kir.

Dema ku li dijî Tevgera Azadiyê ya Kurd êrişên bi armanca qirkirinê dewam dikirin, 7’ê Cotmeha 2023’yan qaşo Hemasê êrişî Îsraîlê kir û ev di Şerê Cîhanê yê Sêyemîn de bû qonaxeke din. Ji vê rojê û pê ve, dewleta netewe ya Îsraîlê weke hêzeke hegemonîk ketiye

dewreyê. Vê jî kiriye ku hevsengiya hêzan a li Rojhilata Navîn ji cihê xwe biheje û rewşeke nû derkeve holê. Xeze bi erdê re kirin yek û Hemas bêbandor kirin, li Lubnanê Hizbullah bêhêz û bêtaqet kirin, li Sûrî rejîma Beesê tesfiye kirin, li Yemenê derbên xedar li Hûsiyan dan û tevgera eskerî ya giran a li dijî Îranê di hevsengiyên siyasî de guhertinên giring kirin. Bi vî awayî Îsraîla ku dixwest bi Peymana Brahîmî têkiliyên xwe bi Ereban re nerm bike, bandora xwe ya eskerî û siyasî zêde kir. Hewl didin ji Hindistanê heta bi Deryaspî rêya enerjiyê pêk bînin. Bi van operasyonên xwe astengiyên li pêşiya vê rêyê rakirin û rê ewle kirin. Li ser bingehê tifaqa Îsraîl-Qibris-Yewnanistanê, rewşeke ne li xêra Tirkiyê li Rojhilatê Deryaspî derketiye holê û vê jî pozîsyona stratejîk a dewleta Tirkî qels kiriye, bandora wê ya li herêmê kêm kiriye.

Van bûyeran hemûyan, projeya Ingilistanê ya bi navê Sykes-Picot ji hev de xistiye. Ingilistanê bi polîtîka xwe ya ʻparçe bike-bi rê ve bibe ʾango bi dîzaynkirina Rojhilata Navîn weke dewletên netewe çerxa xwe ya mêhtingeriyê daniye. Di rewşa heyî de sîstema kapîtalîst li şûna Sykes-Picotê hewl dide çerxa nîzameke nû deyne.

Di rewşeke bi vî rengî de hêza esas ango hêza kakil a sîstema hegemonîk dewleta Îsraîlî hewl dide ji vê rewşê sûd wergire û sînorên xwe fireh bike. Lê xuya ye ku ji gelek aliyan ve gelekî zor û zehmetiyê dikişîne, ji krîza tê de ye nikare derkeve.

Rejîma Beesê ya li Sûrî li sergoyê dîrokê veşartin, li şûna wê, HTŞ'a selefî ya bi koka xwe El Qaîdeyî kirin desthilatdar. Li welatên din ên Rojhilata Navîn desthilatdariyên bi pêşengiya "Rêxistina Birayên Misilman" hilweşiyane; Projeya Kembera Kesk a Îslama siyasî herçiqasî li hin cihan bi ser ketibe jî di demeke kurt de li her deverê ketiye pêvajoya krîz û hilweşînê.

Welatên din ên Ereb hebûna xwe bi petrolê dewam dikin û ketine rewşeke wilo, hema bêje, heke rojeke bi tenê petrol tinebe, pir zehmet e ku hebûna xwe bidomînin.

Komara Îslamî ya Îranê bi têkiliyên bi Rûsya û Çînê re hewl dide hebûna xwe bidomîne, lê têra xwe destekê ji wan nabîne û ev jî hebûna wê dixe tehlûkeyê. Ji 7'ê Cotmeha 2023ʾyan heta roja me ya îro li bereyên derveyî welat hemûyan derbên giran xwarine û bi bin ketiye, lewma ketiye rewşeke wilo, neçar maye êdî di nava welêt de şer bike. Serhildanên gelan ên li dijî Komara Îslamî ya Îranê eşkere nîşan didin ku desteka gel a ji bo rejîmê têra xwe kêm bûye, meseleya wê ya rewabûnê çêbûye, bûye dewleteke ku bi darê zorê bi zehmetî li ser piyan dimîne. Bi bandora êrişên kapîtalîzma global û serhildanên gelan, her kes kakûnî û meraq dike, ka rejîm wê êdî çi qasî karibe li ser piyan bimîne.

Dewleta Tirkî tevî hewldanên xwe yên tesfiyekirinê hemûyan, dît ku nikare PKK'ê ji holê rake, lewma bûyerên piştî 7'ê Cotmeha 2023ʾyan ji bo manûnemana xwe bi tehlûke dît û niyet beyan kir ku di meseleya Kurd de deriyê qonaxeke nû vedike. Rêber Abdullah Ocalan jî bersiva vê beyana niyetê da. Di vê çarçoveyê de Rêber Apo li şûna stratejiya têkoşîna çekdarî stratejiya xweparastinê û siyaseta demokratîk a xwe disipêre huqûqeke yekpare; li şûna sosyalîzma neteweya dewletparêz, sosyalîzma civaka demokratîk esas dibîne 27'ê Sibata 2025ʾan Banga Aştî û Civaka Demokratîk ragihand. Bi vê, bang li dewletên Kurdistan dagir kirine û welat kirine mêhtingeh tê kirin da ku li ser bingehê entegrasyona demokratîk xwe nêzî çareseriya meseleya Kurd bikin, lê heta niha di serî de dewleta Tirkî dewletên din ên têkildar bersiveke temam û hewce nedane.

Komara Tirkiyê weke dewleteke netewe ya hişk hatiye avakirin û mana xwe ya bi vî awayî weke şertê bivênevê yê hebûna xwe dibîne û ji ber ku di vê xeta dewleta netewe de israr dike ew ê nikaribe xwe ji krîz û aloziyên mezin rizgar bike. Dewleta Tirkî, di serî de gelê Kurd, yan wê heqên tevahiya cudahiyan nas bike û demokratîk bibe, yan jî wê weke pêkhateyên din ên dewletên netewe di nava kaos û krîzên kûr de biperpite. Heke demokratîk nebe, wê di têkiliyên xwe de yên bi hêzên hegemon re, yan wê hegemonyaya Îsraîlê qebûl

bike û bi sîstema kapîtalîst a global re li hev bike, yan jî wê weke dewletên din ên netewe bibe hedef û divê wê çaxê li bendê be ku li dijî wê operasyonên cuda bêne kirin. Ji ber ku di nava armancên Şerê Cîhanê yê Sêyemîn de çêkirina rêyeke nû ya enerjiyê û di bin hegemonyaya Îsraîlê de ji nû ve dîzaynkirina Rojhilata Navîn heye, ev herdu hedef û armanc li pozîsyona Tirkiyê ya stratejîk gefan dixwin. Jixwe, ji destpêkê ve li derveyî projeya rêya nû ya enerjiyê tê hiştin û di asta herêmê de jî neçar tê hiştin ku li ber hegemonyaya Îsraîlê stûyê xwe xwar bike. Eşkere ye, jinûveavakirin û dîzaynkirina herêmê, wê hê jî guhertinê li ser Tirkiyeya heyî ferz bike.

Eşkere xuya dike, çi laîk û çi jî versiyonên Îslamî, bi destwerdanên ji derve li Rojhilata Navîn encam nadin; ji laîk heta bi Îslamî, rejîmên model ên dewleta netewe hemû can didin, diperpitin, lewma Rojhilata Navîn di dîroka xwe de ketiye rewşa herî kaotîk û aloz.

Li aliyê din, li dijî ezmûna dusedsalî ya hegemonya kapîtalîst li herêmê, gelan û hêzên demokratîk hem li hundir û hem li derve gelekî rexne kirine û li ber xwe dane. Lê binketin aliyê hevpar ê vê berxwedanê ye. Ji Îslamîstên radîkal heta bi nermên wan, ji komînîstan heta bi milletperestan, ji lîberalan heta bi muhafezekaran gelek hêzên din tehlîla wan a dîroka herêmê û analîza wan a rewşa rojane, herweha awayê wan ê pêkanîna sîstemê ji serketinê dûr e. Di rewşa berbiçav a Xezeyê de ji bo gelan têra xwe diyar bû ku di çarçoveya dewleta netewe de gera li çareseriyê çend hilweşîner e. Çawa ku sosyalîzma dewleta netewe salên 1990'î li Moskovê bi dawî bû, utopya Îslamî ya neteweya dewleparêz jî li Xezeyê bi dawî bû. Yanî bi xebatên oryantalîst ên ji şaristaniya Ewrûpayê veguhestî, li gorî berjewendî û xweşiya her beş û her komê hatiye kirin û ev veguhestin, ne bûne sentezeke felsefî, ne jî bûne pêşketineke siyasî ya azad a serketî û ne jî bûne teoriyek.

Lê ya rastî, Rojhilata Navîn di warê çareserkirina pirsgirêkên global de û di warê sentezên şaristaniyên nû de ji Ewrûpayê gelekî zêdetir xwedî daneheveke dewlemend a çandî ye. Herêm bi rola şaristaniya navendî ya dîrokî rabûye, lewma divê kes ne li bendê be ku bi hêsayî bi ser sîstemê ve bibe yan jî bi sîstemê re li hev bê. Qutbûna ji sîstemê jî bi temamî nepêkan e. Naxwe bi qasî ku mirov têkiliya rast a xwecihî û gerdûnî rast deyne, divê li gorî xwezaya civakî jî guncav be.

Li Rojhilata Navîn şoreşa zêhniyetê ya hem ji bin bandora mezhebên lêberalîzmê yên çepgir û rastgir, hem jî ji ya navendê rizgarbûyî û ji oryantalîzmê bihurî, gelekî giring e. Divê em ji bîr nekin ku heta şoreşa zêhniyetê pêk neyê, ti şoreşa civakî ya mayînde pêk nayê.

7-Çareseriya Modernîteya Demokratîk

Çareseriyên modernîteya kapîtalîst li ber îflasê ne. Ji bilî şer, alozî û malwêraniyê tiştekî nadin gelan; li aliyê din, teoriya modernîteya demokratîk a xwedî nirxekî payeberz bi ezmûnên xwe yên civaka dîrokî û bi potansiyeliya xwe ya azadîxwaziyê, asoyeke çareseriyê ya nû, bi kok û mayînde pêşkêş dike.

Modernîteya demokratîk, li beramberî dewleta netewe, modela neteweya demokratîk bi pêş dixe. Karakterê tekperest ê dewleta netewe, bi rastiya pirdeng û pirreng a civaka dîrokî ya Rojhilata Navîn re ne li hev e, pê re bi nakok e, û ev jî ji bo bipêşketina neteweya demokratîk zemîn û rê dide. Zêhniyeta neteweya demokratîk, zêhniyeta milletperest, dînperest, pozîtîvîst û cinsperest a dewleta netewe qebûl nake; modelek e weleyê ku civakê hemûyî tevî cihêrengî û pirrengiyên wê himbêz dike, her kesî di nava xwe de dihewîne. Her cure îdeolojiya tekperest û homojenker red dike, qebûl nake. Li cîhekî mîna Rojhilata Navîn xwedî pirçand û xwedî pirnasname rêyeke din, alternatîfeke din a çareseriyê tineye û çênabe.

Di çareseriya modernîteya demokratîk de eko-ekonomiya ku xwe disipêre komînalîteyê weke alternatîfa endustriyalîzmê tê bipêşxistin. Ev awayê ekonomiyê, li gorî rêûresma ekonomîk a komîn a civakîbûna Rojhilata Navîn guncav e. Bi komînên ku bêne çêkirin, hem çavkaniyên binerdê û sererdê wê bibin ên civakê, hem jî hilberîn wê xwe bisipêre parvekirina komînal. Bi vî awayî, zirar û ziyanên ku endustriyalîzmê di civakê de û di warê ekolojîk de kirine, wê ji holê bêne rakirin.

Çareseriya modernîteya demokratîk xwe disipêre komînalîteya demokratîk. Ji bo kapîtalîzmê ne civak, ferd ʻesas ʾe. Îdeolojiya kapîtalîzmê ango lîberalîzm li ser înkara civakê ye. Encama wê jî ew e ku civak tê tinekirin, komeke bi ferdan bi sînor tê çêkirin. Ma ne, awayê hebûna civaka dîrokî bi awayê komînê ye. Karakterê pêkhatinê yê civakê komîn e, şêwazê wê yê hebûnê ye, şane û hucreya esas e. Di cewherê komînê de wekhevîxwazî û azadîxwazî heye, lê di heman demê de xwedî karakterekî demokratîk e. Kapîtalîzmê demokrasî dejenere kiriye û kiriye ku bibe amûrekî dijberê civakê; yanena komîn bêyî demokrasî nikare li ser xwe bimîne. Bi pîvanên civakî yên ji klanê heta roja me ya îro û bi xisletên civaka dayikê, civaka ku ji nû ve were avakirin, civaka demokratîk e. Sîstema civaka demokratîk xwe disipêre pirrengî û pirdengiyê, cudakariyê li ser bingehê etnîk an jî baweriyan tercîh nake, xwe disipêre xwerêvebirin û xweparastinê; em ji vê sîstema civaka demokratîk re dibêjin komînalîte. Kapîtalîzm li dijî rastiya civaknasiya dîrokî ya Rojhilata Navîn e, komînalîteya demokratîk jî weke perspektîfa realîst a çareseriya dîroka Rojhilata Navîn, pênasekirina wê ya herî zelal û çareseriya azadîxwaz, çareserkera pirsgirêkan e.

Kapîtalîzma global roja me ya îro li cîhanê bi giştî û pir giran li Rojhilata Navîn pêxîrtengî bûye û hildiweşe; li hemberî vê, gavavêtina bi modernîteya demokratîk divê weke bihurîna ji sosyalîzma pêkhatî weke alternatîfeke rast û bivênevê were dîtin. Rahendên sereke yên modernîteya demokratîk (sêlingên wê) hem di bihurîna ji sosyalîzma pêkhatî de hem jî di derketina ji krîzên modernîteya kapîtalîst afirandî de derfetên pratîk ên çareseriyê didin. Ji vî aliyî ve, modernîteya demokratîk ne tenê bername û teoriyek e, rojane bi qasî nan û avê pêdiviyeke praktîk pê heye.

Dem tam jî dema pêkanîna esasên Modernîteya Demokratîk e. Di warê çareseriya pratîk de ji bo pirsgirêka Filistîn-Îsraîlê alternatîfa bi tenê ye. Bi qasî ku xuya dike, li Filistîn, Qibris, Lîbya û herêmê hemûyî li şûna çareseriyên neteweya dewletparêz, bi awayekî cuda be jî modelên çareseriyê yên xwe disipêrin rahendên modernîteya demokratîk wê bikevin dewreyê. Erê, xuya ye ku bûyerên bi vî awayî wê pêk bên. Herçiqasî xwestin Şoreşa Rojava bi komployekê tesfiye bikin jî çareseriya neteweya demokratîk nîşan da ku di çareseriyê de alternatîfeke îdeal e.

Çareserî, di atmosfera kaotîk a Rojhilata Navîn de, li ser bingehê perspektîfa modernîteya demokratîk li dijî modernîteya kapîtalîst, bipêşxistina bernameyeke siyasî û polîtîkaya wê ya aştiyê ye ya ku divê naveroka wê civaka demokratîk be.

Çareseriya Modernîteya Demokratîk li herêma Rojhilata Navîn wê bi awayekî berbiçav weke “Yekîtiya Neteweyên Demokratîk” yan jî weke “Konfederalîzma Demokratîk a Rojhilata Navîn” tezahur bike ango formulasyona wê bi vî awayî ye. Tişta ku rastiya vê projeyê diyar dike, paşxana wê ya dîrokî û bingehê wê yê çandî ye. Dema ku mirov di dîrokê de li îstîqameta herikîna şêweyên sereke yên komîn û dewletê binêre mirov wê bingehekî hevpar ê çandî û dîrokî yê pêkhatî bibîne. Jixwe di dîroka Rojhilata Navîn de pêkhate nêzî hev in, hema bêje, mîna federasyonekê ne, lewma derfeta modelek bi vî awayî çêdibe.

Çareseriya modernîteya demokratîk li ser bingehê tevahiya danehevên çandî yên heta bi dema modernîteya kapîtalîst a roja me ya îro hatine tepisandin esas digire, û divê bi

zêhniyeta neteweparêziyeke nemilletperest, bi dîndartiyeke nedînperest, bi civakîbûneke necinsperest, bi zanistiyeke nepozitivîst were şirovekirin û avakirin.

Divê mirov civaka neteweyî ya herêmê ya Ereb, Tirk, Kurd û Fars ji nexweşiya milletperestiyê dûr bigire, hewl bide ji feqa dewleta netewe rizgar bike, divê mirov neteweyeke mezin a neteweyan ava bike; bi qasî aliyên wê yên xweser divê aliyên wê yên gerdûnî hebin, avakirina neteweyeke wisa erkeke civakî û dîrokî ye.

Divê mirov Îslamê û ummeta wê di çarçoveya modernîteya demokratîk de bi reformeke rastî ji îstîsmara Îslama desthilatdar, fetihkar û xwînrij rizgar bike, ji dewleteke netewe wêdetir weke ummeteke demokratîk, azadîxwaz û wekhevîxwaz nû bike, û ev jî erkeke din a gelekî giring e. Ji bo gelê Ermen, Asûrî û gelên din ên bi koka xwe Qafqasî jî gavavêtin li ser bingehê xebatên demokratîk û beşdarbûna wan e.

Gelê Kurd hêza bingehîn a gelan e, û rola xwe ew e ku Rojhilata Navîn bikişîne nava aştiyê û demokratîk bike. Gelê Kurd di navenda Rojhilata Navîn de cih digire û li dijî êrişên bi armanca qirkirinê karîbûye hebûna xwe biparêze; li ser dewletên netewe yên Kurdistan kirine bin serdestiya xwe demokrasiyê ferz dike; li ser bingehê modernîteya demokratîk Tevgera Azadiyê ya Kurd xwe nû kiriye û vê kiriye ku Tevgera Azadiyê ya Kurd ji bo gelên Rojhilata Navîn bibe hêviya azadiyê. Tevgera Azadiyê ya Kurd wê di dema nû de li ser bingehê sosyalîzma civaka demokratîk veguherîna hewce bike; li ser bingehê modernîteya demokratîk wê civaka demokratîk a Kurd ava bike; ew ê pêşengiya jinûveavabûna Rojhilata Navîn bike.

Projeya çareseriya modernîteya demokratîk projeyeke civaka demokratîk e; pêdaketin û hizirîna jinan li meseleyan, îradeya wan a azad, pêşengiya wan û afirîneriya wan hewce dibîne. Modernîteya demokratîk serdema şoreşa jinan e, û bi pêşengiya jinan e. Civakîbûna mirov, ango azadiya wî cara pêşî bi êrişa zilam a li dijî jin-dayikê derb xwariye. Nakokiya serdest-kole ya di navbera zilam û jinê de nakokiya pêşî û herî kevin a dîroka civakî ye. Di heman demê de têkoşîna pêşî û herî kevin a dîrokê ye. Ji serdema xwedawendan û vir ve di salên dûrûdirêj de, koletiyeke ewqasî kûr heye, hewldan nînin ji bo yên ji jinan hatine stendin werin wergirtin û di van salan de hin hewldan jî ser wan hatiye girtin, hatine veşartin. Ev dîrok, dîroka parçekirina komînê ye ku civak bi wê bûye civak. Pêkan e ku mirov vê dîrokê ji nû ve bi ruhê komînê bigihîne hev, derz û qelşa kûr a di navbera jin û mêran de ji holê rake. Ev jî tê wê maneyê, çanda serdest a mêr, ya ku ji dema kujerê kastîk ê pêşî heta roja me ya îro hatî, wê were lawazkirin, her ku biçe were tinekirin û li şûna wê çanda komînê were payeberzkirin. Ji bo mirov biçe wan serdemên azadî li wan ji dest nehatibû dayîn, divê mirov serwext, bi hêz û bi îddîa be. Ji bo azadiya jinan, divê pîvanên jiyanê yên mêr ên bi jinê re li ser bingehê sosyalîzma civakparêz a demokratîk ji nû ve bêne avakirin. Jin, ji bo nirxên ji destê Xwedawend Înannayê hatine stendin ji nû ve bi dest bixin, divê avakirina komînê bi her awayî hûrûkûr manedar pêk bînin. Ji bo mêr bibe xwedî jiyaneke azad û manedar, divê pîvanên jiyanê yên bi jinan re zanibe, kesayeta xwe ji ser ta pê sosyalîst bike; ji bo vê jî divê nêrîna xwe ya li xwezayê, ruhberan, kedê, axê, dunyayê û welat azad bike. Ev tê maneya avakirineke nû û pêkhatina wê jî bi komînê pêkan e. Li Rojhilata Navîn ku reha sereke ya dîroka gerdûnî ye, koletî û serdestî maka tevahiya pirsgirêkan in, û ev rastî bi destê mirov hatine çêkirin. Tiştek bi destê mirov hatibe çêkirin, mirov dikare wî dîsa bi destê xwe biguherîne; dikare wî hilweşîne û li şûna wî yê nû ava bike. Ji bo mirov bibe ferdê civaka azad divê mirov zanibe paşerojê ava bike, texeyul bike û zanibe çi deyne şûna yê tê guhertin.

Ji bo kesên ku utopyaya wan a mezin a jiyana azad heye, şert e ku weke cengawerên heqîqetê bijîn. Jixwe ev awayê jiyanê li Rojhilata Navîn gelekî hatiye dîtin. Ferdê komînalîst ê demokratîk, li dijî sê suwarên mehşerê yê modernîteya demokratîk divê bi fikir-zikir-çalakiya

modernîteya demokratîk bibe bersiv. Cengawerê heqîqetê yê serdema modernîteya demokratîk ew kes e, vê nasnameyê bi kesayeta xwe ve dicebirîne, bi mîrasa jiyana azad dijî û wê dide jiyîn ango mîrasa jiyana azad pêk tîne û dide kirin.

Beşa Şeşemîn
RASTIYA KURD Û KURDISTANÊ

1-Hebûna Kurd û Dema Wê

Hebûn û serwextî (bîrbirin-têgihiştin) pirsgirêka herî bingehîn a felsefeyê ye. Têgîna hebûnê bi xwe jî yek ji têgînên sereke yên felsefeyê ye ku hê gelekî kakûnî û meraqa wê tê kirin. Têgîna din, ya pê re û ji wê ne dûr, hema bêje pê ve ya weke cêwiyê wê jî zeman e. Herdu ji hev nabin. Çawa ku mirov bêyî hebûnê nikare li zeman bifikire, bêyî zeman jî mirov nikare li hebûnê bifikire. Zeman, bi temamî têkildarî hebûnê ye. Pabendiya di navbera herduyan de herî zêde bi têgîna bûyînê re têkildar e. Hebûn û zeman bi bûyîneke teqez re pêk tên. Zeman di hebûnê de bûyînê ferz dike. Ya rastî, ji bo hebûn hebe, bidome, hewceyî bi bûyînê heye. Wexta ku em qala hebûneke di rewşa bûyînê de bikin hingê zeman derketiye holê. Yanî heke li cîhekî bûyîn hebe, li wir hebûn û zeman heye. Wexta ku bûyîn nebe, ev tê wê maneyê, hem hebûn û hem jî zeman tineye. Bûyîn, rewş û halê hebûnê yê formgirtin û cudabûnê ye. Hebûneke ne di rewşa bûyînê de, hebûnek û zemanekî tineye.

Rewşa cudabûnê û bûyînê, ew serwextî ye ku weke potansiyel heye. Cudabûn, belkî jî gava pêşî ya ber bi serwextbûnê ve payeberzbûn e. Wexta ku hebûn bi demê re pêk hat û cuda bû, hingê gava pêşî ya ber bi serwextbûnê ve avêtiye. Îca çend bûyîn, form û şêwe hebin, ewçend serwextî jî hene. Di çarçoveya gerdûnî de cudabûn serwextbûn e, serwextbûn jî weke kategorîk di cudabûyînê de li gerdûna giştî rewşa serwextbûnan hemûyan e. Rewşa forman a bêserûbinî, di heman demê de rewşa bêserûbinî ya serwextbûn û bîrbirinê ye. Çend formên cuda hebin, ewçend serwextbûnên cuda hene. Li cem Hegel têgîna ruh û can (Geist), beriya formê tê. Ya rastî, serwextbûneke bêform û bêşêwe tineye. Hegel, formê ji xwezaya fizîkî dide destpêkirin û heta bi dewletê dibe. Bîrbirin, bi rêya forman ji rewşa xweber ango bêform, dixwaze xwe bixe rewşeke bîrbir û serwext bibe. Bîrbirina bi awayê serwextî, bi formên fizîkî, biyolojîk û civakî hem xwe nas dike, hem jî ji xwe piştrast dibe ango hebûna xwe bi delîl dike. Serwextbûna li cem mirov ew bîrbirin e ku dest pê dike ha ji xwe dibe, li xwe divarqile. Serwextbûna felsefî rewşa bîrbirin û serwextbûnê ya herî bipêşketî ye; hay ji xwe bûye û weke ruh û can li rewşa xwe ya pêşî vedigere, lê bi awayekî hayjixwebûyî, yanî weke Can û Ruhê Mutleq. Civakên Rojhilat ango civakên Şerqê bêhtir bi baweriyên dînî û tesewifê xwe gihandine vî şêwazê fikirê, lê civakên Rojava bi rêya zanist û felsefeyê xwe gihandinê.

Heke mirov rewşa Kurdan a hebûn, bûyîn û serwextiyê pênase bike, mirov ê bikare hûrûkûr li mesele û babetê serwext bibe; û ev awa wê ber li me rohnî bike. Heta beriya çendekê jî mijara hebûna Kurdan ji bo gelek dewrûberan, mijareke bi guman û cihê nîqaşê bû. Di van dused salên dawiyê de ji bo Kurd hebûna xwe isbat bikin, belkî jî bi qasî ku li ti hebûna civakî nehatiye kirin, li Kurdan zilm û zor hatiye kirin; hatin înkarkirin û tine hatin hesibandin. Ji aliyê çandî û fizîkî ve ketin ber çerx û polîtîkayên qirkirinê. Li ser cihûwarê Kurdan dayiknîştiman Kurdistanê her êriş û manewra hatin kirin; ji aliyê fizîkî ve welatê wan

hat perçeperçekirin, ji aliyê çandî-zêhnî ve hat perçeperçekirin, ew tine hatin hesibandin û ji bo vê jî her cure amûrên zorê û yên îdeolojîk xistin dewreyê. Mirov dikare bibêje, qirkirin û kokqelandin jî di navê de ti çerx û mekanîzmaya talan û zorê ya modernîteya kapîtalîst nema ku pêk neanîn. Di vê çarçoveyê de Kurdbûn, diyardeyeke weke wê tineye, bêhemta û bêemsal e.

Têkoşîna ku di şexsê PKK'ê de darîçav bû jî ji bo hebûna Kurdan bû. Bi awayekî ji awayan, PKK'ê bi têkoşîna xwe hewl da bersiva pirsa Kurd hene yan tinene, zelal bike. Yekî ji aliyan bi awayekî întîharwarî digot, 'heye', aliyê din jî digot, 'tineye'. Ya ji vê jî wêdetir ku cihê şermê ye, şêst salên beriya PKK'ê jî meseleya bingehîn a entelektueliya Kurd, isbatkirina hebûna Kurdan bû. Bêguman rewşeke pir rezîl û pir bi tehlûke ye ku ferdek û civakek hebûna xwe guftûgo bike; ji ber ku ev işaret bi xeteke zirav a di navbera jiyan û mirinê de dike. Di dîrokê de hovîtiyeke bi vî rengî bi serê ti hebûneke civakî de nehatiye. Ti hebûneke civakî bi qasî Kurdan ji xwe fedî nekiriye û xwe înkar nekiriye yan jî kêm hebûnên civakî bi vî awayî piçûk hatine xistin. Ango Kurd ew e; welatê wî yê dayiknîştiman tineye, bênirx û bêqîmet e, hîç pereyê wî tineye, bi piranî ew kes e ku bêkar e, hema bi her heqdesta kêm razî dibe û dixebite, ji bo debarê timî li ber xwe dide di nava keftûleftê de ye, pêdiviyên xwe yên civakî-çandî ji bîr dike, ji bo pêdiviyên xwe yên maddî û debarê bêyî ku bêhna xwe bide, hewl dide û dixebite, li warê genim û nan ew kesê birçî ye.

Di vê çarçoveyê de ji bo meseleya Kurd û rêyên çareseriyê bêne guftûgokirin, beriya her tiştî divê mirov di warê hebûna Kurdan de bibe xwedî agahî û li babetê serwext bibe. Serwextbûn, mirov derbarê hebûna têkildar de digihîne heqîqetê. Xwegihandina heqîqetê jî armancek e, hewce dike ku mirov di ber wê de gelekî têbikoşe. Heqîqet ne rastî ye, ew rewşa rastiyê ya serwextbûyî ye. Rastiya bêheqîqet, rastiya razayî ye. Rastiya razayî jî pirsgirêka xwe tineye. Heqîqet rewşa hişyarkirî ya rastiya razayî ye. Rewşa Kurdan a razayî û di xewê de ewqasî kûr û nêzî mirinê bû, lewma şer û têkoşîna di ber heqîqetê de jî pir zor û tevlîhev e. Ji ber vê, piştî têkoşîn û cengeke gelekî zor û tevlîhev, rastiya Kurd û heqîqetên derbarê pirsgirêka wê de dest pê kir, derketin holê û wan rê li ber hêviyeke azadiyê vekir.

Kurdîtî di dîrokê de rastiyeke timî sabit nîne, weke gelek diyardeyên civakî timî veguheriye û hebûna xwe pêk aniye. Roja me ya îro, veguherîna wê bêhtir bi lez û berfireh pêk tê. Diyardeya Kurd, aniha di pêvajoyekê de ye pir berfireh tê ravekirin.

Em hewl didin, dîrokeke Kurd û Kurdistanê ya herî nêzî rastiyê binivîsin. Çima rastiya Kurd a diyardeyî? Hewce dike ku em di çarçoveya sosyolojiya dîrokî de bi vê dakevin. Ji ber ku sosyolojî û dîrok nebin, em nikarin ber xwe bibînin û nikarin qala tiştekî bi navê çareseriyê bikin. Sosyolojî, zanistên beşerî hemûyan pênase dike. Ev jî dîrok nebe nayê fêhmkirin. Lewma hewceyî bi perspektîfa sosyolojiya dîrokî heye. Ji ber ku sosyolojiya dîrokî nebe, mirov nikare li diyardeyên Kurd û Kurdistanê serwext bibe. Heke mirov serwext bibe jî wê hem di şer û aştiyê de, hem di çalakiyê de têra xwe rênîşaner nebe. Wexta ku roja îro, em li meseleyê temaşe dikin, diyarde li me ferz dikin ku em hûrûkûr û berfireh bi têgînan dakevin.

Divê em bi wê rastiya ku di dîrokê de jê re dibêjin, Kurd an jî Kurdîtî, çawa dakevin? Diyar e ku mirov di çarçoveya têgihiştina dîrokê ya serdestên roja me ya îro de hewl bide li rastiya Kurd bifikire û têbigihîje, çênabe; wekî ku mirov pir zorê bidiyê û berbiavêje. Bi vî awayî, hin ceribandin û ezmûnên bi zorê yên dîrokê hatine kirin, lê pir zêde têkiliya wan bi bûyerên diyardeyî re nîne. Bi qasî mîtolojî û destanan jî rastiyan nîşan nadin. Rêbaza dîroka çandî, bêhtir nêzî rastiya diyardeyî ye. Dîroka çandî, pêvajoyên şaristanî û modernîteyê di nava xwe de dihewîne. Lê şaristanî û modernîte, dîroka gerdûnî ya çandî nagire nava xwe. Netewe û dewlet, her du jî kategoriyê bingehîn ên dema modernîte û şaristaniyê ne, tenê beşekî bi sînor ji dîroka çandî digire nava xwe. Ji wan nayê ku gerdûnîbûna çandî di nava xwe de

bihewîne. Kurd di dîroka netewe û şaristaniyan de têra xwe cih nagirin û ev nayê wê maneyê ku Kurd dîroka wan tineye. Wexta ku mirov di çarçoveya dîroka çandî de bi meseleyê dakeve, mirov ê bibîne, Kurd bi hezarê salan di dîrokê de xwedî rola sereke ne. Karakter û xisleta vê çandê ye ku formên qebîle û eşîrê tê de pir bi hêz in; ev çand di ekonomiya cotkarî û sewalkariyê de bi rola şoregerî rabûye. Çawa ku çanda Hilala Bibereket di dîroka mirovatiyê de bi rolekê rabûye di hemtayê vê rolê de Kurd jî di dîroka çanda gelan de bi heman rolê rabûne. Bi qasî ku hatiye tesbîtkirin, ji çandekê bi qasî duwanzdeh hezar salan re pêşengî kiriye ya ku navenda wê Hilala Bibereket e. Di dîroka mirovatiyê de me nedîtiye ku ti çandê bi qasî vê çandê dirêj ajotiye, gelek cihêrengî di bin banê xwe de hewandine, mîna rojê rohnî kiriye, germ kiriye û xwedî kiriye. Heke hebe jî rola wan bi sînor bûye, serpilkî û seresere bûne. Ji ontolojiyê heta bi antropolojiyê, ontolojiyek û antropolojiyeke Kurd hewce dike. Her yek ji wan disiplînek e, û mirov dikare gelekî ji wan hîn bibe.

Ontolojiya Kurd, yanî têgîna hebûnnasiya Kurd realîst e. Kurd weke hebûn kevnar in, rastiyeke pir qedîm e. Belkî jî destpêka derketina holê ya mirovê modern e. Girê Mirazan ê Xerabreşkê nîşaneyên vê diyar dike. Lewma mirov dikare weke ontolojiyeke Kurd lê bifikire. Ji ber ku bûye hebûn, heye. Hebûn; pêkhatina ziman, çand, qebîle û eşîrê ye. Ev pêkhate hemû hebûn in. Mebest ji ontolojiyê, zanista hebûnê ye; hebûnnasiye.

Heidegger bi kitêba xwe ya "Hebûn û Zeman"[10] ya ku 1927'an ji bo Elmanan nivîsî, di şertên wê demê de ji bo rewşa hebûn û tinebûnê ya civaka Elman tê de li rêyekê, li çareyekê digeriya. Ji ber ku Elman di wê demê de, di rewşeke hebûn û tinebûnê de bûn. Hegel rêya diçe dewleta netewe vedike, dixwaze Elman bi dewleta netewe hebin, bibin hebûn. Heidegger jî felsefeya dewleta netewe bi pêş dixe.

Ji bo Kurdan jî hewceyî bi diyardeyeke ontolojîk a bi vî rengî heye. Ya rastî, li cem Kurdan hebûn bi hêz e; bi awayekî ji awayan dîroka wan jî dîroka hebûnê ye. Ne dîroka azadiyê ye, dîrokeke hebûnê ye. Û belkî jî di destpêka mirovatiyê de veşartî ne. Ziman, civaka dayikê ku ev her du di zikhev de ne, û paşê civaka qebîleyê diafirînin; jixwe civaka qebîleyê hê jî pir bi hêz e.

Mirov dikare koka Kurdên îro weke şaneya kok a komên Hind-Ewrûpayê pênase bike. Lêkolînên li ser ziman û çanda Kurdî vê rastiyê eşkere dikin. Hem cografyaya ku Kurd li serê dimînin, hem jî dîroka wan, vê rastiyê bêhtir piştrast dikin. Vedîtinên li girê Mirazan û navendbûna dîn û qebîleyên herî kevin ên heta bi duwanzdeh hezar sal berê, mînakeke giring e ku hêza çanda heyî isbat dike.

Disiplîna antropolojiyê bi cureyê mirov dadikeve. Ji mirov bi xwe dest pê dike, ji klan-qebîleyê heta bi mirovê modern pêşketin mijara antropolojiyê ye. Li cografya Kurdan, têra xwe lêkolînên antropolojîk hatine kirin. Heke mirov di çarçoveya antropolojiyê de bi meseleya Kurd dakeve, dikare xwe bigihîne gelek encamên kêrhatî. Pirsên weke mirov çawa bû mirov, çawa bi ziman bû, çawa xwe gihand têgihiştina mîtolojîk-dînî dikevin çarçoveya antropolojiyê. Nexasim çêbûna qebîleyê û hebûna wê, yek ji babetên bingehîn ên antropolojiyê ye. Hûrdikole ka qebîle çawa çêbûye û bi pêş ketiye. Ev li cem proto-Kurdan pir xurt pêk hatine. Qebûlkirina hebûna Kurdên îro, têkildarî dîroka PKK'ê ye. Naxwe dîroka beriya wê hatiye înkarkirin.

Heke wisa be, divê disîplîna ontolojiyê, pêkhatina qebîle û eşîrê –ku pêkhatina kastîk jî dikeve nava wê– dest pê bike, ji vir lêbikole. Ev der ew cih e ku lê qebîle û pêkhatina kastîk

[10] Têbîniya wergêr: Behsa Martin Heidegger û berhema wî ya sereke Sein und Zeit dike. Berhem 1926'an hatibû nivîsîn û salekê paşê jî derçûbû. Ev hewldana Heidegger e ku zanîna hebûnê yanî ontolojiyê li ser hîmekî nû deyne. Bo nimûne binihêre li çapa 1979'an: Martin Heidegger, Sein und Zeit (Tübingen: Max Niemeyer, 1979),

çêbûne. Yanî Girê Mirazan a Xirabreşkê ye. Tevî vê, çanda manewî, mîtolojî, dîn, dewletbûn, bajarbûn û ev hemû li vir çêbûne û divê ontolojî li vir li van babetan bikole. Kurtûkurmancî, nêzîkatiyeke qenc a antropolojîk û ontolojîk vî cih û mekanî heq dikin. Ya ku nahêle mirov bibînin, nêzîkatiya sosyalîzma pêkhatî û pozitivîzma bûrjûwayê ya milletperest in. Di herduyan de jî dîrok tineye. Di yekê de dîroka bûrjûwayê heye, di ya din de jî dîroka proleteryayê ango çîna karker a utopîk. Herdu jî hem rastiyê pênase nakin, hem jî li dijî rastiyê ne. Li civakên mîna Kurdan ên li derveyî civakên Ewrûpayê kor in. Ya rastî, em jî di bin bandora van nêzîkatiyên korker de mane. Çi di PKK'ê de, çi jî di sosyalîzma pêkhatî de encam jihevdernexistin an jî îflas e. Jihevdernexistin, xetimîn, ezber û dogmatîzm pêk hatin. Ji ber ku cihê lê sekiniye û li meseleyê dinêre şaş e; di rêbaz û disiplînê de şaşî hene.

Em dikarin, derbarê dîroka Kurdan de hin fikirên xwe weke pêşnûme û reşnivîsekê wisa diyar bikin: Mirovên pêşî weke şaxekî ji Efrîkayê vediketin, di ser Rîfa Rojhilatê Efrîka re digihîjin Filistînê. Lê li wir derfet û îmkanên manê kêm in, ji ber ku bi ser çolê ve ye û hejmareke hindik a mirovan dikare bihewîne. Lê bi awayekî domdar mirov ji Efrîkayê koç dikin; çawa ku niha jî di ser Deryaspî re koçberiyek heye. Ref bi ref, kom bi kom mirov koç dikin. Kêm ji wan li wir dimînin, yên din, derbasî qûntar û serê Zagros-Torosan dibin. Ev war dibe cihê pêşî yê koçberan.

Cureyê mirov li Efrîkayê hê bi ziman jî nebûye. Ji meymûnan hinekî cihê bûne, komên dişibin mirovan çêbûne, em ji van koman re hê nikarin bibêjin klan in, û bi zimanê işaretan li hev dikin. Ya giring, em fêhm dikin ku hê xwe li wir negihandine şaristanîbûnê. Jixwe, ji bo vê yekê şert û mercên maddî çênebûne. Ji zimanê işaretan nebihurîne. Di fikirê de sînorên mîmetîk derbas nekirine û hê xwe negihandine zimanê sembolîk. Li ser vî bingehî, cureyê homo sapiens derketiye holê. Beriya bi mîlyonan salan têne vê derê. Li cihên çandî yên ku ew diçine wan, cureyên din ên ji bilî homo sapiens jî hene; li Ewrûpayê, li Asyayê û li Efrîkayê cureyên din hene. Lê nekarîne zimanê sembolîk bi pêş bixin. Bi qasî ku em fêhm dikin, xwe negihandine wê astê ku mirov ji wan re bibêje, bûne mirov. Lê piştî ku ji nava şert û mercên Efrîkayê derdikevin, li Mezopotamyayê têra xwe kom dibin. Deng û zimanê işaretan dikare veguhere peyvekê. Di vê de şert û merc, û avhewa xwedî roleke giring û diyarker in.

Mezopotamya ew cih e ku têgîna bihuştê lê çêbûye û xeyala wê hatiye kirin. Dojeh jî ew çol in ku ew mirov tê re derbas bûne. Lewma vê derê weke bihuştê dibînin. Weke encam, em dikarin bibêjin, ev mirov beriya bi 50-60 hezar sal berê –ku ev hejmar li gorî çavkanî û jêderan diguhere– hatine vê deverê. Ji bo cureyekî din ê mirov çêbe hewceyî bi şert û mercên cuda yên xwexwedîkirinê û çandê heye. Bi vî awayî, derfet û îmkanên cudabûna ji heywan û meymûnan çêdibe. Ya rastî, cureyê bi navê Neandertal ji cureyê mirov ê berê li vir cuda dibe. Ev bêhtir ji aliyê fikirê û civakî ve ye. Ev cure, cara pêşî li vir çêdibe û ji vir li dunyayê hemûyî belav dibe. Homo sapiens 50-60 hezar sal berê digihîje vê deverê. Pêşiyên mirovên modern ên îro, ne ji Efrîkayê, ji vir, ji ser erdên Kurdan derketine.

Li gorî pêşbîniyan, ziman cara pêşî li vir, li dora jin-dayikê çêbûye. Çanda jin-dayikê, li vê herêmê bi xurtî pêk hatiye. Ev deng, li vir, li dora Xwedawend Maʾyê vediguhere ziman. Peyvên ku di vê pêvajoyê de çêdibin, di zimanê me yê îro de hê jî hene. Yanî maka van peyvan ev dever in. Em dibînin, bermahiyên wan hê hene. "Ma" tê maneya "Dayikê". Li qûntara Qerejdaxê çandeke giya û nebatan heye, hema bêje, mîna çanda mîh û bizinan. Ev çand, heye ku qederê sîh hezar sal berê têra xwe bi pêş ketiye. Li Başûrê Kurdistanê, li şikefta Şanîdarê bermahiyên sîh hezar sal berê hatine dîtin yên weke zad û hiriyê. Ev çand û afirîneriya klanê ye ku li dora Xwedawend Maʾyê pêkhatiye.

Li Başûrê Mezopotamyayê koma ziman a Samî heye. Ev warekî nêzî Efrîkayê ye. Ev ziman, li vir, pir paşê çêdibe. Li Bakur jî li qûntara çiyayên Sibîryayê, li Ewrasyayê koma

zimanê Ûral-Altayê çêdibe. Diyar e ku koma zimanê Aryen an jî bi navekî din koma ziman a Hind-Ewrûpî li vê cografyayê çêbûye. Peyvên ku em hê jî bi kar tînin, işaret bi vê çandê dikin. Devera ku herî lê zêde ye, kevana Zagros-Torosê, geliyên Dîcle-Firat-Zapê ye. Keşfên arkeolojîk hemû, nîşan didin ku li vir çandeke bi vî awayî çêbûye. Bermahiyên wê heta roja me ya îro hatine. Giringiya G. Childe ew e, wexta ku qala şoreşa Neolîtîk dike, işaret bi vê deverê dike. Me jî arîstokrasî li vê zêde kir. Yanî ewqasî ev der giring e. Encamên 'şoreşa ' arîstokratîk li dunyayê belav bûne; hem jî li ser şopa çanda Neolîtîk belav bûye. Tevahiya belgeyên arkeolojîk û etîmolojîk vê nîşan didin. Bi Sumeran re belgeyên nivîskî jî dikevin destên me. Wekî din, beriya niha bi sîh hezar salî peykerên jinan hene; xuya ye ku li vir çanda jin-dayikê gelekî sîstematîk e, û pir bi pêş ketiye. Li dora çand û ziman komek, û li dora komê jî pêvajoya çandîbûnekê dest pê dike. Bermahiyên arkeolojîk nîşan didin ku cara pêşî li vir çandek bi pêş ketiye û li gorî xwezaya xwe, ev li dora "dayikê" çêbûye. Ne mumkin e ku mêr afirîneriya wisa nîşan bide.

Koma ziman a Aryen, ne ji koma ziman a Samî ye, ne jî ji koma zimanê Ûral-Altay e. Reh û rîşên ziman hema bêje isbat bûne. Ev rast e. Şert û mercên vê deverê ji bo çanda heywan û nebatan têra xwe guncav e. Avhewa guncav e, baran bi rêkûpêk dibare. Di demsala baranbarînê de tu dikarî biçînî, dema ku havîn were tu dikarî biçinî. Têra xwe cureyên heywên hene, ji aliyê daristanan, dexl û zad ve têra xwe dewlemend e. Xulase, bi gelek cureyên heywan û nebatan, mekanekî mîna bihuştê ye. Weke encam mirov dikare bibêje, li cîhekî wisa, wê di warê civakî de ber li pêşketinê vebe, her tişt ê bibe çirrik, ev ê veguhere şoreşa neolîtîkê û ev ê çandeke nû biafirîne. Ziman jî wê di nava vê çanda neolîtîkê ya sîstembûyî de pir bi pêş bikeve. Ji vê jî giringtir, wê li vir ji klanê gav ber bi civaka qebîleyê ve were avêtin. Û dîroka Kurdan hê jî xwe weke dîroka qebîleyan pênase dike. Zimanê işaretan ji Efrîkayê ve heye, lê ahenga deng û peyvan, li vir derdikeve holê. Çi bi pêşketina klanê, çi jî bi pêşketina ziman êdî "qebîle" weke pêkhatineke cuda derketiye holê. Herçî temenê klanê ye, belkî du mîlyon sal be, lê qebîle formekî nû ye. Ev formê nû, hewceyî ziman e. Ziman nebe qebîle çênabe. Heke li cihekî qebîle hebe, li wir ziman jî heye, çêbûye. Ev herdu gelekî giring in. Heke ev herdu têgîn nebin, dîroka nivîskî jî çênabe. Ev jî tê wê maneyê, dîroka nivîskî bêsedem li Mezopotamyaya Jêr çênebûye. Çanda qebîleyê bi pêş dikeve, pê re bi sedan mirov têne cem hev.

Pêvajoya ku jê re neolîtîk tê gotin jî bi vê çandê re têkildar e. Mirov bi riza dilê xwe dêmanî û akincî nabin, kewarên dexl û zad çênakin, sikir û bendan ava nakin. Neolîtîkek bi vî awayî tineye. Kengî, hêmanên ku em ji wan re kastîk dibêjin, derdikevin holê û civaka dayikê ji hev belav dikin, ev hemû çêdibin. Civaka koçer hem azad e, hem jî di xweşhaliyê de ye. Wisa bi awayekî xweber nakeve nava vê cimcime û teqanê. Ji bo ev çand bi pêş bikeve, hewceyî bi kolekirineke kûr heye. Kê ev kir? Revdeyên nêçîrê yên mêran yên ku me behsa wan kir. Ev revde ji Efrîkayê ve hene. Jixwe li Efrîkayê herî zêde revdeyên nêçîrê yê mêran çêdibin. Li Mezopotamyayê bêhtir xwe bi rêxistin dikin. Sîleha ji obsîdyenê çêdikin. Civaka dayikê ji hev belawela dikin û li Mezopotamyaya Jêr şaristaniya Sumeran a xwe spartî koledariyê ava dikin.

Şaristaniya Sumeran gavavêtina dîroka nivîskî tê qebûlkirin. Kast ji rewşa xwe ya bi maske derdikeve û xwe bi sazî dike. Kujerê kastîk hem li Efrîkayê, hem jî li Mezopotamyayê heye. Lê weke hejmar kêm e. Bi Sumeran re hejmara wan zêde dibe. Hêmanên ku em ji wan re proto-arîstokrasî yan jî qral-xweda dibêjin, ji çînîbûna kastîk peyde dibin. Di encamê de, bajarên ku em dizanin û nas dikin, pêk tên. Ûrûk sîteya pêşî ye. Damezirînera vî bajar-dewletê pêşî, Xwedawend Înanna ye. Di heman demê de bajarê Erîdû (bajarê xwedayê mêr) heye. Ew jî bajarê Enkî ye. Paşê ev herdu şer dikin. Hatiye nivîsandin, bûye destan. Înanna

diçe qesra Erîdû û nirxên Enkî dizîne paşde disitîne û tîne Ûrûkê; ev jî nîşan dide ku hê wê demê jî jin bi hêz e. Înanna, wexta ku qala nirxan dike, wan weke "ME ʾpênase dike. "ME" tê maneya vedîtin û afirîneriyên dayik-xwedawendê. Nûnerê koma kastîk Enkî ev nirx dizîne. Xuya ye ku jin-dayikan li vir çandek afirandiye. Cografya ji bo vê guncav e, demeke dirêj li wir mane, kanên civaka dayikê xwe pê xwedî bike hene û bermahiyên vê çandê van hemûyan isbat dikin.

Baş e, Sumerî kî ne? Hinek îddîa dikin ku ji Asya Navîn hatine. Mirov hinekî berketî be, wê bi hêsayî bibîne, ev mirov û çand ji Mezopotamyaya Jor derbasî Mezopotamyaya Jêr bûne. Jixwe di navberê de herêmeke navîn heye bi navê Hessûna. Heke hatina wan ji Asya Navîn bûya, divê delîl û nîşanek hebûya. Di vî warî de ti delîl û nîşan tinene. Lê li muqabilî vê, li Girê Mirazan gelek delîl û belge hene. Ev tê wê maneyê, her tişt li vir, li Mezopotamyayê çêbûye. Li Nîlê, li Îndusê bermahiyên bi vî awayî tinene. Dîroka Sumeran herî zêde 3000-4000 sal beriya niha ye. Lê dîroka Girê Mirazan a Xirabreşkê bi qasî ku niha tê zanîn, duwanzdeh hezar sal bi paşde diçe. Ev tê wê maneyê, li vir çêbûye. Seba vê, Girê Mirazan bêhtir giring dibe.

Komên kastîk, vedîtinên civaka dayikê bi xwe re dibin Mezopotamyaya Jêr. Dîsa qral-xweda, jin, zarok û koleyan bi xwe re dibin. Wan bi darê zorê dixebitînin û şaristaniya Sumeran pêk tînin. Lê çanda dayikê hê jî bi hêz e, Înnana vê nîşan dide. Wexta ku em tên serdema Babîlan ango tên salên 2000'î B.Z., civaka dayikê bi temamî hêza xwe nemaye. Li şûna wê bi serdestiya mêr dewlet hatiye avakirin, ji jinê re ti tişt nehatiye hiştin. Ev serdem werçerxeke bi vî awayî ye. Mirov dikare vê bi hêsayî di destana Babîlê de bixwîne û di Tewratê de bibîne ku di wan deman de hatiye nivîsandin. Baş e, têkiliya vê bi dîroka Kurd û Kurdistanê re çi ye? Eşkere ye, ev çand ji Mezopotamyaya Jor çûye. Komên pêşî yên ziman û qebîleyên pêşî li vir bi gewde bûne. Ev qebîle, li derdora 5000 sal B.Z. gihiştine Hindistanê. Beriya mîladê bi 4000 salan gihiştine Çînê, Ewrûpayê û Misirê. Beriya mîladê bi 6000 salan jî gihiştine Mezopotamyaya Jêr. Belkî jî cihê herî nêz bû, neolîtîka Bakurê Mezopotamyayê herî zû gihiştiye wê derê. Li wir bajardewletê pêşî yan jî şaristanî ava kirine. Vegotineke bi vî awayî heta tu bibêjî, besît e, û mirov dikare jê fêhm bike. Baş e, çi têkiliya vê bi Kurdan re heye? Ji ber ku li vir Kurd hene, deverên li jora Dîcle-Firatê cihûwarên Kurdan in.

2-Rastiya Kurd û Kurdistanê di Navenda Dîrokê de

Ûr-Ûrûk tê maneya girik. Çanda li ser wan avakirî nîşan didin. Mînaka herî balkêş Girê Mirazan e. Zimanê ku qebîleyan bi kar aniye jî bi vî awayî ye. Yên li serê lûtkeyên çiyan, mînak Kurdên Yaresanî, Hewramî û Dimilkî (Kirdkî) peyvên hevpar bi kar tînin. Reh û rîşên gotinên Hûrrî û Mîtaniyan jî yek in. Xwedayên wan jî hene. Mirov bi hêsayî dikare têkiliya wan a bi xwedayan re bibîne. Navên xwedayên wan bi xwe jî heta bi Hindistanê çûne.

Wexta ku em wisa bibêjin, dibe ku hinek me sûcdar bikin û bibêjin, hûn navend-Kurd têgînan rave dikin û têkiliyên wan diyar dikin. Lê ev hemû rastî ne. Me jî berê bi vê nizanîbû. Lê, lêgerîn û lêkolînên me, em gihandin vî zemînî. Em ji vê re dibêjin, "**Dîroka Proto-Kurdan"**. Ji dîroka nivîskî û pê ve, di têkiliyên wan de yên bi civaka şareza ya Sumer re, em prototîpên Kurdan timûtim dibînin. Sumeran xwe disipartin du çavkaniyên sereke, yek ji wan xelkê li herêmên çiyayî yên Bakur bû û ji wan re digotin, "**Kûrtî"**, yê din jî xelkên qebîleyî yê li Rojhilatê wan bûn û ji wan re jî digotin, "**Amorît"**. Gotina "Kûrtî" hê jî ji bo heman xelkî xwedî heman maneyê ye. Gotina "Kûrtî" tê maneya 'koma çiyayî' yan jî 'xelkê çiyê'. Roja me ya îro jî wexta ku qala Kurdan tê kirin, 'çiyayîbûn ʾweke xisleteke wan a bingehîn tê bîra mirovan. Ya rastî, cudahiya di navbera Kûrtiyên dema Sumeran û Kurdên roja me ya îro de belkî tenê bi qasî cudatiya di navbera herfa 'û' û 'u' de ye. Kurd xwedî çanda hezarê salan a qebîleyê ne, û

îro jî Kurdên qebîleyê xwedî giranî ne. Tevî vê, Kurdên bajarî, deştî, yên di warê çînî de cuda bûne, yên bi dewletê re bûne hevkar û yên bûne dijberê dewletê jî têra xwe hene. Lê qurmê sereke yê Kurdbûnê, yanî Kurdbûna xwedî reh û rîşên kûr, ew Kurdbûn e; bi giranî xwedî xisletên qebîleya ji rêûresmê ye. Kurdbûna kok û mak, Kurdbûna qebîleyê ye. Kurdên bajarî, yên çîna serdest û bi dewletê re, bi giranî û weke rêûresm ji Kurdbûnê qut bûne û bi asîmîlasyonê razî bûne.

Li vir, xusûseke giring a balê dikişîne ew e; li dijî çanda şaristaniyê ya Sumeran Kûrtiyan timî li ber xwe daye. Mirov vê xusûsê bi taybetî di vegotinên mîtolojîk ê Xwedawenda Çiyê Nînhûrsagê de dikare bibîne. Dîsa, Destana Gilgamêş bi awayekî cewherî têkoşîna azadî û parastina hebûna Kûrtiyan li dijî şaristaniya Sumeran pênase dike. Di destanê de hevkarê bajarî yê pêşî Enkîdo, belkî jî pêşiyê tevahiya Kûrtiyên çînî û bajarî yên hevkarê desthilatdariyê be. Hûmbaba yê di destanê de, Kurtiyekî çiyayî ye. Enkîdo bi Hûmbaba re bêbextiyê dike û ji bo kuştina wî hema bêje, li ber Gilgamêş digere. Kûrtiyê hevkar ê roja me ya îro tîne bîra mirov.

Nakokî û têkiliyên di navbera çanda qebîleyê ya bêhtir komînal û wekhevîxwaz û çanda hiyerarşîk a dibe çînî de, di pêkhatina Hûrriyan de rolek xwe ya giring heye. **Hûrrî** jî weke Kûrtiyan ji heman reh û rîşê ne. Bi Sumerî peyvên 'Kûr' û 'Ûr 'têne maneya 'Gir' û 'Çiyê'. Ev navê wan koman in ku li gir û çiyayên sîstema Toros-Zagrosê bi cih bûne; herdu gotin ji yek kokê ne, û heman koman pênase dikin.

Ji salên 2000'î B.Z. ve, em dibînin ku Hûrriyan li ser rêya şaristanîbûnê gavên giring avêtine û em tesbît dikin ku bi Xanedaniya Gûdea salên 2150-2050 B.Z. li ser bajarên Sumeran serdestiya xwe çêkirine. Ji salên 1600'î B.Z. ve, em dibînin, li Anatolya Navîn bi navê Hîtîtan û li Mozopotamyaya Jor bi navê Mîtaniyan, du împaretoriyên xizim û cîran ava dikin. Çanda Hîtît û Mîtaniyan di dîrokê de mînakeke herî bi hêz û herî giring a şaristanîbûna Hûrriyan e ku ew jî di bin bandora çanda Sumeran de bû. Herdu hêz, li dijî hêzên Asûr û Babîlan ku herdu bi kok Semîtîk bûn û li ser çanda Sumer a wê demê ava bûbûn, xwe dikin yek û di salên 1596'an B.Z. de bajarê Babîlê dagir dikin. Di salên 1500-1200'î B.Z. de, weke hêzên şaristaniyê yên herî bi bandor ên Rojhilata Navîn, li ser şaristaniya Misirê jî bi bandor bûne. Nasnameya Nefertîtî ya bi navûdeng nîşan dide ku bandora qala wê tê kirin çiqasî bi hêz e. Salên 1200'î B.Z., li hemberî hêza Asûran a mezin dibe, Hûrî weke hêza şaristaniyê ji hev belav dibin, careke din li çanda qebîleyê vedigerin û xuya ye ku demeke dirêj bi vî awayî dewam kirine. Di salên 1200-850'î B.Z. de, konfederasyoneke rêxistiniya wê sist a yekîneyên qebîleyan bi navê Konfederasyona Naîriyan pêk anîne. Di wan deman de, em dibînin ku berî û piştî hêzên navendî yên weke împaretoriyan, timûtim hin konfederasyonên rêxistiniya wan sist hatine avakirin.

Di du hezar salên şaristaniya Sumeran de, têkiliyên proto-Kurdan bi şaristaniyê re gelekî çêbûne. Têkiliyên dualî mohra xwe li bûyeran hemûyan xistine. Aliyê yekê, bi hêmanên dewlet, çîn û bajêr ên zordest û mêhtinkar ên çanda şaristaniyê re tim pev çûye û şerê wan kiriye. Hinek caran Babîl fetih kirine, navendên zordestî û mêhtinkariyê yên weke Nînovê hilweşandine û heta di asta dagirkeriyê de dijwar êriş kirine, lê dema ku hêza wan têrê nekiriye, xwe vekişandina serên çiyan ên nayên fetihkirin û bi vî awayî hebûna xwe parastine; bi awayekî hesas li jiyana xwe ya azad û serbixwe xwedî derketine û jê negeriyane. Ji qûntara başûrê Zagrosan heta bi Dersimê çandek heye ku bi zar û zaravayên mîna hev dipeyivin û ev çand hemû pir ji nêz ve bi van bûyeran re têkildar in. Şopên vê çandê îro jî xuya ne, û hê jî pir bi bandor in. Beşekî ku jê re tê gotin, Kurdê Çiyê, li ser vê xetê bi qasî pênc hezar salan heye û ji qebîleyên bi koka Hûrrî pêk tên. Koka hin peyvên Hûrî û gelek peyvên Dimilkî (Kirdkî) wekhev in, û ev jî vê rastiyê têra xwe rave dikin.

Aliyê diduyan jî têkiliyên xwe yên bi çanda şaristaniyê re erênî dîtine, qebûl kirine û kirine milkê xwe. Bandoreke bi vî awayî ya şaristaniyê li ser çanda Kurd, rê li zêhniyet û saziyên dewletdar, çînî û bajarî vekiriye. Çawa ku me di gelek mînakan de jî dîtiye, pîvanek li vir ketiye dewreyê, ew jî ev e: "Heke tu pê nikarî, bişibiyê û wisa têk bibe". Li vir jî ev lê ye. Di mînakên Gûtî, Mîtanî, Hîtît, Ûrartû, Med, Pers û Sasaniyan de jî em dibînin ku li hemberî hêzên êrişî wan dikin ji bo li ser piyan bimînin û wan têk bibin, dişibin wan û bi xwe şaristaniyê ava dikin.

Proto-Kurdan, berî Îslamê di qonaxa şaristaniyê ya du hezar salan de, bajarên xwe ava kirine, çînên wan ên serdest çêbûne û dewletên xwe damezrandine. Ev çand bêhtir li qûntarên çiyan û deştan çêbûye, û xisletek wê heye, ew jî têkelbûna wê ye. Arîstokrasiya rêveber bi çand û zimanê şaristaniyê re ya ku xwestine bişibinê, rabûne û rûniştine, beşên çîna jêr jî bi çand û zimanê xwe ve mane. Dukarakteriya vê çandê ku di bin bandora giran a cografya Kurdistanê de çêbûye, bi guhertineke pir kêm heta roja me ya îro hatiye. Çand weke çanda çiyê û deştê, dîsa weke çanda deştê û bajêr di warê çînî de ji hev cihê bûye û ev xisletên bingehîn ên ji hev cudabûnê ne. Tebeqeya jor bi hêzên dagirker, fetihkar û xerîb re pir xweş li hev kiriye. Wan çanda xelk-qebîleyên xwe, bêkêr û di dereceya diduyan de dîtiye, wan ew paşguh kiriye. Tenê di nava têkiliyên xwe yên navxweyî de pir kêm bi kar anîne, di şaristaniyên bi xwe avakirî de yan jî di şaristaniyên li navê cîhgirtî de ji bo çand û zimanê wan serdest bibe hewl nedane yan jî pir kêm hewl dane. Ji Gûtiyan heta bi Eyûbiyan ev her bi vî awayî bû. Ev zumreya serdest a dewletdar û bajarî, belkî bi qasî ku li cem ti civakê nehatiye dîtin, li hemberî çanda Kurd a ji rêûresmê bi roleke neyênî rabûye. Ji ber berjewendiyên malbatî û çînî di nava ziman û çandên xerîb de heliyane û bêguman, di vê rewşa neyînî de ev diyarker bûye. Çanda malbat û qebîleyê bi giranî naguhere; tebeqeya jêr û Kurtiyên Çiyê hebûna xwe ya hezarê salan bi vê çandê, bi xwevekişandina qalikê xwe, xwe ji asîmîlasyonê rizgar kirine û heta roja me ya îro hatine. Lê di navbera van herdu beşên çandî de bi qasî çiyayan ji hev dûrketin çêbûye û vê jî kiriye ku bi du awayan ji hev bêne cihêkirin; weke Kurdên rastî û Kurdên qelp bêne binavkirin. Di dema modernîteya kapîtalîst de bûrjûwaziyeke Kurd a milletgir a bi hêz çênebûye û sedema vê, ev rastiya dîrokî ye.

Cemaeta Xiristiyan û ummeta Îslamî civakên nû ne, li ser bingehê têgihiştina baweriyeke hevpar pêk hatine; mirovên arode yên qebîleyan û ji qebîleyan qutbûyî, koleyên bêkar û eskerên fîrarkirî xwe li wan girtine. Civakên ku em qala wan dikin, ji qebîleyê bihurîne, li ser bingehê çînîbûnê, civakên nû û baweriyên wê yên nû ne. Lê di şert û mercên civaka nû de jî qebîle pir kêm diguhere û hebûna xwe gelekî bi hêz didomîne. Li vir, civaka qebîleyê ya pêxîrtengî bûye, li ser bingehê tevneke nû ya civakî û îdeolojîk vediguhere; çareseriya di nava xwe de ango di nava qebîleyê de nedîtiye. Ew hewl dide li derve li cem çanda dewlet, çîn û bajêr ya ku li ser bingehê înkara demokrasiya qebîleyê bi gewde bûye, çareseriyê bibîne.

Hejmar û hecmê qebîleyan mezin dibe, lewma dikevin krîzê û pêxîrtengî dibin. Di demên krîzan de du têgihiştin derdikevin holê: Ya yekê, bingehê jêr ê qebîleyên xizan perçe dibin û di azadiya xwe de israr dikin, xanedanê serdest ê hiyerarşiya qebîleyê jî ji bingehê jêr ê xizan ê qebîleyê qut dibe, bi gavavêtinên îdeolojîk re yên ku em giştî ji wan re dibêjin, dînê şaristaniyê re xwe weke civaka nû ya dewletê bi rêxistin dikin. Li vir, çanda qebîleyê ya berê li hemberî çanda şaristaniyê bi bin ketiye. Bi vê veguherînê re di zikhev de tişta ku bi pêş dikeve, dewletbûn, çînîbûn û bajarbûn e. Çareseriya bingehîn a şaristaniyê ji krîza çanda qebîleyê re dîtî, ev e. Fikira ku di dîrokê de gelekî hatiye guftûgokirin û Marksîst jî gelekî xwedî lê derketine ew e, ev veguherîn gaveke mezin a ber bi pêş ve ye. Yanî wan, şaristanîbûn her tim weke şêweyê jiyanê yê pêşketî û payeberzî hesibandiye. Marks û Engels

bi perspektîva materyalîzma dîrokî ev veguherîn weke mecbûriyetekê qebûl kirine û ew di analîza xwe de weke gaveke pir mezin a ber bi pêş ve hatiye avêtin, destnîşan kirine.

Naxwe, nabe ku mirov vê veguherînê di krîza civaka qebîleyê de weke qonaxeke mecbûrî bibîne. Tişta ku diqewime, tercîha çînî ya hêmanên hiyerarşîk e. Ji ber ku di ber vê veguherînê de wekhevî, azadî û demokrasiya qebîleyê tê bipaşvexistin, mirov dikare bi awirekî guherbar, vê gavavêtinê weke gaveke pir mezin a paşketinê û ji bo mirovatiyê jî weke gaveke mezin a serberjêrçûnê bibîne. Dîrok hertim bi awirên îdeolojîk ên zumreyên serdest hatiye şîfrekirin, lewma ji vê veguherînê re pêşveber û heta pêşketina şoreşgerî tê gotin. Lê ya rastî, ew e ku ti mecbûrbûna wê tineye, berevajî vê, ev gaveke paşketinê ye, mirov piçûk dixîne û gaveke dij-şoreşê ye. Rûyekî din ê dîrokê heye û qala wê nayê kirin. Çandeke demokratîk, azadîxwaz û wekhevîxwaz di têgihiştin û pêkhatina qebîleyê de heye û ev çand di pêşketin û pêşdeçûnê de israr dike û li dijî xiyaneta elîtên xwe yên xanedanperest ên hiyerarşîk têdikoşe. Ha ev hêza bingehîn e, nûnera pêşketin û pêşdebirinê ye. Vê çandê bi awayekî sîstematîk û zanistî qala vê dîrokê nekiriye û dibe ku ev kêmasiyek be. Lê rastiyeke bi vî awayî nayê wê maneyê ku dîrokeke wisa tineye, neqewimiye; berevajî vê ev nîşan dide ku dîrokeke wisa nehatiye nivîsandin, hatibe nivîsandin jî hatiye tepisandin û bangeşeya wê bi hêz nehatiye kirin. Şaristaniya ku yekdestdarên mêhtinkariya îdeolojîk ew çêkirine, ji krîzê re nebûye çareserî; her tim xwe bi desthilatdarîbûn, çînîbûn û bajarîbûnê li ser pişta civakê weke ûra kanserê mezin kiriye û xwe weke jêdera herî mezin a krîzan heta roja me ya îro aniye. Heke mirovatî wê bijî, divê çanda demokratîk, azadîxwaz û wekhevîxwaz a serdemên qebîleyan a li dijî civaka krîzê ya dîrokî ya tevahiya şaristaniyê xwe bi sazî û zêhn kirî, ji nû ve pêk bîne û bi vê, wê bi ser bikeve.

Çanda qebîleyê li Botan û Zagrosê pir kêm guherî be jî hê heye. Ango heta roja me ya îro hatiye. Xwestine dagir bikin, lê yên xwestine dagir bikin ew bi xwe li vir heliyane. Zimanekî din li vir serdest nebûye. Ev jî tê wê maneyê, Kurdîtî çandeke bi kok e, bi reh û rîş e. Têgîna çanda Kurd û Kurdistanê xweserî serdema navîn in. Çawa ku me li jor jî diyar kiribû, Sumerî ji wan re dibêjin, Hûrrî û Ûrî. Tê maneya çiyayiyan. Têgîna Hûrrî ya serdema Sumeran e. Babîl û Asûran ev awayê têgînkirinê dewlemend kirine. Peyva ʻNaîrîʼ bi zimanê Asûrî ye, maneya nehir e ango çem û rûbar e. Peyva Mada jî peyveke Asûrî ye. Li Başûrê Ûrmiyê bi Madan re şer kirine. Binavkirineke Asûr a Sargon heye. Asûran weke hêzeke serdest têgîn çêkirine. Sumeran jî têgîn çêkirine. Divê mirov Aqadan jî li wan zêde bike. Hê jî têgînên ji Babîlan mayî hene. Lê zimanê wan ê ku wan bi xwe afirandî, zimanê Aryen e, komeke ziman a safî ye. Çavkaniyên zimanê Sumer têne lêkolan û hê jî tê gotin, “hê jî tiştek bi dest neketiye”. Lê çavkaniya herî nêzî rastiyê ev der e. Binavkirin û têgîn jî vê nîşan didin. Ji vê re dîroka proto-Kurd tê gotin. Navekî wisa lê kirine ku ev navlêkirin şaş nîne. Ev dîrok tê digihîje heta kû derê? Ev tê heta bi serdema Med û Persan. Xuya ye, çandeke pir bi hêz e. Mirov çi aliyê beşê Bakurê Amedê û çi jî li aliyê beşê Zagrosê binêre, mirov ê gelek bermahiyan bibîne. Ev bermahî hemû jî heta bi 10.000 sal B.Z. ve diçin. Ev delîl û belge gelekî bi hêz in. Heke di vê çarçoveyê de hûrûkûr lêkolîn bêne kirin wê teqez rastiyeke wisa ya dîroka proto-Kurd piştrast bibe.

Têkiliya Med û Persan jixwe di dîrokê de heye. Zimanê axivîne, em îro jî dikarin fêhm bikin. Bi zimanê Aryenî diaxivin. Şerê wan ê bi Asûran re pir eşkere ye. Dîsa bibinketina Asûran giring e. Mîtolojiya Dehak têkildarî vê ye. Têkiliyên Med û Persan di dîrokê de cihê xwe girtine. Herodot bi awayekî balkêş qala vê yekê dike.

Çanda Grek bi destê Skender gav diavêje vir û vê çandê ji hev belav dike. Bi vê re, em navlêkirineke nû dibînin. Di kitêba Ksenofon a bi navê **Vegera Dehhezaran** de navê “Kardûkan” tê hildan. Koka peyva “Kurd” ya îro ye. Ji welatê wan re dibêjin, “Kardiyan”.

Kurdiyan û Kardûkan navê cihûwarê wan ango navê welatê Kurdan e. Çanda Grek vê têgînê lê dike. Jixwe Vegera Dehhezaran têkildarî Kurdistanê ye. Gotina "Xelkê Naîrî" di çavkaniyên Asûran de heye. Heredot jî nivîsî ye. Ji van hemûyan jî wêdetir, Kurd li vir mane, jiyane. Ma ne, hinek li vir bûne ku bi wan re şer kirine. Lewma gotine, hinekan "ji zinaran kevir diavêtin me, me bi wan re şer kir." Kî bûn ew kesên ku kevir diavêtin û şer dikirin? Destana Gilgamêş çavkaniyeke ciddî ye. Dibêje, "Em hatin warê çiyayî, em li Hûmbaba rast hatin, me ew kuşt." Çîrok, pir eşkere, vê derê pênase dike. Ev jî çavkaniyeke ciddî ya dîrokî ye. Destana Gilgamêş, vegotinên Asûran, vegotinên Yewnanan, paşê vegotinên wan ên di dîroka wan bi xwe de, baweriya wan bi xwe ya bi navê Zerdeştiyê û fikirên wan bi xwe hêdî hêdî têne nivîsandin. Jixwe serdema Med û Persan bi temamî nivîskî dibe.

Bi vî awayî, her ku diçe dîrok bêhtir biserûber dibe û dîsa, her ku diçe, ev dîrok bi têgîna Kurd tê hildan. Çîroka têkiliyên Med û Persan dirêj e. Dîroknas timî dibêjin; di rêza pêşî de Pers, di rêza diduyan de Med tên. Hêzên bingehîn ên eskerî Med in. Malbatên esas ên mezin, malbatên xwedî şecere yên esilzade bi kok Med in.

Ya giring ew e, divê mirov komînalîteyê baş bi hîm û esas bike. Komînbûna herî balkêş, B.Z. salên 500'î di Serdema Mîhwerê de ye. Pênc şax û milên mezin ên vê komînbûnê hene, di navenda wê de çanda sîstema Toros-Zagrosan heye. Gelo bi vê, em dikarin xwe bigihînin îdeolojiyeke komînal? Erê, ev çêbûye, bi pêş ketiye. Kengî? B.Z. di salên 500'î de Zerdeşt wekî pêxemberekî manedar dibe. Ya rastî, ev çandeke dîrokî ye. Mîna di Îslamê de Zerdeşt jî îdeolojiya xwe vediguherîne nîv-dîn û nîv-felsefeyê. Ev îdeolojî li qesrên Persan dibe dînekî fermî. Ev dîn, xwedî xisleta komînê ye. Ji vê ye, Mag li dijî keyayê Persan darbeyê dikin. Jixwe dîroka Medan, bi awayekî cewherî dîroka komînê ye. Jê re dibêjin, "Konfederasyona eşîran" û ev pênasekirin rast e. Formê eşîrê di nava xwe de komîn e. Mirov dikare bibêje, Konfederasyona Medan, federasyoneke komînalîteyan e. Vê rewşê bi sedsalan dewam kiriye. Herî dawî di salên 580 B.Z. de Persan ew bi bin xistine. Bi Persan re serdema keyatiyê ango dewletbûnê dest pê kiriye. Li hemberî Medan teqez bi ser ketine û ev jî bi saya vê ye. Konfederasyona Naîriyan li dijî Asûran li ber xwe dide.

Li salên 500'î B.Z., em dibînin ku ew veguherîne qebîleyên qelstir û lawaztir. Xisleta wan a federasyonbûnê nemaye. Naîrî, Sûbarûyên li Zê û Med jî êdî bi vî awayî ne. Med tevahiya sêsed salan li dijî Asûran li ber xwe didin. Beriya wan jî Hûrrî hene; li herêmên Çewlîk, Bedlîs û Amedê bûne xwedî çandeke berfireh. Bermahiyên vê çandê roja me ya îro jî hê pir bi hêz heye.

3- Kurd Di Serdema Mîhwerê de

Divê mirov bêhtir hûrûkûr bi Serdema Mîhwerê ya salên 500'î B.Z. dakeve. Li vir, pêşketineke îdeolojîk heye. Êdî ji klan-qebîleyan derbasî komînên bingeh îdeolojîk dibin. Li şûna pabendiya li ser bingehê klanê, îdeolojî cih digire. Yanî ji qebîle-eşîrên mîhwer komîn, derbasî komînên bingeh îdeolojî dibin. Ev pêvajo bi pêşengiya Magan bi sedsalan didome. Keyayê Persan rahibên Magan ji xwe re dike mertal û bi vî awayî Zerdeştîtiyê dike îdeolojiya fermî, li beramberî vê, berxwedana komînên Magan jî dewam dike. Di vê demê de gelek "Ocax" hene. Ev xusûs hemû hêjayî lêkolînê ne. Rewşa ku em qala wê dikin, weke heyî li cem Grekan jî xwe nîşan dide. Di dîroka Heredot de mirov şopên vê rastiyê têra xwe dibîne. Ji têgîn û baweriyên li Mezopotamyayê gelekî bi bandor bûne. Eşkere ye, hinekî jî guhertine. Yên ku ev guhertin kirine jî **Heft Zanyar** û **Sokrates** in. Zanyar para bêhtir bi xwezayê re eleqedar dibin, Sokrates jî bi civakê re yanî bi xwezaya duyemîn re. Herdu aliyan jî bi giranî kategorî û têgînên ji Medyayê bi kar anîne.

Trajedyaya “Medea” yekser bi Medan re têkildar e. Koka wê ev der e. Apollo, xwedayekî Anatolyayê ye. Heta têgîn bi xwe jî ji Hîtîtan girtine. Zeûs, ji gotina “dêw” ya ku em nas dikin, tê. Ew jî ji Kurdiya dema Zerdeşt a “daeva”, ji “dîv” tê ku bi vê gotinê işaret bi hebûnên tariyê yên xirab dikirin. Jixwe yek ji xisleta zimanên Arî ew e, pîtên “D” û “Z” cîhguher in. Ma ne, em hê jî dibînin, navê Zeûs weke “Deûs” tê nivîsandin. Zeûs serê panteoneke xwedayan e. Divê mirov van trajedyayan û sîstemê, weke versiyoneke sêyemîn fêhm bike.

Tişta nû ya Sokrat kirî ew e, ew vê îdeolojiyê weke felsefe kûr dike. Bala xwe bidinê, ji serî heta binî rêbazeke li ser bingehê ‘pirsîn û bersivdanê’ pêk tîne. Ev, cewherê ‘rêbaza Sokratîk’ e ku em wê nas dikin. Ev, di heman demê de şikestinek e. Lê çavkaniya wê îdeolojiya komînê ye. Platon jî vê li ser rêveberiya arîstokratîk tetbîq dike. Yên ku Sokrates kuştin jî ji arîstokrasiya Atînayê ne. Ev ew kes bûn, xwedî li demokrasiyê derdiketin, lê pêkhateyek bûn, jiyana wan bi xwe arîstokratîk bû. Sedema kuştina wî jî wisa rave kiribûn: “Tu ciwanên me jehrî dikî.” Aspasia şêwirmenda jin a Sokrates bû, bi awayekî ji awayan nûnertiya civaka dayik dikir. Sokrates bi temamî girêdayî vê jinê bû û mirov dikare vê jinê weke ʻjina zanyar ʾbibîne. Bi wê re gelekî guftûgo dike û ev yek xwe di felsefeya wî de jî nîşan dide. Serdema kahînan rewşa komîn a civaka dayikê pênase dike û Aspasia jî zanyara wê ye. Kahîn jinên zanyar in. Kuştina Sokrates ji bo vî beşî jî derbeke xedar e. Li cem Sokrates, mirov bi hêsayî dikare veguherîneke hêja ya nasnameyî di dîn û felsefeya komînalîteyê de bibîne.

Platon jî îdeolojiya komînê ji bo bipêşxistina modeleke dewletê ya arîstokratîk bi kar tîne. Sokrates dewletparêz nîne. Platon jî ji kastê veguherîna ber bi dewleta arîstokratîk ve formule dike; bingehê vê yê felsefî û îdeolojîk bi pêş dixe. Cewherê şoreşa Platon ev e. Ji Sokrates, Platon û Arîsto gelek ekolên felsefî zêde bûne. Demokrîtosê ku Marks îlhama xwe jê girtiye jî nûneriya yek ji wan ekolan dike. Demokrîtos felsefeya bindestan çêdike. Ji ekola Sokrates tê ango weke kok xwe disipêre wê.

Şaxê diduyan milê Hindê ye. Di navenda milê Hindê de Bûdha heye. Bûdîzm, îdeolojiyeke tîpîk a komînê ye. Pir balkêş e, û hêja ye ku mirov pê dakeve. Tiştên ku arîstokrasiya Aryen li Hindistanê kirine, bi awayekî balkêş nîşan dide. Weke tevgereke komînal heta tu bibêjî xwedî pîvan e. Bûdîzm, bi lez xwe digihîne Çînê û di demeke kin de dibe baweriya fermî ya xanedanên Çînê. Li vir, arîstokrasî, bi awayekî ku wê bikin versiyoneke îdeolojiya dewletparêz, wê vediguherînin. Li cem hin qebîle û ezbetên Tirkan, li welatên Asya û Başûrê Asyayê têra xwe belav dibe. Çawa ku Muawiye Îslam, Platon jî felsefeya Sokratîk xist xizmeta arîstokrasiyê, li Hindistanê jî qralê Aşûkayê, Bûdîzmê ji bo xizmeta arîstokrasiyê pêşkêş dike. Li Çînê jî Xanedaniya Tang bi roleke heman rengî rabûye. Çima? Ji ber ku ev awa pêkhateyên îdeolojîk, ji sosyalîteya xwe disipêre xizimtiyê bihurîne. Mînak, heke Hz. Mihemed bi îdeolojiya ku ji xizimtiyê bihurî ranebûna, wê pir zehmet bûya ku wan qebîleyan bîne cem hev. Ji bo Ereban bîne cem hev, neçar e ku ji îdeolojiya xwe disipêre xizimtiyê bibihure. Îslam pabendeke îdeolojîk e ku qebîleyan hemûyan tîne cem hev. Bûdîzm jî li Çîn û Hindistanê bi vê rolê radibe.

Destpêka vê pêvajoyê salên 500’î B.Z. ye, di vê serdemê de li Medyayê Zerdeştîtî bi pêş dikeve. Di pêkhatina hebûna Kurd de rêûresma Zerdeşt xwedî roleke giring e. Ev rêûresm, di navbera dînên Brahîmî yê yekxwedayî û dînên totemîk de xelekeke derbasbûnê ya dîrokî ye. Di çanda qebîleyan de pêkhateyên totemîk di têgihiştina dînî de serdest in; cara pêşî Zerdeştîtiyê ev pêkhateyên totemîk ji tabûtiyê derxistin û ew li ser bingehekî têgînî-exlaqî veguherandin, lewma Zerdeştîtî şoreşa pêşî û mezin a exlaqî û dînî ye. Dişibe gavavêtina Îslamê ya xwe sipart qebîleyên Ereb, lê Zerdeştîtî beriya wê ye. Li cem qebîleyên Medan ên proto-Kurd, hîmên exlaq û baweriyê bi armanca yekîtiyeke bêhtir li asta jor hatine danîn. Ji bo civak ji pêxîrtengî û krîzê derkeve, qebîle çareseriyeke ku aliyê wê yê demokratîk xurt bi

pêş dixe. Ev sîstema baweriyê ku di salên 1000'î B.Z. de hebûna xwe nîşan dide, bi Zerdeşt sîstemeke bi bandor a civakê bi pêş dixe. Di şoreşa Zerdeşt de ya giring ew e, cara pêşî ji yekîneyên xanedan û qebîleyan ên teng dibihure; di navbera tevahiya qebîleyên Medan de nasnameyeke hevpar a di asta jor de çêdike. Rahibên ji wan re 'Magî' (mirovên zanyar) tê gotin, hêzên pir bibandor ên civaka nû ne. Zerdeştîtî enerjiyeke pir mezin a civakî derdixe holê. Ew qebîleyên ku hatina wan a cem hev pir zor û zehmet bû, Zerdeştîtiyê karîbûye wan li ser bingehê baweriyeke hevpar a dînî-exlaqî bîne cem hev û ev şoreşeke mezin e ya ku dîrok têra xwe pê daneketiye. Ji Îslamiyet û Xiristiyantiyê ne kêm bi bandor bûye. Tew di pêkhatina rêûresma qebîleyên Ibrî de bi rol û maka bingehîn rabûye. Tişta ku derfet daye pêkhatina Konfederasyona Medan jî ev cewher e. Xanedaniya Axamenîş a Pers bi dekûdolaban, Konfederasyona Medan a bêhtir xwedî naverokeke demokratîk bû, bi dest dixe. Di encama vê de, Persan di dîrokê de împaretoriya xwe ya herî mezin ava kir û ev jî têkiliya xwe ji nêz ve bi rêûresma civakî ya Zerdeştîtiyê re heye. Rêûresm ji rê derxistine û naveroka wê ya demokratîk pûç kirine; weke encam, rêûresma şaristaniya navendî ya Îranê derketiye holê.

Rêûresma împaretoriya Aryen, di dîrokê de ew rêûresm e, çanda qebîleyê ya xwedî naveroka demokratîk herî baş di nava çerxên xwe yên rêveberiyê de pir bi hosteyî bi kar aniye. Pesnê xwe dide ka çawa naveroka demokratîk di nava sîstema xwe ya şaristaniyê de helandiye û monarkên herî bi hêz ên dîrokê afirandine. Li dijî demokrasiya Atînayê ya li Rojava, xwe weke rêûresma despotîzmeke Rojhilat zexm kiriye û heta roja me ya îro karîbûye xwe domdar bike. Bîrbiriya felsefî ya demokrasiya Atînayê rê lê vekirî, di pêkhatina şaristaniya Rojava de weke maka bingehîn bi rola xwe rabûye; rêûresma Zerdeştî ya despotîzma li qesrên Persan naveroka wê pûçkirî, ne tenê li hemberî artêşên Skender bi bin ket, nekarî danehevên çanda civakên Rojhilat jî ji berhewabûnê rizgar bike. Çawa ku despotîzma Osmanî nekarî bermahiyên daneheva çandî ya Îslamî li hemberî şaristaniya Rojava ya kapîtalîst biparêze. Ev rêûresma demokratîk a dîrokî ku hema bêje di nava Kurdên Êzîdî de li ber hişkbûnê ye, mijareke hêjayî lêkolanê ye. Dema ku mirov ji nêz ve çavdêriya Kurdên Êzîdî û Elewî bike, mirov ê pir bi hêsayî xisletên wekhevî, azadî û demokratîk ên çanda Zerdeştiyê bibîne. Tevî ku gelekî hatine tepisandin jî aliyên wan ên bi xwezayê re bûne yek, wêrekî û rastgoyiya wan hêja ye, û ev xisletên wan bala mirov dikişînin.

Pers Zerdeştîtiyê pêşkêşî xizmeta arîstokrasiyê dikin. Lê rêûresmeke bi hêz a meleyan jî dewam dike. Manî, vê hinekî bi pêş dixe. Manî Kurdek e. Tişta ku xwedî lê derdikeve jî îdeolojiya komînê ye. Bandora Manîtiyê heta bi Îslamê jî weke îdeolojiya klan-qebîleyê dewam dike. Lê Manîtî jî dikeve bin bandora arîstokrasiyê û nikare xwe ji vê rizgar bike. Arîstokrat dikevin nava vê baweriyê, wê ji hev perçe dikin û gincirê wê jî weke terîqet û mezheb belav dikin. Çawa ku baweriyên Êzîdî, Elewî-Qizilbaş ên ji Zerdeştiyê mane xwe pênase dikin. Hemin bi deformasyonekê heta roja me ya îro tên.

Ermenî weke kok ji bakurê Yewnanistana îro tên. Ji bakurê Yewnanistanê milekî Doran ber bi Rojhilat ve tê peravên Egeyê û wexta diçin Îyonyayê, Ermenî jî tên Mezopotamyayê. Dibe ku şaristaniya Ûrartûyê ji wan bi bandor bûbe. Ji ber ku Ermenî di pîşeya hesinkariyê û hostetiya avakirinê de bûne pispor. Ermeniyan li vê herêmê gelek keleh ava kirine. Hostatiya di warê madenan de hê jî di destê Ermenan de ye. Li vir, ya giring ew e, ev çandeke arîstokratîk e. Jixwe Ermen, milekî dij-şoreşa arîstokratîk in. Ji koma ziman a Helen, Hind-Ewrûpî ne. Tebeqeyeke arîstokratîk in. Frîgî, Lîdyayî û Dor jî komên şer ên arîstokratîk in. Mîna komên kastîk ên berê, ev kom jî hem hukim li Anatolyayê hem jî li Kurdistanê dikin. Ev komên şerker ên arîstokratîk in.

Piştî ku Hîtîtî hilweşiyan, ji salên 1000'î B.Z. ve, ev komên arîstokratîk dor li Anatolyayê digirin. Pers, herêmên Ermenî lê ne, dikin eyalet. Pers jî gotina, "Armenya 'bi kar tînin. Lê bi

tevahî, li dorbera wan, qebîleyên Kurd hene. Kurd ji komên qebîleyan pêk tên û bi ti awayî nabin bajarî. Li deştan, bi madenkarî, bi zenaet û bi bazirganiyê bajarîbûn bi pêş dikeve. Lê Kurd ji civaka qebîleyan nagerin.

Divê têkiliyên Kurd û Ermenan xweş bin. Ji ber ku li Ûrartûyê rêveberî di destê Ermenan de ye; çiya, qebîle, heywanxwedîkirin û şivantî di destê Kurdan de ye. Heta dema dawî jî ev rewş bi vî awayî dewam dike. Çanda arîstokratîk bipaşketina Ermeniyan bi lez dike, lê qebîlegiriya Kurdan dihêle ku Kurd hê jî li vê erdnîgariyê bijîn û bimînin. Ev tesbîteke giring e. Wexta ku ev rastiyên dîrokî li ber çav bêne girtin, wê were fêhmkirin ku dîroka Ermenan di heman demê de dîrokeke Kurdan e, û divê bi vî awayî mirov pê dakeve. Ji roja ku Ermen li Anatolya û Kurdistanê cara pêşî bi cih bûne û heta roja me ya îro, di pêvajoyan hemûyan de Kurd her tim li cem wan bûn. Çi bi parvekirin û bi hevparbûnê, çi jî bi pevçûn û bi tengezariyê, her tim di nava têkiliyê de bûn. Ji lewra hîç zehmet nîne ku mirov di dîroka Ermenan de şopên dîroka Kurdan bibîne. Hevparbûna Ermen û Kurdan, di çandê de, di ziman û hêmanên gelêrî de, di destanan de, di şêweyê kincliberxwekirinê de û di rabûn û rûniştina rojane de bi hêsayî tê dîtin. Wexta ku rastî ev be, mirov rabe, dîroka Ermenan û dîroka Kurdan ji hev cuda bike, wê ev bibe vegotineke kêm a dîrokê.

4-Di Dîroka Ereb de Dîroka Kurd a Sergirtî

Îslam di nava qebîleyên Ereban de derket holê û ev qebîle bi îdeolojiyeke komînê dan naskirin. Hz. Mihemed di rêûresma pêxembertiyê de komînkarê dawî û yê herî mezin e. Mirov dikare jê re "sosyalîstê prîmîtîv" bibêje. Em têgîna "prîmîtîv" bi maneya "paşvemayî" bi kar naynin, em bi maneya "yên ji pêşiyê" bi kar tînin. Li Rojhilata Navîn hê jî pir bi hêz e. Ji ber ku derbeke kujer li îdeolojiya qebîleyê ya xwe disipart xizimtiyê xist. Tevgereke bi heybet a îdeolojîk çêkir. Seba ku îdeolojiyeke komînal a bi hêz bû, karîbû qraltiyên heyî hemûyan bi erdê re bike yek. Çanda qebîleyê ya ji rêûresmê ya Îslamiyetê û bandora wê ya li ser sîstema şaristaniyê di asta şoreşê de giring e. Belkî jî ji bo krîza sedsalan a di çanda qebîleyê de bersiva herî bi bandor a şoreşgerî ye. Beriya Îslamê, li Nîvgirava Erebistanê, qebîleyên Ereban bi sedsalan û heta bi hezar salan di nava xwe de bêdawî şer kirine û pevçûne. Di çanda qebîleyê de dejenerasyoneke mezin heye. Jin piçûk hatiye xistin, zarokên keçik bêqîmet têne dîtin û hema bêje, bi saxî wan dixin binê axê. Ev çand, weke çareserî xwedî wê taqetê nîne ku ji civaka klasîk re bibe bersiv. Bi kurtî, ne bi federasyonên qebîleyan ên ji rêûresmê, ne jî bi desthilatdarên koledar ên ji rêûresmê, ber li krîzê nayê girtin. Pêşniyazên îdeolojîk, pratîk û polîtîk ên Hz. Mihemed di vê rewşê de hema bêje, dibin çare û derman.

Îslam, hêz û enerjiya di qebîleyan de bi Îslamê re dike yek û rê li ber pêşketineke bi heybet vedike. Ew dikare xwe bigihîne her deverê. Îslamê di destpêka serdema navîn de ango di salên 600'î P.Z. de dest pê kir û heta bi salên 1600'î P.Z. karîbû bibe îdeolojiyeke hegemonîk. Xisleta bingehîn a vê şoreşa Mihemedî ew e, li ser civaka qebîleyê bêyî ku ber bi civakeke nû ve biberide, bêyî ku bikeve bin fermana du împaretoriyan ango Bîzans û Sasanî yên li kêleka wan, karîbûye culhet bike ji wan wêdetir gav biavêje sîstemeke nû ya polîtîk û xwe ji bo vê ehil û erkdar dîtiye. Têgîna Ellah pir payeberz kiriye û di bingehê vê de çanda polîtîk û civakparêziya ummeta Îslamê heye. Wexta ku mirov tehlîla dîrokî û sosyolojîk a têgîna "Ellah" li ser bingehê zanistî bike, mirov ê giringiya bi van herdu diyardeyan re eşkere û zelal bibîne. Li peyva "Ellah" nodûneh maneyên cuda hatine barkirin, ya rastî ev manîfestoya siyasî, civakî û heta ya ekonomîk diyar dikin. Jixwe, xwe weke ʻqasidʼ û ʻresûl ʼ ango ʻbeyanker ʼpênase kiriye û ev jî nasnameya nû ya senteza civakî û dîrokî ya li paşxaneya wî, pir bi awayekî baş û bi hêz rave dike.

Di dîroka şaristaniyê de dualîteya bi serê her şoreşê de hatiye di şoreşa Îslamê de jî pir bi hêz pêk hatiye. Piştî pêkhatina wê bi demeke kurt, pirsgirêka bingehîn derdikeve holê: Gelo şoreş ê li ser xeteke demokratîk, yan jî li ser xeta dewlet-desthilatdarê bimeşe, pêk bê? Ji derketina Îslamê û pê ve, ev herdu meyl xwe bi awayekî pir bi hêz nîşan didin. Tebeqeya jor a qebîleyê û hewesdarên desthilatdariyê, hewl dan şoreşê bi lez bikin selteneta Îslamî; beşên jêr ên qebîleyê û kesên kole jî li ser xeta demokratîkbûnê gelekî hewl dan. Tebeqeya jor a Qureyş ku qebîleya serdest bû, bi pêşengiya Muawiye, hewl da ber li gavavêtina hevseng a Îmam Elî bigirin ku ev gavavêtina wî xwedî xisletên demokratîk bû. Piştî wefata Mihemed, her sê xelîfeyên pêşî Ebûbekîr, Omer û Osman bi sedema nakokiya wan bi Îmam Elî re di qonaxa derbasbûnê de (P.Z. 632-656) xelîfetiyê bi dorê dikin. Di vê demê de rêûresma demokratîk (şabiye) û rêûresma desthilatdar (sulte) li dijî hev du şerekî dijwar dikin.

Destpêka şikestina di Îslamê de Muawiye ye. Mirov ji vê re dikare dij-Îslam jî bibêje û di esasê xwe de ji aliyê arîstokrasiyê ve fetihkirina Îslamê ye. Ev fetihkirin, bi awayekî berbiçav bi bûyera Kerbelayê pêk tê. Ji hezar salî zêdetir demek e ku hê jî di Îslamê de bûyera Kerbelayê pêk tê. Îslam ji Ehlîbeytê derket û endamê wê hemû li Kerbelayê hatin kuştin. Piştî vê, gelek mezheb û terîqên weke Smaîlî, Zeydî, Fatimî, Karmatî û gelekên din, li ser vê bûyerê ji hev cuda dibin û çêdibin. Arîstokrasî hêza xwe diparêze, lê civak dabeşî çendek kom dibe. Beşekî qebîleyên çolê vediguherin arîstokrasiyê, beşekî din jî dabeşî mezheb û terîqan dibin; bi vî awayî muxalif dimînin. Ebbasî wê bên û xizmeta ji bo arîstokrasiyê bidomînin.

Îslam li ber serê Kurdan bû, lewma pir dijwar bandor li hebûna çandî ya Kurd kir. Para bêhtir jî bi hilweşîneriya Îslama Seltenet re rûbirû man. Rejîma seltenet û xanedaniya Emewî, bi awayekî pir bişibe şêwazê malwêran û fetihkar ê Skender kete şerê xwînrij ê fethê û di demeke pir kurt de erdên Kurdan kir bin seltenetiya xwe. Nexasim fermandarên mîna Heccacê Zalim, tevahiya Kurdên destê wan şûr digirtin kuştin, jin û zarokên wan hemû desteser kirin. Bi qasî ku em dizanin, Kurdan di dîrokê de mînaka pêşî ya dagirkeriyeke bi vî awayî di dema Gilgamêş de dîtiye. Di destana Gilgamêş de qala sefereke xwînrij a dagirkeriyê tê kirin. Gilgamêş vê seferê tevî Enkîdoyê hevkar li Başûrê Kurdistanê li warê çiyayî û daristanî pêk tîne. Helwesta Kurdan a li dijî Îslama seltenetê, rê li ber dualîteyeke kûr vekiriye. Hiyerarşiya eşîrê ya ji rêûresmê ku girêdayî împaretoriya Îran-Sasanî bû, piştî ku împaretorî bi bin ket û ji hev de ket, pir dereng nema, dilsoziya xwe ji bo efendiyên xwe yên nû nîşan da. Zumreya hevkar a Kurd ku dema desthilatdarî tê gotin, timî xulamtiya ji efendiyê dagirker re tê bîrê, bi demê re pêşî bi Xanedaniya Emewî re bû yek, paşê her ku çû bû Ereb.

Çîroka erebbûnê ya elîtên Kurd ên hevkarê desthilatdariyê têra xwe balkêş e. Ev beşa ku em qala wê dikin, tevî ku ji aliyê etnîkî ve xizmê çanda împaretoriya Îranê ye û bi hezarê salan pê re hevkarî kiriye û dîsa di nava wê de bi giranî hebûna xwe ya çandî û zimanî parastiye, pir bi lez erebbûn hilbijartiye û ev jî ji nêz ve bi pêkhatina wê ya çînî re têkildar e. Beriya erebbûnê, pêşengên hiyerarşîk ên Kurdan, bi çanda qebîleyê re bi awayekî nêz di nava têkiliyê de bûn, endamên heman qebîle û eşîrê bûn. Ango çînîbûn qels û lawaz bû. Ji ber ku ji bo berjewendiyên wan, mayîna wan weke tebeqeya jor di nava hiyerarşiya qebîle û eşîrê de ji çînîbûnê bêhtir ji wan re kêrhatî û hewce bû. Ne li gorî berjewendiyên wan bû ku ji têkiliyên çandî yên eşîrê qut bibin, tenê weke ferd an jî malbat di nava çanda xanedaniya hakim a xerîb de bihelin. Di rewşeke bi vî awayî de pêkan bû ku ji her tiştê xwe bibin. Ji ber ku wan gelek mînakên dîrokî bi çavên serê xwe dîtibûn. Rastiya qebîle û eşîrê ya Kurdan, bi hêz e; endamên vê çandê hişk pê ve girêdayî ne, hema bêje, rê nade ku bi çanda hêzeke derve re bibe yek û asîmîle bibe yan jî di vî warî de rewşê bêîmkan dike. Tevî vê, di warê dîrokî de şert û mercên wan ên maddî yên çînîbûnê zêde bi pêş neketine ango li cem wan,

çanda bajar û dewletê kêm peyde bûye û ji vê jî giringtir, hertim li hemberî dagirkeriyên mêhtinkar, fetihkar û istilaker ên ji derve, têkoşiyane û di vê de rola van hemûyan giring e.

Di dema dagirkeriyê ya Xanedaniya Emewî ya Ereb de hem di warê dîrokî de hem jî di warê civakî de cudabûnek pêk tê. Bi sulteya Îslamî re tebeqeya jor a qebîleya Ereb, ji tebeqeya jêr a qebîleya xwe bi lez qut dibe û vediguhere çîneke nû ya serdest. Em qala çînîbûneke kûr dikin. Di dema Emewiyan de arîstokrasiyeke pir bi hêz a Îslam-Ereb çêbûbû. Di çanda Rojhilata Navîn de, cara pêşî ji têkiliya kole-efendî ya ji rêûresmê wêdetir, weke têkiliyeke ya serf-senyor a paşê li Ewrûpayê çêbû, bi awayekî nû têkiliyeke beg-mirêba çêbû. Li gorî koletiya klasîk, pêkhatina têkiliyên çînî, hişt ku mirov bêhtir karibin xwe ragirin û rûsipîtiya herî giring a sulteya Îslamî ev e. Pergala çîna nû ya desthilata Îslamî çêdibe. Yê pêşengiya vê dike, Xanedaniya Emewî ye. Xanedanên Emewî ji bo ji wan re xizmetê bikin, di demeke pir kin de qesrên xwe bi hevkarên çînî û bermahiyên burokratên selteneta Sasanî û Bîzansan tijî kirin. Tebeqeyên çandên jor ên hatin fetihkirin, hemûyan ev çînîbûna nû ya dîrokî civakî li gorî berjewendiyên xwe guncav dîtin û li ser bingehê hevkariyê bi lez bûn arîstokrat. Tebeqeyên ku em qala wan dikin, bi rêya gelek zewacan bi arîstokrasiya xanedanên hakim re têkilî danîn. Zarokên xwe bi çand û zimanê fermî yê Erebî perwerde kirin. Ji çand û zimanê qebîleya xwe bi lez dûr ketin. Berê rewşeke bi vî rengî ne li gorî berjewendiyên wan bû, lê di nava şert û mercên arîstokrasiya nû ya Îslamî de ev têra xwe ji bo wan guncav bû. Jixwe di dîrokê de gelek mînakên bi vî awayî hebûn û rewşên bi vî rengî pêk hatibûn.

Aqadî, Aramî û Suryaniya fermî, beriya Erebî bi hezarê salan, çand û zimanên hevpar ên împaretoriyên koledar ên klasîk bûn. Mîna rola Grekî û Latînî ya li Rojava, ew pir berê bi roleke wisa rabûbûn. Erebî cara pêşî bi Îslamê re li Rojhilata Navîn bi awayekî berfireh, bû çand û zimanê hevpar, bû xwedî payeyeke berz. Çanda xanedaniyê jî bi Erebî hat pênasekirin û li Rojhilata Navîn bû çanda jiyana hevpar a arîstokrasiya Îslamê. Lewma, hema bêje, malbateke arîstokratîk a Rojhilata Navîn nema ku xwe bi kok û şecereyê bi xanedaniyên Ereb ve girê nede. Her malbata arîstokratîk a hevkar, koka xwe bi xanedaniyeke Ereb, nexasim jî pir bi îhtîmam bi Ehlîbeytê ve girê dida. Divê mirov çîna esker û ulemayan jî li vî karwanê nû zêde bike. Tevahiya wan jî kokên xwe yên berê înkar kirin û şecereyên nû girtin; û ev li cem wan bû adet an jî bû rêûresm. Çanda Farsî ya hezarê salan jî di nava çand û zimanê Erebî de nekarî xwe ji asîmîlasyoneke pir giran rizgar bike. Jixwe, çand û zimanên lawaz pir hêsayî hatin daqurtandin. Giringiya berê ya Aqadiya kevin bi temamî nema; Aramî û Suryanî jî têra xwe ji taqetê ketin.

Tebeqeyên jor ên qebîle û eşîrên Kurd jî pir bi lez bi vê re bûn yek û para xwe ji asîmîlasyonê girtin. Dewamkirina rêûresma Zerdeştî ya berê, ji karê zêdetir ji wan re zirar bû. Heke wan di vê çandê de israr bikira, heye ku weke hebûn nemana. Piştî ku derb xwarin bi demeke kurt, çawa ku di dîrokê de gelek caran çînên serdest li ser bingehê berjewendiyan di nava çand û zimanên xerîb de helîna xwe qebûl kirine ku ev li gorî wan e, wan jî ev awa ji bo dewamkirina hebûna xwe hewce dîtiye. Di navbera sedsalên 7 û 10'ê P.Z. de tebeqeyeke jor a Kurdên hevkar a pir bi hêz di nava çand û zimanê arîstokrasiya Ereb de heliyayî û pê re bûyî yek, çêbû. Ev beş, herçiqasî bi dirûv Kurd bêne hesibandin jî ji aliyê çand û ziman ve tenê bendeyê çand û zimanê Erebî bûn. Bi vî ziman û çanda nû re jiyan ji bo wan fexr û serbilindî bû; pê xwe kesên neqane û payeberz dihesibandin. Herî zêde van beşan, çand û zimanê xwe zû terikandine. Li Kurdistanê hê jî pir zêde bermahiyên van beşan hene.

Di Îslamê de çendek mezhebên Şîa yên muxalif derketin. Li cem Kurdan jî vê xwe nîşan da û ev xeta Ebul-Wefa El-Kurdî bû. Vê, di Îslamê de şikestineke giring çêkir û rê li komînbûnê vekir. Komînbûna Kurd, di serdema navîn de bi "Wefaîtiya" ku Ebul-Wefa bi pêş xist, bû

xwedî pênase û bi gewde bû. Ebul-Wefa ev kir îdeolojiyeke komînê. Mirov dikare bibêje, vê îdeolojiya komînê heta bi Elewiyên îro veguherandine. Lê bi kok, bi reh û rîş, Îslam e. Muxalif e, ango dijber e, li warên çiyayî alîgirên wê çêdibin. Di bîrûbaweriya dijber de ku weke Ehl-î Heq û Yaresanî hê jî dewam dike, xwe weke versiyoneke cuda nîşan dide. Êzdî komeke pir cuda ne. Qadirî û Neqşîbendî weke versiyonên cuda derdikevin holê. Neqşîbendîtî bêhtir weke terîqeteke modernîteyê bi pêş dikeve û xwe disipêre şah û siltanan. Tevî ku bingehê Şîatiyê komînal e, ji ber ku xwe disipêre Sefewiyan vediguhere îdeolojiyeke xanedaniyê.

Rewşeke balkêş e, yên serkêşiya van hemûyan dikin, hema bêje gişt Kurd in. Sefiyuddîn Kurdek e. Ebdulqadirê Geylanî jî Kurd e, Kurdistanî ye. Sedsala 19'an, nûnerê terîqeta Neqşîbendîtiyê ji Eşîra Caf Kurdekî ji Silêmaniyê bi navê Mewlana Xalid e. Ev hemû jî îdeolojiyên xwe pêşkêşî xizmeta şah û siltanan dikin. Talabanî ji terîqeta Qadirî bû, Barzanî jî ji terîqeta Neqşî bû. Wan bandora van terîqetan bi kar anî û xwe bi wan modern kirin. Ya ku em jê re îdeolojiya modern jî dibêjin, milletperestî ye. Beşa muxalif jî heta bi sosyalîzmê tê.

5-Di Dîrokê de Têkiliyên Kurd û Tirkan

Beriya her tiştî, divê em binê vê nuqteyê bi xetên stûr xêz bikin: maceraya Tirkan li Rojhilata Navîn bêyî Kurdan nabe. Divê mirov vê hûrûkûr fêhm bike. Tirkan çi ava kiribe jî, li ser pişta Kurdan ava kirine. Ango bi saya Kurdan, ava kirine. Ev jî li ser bingehê têkiliya fermanberiyê kirine. Mixabin, ji Harpagos û vir ve, Kurd timî eskerê fermandarên xelkê ne. Xisleteke Kurdan a ji rêûresmê ye. Fermandar timî ji xelkê din e. Ji dema ku Konfederasyona Medan a dîrokî bi xiyaneta Harpagos hat bidawîkirin û heta roja me ya îro, eskerên herî neqane yên Kurdan her tim eskerên fermandarên xelkên din bûn.

Heke ku em hinekî din Tirkan rave bikin, em ê bibêjin; Tirk weke eskerê Îslamê hatine vê cografyayê. Di wê demê de yek ji xanedaniyên Kurd xanedaniya Buweyhiyan dor li xelîfetiya Ebbasiyan girtiye û bi erka wezîfedarekî dînî fonksiyona wê hatiye bisînorkirin. Fatimî heta ber Dîcle-Firatê hatine, hema bêje, dawî li xelîfetiyê tê. Di rewşeke bi vî awayî de xelîfeyê Ebbasî ji bo alîkariyê bang li Tûxrûl Beg dike û siltantiyê didiyê. Şertê wî yê sereke jî ew e, jê dixwaze bandora Buweyhiyan bişikîne. Tûxrûl Beg ji bo pêdiviyên xwe yên eskerî tevdarik bike, bi hevrikê Buweyhiyên Şîa bi Kurdên sûnnî re tifaqê dike, bi vî awayî bingehê têkiliyên Kurd û Tirkan datîne. Tûxrûl Begê ku desteka Kurdên sunnî digire, xanedaniya Buweyhiyan bi bin dixe û bi vî awayî, xelîfetiyê ji tinebûnê xilas dike. Tûxrûl Beg, bi mîrê Şeddadiyan Menûçehr re tifaqê dike, pê re hêzên xwe dikin yek û li dijî qraltiya Ermenan dest bi êrişê dike. Tûxrûl Beg ji Aniyê heta bi Qersê li tevahî deveran hakimiyeta xwe çêdike, li gorî tifaqa xwe ya bi Menûçehr re bajarê Anî jê re dihêle û herêma Qersê jî bi xwe bi rê ve dibe.

Tifaqa Tûxrûl Beg bi Menûçehr re qraltiya Ermenan têk bir; bi vê re Tûxrûl Beg bi hêz dibe û 1055'an ji xelîfê Ebbasiyan payeya "siltantiyê" digire. Di wê demê de mîrtiyên Kurdan li herêmê têra xwe bi bandor in. Mîrtiya Şeddadî ya Kurd a navend Azerbeycana îro, li meydanê hêza serdest e. Merwaniyên navend Farqîn, li ser xeta ku ji Wanê heta bi Ûrfayê dirêj dibe, hêza serdest in. Mirdasiyên navend Gêl, ji Semsûrê heta bi Meletiyê herêmekê kontrol dikin. Hin beşên cografyayê di bin destê Mîrtiya Hesenweyhî de ne. Statuya mîrtiyên hûr û gir ên weke van, di nava Selçûqiyan de bi awayekî yekîneyên serbixwe ne.

Têkiliyên Kurd û Tirkan dişibin têkiliyên Med û Persan ên di dîrokê de. Med nebûna Pers, Pers jî nebûna Medê nikarîbûna li ser piyan bimînin. Eskerên bi bandor û jêhatî yên împaretoriya Persan bi giranî ji Kurdan bûn û di fermandariyê de Pers hebûn. Heke em bi zimanê îro bibêjin, Îran bêyî Kurdan nabe. Jixwe ev têkiliya nîv-stratejîk, nîv-taktîk îro jî dewam dike. Em dibînin, di maceraya Tirkan a Rojhilata Navîn de fermandar Tirk in, eskerên li pêş ên neqane jî Kurd in. Çawa ku di dema Med û Persan de jî bi vî awayî bû. Ev tesbîteke

giring e ku ji bo ku mirov roja me ya îro fêhm bike. Divê mirov vê, bi hemû hûrgiliyên wê fêhm bike û lê serwext bibe. Yan na, ti kes nikare xwe ji têkçûnê rizgar bike.

Tûxrûl Beg, piştî ku payeya siltantiyê ji xelîfe digire, navenda xwe li paytexta Medan a dîrokî Hemedanê ava dike. Bi demê re li vê navendê hîmên Dewleta Mezin a Selçûqî tê danîn. Tevahiya serekên Selçûqiyan, malbatên xwe tînin Hemedanê û vê derê ji xwe re dikin cihûwar. Ji ber ku Kurd û Selçûqî herdu Sunnî bûn, ji bo bi hev re bin, zemîn çêdibe. Divê em diyar bikin ku di vê demê de, Ebdulqadirê Geylanî ku alimekî Kurd e, ji bo pêkanîna bingehê teorîk ê huqûqî yê binesaziya dewletê dest bi xebatên fiqhî kiriye. Rêûresma ulemayên Kurd di warê aqilmendiya dewletê de bi Nîzamîmulk, Îdrîsê Bedlîsî û bi kesên weke wan, wê bi sedan salan dewam bike. Tifaqa Kurd û Tirkan, ne tenê di warê eskerî de çêbûye, di warên din de jî çêbûye ango di wan waran de ku aqlê dewletê li wan pêk tê.

Ji salên 1100'î ve, mîrtiyên Kurdan qonax bi qonax bi siltenetiya Selçûqiyan ve têne girêdan. Ji salên 1000'î heta bi salên 1100'î statuya serbixwe ya mîrtiyên Kurdan xwe disipêre têkilî û tifaqa wekhev a bi Selçûqiyan re. Çawa ku di dema Silhedîn de tê dîtin, carinan fermandarekî Kurd pêşengiyê dike, carinan jî fermandarekî Tirk. Di wan şert û mercan de tifaqa Kurd û Tirk ji bo herdu gel hebûna xwe biparêzin, bivênevê ye. Ji salên 1100'î ve, hevsengiya di tifaqê de qonax bi qonax diguhere û fermanberî dikeve destê Tirkan. Di warê îdeolojîk de bi giranî meydan ji mela û ulemayên Kurd re dimîne. Herweha Kurd ê giraniya xwe ya di warê civakî û çandî de jî bidomînin.

Rêûresma malbatê ya Selçûqiyan, di pozîsyona rêveberiya dewletê ya li Rojhilata Navîn de êdî hebûna xwe weke siltan û prens didomînin. Selçûqî, ji bilî rêveberiya dewletê û begtiyê ti pozîsyonê qebûl nakin û li Rojhilata Navîn êdî hêza nû ya serdest in. Yên ku di nava xanedantiyê û begtiyê de neyên qebûlkirin jî dibin Tirkmen. Ya rastî, Tirkmen ew kes in ku ji xanedantiyê hatine avêtin. Tirkmen li dijî zilm û zorê serî radikin, lewma wan mişextî çolên Iraq û Sûrî dikin; dîsa ew qebîle ne, li Anatolya, Deryareş û Torosan penayî baniyan bûne. Yoruk, Çepnî û Tahtaciyên îro ji wan in. Weke "Etrak-i bî-îdrak" ango "Tirkên bêîdrak" qala wan tê kirin. Beşê xanedaniyê xwe ji van nahesibîne. Çi begên Osmaniyan û çi jî begên Selçûqiyan hem dînê xwe guhertine hem jî bûne xerîbê rêûresma xwe. Kom û klîkeke rêveber in. Ji bo wan xizimtî hîç giring nîne. Ev beşek in, bi temamî bûne desthilatdar û dewlet. Zemînê van ê çandî û îdeolojî bi awayekî bingehîn Kurd pêk tînin. Kurd jî ji dema Persan ve hîn bûne bibin eskerên baş û li çiyan bijîn. Di alîkariyê de jî payeberz in.

Xanedanên Osmanî misilmanên Sunnî bûn, lê Tirkmen bi giranî ji bawerî, mezheb û terîqetên muxalif bûn. Ji bo begên Osmaniyan ti qîmeta xizimtiyê tinebû. Hêzeke arîstokratîk temsîl dikin a ku bi temamî bi desthilatdarî û dewletê ve kilît bûye.

Têkiliyên Kurd û Tirkan weke têkiliyên Tirk û Yewnan nîne. Ev diyalektîka têkiliyê ku ji hezar salî û vir ve hebûna hevdu temam kirine, heta niha ji aliyê dîroknasên Kurd ve weke "Tirkan Kurd bi kar anîne" şirove kirine. Ya rastî, ji vê têkiliyê Kurdan jî kar kiriye û nirxên bi dest xistî, hene. Tişta ku Kurd nikarin bi tena serê xwe bikin, bi Tirkan re kirine. Di vî warî de mînaka herî berbiçav Şerê Melazgirê ye. Kurdên Sunnî fêhm dikin ku heke bi Selçûqiyan re têkiliyê daneynin, emîrtiya wan wê ji destê wan biçe, seba vê, li gorî berjewendiyên xwe hewceyî têkilîdanînê bûne.

Ji bo mirov li Zagrosan hebe, divê mirov tifaqê çêke. Kurd û Tirkên ku ev rastî ji nêz ve bi çavên serê xwe dîtine û di vî warî de xwedî ezmûn bûn û herçiqasî hin caran li dijî hev du şer kiribûn jî bi giştî her tim ji bo tifaqê biryar dane. Salên 1070'yî qralê Bîzansan heta bi Payîzavaya îro tê. Xwedî wê hêz û taqetê ye ku Hekkariyê jî bigire. Mîrtiya Merwaniyan di tehlûkeyê de ye. Li aliyê bakur, ji ber ku Ermen û Bîzansan tifaq çêkirine, tehlûke heye Şeddadî jî bikevin kontrolê. Seba vê, mîrên Kurdan hewce dibînin bi Siltan Alparslan re tifaqê

bikin. Heke mîrên Kurdan bi Tirkan re tifaqê nekin, heye ku bi demê re prenstiyên Gurciyan û Qraltiya Ermenan tifaqê bikin.

Axir, di encamê de, Tirk û Kurdên ku ev tehlûke dîtin, tifaqa xwe çêkirin û li Melazgirê bi derbeke pir xedar Bîzans bi bin xistin. Melazgir jî di navê de Qers, Mûş û Farqîn hemû ji Bîzansê têne rizgarkirin. Ji ber ku vê tifaqê hem bi Kurdan hem jî bi Tirkan daye qezenckirin, piştî wê tevahiya hezar salî, tevî rûdana hin nakokiyan jî zemînê têkiliyên xwe disipêrin hev du, hatiye danîn. Heke mîna têkiliyên Tirk û Rûman, têkiliyên Tirk û Yewnan bûya û bi hev du re şer kiribûna, Tirkan wê Anatolya û Kurdan jî Mezopotamya ji dest bidana. Ne Tirk diman, ne jî Kurd. Ev di salên 1000'î de bi vî awayî bû, salên 1500'î jî bi vî awayî bû û ji bo niha 2025'an jî bi vî awayî ye.

Diyardeya ku em jê re xuşk û biratî dibêjin, bingehekî wê yê wisa objektîv hebe jî aliyê wê yê sûbjektîv kêm maye. Heke ku em bi têgîna mîrasê dakevin jî em dikarin pê qala vê meseleyê bikin. Pêşiyên me, ji me re dîrokek hiştin û ew bi xwe bûn malê dîrokê. Ji Zagrosan heta bi Qefqasan mîrtiyên Kurdan serdest bûn. Zemînê wan ê çandî jî têra xwe bi hêz bû. Kurd dêmanî ne, û têkiliyên wan hemû wekhev in. Selçûqî komên şerker bûn, wexta ku hatin cografya Kurdan, gelek prensên Selçûqiyan dest pê kirin bi zimanê bi Kurdî re hevpar bi Farsî axivîn. Her ku çû, qebîleyan jî zimanê Farsî û Kurdî tercîh kir. Li qesrên Selçûqiyan ne Tirkî, Farsî tê bikaranîn. Yên li cem Mewlana, Kurd bûn. Di encama têkiliyeke li vê astê ya ketî zikhev de Bîzans hat bibinxistin, Melazgir, Farqîn, Ûrfa û hin deverên din ji Bîzansan têne stendin.

Di destpêkê de têkiliyeke nêzî wekheviyê heye. Kurd û Tirkên ku têkiliyeke wisa nêz danîn, karîbûn vê bi sedsalan dewam bikin. Di dema şerê Çaldiranê de Yawiz Siltan Selîm ji begên Kurdan re dibêje, "Di nava xwe de bibin yek û ji nava xwe begekî began hilbijêrin da ku ez wî muxateb qebûl bikim." Mistefa Kemal jî ji Kurdan re nabêje, "Hûn ê bi zorê bibin eskerê min." Ji bo wan razî bike rewşa konjonkturel rave dike. Kurd li pey beşê elît ê hevkar naçin bi Mistefa Kemal re tifaqê dikin. Têkilî bi rizadilî ye. Tifaqa ku bi vê meylê tê danîn, şerê rizgariya neteweyî bi ser dixîne. Şerê rizgariya neteweyî bi rastî jî şerê biratiyê ye. Jixwe, di destûra wê ya bingehîn de di Teşkîlat-i Esasiye de cih dane Kurdan. Di vî warî de beyan û daxuyaniyên Mistefa Kemal jî hene. 16-17'ê Çileya 1923'an, li Îzmîtê ji çapemeniyê re axiviye û ev di daxuyaniya wî de hene. Gotiye, divê muxtariyet ji bo Kurdan hebe ango otonomiyê bidin wan. Lê paşê tehlûkeyê dibîne û çerx dike.

Ji wê rojê heta îro çi ma? Kemalîst pozîtîvîst in, bûrjûwa ne. Çi tişta ku li dijî desthilatdariya xwe bi tehlûke bibînin, ji holê radikin. Xeta Talat Paşa jî xeteke qirker e. Dibêje, "Min Ermen qir kirin." Dibêje, "Min Zozo qedandin, niha dor a Loloyan e." 1915'an van gotinan dibêje. Heke di şer de bi bin neketibûya, wî yê qirkirina esas hingê kiribûya. Yanî wê koka Kurdan biqelanda. Ji ber ku Mistefa Kemal bêhtir realîst e, ewqasî hişk hereket nake. Fêhm dike ka Kurd ji bo wî çiqasî giring in. Polîtîkaya Talat Paşa nameşîne.

Wexta ku mirov li dîroka hezar salî ya Kurd û Tirkan dinêre, dibîne ku di warê çandî de têra xwe ketine nava hev. Mîrektiya Germiyan li Anatolyayê mîrektiyeke Kurdan e. Mîrektiya Artûkiyan jî li Kurdistanê mîrektiyeke Tirk e, lê teba û endamên wê Kurd in. Bi xwe jî bûye Kurd. Ne tenê Kurd û Tirk, li ser erdên Mezopotamya û Anatolyayê, nasname, çand û bawerî bi giranî bi hev re bi tifaq bûne. Bi tena serê xwe Tirk tineye, bi tena serê xwe Kurd jî tineye; bi tena serê xwe Ereb yan jî Fars jî tineye. Dîrok û çandên ketine zikhev hene.

Ermen etnîsîteyek in. Buweyhî xanedaniyek in. Tirkmen milliyetek in, ji eşîrên Kurdan cuda ne. Cihû milliyetek in, mensûbê dînekî cuda ne. Suryanî milliyeteke cuda ne, mensûbê dînekî cuda ne. Ew jî komeke Kurdistanî ne. Li Kurdistaneke demokratîk, divê ev hemû weke koman, cihê hebin. Ango divê weke komên cihê, bêne pêkanîn. Me berê digot, "Eşîrtî

paşvemayîn e, divê em demlidest wan ji holê rakin.” Lê ya rastî, ew çandeke hezar salan e. Xisletên wan ên erênî jî hene. Divê mirov wan demokratîk û hemdem bike. Têgîna neteweya demokratîk bi van re têkildar e. Yanî neteweya demokratîk kûr û berfireh e; van etnîsîte, terîqet, mezheb û heta dînan hemûyan di nava xwe de dihewîne. Kurdistan ew cografya ye, li ser erda wê Cihûtî û Xiristiyantî derketine holê. Li ser vê erdê misilmantî bi ser ketiye. Li şûna ku ev bêne înkarkirin, divê ji bo wan derfet û îmkan werin çêkirin da ku di nava demokrasî û aştiyê de xwe pênase bikin û bi hev re bin. Wexta ku ev bi hev re bin, wê enerjiyeke mezin a neteweya demokratîk derkeve holê. Jixwe, hêza neteweya demokratîk jî ji vê ye. Di navê de her cure mezheb, dîn, çand û etnîsîte heye. Bi awayekî ji awayan wê konfederal bijîn. Ya ku em jê re konfederalîzma demokratîk dibêjin, ev e.

Li cem Tirkan çêbûna girseya qebîle û ezbetên Tirkmenan di warê dîrokî de duşeqbûneke çînî pênase dike. Li cem Kurdan jî bi heman awayî beşên li derveyî qebîle û eşîran mayî, beşê Kurmancan pêk tînin. Em vê duşeqbûna sosyolojîk di dawiya serdema navîn de dibînin. Heke em vê rewşê bi awayekî din pênase bikin, em ê bibêjin, Kurmancbûn û Tirkmanbûn pêvajoyeke xelkbûnê pênase dike. Tirkmen li hemberî begtiyên Tirkan, Kurmanc jî li hemberî begtiyên Kurdan weke nasnameyeke nû ya civakî çêdibin. Di çarçoveya sosyolojiya dîrokî de hewceyiya vê mijarê bi şiroveyê heye. Li cem me, Rêber Apo ev sosyolojî pênase kir û tesbîteke wisa kir, “**Em di destpêka dîrokê de, dîrok jî di roja me ya îro de veşartî ye.”**

Beriya Kurmancbûnê, beşên serdest ên Kurd di nava pêkhateyeke arîstokratîk de bûn, beşekî mezin ê gel jî di nava çanda qebîleyê de bûn. Kurmancbûn hema bêje mîna Tirkmenbûnê weke berhemeke sosyolojîk a dema Îslamê derdikeve holê. Xisleta sereke ya Kurmancbûnê ew e; têkiliyên wan ên qebîle û eşîrê êdî nemane, ketine pêvajoya bajarîbûnê.

Mîrtî jî li kîjan herêmê bin û kîjan nasname li wir serdest be, dibin weke wê û hebûna xwe wisa dewam dikin. Li Îranê kirasê nasnameya Persiyê, li nîvgirava Ereb kirasê nasnameya Erebiyê û li Anatolyayê jî kirasê nasnameya Tirkîtiyê li xwe dikin. Di warê eskerî de jî rewşeke bi heman rengî pêk tê. Harpagos fermandarekî Kurd e, împaretoriya Persan heta bi peravên Egeyê dibe. Li cem Osmaniyan Paşa Beyazîd, li cem Ebbasiyan Ebû Muslîm Kurd e. Yên dibin weke yên din, nasnameya yên din ji dêvla nasnameya gelê xwe tercîh dikin. Hewl didin bibin weke yên din, îro jî ev tercîh li cem mîrtiyan dewam dike.

Kurmanc, cara pêşî li derveyî qebîle û eşîrê weke hebûneke çandî-civakî bi pêş dikeve û ev hem çerxa bûna wekî yê din dişikîne, hem jî bingehê milletbûn û gelbûnê datîne. Millet, kategorî yan jî qonaxeke berî netewe ye. Netewebûyîn, rewşek e, têkiliya xwe bi rêveberiya siyasî re heye. Heke mirov Kurdan weke gelekî xwe gihandiye rewşa netewe pênase bike wê ev mubalexe û heleman be. Lê rewşeke Kurmancbûnê heye. Tevî ku Kurmanctî hertim bi pêş dikeve û mezin dibe, di nava xwe de nekarîbûye rêveberiyeke xwe ya siyasî pêk bîne û nekarîbûye hebûna xwe ya siyasî nîşan bide.

Bi gotineke din, Kurd ji çanda qebîle û eşîrê derdikeve; bi vê re diyardeya gelbûnê çêdibe û ji vê re Kurmanc tê gotin. Maneya wê ‘Mirovê Kurd ’e. Li cem Tirkan Tirkmen, li cem Ereban Bedewî, li cem Îraniyan Ecem xwedî heman maneyê ne. Herçiqasî Kurmancan bi temamî nekarîbû xwe ji pabendiya qebîle û eşîrê bikin jî ber bi roja me ya îro ve bi bajarbûna bi lez re kategoriyek in ku têra xwe bi pêş dikevin. Ji tevahî qebîle û eşîran malbatên ku bi hin sedeman qut bûn, li gund û bajaran serbixwe bûn û ev bûn hêza bingehîn a gelbûna Kurdan. Bi vî awayî Kurd ber bi gelbûnê ve bi pêş dikevin û li ser rêya netewebûna demokratîk diçin, lê tebeqeya jor a eşîran bi heman hêz û lezê ji milliyetê derbasî millet û neteweyê nebûne. Ev tebeqe nebûye neteweya dewletê û di vî warî de bi serneketina wan, di warê neteweya demokratîk de weke şens rê li Kurdan vekiriye. Di warê netewebûyîna demokratîk û netewebûyîna dewletê de cudahiyên bingehîn hene.

Dîroka avakirinê ya netewebûyînê dused salên dawî ne, lê biratiya Kurd û Tirkan ji hezar salî zêdetir e. Jixwe di pêşketina netewebûyîna Rojava de Xiristiyantî bi roleke mezin rabûye. Lê li cem Kurdan jî li pêşiya netewebûyînê dîn û Îslamiyet dibin asteng. Di vî warî de Şah Îsmaîl mînakeke eşkere ye. Tevî ku Kurd e, hem dibe Faris, hem dibe Tirkmen. Jixwe bingehê milletperestiya Fars disipêrin Şah Îsmaîl. Di şexsê Şah Îsmaîl de nirxên Kurdan ji dest çûne. Kurdên ku di nava ulemayên Osmanî de ji xwe re cih çêkirine jî ji Kurdbûnê dûr ketine. Lewma Ehmedê Xanî hê di salên 1700'î de hesreta xwe wisa tîne ziman;

Ger dê hebûya me îttîfaqek
Vêk ra bikira me înqiyadek
Rûm û Ereb û Ecem temamî
Hemiyan ji me ra dikir xulamî

6- Rastiya Kurd

Ji bo mirov dîroka Kurd û Kurdistanê bi awayekî herî nêzî rastiyê vekole, divê mirov di çarçoveya sosyolojiya dîrokî de bi dîrokê dakeve. Têkoşîneke rast a azadiyê divê pirsgirêka hebûnê ji bo xwe bike mesele ango divê heqê xwe yê hebûnê, nasnameya xwe, heqê manûnemana xwe bixe ber lêpirsînê û bi misogerkirina wê dakeve. Ji ber ku weke faşîzmê kirî, mutleqkirina pirsgirêkê ango asêkirina derî li nîqaşê, tine hesibandina wê, înkarkirina wê yan jî xwe lê kerr kirin, rê li çareseriyan venake. Xisletên bingehîn ên ku Kurdan dikin komeke cihê çi ne? Mirov bersiva vê pirsê bide pir giring e. Ji ber ku bi bersiva vê pirsê, em ê hem karibin di rewşa îro ya civaka Kurd û avakirina paşeroja wê de bigihin, hem jî bi tevahiya warên civakî dakevin. Kurd çiqasî karibin hûrûkûr bi vê pirsê dakevin û bersivên herî nêzî rastiyê bidinê, ew ê ewqasî bi çanda xwe ya ku ew ji her kesî cihê kirine, nêzî diyarde û bûyeran bibin û bibînin, ew ê weke civak karibin xwe ji nû ve û bi awayekî bi hêz pênase bikin.

Ji bo ku em rastiya Kurd fêhm bikin, em dikarin di dîroka Kurd de dabeşbûneke bi vî awayî bikin: Pêşî di navbera salên 30.000 – 530 B.Z. de "Dîrokeke Proto-Kurd" ya demdirêj heye. Salên 30.000 B.Z. dîroka proto-Kurd bi civaka dayikê dest pê dike û maka wê tejaneya Toros-Zagrosê ye. Ev pêkhateya çandî-civakî ji klanê derbasî qebîleyê, ji qebîleyê derbasî eşîrê bûye û salên 670 B.Z. bi Konfederasyona Medan a navend Hemedan gihiştiye asta herî payeberz. Salên 580 B.Z. di encama xiyaneta navxweyî ya fermandarê artêşa Medan Harpagos de Konfederasyona Medan vediguhere Împaretoriya Persan. Bi vê darbeya xiyanetê, dîroka proto-Kurd bi dawî bûye û "Dîroka Kurd a Sergirtî" dest pê kiriye. Vê pêvajoyê salên 580'î B.Z. dest pê kiriye û heta salên 1800'î P.Z. dewam kiriye; ev dîrokek e, bi perde û xêliyên Ereb, Pers û Tirkan ser wê hatiye girtin. Di nava dîroka qalkirî de Kurd weke siyekê ne, ser wan bi perde û xêliyeke stûr hatiye girtin û hema bêje hebûna wan weke xeyalekê ye. Wexta ku qala her çi bûyerekê hatiye kirin, weke dîroka Tirk, Fars û Ereban qala wê hatiye kirin, xwestine hebûna Kurdan gav bi gav tine bikin. Lê ya rast ew e, Kurd ne tenê gelek in, di heman demê de weke siltan, fermandar, ulema û wezîr di nava vê dîrokê de bûne xwedî rol û rist, lê di dîroka nivîskî de nekarîne di dereceya diduyan de jî cih bigirin. Berpirsiyarî û erka herî mezin a dîroknasiya Kurd ew e, vê perde û xêliyê rake. Ji bo vê jî divê dîroknas bixebitin. Pêvajoya dused salên dawiyê jî em dikarin weke ji dîroka Kurd a sergirtî derbasbûna "Dîroka Înkarê" pênase bikin. Em di vê pêvajoyê de êdî bi dîroka "Kurd tineye" rûbirû ne. Em ji vê re wekî din dikarin bibêjin, "dîroka tinebûnê", "dîroka asîmîlasyonê" û "dîroka qirkirinê". Bi modernîteyê re pêvajoyeke bi vî awayî dest pê dike. Li gorî sosyolojiya dîrokî, mirov dikare dîroka Kurdan bi vî awayî pênase bike. Xuya ye ku dîroka proto-Kurd têra

xwe bi pirsgirêk e. Di dema navîn de bi qonaxa ku em jê re dibêjin ʻDîroka Sergirtîʼ pirsgirêk bêhtir kûr dibe, rastiya Kurd birîndar dibe û dikeve rewşa nexweşiyê. Îca di qonaxa dused salên dawî ya modernîteyê de nexweş êdî li ber mirinê ye. Ya ku em jê re rastiya Kurd dibêjin, ev e.

Ya rastî, hebûn û jiyana Kurdan, komînal e. Heke di vê çarçoveyê de qala dîrokê were kirin, em ê karibin qala gelek tiştan bikin. Lê heke ku em di warê komînê de qalkirina xwe kêm bihêlin, hingê ew tê wê maneyê, me qala tiştekî nekiriye. Heke ku em di çarçoveya "çînî" de pê dakevin, em ê nikaribin qala tiştekî bikin. Lê wexta ku em bibêjin "Komîn, qebîle, konfederasyona qebîleyan" em ê ji bo qalkirinê gelek tiştan bibînin û peyde bikin. Rêbaza rast ev e, û em ji vê re sosyolojiya dîrokî dibêjin. Wexta ku ev rêbaz were bikaranîn wê dîrokeke Kurdan a pir cuda were pêşberî me. Dîroka rast jî ev e.

Civakek çiqasî hûrûkûr û demdirêj di bin bandora dîrok û cografyayê de ma be, ewqasî jî xwecihîbûna wê civakê bi hêz û mayînde dibe. Ev bandorên bi hêz û mayînde, dîroka paşê ya wê civakê jî muhafezekar dike. Heke ku em hê jî xisletên Kurdan ên otantîk û xwecihî dibînin, ev bi saya bandorên vê rastiya bi hêz û mayînde ne. Em li vir, derketina holê ya civaka qebîleyê dibînin. Li gorî civaka klanê, civaka qebîleyê pêşketineke mezin a şoreşgerî ye. Bi civaka qebîleyê re cudabûna ziman û çandê, têkiliyên koçerî û dêmanî bi pêş dikevin.

Wexta ku mirov hêza hê jî bi bandor a qebîle û dîn tehlîl bike, divê mirov li pişta wan diyarkeriya dîrok û cografyayê bibîne. Girê Mirazan ê Xirabreşkê, di dema xwe de, navenda dînî ya hevpar a qebîleyan e; bi koçerî û dêmanî di zikhev de hezarê salan bihurandine. Bi taybetî li Ûrfayê, bi giştî li cem Kurdan hesta dînî hê jî pir bi hêz e, û di vê de para vê rastiya ku em hewl didin qala wê bikin, ne kêm e. Em li vir qala çandeke bi hêz dikin ku beriya şaristaniya bajêr a Sumeran bi hezarê salan berê çêbûye û bi hezarê salan dewam kiriye. Li ser kevirên tîk hatine danîn, pîta pêşî û mînakên nivîsê yên beriya hiyeroglîfiyê hene. Beriya bi duwanzdeh hezar salan li ser wan keviran bi nivîseke weke ya zimanê sembolîk a hiyeroglîf nivîsandin û verotina wan keviran, qonaxek e ku nirxê wê yê dîrokî pir mezin e.

Civaka Sumer û Misirê xweber derneketine holê. Bi van mînakan jî isbat dibe ku çavkaniya wan çanda Mezopotamyaya Jor e. Xwe disipêrin paşxaneyeke wisa ya dîrokî. Sefera Misirê ya pêxember Brahîm delîlekî din ê pir mezin e ku nîşanî me dide ka diyalektîka dîrokî ya li Hilala Bibereket çawa bi pêş ketiye. Çanda ku bûye maka şaristaniya Misir û Sumeran, ev çanda li sîstema çiyayên Toros-Zagrosê ye. Ya ku ji hemûyan jî giringtir ew e; bandora wê ya di dîroka civakî de hê jî dewam dike û qonaxa çandeke pir mezin e. Şopên vê çanda navendî hê jî têra xwe hene û heke ku ev gel hê jî weke gelê xwecihî yê herî kevin ê vê cografyayê hebûna xwe dewam dike, bêguman em ê pêkhatina rastiya Kurd bisipêrin vê çandê. Civaka qebîleyê qederê beriya çardeh hezar salan li cografya Toros-Zagrosê xuya dike. Bi dahol û zirna xwe ya pêşî, bi bilûra xwe, bi afirîneriya xwe ya mûzîk û hunera gerdûnî ya pêşî, hema bêje, hebûna xwe bi qîrîn radigihîne.

Rastiya Kurd hem berhemekî vê qonaxa mezin a dîrokî ye, hem jî di warê bistmayîna li vê çandê de xwedî nîşaneyên bi hêz e. Bi israr dixwaze weke gelekî xwedî çanda qebîleyan bimîne, mirov vê israra wî tenê nikare bixweparastina wî ya li dijî hêzên şaristaniyê rave bike. Heke çand bi xwe, ne xwedî reh û rîşên kûr bûya yan ew ê bi xwe bûbûya şaristanî yan jî ew ê di nava şaristaniyê de ku jê re maktî kiriye, biheliya. Ji ber ku em bi hezaran civakên qebîleyan nas dikin ku bi vî awayî heliyane. Di vî warî de Kurd komên gelekî ne ku mînaka wan tineye. Tevahiya daneyên dîrokî nîşan didin ku ne tenê şoreşa Homo Sapiens a sêsed hezar salî, şoreşa cotkariyê ya bi qasî çardeh hezar salan jî bandorên mayînde li çanda Kurd a dêmanî kiriye. Nexşeyên genetîk isbat dikin ku hem cureyê Homo Sapiens hem jî şoreşa cotkariyê ji navenda vê çandê li dorbera xwe û dunyayê belav bûye.

Kurd hebûna xwe, roja me ya îro jî bi karakterên xwe yên çandî hê jî diparêzin û ev bi saya hêza çanda dîrokî ye. Jiyana çandî tercîhî jiyana şaristaniyê dikin û nabe ku mirov vê bi paşvemayîneke besît an jî bi prîmîtîviyê rave bike. Çanda wan, ne çanda bajarekî, çînekê û dewletekê ye. Çandek e ku di nava xwe de otorîterbûnê, çînîbûnê qebûl nake û di çanda demokratîk a qebîleyê de israr dike. Kes bi hêsayî nikare Kurdan bixe zevtûrebtê û ev jî têkiliya xwe bi vê çanda demokrasiyê re heye.

Divê em bi awayekî taybet destnîşan bikin ku tevahiya fikirên cuda û marjînal ên derbarê Kurdan de bi pêşhukmên sûbjektîv in. Herçiqasî roja me ya îro li derveyî civak û dîroka gerdûnî hatibin hiştin jî Kurd ji destpêka bihurîna ji civaka klan û pê ve, weke nûnerên civaka qebîleyê di tevahî pêvajoyên qonaxên civak û dîroka gerdûnî de ango di qonaxên bajarbûn, çînîbûn û civaka şaristaniya dewletî de xwedî rola sereke bûn. Di çanda jiyan û rêxistiniya civakî ya şêwazê qebîleyê de hem di warê avakirinê de û hem jî di warê dewamkirina wê de hêmana sereke bûn. Kurd kirdeya damezirîner a çanda qebîleyê ne.

Rastiya Kurdistanê bi awayekî esasî cografyayeke çiyayî, çand û warekî parastinê ye. Ev jî bi tevahî ji pirsgirêkan pêk tê. Lewma bi temamî dîrokeke Kurdan a xweser çênebûye. Pir zêde qral-xweda tinene. Ji ber ku timî li dijî qral-xwedayan şer kirine. Komîn û qebîle bi wan derketine holê; timî di nava rewşeke ceng û şer de bûne. Di serdema navîn de bi wan şah û siltanan re yên ku xwe siya xwedê dihesibandin, hatine beramberî hev du. Li seranserî rêzeçiyayên Toros-Zagrosan timî di haletekî cengê de bûne. Xwediyê dîrokekê ne ku tê de timî di nava cenga manûnemanê de bûne.

Çawa ku me li jor jî diyar kir, beşekî dirêj û giring ê dîroka Kurdan dîroka sergirtî ye. Divê perde û xêliya li ser vê dîroka Kurdan were rakirin. Em têkiliyên Pers-Kurdan ên di dîrokê de, ji Dîroka Proto-Kurdan weke derbasbûna Dîroka Sergirtî ya Kurdan pênase dikin. Wexta ku em qala dîroka sergirtî ya Kurdan dikin; em qala veguherîneke îdeolojîk ya salên 500'î B.Z. dikin. Yanî ji pêkhatineke bingehê wê xizimtî, derbasî pêkhatineke bingehê wê îdeolojî dibe. Pêşî weke proto-Kurd, Med hene. Pers, dawî li vê dema Medan tînin, bi vê re hem di komînalîteyê de veguherînek çêdibe, yanî komînên li ser bingehê îdeolojîk bi pêş dikevin, hem jî Pers timî li pêş in, Med jî li paş in. Ya rastî, di vê çarçoveyê de dîroka Kurd-Persan, dibe dîrokeke Kurdan. Ha dîroka ku em jê re dibêjin, sergirtî, ev e. Kurd timî di dereceya diduyan de ne, Pers jî timî yekemîn in. Ji 2500 salî ve, ya li diyarê Îranê diqewime, vê rastiyê pênase dike. Li vir, dîroka Kurdan di nava dîroka Persan de heye. Heta hebûna Partan û Sasaniyan li Îranê bi saya Kurdan e. Çawa ku roja me ya îro dîroka Tirkan bêyî Kurdan nayê nivîsandin, heman rewş ji bo Îranê bêhtir lê ye. Di vê çarçoveyê de, em dikarin bibêjin, dîroka Persan û dîroka Kurdan yek e. Em bi hêsayî dikarin şopên dîroka Kurdan di dîroka Persan de bibînin.

Di serdema navîn de Îslama Ereb derdikeve holê. Di bin siltantî û Îslama Ereb de ku bi Emewiyan dest pê kir û bi Ebbasiyan dewam kir, Kurdan bi qasî pêncsed salan bi awayekî sergirtî hebûna xwe dewam kir. Qesr û qonax bi wan tijî kirine, bûne Ereb, lê di cewherê xwe de Kurd in. Beşê ku em ji wan re ulema dibêjin, bi piranî Kurd in, û ev rewş heta roja me ya îro dewam dike.

Ya ji van hemûyan jî giringtir, beşê ku em ji wan re dibêjin, serdest û siltanên Tirkan, bi Kurdan re tifaq kirine û bi vî awayî, cara pêşî derbasî Rojhilata Navîn û Anatolyayê bûne. Yek ji wan bi hezarê salan li ser erda xwe, li welatê xwe ye, yê din jî cihê Xiristiyanên Anatolyayê girtiye. Heke desteka Kurdan nebûya, wan ê nikarîbûya vê bikin.

Alparslan weke emîrekî Kurd an jî siltanekî Kurd tê naskirin. Em bi kêmanî, dikarin bibêjin, ev dîrok, dîrokeke hevnirx e. Ser vê dîrokê hatiye girtin. Alparslan ji bo deriyên Anatolyayê veke li Kurdistanê li hevgiran û mitefiqan digeriya. 1071'ê, dema ku xwe ji Şerê Melazgirê re amade dikir, bi begtî û eşîrên Kurdan ên bi hêz re têkiliyên xwe xweş dikirin. Di

encama vê de, tifaqa lê digeriya, bi Siltantiya Merwanî re, ya ku navend Meyafarqîn (Silîva) bû, peyde kir. Ji gelek eşîrên herêmê ji bo hêzên xwe yên qebîleyê hêzeke hemta bi ser hev de anî. Wekî ku hinek yeqîn dikin, Şerê Melazgirê yê li dijî Împaretoriya Bîzansê, ne tenê bi hêzên ji ezbetên Tirkan, bi kêmanî bi qasî wan bi hêzên begtî û eşîrên Kurdan hatiye kirin û bi ser ketiye. Heke ku em Şerê Melazgirê rast tehlîl bikin, di têkiliyên Kurd û Tirkan de wê mentiqê stratejîk ê bingehîn jî were fêhmkirin. Bi kurtî rewş ev e: Li hemberî êrişên ji rojava û bakur tên, Kurd ji bo hebûna xwe biparêzin û xurt bikin hewceyî bi hevgir û mitefiqên bi hêz in. Ev derfet û îmkan di hêzên Ereb-Îslamê de dîtin. Heta ezbetên Tirkan bêne herêmê, yek ji sedemên bingehîn ên têkiliyên wan bi hêzên Ereb re û bi lez Îslambûna wan, ji vê pêdiviya wan a bi rewşeke ewle ye. Pêdiviya ezbetên Tirkan bi welatekî nû, dihişt ku yan ew ê bi Kurdan re şer bikin û bibin hêzeke dagirker an jî derfeta vê nebûya, ew ê li dijî Împaretoriya Bîzansê bi wan re tifaqê bikin û Bîzansan bi aliyê rojava ve dahf bidin û bi vî awayî ji xwe re cihûwar çêkin. Herdu alî jî bi vî mentiqê stratejîk ketin Şerê Melazgirê. Ev şer li dijî Împaretoriya Bîzansê teqez şerê hevpar ê Kurd û Tirkan bû.

Encamên vî şerî eşkere ne: Ji bo ezbetên Tirkan deriyên Anatolyayê vedibin, demeke dîrokî dest pê dike. Kurd jî ji hêzeke kelem a ku wan bi sedsalan paşde dixe û zextê li wan dike, rizgar dibin. Di vê têkiliyê de erka Îslamê xerc e. Şerê hevpar ê di bin navê Îslamê de, ya rastî armanc xweparastin û bipêşxistina du gelan e ku herdu jî bi giranî xwedî xisletên qebîle û eşîrê ne. Ji bo herdu gelan jî binketin, wê maneya xwe bipaşketin û têkçûna hebûna wan bûna. Dîroka fermî, Şerê Melazgirê hertim bi mezinahiya Siltanê Tirk ve girê dide û bi vî awayî esasê wê yê rastî vedişêre. Şerê Melazgirê, bi qasî Tirkan herî kêm şerê Kurdan e jî. Ji ber ku di dîroka fermî de nehatiye nivîsandin, ev rastî ji holê ranabe.

Herçiqasî mentiqê vê têkiliya Kurd û Tirkan car caran bi şer xira bûbe jî heta roja me ya îro dewam kiriye. Piştî ku Tirk di nava Anatolyayê de bi cih bûne jî vê stratejiya nû her tim hebûna xwe domandiye. Herdu hêz jî ji bîr nakin ku kengî di kêliyên krîtîk ên dîrokê de bi hev re tifaq kirine û bi hev re tevgeriyane, serketî bûne. Ev mentiq wê di Xanedaniya Eyûbî ya Kurd de, li cem gelek Begtiyên Anatolyayê û di dema Osmaniyan de jî her bimeşe. Wexta ku em hûrûkûr bi nava dîrokê ve diçin, em stratejiyeke bi heman awayî ji têkiliyên Hîtît-Mîtanî ve, di navbera hêzên Anatolya û Mezopotamyayê de dibînin. Hem gel û hêzên sivîl, hem jî hêzên desthilatdariyê di zikhev de vê pêk tînin. Ne tenê li dijî êrişên ji rojava tên, li dijî gefxwarina rojhilat û başûr jî ev stratejiya parastinê ya hevpar wê bimeşe. Siltanê Osmanî, Selîmê Yekemîn, berfirehbûna Împaretoriya Xanedaniya Sefewî ya Îranê, bi heman têgihiştin û tifaqê rawestandiye. Di heman wextî de Siltantiya Memlûkiyan a navend Misir a ji başûr hat, bi tifaqa ku bi pêşengiya Îdrîsê Bedlîsê hat avakirin, hat rawestandin û paşê jî hilweşiya.

Di Şerê Çaldiranê yê li dijî belavbûna Împaretoriya Xanedaniya Sefewî ya Îranê de, di artêşa Yawiz Selîm de ji yenîçeriyan bêhtir hêzên begên Kurdan û eşîrên wan hebûn. Bi tifaqa Kurd û Osmaniyan, şer ji aliyê eskerî ve bi ser ketiye. Hêjayî bibîrxistinê ye, li Amasyayê 28 Begên Kurdan û Yawiz Selîm mohr li binê protokolekê danîne.

Li Ûrfa û Mêrdînê serdestiya Memlûkiyan heye; dema ku mirov vê rewşê li ber çavan digire, mirov dibîne Şerê Mercîdabiqê jî (li Bakurê Sûrî devereke nêzî Helebê ye) xwedî karakterekî bi heman awayî ye. Divê mirov diyar bike ku herdu şer jî ji aliyê stratejîk ve di hebûn û serxwebûna Kurdan de xwedî roleke giring bûne. Destnîşankirina vê rewşê, hewce ye, û heta tu bibêjî realîst e.

Dewleta Eyûbî ku di nîveka berxwedana li dijî xaçperestan de ye, encama tifaqeke Kurd û Tirk e. Hêza Ereban a li ber xwe bide, tineye. Xelîfetiyeke sembolîk li cem wan maye û ji bilî vê ti hêza wan tineye. Lewma ya rast ew e ku mirov şerên li cografya Kurdistanê di demên

Xanedaniyên Selçûqî, Eyûbî û Osmaniyan de hatine kirin, weke şerên li dijî hêzên dagirker bibîne.

Heta ku naveroka têkiliyên Kurdan bi qewm, begtî, siltantî û ezbetên Tirkan re danî neyê fêhmkirin, dîroka hebûnê ya herdu civakan wê rast neyê nivîsandin. Kurdan bi Tirkan re tifaq û têkiliyên stratejîk danîn, ev têkilî û tifaq ne ku ji bo li hebûna wan bi zora eskerî yan jî asîmîlasyonê gef were xwarin danîn, berevajî vê, ji bo her du hebûn bêhtir xwe biparêzin û bi pêş bixin, têkilî û tifaq danîn; divê ev wisa were fêhmkirin. Ji ber ku li Rojhilata Navîn Kurd bêyî Tirkan, Tirk bêyî Kurdan nikarin bijîn. Heke mirov herduyan ji hev du bike, ev tê wê maneyê, hebûna herduyan jî dikeve hedefa êrişên bi armanca tinekirin û îmhayê. Dîrokeke Tirkan a bêyî Kurdan, lihevçêkirî, derew û çeloxwarîkirineke li derveyî rastiya dîrokî ye. Mirov nikare qala hebûneke Tirkan a bêyî Kurdan bike. Têkoşîna me, ji bo çareserkirina pirsgirêkeke hebûnê ye, lê dema ku em vê têkoşîn dikin, divê em têkiliyên Kurd û Tirkan red nekin, bi milletperestî û înkarê nexapin. Em rastiya dîrokî li ber çavan digirin û vê têkoşînê dimeşînin. Kurdê qels, Tirkê qels e. Heke Tirk bi Kurdan re tifaqeke rast nekin, wê nikaribin li herêmê bibin hêzeke bi bandor.

Ji ber ku Ziya Gokalp ev rastiya dîrokî fêhm kiribû, bi awayekî taybet têkiliyên Kurd û Tirkan dest nîşan kiribû. Tifaqa Kurd û Tirkan, hem belavbûna Bîzansan a li herêmê radiwestîne, hem ber li Seferên Xaçperestan digire, hem jî dike ku Tirkmen li Anatolyayê bi cih bibin, bibin dewlet û derfetê dide împaretorbûna wan. Divê mirov bi vê paşxaneya bi hêz a dîrokî bizane, têkiliyên Kurd û Tirkan ji nû ve û li ser bingehekî demokratîk tenzîm bike, huqûqa wê bi pêş bixe.

Di zêhniyeta Tirkan de ku di warê dîrokî de kûr e, heman mentiqê stratejîk heye. Ji dused salan ve 'faşîzma Tirkê Spî' ku bi awayekî berbiçav tê maneya ajantiya Rojava, di bingehê helwesta wî ya înkara vî mentiqê stratejîk û meşa wî ya dîrokî de, kirin û niyeteke wî ya komplowarî ya li dijî herdu çandên civakî heye. Ji demên pêşî yê avabûnê ve, bi awayekî cewherî têkilî li ser vî bingehî bûn û îca paşê li ser van têkiliyan ferzkirina asîmîlasyon, îmha, înkar û qirkirinê, li hemberî her du çandên civakî xiyaneteke mezin e, û ev ê bike ku her du çandên civakî bixisirin û bi bin bikevin.

Mistefa Kemal mirovekî rasyonel bû. Xwe li milletperestiya Anatolya û Kurdistanê girt. Heta ji ber vê, bi Îttîhadperestan re hinekî pevçû. Komar jî li ser vî bingehî ava kir. Derket holê ku ev bêhtir realîst û rasyonel e. Îttîhadperestan, bi vegotineke sexte û lihevçêkirî ya Tûranperestiyê împaretoriyek hilweşand.

Mistefa Kemal, lîberalîzma Ingilîz, têgihiştina kapîtalîzmê ya Ingilîzan, sosyolojî û pozîtîvîzma Fransiyan, mîlîtarîzm û dewletperestiya Elmanan gihand hev du û bi vî awayî siyaseta xwe çêkir. Kapîtalîzma Ingilîzan, Jakobenîzma Fransiyan û îdealîzma Elmanan sentez kir. Komar berhema vê sentezê ye û kapîtalîzma dewletê bi pêş xistiye.

1925'an polîtîka Kurd a Ingilîzan û polîtîka Kurd a Stalîn hev du digirtin. Herduyan jî Kurd weke amûrekî didîtin û li hemberî polîtîkaya qirkirina Kurdan, tine hesibandina wan, xemsar û bêeleqe bûn. Ev herdu hêzên dijminê hev, li ser kêm mijaran li hev dikirin û yek ji wan jî ev mijar bû.

Rejîma li Tirkiyeyê hatiye avakirin, navê wê komar e, lê bi awayekî esasî ne sîstema komarê yan jî sîstema dewletê ye. Dewlet pîvanên xwe, saziyên xwe û aqlekî xwe yê pê ve girêdayî heye. Huqûqekî wê yê wê bi sînor dike û wê girê dide, heye. Lê sîstema dewleta Tirk, rejîmeke şer e ku li ser qirkirina Kurdan hatiye avakirin. Pîvana wê ya pêşî ya damezrandinê qirkirina Kurdan e. 1925'an, piştî ku Şêx Seîd bi dar ve kirin, berê xwe dan Hesen Xeyrî û yên weke wî difikirîn. Berê xwe dabûn wan, ne ku radîkal bûn, lê ji ber ku wan yekîtiya navxweyî ya Kurdan ji xwe re kiribû armanc. Ji ber ku xwediyê vê fikirê bûn, bûn hedefa êrişên komarê.

Seyîd Riza berî ku were darvekirin, Mistefa Kemal dibîne. Di vê hevdîtinê de armanca wan ew e, bi Seyîd Riza bidin gotin ku poşman bûye û paşê wî bi dar ve bikin. Dixwazin ji devê wî bibihîsin ku bibêje, 'ez poşman bûme' yanî dixwazin gotina 'poşman bûme' pê bidin gotin û paşê wî bi dar ve bikin. Gotinên dawî yên Seyîd Riza têne zanîn. Wî bi dizî dibin Elezîzê û li gara trenê dibin cem Mistefa Kemal. Li ser wî vê ferz dikin: "Ti carî qala Kurdbûnê neke, qebûl bike ku Dersim welatê Tirkan e, em ê jî te efû bikin." Yanî jê re dibêjin, heke li hebûna xwe xiyanetê bike û xwe biavêje bextê înkarê, ew ê wî efû bikin. Seyîd Riza vê qebûl nake û ji hebûna xwe nagere, ji ya xwe nayê xwarê. Lewma wî bi dar ve dikin. Ya rastî, heman helwestê li hemberî Hesen Xeyrî û Şêx Seîd jî nîşan didin. Seba vê, asêkirina Şêx Seîd û Seyîd Riza di mezhebperestiyê de, li hemberî helwestên wan ên bi rûmet, xiyanet e. Nabe ku bi nasnameyên weke 'Neqşî' û 'Elewî' bêne bisînorkirin û berevajîkirin.

Di qirkirin, tevkujî û bobelatên dused salên dawî yên Kurdan de rola Ingilîzan sereke ye. Di bervekirina li Mistefa Kemal de jî Ingilîz xwedî rol in. Ingilîzan, wexta ku dît heyeta Mehmûd Berzencî û hikûmeta Enqereyê hevdîtinan dikin û heye ku xwe bigihînin tifaq û hevgirtinekê, û dîtin ku ev yek wê berjewendiyên wan ên li herêmê bixe tehlûkeyê, 1922'yan bi Kemalîstan re rûniştin û pêşî li rejîma nû ya komarê vekirin. Ji Mûsil-Kerkûkê, heta ji berjewendiyên xwe yên mîna rêya Hindistanê, ji plana Sevrê dest kişand. Ingilîz heta wê rojê bi plana Sevrê ve girêdayî bûn, lê wexta ku dîtin, encamên têkiliyeke nû ya Kurd û Tirkan wê berjewendiyên wan bixe tehlûkeyê, hema yekser ew peyman betal kirin û desteka ji bo Yewnanan jî vekişandin. Jixwe, wexta ku desteka xwe vekişandin Yewnan bi bin ketin û vekişiyan. Bêguman heta wê demê hewldanên Şerîf Paşa li Ewrûpayê hebûn. Serkonsolosê Stenbolê, ji Cemiyeta Kurd Tealî bi Seyîd Ebdulqadir re hevdîtinê dike; otonomiyê, federasyonê yan jî dewleteke piçûk a Kurd li herêmê guftûgo dike. Mistefa Kemal tevahiya rewşê dibîne û li hemberî wê bi Berzencî re hevdîtinan dike. Kurd di hin astan de ji bo armancên xwe têkiliyan datînin. Dîsa bi Sovyetê re peymanan çêdike, têkiliyan datîne. Bi Fransiyan re jî peymanan mohr dike. Ingilîz dema ku vê rewşê dibînin, têkiliyên xwe yekser bi Kurd, Yewnan û Ermenan re bi dawî dikin û bi Mistefa Kemal re li hev dikin. Bi vî awayî, qirkirina Kurdan bi temamî qebûl dikin. Li beramberî vê, tesfiyekirina padîşahtî û xîlafetê jî di navê de heta dawiyê vekirina deriyê komarê li kapîtalîzmê tê erêkirin. Bi vî awayî jî Mûsil û Kerkûkê garantî dike.

Desthilata heyî ya roja me ya îro, di nêzîkatiya xwe ya Kurdan de xwedî ti qabîliyeteke felesefî-rasyonel nîne. Kurdan ji bo desthilatdariya xwe wekî potansiyeleke dengan wekî amûrekî dibîne. Ango nêzîkatiyeke xwe ya seresere, pragmatîk, rojane û hesabwarî heye. Ya rastî bi xwe jî nizane wê çi ji vê diyardeyê bike û çawa bike. Ya rastî, gotinên wan ên wekî "Kurd çi fêhm dike ji cejnê, radihîje dew û dibe xulxula wî vedixwe", "Qereçî lêdixe, Kurd direqise"[11] doktrînek e, awayê wan ê nêrîna li Kurdan e. Yanî Kurdan weke tiştekî pûç, qediyayî pênase dikin. Nêzîkatiya wan a ji bo Kurdan ev e. Naxwe Kemalîzm di nava xwe de polîtîkayek, rasyonalîteyek û mentiqekî xwe heye. Hemin aliyên wê yên mirov rexne bike hene, lê mentiqekî wê yê xwe disipêre modernîteya Rojava heye. Îro ji Kemalîzmê tê bihurîn. Lêgerînên Neo-Kemalîst hene, lê diyar nîne ka ew ê karibin çareseriyê bînin yan na.

Li cem Kurdan, zemînekî ku çînî yan jî sosyo-ekonomîk ê milletperestiya bûrjûwa ya Kurd derxîne holê, bi pêş neket. Ingilîzan ev rewşa Kurdan dît, lewma hem desteka xwe û hem jî hêviya xwe ji wan qut kirin. Tevî ku li cem Ereban, Tirkan û heta Efrîkiyan bi ser xistin jî dîtin ku wê ev li cem Kurdan bi pêş nekeve. Li cem Kurdan komeke bazirganan, çîneke navîn bi pêş neket, jixwe tinebû. Seba vê, di dema isyan û serhildanan de jî milletperestiyeke Kurd bi pêş

[11] Têbîniya wergêr: Ev her du biwêjên bi Tirkî jî wegerên motamo ne û bi Kurdî nayên gotin.

neket. Para bêhtir, wexta ku berjewendiyên malbatê yan jî eşîrê ketine tehlûkeyê serî rakirine, rastiyeke bi vî awayî heye. Wekî din, beşa serdest, jixwe xwe Kurd nabîne, ya rastî, li ser bingehê xweînkarkirinê hebûna xwe diparêze. Xwe bi Fars, Ereb û Tirkan ve girê dide. Wexta ku berjewendiyên wan dikevin tehlûkeyê serî radikin, hema paşê bi lez xwe nêzî hevkariyê dikin. Lewma çîneke civakî, çîneke bazirganiyê, çîneke rewşenbîran a Kurd çênebû. Pirsgirêkeke ciddî ya pêşengtiyê hebû.

Îro li dora diyardeya Kurd bûyerên mezin diqewimin û êdî her kes dizane ku divê ev pirsgirêk çareser bibe. Ji bo çareseriyê qala çar modelan tê kirin: ʻHeqê neteweyan ê diyarkirina çarenûsa xwe (HNDÇX)ʼ,ʻxweseriya ferdîʼ, ʻxweseriya herêmîʼ û ʻxweseriya çandîʼ. Divê ji van projeyeke çareseriyê, sentezek derkeve. Tam ji bo vê jî felsefe heye. Dîrok û sosyolojî ji bo vê armancê hene. Herî baş Ingilîz dizanin ku diyardeya Kurd di çi rewşê de ye. Dîsa herî baş ew dizanin ku pirsgirêk di nava xwe de çi dihewîne û naveroka wê çi ye ango haya wan ji vê heye.

Ya ku îro tê şikandin ʻçembera Ingilîzan ʼe, ango çember û feqa sedsalan e, ew ê bixwazin ku wê ji nû ve aktualîze bikin. Di şerê li dijî Kurdan de hêmana esasî Ingilîz in. Bi saya vê, xwe li pişt perdeyê digire; tê zanîn ku tenê di van 15-20 salên dawî de ji Tirkiyê 500 mîlyar dolar weke faîz pere veguhestiye Londonê. Sedsala bihurî Kurd birîndar hiştin û di vê sedsalê de jî dixwazin modelekê çêkin dîsa Kurdan tê de birîndar bihêlin. Ew ê bixwazin ku desthilata li Tirkî bixin nava şer û bi projeya weke pîlana Îxwanan a li Sûrî, vê bi ser bixin. Bi vê armancê, pêkan e ku emîrtiyeke Erbîlê derxin pêş.

Kurdîtiya hevkar-xayîn, hespekî trûva ye ango altax e. Ji bilî xwe, hewl dide hem hebûn hem jî xebatên tevahiya tevgerên Kurdistanî ji holê rake. Xwestin valatiya di warê pêşengtiyê de ya li cem Kurdan bi vê pêşengtiya sexte tijî bikin. Çîna serdest a feodal, milletperestiya prîmîtîv û hevkartiya ji rêûresmê ferz dikin. Ew bi dewleteke netewe ya di kontrola dewleta faşîst de dixwazin berîkên xwe tijî bikin. Çareseriya wan a ji pirsgirêka azadî û hebûnê re tineye.

Malbatî, saziya xweqedandin û xweqirkirinê ye. Li cem me hevmaneya Judenratê ye. Saziyeke di nava sînorên biyolojîk de ye. Pêkhateyeke xwe bi xwe diqedîne, tine dike. Çanda malbatî, li Kurdistanê ekonomî û her tişt daqurtandiye. Malbatî, malbateke mezin e. Malbata normal jî di nava xwe de dihewîne, lê mirov nikare weke wê bibîne. Malbatî, hemû hêzê û mêhtinkariyê di destê xwe de digire. Xwe disipêre malbatê û ber li pêşketina çînîbûnê digire. Ber li netewebûnê digire. Malbatîtî, îdeolojiyek e; zêhniyet û îdeolojiyeke muhafezekar û paşverû ye. Her malbatî, desthilatdariya xwe ava dike. Yewnan jî her cihê ku diçûnê, li wir dewletên xwe yên sîte/polîs ava dikirin. Lê di malbatîtiyê de pêkanîna organîzasyoneke mezin tineye. Bêhtir berjewendiyên teng ên malbatî di ser her tiştî re tên girtin. Eşkere ye ku bi vê malbatîtiyê tiştekî were rizgarkirin tineye. Hinek di malbatîtiyê de bist bûne, mane. Ji nasnameyeke bistbûyî û di cihê xwe de çikiyayî, afirînerî çênabe.

Di vê qonaxê de, rastiya netewe û gelê Kurd di dîrokê de cara pêşî xwe gihandiye asta herî pêşketî ya bîrbirin û serwextbûnê. Li vir, qonaxa ku em qala wê dikin, ne rastiyeke qîm dike yan jî qîm nake ye, li vir a giring ew e, ji çarçoveya têgihiştina partî yan jî komeke elît derketiye, jê bihuriye. Girseya sereke ya rastiyê, weke gel û netewe li rastiya xwe serwext bûye. Êdî gel an jî neteweyeke bîra hebûna xwe dibe û lê serwext e, heye. Netewe bi xwe weke têgîn rewşa zêhniyetekê pênase dike. Ji bo Kurdan ev rewşa zêhniyetê pêk hatiye. Lê em heman tiştî nikarin ji bo bigewdebûnê bibêjin. Çawa ku tê zanîn, jiyan bi tenê bi zêhnê nabe, ji bo wê bigewdebûn pêkhatineke giring e; ango rewşeke heqîqetê pênase dike. Di encamê de, vê rastiya ku hay ji xwe bûye û derketiye holê, hewce ye; xwe li ser bingehê neteweya demokratîk ava bike, ji bo vê têkoşîna siyaseta demokratîk a pêwîst bide, û divê vê

li ser zemînekî huqûqî yê giştî û li ser bingehê xweparastinê bide meşandin. Armanca bingehîn a hewldanên pratîk ên rojane têne meşandin, ev in.

7- Vejîna Kurd

Ji salên 1970'yî heta roja me ya îro, rastiya ku bi têkoşîna pêncî salên dawî derket holê, qonaxeke nû ya dîroka Kurdistanê ye. Mirov ji vê qonax û pêvajoyê re dikare bibêje "Dîroka Kurd a Hemdem". Pêvajo û qonaxa dîrokî ya ku em qala wê dikin bi PKK'ê dest pê kir. Xisleta bingehîn a vê qonaxê ji yên beriya xwe ew e, cenga manûnemanê û polîtîkayên înkar, îmha û asîmîlasyonê di zikhev de meşiyane. PKK'ê bi awayekî radîkal ê şoreşgerî mudaxeleyî vê pêvajoyê kiriye û pêvajo berevajî kiriye.

Rastiya salên 1970'yî ya Kurdan ew e, ji xwe, ji nasnameya xwe, ji çanda xwe, ji dîroka xwe direve û xwedî li xwe dernakeve. Tevahiya serhildan û isyanên di dused salên dawiyê de bi tevkujî, sirgûn, zilm û zordariyê bi encam bûne, paşê li cografyaya Kurdistanê polîtîkaya hilweşandina ekonomiyê xistine dewreyê û bi vê Kurd mehkûmî birçîbûnê kirine; şaneya civakî ya li Kurdistanê perçe kirine û kirine ku mirov ji bilî debara malbata xwe li tiştekî din nefikirin. Ji bo gelê Kurd ji vê rewşa kambax bihata rizgarkirin, hewce bû careke din li hebûna xwe, li zimanê xwe û li çanda xwe vegeriyana û ji bo vê jî têkoşîneke dijwar pêwîst bû. Xwegihandina rewşa îro bi saya berxwedana li zindanan, têkoşîna bi qehremanî ya gerîla û berxwedana serhildanê ya li tevahiya civakê belavbûyî, pêk hat.

Bi têkoşîna 52 salan a Rêbertiya Tevgera Azadiyê ya Kurd, pratîka Kurdan a ji hebûna xwe direviya, hat berevajîkirin û pêvajoyeke nû ya dîrokî hat destpêkirin. Bi vê pêvajoyê re, Kurd hem li hebûna xwe xwedî derketin, hem jî ev yek bi dunyayê hemûyî dan qebûlkirin û dîsa ev hemû bi saya vê têkoşînê bû. Bi saya serê vê têkoşînê, Kurd careke din weke komeke neteweyî li dora nirxên hevpar hatin cem hev û ji bo civaka Kurd ji niha û pê ve karibe têkoşînê bidomîne, mîrateyeke bibe zemînê dîrokî hat çêkirin. PKK'ê hem hebûna Kurdan da qebûlkirin, bi vê re rê li siyaseta demokratîk vekir û hem jî ji bo têkoşîneke demokratîk a hevgirtî daneheveke giring a civakî terxan û dabîn kir.

Xusûsa herî giring a divê mirov balê bikişîne ser wê ev e: Rêbertiya PKK'ê bi vê têkoşînê di dîrokê de cara pêşî 'Aqlê Kurd' çêkir. Di civaka Kurd de hema bêje, aqilê civakî bi temamî ji hev hatiye belavkirin û ji bîra hevpar hatiye birin; Rêbertiya PKK'ê bi têkoşîna meşandî aqlê Kurd ê hevpar ji nû ve bi gewde û bi teşe kir. Heta ku rêûresma civakî ji nû ve nehata şirovekirin, pirsgirêka civakî rast nehata tesbîtkirin, civak ji nû ve ranekirina ser piyan û ew neaniya cem hev, nirxên hevpar tesbît nekirana; stratejiya civakî-polîtîk, armanc û taktîkên ku hewcedariya civakê li vê dunya hemdem bi wan hene diyar nekirana û bi civakê nedana qebûlkirin û di wan de serketî nebûna, mumkin nebû ku aqilê Kurd çêbûya û ev hemû ji erk û wezîfeyên zehmet in. Rêbertiya PKK'ê bi hewldanên xwe yên piralî, bi tehlîlên xwe yên kûr û berfireh, karîbû hem xeteke îdeolojîk hem jî aqlekî hevpar ê Kurd çêke û di vê de bi ser ket.

Dewlemendiya di warê daneheva dîrokî de, têgihiştina komînal, nirx û çand ji wan dewlemendiyan in ku di hebûna Kurd de hê jî hene û dijîn. Tevahiya dîrokê, formê qebîle û eşîrê her tim bi awayekî komînal hebûna xwe dewam kiriye. Di forma qebîleyê de, hevgirtina civakê, wekhevîxwazî û xweparastinê weke şêweyên bingehîn ên tevgerê, hebûna xwe parastine. Di forma qebîle-eşîrê de xwesipartin û xweavêtina çiyê, kiriye ku gelê Kurd bibe yek ji wan gelên ku modernîteya kapîtalîst herî kêm lê bandor kiribe. Ji roja jihevbelavbûna Konfederasyona Medan heta roja îro, pêşengiyeke ku yekîtiya siyasî ya Kurdan pêk bîne derneketiye holê, lê tevî vê, di çarçoveya forma qebîle-eşîrê de bi awayê xwe yê xweser şêweyekî xwe yê xweparastinê pêk anîne û bi vê, hebûna xwe bi giranî parastine; di vî warî de serketina wan, ji bo Têkoşîna Azadiyê bûye mîraseke gelekî giring.

Kurd bi saya têkoşîna PKK'ê bûn hebûn, niha erk û wezîfeya wan e ku vê hebûnê azad bikin. Azadiya hebûnê bi dewleta netewe pêk nayê. Dewleta netewe bi xeta neteweya demokratîk û ya komînala demokratîk a têkoşîna azadiya Kurd re çep e, û tevî vê, bi çanda dîrokî ya civaka Kurd û karakterê wê re jî ne li hev e. Kurdan di tevahiya dîroka xwe de xwe hertim ji şêwazê civak û zêhniyeta dewletperest dûr kiriye. Ji ber ku forma qebîle-eşîrê bi giranî jiyana komînal di nava xwe de dihewîne, bi hezar salan e ku hebûna xwe di nava civaka Kurd de didomîne. Di vê çarçoveyê de em dikarin bibêjin, ji bo civak ji nû ve bicive û bigihîje hebûna xwe, komînalîte wê dîsa bi rola sereke rabe.

Dîroka Kurdan ji îro û pê ve wê dîroka avakirina neteweya demokratîk û komînalîteya demokratîk be. Ev, hem bi dîrok, çand û şaneyên civakên Rojhilata Navîn re, hem jî bi karakterê civakî yê gelê Kurd re li hev e, û rêya herî guncav e.

Beşa Heftemîn
DI DÎROKÊ DE ROL Û CIHÊ PKK'ê

Herçiqasî em weke tevger ji bo azadî û serxwebûna Kurdistanê bi rê ketibin jî di dema koma pêşî ya îdeolojîk de navên weke "Şoreşgerên Kurdistanê" û "Apociyan" ji bo me hatibin hildan jî ji roja damezrandinê ve bi awayekî fermî me navê PKK'ê (Partiya Karkerên Kurdistanê) bi kar anî. Yanî me ji xwe re got, Partiya Karkerên Kurdistanê. Lê ya rastî, diyardeyek bi vî awayî ya sosyolojîk, diyardeyeke bi vî awayî ya civakî tinebû. Lê me navê xwe partiya karkeran danî. Çima? Ji ber ku, li gorî sosyalîzma pêkhatî, li cem her gelî, li cem her neteweyê partiyek wisa hebû; ji Viyetnamê heta bi Kubayê, ji Rûsyayê heta bi Çînê li her welatî partiyeke wisa ya karkeran an jî kominîstan hatibû avakirin. Em di bin bandora wan de man û me dilê xwe bijand wan. Ango me xwest em jî weke wan bin. Me got, "Madem em jî neteweyek in, divê partiyek me jî hebe." Heqê neteweyan ê diyarkirina çarenûsê, partiyeke bi vî awayî û dewleteke netewe ya xwe disipêre vê, ferz dikir. Me jî her tişt bi heman awayî bi van têgînan rave kir.

Çawa ku tê zanîn, partiyên bi vî rengî yên bingehê wan çînî, divê pîvaneke wan, armanceke wan, bernameyeke wan û wekî din jî rêbazeke wan a şer hebe. Ha stratejiya şerê rizgariya neteweyî ev e. Di teoriya sosyalîzma pêkhatî de ev hemû hene; yanî me ji cem wan hazir wergirt. Ya ku me yê bi tenê bikira ew bû, me yê ew rastî, li Kurdistanê tetbîq bikira.

Li Kurdistanê rêxistin û kesên din hebûn ji bo vê biceribînin. Mînak DDKO hebû, lê kir û nekir navê "Kurd" bi kar neanî. Wekî din jî di nîvê salên 1970'yî de ji bo avakirina partiyê wêrekî û degelî lazim bû. Hin şax û dûvikên PDK'ê li Bakur hebûn, lê bi bandor nebûn û bi ser neketin. Sekreterê wê yê pêşî Faîk Bûcak kes nizane kê ew kuşt; du sekreterên wê yên din Saît Kirmizitoprak û Sait Elçî bi hev dan kuştin. Me nav li van rêxistinan kiribû û ji wan re digot, "milletperestên prîmîtîv" yan jî "milletperestên bûrjûwaya biçûk". Bi kurtî, me digot, "Em ê nebin weke wan" û bi vî awayî em bi rê ketin. Herçiqasî me armancên xwe hemû bi cih neanîn jî PKK'ê hebûna Kurdan misoger kir û bi vî awayî mohra xwe li dîrokê da. Dîrokê sedemên derketina holê yên PKK'ê, armanc û pêşbîniyên wê di çarçoveya bûyerên dîrokî de piştrast kiriye.

1-Bi PKK'ê Gavavêtina Hebûna Kurdan

Divê rewşa nîvê salên 1970'yî ji bo Kurdan baş were fêhmkirin. Xweînkarkirin û reva ji xwe gelekî zêde bû. Ya rastî, DDKO ji xwe direviya; ji navê 'Kurd 'direviya, ev nav li xwe nedikir û xwe jê dûr dikir. Jixwe, çepgiran bi piraniya xwe, qala hebûna Kurdan nedikir û navê Kurd

hilnedida û digotin; “Hê dema wê nehatiye” yan jî “kengî sosyalîzm hat avakirin em ê lê bifikirin.” Formulên wan ên çareseriyê ev bûn. Çepgir qaşo ew kes bûn, digotin, “Em di vê meseleyê de hene.” Rêxistinên milletperestên prîmîtîv diyar nebû çi dikirin û tu li wan bigeriya te ew nedidîtin. Tew ji bo şoreşgerên weke me, cih tinebû lê bisitirin. Ma qey em nediçûn cem rêxistinên milletperestên prîmîtîv, nîv-eşîr û nîv-feodal. Rêxistinên qaşo çepgir jî sosyal-şoven bûn; tew nedixwestin navê Kurd jî hildin.

Damezirînerê PKK’ê Abdullah Ocalan, ha di van şert û mercan de, salên 1970’yî xwest bi bandor gav biavêje û veguherîneke dîrokî pêk bîne. Salên 1969’an, wexta ku pirtûka bi navê Elîfbêya Sosyalîzmê xwendibû, gotibû, “Mihemed bi bin ket, Marks bi ser ket.” Lê hê ne di wê rewşê de bû, komekê ava bike, ber bi çepgirî yan jî milletperestiyê ve biçe. Xwe hinekî gurçûpêç kiribû û bi wê karîbû tenê gav biavêje nava dunya salên 1970’yî. Bi herdu aliyan re jî eleqedar dibû. Lê înkarê xwe li her derê alandibû. Te navê xwe jî bigota te yê her tiştê xwe ji dest bida. Jixwe karmend bû, ne mumkin bû ku xwe li tiştekî wisa rakişanda. Salekê li Amedê mabû û gelekî bandor lê kiribû, lê hê jî di wê astê de nebû ku tevlî tevgera Kurd bibe.

Piştî ku derbasî Stenbolê bû, çû cem DDKO’yê û bi vî awayî gava xwe ya pêşî avêt; têgîna “Kurd” li wir bi lêv kir. Cara pêşî Mûsa Anter li wir dît. Mûsa Anter li wir şîret lê kir û got, “Dewlet û çepgir bi hev ketine, em dikarin ji vê sûd bigirin û xwe ji navê derxin, em di vê pevçûna çepgir-rastgir de ji xwe re rêyekê bibînin û ji navê derkevin.” Mûsa Anter welatparêzekî ji can û dil bû. Jixwe ji ber ku wisa bû, ji aliyê kontrayan ve hat kuştin. Nisêbîn xwedî li bîranîna wî derdikeve û ev tiştekî gelekî hêja ye. Belkî jî piştî Şerê Cîhanê yê Diduyan welatparêzekî ciddî yê bi tenê bû. Wê wextê gotibû, “tevlî van karê bi tehlûke nebin, xwe biparêzin” bêguman ev gotina wî gelekî hêja bû. Partî ava nekiribû, lê bi wêjeyê hewl dida ji Kurdan re hin tiştan bibêje.

Bala xwe bidinê, ji înkar û revê zêdetir tiştekî din tineye. Dewlet hakimê her tiştî bû. Ji Başûr nûçeya kuştinê ya herdu Seîdan hatibû û lewma hêviyeke mirov ji wir bikira nemabû. Li Rojhilatê Kurdistanê Qasimlo hebû, ew jî di nava rewşeke bêçare ya bi heman rengî de bû. Di wê demê de kesî xwe nêzî Kurdbûnê jî nedikir.

Rêber Abdullah Ocalan jî tevî şert û mercên heyî xwest gav biavêje. Lewma çû civînekê ku Mahîr Çayan tê de qiseker bû û cara pêşî li wir li wî guhdarî kir. Mahîr Çayan di axaftina xwe ya li wir de gotibû, “Pirsgirêka Kurd heye. Heqê wan ê avakirina dewleteke cuda jî di navê de, divê em her heqê wan qebûl bikin.” Wekî din, li ber dûviktiya bûrjûwayê û pêkhênerên polîtîka revîzyonîst rabûbû û gotibû, “Ne ku em polîtîka revîzyonîst a bûrjûwayê, divê em bi şêweyekî şoreşgerî helwestê nîşan bidin.” Rêber Abdullah Ocalan piştî guhdarîkirina Mahîr Çayan gotibû, “Ha şoreşger divê wisa bin” û helwesta wî ya wêrek bandoreke mezin lê kiribû. Bi vî awayî kêfa wî ji Mahîr Çayan re hatibû.

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, di dawiya 1971’ê û serê sala 1972’yan de ji Stenbolê derbasî Enqereyê bû; ji Fakulteya Huqûqê ya Stenbolê derbasî Fakulteya Zanistên Siyasî ya Enqereyê bû. Wê demê bi vî awayî bû, mirov dikarîbû ji fakulteyekê derbasî yeka din bibe, Mahîr Çayan û Huseyîn Cevahîr jî heman rêbaz bi kar anîbûn. Bêguman eleqeya wî ya ji bo siyasetê kiribû ku Fakulteya Zanistên Siyasî tercîh bike.

Adara 1972’yan, Mahîr Çayan û hevalên xwe, tevî hin kadroyên THKO’yê çalakiyeke giring pêk anîn. Armanca vê çalakiyê, rawestandina darvekirina Denîz Gezmîş û hevalên wî bû. Tevî ku Deniz ne ji rêxistina wî bû, Mahîr bi vê çalakiyê xwest darvekirinê rawestîne. Wexta ku 30’ê Adarê Mahîr û hevalên wî li Kizildereyê şehîd bûn, bi pêşengiya Rêber Abdullah Ocalan li Fakulteya Zanistên Siyasî çalakiyeke boykotê hat kirin. Di vê çalakiyê de Rêber Abdullah

Ocalan hat girtin û bi qasî heft mehan li Girtîgeha Mamakê girtî ma. Di pêvajoya girtîmanê de rastiya şoreşgerî bêhtir ji nêz ve nas kir.

Mijdara 1972'yan, ji ber kêm delîlan hat berdan. Li Enqereyê li nêzî Anitqebrê (Qebra Mistefa Kemal) tevî du hevalên xwe xaniyek kirê kir. Li vir jî hûrûkûr bi meseleya Kurd daket û di warê fikirî de bêhtir kûr çû. Di vê çarçoveyê de fikira "mêhtingeriyê" ango Kurdistan mêhtingeh e, li cem wî bêhtir zelal bû.

Rêber Abdullah Ocalan, paşê Hakî Karer û Kemal Pîr nas kirin û derbasî mala wan a li Bahçelîevlerê bû û bi wan re ma. Fikira "Kurdistan mêhtingeh e" her ku çû li cem wî zelal bû û weke tezekê di qonaxa dawî de bû. Hinekî xwendibû û hinekî jî bûbû xwedî tecrûbe. Li ser vî bingehî gihişt biryarekê û got, "Ez ê bi vê fikirê di vê meseleyê de ku pê re mijûl im, bikevim rê û bimeşim." Em ji bîr nekin ku meseleya Kurd meseleyek wisa bû wê demê kesî newêrîbû qala wê bike û her kes jê direviya.

Rêber Abdullah Ocalan bû endamê DDKO'yê, lê nebû endamê Dev-Genc'ê. Beşdarî kongreya dawî ya DDKO'yê bû û cara pêşî li kongreyekê axivî. Wexta ku cara pêşî çû DDKO'yê Hikmet Bozçali serok bû. Li gorî rêzê, Necmettin Buyukkaya û Mehmet Tuysuz bûn serok. Rêber Abdullah Ocalan di axaftina xwe ya li kongreya DDKO'yê de got, "Em nebêjin meseleya Şerqê em bibêjin meseleya Kurd" û ev gotina wî bû sedema şik û gumanê. Ji ber ku gotina Kurd qedexe bû, her kes difikirî ku 'tenê provokator dikarin bi kar bînin. 'Lê Rêber Abdullah Ocalan pir bi wêrekî têgîna Kurd û Kurdistanê bi kar anî.

Dr. Hikmet Kivilcimli peyamek ji kongreya DDKO'yê re şandibû. Di wê de digot, "ewladên leheng ên Mezopotamyayê." Rêber Abdullah Ocalan ev têgîn jî li ber çavan girt û têgîna "Kurdistan mêtingeh e" bi kar anî. Heta wê wextê her kesî têgînên weke "Rojhilatê Anatolyayê" bi kar dianîn. Lê Rêber Apo pênasekirin û navlêkirinek bi kar anî ku heta wê demê kesî bi kar neanîbû.

Rêber Abdullah Ocalan êdî têra xwe pijiya bû, û piştî ku vegeriya Enqereyê bi hevrêyên xwe Hakî û Kemal re têkiliyeke gelekî ji dil, mîna biracaniyê danî; têkiliyek mîna yekîtiya çepgiriyê bû. Asta fikirî ya ku gihiştibûyê û xwe tê de zelal kiribû, xwest bi wan re parve bike. Lê fikirî ku ya rast ew e, vê fikira xwe, pêşî bi ciwanekî Kurd re parve bike. Wê demê li cem wan xortekî ji Dersimê hebû, navê wî Îbrahîm bû. Got, "her çawa be, ji zemînekî tertele û tevkujî dîtî tê û ji her kesî zêdetir ew ê alîkar be." Bi vî awayî fikirî û jê re got, "Kurdistan mêhtingeh e" û wexta ku wisa got, hema bêje, ji xwe ve çû, bêhiş ket. Paşê ev fikira xwe ji hevalên din re rave kir û li ser vî bingehî xebata xwe ya ji bo çêkirina komekê bi pêş xist.

Têgihiştineke xweser a Rêber Abdullah Ocalan a xweveşartin û ewlekariyê hebû. Çawa ku di tevahiya jiyanê de gelekî hesas bû, di vê babetê de jî têra xwe baldar bû. Bi her kesî re yek bi yek têkilî datanî û fikira xwe bi wan re parve dikir. Welê yeqîn dikir ku heke kesên din kirinên wan bibihîsin, her tişt wê biqede, neçe serî. Lewma mirov çawa ku di guhê hinekan de bi pistepist bipeyive wisa bi dizî xeber dida. Koma Apociyan tevahiya pênc salan hîç qeydeke nivîskî negirt, tenê bi gotinê kar û xebatên xwe meşandin. Bi saya vê rê û rêbazê, heta bi sala 1977'an îstîxbarata Tirkî MÎT'ê ew neşopandin. Tevahiya pênc salan dewletê texmîn nekiribû ku wê Rêber Abdullah Ocalan komekê damezrîne.

Rêber Abdullah Ocalan di tevahiya qonaxên krîtîk de bêhtir bi hisên xwe tevdigeriya û gavên ku kes ne li benda wan bû, diavêtin. Bi saya hisên wî pênc sal xweş derbas bûbûn. Ti rê û rêbazeke din wê derketin û gavavêtina Koma Apocî bi vî awayî serketî nekiribûya. Heke komê kovarek derxistibûya yan jî belgeyeke nivîskî li pey xwe hiştibûya, teqez wê pir zû tesfiye bûbûya. Seba vê, rê û rêbaz gelekî giring e. Heke tu di cihekî tarî de bî, divê tu gava xwe rast biavêjî. Yanî divê tu gavavêtina xwe diyar bikî. Encama herî balkêş a vê ezmûnê ev e.

Em li vir qala îllegalîteyeke teng nakin; divê ev rêbaz weke meşeke rast, mezinbûneke gavbigav û şanebişane were fêhmkirin. Ev tiştekî wisa ye, mîna ku tu tovekî bixî bin axê, ew bibe şitil û mezin bibe. Heke tu hêkê nexî bin kurkê, çêlik jê dernakevin. Piraniya kadroyan weke rêbaz kurkketinê şaş dikin, lewma xira dikin, dirizînin. Rêbaz û şêwazê Rêber Abdullah Ocalan xira nake, narizîne. Şêwazekî şaş nameşîne. Mînak, projeyek, pêşnûmeyek hebe, pêşî dihêle heta ku bisitewe. Li mişarê dihêle, li bendê dimîne bibe şitileke temam û paşê di xetê de diçîne. Ha ji ber vê, di dema damezrandina PKK'ê de guftûgo hatiye kirin "gelo bila bibe rêxistineke ciwanan an jî bibe partî." Yanî ji bo ti tiştî wisa bi carekê û bi hêsayî biryar nehatiye dayîn.

Sala 1974'an, wexta ku ciwanên hîndekariya bilind li Enqereyê xwe bi rêxistin dikirin, Rêber Abdullah Ocalan weke Serokê ADYOD'ê (Komeleya Hîndekariya Bilind a Demokratîk a Enqereyê) hatibû hilbijartin. Li wir cudahiyek weke Kurd û Tirk tinebû û namzetê Dev-Genc'ê hevrê Abdullah Ocalan bû. Namzetê din jî Taner Akçam bû. Heye ku xwendevanan bi sedema fedekarî û duristiya Rêber Abdullah Ocalan ew tercîh kiribûn. Ya din jî Rêber Apo namzetê Fakulteya Zanistên Siyasî bû, Taner Akçam jî namzetê Zanîngeha Teknîk a Rojhilata Navîn bû. Di encamê de Rêber Apo bi ser dikeve. Apocî di nava ADYOD'ê de komeke piçûk a çepgir bûn û digotin, "Kurdistan mêhtingeh e". Rêber Abdullah Ocalan ji rastiya fikirên xwe piştrast bû.

Koma Apoyî di Newroza 1973'yan de bi civîna li Bendava Çûbûkê hatibû damezrandin. Ev, gava pêşî ya ji bo pêkhatina komê bû. Ji vê civînê jî belgeyeke nivîskî tineye û ev jî bi armanca tevdîr û ewlekariyê ye. Li gorî wê rojê, tinebûna defter û qelemê tevdîrek e. Beşdar jî nizanin wê civîn çêbibe. Ji wan re gotibû, "Îro Newroz e, de em herin Bendava Çûbûkê" û bi vî awayî li wir civiyabûn. Bi vî awayî hatina cem hev jî tevdîrek e. Jixwe, ji bilî Rêber Abdullah Ocalan kes nizane bi armanca pêkanîna komê civîn wê were lidarxistin. Û piştî civîna li Bendava Çûbûkê hat eşkerekirin ku êdî ew kom in. Ji ber ku belgeyeke nivîskî tineye, kes nikare îsbat bike ku ew bûne kom. Yanî kesî nikarîbû bigota, "we komeke Kurd ava kiriye." Ji ber ku belge û îsbata wê tinebû.

Dema ku PKK li gundê Fîsê tê damezrandin jî tê guftûgokirin, "gelo em rêxistineke ciwanan an jî partiyê ava bikin". Axir, di encamê de biryar didin partiyê ava bikin. Ji bo beşdarbûna kongreyê ji gelek deverên Kurdistanê beşdar hatine destnîşankirin. Beşdar li gundê Fîsê yê navçeya Licê ya Amedê kom dibin. Wî wextî Pêşnûmeya Bernameyê û Manîfestoya Rêya Şoreşa Kurdistanê hatine amadekirin. Pêşnûmeya Bernameyê weke bersiva şehadeta hevrê Hakî hatibû amadekirin. Beriya van, belgeya bi tenê ya nivîskî, pêşnûmeya ku Rêber Abdullah Ocalan zivistana 1975-76'an bi hevrê Xeyrî Dûrmûş dabû nivîsandin e. Ev pêşnûmeya ku wê paşê di warê xebatên fikirî de rêzanî bikira, veşartî hat hiştin û weke materyaleke nivîskî nehate çapkirin. Lê di çarçoveya fikirên vê pêşnûmeyê de bihara 1977'an li navendên sereke yên Kurdistanê civîn hatin lidarxistin û namzetên kadrotiyê beşdarî van civînan bûn. Piçûk û mezin bi qasî pêncî civînî pêk hatin. Bi van civînan armanc pêkanîna bingehê rêxistinê bû. Li ser bingehê van civînan, 26-27'ê Mijdara 1978'an, bi civîna li gundê Fîsê biryara partîbûnê hat dayin. Herçiqasî derbarê naveroka partiyê û navê wê de demekê guftûgo hatin kirin jî di dawiya dawî de li ser navê PKK'ê (Partiya Karkerên Kurdistanê) biryar hat dayin. Di vê de jî ji Viyetnamê bi bandor bûbûn. Hewce bû ku navê Partiyê hebûya. Ji ber ku înkareke gelekî dijwar hebû.

Jixwe hê mehek nebûbû ku navê partiyê bi awayekî fermî hatibû ragihandin, li rojavayê Firatê komkujiya Mereşê ya bi armanca kokqelandina Kurdan pêkanîn û di vê çarçoveyê de li Kurdistanê rewşa awarte ragihandin. PKK'ê weke partî di warê rêxistinî de hê xwe baş gurçûpêç nekiribû, darbeyeke nû ya eskerî gav bi gav amade dikirin. Gulana 1979'an li Elezîzê

endamên rêxistinê hatin girtin û ji nava wan Şahîn Donmez li ser rêxistinê da. Xiyaneta Şahîn Donmez bandoreke giran kir. Di vê rewşa pêxîrtengî de, Rêber Abdullah Ocalan Tîrmeha 1979'an di sînorê Tirkiyê re derbasî Rojavayê Kurdistanê bû û çû bajarê Kobanê. Darbeya eskerî ya nû ku bi komkujiya Mereşê gavên wê yên pêşî avêtin, 12'ê Îlona 1980'yî pêk hat.

Wexta ku darbeya eskerî ya faşîst a 12'ê Îlona 1980'yî pêk hat, Rêber Apo li Rojhilata Navîn, li Lubnan-Sûrî bi rêxistinên Filîstînê re hewl dida têkiliyên xwe xweş bike. Di vê rewşê de li dijî darbeyê, ji bo demekê kadro vekişandin, wî ew kom kirin, ew perwerde kirin û ji bo ji nû ve wan bişîne welêt, ew gurçûpêç kirin. Li welêt jî sala 1981-82'yan Berxwedana Mezin a Zindanan bi pêşengiya hevrê û heval Mazlûm Dogan, Kemal Pîr, Xeyrî Dûrmûş û Sakîne Cansiz pêk hat. Li qada Rojhilata Navîn Konferansa 1'ê ya PKK'ê û li ser bingehê Kongreya wê ya 2'yan, xeta teorîk û stratejîk a têkoşînê li dijî Darbeya 12'ê Îlonê hat bipêşxistin û perwerdeyeke zêde ya kadro-şervanan hat meşandin. Çawa ku piştî darbeya eskerî ya 12'ê Adara 1971'ê xebateke pêşengî û biserhevdeanîna ciwanên şoreşger ên li Enqereyê hatibû kirin, bi awayekî mîna wê, piştî darbeya eskerî ya 12'ê Îlona 1980'yî xebatek li Rojhilata Navîn ji bo biserhevdeanîna rêxistinên Kurd û Tirk û di bereyeke antî-faşîst de anîna wan a cem hev, di asta pêşengiyê de hat meşandin. Ezmûn û daneheva derketibû holê, ji Payîza 1982'yan û pê ve şand welêt û li dijî darbeya eskerî ya 12'ê Îlonê berê wê da berxwedana gerîla.

Tevî her awa şêweyên şaş ên di pratîkê de ku tevger bi paş ve dixistin, hewldana nû ya ku Rêber Apo xist dewreyê, bi çalakiyên li Dihê û Şemzînanê yên 15'ê Tebaxa 1984'an bi berxwedana gerîla di pratîkê de bi gewde bû. Bi pêşengiya Fermandar Egîd (Mahsûm Korkmaz) berxwedana gerîla ji zor û zehmetiyan hemûyan bihurî; di demeke pir kurt de bandoreke mezin li gel kir; zemînê gerîlabûn û cephebûnê çêkir. Rêber Apo bi xwe Akademiya Mahsûm Korkmaz bi rê ve dibir. Li wir, perwerdeyeke zêde ya teorîk, îdeolojîk û eskerî dida. Bi têkoşîna li vî warî, Gerîlayên Azadiya Kurdistanê her awa çetetî ji nava xwe birin û bi vê performansê sala 1990'î karîbûn gel rakin serhildanê û şoreşa vejîna neteweyî pêk bînin. Serhildana gelê Kurd a bi pêşengiya jinê, di heman demê de radigihand ku şoreşa azadiya jinê jî dest pê kiriye.

Rêber Abdullah Ocalan, encamên hilweşîna Yekîtiya Sovyetê di serê sala 1990'î de û piştî Şerê Kendavê Şerê Başûrê Kurdistanê yê di Cotmeh û Mijdara 1992'yan de tehlîl kirin û li ser vî bingehî nêzîkatiya Serokkomarê Tirkiyê Turgut Ozal jî li ber çavan girt û di 17'ê Adara 1993'yan de cara pêşî agirbest ragihand û bang li rêveberiya Tirkiyê kir ku pirsgirêkan bi rêya siyasetê çareser bike. Ji hin aliyan ve zemînê çareseriyeke siyasî hebû û rewşa pratîk-eskerî jî di wê pozîsyonê de bû, karîbû xwe bide ber çareseriyê. Lê li hundir û derve, hêzên çete û dorberên kurtêlxurên şer, bi hin provokasyonan ber li çareseriya siyasî girtin, hêzên alîgirên çareseriya siyasî jî li Tirkiyê kirin hedef û bi êrişan şerekî taybet ê topyekûn xistin rojevê. Eşkere, piştî vê, her ku biçûya, rewşeke pir giran a şer û rewşeke xwedubarekirî wê derketa holê.

Rêber Abdullah Ocalan, di pêvajoya êrişên nû de, ji aliyekî ve daxwazên xwe yên ji bo çareseriyeke siyasî-demokratîk misêwa nû kirin, ji aliyekî din ve jî ji bo êrişên giran ên bi armanca îmhakirina gel û gerîla bişikîne di nava têkoşîneke gelekî zêde û afirîner de bû. Dorberên kurtêlxur ên derve û hundir nikarîbûn berxwedana gerîla bişikînin û xwe nedan ber çareseriyeke siyasî. Wan sala 1998'an ji rewşa xwedubarekirî û wekhevmanê sûd wergirt, birêxistinkirina komploya navneteweyî ya 15'ê Sibata 1999'an ferz kirin. Ji bo çareseriyeke siyasî-demokratîk, daxwaza Rêber Apo red kirin, lê Rêber Apo karîbû xwe bigihîne Romayê. Hêzên nebixêr û kurtêlxur nesekinîn, 15'ê Sibata 1999'an komploya navneteweyî pîlan kirin û sîstema Îmraliyê deribandin û derxistin holê.

Rêber Abdullah Ocalan, di asta dîrokî de bi guhertina di paradîgmayayê de, bersiv da êrişa komploya navneteweyî û sîstema qirkirinê ya Îmraliyê. Ji bo pirsgirêkên civakî yên ku sîstema dewletê û desthilatdariyê ew derxistine holê û pergala modernîteya kapîtalîst jî ew girantir kirine, bi paradîgmaya modernîteya demokratîk rêyên demokratîk ên civakparêz bi pêş xistin. PKK ji partiyeke dewletperest a netewe û desthilatperest derxist, kir partiyeke demokratîk a civakparêz ku xwe disipêre ekolojiya civakî û azadîxwaziya jinê. Wî çareseriya neteweya demokratîk a pirsgirêka Kurd kir bername, sîstema konfederalîzma demokratîk a xwe disipêre xweseriya demokratîk bi rê xist û li ser vî bingehî bi pêş xistina çareseriyan weke erk zelal kir. Bi vî awayî, ji rewşa bêçare ya dewletperest a netewe bihurî; ji bo çareseriya neteweya demokratîk têkoşîn da ber xwe, li ser vî bingehî sîstema modernîteya kapîtalîst darizand û di encamê de taktîk û stratejiya têkoşîna li dijî komployê derxist holê.

Bi vî awayî, têkoşîna bîst salan û şerê dijwar ê deh salên dawî, herçiqasî ji 1993'yan ve misêwa xwe dubare kiribe jî hewcedariya jinûvetehlîlkirina wê derket holê. Beriya her tiştî şerê qewimî ne bi ser ket, ne jî bi bin ket; ji rewşa wekhevmanê nebihurî û di vê çarçoveyê de her xwe dubare kir û vê rewşa xwedubarekirî û tekrarê tenê çaresernebûn kûrtir kir. Bi vê re, hewce kir ku rewşên teorîk, îdeolojîk, rêxistinî, taktîk û stratejîk ên rê li ber vê vekirin ji nû ve bêne analîzkirin; li gorî vê, hewce kir ku PKK ji aliyê îdeolojîk û stratejîk ve bi temamî ji xeta rizgariya neteweyî qut bibe, hemahengiya di navbera armanc û amûrê de bi temamî were pêkanîn, li ser vî bingehî pêvajoyeke nû ya guhertin, veguhertin û jinûveavakirinê dest pê bike. Herweha vê jî di pratîkê de kir ku cudabûna di navbera komîn û dewletê de, di navbera komîngeriya jinê –ya ku xwestin tine bikin– û revdeya mêrê serdest ê kastîk de ku xwe disipêre nakokiya dîrokî, divê hûrûkûr bihata fêhmkirin; di encamê de hewce kir ku pêkhateya rêxistinî ya PKK'ê û stratejiya têkoşîna çekdarî were bidawîkirin.

Tevî şaşî û kêmasiyan hemûyan jî berxwedana gel û gerîla ya bîstûşeş salan a li dijî komployê, karîbû tevahiya êrişên îmha û înkarê yên dewleta Tirkî bişikîne û wan pûç bike. Bi 'Pîlanê Çalakiya Çokdanîn 'êpir dijwar û hovane êriş kirin, destûra wan a serketinê nehat dayin, berevajî xwediyên êrişê bi xwe ketin tengasiyê. Tevî vê rewşa hundir, li Rojhilata Navîn Şerê Cîhanê yê Sêyemîn xwe da sînorê Tirkiyê; tehlûkeyên ji bo hebûna wê xuya bûn, dewleta Tirkî vê rewşa han ji bo manûnemana xwe weke xeter dît. Lewma dewleta Tirkî, Cotmeha 2024'an bi Devlet Bahçelî dest bi nêzîkatî û vegotineke nû kir. Rêber Abdullah Ocalan jî 27'ê Sibata 2025'an bi Banga Aştî û Civaka Demokratîk bersiv da vê nêzîkatî û vegotina nû ya dewletê. Rêber Apo li ser vî bingehî pêvajoyeke nû da destpêkirin û pêvajo bi nasname kir. Li ser bingehê vê Bangawaziyê, pêvajoya têkoşîna hebûn û azadiya gelê Kurd a bi navê PKK'ê hat bidawîkirin, demeke nû ya dîrokî li ser bingehê Yekîtiya Komînên Demokratîk hat destpêkirin.

2-PKK Li Dijî Înkarê Tevgera Vejîn û Misogerkirina Hebûna Kurdan e

Di vê tehlîlê de pênasekirina "Dîroka Proto-Kurdan" heta tu bibêjî di cih de ye. Dîsa dema "Dîroka Kurd a Sergirtî" jî bi vî awayî ye û serdema navîn pênase dike. Bi modernîteyê re Kurd ketin "Dîroka Tinebûnê", "Dîroka Înkar û Îmhayê". Di vê pêvajoyê de hilweşîn bi lez dibe. Sîstema qebîle û eşîrê belkî Kurd hinekî li ser piyan digirtin, lê jihevbelavbûna bi awayê Kurmancan bi lez bûbû. Li vir, divê mirov bûyera Kurmancbûnê baş fêhm bike. Ya rastî, derketina holê û gavavêtina PKK'ê xwe disipêre Kurmancan û ev giring e. Têkiliya xwe ne bi eşîrê re, ne bi mezhebekî re, ne jî bi malbatekê re heye. Rêber Apo jî di navê de beşekî mezin kadroyên PKK'ê ji malbatên Kurmanc in ku ew malbat bi zor û zehmetî li ser piyan diman.

Baş e, mirov dikare malbatên bi vî awayî weke yekeyeke civakî bibîne? Eşkere ye ku mirov ji wan re nikare bibêje, ev çînek in, dîsa eşkere ye ku ev ne civak û malbat in. Çend xizim û merivên hev hene, lê ew jî dijberên hev in. Malbat bi temamî di nava xwe de ji hev du belav

bûne. Ji zû ve ji hev du belav bûne, ti pîvan û rêûresma eşîrê nemaye. Di heman demê de qebîle jî bi vî awayî ye. Ji wan re dibêjin, “Mala Ocê”. Dibe ku ʻmalbata Oc ʾêqebîleyek be, lê ew jî tenê weke nav heye. Bi îhtîmaleke xurt, şax û milekî eşîra Berazî ne. Bav ji malbatek wisa ye. Dayik jî ji rêûresma Tirkmen tê, lê bûye Kurd.

Eşkere ye ku ev hemû giring in, lê di warê civakî de bandora xwe zêde li ser Rêber Apo tinene. Di tehlîla Rêber Apo ya li ser malbatê de netewebûyîn tine bûye. Çanda klan û qebîleyê jî tineye. Tişta ku heyî “malbatî” ye, ya rastî, ew jî hilweşiyaye, navê wê heye, ew bi xwe tineye. Dema ku Tirkmen tê gotin, ji aliyê dayikê ve pêjna tiştekî heye, lê ew jî bûye Kurd. Ya rastî, bi temamî rewşeke tevlîhev û aloz heye.

Bala xwe bidinê, ji aliyê bav ve, hema bêje, çanda qebîle-eşîrê bi temamî qediyaye. Lewma ji vî aliyî ve tiştekî ku xwe di zarok de nîşan bide tineye. Ya dimîne malbatek e, ew jî ji hev de ketiye, li pêşiya zarok kelem û asteng e. Ev tê wê maneyê, gundekî bi vî awayî, tiştekî ku bide Rêber Apo tineye. Li naverastê gundek heye, haya xwe ji ti tiştî tineye. Gundê ku em qala wî dikin, ti rastiyeke wî ya civakî jî tineye. Ne gundê qebîleyê ye, ne jî gundê eşîrê ye; hema mirov jê re bibêje, “gundê xwe jibîrkirî” duristtir e.

Baş e, di vê rewşê de çi dibe sedem ku bend û sikir ji ber Rêber Apo radibin, çi dibe sedem Rêber Apo derkeve holê? Divê mirov vê rast û durist analîz bike. Di encamê de PKK bi temamî bi îradeya Rêber Apo pêk hatiye.

Eşkere ye ku pir zehmet e; mirov li vir bingehekî civakî bibîne. Di warê dînî de lêgerîna wî heye û gelek dua ji ber kirine. Lê jiberkirina duayan derketina holê ya rêberayetiyê nikare pênase bike. Dîsa rêûresmên gund hene û ev jî hîç bala wî nakişînin. Jixwe terbiya gund û cemaetê qet wî eleqedar nakin. Di nava malbatê de bav dibêje, “min ji vê pîrekê rizgar bike”; dayik jî dibêje, “min ji vî zilamî rizgar bike.” Her yek ji wan pirsgirêkeke mezin e. Lê tevî van hemûyan jî hin tişt kirine.

Bêguman pêvajoya dibistanê giring e. Li dibistanê rewş hinekî diguhere, Kurdbûn cara pêşî weke pirsgirêk derdikeve pêş. Dixwaze bixwîne û bibe karmend, lê dibe xwediyê tirs û fikaran, xwe bi xwe dibêje, “gelo dibe ku Kurdbûn li pêşiya vê bibe asteng?”. Herçiqasî li dibistanê serketî dibe û îmkanên payeberzbûnê çêdibin jî di encamê de asîmîlasyon tiştekî wisa ye ku mirov ji xwebûnê dûr dixîne. Eger mirovî bi pêş nexe, bi temamî ji navê dibe. Ev rewşa ku em işaret pê dikin û hema bêje bi serê her ciwanê Kurd de hatiye, têra xwe bi serê Rêber Apo de jî hatiye. Piştî dibistana navîn li nîveka Enqereyê li Lîseya Pîşeyî ya Tapû Kadastroyê xwend.

Bêguman atmosfera Enqereyê di warê çanda asîmîlasyonê de xurttir e. Heke atmosfera şoreşgerî ya salên 1970ʾyî nebûya, atmosfera Dev-Gencê nebûya, heye ku ji vir gavavêtin çênebûya. Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji Komeleya Têkoşîna Li Dijî Kominîzmê heta bi Ocaxên Ulkuciyan ên li Enqereyê ket her atmosferê û li van deran li hin tiştan geriya, lê nedît. Çavdêriyên wî yên derbarê Dev-Gencê de bêhtir bandor lê kirin û berê wî da aliyê çepgiriyê. Lê ev xusûs hê di wê astê de nebûn ku karibe rêxistinekê damezirîne. Piştî Lîseya Pîşeyî ya Tapû Kadastroyê li Diyarbekir û Stenbolê karmendî kir û paşê ji bo li Fakulteya Zanistên Siyasî bixwîne, careke din vegeriya Enqereyê. Di tevahiya vê pêvajoyê de, eleqeyeke wî ya bi hêz ji bo Dev-Gencê çêbû. Ev tê wê maneyê, heke Tevgera Ciwanên Şoreşger ên Tirkiyê nebûya, belkî jî **Gavavêtina Rêbertiya Apoyî** jî nebûya yanî belkî Rêbertiya Apoyî derneketibûya holê. Ev xusûs gelekî giring e. Hema bêje, Tirkiyeya salên 1970’yî û Dev-Genc di vî warî de bandoreke wan a diyarker çêbûye. Nifşê ciwanên şoreşger ên dunya 1968ʾan yek ji hêmanên giring e ku di derketina holê ya Apoyiyan de xwedî rol bûye. Ev jî xusûsek e ku di rêûresma DEM Partiyê de heye. 2013ʾan, dema HDP hat damezirandin Rêber Apo gotibû, “Ez mîrasa

Mahir dewrî we dikim.” Mîrasa Mahiran a ku tevahiya çil salan hilgirtibû, dewrî HDP’ê kiribû û hişyar kiribû, gotibû, “Alaya ku min dewrî we kiriye, timî payeberz bikin.”

Ji ber vê ye, ji roja damezirandina HDP’ê û pê ve, Çepgirên Tirkiyê di nava wê de cih girtin û têkiliya vê, bi vê mîrasê re heye. Hê di 1974’an de ciwanên şoreşger li ADYOD’ê hatin civandin, 1981-82’yan Bereya Berxwedana Yekbûyî Ya Li Dijî Faşîzmê (FKBDC) hat damezirandin û pê tevgera şoreşger hate cem hev. Lîderên weke Mîhrî Bellî, Teslîm Tore û Taner Akçam di nava vê bereyê de cih girtin. Lê ew çûn Ewrûpayê, Rêber Apo ma û neçû; tercîh kir ku têkoşîna şoreşgerî bi israr li welêt bimeşîne.

Ev tê wê maneyê, salên 1973-75’an di qonaxa çêbûna komê de, têkildarî têkiliyên me yên bi çepgiriyê re, em dikarin qala mîraseke Dev-Gencê bikin. Yanî di salên 1970’yî de derketina me ya holê encama pratîka Dev-Gencê ya van salan e. Kesayeta pêşeng a vê pratîkê jî Mahir Çayan e. Derdikeve holê ku yek ji stûnên bingehîn ên ku PKK xwe disipêriyê, ev e. Li salên 1972-73’an, di gavavêtina ber bi çêkirina komê de bîranîna Mahir giring e. Ev şehadet bêqedr ji bîr neçûne, bi çêbûna Koma Apoyiyan bi qedrê van bîranînan hatiye zanîn. Jixwe, di nava tevgerê de ciwanên Kurd ên weke Omer Ayna û Huseyîn Cevahîr di asta pêşengiyê de hene, yanî mirov dikare qala yekîtiyeke Kurd û Tirkan bike. Bi Kemal Pîr û Hakî Karer re ev yekîtî derbasî nava Koma Apoyî bûye ango Kom li ser bingehê yekîtiya Kurd û Tirkan hatiye damezirandin.

Çawa ku tê zanîn, bi vê komê, sala 1978’an gava partîbûnê hat avêtin. Li vir xala esasî ew e, em dibêjin, “Hema gavek be jî bila PKK çêbe”. Di vê çarçoveyê de me digot, “Me şitila xwe danî, êdî wê mezin bibe”. Lewma hîç xema me nebû, em ê bijîn an jî nejîn. Yanî em dibêjin, Newroza 1973’an li Bendava Çûbûkê tovek hatiye danîn, ew jî bûye şitil û me ew jî sala 1978’an di nava axê de çandiye; ‘êdî divê ew mezin bibe’. Fikira me, hestên me û nêzîkatiya me bi vî awayî bûn.

Bêguman di derketina Rêber Apo ya ji Enqereyê de têkiliya wî ya bi Kesîre Yildirim re giring e. Li Enqereyê ev têkiliya wî çêbûbû. Tevî ku aliyê wê yê hestyarî hebû, aliyekî wê yê din ê giring hebû; bû bersiva pirsa ka di nava rêxistinê de cins wê çawa bi hev re hebin. Di heman demê de têkiliyeke wisa bû ku her kes nexwedî wê hêzê bû ku wê çareser bike û ji navê derkeve. Hatibû bihîstin û dihat zanîn ku malbata Kesîreyê li Dersimê di nava xiyanetê de ye. Weke herêm ew û heval Mazlûm Dogan nêzî hev bûn. Herdu jî xwedî wan xisletan bûn ku hewce dikir, mirov bi wan re eleqeder bibe û wan qezenc bike. Tevlîkirina heval Mazlûm zehmet nebû, lê Kesîre bi îhtiyat bû. Bi qasî ku xuya dikir, jineke xwedî xisletên Kurdîtiyê bû. Lewma eşkere bû ku Rêber Apo dixwest wê tevlî bike. Di nêzîkatiya wî de hestyariyek hebû ku pêkan bû, li cem her kesî hebe. Di axaftina xwe ya ligel Kesîre de gotibû, “Temam tu jî dikarî tevlî komê bibî, lê tu dikarî tiştekî weke nîşaniyê bikî, tu dikarî vê bi min re jî bikî û tu dikarî bi kesekî din re jî bikî.” Difikirî ku wê di rewşeke berevajî de li nava komê bibe xwedî roleke xirakirinê.

Malbata Kesîreyê, ya ku berê li Dersimê bû, hatibû Enqereyê. Yek ji helwestên herî ciddî yên Rêber Apo têkilîdanîna bi vê malbatê re bû. Di salên 1976-77’an de hema bêje, herdu salan bi vê meseleyê pir mijûl bû. Ji destpêkê ve têkiliyeke bi pirsgirêk bû. Ne qebûlkirin hebû, ne jî tam redkirin hebû. Bi temamî pirsgirêk bû. Bavê wê Alî Yildirim, yek ji wan kesan bû ku yekser bi Îsmet Înonî re têkilî danîbû; li Dersimê bi Kemalîstan re tevgeriyabû. Ji bo Rêber Apo gotibû, “Me ev zilam li mala xwe hewand da ku em wî ji van karên bi tehlûke dûr bikin.” Lê diyar nebû ku Kesîre çiqasî bi zanebûn di nava meseleyê de ye. Heke di asta jor de ji bo bêbandorkirina Rêber Apo biryar dabin, ne zelal e, ka rola Kesîre di vê de heye yan na.

Alî Yildirim ji destpêkê ve, têkiliya Kesîreyê bi Rêber Apo re erênî nedîtibû û eşkere gotibû, ew vê têkiliyê qebûl nake. Jixwe zewaca bi Kesîreyê re tiştekî sembolîk bû. Di vê têkiliyê de hin armancên Rêber Apo hebûn; pir bi serwextî nebe jî mîna ku di nava xwe de bibêje, "ev têkilî ji min re lazim e". Jixwe gelek kes vê xusûsê fêhm nakin. Naxwe têkiliyên bi vî awayî ji bo Rêber Apo di wê karakterê de bûn, bivênevê lazim bûn. Bêguman nefikirî û negot, "ev malbateke dewletê ye, ez ê wê bi kar bînim". Herweha mesele ne ew hest bûn ku nikarîbû ji wan bigere. Lê ji bo Koma nû ya pêkhatibû, têkiliyeke bi vî awayî hewce bû. Axir, di bûyera PKK'ê de ev mesele cîhekî xwe yê krîtîk heye.

Lê Kesîre hema bêje ji destpêkê ve bi awayekî nedîtî hewl dida Rêber Apo têk bibe. Yanî ji bo vê di nava tevgerê de bû. Gelo bi rastî, hewl dida wî bi bin bixe, yan jî bi van kirinên xwe dixwest nîşan bide 'ev têkilî çima nabe ku bimeşe'? Heta niha rastiya vê bi temamî nehatiye fêhmkirin. Deh salên bi Kesîreyê re weke deh salên manûnemanê bûn. Lê di navbera salên 1977-87'an de PKK bi saya vê têkiliyê li ser piyan ma. Lê vê têkiliyê Rêber Apo gelekî tengav kiribû. Heval Cemîl Bayik û Kemal Pîr vê rewşê dibînin û di nava xwe de dibêjin, "Em Serokatiyê ji vê rewşê rizgar bikin" û bi vê yekê jî biryar didin ku Kesîreyê ceza bikin, lê paşê ji hev du re dibêjin, "teqez tiştekî ku Serokatî dizane heye" û bi vê hizirê dev ji cezakirinê berdidin. Yanî vê têkiliyê Rêber Apo ewqasî xistibû zorê û tengav kiribû.

Ji Harpagos ve di dîroka Kurdistanê de têgihiştinek heye. Yanî "Harpagostî" ew e; heta ji te tê ji yên din re xizmetê bike. Di vê çarçoveyê de nakokiyeke Harpagos hebû. Em ji vê re dikarin "Sendroma Harpagos" jî bibêjin. Xuya bû ku ya qewimî jî Sendromeke Harpagos bû. Baş e, mirov çawa dikare xwe ji vê rizgar bike? Ha meseleya esasî jî ev e. Vê sendromê di dîroka Kurd de zirareke mezin daye. Sendromeke 2500 salî ye û nexweşiyeke ciddî ye.

Bêguman, em van hemûyan diyar dikin da ku em dema analîza PKK'ê bikin, em bi temamî bi duristî bikin û em maneyeke temam lê bar bikin. Ji bo xusûsên ku em di wan de xapiyane ji holê rakin û hin kêmkurtiyan li dawiyê bihêlin, van hemûyan pênase dikin. Belkî hewceyî bi vê têkiliyê tinebû, lê bû. Çima? Ji ber ku ev hakimên Kurdistanê bûn. Wan xwe wisa didît û ti carî nedixwestin serdestiya xwe bidin kesên din. Heke ev nehata dîtin û bi têkoşînê ew li dawiyê nehatana hiştin PKK nedihat avakirin. Bihata avakirin jî wê şaş û kêm bûya.

Li vir, xusûsa ku divê em ji hev derxin û rohnî bikin ev e: Xuya ye ku teqez wê ev têkilî bihata pêşiya me. Aliyê wê yê hestyarî jî wê pêk bihata. Ji bo vê jî mirov dikare bibêje, bêwext û zû qewimî, mirov dikare bibêje, "bi awayekî pir bi tehlûke pêk hat", dîsa mirov dikare bibêje, "Kom, ji bo vê ne amade bû". Diyar e ku mirov dikare van gotinan û yên weke wan bibêje. Lê têkiliyeke wisa wê her pêk bihata û mirov vê mecbûriyetê nikare înkar bike. Ji ber ku nexşeya Kurd, mentalîteya Kurd bêyî vê nabe. Yanî dibêje, "hakim û serdestên vir em in". Dibêje, "Heke partî jî hebe, bêyî me nabe". Dibêje, "Heke serokatî jî hewce be, em serok in. Tu kî yî?". Kesîre ji bo Şahîn Donmez dibêje, "Mîna kûçikên li ber deriyê me bû, me hestiyên xwe didanê". Wî beşî pozîsyon û cîhê xwe wisa diyar dikir.

Jixwe van beşên hevkar digot, "Ax û civak em in." Xwe weke ajan jî nedidîtin. Ha arîstokrasî tam jî ev e. Tarik Ziya Ekîncî ji bo begên Licê wisa gotibû, "Ev beg xwe Kurd nabînin. Li gorî wan Kurd ew kes e, kole ye, tê xebitandin, virde wirde baz dide suxreyan. Li gorî vê tebeqeyê Kurd kûçikên ber deriyê wan in." Ev gotinên wî gelekî manedar in. Tevahiya têkoşîna zor û zehmet a Rêber Abdullah Ocalan ji sala 1977'an heta bi 1987'an meşand, hemû ji bo eşkerekirina rûyê rastî yê vî beşî bû.

Rêber Abdullah Ocalan, ha li dijî vî beşî têkoşîneke gelekî mezin meşand. Divê tevahiya kadro, Dersimî û jin, mezinahî û giringiya vê têkoşînê pir baş fêhm bikin. Têkiliya ku heval Kemal û Cemîl ji bo wê digotin "Mirov nikare bîstûçar saetan xwe lê ragire", Rêber Abdullah

Ocalan çawa tam deh salan îdare kir? Ha pirsa ku divê rast were fêhmkirin û bersiva wê rast were dayin, ev e. Dema ku cara dawî ji Rêber Abdullah Ocalan vediqete, dibêje, “Ma qey ez ji bo te marê reş im? Netirse ez bi te venadim, te jehrî nakim.” Jixwe bi giştî helwesta Kesîreyê bi vî awayî ye. Jixwe piştî vê pênaseya xwe bi çilûpênc rojan li Atînayê ji holê wenda dibe, diçe.

Ev bûyera ciddî, şerekî mezin û şerekî psîkolojîk ê pir zor e. Têkoşîna di navbera Rêber Apo û Kesîre de şerekî rêbertiyê bû. Ha divê ev heqîqet rast were fêhmkirin. Kesîreyê ji Rêber Apo re digot, “Tu nikarî vê têkiliya me bi kar bînî û pê PKK’ê bi rê ve bibî.” Ha heqîqeta eşkere û tazî ev rastî ye. Pir eşkere ye, heke ku Rêber Apo di vê têkoşînê de bi ser neketa, Dersim wê nebûya, Dersim wê bi temamî biqediya. Lê di vê meseleyê de neheqiyek li Rêber Apo tê kirin û tê gotin, “Malbateke ku evçend neheqî li Dersimê kirine, te çima tercîh kir.” Bi vê gotinê, Rêber Apo tê rexnekirin! Jixwe ev ew rastî ye, ya ku Rêber Apo ew qebûl kiriye û pê re şer kiriye, Rêber Apo kiriye rêber û serok. Ji damezirandina PKK’ê heta bi 1987’an şerê rêbertiyê bi vî awayî dewam kiriye. Kêliya ku reviya, barekî giran ji ser milê Serok Apo rabû û di warê derûnî de xwe rehet his kir; weke ku ji bin barekî derketibe, xwe sivik his kir.

Rêber Apo niha dîsa bi heman awayî xwe sivik his dike. Îca jî ji ber ku karîbû xwe ji rewşa asêbûyî ya PKK’ê rizgar bike. Şerê Kesîreyê kirî, bi rastî jî şerekî zor û zehmet bû, mirov ji taqetê dixist û têra xwe dihilhiland. Kengî Kesîre piştî şerê deh salan reviya, hingê hevkarî jî bi wê re nema û li dawiyê hat hiştin. Niha di meseleya PKK’ê de jî têkiliya sosyalîzma pêkhatî û bûrjûwayê li dawiyê tê hiştin. Bêguman tehlîlên di vî warî de gelekî giring in. Mirov dikare ji tehlîlên derbarê derketina holê ya PKK’ê û sedemên derketina wê de têra xwe hîn bibe.

Kurd gelekî wiha ye ku hatiye înkarkirin. Me ji xwe re got, em PKK ne, bi vî awayî me nav li Kurdan kir, hem me partî ava kir û hem jî me ev yek weke sosyalîstan kir. Bi partiyeke bi vî awayî di nasnameya Kurdan de hem hebûn hem jî azadî di zikhev de hatiye hebandin. Di encama têkoşînê de hebûn tê misogerkirin, lê sosyalîzm yanî azadî nayê bidestxistin. Ji bandora xisletên navxweyî yên sosyalîzma pêkhatî, sosyalîzm bi ser neket û hilweşiya. Lewma li Rûsyayê jî hilweşiya, li Çînê jî hilweşiya.

Li vir, rewşeke Kurdbûnê heye ku bi temamî hatiye înkarkirin. Li dijî înkarê, em hebûnê bi partiyeke hem sosyalîst û hem Kurdistanî disipêrin ontolojiyê, antropolojiyê û sosyolojiyê. Bala xwe bidinê, me di meseleya Kurdan û PKK’ê de kîjan Kurd ji xwe re kirin esas? Bêguman me Kurdên Kurmanc kirin esas. Ha ev gelekî giring e. Dêhna xwe bidinê, bingehekî ontolojîk, antropolojîk û sosyolojîk heye. Ragihandina PKK’ê di vê çarçoveyê de ye. Heke ku em bi van têgînan dakevin, em ê bibînin ku me hebûna Kurdan misoger kiriye. Yanî Kurd hene û hebûna wan misoger e. Ev, serketineke PKK’ê ye, di asta zaferê de ye. Destketiyeke wê ya antropolojîk e, destketiyeke ontolojîk e, lê desketiyeke sosyolojîk nîne; yanî azadî bi dest neketiye. Çima? Ji ber ku bi sosyalîzma pêkhatî azadî bi dest nakeve. Ji ber ku wilo bû, ji ber sedemên navxweyî sosyalîzma pêkhatî hilweşiya.

PKK’ê jî bi şerê bi Kesîreyê re hebûn bi dest xist. Kurd hemû di rastiya jinê de bi bin ketine, lê berevajiyê wan li cem Rêber Apo hebûn bi dest ketiye, bi ser ketiye. Em li vir, careke din li çîrokên Mem û Zînê, li Derwêş û Edûlê vegerin. Ya rastî, di van serhatî û çîrokan de bûyereke sosyolojîk heye û em hewl didin rave bikin. Ev sosyolojî nayê zanîn. Ev “Sosyolojiya Mirinê” ye. Xuya ye ku ev sosyolojî neyê vejandin wê înkara Kurdan bi dawî nebe, Kurd ê neveje, hêlîna Kurdan wê bi sihet û tekûz nebe. Hemin ev rewş tenê xweserî Kurdan e. Cihû dibêjin, “Qirkirin bêhemta ye, mînakeke wê li cem xelkên din tineye.” Maneya vê ev e; bûyereke mîna vê neqewimiye, tekane ye. Çawa ku mînakekî wê tineye, ev sosyolojiya Kurdan jî bûyereke tekane ye û di ti kitêbê de mînakê wê tineye.

Ha hewce bû ku Rêbertiya PKK'ê ev çareser bikirana. Saziya ku em jê re dibêjin "Rêbertiya PKK'ê" heke ku ev çareser nekiribûya wê pêk nehatana. Kadroyên PKK'ê jî nikarin vê girêhişkê vekin. Bêguman hewldaneke berbiçav heye, lê nikarin vekin; jixwe girêhişka kadroyan bi xwe jî ev e. Lê divê ev girêhişk were vekirin û çareserkirin. Jixwe, rastiya rêbertiyê çareserî ye. Heke kadroyek vê ji can û dil his neke, ne mumkin e ku bi ser bikeve. Di zêhn û bîrê de tiştekî wisa tineye. Ji ber ku tineye, nayê fêhmkirin. Lê rastiya Rêbertiyê jî dibêje, ji ber vê sedemê, tevahiya dîroka antropolojî û ontolojiya Kurdan, heta bûyerên çandî yên Kurdan li xiyanetê qewimîne. Ji ber vê nakokiyê, Kurdbûn ji Kurdbûnê derketiye, bûye kelax û gewdekî di nava kul û birînan de ye.

Em ber bi salên 1970'yî ve tên, înkar bi awayekî mutleq serdest e. Ha Rêbertiya PKK'ê ev kun kiriye. Ji vê re çi tê gotin bila were gotin, hûn dixwazin bibêjin destan, teorî, sosyalîzm, welatparêzî, axir hûn çi dibêjin bibêjin, lê Rêbertiya PKK'ê ev kir. Ev tê wê maneyê, PKK tevî rewşên neyênî û dijberiyan hemûyan jî tevgereke mezin e. Ji înkarê gav avêtiye hebûnê ango gav avêtiye dîrokê. Ev karekî pir zor e. Serokatiyên berê yên Kurdan nekarîn tiştekî wisa bikin. Her gavavêtina serokên Kurdan di nava du mehan de hilweşiyaye û mîrasa hiştine jî bêhtir hilweşîner bûye. Her berxwedan û her têkçûna bi wê re hatî, parçeyekî din tine kiriye û di encamê de tiştekî bi navê Kurd li naverastê nemaye. Hûn çiqasî bi dîroka mîrtî û eşîrtiyê dakevin, bivênevê hûn ê bi encamê re rûbirû bibin. Ha tişta ku jê re dîroka Kurdan tê gotin ev e. Rêbertiya PKK'ê li dijî vê şer kiriye û di encamê de rêyek dîtiye. Bêguman li vir nayê gotin, "divê her kes rêyekê bibîne". Ji ber ku ev xusûsek e, tenê bi kesekî tê biserxistin. Tişta ku Rêber Apo dike rêber jî ev e.

Rêber Apo, deh sal bi vî awayî bi Kesîreyê re derbas kirine. Di nava komê de du alîkarên sereke yên Rêber Apo hene û ji bo vê rewşê çareseriya wan dîtiye ew e, dibêjin, em Kesîreyê ceza bikin! Baş e, heke wan wisa bikira wê çi bûbûya? Belkî jî kom wê demê wê biqediyana. Heke hûn bibêjin, "em her kesê neyênî bikujin" ev nabe çareserî. Jixwe, ji dîrokê jî tê zanîn ku ev ne ti rê ye. Ne tenê kuştin, qewitandin jî çareserî nîne. Axir, di encamê de şerê hebûnê yê PKK'ê bi şêwazê Rêber Apo bi ser ketiye. Lê bi sosyalîzma pêkhatî azadî bi dest neket. Bidestneketina azadiyê, xusûsek e ku bi temamî bi cewherê sosyalîzma pêkhatî re têkildar e.

Bêguman, şax û rahendekî din ê şerê bi Kesîreyê re têkildarî tevgera azadiya jinê û têkoşîna wê ye. Ev jî herî kêm bi qasî şerê rêbertiyê giring e. Jixwe têkoşîna azadiya jinê û şerê rêbertiyê weke yek bûyerê ne, her du di zikhev de pêk hatine. Xisleta cihêwaz a Rêbertiya PKK'ê ew e, xeta azadiya jinê daniye û karîbûye wê bi pêş bixe. Ev jî têkildarî têkoşîna bi Kesîreyê re bi pêş ketiye. Bi têkoşîna li dijî têgihiştin û şêwazê tengavker, arîstokrat û hevkar ê Kesîreyê, Rêbertiya PKK'ê xet û têkoşîna azadiya jinê derxistiye holê û bi pêş xistiye. Bi pêşengiya tevgera azadiya jinê, bibinneketina Rêbertiya PKK'ê hatiye misogerkirin.

Ya rastî, xusûsa ku herî zêde divê rast were fêhmkirin û bipêşdebirin, ev xusûs e. Çawa ku bi Kesîreyê re têkoşîneke rast nehatibûya meşandin, Rêbertiya PKK'ê wê bi pêş neketibûya, bi heman awayî, heke têkoşîneke rast nehatibûya kirin, xet û têkoşîna azadiya jinê jî wê nehatibûya bipêşxistin û ew ê heta roja me ya îro nehatibûya. Heke ev jî nebûya, PKK'ê wê xwe negihandibûya hêza guhertin û veguherînê ya roja me ya îro. Xuya ye ku rola bingehîn a tevgera azadiya jinê di guhertina paradîgma û bidestixistina hebûnê de lîstî, wê ti carî kêm nebe, di têkoşîna ji niha û pê ve ya bidestxistina azadiyê de jî pozîsyona wê ya pêşengiyê wê bidome.

3-Modernîte û PKK

PKK'ê di gavavêtina xwe ya pêşî û derketina xwe ya holê de bingehê civakî yê xwe sipartê Kurmanc bûn. Kurmanc, ne eşîr, ne çîn, ne arîstokrasî, bûrjûwa yan jî bûrjûwaya piçûk e. PKK

tevgera kesekî ye, yê ku ji nava malbateke Kurmanc a hilweşiyayî û jihevbelawelbûyî derketiye û karîbûye culhetî gavavêtinê bike. Di pêvajoya pêşketina xwe de jî Kurmanc kirine esasê xwe. PKK ne li cem qebîle û eşîran, li keviyên bajaran li nava feqîr û hejaran, li nava karker û rêncberan, li nava girseyên ji gundan koçberî metropolan bûyî, bi pêş ket. Paşê di nava eşîran de bi pêş ketiye. Çi wexta ku salên 1990'î bûye hêz, wê wextê jî di nava eşîran de cihekî xwe çêbûye. Çawa ku roj gerstêrkên dorbera xwe dikişîne, mirov dikare PKK'ê jî bi heman awayî pênase bike.

Li vir, pirsa ku divê mirov bike ev e: Gelo PKK tevgereke modern e, yan jî çiqasî modern e? Ji ber ku xeta sosyalîzma pêkhatî kir esasê xwe, ev jî nîşan dide ku ew teqez xwedî karakterekî modern e. Ji ber ku PKK'ê xwe sipart vê xetê, têgînên wê hemû yên sosyalîzma pêkhatî bûn. Weke xet modern e; lê nava wê bi proto-Kurd, bi Kurdê sergirtî û Kurdê înkarkirî tijî ye. Di qonaxên dîrokî de çiqasî Kurd hebin, hemû di nava wê de hene. Yanî ji Nebî Nûh ve Kurd hemû di nava PKK'ê de ne. Helbet ev jî dihêle ku şerê navxweyî di nava PKK'ê de biqewime. Şerê navxweyî yê PKK'ê bi cewherê xwe ev e.

Ev tê wê maneyê, şerê navxweyî yê PKK'ê ne şer û pevçûneke wisa sivik û besît e. Ji Semîr heta bi Kesîreyê, ji Şemdîn heta bi Botan bi sedan mînakên bi vî awayî hene. Diyar e ku tevahiya nexweşiyên ku di hebûna Kurd de hene, derbasî nava PKK'ê bûne. Înkarkirin jî di nava van nexweşiyan de ye. Tevahiya hesabpirsîna ji derve jî derbasî nava PKK'ê bûye. Eşkere ye ku bihevduketin û xwelihevrakişandineke mezin pêk hatiye û ji nava wê PKK sax derketiye. Rewşeke bi heman rengî di dîroka Çînê de jî heye. Mao jî gotiye, "Di dîroka Çînê de çiqasî nakokî hene, hemû derbasî Partiya Kominîst bûne. Û ev şer wê bi sedsalan dewam bike." Ev tesbîta Mao rast e, û bi vî rengî em jî pê re ne.

Yek ji encamên ku divê mirov ji sosyalîzma pêkhatî derxe ew e, şerê çînî bi dawî nebûye. Me ev rastî di rewşa berbiçav a Kurdan de bi awayekî pir balkêş dît. Li cem me, ev rewş bi awayekî pir dijwar, pir bi awayekî rezîlane û heta bi awayên biçin xiyanetê, têgihiştinên li derveyî azadiyê hatin ceribandin; lê yek ji wan jî bi ser neket. Axir, di encamê de em gihiştin qonaxekê ku em bi îradeya xwe dawî li hebûna rêxistinî ya PKK'ê bînin; navê vê jî serketin e. Bêguman mirov dikare navekî li bûyera fesixkirinê ya PKK'ê bike. Em dikarin ji vê rewşê re bibêjin, "Temenê xwe temam kir" yan jî di çarçoveya heman maneyê de em dikarin bibêjin,"wextê xwe temam kir". Ji ber ku eger em israr bikin, heye ku ev rêya asê bûye, me bixeniqîne. Ya din jî tiştekî me bi dest xistibe hebe, dibe ku em wî jî ji dest bidin. Ev, tesbîteke gelekî giring e. Ji ber ku mirov di tiştekî wextê wî derbasbûyî de ango mîadê xwe temam kirî de israr bike, dibe ku mirov yê bidestxistî jî ji dest bide.

Ya rastî, lazim bû ku me di nîvê salên 1990'î de nuqte daniya, bi dawî bikira. Têkiliya bi modernîteyê re jî bi vî awayî ye. Me bi modernîteya kapîtalîst re şer kir, me bi şêwazê wê yê înkarê re şer kir. Di vî şerî de me hebûna xwe bi dest xist. Eşkere ye ku ev destketineke mezin e. Bi amûra heyî ji vê zêdetir me nikarîbû bi dest bixista. Ev jî zelal e. Niha, tişta ku em dikin, hûn dixwazin jê re fesixkirin bibêjin, yan jê re temenê xwe temamkirin bibêjin yan jî jê re bibêjin wextê xwe, mîadê xwe temam kiriye bibêjin, axir em çi bibêjin jî em bi vê tiştekî wenda nakin. Berevajî, em ji bin barekî giran derdikevin. Ev barê giran belesebeb xwînê dirijîne, badilhewa moralê diçilmisîne û cîwarê teng dike. Dibe ku çawa Mao bi "Şoreşa Çandê" kir, di encamê de ya heyî biqede û di dawiyê de radestî kapîtalîzmê bibin. Heke ku em jî dewam bikin, ev encam li benda me ye. Di vê çarçoveyê de fesixkirina PKK'ê giring e.

4-Destketiyên PKK'ê

Me li jor rave kir ku PKK di bidestxistina hebûna Kurd de bi rola bingehîn rabûye. Têkoşîna PKK'ê bi her kesî da gotin, "Erê, Kurd heye". Di serdema modern de îsbatkirina hebûna

Kurdan, pêkhatin û çêbûna wan jî bi saya têkoşîna PKK'ê ye. Ev, destketiya herî dîrokî ya PKK'ê ye. Di vê de bi ser ket û mohra xwe jî li binê vê serketinê danî. Lewma PKK êdî bûye malê dîrokê.

PKK rêxistinek e, di serdema modern de înkara Kurdan bi erdê re kiriye yek. Hebûna Kurdan di PKK'ê de gihişt maneya xwe ya dîrokî. Dîroka PKK'ê, dîroka îsbatkirina hebûna Kurdan û avakirina wan e. Maneya têkoşîna PKK'ê ev e, û divê maneyeke din tê de neyê dîtin. Baş e, çiqasî xwe û Kurd kirin wekhev? Yanî Kurd û PKK bûn wekhev? Bêguman ev jî gelekî manedar e, û wekhevbûna ku em qala wê dikin, bi awayekî serketî pêk hatiye. Di warê hebûna xwe de serwext bûye û di vî warî de bi ser ketiye. Baş e, vê rastiyê, karîbû dîroka Kurdan a hemdem û bîrbirina wê derxîne holê? Erê, derxist holê. Mîrasa dîroka PKK'ê bidestxistina hebûna Kurdan e. Giring e ku mirov vê destketiyê xurt bike û bihêle ku bi vî awayî di dîrokê de cih bigire. Dîroka PKK'ê weke hebûnekê di dîroka Kurdan de cihê herî manedar girtiye. Hem li dijî înkar, asîmîlasyon û tinekirinê, hem jî li dijî qirkirin, kokqelandin û qirkirina civakê, dîroka hebûnê ye û di vî warî de bi ser ketiye.

Ji ber ku PKK'ê temenê xwe temam kir, divê fesix bûbûya. Em bi vê îqna bûn. Hem ji bo bihurîna ji sosyalîzma pêkhatî û hem jî ji bo bihurîna ji înkar û qirkirina li Kurdistanê, hewceyî bi vê heye. Hilweşîn û têkçûna paradîgmaya ku navenda wê sosyalîzma dewletê, bi temamî di PKK'ê de jî xwe nîşan daye. Ev tê wê maneyê, ev bingehê ku PKK'ê ji xwe re kiriye esas, yanî sosyalîzma dewletparêz a netewe, pîvaneke sosyalîst a rast nebûye. Ji ber ku hîmê wê yê îdeolojîk nerast bûye û rê li hilweşînê vekiriye, divê em biguherin. Tiştekî di vir de neyê fêhmkirin nîne.

PKK'ê ji bo îsbatkirina nasnameya Kurd şer kir û di encamê de îsbat kir. Ya rastî, bi giranî ev hat kirin. Baş e, azadî hat bidestxistin? Na! Ji ber ku sosyalîzma pêkhatî, ne ew sosyalîzm e ku azadiyê bi dest ve bîne. PKK jî rêxistineke sosyalîzma pêkhatî bû, lewma nikare azadiyê pêk bîne. Û jixwe derket holê ku nikare pêk bîne. Lê dikarîbû nasnameyê çêke û di pratîkê de jî ev kir. Bi vê jî PKK bi kêra dîroka pozîtîv hatiye. Seba vê, ji bo bihurîna ji PKK'ê hem di warê naverokê de û hem jî di warê şêweyê de hewceyî bi fikaran nîne. Heta pêwîst bû ku di nîvê salên 1990'î de ev bihata kirin; lê ji ber sedemên cuda ev nehat kirin. Xuya ye ku îro fesixkirina wê dereng e, lê manedar e. Em di vê de ti pirsgirêkê nabînin. Lê hinekan bihurîna ji PKK'ê pir bi kêfxweşî pêşwazî kir, hew nema bifirin. Ev kêfxweşî ji xeyaleke pûç û biberbaketinê wêdetir ne tiştek e.

Têkoşîna çekdarî jî me ji sifirê da destpêkirin û me Kurd kişandin navê. Em vê jî înkar nakin. Hemin sedemên vê hene. Rêbazeke bingehîn a bi vî awayî, di dema gavavêtina pêşî û derketina holê de bi giştî hewce bû. Ji ber ku têkoşîna rizgariya neteweyî ya xwe sipartibû stratejiyeke armanca wê dewleta netewe serdest bû. Ya rastî, di vê stratejiyê de rizgariya çekdarî jî heye. Di dema nû de bi destberdana ji dewleta netewe, bi xwe re destberdana ji şerê rizgariya neteweyî ya çekdarî jî tîne. Ji ber ku bernameya partiyê ya li ser bingehê dewleta netewe di rewşeke asêbûyî de ye. Ji ber vê sedemê, stratejiya têkoşîna çekdarî yan jî şerê rizgariya neteweyî ku rêbaza bingehîn a wê bernameyê ye, divê li dawiyê bêne hiştin. Li gorî hewcedariya yekîtî û hemahengiya di navbera armanc û amûrê de, wexta ku armanc were terikandin hewce ye amûr jî were terikandin. Di vê çarçoveyê de, em stratejiya têkoşîna çekdarî jî diterikînin.

Têgîna "partiyê" têgînek e, hewce ye ku mirov wê bixe ber lêpirsînê. Jixwe partî têgîneke çînî ye, û ji bo çînê bigihîne desthilatê tê avakirin. Yanî di navbera desthilat û çînê de pirek e. Niha em hewce nabînin ku vê têgînê bêhtir xurt bikin yanî weke berê em alîgirê vê nînin. Partî bûyereke çînî ye, û meseleya çînî xurt dike. Di vê çarçoveyê de, em dest ji têgihiştina çîn-partiyê dikişînin. Hem di çarçoveya rexnekirina raboriyê de û hem jî di çarçoveya xêzkirina

perspektîva dema bê de, pêşniyazeke me ya weke “em partiyeke nû ava bikin” wê tinebe. Divê mirov li şûna partiyê li tiştekî din bifikire. Divê mirov partiyê weke amûrekî zorker û li ser bingehê çînî zorê dide civakê bibîne û di vê çarçoveyê de divê mirov wê weke amûreke pirsgirêkê kûr û asê dike bibîne; wisa pê dakeve. Amûra partiyê ya heyî, sedema bingehîn a jihevdeketina sosyalîzma pêkhatî ye. Bi qasî ku em dizanin, ehlên fikirê yên din jî ev tesbît kirine, lê wan nikarîbûye çareseriyekê bibînin. Em ê partiya li ser bingehê çînî hem rexne bikin û hem jî em ê guftûgo bikin ka li şûna wê çi deynin.

Têgihiştina rêxistinê ya li ser bingehê çînî, di binketin û jihevdeketina sosyalîzma pêkhatî de yek ji hêmanên herî giring e. Problematîka herî giring a Marksîzmê ye. Di heman demê de têgîna çînê ya Marksîzmê jî bi pirsgirêk e. Yanî ne tenê têgîna partiyê, têgîna çînê jî weke teorî bi pirsgirêk e. Jixwe, proletarya pîşesaziyê, herî zêde bi kêra faşîzmê hat. Kesê ku herî zêde çîna karker a Elman bi kar anî, Hîtler bû. Ev beşa ku em jê re çîna karker dibêjin, ji sosyalîzmê zêdetir ji faşîzmê re bû bingeh. Hê jî rastgiriya nû xwe disipêre vî beşî, van karkeran; weke ku gelek kes yeqîn dikin xwe nasipêre çîna bûrjûwayê. Herî zêde ev beş destekê dide ‘rastgiriya nû’. Divê mirov vê baş ji hev du derxe. Jixwe li Tirkiyê jî herî zêde partiyên bûrjûwayê û AKP’ê karker bi rê xistin. Hema bêje, pratîka nîvsedsalê ya Tirkiyê li naverastê ye. Em nikarin ji van hemûyan re bibêjin, “propaganda ye” û derbas bibin. Baş e, rêxistina çînê çima bi pêş nakeve? Şaşî di kû de tê kirin? Eşkere ye, li ti deverê partiya karkeran bi pêş neket. Li Elmanyayê bi pêş ket, lê ew jî partiya bûrjûwayê bû, ne partiya karkeran bû. Li cem Bolşevîkan jî pratîk bi heman awayî bû; komeke piçûk a elît kar meşand, nebû partiya girseya karkeran. Eşkere ye ku divê em vê diyardeya Marksîst bi temamî di ber çavan re derbas bikin. Em ê ji têgîna çînê ya Marksîzmê bibihurin. Di sosyalîzma pêkhatî de me ji pêkhatina partiyê re got, “proto-dewlet”. Partî bû organîzasyoneke proto-dewletê. Ev rewş sêsed salan bi vî awayî bi pêş ket. Xuya ye ku divê em rexne li vê rewşê bigirin.

Tevahiya sosyalîzma pêkhatî, ceribandina di sala 1848’an de, Komîna Parîsê ya di 1871’ê de, Şoreşa Ûris a di nava şert û mercên Şerê Cîhanê yê Yekemîn de derket holê, Şoreşa Çînê ya piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn pêk hat, paşê Şoreşa Viyetnamê, ev hemû li ser bingehê şer çêbûne. Hemûyan jî sîstema kapîtalîst bi pêş xist. Herçiqasî serketina sosyalîzmê ya xwe disiparte zorê hat ragihandin jî ji hemûyan kapîtalîzm derket holê. Di serî de jî Çîn; di şerekî mezin de bi ser ket, lê niha di kapîtalîzmê de welatê herî li pêş e. Kesî ji der ve Çîn nekişand nava kapîtalîzmê; berevajî Partiya Kominîst bi xwe ji vê re pêşengî kir. Hê jî vê rola xwe dewam dike. Hemin ev hemû ne xweber in.

Helbet divê alternatîveke van jî hebe. Weke alternatîvekê, em li şûna dewleta netewe ya sosyalîst derbasî sosyalîzma civaka demokratîk dibin. Diyar e ku ev bernameyeke nû ye, bernameya Sosyalîzma Civaka Demokratîk e. Ev bernameya nû, **bernameya Sosyalîzma Demokratîk û Civaka Demokratîk** e. Bêguman wê di stratejiya vê de stratejiya şerê rizgariya neteweyî tinebe. Me ji stratejiya şerê rizgariya neteweyî dest kişand. Em ê li şûna wê **stratejiya siyaseta demokratîk** deynin. Siyaseta demokratîk stratejiyek e, ji bo civaka demokratîk bivênevê ye. Civaka demokratîk têkiliya xwe bi stratejiya siyaseta demokratîk re heye. Çi di Destûra Bingehîn de çi jî di qanûnan de, li kû çi hewce bike wê were pênasekirin. Bêguman, du stûnên sereke yê vê stratejiyê wê hebin. Stratejiya siyaseta demokratîk wê xwe bisipêre huqûqa hevgirtî û xweparastinê; li ser vî esasî wê bibe xwedî hêza pêkanînê. Helbet ev stratejî wê bi awayekî piralî û bi taktîkên afirîner were pêkanîn. Ya ku vê pêk bîne jî wê huqûq be. Ev tê vê maneyê: Ji mîrasa PKK’ê çi ma be, wê di bin vê stratejiya siyaseta demokratîk a nû de karaktera huqûqî bi dest bixe.

Di encama muzakereyan de ku wê bi dewletan re were meşandin, qanûnên antî-demokratîk wê rabin, reformên huqûqî wê bêne kirin. Divê ev, ne li nava demê belav bibe û

dirêj bajo, divê di demeke maqûl de were kirin. Heke reformên huqûqî yên me li jor çarçoveya wan diyarkirî neyên pêkanîn, wê wextê atmosfera şer bivênevê wê bi awayên nû dewam bike.

Di dema nû ya dîrokî de ji bo gavavêtina qonaxa aştî û civaka demokratîk, fesixkirina PKK'ê hewce ye. Ji bo ku em derbasî demeke nû bibin, em PKK'ê fesix dikin. Hin dînamîkên di nava dewletê de fesixkirinê weke ku em xwe tine dikin, fêhm dikin. Di nava me de jî hinek wê weke xwemehrûmkirina ji parastinê fêhm bikin. Lê ya rastî, ev derketina ji rewşa asêbûyî ye. Fesix, ne bidawîbûnek e, gavavêtina pêvajoyeke nû ya têkoşîn û rêxistiniyê ye. Di pêvajoya nû ya têkoşînê de, ne şer wê aştî, ne dewleta netewe wê civaka demokratîk were avakirin.

Formulasyona vê jî zelal e. Weke alternatîva dema yekemîn, pêşî bi kongreyekê PKK wê were bidawîkirin, paşê weke alternatîv, bernameya civaka demokatîk wê were çêkirin; hem ji bo bernameya wê, hem ji bo stratejiya wê, hem jî ji bo huqûqa wê, divê biryarên hewce bêne dayin. Bêguman biryarên ku li ser vî bingehî bêne dayin wê xwedî xisleteke dîrokî bin.

Pêdiviya Kurdan bi azadî û demokrasiyê pir aktuel e. Êdî pirsgirêka me ya hebûnê bi awayekî esasî çareser bûye. Her kes hebûna Kurdan bi awayekî ji awayan kêm zêde qebûl dike. Lewma şerê hebûnê êdî wê neyê kirin. Niha mesele azadî û demokrasî ye. Mînak, Kurd wê çawa bibin civakeke demokratîk? Ew ê çawa azad bibin? Ha pêşengiya kadro wê di vir de roleke xwe ya mezin hebe û **Tevgera me ya Hevrêtiya Komînalîst** wê di çarçoveya van pirsan de bi meseleyê dakeve. Demokrasiya komînal mijara sereke ye, ya ku em ê li serê qiyametê rakin.

Demokrasiya komînal a li ser bingehê azadiya jinê, bi tevahî komînalîzm e. Em ê ji hebûnê xwe bigihînin azadî û komînalîzma demokratîk. Eşkere ye ku Civaka Demokratîk, hewceyiya xwe bi Siyaseta Demokratîk û Huqûqa Demokratîk heye. Babetên teorîk wê li bin van sernavên sereke bicivin û li ser wan hûrûkûr bibin. Em ê modela wê ya rêxistinê jî deynin holê. PKK diçe, baş e, ev valatiya çêdibe wê bi kîjan modela rêxistinê were tijîkirin? Bi gişt modela rêxistinê û rêxistinbûnê wê di mîhwereke aştî û demokrasiyê de be.

Aştiya civakî giring e; ji bo sosyalîzma demokratîk were avakirin divê pirsa aştiya civakî ji hev were derxistin. Aştiya civakî, bi şer nabe. Di jihevdeketina sosyalîzma pêkhatî de jî ev bi vî awayî bû. Sosyalîzma pêkhatî, ji ber ku xwe sipartibû şer, hilweşiya. Çawa ku tê zanîn, Mao dibêje, "Desthilatî bi devê tivingê ye". Lê bi devê tivingê sosyalîzm nayê avakirin. Bi devê tivingê dewlet tê avakirin, dewleta netewe tê avakirin, û ev jî nabe sosyalîzm. Jixwe hewldan û ceribandinên bi vî awayî bi bin ketine.

Bêguman xweparastin her tim hewce ye. Xweparastin bi huqûqê dibe, bi siyaseta demokratîk dibe. Wexta ku her çi hêzek bi armanca îmhakirina hebûnê êriş bike, hingê heqê hebûnê yê serhildanê çêdibe. Ji bo aştiya civakî jî ev pîvan pir giring e. Di tevahiya muzakereyan de em ê li vê pîvanê xwedî derkevin. Di çarçoveya Sosyalîzma Demokratîk de jî xweparastin giring e.

Ev, beşê polîtîk ê modela rêxistinbûna nû ye. Li gelemperiya Kurdistanê, yekîtî wê çawa çêbe? Li çar parçeyan yekîtî wê çawa were pêkanîn? Ji bo van kongreyên cuda, bernameyên cuda hewce dikin. Bernameyên li Sûrî, li Iraqê, li Îranê û li Tirkiyê wê cuda bin. Heta, navê partiyên cuda wê hewce bike. Ev ew nirx in ku me li ser yekîtiya Kurdan saz kirine.

Li şûna rêxistineke wext û mîadê xwe temam kiriye, ji niha û pê ve, em ê navê "**Yekîtiya Komînên Demokratîk ên Kurdistanê"** bi kar bînin. Ev vegotin hemû, di encamê de ji bo çêkirina kadroyeke û kodroyekî afirîner û bipêşxistina tevgera hevrêtiya komînalîst e. Komînalîzm çi ye? Komîn çawa têne avakirin? Çend komîn pêwîst in? Divê em bi şev û roj li ser bersiva van pirsan hûr bibin û bixebitin. Divê kêliyeke kadro jî vala neçe. Li naverastê berpirsiyariyeke giran heye. Wexta ku em razên jî divê em li teorî û pratîkê bifikirin. Ev ne

karekî rûtîn ê burokrasiyê ye; ev kar afirîneriyê ferz dike. Di çarçoveya van analîzên teorîk de bipêşxistina pratîkê erk û karê kadroya û kadroyê afirîner e.

Beşa Heştemîn
ERK Û XISLETÊN DEMA NÛ

Wexta ku PKK cara pêşî di atmosfereke pir hişk a înkarê de derket holê bi sloganeke ji du peyvan pêkhatî berê xwe da afirandina dîrokê û çêkirina rastiyê. Di atmosfera înkar, îmha û asîmîlasyonê de bi têkoşîna xwe, pratîka revê ya ji hebûnê ku li cem Kurdan bi pêş diket, berevajî kir û pêvajoyeke nû ya dîrokî da destpêkirin. Tevî ku di warê xwegurçûpêçkirinê de kêmasiyên wê hebûn, ji bo heqên bingehîn ên Kurdan bi dest bixe, li ser hîmê stratejiya têkoşîna çekdarî şerekî bi bandor û dijwar kir. Derbên mezin li înkar û koletiya rizadilî da ku dagirker û dijminan rê lê vedikir. Di encamê de PKK'ê erka xwe ya dîrokî bi cih anî û rastiya ku em jê re dibêjin ʻhebûna Kurdan ʾhem îsbat kir hem jî kir ku ev rastî were qebûlkirin. Bi vî awayî, rastiya ku em jê re dibêjin, hebûna Kurdan an jî hebûna neteweyî derket holê. Di vê qonaxê de ku em gihiştinê, gelê Kurd diyardeyeke dîrokî ye û kes nikare înkar bike. Qonaxek temam bû, di vê qonaxê de hebûna Kurdan hat qebûlkirin, qonaxa niha qonaxa azadiyê ye. Divê êdî azadî were bidestxistin.

Damezirînerê PKK'ê Rêber Apo, paradîgmaya desthilatperest û dewletperest guhert û bi paradîgmaya demokratîk, ekolojîk û azadîxwaziya jinê ku bi pêş xistiye, di PKK'ê de rê li ber guhertinên bingehîn vekiriye. 27'ê Sibata 2025ʾan bi "Bangawaziya Aştî û Civaka Demokratîk" jî guncav dîtiye ku bernameya partiyê ya ji sosyalîzma pêkhatî mayî û stratejiya wê ya xwe disipart şerê rizgariya neteweyî bi dawî bike. Di çarçoveya vê bangê de PKK'ê bersiv daye, 5-7'ê Gulanê Kongreya xwe ya 12'ê pêk aniye; tê de pêkhateya xwe ya rêxistinî bi dawî kiriye. Bi vî awayî serdema PKK'ê qedandiye û ew di nava rûpelên dîrokê de bi cih kiriye. Ev tê wê maneyê, ev destpêkeke nipînû ye û gavavêtina qonaxeke nû ya dîrokê ye. Bername û teoriya dewletparêz a netewe û sosyalîzma pêkhatî tevî stratejiya şerê rizgariya neteweyî wê li dawiyê bêne hiştin, li şûna wan teoriya modernîteya demokratîk, bernameya civaka demokratîk û stratejiya siyaseta demokratîk wê bêne bipêşxistin. Karaketerê dema nû yê teorîk, stratejîk û bernameyî bi vî awayî ye.

Dema raborî, bi stratejiya şerê rizgariya neteweyî şêweyê çalakiyên hilweşîner kiriye esas û bi vî awayî demeke hilweşîner a şoreşê pêk hatiye. Dema nû, bi stratejiya siyaseta demokratîk, şêweyên çalakiyên pozîtîv wê esas bin û bi wan dema çêker û avaker a şoreşê

wê pêk bê. Di vê çarçoveyê de pêvajoya nû, pêvajoya avakirina demokratîk e. Ji bilî çalakiyên xweparastinê yên li hemberî êrişên bi armanca îmhayê, divê şêweyê tevahiya rêxistin û çalakiyan xwedî karakterê çêker û avaker bin. Em ji vê re dibêjin, qonaxa pozîtîv a şoreşê yan jî 'şoreşa pozîtîv'.

Yek ji têgînên herî giring û nû yên pêvajoya avakirinê têgîna şoreşa pozîtîv e. Ev, têgihiştineke nû ya li şoreşê ye. Ne teoriya hilweşandinê, teoriya avakirinê ye. Tevahiya şoreşan bi giştî hilweşîner in. Bi bidestxistina desthilatdarî û dewletê re avakirin esas e. Cudahiya şoreşa pozîtîv ew e, bêyî ku xwe bi dewlet û desthilatdariyê bike, neteweya demokratîk û civaka demokratîk a ku xwe disipêre komînalîzmê, ava dike. Yanî em ê dunya xwe bi xwe ava bikin. Ne bi xirakirinê, dewlet wê li dawiyê were hiştin, bi avakirina komînalîzmê dor li dewletê wê were tengkirin. Sosyalîzm rastiyeke Rojhilata Navîn e, reh û rîşên wê, qurmê wê li vir e. Komînalîzma demokratîk an jî sosyalîzma demokratîk tenê dikare li vir bipişkive, hêşîn bibe.

Rastiya avakirinê ya ku jê re şoreşa pozîtîv tê gotin, xwe disipêre modernîteya demokratîk. Modernîteya sosyalîst a demokratîk, li dijî kujerê kastîk ku versiyona wî ya roja me ya îro modernîteya kapîtalîst e, li ser bingehê parastin û xwedîderketina li nirxên jiyana komînal, civakîbûnên pêkhatî pênase dike. Li dijî sê lingên dustanê yên modernîteya kapîtalîst, sê pîvanên bingehîn ên modernîteya demokratîk an jî komînalîteyê hene: Li dijî dewleta netewe neteweya demokratîk, li dijî kapîtalîzmê komînalîzma demokratîk û li dijî endustriyalîzmê eko-ekonomî. Kapîtalîzm pergala talan û şêlandinê ye; li dijî vê hêza wê ya xeternak û tineker, di dema nû de ji bo hebûn û heyînê hewce ye ku mirov civakê bi komînalîteyê biparêze. Di komînalîteya demokratîk de israr, ji her demê zêdetir di mirovbûnê de israr e.

Şaneya kok a sîstema civaka demokratîk komîn e. Komîn paradîgmaya bingehîn e, fikira esas e, û ew civak e ku xwe bi rê ve dibe. Çawa ku dîrokeke dewletê heye dîrokeke komînê jî heye. Çawa ku sîleha kapîtalîzmê dewleta netewe ye, sîleh û pîvana damezirîner a gelan jî komîn e. Şoreşa esas bi avakirina komînê çêdibe. Her polîtîka, her gav, her tişt divê di mîhwera komînê de were bipêşxistin. Jiyana azad a gelan wê bi komînê pêkan be. Xwezaya sosyalîzmê xwe disipêre komînê. Mîhwera dema nû wê bi avakirina civaka komînal a demokratîk çêbe.

Di warê polîtîk de ji rêveberiya desthilatdar derbasbûna rêveberiya demokratîk, ji bo sosyalîzmê pîvaneke bivênevê ye. Ev pîvan, ji têgihiştina dewleta netewe gavavêtina nava têgihiştina neteweya demokratîk û gavavêtina nava amûrên wê yên polîtîk pênase dike. Ji bo sosyalîzmê dewletperestî û desthilatperestî çala mirinê ye û tevdîra li dijî vê nexweşiyê komînalîte ye. Ji bo gavavêtina nav komînalîteyê, divê sosyalîzm ji nexweşiya desthilatperestî û dewletperestiyê were paqijkirin û di vê çarçoveyê de mirov sosyalîzmê bi heq bigihîne cewherê wê yê demokratîk.

Jiyana komînal şêweyê jiyanê yê bi tenê ye ku ferdan ji têkiliyên malbatperest û dewletperest rizgar dike; wan giştî dike, dike endamên malbata mirovatiyê. Millet, dewleta netewe û versiyonên wan, mirovatiyê dabeşî koman dikin, şeqkirina ku bi destê kujerê kastîk dest pê kiriye, kûr dikin. Têkiliya komînal jî rê vedike da ku civak ji nû ve bigihîje nirxên xwe. Mirov çareseriya pirsgirêkên civakî herî baş bi komînalîteyê dikare pênase bike.

Kesayeta komînalîst kesayeteke wisa ye, ji jiyanê zewq digire. Her cihê ku diçiyê komînekê çêdike yan jî cîhgirtina di nava komîna heyî de weke erka xwe dizane. Kesayeta ku karibe ruh û hewaya komînalîst di xwe de ragire û pêk bîne, ew ê karibe mirovan ji aliyê rûhî û zêhnî ve li dora komînekê bi rêxistin bike. Kesayeta ku dortengkirina dewletê weke bahane nîşan bide ew hê bi rastî nebûye kesayeteke komînar. Dewlet her ku hewl bide dorê li

komînê teng bike, komînar jî wê bi dorfirehkirina komînê dortengkirina li dewletê bike armanc. Komînarekî ev ruh û zêhn di xwe de çêkiribe, wê weke erkeke xwe komînalîzmê ji nû ve bixe rojeva civakê û pêk bîne.

Avakirina komînê girêdayî kesayeta komînalîst a demokratîk e. Têgihiştina çîna navîn a desthilatperest û dewletperest, kesayeta wê û şêweyê wê yê jiyanê divê bi temamî li dawiyê were hiştin. Heta şoreşa kesayeta komînalîst-demokratîk pêk neyê, komîn nayê avakirin. Lewma divê kadro beriya her tiştî xwe ji serî heta binî biguherîne û veguherîne. Di vê çarçoveyê de divê di dema nû de kadro xwe li ser xeta komînalîst-demokratîk bi rexne û xwerexnekirineke jidil xwe biguherîne û bi vî awayî, xwe bike endamekî serketî û hevgirtî yê tevgera hevrêtiya komînalîst. Xwe li gorî zêhniyeta komînalîzma demokratîk, kesayet û polîtîkaya wê ya pratîk çêdike. Li derfet û îmkanan nagere, ew bi xwe îmkanan diafirîne. Ew bi cewherê xwe, gotina xwe û pratîka xwe, dibe yek. Xwe digihîne kesayeta kolektîv, hevrêyê xwe yê pê re dimeşe, heramoyî û veder nake. Xwe yê herî rast nabîne, her tim nefsa xwe dixe lêpirsînê; xwe di pozîsyona xwerexnekirinê de dihêle û dilnizm dibe. Gilî û gazinan nake, xemsariyê nake, karê xwe paşguh nake, çi hewce be wê dike. Hem bi xwe dixebite hem xebatan bi hevrêyên xwe re parve dike. Ji ser ta pê, etîk û estetîkbûnê esas digire. Kêliyekê bi tenê jî hebûna Kurdan a di nava pencê qirkirinê de ji hişê xwe dernaxîne û bi vî awayî diçe ser kar û dixebite. Bi awayekî komînal û sade dijî, li xwe daneyne hin tiştên piçûk ên mirov hînî wan bûne bike, û çav bernade tiştên maddî yanî nefsa xwe kor dike. Li dijî her cure ferdperestiyê têdikoşe.

Di dema têkoşîna nû de, di her warê jiyana civakî de komîn wê bêne pêkanîn. Ji bo civak li ser dînamîkên xwe bi xwe mezin bibe, şertê bingehîn xwebirêxistinkirin e. Divê ev awa xwebirêxistin weke tenduristî, ekonomî, dîplomasî, polîtîka û xweparastin li nava tevahiya hêmanên neteweya demokratîk were berfirehkirin. Tebeqe, cins, bawerî û milletên cuda yên heman çarenûsa civakî-dîrokî parve kirine, li bin banê neteweya demokratîk dikarin di nava van komînan de xwe bi rê bixin. Komîn wê xwe li gorî pîvana neteweya demokratîk bi rê bixe; ji jêr ve bi hezaran komîn wê bi awayê matrûşka xwe bi rê bixin ango bi awayê komîn di nava komînê de pêk bên. Matrûşka her yek ji wan komînek e, hemû di nava hev de komîneke din pêk tînin. Sîstema komînalîteyê ji tevn û toreke rêxistinî ya bi vî awayî pêk bê.

Hêmana mak û damezirîner a modernîteya demokratîk jin e. Tevahiya dîrokê weke hêza pêşeng a civaka komînal jin bi rola xwe rabûye. Civaka dayikê ya bingehê civakîbûnê ye, li ser van erdan derketiye holê û xwe çêkiriye. Di dîroka civakê de mêhtinkariya pêşî di warê cins de pêk hatiye. Nuqteya pêşî û bingehîn a şikestxwarinê qirkirina cins e; di şexsê jinê de çanda civakîbûna azad qir kirine. Jin, bi têkoşîna azadiya jinê û mîrasa PKK'ê afirandî, bûye hêza pêşeng; bi awayekî balkêş xwe gihandiye asta neteweyî, herêmî û cîhanî. Di dema nû de, jina ku di avakirina azadiyê de bûye hêza sereke, wê pêşengbûnê bidomîne.

Komînalîte wê bi hewldan û keda jinê were avakirin û wê wekhevbûna wan misoger bike. Her ku jin bibin îrade, ew ê mêran jî bikişînin nava esasên jiyana komînal. Heta ku jin bi hêz nebin, beşdarbûna mêran a nava avakirina civakîbûnê wê li gorî nirxên komînal nebe. Beşdarbûna nava avakirina civakîbûnê divê bi awayekî azad, bi serwextî û bi îrade be. Wexta ku jin komînalîteyê bi pêş bixin, ew ê hem hîmên têkiliyeke rast a jin û mêran deynin, hem jî ew ê ji nû ve bigihîjin xwezaya xwe. Di komînalîteya demokratîk de, mêr wê ji mêrtiya xwe ya serdest, jin jî wê ji jintiya xwe ya ji rêûresmê derkevin û her du wê li gorî pîvana hevjiyana azad tevbigerin.

Ciwantî ne diyardeyeke fizîkî ye, nasnameyeke civakî ye. Ewqasî jêhatî ye ku dikare bi dînamîzma xwe destanan binivîse. Bi karakterê xwe yê şoreşger, afirîner, nûxwaz, li guhertin û veguherînê vekirî, hêza rêveber a civakê ye. Wexta ku jiyana bi rêbaz û bi armanc weke

disiplînê bibîne û seferber bibe, dîsa wexta ku sebir û israrê kêm neke, xwedî wê hêzê ye ku ji dozên dîrokî re pêşengiyê bike. Mîraseke bêhempa ya ku bi têkoşîna ciwanên Kurdistanê pêk hatiye, rê vekiriye da ku nifşekî ciwanên pêşeng, çêbe. Di xebatên avakirina komînalîteyê de berpirsiyarî û rola pêşeng a ciwanan wê diyarker be. Têkoşînên civakî, yên ku ciwan ji wan re pêşengiyê bikin; bi ruhê xwe yê tevlî bikin, bi dînamîzma xwe ya rê bidin ber, bi helwesta xwe ya afirîner a wê bidin pey xwe û bi enerjiya xwe ya naqede, teqez wê çareseriyê bînin û bi ser bixin. Ciwan wê bi vê serwextî, îrade û baweriyê bizanibin ji dema nû re pêşengiyê bikin û di rênîşandana serketinê de diyarker bin.

Pîvana ku rê bide ber têkiliyên me bi dewletên netewe re entegrasyona demokratîk e. Em dikarin ji vê re çareseriya entegrasyonîst jî bibêjin. Rêber Apo di parêznameyên xwe de ev rewş weke 'dewlet + demokrasî' formule kiribû. Heke mirov dev ji dewleta netewe berde û li şûna wê bernameya neteweya demokratîk bi cih bike, hewce dike ku mirov pir zêde û pir bi xwestek, hertim û domdar têbikoşe. Hewce dike ku her sosyalîst xwedî şêwazekî bi vî awayî yê têkoşînê be. Entegrasyona demokratîk wê di teoriya sosyalîzmê de şiroveyeke nû bi pêş bixe. Nexasim di têkiliyên civak û dewletê de, di çareseriya pêvajoyên bi şer de û di avakirina civakî de wê weke kategoriyeke bingehîn cihê xwe hebe. Di heman demê de çareseriyeke herêmî jî wê hebe. Îro li Rojhilata Navîn atmosfera şer û pevçûnê gihiştiye asta xwînrijîn û hovîtiyê; ji bo ev atmosfer bi dawî bibe, modeleke çareseriyê ye.

Çareseriya entegrasyona demokratîk xwe disipêre rêbaza muzakereyên demokratîk. Muzakere, ji pêdiviya berpirsiyariyeke exlaqî û siyasî ye. Muzakere û diyalog, dikin ku pêşdadwerî û jihevnepiştrastî kêm bibe, hevdufêhmkirin xurt bibe, cihêkarî kêm bibe û ji bo şer bi temamî bi dawî bibe, zemîn amade dikin. Eşkere ye ku li cografyayeke mîna Rojhilata Navîn ku pirsgirêk bi şiddetê têne tepisandin, divê her cure pirsgirêk bi muzakereyên demokratîk û lihevkirinên demokratîk bêne çareserkirin. Di dema nû de yek ji rêbazên sosyalîst ên çareserkirina pirsgirêkan jî rêbaza muzakereyên demokratîk e.

Teoriya dema nû modernîteya demokratîk e. Em dikarin vê weke sosyalîzma demokratîk yan jî modernîteya komînalîst jî pênase bikin. Bernameya polîtîk a dema nû, pêkanîna civaka demokratîk yan jî avakirina neteweya demokratîk e; stratejiya wê, siyaseta demokratîk e ku xwe disipêre xweparastinê û huqûqa hevgirtî; çarçoveya wê ya taktîk, her şêwe çalakiyên çandî, siyasî, civakî û demokratîk in ku piraniya wan pozîtîv in û ji bo serketina stratejiya siyaseta demokratîk xizmetê dikin.

Bernameya polîtîk, wan erkan diyar dike ku wê tevgera civakî pêk bînin. Stratejî, ji bo biserxistina van erkan rêya herî kurtebirr pênase dike. Taktîk jî ji bo serketina stratejiyê, gavên ku divê bêne avêtin di nava xwe de dihewîne. Li ser bingehê van, ew ê gelekî baş û bikêrhatî be ku em erkên polîtîk ên ku divê tevgera komînên demokratîk pêk bîne û ji bo serketina wan erkan stratejî û taktîkên ku divê bêne meşandin, bi kurtî rave bikin.

1-Bername

Di dema nû de bernameya me ya polîtîk avakirina civaka demokratîk yan jî neteweya demokratîk e. Ji bo were fêhmkirin, em ê sernav bi sernav bi armancên bingehîn ên avakirina civaka demokratîk dakevin.

a) Armancên Siyasî

Mebest ji armancên siyasî, şêweyê rêvebirina civaka demokratîk e. Slogana me ya bingehîn ev e: "Sosyalîzma dewleta netewe mirov dibe binketinê, sosyalîzma civaka demokratîk mirov dibe serketinê!". Çawa ku me di beşên têkildar de diyar kir, sosyalîzma

pêkhatî em ber bi fikira dewleta netewe ve birin û bi vî awayî, em ketin rewşeke asêbûyî. Em bi bernameya "Civaka Demokratîk" ji vê rewşa asêbûyî derdikevin. Em ji têgihiştina neteweya bûrjûwayê ber bi têgihiştina neteweya demokratîk ve diçin. Em qala desthilata dewletê nakin, em qala avakirina warê siyasî yê neteweya demokratîk, civaka demokratîk dikin.

Heke neteweya demokratîk zêhniyeta modernîteya demokratîk be, bi gewdebûna wê jî armancên wê yên siyasî ne. Em ji vê re jî dikarin bibêjin, komîna komînan, komînalîte, yekîtiya komînan û koma komînan. Lê divê mirov vê, bi têgîna dewletê re tevlîhev neke. Komîn, pêdiviya bingehîn a civakê ye, xwerêvebirina wê ye. Komîn, şaneya kok a neteweya demokratîk e. Heke şane ne tekûz be, gewde jî wê ne tekûz be. Ji lewra komîn pir giring e, bivênevê ye.

Ji bo civakekê, erka bivênevê, exlaqî, zanistî û estetîk xwegihandina hêza xwerêveberinê ye. Civakeke di vê erkê de biserneketî, pêşketina wê ya exlaqî, zanistî û estetîk jî ne mumkin e, herweha bi sazîbûn û pêşketina wê ya siyasî û ekonomîk jî ne pêkan e. Civakên ku xwe negihînin xwerêveberiyên xwe, bivênevê wê di encama polîtîkayên mêhtingerî, asîmîlasyon û qirkirinê de tine bibin.

Rêveberiya desthilatdariyê di civakê de çiqasî antî-demokratîk be, xwerêveberî jî ewqasî demokratîk e. Rêveberiyên temam desthilatdarî çiqasî dijberiya demokrasî û dûrxistina civakê ji rêveberiyê pênase bikin, xwerêveberî jî berevajî çiqasî civakê beşdarî rêveberiyê bikin ewqasî demokratîkbûnê pênase dikin. Di vê çarçoveyê de mirov dikare demokrasiyê weke xwerêveberiya ku civak beşdarî wê dibe, pênase bike. Di xwezaya xwerêveberiyê de demokrasî heye. Ji civaka klanê ya herî piçûk heta bi civakên neteweyî yên herî berfireh, erkeke domdar û berfireh dibe, pênase dike.

Di şert û mercên kapîtalîst de berê her neteweyê didin dewleta netewe û ji bo netewebûnê jî dewletbûnê weke qanûneke gerdûnî diyar dikin. Li hemberî vê, avakirina neteweya demokratîk ne bi dewleta netewe bi xwerêvebirinê dibe. Li vir a giring ew e, civak ne ji aliyê hêzeke derve yan jî hêzeke serdest, ji aliyê xwe ve tê birêvebirin. Di neteweya demokratîk de ne rêveberiya biyanî, xwerêveberî esas e.

Li Kurdistanê, bigewdebûna neteweya demokratîk li ser bingehê xwerêveberiyê jî "**Yekîtiya Komînên Demokratîk a Kurdistanê"** ye. Komîn yekeyeke bingehîn e, lê rasterast rêveberî û demokrasî pêk tê. Yekîtiya Komînên Demokratîk a Kurdistanê hevgirtina gelek komînên konfederal e; ji kolanan heta bi gundan li her deverê û li her warê jiyanê ku pêdivî bi wan hebe têne avakirin. Ev rewş weke konfederalîzma demokratîk jî hatiye pênasekirin.

Komîn meclisa herî piçûk a xwerêveberiyê ye; yekser lê demokrasî pêk tê. Li gorî ku em nikarin bajar ji herêmê, herêmê ji welat, welat ji dunyayê qut bibînin, komîn jî bi hev ve girêdayî ne û bi hev re di nava têkiliyê de ne.

Civaka demokratîk pênasekirineke giştî ye. Sê şêweyên civaka demokratîk hene: civaka demokartîk a bingeh lîberal, civaka demokratîk a bingeh çîn (sosyalîzma pêkhatî), ya din jî ya me bi pêş xistiye civaka demokratîk a bingeh komînal e. Divê em bi taybetî destnîşan bikin ku civaka demokratîk a bingeh komînal ji pêkhatinên sosyalîzma pêkhatî bi temamî cuda ye.

Ev hemû, li dijî nexweşiyên desthilatperestî û dewletperestiyê tevdîr in. Komînalîzm, dermanê herî xurt ê nexweşiyên desthilatperestî û dewletperestiyê ye û bi vî dermanî tehlûke têne pûçkirin. Komînalîte rastiyek e, di tevahiya dîrokê de gel û xelk pê rabûne. Em dixwazin vê bigihînin sîstema modernîteya demokratîk û bi vê civaka demokratîk a hemdem pêk bînin.

b) Armancên Civakî

Bernameya polîtîk a manîfestoya civaka demokratîk, di çarçoveya pêdiviyên civakê de rêxistiniya wê û bi şêweyekî demokratîk hebûna wê dike armanc. Armancên civakî ew armanc in ku bi wan civaka demokratîk tê avakirin. Warê civakî yê civaka demokratîk di nava xwe de dihewîne.

Civakîbûn jî di encamê de gerdûnek e, û em jê re dibêjin, 'xwezaya duyemîn'. Navenda kişandinê ya xwezaya duyemîn bîra wê ye, xisleta wê ya etîk e, pîvanên wê yên estetîk in, û îradeya wê ya polîtîk e. Ev sîstematîkeke Kurd e, û ev sîstematîk, sîstematîka civaka demokratîk e, û giring e. Divê mirov zanibe, li cihê xwe weke yekeyeke sîstema civakî bixebite. Civak wisa bi qaûnên hişk naxebite. Di xwezaya civakî de ne yase lê meyl hene. Xebatên civakî bi aqil, bi jîrî, bi nermbûneke polîtîk têne meşandin. Pîvanên wê yên xweser hene, em ji vê re exlaq dibêjin. Hecimekî xwe û girseyeke xwe ya xwe lê digire heye, em ji vê re hebûna Kurd dibêjin, û ev bîr û hafize ye. Wekî din, divê mirov navenda aqil, aqlê analîtîk lê zêde bike. Divê mirov van hemûyan bide ser hev, bi ser û ber bike, bi vî awayî navendeke bi hêz a civaka demokratîk pêk bîne.

Şêweyê herî berbelav ê civaka komînal wê di warê civakî de pêk bê. Komîn wê li tevahiya rahendên di warê civakî de ava bibin. Şaneya kok a di warê civakî de xwe disipêre komînê. Komîn tê maneya civakîbûnê. Di warê tenduristî, perwerde, ziman, çand, dîrok, spor û hwd. de komîn têne avakirin. Di çarçoveya pêdiviyên civakî de mirov dikare komînên ziman, dîrok û felsefeyê jî ava bike. Babeteke din ku divê mirov bi giringî li ser bisekine ew e, divê komînên demokratîk bi awayekî bêne avakirin ku tevahiya cudahiyan hembêz bikin. Divê tevahiya nasnameyên cuda, bawerî, mezheb û komên civakî yên li Kurdistanê kirdeyên xwe yên xebatên komînal pêk bînin.

Di warê ekonomiyê de armanc ekonomiya komînal e. Xebatên di warê ekonomîk de wê li ser bingehê kolektîvîteyê bêne bipêşxistin. Zanista civakî ya Ewrûpayê qada ekonomiyê cihê dike, vediqetîne. Lê ya rastî, divê mirov di warê civakî de bi ekonomiyê dakeve.

c) Li Rojhilata Navîn Pirsgirêka Kurd û Çareseriya Entegrasyona Demokratîk

Entegrasyon, ji ber ku têkiliya bi dewletên netewe re pênase dike giring e. Çar dewletên netewe yekser bi Kurdistanê re têkildar in. Em ê bi çar dewletan re li ser bingehê nêzîkatiya entegrasyona demokratîk bi hev re bin.

Weke peyv û gotin, maneya entegrasyonê "bihevrebûn, biyekbûn, têkiliya yekbûnê ya bi yekeyên cuda re" ye, lewma entegerasyon yekbûna demokratîk a dewleta netewe û civaka demokratîk pênase dike. Ev pênaseya wê ya herî rast e. Li gorî vê, civak xwe weke dewletekê bi rê naxe û xwe bi dewleteke din ve girê nade. Xwe weke civakeke demokratîk bi rê dixe û xwe entegereyî komara demokratîk dike. Di heman demê de entegrasyona demokratîk wekhevbûnê jî di nava xwe de dihewîne. Bi muzakereyên demokratîk tê avakirin, lewma ew muzakereyên demokratîk ferz dike. Muzakereyên demokratîk, bihevrebûn û biyekbûna civaka demokratîk û dewleta netewe pêk tîne.

Dewleta netewe niha asîmîlasyonê pêk tîne, lê entegrasyon berevajiyê asîmîlasyonê ye. Asîmîlasyon, bişaftin û pevçûnê di nava dewleta netewe de diafirîne; entegrasyona demokratîk rê li bihevrebûneke bi îrade vedike. Asîmîlasyon, dijminatiya herdu aliyan mezin dike, entegrasyona demokratîk aştî û biratiyê ava dike. Eşkere ye ku dewleta netewe ya entegrasyonê red bike û xwe nêzî muzakereyê neke, wê di asîmîlasyonê de israr bike.

Entegrasyona demokratîk qebûlnekirina çareseriya dewleta netewe ye. Dewleta netewe xwe disipêre înkar, asîmîlasyon û îmhayê. Dewleteke netewe ya entegrasyon qebûl kirî û li muzakereyan rûniştî, eşkere ye ku wê ji xisletên xwe dûr bikeve. Lewma, ji bo texrîbatên

dewleta netewe li herêma me kirî ji holê bêne rakirin û ji nû ve atmosfera hevparbûna gelan were afirandin, divê mirov entegrasyonê weke çareseriya bingehîn bibîne.

Entegrasyona demokratîk, muzakereya demokratîk ferz dike, wekî din jî nabe. Xisleta muzakereyên ji niha û pê ve, bi xisleta "Huqûqa Biratiyê" ye. Ji vê jî wêdetir, divê weke pênasekirina gera li huqûqa biratiyê were dîtin. Nêzîkatiya weke "Dewlet bi hêz e, dewlet wê her tiştî ferz bike, zorê bike" nayê qebûlkirin. Nêzîkatiyên bi awayî hemû, nêzîkatiyên faşîst in. Divê hemû bêne redkirin. Ya divê were kirin, bi muzakereyên demokratîk civaka demokratîk bi dewleta netewe re were entegrekirin.

Kurd, herçiqasî li Rojhilata Navîn xwediyê pirsgirêka herî giran bin jî di warê çareseriyê de jî di pozîsyona herî îdeal de ne. Çareseriya Kurd û Tirkan çareseriya Rojhilata Navîn e. Evqasî giring e, û evqasî lezgîn e, dibe ku Rojhilata Navîn hemûyî bibe çareseriyê. Di vê çarçoveyê de, em dikarin bibêjin, çareseriya Kurd û Tirkan ne weke her çareseriyê ye, ne çareseriyeke herêmî ye jî, ne jî çareseriyeke çarçove teng e. Teqez çareseriyeke Rojhilata Navîn e. Û heta çareseriyeke wisa ye ku bandora wê di asta cîhanê de jî wê bibe.

Kurd bi çar dewletên cîran re jî di nava şer û pevçûnê de ne, û ev rewş hê jî didome. Hê jî bi ti hêzê re neketiye qonaxa muzakereyan. Mirov dewletên netewe yên herêmê bîne qonaxa muzakereyan, ev ji bo avakirina aştî û civaka demokratîk, çarçoveyeke guncav e. Dîsa, ji bo ku mirov karibe vê çarçoveyê bi pêş bixe û fireh bike, divê mirov bi dewletên netewe re yên ku Kurdistan di nava xwe de parve kirine, berê xwe bide çareseriya entegrasyona demokratîk. Em ji vê re dikarin bibêjin, "Li Rojhilata Navîn Pirsgirêka Kurd û Çareseriya Entegrasyona Demokratîk". Sosyalîzma pêkhatî û perspektîva wê ya xwe disipêre dewleta netewe çi zû û çi dereng, wê rê li ber şer veke. Perspektîva dewletparêz a netewe di nava xwe de aştiyeke mayînde nahewîne. Berevajî wê, nîşan dide ku pênc dewletê li ser van erdan wê hertim bi hev bikevin.

Lewma divê dewletên netewe jî ji bo çareseriya entegrasyonê di veguherîna demokratîk re derbas bibin. Mirov xwedî bernameyeke dewleta netewe be, ev ne armancek e ku li gorî fikira sosyalîst e, ne li gorî pratîka wê ye, û ne jî dikare çareseriyeke realîst pêk bîne. Pêk bîne jî wê gelekî xwînrij pêk bîne. Ev, ne ew tişt e ku sosyalîstek qebûl bike. Lewma me pêşniyaza çareseriyê ya "neteweya demokratîk" bi pêş xist. Çareseriya ku li sosyalîzmê tê, çareseriya neteweya demokratîk e. Têgihiştina "Sosyalîzm bêyî demokrasî nabe" û divê mirov "bernameya civaka demokratîk" bi pêş bixe, pîvanek e ku divê mirov di her şert û mercî de pêk bîne. Ya ku wê berê têkiliyên me yên bi dewletên netewe re diyar bike jî ev pîvan e. Em dikarin ji vê re bibêjin, çareseriya entegrasyona demokratîk. Heke mirov ji dewleta netewe biqere û li şûna wê bernameya neteweya demokratîk deyne, divê bikeve nava têkoşîneke pir jidil û domdar. Her kesê sosyalîst divê ji têkoşîneke wisa re amade be. Entegrasyon, ji şêwazên têkoşînê yên berê cuda –ew awayên bi pevçûn, îllegal, gavek li pêş û gavek li paş– li ser me awayekî nû ferz dike ku divê em hûrûkûr bi meseleyan dakevin û rêxistiniyê bi sazî bikin. Şêwazên têkilîdanînê bi dewletên netewe re divê li gorî vê pîvanê bin û ev bi qasî manûnemanê giring e.

Ji sed salî zêdetir e ku dixwazin Kurdan bi polîtîkayên înkar, îmha û asîmîlasyonê tine bikin û hê jî vê dixwazin. Kurd li ber vê rabûne; di vê çarçoveyê de li dewleta xwe ya netewe geriyane, ji bo wê ava bikin têkoşiyane û berdêl dane. Dewletên netewe yên herêmê, ji Pakta Sadabatê heta bi Pakta Bexdayê, bi gelek polîtîkayên asîmîlasyonê xwestine koka Kurdan biqelînin û ji bo vê jî her rê û rêbaz ceribandine. Armanca bingehîn a her çar dewletên netewe ew e ku bi polîtîkayeke hevpar Kurdan gav bi gav tine bikin. Ev pakt û peyman heta roja me ya îro *de facto* dewam dikin. Îran veguherî Komereke Îslamî, Iraq û Sûrî ji hev de ketin, bi vî awayî ev tifaqa veşartî ya çarqolî perçe bû, lê heta niha beyaneteke fermî nedane

ku tê de bibêjin, me dev ji polîtîkayên îmha, înkar û asîmîlasyonê berdaye. Berevajî, heke ku keysa xwe li Kurdan bînin û firsenda wan çêbe, ev çar dewlet wê bibin yek; ew ê texsîr nekin ku Kurdan asîmîle bikin û heta wan qir bikin. Ji bo vê jî wê bi hev re bikevin nava tevgerê.

Em entegrasyonê weke modela bi tenê ya çareseriyê ji bo welatê xwe û herêmê tesbît dikin û bi heman awayî, em dibêjin, divê em vê entegrasyonê bi şêweyekî xwezayî, bêyî ku kes tiştekî ferz bike, bi avakirina zemînên huqûqî yên beramberî hev, pêk bînin. Pêvajoyên polîtîk bi peymanên huqûqî têne misogerkirin, paşê aliyên peymanê ji bo peyman bibe peymaneke civakî, hêza xwe ya polîtîk, bandora xwe, derfet û îmkanên xwe bi kar tînin. Projeyeke entegrasyonê ya bi huqûqê nehatibe misogerkirin û bi têkiliyên xatir-dostaniyê hatibe meşandin, tişta ku bi xwe re bîne di encamê de wê aştiyeke trajîkomîk be. Têra xwe tecrûbeyên dîrokî û civakî hene ku nîşanî me didin, pêvajoyên bi vî awayî di demeke kin de rê li ber rewşên bêhtir bipevçûn û xwînrij vedikin.

Entegerasyoneke bi huqûqê hatibe misogerkirin, beriya her tiştî wê di nava xwe de wekhevî û biratiyê bihewîne. Alî wê li hemberî huqûqê wekhev bin, ji hebûna hev du re û ji nirxên hev du re bi rêz û hurmet bin, ji çavkanî û firsandan di heman astê de bi awayekî wekhev sûdê bigirin û di berpirsiyarî û erkan de wê xwedî heman heqan bin.

Entegrasyon ferz dike ku alî li beramberî hev du gavan biavêjin. Nabe ku aliyek bi serê xwe biryarê bide, yan jî aliyek li ser aliyê din tiştekî ferz bike, entegrasyon bi vî awayî nabe. Ji bo entegrasyon bibe, şertê pêşî ew e, divê entegrasyon bi pêvajoyeke muzakereyê were pêkanîn. Muzakere nîşan dide ku pêvajoyek heye, tê de alî ji hev du re rêz digirin, êşên hev du fêhm dikin û li daxwazên hev du guhdarî dikin.

Pîvana bingehîn a entegerasyona demokratîk ew e ku alî bi hev re bijîn, bêyî ku hev du bihelînin ango asîmîle bikin. Divê cihêkarî û weke doktrîna sosyalîzma pêkhatî ya sedsala 20'an gera li dewleketeke netewe ya nû bêne terikandin û ev pêdiviyeke têgihiştina sosyalîst e. Lê ev nayê wê maneyê, em ê dev ji azadî û heqên xwe yên bingehîn berdin. Entegrasyon wê rê veke da ku gelên me ji niha û pê ve li ser heman cografyayê di nava yekîtiyê de bi çand û nasnameyên xwe re dilsoz bijîn.

Gelo dewletên netewe yên herêmê xwe didin ber entegrasyonê? Yan jî ji entegrasyonê çi fêhm dikin? Gelo bi rastî li dijî asîmîlasyonê ne? Ji bo bersiva pirsên bi vî awayî, diyalog û pêvajoyên muzakereyan esas in. Gelek êş hatine kişandin û gelek pêşhikim çêbûne, mirov wan deyne pêşiya guftûgoyan, çareserî çênabe. Çawa ku hêzên muxalif ên sosyalîst û demokratîk bi wêrekî şaşî û rewşên asêbûyî yên doktrîner ên sosyalîzmê guftûgo dikin, divê îdeologên dewleta netewe û navendên wan ên polîtîkayê jî bi heman samîmiyetê bi şaşî û sûcên dewletê re ku ji dused salan zêdetir hatine kirin, rûbirû bibin. Ango entegrasyon ne ew polîtîka ye ku aliyek pêk bîne, divê her du alî jî li beramberî hev du, li şaşî û kêmasiyên xwe mikur bên, xwe ji şaşî û kêmasiyên xwe bişon; di vê pêvajoyê de her du alî jî wê hîn bibin ku bi şaşî û kêmasiyên xwe re rûbirû bibin. Heke aliyê qels bide pey aliyê bi hêz, ev ne entegrasyon e, ev israra di polîtîkaya asîmîlasyoneke nû de ye. Ku wê ev jî bi dînamîkên nipînû rewşeke bi şer û pevçûnê gurr bike.

Heke biratiya hezar salan a li ser van erdan wê ji nû ve were vejandin, divê bingehekî wê yê huqûqî were pêkanîn. Ji bo bereya navxweyî ya aştiyê were qewînkirin, divê huqûqa entegrasyonê were qebûlkirin. Entegrasyon tê wê maneyê, komên siyasî-civakî, bawerî, nasname û gelên li heman cografyayê û bi hev re, li hemberî qanûnan di rewşeke wekhev de ne. Xala esasî ev e. Polîtîkayên entegrasyonê yên li ser hîmên huqûqî hem li dijî rewşa asêbûyî û çareserneker a dewleta netewe, hem jî li dijî polîtîkayên bişaftinê yên asîmîlasyonîst pêngavek e.

Çareseriya entegrasyonê bi awayekî demokratîk bi sazîbûna Kurdan ferz dike. Heke bi entegrasyonê Kurd nebin xwedî saziyên demokratîk, wê demê, ev ji bo Kurdan tê wê maneyê, polîtîkayeke nû ya asîmîlasyonîst tê ferzkirin. Bi çêbûna saziyên demokratîk, Kurd wê ne tenê hebûna xwe misoger bikin, bi kêmanî bi qasî vê giring e, ew ê ji niha û şûn ve, heta gef li hebûna Kurdan neyê xwarin, ji bo heqên xwe yên demokratîk şiddetê bi kar neynin û sîlehê hilnedin. Pêkanîna qanûnên entegrasyonê, devberdana ji asîmîlasyonê ye. Çiqasî rewşa bi şer û bi pevçûnê ji holê rabe û bi dawî bibe, bivênevê daxwazên huqûqî jî wê ewqasî misoger bibin.

Xisleta bingehîn a teoriya bihevrebûnê yan jî entegrasyonê, demokrasî ye, û bêyî wê nabe. Hikûmeteke dîktatoryal, monarşîst an jî faşîst nikare bernameyeke demokratîk bimeşîne. Hingê, maneya wê ew e ku ew nikare bernameyeke entegrasyonê ya xwe bi temamî disipêre muzakereyan jî pêk bîne. Wexta ku mirov rewşa Kurdan a bêyî statu û polîtîkayên heyî yên dewletên netewe yên Kurd bi wan re di nava têkiliyê de ne li ber çavan bigire, mirov ê bibîne guhertin û veguherîn ji bo her du aliyan jî elzem e. Di rewşeke berevajî de ango di çaresernekirinê de israr, tê wê maneyê, her du alî jî wê ji wan hêzan re ku “Feqa Kurd” amade kirine, xizmetê bikin û aşê wan bigerînin.

Heke Kurd bibin xwedî saziyên demokratîk, ev yek wê bike ku hem Kurd bi dewletên netewe re yên ku ew bi wan re di nava têkiliyê de ne, bihevrebûneke rast çêkin, hem jî wê bike ku Kurd hîmê aştî û yekîtiya neteweyî di nava xwe de deynin. Divê dewletên netewe ji heqên demokratîk ên Kurdan re bi hurmet bin, divê Kurd jî li hemberî heqê serweriyê yê van dewletan xwedî helwesteke rast bin. Heke dewleta netewe veguherîna demokratîk weke hedefekê daneyne ber xwe, wê wextê mumkin nîne ku polîtîkayeke entegrasyonê bimeşîne.

Maneya bisazîbûna civaka demokratîk ev e: Kurd û tevahiya komên civakî, bawerî û gelên li herêmê wê weke civak heqê wan hebe çarenûsa xwe diyar bikin. Nabe ku di nava sînorekî dewletê diyarkirî de li gorî çarenûsa xwe bijîn û nabe ku di nava sînorê dewleta netewe destûrdayî de neçarî jiyanekê bibin. Dewlet, berpirs e ku tenê li ser van koman bi awayekî ku bi wan re di nava muzakereyê de be koordînasyona demokratîk a giştî pêk bîne. Demokratîzekirina dewletê di çarçoveya zanistên civakî de armanceke guncav nîne; ya esas ew e, dewlet di warê demokrasiyê de hestyar û hesas bibe. Mirov dikare bi awayekî berbiçav nîşan bide ka di rewşa muzakereyan de bi guftûgoyên li beramberî hev du, çawa bisazîbûna demokratîk dibe. Herdu alî jî nabe ku vê rewşê li hemberî hev du weke paşvegavavêtinê bibînin.

Ev esas û hîmên jiyana demokratîk in. Di guftûgoyên demokratîk de heta pabendî bi esasê hebe, tesbîtkirina prensîp, pênase û têgînên ku li ser wan were lihevkirin, wê ne zehmet be. Axir, em qala bihevrebûnekê dikin ku li ser heman cografyayê, di bin çandeke hevpar a ji hezar salî zêdetir de derbasbûyî ye. Heke di armanca bisazîbûneke demokratîk de samîmiyet çêbibe, hingê dîtina rêyên vê yên guncav pêkan e. Di her rewşê de ev rê heqê me yê avakirina civaka demokratîk, heqê me yê ku em bibin civakeke demokratîk û neteweyeke demokratîk, di nava xwe de dihewînin. Weke formulasyoneke giştî, em dikarin bibêjin, Kurd ê têkiliyên xwe bi dewletên netewe re bi modela entegrasyona demokratîk pêk bînin. Wexta ku rejîm di warê demokrasiyê de bibin hestyar û hesas, ne mumkin e ku lihevkirin negihîje encamê.

Rêxistiniya demokratîk bi awayekî pabend û dilsozî pîvanên entegrasyonê wê bi perspektîva neteweya demokratîk were kirin. Neteweya demokratîk zêhniyetek e; komînalîzma demokratîk, federalîzma demokratîk yan jî konfederalîzma demokratîk bi gewdebûna wê ne. Maneya têkiliya wê bi zêhniyetê re ev e: Neteweya demokratîk têgînek, teoriyek e; awayê bigewdebûyî yê vê teoriyê komînalîzma demokratîk, federalîzma

demokratîk yan jî konfederalîzma demokratîk e. Li gorî hewceyî û pêdiviyan, mirov dikare van têgînan biguherîne. Mirov dikare jê re bibêje, xweseriya demokratîk jî. Xala cihê ev e: Di têkiliya madde-enerjiyê de enerjî di maddeyê de bi form dibe. Ev, xusûseke gerdûnî ye. Netewe jî enerjiyek û formekî xwe heye. Form wergirtin an jî bigewdebûn bi dewleta netewe re ne li hev e, lê li cem neteweya demokratîk cuda ye. Zêhniyeta neteweya demokratîk cuda ye, zêhniyeta dewleta netewe cuda ye. Lewma formên wan jî ji hev du cuda ne.

Di vê çarçoveyê de entegrasyon pênaseya berbiçavbûyî ya neteweya demokratîk e. Dewleta netewe tevahiya civakê weke dewleta netewe organîze kiriye. Zêhniyet, cîhana hestan, bîrbirin, bertek û armanc hemû li gorî mentiqê dewleta netewe çêdibin. Qanûnên entegrasyonê jî maneya wan bi temamî bipêşxistina ziman û bîrbirineke nipînû ye. Ev jî tenê bi têgihiştina neteweya demokratîk, teorî û çanda wê mumkin e ku pêk bê. Heke doza jiyaneke bi hev re tê kirin, ji bilî qebûlkirina muzakereyên demokratîk rêyeke din û alternatîvek nîne. Dewleta netewe hewl dide her tiştî diyar bike, erka hêzên neteweya demokratîk jî ew e ku her tiştî ji bin yekdestdariya dewleta netewe derxin û wan azad bikin.

Hêzên neteweya demokratîk wê bi derfeta entegrasyonê bi ser bikevin. Ji ber ku entegrasyon ne ew siyaset e ku li ber kendal tê kirin. Di encama muzakereyan de xebatên legal ên bi huqûqê misogerkirî wê hebin, lewma nabe ku dewleta netewe weke berê kirî, dîsa şiddetê bi kar bîne û tine bihesibîne. Ya esas, pêkanîna beşê teorîk e. Em ji vê re dikarin bibêjin, beşê maneya polîtîk. Piştî ku ev pêk hat, tenê pêkanîna teoriyê dimîne. Pênaseya vê ya berbiçav jî huqûq û siyaseta demokratîk e.

Di vê qonaxê de ya giring ew e, ka gelo hêzên neteweya demokartîk wê li gorî formê vê zêhniyetê û li gorî çarçoveya wê ya teorîk tevbigerin an na. Hin mijarên din jî hene, bi kêmanî bi qasî pêkanîna çarçoveya teoriyê giring in, ew jî ev in; di pêkanîna çarçoveya teoriyê û avakirina saziyan de ziman û uslûbeke çawa, rê û rêbazeke çawa were bikaranîn, divê mirov ji kû û çawa dest bi muzakereyan bike û bibe xwedî helwesteke çawa. Çendîn rastiyên teorîk hebûn, lê ji ber ku zemînê wan ê pêkanînê yan jî hêza wan çênebû, hatin jibîrkirin, çûn. Heke di pirsgirêkeke civakî de avakirin rast neyê fêhmkirin û rast neyê pêkanîn, ev ê êş û azarên nekewin bi xwe re bîne. Seba vê, pir giring e, kesên ku ev çarçoveya teorîk qebûl kirin û ji bo pêkanîna wê namzet in, divê di nava her şert û mercî de li gorî wê xwedî jiyan û şêweyekî xebatê yê guncav bin, jê gav bi paş ve neavêjin. Kesên ku ji bo bisazîkirina entegrasyona demokratîk namzet in, li akademiyan nagihîjin; li wan deran, dibe ku mirov tenê çarçoveya teorîk hîn bibe. Ya esas, kengî daketin meydanê û ketin nava pratîkê, hingê cewher û xisleta wan wê derkeve holê. Divê ew bi perwerdeya xwe, bi zanîna xwe, bi hestên xwe; li cihê ku ev hemû têrê nekin, bi pêşbînî, bi hisên xwe û bi ezmûnên xwe yên ji pratîkê girtî tevbigerin, hema bêje, divê bêhna firsend û tehlûkeyan bikin.

Xisleta sereke ya entegrasyona demokratîk ew e, xwe disipêre komînalîteya civaka demokratîk. Ev jî ferz dike ku di her warê jiyanê de komînalîte were birêxistinkirin. Ev rêxistiniya komînal li ser bingehê şax û rahendan berbiçav dibe. Di vê nuqteyê de xusûsa ku divê mirov li ber çavan bigire ev e; şax û rahend ji hev du ne qut in. Şax û rahend, mîna civaka demokratîk organîzmayên zindî ne, û di zikhev de ne. Em dikarin şax û rahendên demokratîk bi vî awayî pênase bikin:

1.Welatiyê Azad: Welatiyê azad ê civaka demokratîk, bi dilsoziya xwe ya bi komînalîzma demokratîk dibe xwedî hebûn. Welatiyê dewleta netewe ferdperestiya kapîtalîst esas digire, lê welatiyê azad komînalîst e; bi komînalîzma demokratîk heye, hebûn e. Di vê çarçoveyê de li hemberî civaka demokratîk, ji aliyê etîk û polîtîk ve berpirsiyar e.

Welatiyê civaka demokratîk bi qasî ku azad e, divê ewqasî jî komînal be. Ferdperestiya kapîtalîst bi ferdê azad ê sexte li dijî civakê hatiye sorkirin û ev ferd di cewherê xwe de koleyekî heta tu bibêjî kole ye. Lê îdeolojiya lîberal, îmajeke wisa çêdike, mîna ku ferd di civakê de bêserûbinî xwediyê azadiyê ye. Lê ya rastî, vê îdeolojiyê meyla kara herî zêde ya di ti dema dîrokê de nehatiye dîtin, veguherandiye sîstema hegemonîk; ferd kiriye koleyê keda heqdestê û bi vî awayî wê ferd kiriye nûnerê şêweyekî koletiyê yê herî pêşketî.

Li hemberî vê, welatiyê civaka demokratîk, azadiya xwe di nava komînalîteya civakê de yanî di nava komên piçûk ên bikêrhatî de dibîne. Komîna demokratîk û azad, ji bo pêkhatina welatiyê civaka demokratîk dibistana bingehîn e. Kesa/ê ku komîna wê/wî tinebe, ya/yê ku bi awayekî komînal nejî, ferdbûna wê/wî jî çênabe. Welatî, berpirsiyariya xwe ya li hemberî komînê weke pîvaneke bingehîn a exlaqî qebûl dike. Exlaq jî hurmet û pabendiya bi jiyana komînal re ye. Komîna nebe demokratîk, nabe polîtîk. Komîna nebe polîtîk jî azad nabe. Ji bo civakbûna demokratîk şertê pêşî azadbûna welatiyên wê ye, û divê welatiyê azad vê azadbûna xwe bi komîna xwe ya pabendî wê ye; li ser bingehê polîtîkaya demokratîk pêk bîne.

Li aliyê din, ji bo welatiyê azad, ji ber ku di bin banê dewleta netewe de ye, rahenda welatîbûna destûra bingehîn a dewleta netewe jî heye. Ev rahend, wexta ku dewleta netewe, statuya civaka demokratîk bi entegrasyona demokratîk nas dike, derdikeve holê.

2.Xwerêveberî: Xwerêveberî, ji ber ku têkildarî entegrasyona demokratîk e, rêveberiyeke safî û xwerû nîne. Bi dewleta netewe re di bin heman banê siyasî de ye. Divê ev alî li ber çav were girtin. Di nava sînorên dewleta netewe de civaka demokratîk bi xwerêveberiyê xwe bi rê ve dibe.

Civaka demokratîk, bêyî xwerêveberiyê nabe. Bi giştî tevahiya şêweyên neteweyan, bi taybetî jî neteweyên demokratîk, hebûnên civakî yên xwedî xwerêveberî ne. Heke civakek ji xwerêveberiyê mehrûm be ew ji netewebûnê derdikeve. Di rastiyên civakî yên hemdem de neteweya bêyî rêveberî nabe. Di vê qonaxê de ku em gihiştinê, Kurd bi qasî ku civakeke pir polîtîk in, ji vê jî zêdetir îro di rewşekê de ne, vê rastiya polîtîk weke civaka demokratîk birêxistin dikin.

Xwerêveberî, yek ji xisletên bingehîn ê hebûna civakî ye. Mirov ji xwerêveberiyê re bibêje, mejiyê civakî wê pênasekirineke di cih de be. Xwerêveberî erka di xwezaya civakî de birêkûpêk dike, kontrol dike, diparêze û dihêle domdar be. Xwerêveberî bi beşdarbûna yekser a civakê pêk tê.

3.Jiyana Civakî: Bi avakirina civaka demokratîk re di heman demê de di jiyana civakî de jî veguherîn wê bibe. Navê vê veguherîna pêk bê, komînalîzma demokratîk e. Di vê çarçoveyê de jiyana civakî, jiyana komînal e.

Beriya dewlet û kapîtalîzmê jî civak hebû. Mirov bi civakê bû mirov. Tişta ku civak bi pêş xist, ne bajar, çîn, dewlet û şaristanî bûn, berevajî, hebûna ku ev diyarde hemû derxistin holê, civak bû. Di jiyana mirov de ti tişt nikare şûna civakê bigire. Mirov dev ji civakê berde ji civakbûnê derdikeve ango dev ji mirovbûnê berdide, ji mirovbûnê derdikeve. Civaka demokratîk beriya her tiştî bi israr e ku weke civak bimîne; bi şîara “yan civak yan hîç” li ber modernîteya kapîtalîst disekine.

Civaka demokratîk li dijî wê kirina ku civakê dike ne tiştek, civaka alternatîv e. Ew civak e ku bi azadî û wekheviyê heye û li dijî wê civaka qediyayî ye ku tê de her şêweyê koletî û newekheviyê heye û hatiye qebûlkirin. Yek ji şertên sereke yên civaka demokratîk ew e, divê civakeke tekûz û bi sihet be. Ew, wê civaka ku dewleta netewe ew qedandiye, ji nû ve li eslê

wê vedigerîne. Civaka tekûz û bi sihet ferdên bi sihet digihîne. Ferdekî ku ji aliyê zêhnî û ruhî ve bi tenduristî be, wê ji aliyê fizîkî ve xweragirî û tenduristiya wî baş be û wê nexweşiyên wî kêm bibin. Têgihiştina li perwerdeyê ya civaka demokratîk armanca xwe civakîbûn û welatiyê azad e, lewma diyalektîka pêşketinê ya civakê bi ferd re û ya ferd bi civakê re ji nû ve tê danîn. Rola zanistan a civakîkirin, azadkirin û wekhevkirinê ji nû ve derkeve holê. Civaka demokratîk civakîbûna wê civakê ye ku di biwara hebûna xwe de rast serwext bûye.

Dewletbûn û malbatbûnê, di çarçoveya dîrokî û aktuel de hema bêje jiyana civakî xeniqandine. Bi modernîteya kapîtalîst re dewletperestî û malbatperestiyê hema bêje civak dîn û har kiriye. Her du diyarde jî bi duşeqbûna civaka komînal a dayikê re derketine holê û bi pêş ketine. Ne mumkin e ku mirov bi temamî malbatê û dewletê red bike yan jî bi temamî qebûl bike. Dewletbûn pirsgirêkan çareser nake, berevajî pirsgirêkan diafirîne û jêdera wan e. Malbatbûn jî îro misêwa ji pirsgirêkên nû re cih xweş dike û zemîn çêdike. Ji ber ku ji Kurdan re tenê zemînê malbatê hatiye hiştin, parastina malbatbûnê weke erka xwe ya bingehîn dibînin. Dewlet hemû, weke erk parastina malbatê, zarokanînê, tevdarika rêncberî û eskeriyê didin Kurdan. Malbatîbûn devberdana ji Kurdbûnê ye û malbatîbûn devberdana ji civakbûnê ye. Heta ku ev li dawiyê neyên hiştin civaka demokratîk pêk nayê. Jiyana civakî ya ku wê bi komînalîzma demokratîk were avakirin, di esasê xwe de li dijî malbatbûn û dewletbûnê têkoşîneke xurt a demokratîk ferz dike. Divê neyê jibîrkirin ku têkoşîn û xebata herî mezin a avakirinê wê di vî warî de were meşandin.

Guhertin û veguherîn wê li ser bingehê şoreşa mezin a zêhniyetê, azadiya jinê û civaka eko-ekolojîk di warê jiyana civakî de pêk bên.

4.Hevjiyana Azad: Roja me ya îro, yek ji pirsgirêk û nakokiyên bingehîn û giring li dorbera jinê ye. Di bingehê pirsgirêkên civakî de sîstem û zêhniyeta mêrê serdest heye û kengî kujerê kastîk civaka dayikê kir du şeq pirsgirêkên civakî dest pê kirin.

Pirsgirêka bingehîn a li pêşiya civaka demokratîk jî mêrên serdest û jinên kole ne. Eşkere ye ku ev pirsgirêk wê bi malbatbûn û malbatgiriyê çareser nebe. Heta malbatbûn maka pirsgirêkê ye. Tam jî di vê nuqteyê de hevjiyana azad weke formulasyon û hêza çareseriyê ya bingehîn hatiye bipêşxistin. Bi komînalîzma demokratîk, jin û mêr wê bikişin nava komînalîzmê û di nava komînalîzmê de ji rolên wan ên hev du dixînin, wê bêne şuştin; di vê çarçoveyê de bi hevjiyana azad a xwe disipêre îradeya azad, jin dikarin azad bibin.

Di pêvajoya civaka demokratîk de azadbûna jinan gelekî giring e. Jina azadbûyî civaka azadbûyî ye. Civaka azadbûyî jî civaka demokratîk e.

Di vê nuqteyê de divê zêhniyeta cinsperest a mêrê serdest li dawiyê were hiştin. Cinsperestî ew war e ku pirsgirêka bingehîn a mêr lê rûdide. Li vî warî her du cins jî dikevin rewşa koleyan. Lewma ji bo hevjiyana azad, warê têkoşînê yê bingehîn cinsperestî ye. Mêr û jina azad, li dijî vê diyardeya koleker a serdestiya mêr dikarin bi têkoşîneke radîkal derkevin holê. Ev jî tenê bi kesayetên komînalîst-demokratîk ên ji malbatbûnê bihurîne, mumkin e.

5.Eko-ekonomî: Modernîteya kapîtalîst nîzamekî talanê yê xwe disipêre endustriyalîzmê ava kiriye. Bêkarî û koletiya bi heqdestê, têkildarî vî nîzamê talanê ye. Ji bo rizgarbûna ji vî nîzamî, divê civaka demokratîk ekonomiya xwe ya xwe disipêre komînalîteyê bi pêş bixe. Nabe ku pirsgirêka ekonomîk bi kêm heqdestî yan jî bi koletiya heqdestiyê were bisînorkirin. Ya rastî, girtina eko-ekonomiyê ji destê civakê, dagirkeriya bingehîn a ekolojîk û ekonomiyê, jêdera pirsgirêkên ekonomîk e.

Dagirkeriya ekonomîk di nava dagirkeriyan de ya herî bi tehlûke ye. Dagirkeriya ekonomîk rêbazeke herî hov e; civakan ji hev dixîne, hildiweşîne û wan rezîl dike. Ji zilm û zordestiya dewleta netewe zêdetir, desteserkirina amûrên wê yên ekonomiyê û kontrolkirina jiyana wê

ya ekonomîk, bêhn li civaka Kurd hatiye çikandin. Dîlgirtina bi ekonomiyê, di înkara nasname û mehrûmkirina ji azadiyê de kirine amûrê herî bi bandor.

Sîstema ekonomîk a civaka demokratîk ne tenê van kirinên hov radiwestîne, di heman demê de dike armanc ku kontrola civakê ji nû ve li ser ekonomiyê çêke. Endustriya ekolojîk û ekonomiya komînê esas dibîne. Sînorê li pêşiya endustrî, bipêşketin, teknolojî, milkiyet û kargehan civaka demokratîk e, ango divê yek ji wan sînorê civaka demokratîk binpê nekin û derbas nekin. Ekonomiya komînal modelek e ku tê de daneheva sermaye û karê dadikeve asta herî kêm. Ji pereyan bidestxistina pereyan weke awayekî herî bêzehmet ê mêhtinkariyê dibîne, lewma di nava sîstema ekonomîk a civaka demokratîk de cihê vê mêhtinkariyê tineye. Destûr nade avakirina ti bendavê ya ku ekolojiyê, erdên bi bereket û dîrokê li ber çavan nagire û heta destûr nade li şûna yên temenê wan temam bûne, yên nû bêne avakirin. Bi ruhê seferberiyê li ber bêdaristanhiştin û erozyonê radibe. Ji ber ku bêdaristanhiştin û erozyon dijminê herî mezin ê ruhberan û civakê ye. Lewma li hawîrdorê dardanînê û parastina axê weke kar û kedeke pîroz dibîne, jixwe xebatên di van du waran de têrê dikin ku bi sed salan bêkariyê ji holê rakin. Vegera li axê, li xebatên dardanînê, li cotkariya ekolojîk, li qût û zad, ne tenê ji bo bêkariyê çareyeke bingehîn e, di heman demê de li dijî tevahiya nexweşiyên bajar û modernîteya kapîtalîst jî jehrkuj û panzehîr e.

Civaka demokratîk tam jî divê bi van nuqteyên giring ên eko-ekonomiyê dakeve û ji wan re çareyan bibîne. Ev yek jî tenê heke eko-ekonomiya xwe disipêre ekonomiiya komînal li nava civakê were serwerkirin, pêkan e. Heke civaka demokratîk, ekonomiya komînal gav bi gav bi pêş bixe, hilberîna alternatîv û parvekirinê pêk bîne, ew ê karibe civakê ji hewcedariya nîzama talanê ya modernîteya kapîtalîst rizgar bike. Civak divê eko-ekonomiya xwe bi pêş bixe, ev yek ji tiştên bivênevê yên civaka demokratîk e.

6.Huqûq: Huqûqa demokratîk xwe disipêre pircuretiyê, di warê huqûqî de kêm vesazî û tertîban dike; ji ber ku pêkhateyeke hêsan û besît e. Civakên demokratîk bi giranî bi vesazî û tertîbên exlaqî û polîtîk hewl didin pirsgirêkan çareser bikin. Li şûna pîvanên exlaqî û polîtîk, bi qanûnan meşandin û rêvebirin, bêhtir şêweyekî xweserî modernîteya kapîtalîst e. Dewleta netewe ya serdest ew şêweyê dewletê ye ku tevahiya dîrokê herî zêde vesazî û tertîbên huqûqî bi pêş xistine.

Huqûqê heyî yê dewleta netewe yekalî ye. Huqûqek e ku xwe heta bi şaneyên civakê ferz dike û bi her tiştî xwe navendî dike. Ev rewş, barekî giran li dewleta netewe jî bar dike. Divê bi reformên qanûnî û destûra bingehîn vî huqûqê yekalî û navendî ji nû ve vesaz bike.

Huqûqa neteweya demokratîk, nexasim li hemberî huqûqa destûrê hestyar e. Neteweya demokratîk, ji neteweya huqûqê bêhtir neteweyeke exlaqî û polîtîk e. Ji ber ku di bin banekî hevpar ê siyasî de qebûl dike bi dewletên netewe re bimîne, pêdivî bi huqûqê heye. Di rewşeke bi vî awayî de cudabûna qanûnên neteweyî û rêveberiya herêmî (cihî) giring dibe.

Xala bingehîn a vesazkirina huqûqê, huqûqa rêveberiyên herêmî ya kûr û berfireh e. Bi huqûqeke bi vî awayî, têkiliyên dewleta netewe û civaka demokratîk wê li giştî û li herêmî (cihî) bêne vesazkirin. Di vî huqûqî de xusûsa herî giring naskirina hebûna civaka demokratîk e.

7.Çand û Ziman: Entegrasyona demokratîk ew e ku zimanê civaka demokratîk û çanda wê weke hebûn bêne naskirin. Civaka demokratîk, di cewherê xwe de neteweya demokratîk e. Neteweya demokratîk cudabûna xwe ji neteweya tekperest ew e; ji gelek neteweyan pêk tê, lê heman zêhniyetê parve dikin. Cîhaneke hevpar a zêhniyet û çandê ye.

Bi vê ve girêdayî, neteweya demokratîk di nava xwe de xweseriyên demokratîk ên neteweyên cuda dihewîne û wan pênase dike. Ango civaka demokratîk pênaseya van neteweyên cuda yên demokratîk e. Lewma her netewe heqê xwe heye, xwe bi awayekî azad birêxistin û pênase bike. Aliyekî vê jî di çand û ziman de berbiçav dibe.

Di entegrasyona demokratîk de, neteweya demokratîk heqê xwe heye di warê perwerdeya bi zimanê dayikê û bipêşxistina çandî de xwe bi her awayî bi sazî bike. Heke naskirina hebûnê di ziman û çandê de berbiçav dibe, hingê divê astengiyên li pêşiya perwerdeya ziman û bipêşxistina çandê bêne rakirin. Di avakirina neteweya demokratîk de yek ji şax û rahendên bingehîn ev xusûs e.

8.Xweparastin: Yek ji xisletên bingehîn ê ku hebûnê dike gerdûnî, xisleta xweparastinê ye. Her zindiyê di gerdûnê de li gorî xwe xwedî sîstemeke parastinê ye. Her hebûn ji bo xwe biparêze di nava berxwedaneke xweparastinê de ye. Ev xislet bêhtir li civaka mirov tê. Di vê xusûsê de nuqteya ku divê rast were fêhmkirin ew e, xweparastin ne tenê têkildarî hêzên xweparastinê ye. Ji zêhniyetê heta bi perwerdeyê, ji ekonomiyê heta bi tenduristiyê, ji ekolojiyê heta bi azadiya jinê û ji rêxistiniya demokratîk heta bi siyasetê di her warê jiyanê de avakirina civaka demokratîk xweparastina bingehîn e. Civaka demokratîk a li ser vî bingehî parastina xwe bi kûrahî û firehî pêk anîbe, ti hêz nikare wê ji hev belav bike. Pîvana sereke ya xweparastina li ser vî bingehî pêk bê ev e: “Heke hêzeke me hebe ku em karibin pê tevahiya dunyayê bi bin bixin jî em ê êriş nekin, lê dunya hemû bi ser me de bê jî em ê xwe biparêzin!”

9.Dîplomasî: Di navbera dewletan de ji bo lîstikên şer ên kar û qezencê, dîplomasî kirine amûrekî manîpulasyonê. Ne ji bo aştiyê, ji bo amadekariya şeran, veguherandine amûrekî. Dîplomasiya civaka demokratîk, rêûresma civaka komînal aktualîze dike. Li gorî vê, dîplomasî wê hevgirtin û aştiya civaka li derveyî tevahiya dewlet-desthilatan bi pêş bixe. Li ser vî bingehî dîplomasî wê ne şer, lê têkiliyên civakên cuda xurt bike; ew ê têkiliyên wan ên dostane bikêrhatî bike; têkiliyên wan bi pêş bixe û têkiliyên jihevdeketî birêkûpêk bike.

Di dîroka Kurdan de erênî yan jî neyênî pêvajoyên gelek têkiliyên dîplomatîk her hebûn. Di parastina azadî û hebûna wan de roleleke erênî ya xebatên dîplomatîk heye. Di pêvajoya modernîteya kapîtalîst de belkî jî li vê dunyayê gelekî din weke Kurdan tineye pir zêde bûbe qurbanê lîstikên dîplomatîk. Li Rojhilata Navîn di dîplomasiya dewleta netewe de rola dane Kurdan timî piyontî bûye û vê yekê rê li encamên gelekî giran vekiriye. Roja me ya îro, Kurd hem di nava xwe û cîranên xwe de hem jî di asta global de pir zêde xwe hewceyî dîplomasiyeke manedar dibînin. Nexasim pêdivî bipêşxistina dîplomasiyeke hevgirtî ya navbera Kurdan heye û ev yek ji erkên bingehîn ên neteweyî ye.

d) Yekîtiya Navbera Kurdan

Bi têgihiştina yekîtiya navbera Kurdan, divê beriya her tiştî dorberên siyasî yên ji neteweya demokratîk re xerîb, bêne qezenckirin û divê ev armanca bingehîn be. Muzakereyên navbera Kurdan, bi kêmanî bi qasî muzakereyên bi dewletên netewe re nehêsan û piralî ne. Mirov armanca ji vê yekîtiyê bi vî awayî dikare berbiçav bike: Li dora pêkhateyeke konfederal, li bin banê kongreyekê hatina cem hev û di mijarên neteweyî de gihiştina helwestên hevpar. Bi dewletên netewe re di her cure muzakereyan de divê xwe ji hevgirtin û peymanên li dijî hev dûr bigirin; jixwe dewletên netewe ji berê de xwedî stratejiyekê ne ku Kurdan li dijî hev bi kar tînin, ha divê li hemberî van stratejiyan hişyar bin û ev rahenda prensîp a van muzakereyan e. Naveroka yekîtiya navbera Kurdan divê bi zêhniyeta neteweya demokratîk û sazîbûna demokratîk were tijîkirin.

Dibe ku dorberên siyasî yên Kurd ên di bin bandora dewletên netewe de li hemberî vê li ber xwe bidin, lê em ê dev ji bernameya civaka demokratîk û stratejiya wê bernedin. Seba vê, di nava me de muzakereyeke zêde wê hewce bike. Ya giring ew e ku ev muzakere ne bi pevçûnê, bi rêyên lihevkirin û guftûgoyê pêk bên û dewam bikin.

Çareseriya demokratîk, a ku em li vir qala wê dikin, kengî dewleteke netewe êrişî her çi herêmeke Kurdistanê bike, hingê di çarçoveya pîvana xweparastinê û reflekseke hevpar a liberrabûnê de dikeve dewreyê û li ser bingehê berxwedanê ye. Heta ku ev garantî pêk bê, xweparastina çekdarî jî di navê de, şert e ku her heqê berxwedanê were parastin. Kengî li ser bingehê yekîtiyeke neteweyî ya demokratîk çareseriyek pêk bê, hingê mumkin e ku sîleh bi temamî bêne terikandin.

Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê, weke kongreyek e ku tevahiya Kurdan di bin banê xwe de dihewîne, wê bibe hêza bi sazî ya yekîtiya navbera Kurdan. Li Filistînê Rêxistina Rizgariya Filistînê PLO, li Efrîka Başûr ANC bi çi rolê rabûbin, divê mirov roleke bi heman rengî bide vê kongreyê û ev ji bo bingehê yekîtiyê esas e. Divê navê vê kongreyê û pîvanên wê yên xebatê jî di çarçoveya muzakereyên demokratîk de bêne diyarkirin. Divê rêveberiyeke wê ya Kurdan hemûyan di nava xwe de bihewîne hebe û ev rêveberî dikare muzakereyan hemûyan bi xwe ve girê bide. Ji bo demeke dûr û dirêj, pêdivî wê bi sazîbûneke bi vî rengî hebe.

Ji bo Kurdan rêxistiniyek bi vî awayî hewce ye, ew li bin banê wê dikarin bêne cem hev, lewma mirov dikare vê rêxistiniyê ji bo Kurdan weke rêxistiniyeke ban an jî sîwanê bibîne. Kongreya neteweyî dikare her sal bicive; dikare rêzikname, bername û armanca xwe hebe. Piştî ku di çarçoveya pîvanên demokratîk de armanca xwe û xalên rêziknameya xwe diyar kirin, kongre wê paşê jî rêveberiya xwe hilbijêre. Rêveberî wê saziya pêkanînê be, lewma mirov dikare wê di çarçoveya daxwazên tevahiya komên Kurdistanî de hilbijêre. Ji ber ku ew ê ji bo yekîtiya navxweyî ya Kurdan bibe pênasekirina siyasî ya berbiçav.

Xweparastina kongreyê divê demokratîk be; nabe ku di bin destê malbatekê, xanedanekê yan jî klîkeke siyasî de be, mînakên vê yên di dîroka dunyayê de nîşanî me dane ku kongreyeke wisa wê nikaribe neteweyî be. Saziyeke bi vî awayî, dikare xweparastina giştî ya Kurdan bide ser xwe. Ev ê ne artêşeke dewleta netewe be, ev ê hêzeke xweparastinê be. Heta ku tehlûkeya neteweyî hebe, divê hebûna xwe biparêze.

Ev hêz, wê li dijî tehlûkeyeke ji der ve were, û li hundir li dijî êrişeke li beramberî gel, li cem gel cihê xwe bigire; ew ê ber li êrişê bigire û bike ku êrişkar ji ya xwe bêne xwarê. Ji bo hêzeke nû careke din bi têgihiştina serdestiyê ranebe û li dijî polîtîkayên tepisandina civakê, ew ê xeteke xweparastinê çêke. Ji bo civakekê, xweparastin bivênevê ye. Di pêvajoya muzakereyên entegrasyonê de, hem bi dewletên netewe re hem jî bi hêzên Kurdistanî re di hevdîtinan hemûyan de xweparastin û xisletên wê yên bingehîn wê her di rojevê de bin.

Weke pîvan hêza xweparastinê, wê nebe artêşa dewletên netewe û wê nebe hêzeke dewleta netewe ya Kurd. Ji zabiteyan hinekî mezintir û ji artêşên dewletên netewe hinekî piçûktir, teqez wê hêzeke xweparastinê ya li gorî ruhê sosyalîzmê be jî. Her çi hêz bi darê zorê rê li îmhayê, înkara neteweyî yan jî şerê eşîrî veke, ev hêz wê li dijî wê were bikaranîn. Ev pênasekirineke giştî ye. Dewletên netewe divê pêdiviyeke wisa ya xweparastinê qebûl bikin, ji ber ku ev ji bo aştiya civakî jî hewce ye.

Li her beşî, hêzeke xweparastinê ya Yekîtiya Kurdan wê hebe. Hêza xweparastinê ya yekîtiya demokratîk divê pêkanîneke hevpar bi hêzên Kurdistanî re bike armanc. Heke ku ev nebe jî divê derfet û îmkan bêne zêdekirin da ku bi hev re tevbigerin. Ev tê wê maneyê, rê wê li tifaqeke dîrokî ya navbera hêzên Kurdistanê vebe û ev ê dînamîkên pevçûnê ji holê rake. Meseleya Kurdan a xweparastinê wê bi dewletên netewe re di encama muzakereyên

entegerasyonê de çareser bibe. Divê dewletên netewe di nava komarên xwe de jî demokrasiyeke rastî pêk bînin û ji bo xweparastina Kurdan zemînê huqûqî çêkin.

Kongre, di heman demê de wê ji bo bisazîbûna Kurdan di warê ekonomîk, civakî, çandî, dîrokî, zimanî û hwd. de bibe navend. Em bi giştî ji vê re dibêjin, **Yekîtiya Demokratîk a Kurdan**. Armanca sereke ya çareserî û muzakereya navbera Kurdan ev e. Erê, pêdiviya me bi dewleta netewe tineye, lê bi awayekî bivênevê pêdiviya me bi civaka demokratîk û yekîtiya navxweyî ya Kurdan heye. Saziyên siyasî yên Kurdan ên heyî jî li gorî têgihiştina civaka demokratîk divê hem beşdarî vê pêvajoyê bibin hem jî destekê bidin yekîtiya navbera Kurdan. Armanca muzakereya navbera Kurdan ew e, ti pêkhateya siyasî ya Kurd a alîgirê yekîtiya neteweyî li derveyî kongreyê neyê hiştin.

Hezaran sal e ku çareseriyên malbatî, xanedanî û eşîrî li Kurdan hatin ferzkirin. Ev awa çareserî heta roja me ya îro meşandin. Lê xwediyên vê çareseriyê ji bo berjewendiyên teng ên malbatî, xanedanî û eşîrî ketin pozîsyoneke wilo ya ku pê tevahiya Kurdistanê feda kirin. Rola wan a pê rabûn, dişibe rola komîteyên Judenrat ên Cihûyan di dema kampên komkirinê yên faşîzma Elmanyayê de. Bêguman divê mirov van li dawiyê bihêle û di çarçoveya pîvanên neteweya demokratîk de wan bîne cem hev. Çawa ku mirov xwe bi dewletên netewe re ji bo pêvajoyeke entegrasyonê amade dike, divê mirov cehd û xebatê bike da ku di nava hêzên Kurdan de jî ji bo ev hêzên heyî ji rola xwe ya bêyom dûr bikevin û li ser bingehê neteweya demokratîk tevlî pêvajoya avakirinê bibin.

e) Li Rojhilata Navîn Krîza Civakî û Çareseriya Modernîteya Demokrtîk

Pirsgirêkên Rojhilata Navîn dîrokî ne. Civakên Rojhilata Navîn tevahiya dîrokê pirsgirêk û kîrzên wan ên mezin hebûn. Sedema vê ya bingehîn a dîrokî ew e, kujerê kastîk, çîna arîstokratîk û sîstema dewletperest û desthilatperest li ser van erdan bi pêş ketiye. Ji ber van sedemên bingehîn, herêm bi qasî panzdeh hezar sal in ku di nava van pirsgirêk û krîzan de digeveze, pêxîrtengî dibe. Hema bêje, li çi herêmeke din a dunyayê, evqasî demdirêj ti civakê bi pirsgirêkan re li ber hev nedaye, bi pirsgirêkan re neketine qirika hev du.

Li vê cografyayê ku cara pêşî civaka dayikê derketiye holê, di heman demê de ew mekan e ku lê pirsgirêk û nakokiyên pêşî rûdane. Kengî kujerê kastîk jin kiriye kole, nakokî û pirsgirêka civakî ya pêşî jî dest pê kiriye. Kolekirina jinê û kolekirina civakê hema bêje bi hev re dimeşin. Çawa ku tê zanîn, koletiyê ne bi derketina holê ya dewletê dest pê kiriye, kengî kujerê kastîk jin kiriye kole, hingê koletiyê dest pê kiriye.

Ev nakokî û pirsgirêka civakî ya bi pêş ket, bi duşeqbûna komînê re xwe di derketina holê ya dewletê û rûdana pirsgirêka malbatê de pênase kiriye. Pirsgirêka bingehîn, pêkhateyên xanedanî û malbatperestiyê ne, ew xwedî wê xislet û karakterê ne ku pirsgirêka herî bi kok bin. Li Rojhilata Navîn ev herdu sazî hê jî pir bi hêz in, ji ber ku kok û rehên wan xwe bi dîrokê xwedî dikin. Pirsgirêka li Rojhilata Navîn heta li ser bingehê dîrokî peywendiya wê bi aktueliyê re neyê danîn wê neyê fêhmkirin. Heta bi çavekî sosyolojîk, antropolojîk û ontolojîk neyê tehlîlkirin, derketina ji nava pirsgirêkê, helkirina wê çênebe. Ji ber ku îdeolojiya malbatî û xanedantiyê bingehê tevahiya sîstemên serwer e. Di vê çarçoveyê de mirov dikare bibêje, prototîpên desthilat û dewletê ne.

Çavkaniyeke din a pirsgirêkên civakî dînperestî ye. Giring e ku mirov baweriyên civakî û dînperestiyê tevlîhev neke. Dînperestî ew e, bawerî yan jî dîn hişk bibe û bibe îdeolojiya desthilat-dewletê. Dînperestî, li Rojhilata Navîn çawa bûye sedem ku nasnameyên cuda bêne beramberî hev du û pev biçin, di heman demê de nehiştiye civaka demokratîk û baweriya demokratîk bi pêş bikeve.

Meseleyeke din a dibe sedema rûdana pirsgirêkan, dewleta netewe ye. Dewleta netewe ya bi hegemonyadariya Ingilistanê hatiye bipêşxistin, rewşeke bêhtir kaotîk afirandiye. Hêzên modernîteya kapîtalîst, beşên hevkar ên ku serdest kirine, li dewleta netewe kirine notirvan û nobedar. Di vê qonaxê de ku em gihiştinê, dewleta netewe ku timî krîzan diafirîne, bi bin ketiye.

Dewletên netewe yên li Rojhilata Navîn, Îslama dijber weke rûpoşeke mezin bi kar tînin. Versiyona vê ya dawî jî Îslama faşîst e. Îslama siyasî ya roja me ya îro, bêyî ku mirov weke radîkal û nerm cihê bike, îslameke faşîst e. Pêxîrtengî û pirsgirêkên ekonomîk-polîtîk ên îro li Rojhilata Navîn diqewimin, têkiliya xwe bi hegemonya dused salên dawî ya şaristaniya Ewrûpayê re heye. Modernîteya kapîtalîst bi Şerên Cîhanê yê Yekê û Diduyan bi statukoya dewleta netewe mudaxeleyî Rojhilata Navîn kiriye û destwerdana bi vî awayî ji bilî şer û xirakirinê tiştekî din nedaye herêmê.

Ji ber ku Rojhilata Navîn şaneyên wê yên civakî ji pirçand û pirnasnameyan pêk tê. Li ser şaneyên civakî yên polîtîk û çandî ferzkirina modela dewleta netewe ya tektîp-tekperest, projeyeke desthilatdariyê ye. Projeya dewleta netewe, projeyek e ku ji derve li ser Rojhilata Navîn hatiye ferzkirin û bi pirsgirêk e. Ferzkirina dewleta netewe li ser Rojhilata Navîn tiştekî wisa ye, weke ku tu bombeyekê deynî nava gelên Rojhilata Navîn. Jixwe ji sed salî zêdetir e ku dewleta netewe, ji xwîn û xirakirinê pê ve tiştek neaniye Rojhilata Navîn.

Di encama vê de, gelên Rojhilata Navîn hatine ber têkçûneke mezin û întîharê. Di vê qonaxa em tê de sîstema dewleta netewe ya ne li gorî hevgirtin-hevparbûna Rojhilata Navîn e, bi bin ketiye. Şoreşa Îslamî ya Îranê ku nûnertiya milletperestiya Şîa dike, li Rojhilata Navîn li pey hegemonyayê çû, û ji ber sîstematîka dewleta netewe bi hilweşînê re rûbirû ye. Îsraîl jî bi pêvajoya 7'ê Cotmehê re weke hêzeke hegemonîk ketiye dewreyê. Vê jî kiriye ku li Rojhilata Navîn hevsengiyên hêzê bihejin û rewşeke nû derkeve holê.

Şoreşa Îslamî ya Îranê di rewşa heyî de hildiweşe. Dîsa dewleta netewe ya Îsraîlê weke siyonîst di rewşa berbiçav a Xezeyê de pir xurt hildiweşe û di nava nakokiyên mezin de ye. Ev mînakên aktuel ên balkêş in. Heke ku em hinekî din hûrûkûr pê dakevin; em ê bibêjin, li Rojhilata Navîn ku ji Sykes-Picot a dawî sînorên wê hatine xêzkirin yanî di nava sînorên dewleta netewe de ku Ingilîzan bi polîtîka parçe bike-bi rê ve bibe xêz kirine, qelşên mezin lê dikevin heta ji vê jî wêdetir hildiweşe; û ev rewşa herî esas a Rojhilata Navîn e.

Nîzama Sykes-Picot ji hev du dikeve. Peymana Sykes-Picot, projeyeke Ingilîzan bû, bi polîtîka parçe bike-bi rê ve bibe Rojhilata Navîn bi dewletên netewe dîzayn kirin. Bi îhtîmaleke mezin, bi sedema ku Ingilîzan jihevdeketina îro pir berê dîtibû, di pêvajoya Bihara Ereban a sala 2010'an de xwestin Rojhilata Navîn ji nû ve dîzayn bikin. Di pêvajoya Bihara Ereban de ji bo li şûna Sykes-Picot nîzamekî nû ava bikin xwe ceribandin. Di vê pêvajoyê de hinekî bi pêş de jî çûn, lê Rûsya û Îranê bi rejîma Esed mudaxele kir û bi vî awayî ev mudaxele sekinandin. Li ser vê yekê, Ingilîz ji bo Esed yanî pêşengiya Beesê hilweşînin li Tirkiyê bi rejîma AKP'ê re tifaqeke pir hişk girêdan.

Di vê çarçoveyê de herî dawî rejîma Beesê ya Sûrî hat binaxkirin û ji dîrokê re hat hiştin. Bi temamî deriyên xwe asê kirin. Em niha nizanin heye yan tineye. Li welatên din ên Rojhilata Navîn şoreşên bi pêşengiya Rêxistina Birayên Misilman jî hilweşiyan. Rewşa Şoreşa Îslamî ya Îranê jî li ber çavan e. Projeya dewletê ya xwe disipêre Îslamê weke alternatîva jihevdektina Sykes-Picotê bi pêşxistibûn û navê wê jî kiribûn 'peymana kembera kesk'. Bi vê projeyê, hin şoreşên Îslamî pêk hatin. Ew niha hemû jî di nava krîzeke mezin de ne. Dewleta netewe, ji modela xwe ya laîk heta bi modela xwe ya Îslamî û rejîmên mollayan di rewşeke asêbûyî de ye; çareya xwe jî nîne.

Îsraîl dixwaze ji vê rewşê sûd wergire û sînorên xwe fireh bike. Ew jî nikare di vê de bi ser bikeve, ji ber ku di rewşeke krîzê de ye. Bi qasî ku xuya dike, alozî û tevlîheviyê hê jî wê kûr bibe. Piştî hilweşîna dewletên netewe yên klasîk, dewletên netewe yên naverok Îslamî yan jî Îslama siyasî yên anîn şûna wan jî têkçûne. Di çil salên dawî de, di serî de Îran li tevahiya welatên din ew jî hildiweşe. Tenê bi petrolê dikarin li ser piyan bimînin. Heke petrol nebe, temenê wan bîstûçar saet jî namîne. Ma jiyana wan a xwe disipêre petrolê dikare çiqasî dewam bike?

Encam kûrbûna kaos û tevlîheviyê ye. Gel dixwazin azad bijîn û ji bo vê têdikoşin. Şaşiyên Tevgera Filistînê çêbûn. Di pîvana çareseriyê ya dewletxwaziya netewe û têgihiştina çareseriyê ya xwe disipêre du dewletan de israr, di rewşa berbiçav a li Xezeyê de Filistînî tine kirin. Çawa ku sosyalîzma dewleta netewe, salên 90'î li Moskowê qediya, utopya Îslamî ya dewletxwaziya netewe jî li Xezeyê qediya. Li Tirkiyê jî CHP, yanî îdeolojiya Kemalîst, ji salên 90'î ve bi sedema ku bi awayekî hişk di dewleta netewe de israr kir, qediya. Heke desteka Sovyet û Çînê nebûya, Îran ji zû ve qediyabû. Dewletên din ên Ereb jî bi saya petrolê hene. Vê kiriye ku Rojhilata Navîn di dîrokê de bikeve rewşa herî kaotîk. Herçiqasî ji der ve mudaxele bibe jî eşkere bûye ku wê rizgar nebin, jixwe versiyona laîk ji zû ve qediyaye. Versiyona Îslamî jî ruh dide, diperpite, hema bêje di sekeratan de ye.

Civaka komînal ku yek ji seriyên qelş û duşeqbûna civakî ye û mijareke bingehîn a sosyolojiya dîrokî ye, li Rojhilata Navîn hêzeke bingehîn a hebûn û berxwedanê ye. Qebîle, eşîr, baweriyên li derveyî dewletê, mezheb û terîqet, herçiqasî bûbûn tort û gerode jî dînamîka berxwedanê ya civakê ne, û roja me ya îro jî hebûna xwe diparêzin. Bingehê sereke yê komînalîzma demokratîk wê xwe bisipêriyê, ev dînamîk in.

Tevgera Azadiyê ya Kurd ku li Rojhilata Navîn xwe bi teoriya modernîteya demokratîk careke din nû kiriye, tevî hemû tevgerên bi armanca qirkirinê û siyasetên îmhayê yên kevneşopî, weke hêzeke alternatîv derketiye holê. Tevî ku di asta dunyayê de dor li rastiya pêşengiyê ya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan hatiye girtin jî PKK'ê karîbûye hebûna xwe bidomîne. Hem weke Tevger hem jî weke Rêbertî, wê karîbû xwe bigihîne heta roja me ya îro. Weke encameke berbiçav hebûna Kurdan û nasnameya Kurdan a neteweyî misoger bûne. Di navenda Rojhilata Navîn de hebûneke Kurdan a bi hêz heye. Ev rastiyek e ku kes nikare înkar bike.

Çîn weke hêzeke nû ya hegemonîk derdikeve holê, lê Rojhilateke Navîn a xwe bisipêre Çînê zêde mumkin xuya nake. Ne di wê rewşê de ye ku destê xwe jî dirêj bike. Jixwe alternatîva Îslamî hîç realîst nîne. Alternatîveke bi vî awayî ti xisleta xwe ya vejîner tineye, jixwe ewqasî hewceyî jî pê nîne. Ha rewşa Kurdistanê di vî warî de giring e. Hêzên mîna Emerîka û Rûsyayê ku kontrola herêmê di destê wan de ye, bi ti awayî ji Tevgera Kurd nagerin û ev babetek e, divê mirov bi giringî pê dakeve.

Roja me ya îro, li Rojhilata Navîn hêviyên gelan ên ji bo azadiyê, girêdayî tevgera azadiyê ya li Kurdistanê ye. Ji bo van hêviyên azadiyê divê tevgera azadiyê ya li Kurdistanê bidome. Çarçoveya vê ya teorîk jî modernîteya demokratîk e. Modernîteya kapîtalîst teqez îflas kiriye, tiştekî wê yê bide tineye; tevlîheviyê çêdike, rê li ber şer û xirakirinê vedike. Modernîteya demokratîk jî asoyeke nû ya çareseriyê pêşkêş dike. Tam dem dema wê ye ku mirov esasên wê pêk bîne. Her ku diçe baştir tê dîtin ku modernîteya kapîtalîst kaosê kûr dike, modernîteya demokratîk jî derfetên çareseriyê diafirîne. Perspektîva rêxistinî ya polîtîk û îdeolojîk a Tevgera Kurd bi formulasyona neteweya demokratîk ji bo Îran, Sûrî û welatên din ên Rojhilata Navîn weke alternatîveke azadîxwaziyê xwe dide der û nîşan dide.

Divê mirov di vê çarçoveyê de bi babeta fesixkirina PKK'ê dakeve. Ev biryara fesixkirinê, di rewşa kaotîk a Rojhilata Navîn de li dijî modernîteya kapîtalîst li ser bingehê modernîteya

demokratîk hatiye girtin û ji bo pêşdebirina bernameyeke siyasî ya bi naveroka civaka demokratîk û polîtîka wê ya aştiyê ye. Armanceke wê ya din jî ew e ku ne bi şer lê bi aştiyê û weke stratejî alternatîveke siyaseta demokratîk bi pêş bixe. Aştî, hewcedariyeke siyaseta demokratîk e. Huqûq jî ji bo vê deman û temînat e. Siyaseta demokratîk ew siyaset e ku bingehê xwe exlaq e. Siyaseta demokratîk, polîtîkaya etîk e. Lê di vê de jî bivênevê divê huqûq hebe. Ji bo li ser vî bingehî pêşengiya çareseriya pirsgirêka Kurd were kirin, PKK hatiye fesixkirin. Ya ku li şûna wê jî were danîn wê sêlingên modernîteya demokratîk bin.

Modernîteya demokratîk, li dijî dewleta netewe modela neteweya demokratîk bi pêş dixe. Dewleta netewe bi rastiya civakî-dîrokî ya Rojhilata Navîn re li hev nake û bi nakok e, û ev ji bo bipêşxistina neteweya demokratîk zemîn çêdike. Neteweya demokratîk, modeleke birêxistinkirina civakî ye; nerm e, deriyê xwe li cihêrengiyan vekiriye. Zêhniyeta neteweya demokratîk zêhniyeta dewleta netewe ya milletperest, dînperest, pozîtîvîst û cinsperest red dike, ji ber ku modeleke wisa ye, civakê ligel tevahiya cudahiyên wê bi awayekî hevgirtî li ser piyan digire û di nava xwe de dihewîne. Li ser vî bingehî, her awayê îdeolojiyên tekperest û homojenker, red dike. Jixwe li cografyayeke mîna Rojhilata Navîn pirçand û pirnasname alternatîveke din a çareseriyê tineye û nabe.

Ji sê lingan lingê diduyan jî komînalîzma ku xwe disipêre eko-ekonomiyê ye, û weke alternatîva endustriyalîzmê tê bipêşxistin. Ev şêweyê ekonomiyê, li gorî rêûresma ekonomîk a civakîbûna komînal a Rojhilata Navîn guncav e. Bi komînên bêne avakirin û bipêşxistin, civak wê bibe xwedî çavkaniyên hem sererdê û hem jî yên binerdê; bi vê ve girêdayî li ser bingehê parvekirina komînal hilberîn wê bibe. Bi vî awayî jî malwêraniya endustriyalîzmê di warê civak û ekolojiyê de kirî wê ji holê were rakirin. Polîtîkayên ekonomiyê, polîtîkayên çandê, polîtîkayên bajêr yên heyî, hemûyan malwêraniyeke wisa kiriye ku civak neyê naskirin û ev li dijî rastiya sosyolojîk-dîrokî ya Rojhilata Navîn e. Li dijî wê, komînalîteya demokratîk weke derman e.

Komînalîteya demokratîk, pênasekirina herî zelal a dîroka Rojhilata Navîn e, perspektîva wê ya herî azadîxwaz e, û rasteqîn e. Pêxîrtengî û hilweşîna kapîtalîzma îro li gelemperiya dunyayê, ji giştî zêdetir, bêhtir li Rojhilata Navîn pêk tê. Li dijî vê hilweşîna kûr, gavavêtina li ser bingehê modernîteya demokratîk weke bihurîna ji sosyalîzma pêkhatî, alternatîveke bivênevê ye. Dîsa sêlingên modernîteya demokratîk, hem di warê bihurîna ji sosyalîzma pêkhatî û hem jî ji bo derketina ji krîzên modernîteya kapîtalîst de derfetên pratîk ên çareseriyê didin. Ne tenê bernameyeke terorîk, pêdiviyeke pratîk a rojane bi qasî nan û avê pêdiviyek e.

Gava mirov bibêje Kurdistan qala Rojhilata Navîn dike. Çareseriya Komînalîzma Demokratîk, a ku em qala wê dikin, çareseriyeke dîrokî ya Rojhilata Navîn e. Rojhilata Navîn tevahiya dîrokê komînalîte ye. Pergala qebîleyan li Rojhilata Navîn e. Yekîneyên qebîleyan, warekî bêqusûr ê komînalîteyê ye. Sê dînên mezin ên Yekxwedayî li Rojhilata Navîn derketine holê û komînal in. Di nava dînan de serhildêrên li dijî dewletbûnê li ber xwe dane, yên weke Xaricî, Hurremî, Karmatî û hwd. hemû komînal in. Komînalîteya Demokratîk, sîstemeke Rojhilata Navîn e. Projeya entegrasyonê weke projeyeke sosyalîzm û demokrasiyê li herêmê derfetên çareseriyeke dîrokî û rasteqîn pêşkêş dike. Heta, ev nêzîkatî xwedî karakterekî global e. Çareseriya li vir pêk tê, ew çareserî ye ku pêşkêşî Enternasyonala Komînalîst were kirin.

Xulase, ev model wê li Rojhilata Navîn wisa formulasyona xwe bibîne "**Yekîtiya Neteweyên Demokratîk ên Rojhilata Navîn**" yan jî "**Konfederalîzma Demokratîk a Rojhilata Navîn**". Mîna Yekîtiya Ewrûpayê yan jî mîna Koma Dewletên Serbixwe yên Rûsyayê.

f) Armancên Enternasyonalîst

Berê, yên ku hem sîstema sosyalîst û hem jî ya kapîtalîst ji xwe re dikirin esas di modela dewleta netewe de hevpar bûbûn. Lenîn bi xwe jî ji modela dewleta netewe nebihurîbû. Lenîn li Rûsyayê; Mistefa Kemal jî li Tirkiyê di heman demê de bi rêbazên wekhev hewl dan civakên xwe bi rêxistin bikin. Wexta ku Anglo-Sakson û Fransiyan hewl dida modela dewleta netewe pêk bînin, Elmanan bi rêbaza faşîst gav avêtin. Di vê qonaxê de ku em gihiştinê, tê zanîn, rêbazên dewleta netewe yên hem sosyalîst, hem lîberal û hem jî yên faşîst ketine krîzê. Dewleta netewe di her warî de ji hev du dikeve. Rastgiriya nû xurt dibe û ev jî jihevdeketina vê sîstemê nîşan dide. Ev tesbît, ji bo ravekirina rewşa giştî ya dewletên netewe ku vedîtina kapîtalîzmê ne, têrê dikin.

Saziya Neteweyên Yekbûyî ya ku xwe disipêre dewletên netewe jî îflas kiriye. Divê li şûna wê, li modeleke nû ya rêxistiniyê bi şêweyê "Yekîtiya Dewletên Netewe û Neteweyên Demokratîk" bifikirin. Yekîtiya Neteweyên Demokratîk, divê ne tenê dewletên netewe, divê neteweyên ku dewletên wan tinene jî di nava xwe de bihewîne. Neteweyên Yekbûyî ne binavkirineke şaş e, lê dewletên netewe di nava xwe de dihewîne, neteweyên demokratîk li derve dihêle. Pêdivî bi vesazkirinekê heye da ku neteweyên demokratîk jî karibin tevlî yekîtiyê bibin. Ji bo Neteweyên Yekbûyî ji silteya pênc hêzên hegemon rizgar bibe û bibe pêkhateyeke demokratîk, divê neteweyên ne dewlet jî tevlî wê bibin.

Statuya "endamê çavdêr" ya di rewşa heyî de li Neteweyên Yekbûyî heye, ji bo tevlîbûna neteweyên demokratîk têrê nake. Neteweyên nedewlet, divê li Neteweyên Yekbûyî ne weke çavdêr, lê karibin weke endamên esasî beşdar û pişikdar bin. "Yekîtiya Neteweyên Demokratîk ên Dunyayê" belkî ji bo jiholêrakirina vê neheqiyê bi kêr bê.

Weke pîvan, dibe ku rejîmên ne demokratîk ên dîktatoriyal jî bi sînor bike. Gelo dikarin vê bikin? Herçiqasî bendewariyeke utopîk be jî dibe ku li yekîtiyeke milletan a manedar were fikirîn. Li gorî ku dewletên netewe wê ji holê ranebin, divê ji bo wan rê û rêbazên veguherîna demokratîk bêne guftûgokirin. Ha paradîgma neteweya demokratîk, di guftûgoyên veguherîna demokratîk a dewletên netewe de ji bereya sosyalîzmê alîkariyek e. **Yekîtiya Neteweyên Demokratîk** jî wê pênasekirineke giştî ya vê yekê be.

Kurd wê yekîtiya xwe ya bi çar dewletên netewe yên cîran re bi entegrasyona demokratîk pênase bikin; em ê ji têkiliyên wan yên bi neteweyên din ên dunyayê re jî bibêjin, **Enternasyonala Komînal**. Têkiliyên bi neteweyên din re, wê di bin navê neteweya demokratîk a komînal de bêne bipêşxistin. Di warê sosyalîzmê de teoriyên nû yên me bi pêş xistin, analîzên me yên dîrok-civakê ku bi giştî, em weke Paradîgmaya Modernîteya Demokratîk bi nav dikin, bi ezmûnên lêgerîn û têkoşînê yên deverên cuda yên dunyayê re bigihîje hev, rêxistiniyên nû yên van xebatan bêne bipêşxistin, ev ê di pêşdebirina îdeolojiya sosyalîst û stratejiya wê ya têkoşînê de alîkariyeke giring bike. Tevî vê, wê di navbera dorberên sosyalîst ên global û herêmî de têkilî û hevgirtinê çêke û ew ê hêzê bide avakirina sosyalîzmê.

Bi vê armancê, kombûna **Enternasyonala Komînal a Yekemîn** bi beşdarbûna derdorên sosyalîst û muxalifên navneteweyî wê pêdiviyeke giring tevdarik bike.

2-Stratejî û Taktîk

Her bername xwe disipêre stratejiyekê. Stratejiya bernameya civaka demokratîk jî siyaseteke demokratîk e, ya ku xwe disipêre xweparastinê û huqûqa hevgirtî. Di navbera stratejiya wê û bernameya wê de pabendiyeke xurt heye. Civaka demokratîk bi siyaseta demokratîk derdikeve holê. Xweparastin û huqûqa hevgirtî du rahendên bingehîn in ku xisleta siyaseta demokratîk diyar dikin.

Siyaseta demokratîk her awa xebatên çalakî (hilbijartin jî di navê de), rêxistinî û serwextbûnê yên civaka komînal bi pêş dixe. Wexta ku PKK hat fesixkirin, stratejiya wê ya xwe disipart şerê rizgariya neteweyî jî hat fesixkirin. Stratejiya şerê rizgariya neteweyî, bikaranîna sîlehê wekî amûrekî bingehîn hewce dike. Bi fesixkirina PKK'ê re ev stratejî jî tê bidawîkirin.

Stratejiya şerê rizgariya neteweyî şûna xwe ji siyaseta demokratîk re hiştiye. Êdî ne sîleh, lê stratejiya siyaseta demokratîk li şûnê tê danîn. Ya giring ew e, bi her awa propaganda, xebatên rêxistinî û di her warî de bi avakirina komînan, tijîkirina nava wê ye. Êdî di dest de wê sîleh tinebe, sîleha siyasetê wê hebe. Clausewitz, şerê eskerî weke rewşa polîtîkayê ya herî zêde xwegurçûpêçkirî pênase dike. Êdî em ê şer wekî amûrekî siyasetê nebînin û em xwe ji vê têgihiştinê dûr dikin. Siyaseta herî baş, siyaseta demokratîk e. Em ji her awa xebatên rêxistinî û serwextkirinê yên ji bo komînbûn û siyasîbûna civakê re dibêjin, siyaseta demokratîk. Ev stratejiyek e ku têra xwe giring e.

Siyaseta demokratîk wê di nava komara demokratîk de were pêkanîn. Em ê Komara Tirkiyê û siyaseta demokratîk entegre bikin. Ev ê bibe garantiya demokrasiyê. Siyaseta demokratîk weke şert civaka demokratîk ferz dike. Lê komara demokratîk jî hewce dike. Heke komara demokratîk nebe, entegrasyon jî nabe. Bi komareke faşîst re entegrasyon çênabe. Lewma bi siyaseta demokratîk re divê komara demokratîk hebe. Bi wê re entegrasyon çêdibe, bi wê re hevgirtin dibe. Ev pir giring e, û bersiva armanca me dide.

Partiya siyaseta demokratîk jî wê hebe. Rêxistin û partiyên ku di warê siyaseta demokratîk de hene, divê pozîsyona xwe ji nû ve û ji serî ve birêkûpêk bikin. Piştî xwefesixkirina PKK'ê, saziyên siyasî yên demokratîk wê li nava tevahiya komarê belav bibin, wê bibin partiya hemû beş û hemû koman; wê bernameyeke nû bidin ber xwe û wê bi vî awayê xwegurçûpêçkirinê siyaseta entegrasyonê bimeşînin. Partiya ku di vî warî de were avakirin, dibe ku guncav be, mirov jê re bibêje, "**Partiya Komara Demokratîk**".

Pêkhatina stratejiyê di siyasetê de bi huqûqê dibe. Bingehê huqûqê jî heq e. Têkoşîna ji bo heqiyê têkoşîna ji bo mirovatiyê ye. Rayedarên dewletê her roj dibêjin, "Kurd û Tirk bira ne, ev biratiyeke hezar salan e". Baş e, heke ku Kurd û Tirk bira ne, çima hûn huqûqê Kurdan nas nakin? Heke huqûqê Ereban, Tirkan û Eceman wê hebe, huqûqê Kurdan jî wê hebe.

Entegrasyona demokratîk, civaka demokratîk û siyaseta demokratîk ev hemû war hewceyî bingehê huqûqî ne.

Ji bo hebûn berbiçav bibe û di warê qanûnî de bi statuyê misoger bibe, huqûq şert e. Huqûq nebe, hebûn berbiçav nabe û statuyê bi dest naxe. Di warê huqûqî de garantî nebe, mirov nikare qala têkoşîna demokratîk bike. Tişta ku dihêle, têkoşîna siyasî ya demokratîk bibe û ji bo vê misogerî û zemîn çêdike, huqûq e. Ango ji bo stratejiya siyaseta demokratîk pêk bê û bimeşe, huqûq xwedî karakterekî wisa ye ku mirov nikare jê bigere.

Ti gel bêyî statu nabe. Têgihiştina ku statuyê bi dewleta netewe yan jî otonomî û federasyona girêdayî dewleta netewe ve bi sînor dikin xwediyê çareyê nînin. Çareseriyên ku xwe disipêrin dewleta netewe, ji aliyê îdeolojîk-polîtîk ve jî nabin çareseriyeke demokratîk û azadîxwaz. Ya esas ew e, nasname û hebûna civaka demokratîk were misogerkirin, garantîkirin. Em statuyê weke bisazîbûna civaka demokratîk dibînin ku ev jî bi huqûqa qanûnî û destûrî dibe. Ev huqûq wê bibe garantî da ku gelê Kurd çand û nasnameya xwe çêke û bi pêş ve bibe.

Huqûq, di heman demê de warekî xweparastinê ye. Lewma binesaziya huqûqî çiqasî bi hêz be, hebûna çand û nasnameyê bi huqûqê hatibe misogerkirin, wê polîtîkayên dewleta netewe yên bi armanca jiholêrakirina hebûnê jî bêne bisînorkirin.

Wexta ku em qala huqûqê dikin, em qala huqûqa giştî dikin. Ev ew huqûq e, di asta qanûnî û destûrî de bi awayekî giştî bi heqên nasnameyî û çandî dadikeve. Em di çarçoveya

qanûnî û destûrî de ji vî huqûqî re dikarin bibêjin, huqûqa hev du temam dike. Ango têkiliya huqûqê bi hebûnê re heye. Ango bingehê qanûnî û destûrî nebe, mirov ne dikare qala hebûna civakî bike, ne jî dikare qala têkoşîn û jiyana siyasî bike.

Li aliyekî din, babeta xweparastinê babeteke manûnemanê ye. Mirov têgihiştina li xweparastinê nikare tenê bi amûran rave bike. Bingehê xweparastinê xwerêxistineke têr û temam e. Heke hêzek di her kêliya rojê de xwe tam birêxistin bike, ev tê wê maneyê, bi her awayî tevdîra xwe ya xweparastinê kiriye. Civakeke xwerêxistiniya xwe nebe, nikare xwe biparêze. Civakeke xwe bi her awayî bi rê xistibe, bêyî ku hewceyî şiddetê bibe, dikare xwe biparêze. Bi siyaseta demokratîk kare xwe biparêze. Ti hêz nikare gelekî rêxistinkirî hilweşîne, bitepisîne, bêdeng bike.

Devberdana ji têkoşîna çekdarî, ji taktîk û stratejiyên xwe disipêrin wê, nayê wê maneyê ku mirov dev ji heqê xweparastinê berdide. Heke hebûna Kurd weke civaka demokratîk misoger nebe û tu rabî dev ji heqê xweparastinê berdî, hingê tu bi destê xwe qebra xwe dikolî.

Gelê Kurd ji bo parastina hebûna xwe bi têkoşîna çekdarî rabû. Di rewşa heyî de tehlûke û gefa li dijî hebûnê dewam dike. Tehlûkeya ku hebûna gelê Kurd pê re rûbirû ye, di asta qirkirinê de ye. Gelê Kurd ji bo vê tehlûkeyê ji holê rake û hebûna xwe misoger bike rahişt sîlehê, lê heke hebûna xwe misoger bike, helbet wê nîzama çekdarî ya heyî nedomîne.

Gelê Kurd gelek berdêlên mezin dan û hebûna xwe ji nû ve ava kir. Heke careke din li dijî hebûna xwe tehlûke û gefxwarinê bibîne, hemin wê bêdeng nemîne. Heke dixwazin pêvajoya bi şer û pevçûn bi dawî bibe, neçar in ku di warê xweparastinê de vesazkirina qanûnî û destûrî pêk bînin.

Civakên ku ji xweparastinê bêpar, tehlûke ji bo wan heye ku nasnameyên xwe, xisletên xwe yên polîtîk û demokratîkbûna xwe ji dest bidin. Ji bo ku em bikaribin bibêjin civaka demokratîk xwe diparêze, divê ew karibe bergiriya nasnameya xwe bike, polîtîkbûna xwe pêk bîne û siyaseta xwe ya demokratîk bike. Rastiya îro ya civaka exlaqî û polîtîk yanî pirsgirêka wê ji azadî, wekhevî û demokratîkbûnê wêdetir, pirsgirêka hebûn û heyînê ye. Ji ber ku hebûn di tehlûkeyê de ye. Li hemberî vê tehlûkeyê, civaka demokratîk parastina hebûnê dixe pêşiya her tiştî.

Me di xweparastinê de weke pîvaneke bingehîn ev pênase kir: Heke hebûn neyê redkirin û bi armanca tinekirinê bi ser de neçin, têkoşîna çekdarî wê weke rêbazekê esas neyê dîtin, li pêş neyê girtin. Heke li dijî hebûnê bi armanca tinekirinê êriş bikin û derkevin seferan, wê wextê sîleh jî di navê de bi her awayî wê heqê parastina rewa çêbe. Li dijî hebûnê, êrişeke bi armanca tinekirinê sedema şer e. Li kû, çi wextê û ji aliyê kîjan dewletê ve were kirin bila bê kirin, li dijî êrişên bi armanca tinekirinê ev heq wê were bikaranîn. Bala xwe bidinê, em dibêjin, êrişa li dijî hebûnê, ev destnîşankirin giring e. Ya rastî, ev meseleyeke têkildarî pirsgirêka hebûnê ye; ne meseleyeke têkildarî azadiyê ye.

Bêyî parastina civakê, siyaseta demokratîk nabe. Siyaseta demokratîk, civaka demokratîk bi pêş ve dibe; xweparastin jî wê li dijî êrişên desthilatdariyê yên li beramberî hebûna wê, azadiya wê, pêkhateya wê ya demokratîk û wekhevîxwaziya wê, diparêze.

Xeta xweparastinê ya civaka demokratîk cuda ye. Stratejiya rizgariya neteweyî xwe disipêre zor û sîlehê, lê di komînan de ev xet xwe disipêre xweparastinê. Di pêşketina faşîzmê de para komînîst û sosyalîstan gelek bû, ji ber ku nikarîbûn xeta xweparastinê rast bi pêş bixin, nikarîbûn di nava dewletê de tifaqeke rast bi pêş bixin û nikarîbûn dewleta normê û dewleta li derveyî huqûqê ji hev derxin. Civaka demokratîk bi awayekî esasî xweparastina xwe li dijî her awa hêzên li derveyî normê û huqûqê dike; ew hêz êrişî hebûna civakî û

demokratîk a gel dikin. Êrişên sîstematîk û niyetxirab ên li dijî daristanan, avê, jîngehê, pêkhateyên demokratîk û civakê di çarçoveya xweparastina rewa de ne.

Wexta ku me dev ji dewleta netewe berda, me dev ji xweparastinê berneda. Ya rastî, em li dewleta netewe weke zirxekî parastinê fikirîbûn. Lê me dît ku civak bi vî awayî nayê parastin. Li hemberî vê, parastina civakê bi heqê xweparastinê, misogerkirina bi huqûq an jî sîstemeke cuda ya ewlekariyê, erkeke bivênevê ye. Azadî û hebûna Kurdan bêyî xweparastinê nabe. Di heman demê de nabe ku ev erk ji hin kesan an jî koman re were hiştin. Ev erk a tevahiya welatiyên azad ên neteweya demokratîk e, ya tevahiya rêxistin û komînan e, û di nava erkên wan ên eslî de ye. Cewher û esasê meseleyê ev e.

Stratejî fikir e, taktîk pêkanîn e. Çarçoveya taktîk a stratejiya siyaseta demokratîk a xwe disipêre xweparastin û huqûqa giştî, di nava xwe de rêbazên pratîkbûnê dihewîne.

Civaka demokratîk wê bi rêbazên têkoşîn û rêxistiniyê yên di mîhwera stratejiya siyaseta demokratîk de bê avakirin. Ji vê re, warê taktîkî tê gotin.

Ji bo avakirina civaka komînal-demokratîk warê taktîkî heta tu bibêjî berfireh e, û xwedî rêbazên dewlemend e. Lewma ji bo pêkhatina stratejiya siyaseta demokratîk derfet û îmkan têra xwe hene. Divê mirov tevahiya şêweyên têkoşîna civakî, siyasî û demokratîk di vê çarçoveyê de bibîne. Her awa çalakiyên sivîl ên guhnedanê, protesto, xwepêşandan, grev, aktîvîteyên girseyî, mîtîng, meş, hilbijartin, xebatên rêxistinî û avakirinê di vê çarçoveyê de ne. Civaka rêxistinkirî ew civak e, bi helwesta xwe dikeve nava çalakiyên girseyî yên demokratîk û heta encam bigire, têdikoşe; wexta ku hewce bike rêbazên huqûqî bi kar tîne û heqê xweparastinê bi kar tîne. Ev jî helwesta çalakiyên taktîk ên vê demê pênase dike.

ENCAM

Bi manîfestoya civaka demokratîk, ya ku di mîhwera wê de komîn û jin heye, rêwîtiyeke dîrokî pêk tê. Ev têgihiştina komînê, li her ferdê xwedî biryar e ku bibe komînar, berpirsiyariyeke civakî ya giring bar dike. Her endamê komînê ku serwext e, li vê cografya û vê serdemê dijî, wê li ser bingehê serwextbûneke li hebûnê, xwe bide ber vê berpirsiyariyê. Kesê xwedî ruh û rewanê komînalîteyê ew kes e ku di xwe de paşerojê ava dike, dilsozê ax, gel, dîrok û çanda xwe ye.

Komînalîte di nava xwe de etîk-estetîkê dihewîne. Etîk, îrade û serwextbûna azad a komînalîteyê ye. Ji bo komînalîteyê, îrade û serwextûneke azad a bi hêz hewce dike. Mirov heta ku nebe xwedî îrade û serwextbûna azad, nabe komînalîst û nikare civaka demokratîk ava bike. Civaka demokratîk ew civak e, bi îrade ye, û azad e. Etîk-estetîk pîvanên jiyana komînalîteyê ne. Estetîka komînalîteyê civakîbûna wê ye, forma wê ya civakî ye. Jiyana herî rast, ya herî qenc û ya herî bedew weke civaka demokratîk û jiyana komînal bi pênase dibin.

Jin tenê bi komîna demokratîk dikarin wan nirxên ku ji destê Xwedawend Înannayê hatine girtin, ji nû ve bi dest bixin. Jina azad, bêyî komîn nabe. Li her deverê komînên jinan dikarin bêne avakirin. Nirxê jiyanê, yê ku bêyî wî nabe, komîn e. Jin ango komînalîte.

Mak û cewherê jiyana komînal çiyayên Toros-Zagrosê ne. Ji bo mirov ber bi sêhr û heybeta van çiyan nekeve, ti sedem tineye. Li dora wan rêxistina komînê weke hûnandina helbestê, mirov dikare jîn û jiyanê bihûne. Li van çiyayan, lêgerên azadiyê bi qasî pêncî hezar

şehîd, cangorî û pakrewan dan. Ji bo ku mirov bîranînên wan zindî û mayînde bike, divê mirov komîna herî baş û qenc ava bike. Di dîrokê de dergûşa mirovîbûn, civakîbûn û jiyana komînal ev herêm e, îro jî ti sedem û kelem li ber nîne ku bi heman rolê rabe.

Heta bi vir, me li ser xweza û civaka dîrokî hûrûkûr tehlîl û analîz kirin. Bi van tehlîlan, em gihiştin hin heqîqetan; ew heqîqetên sereke û bingehîn jî ev in:

Heqîqet 1: Tesbîta ku dibêje, ʻLi gerdûnê tişta ku tenê naguhere guhertin e ʼtesbîteke rast e, lê kêm e. Guhertin heye, lê veguherîn jî heye. Lewma ya rast ew e, em bibêjin, guhertin û veguherîn. Heke veguherîn nebûya, di gerdûnê de evqasî pircuretî û pirrengînî wê derneketa holê. Di vê çarçoveyê de weke pênasekirina heqîqeta gerdûnî, hewce dike ku em "qanûna guhertin û veguherînê" tesbît bikin.

Heqîqet 2: Xwezaya civakî xwe disipêre mirov û bi pêş dikeve. Heke ku em ji xwezaya fizîkî re bibêjin, xwezaya yekemîn, rast e ku em ji xwezaya civakî re jî bibêjin, xwezaya duyemîn. Xwezaya duyemîn xwedî karakterekî cuda ye; ev cudabûn têkildarî civakîbûn û şêweyê zêdebûna mirov e. Wesfê herî berbiçav ê xwezaya civakî ew e, xwe disipêre mirov û bi pêş dikeve. Wesfê herî bingehîn ê mirov jî xisleta wî ya civakîbûnê ye ku bixwesipartina fikir û serwextbûnê bi pêş dikeve. Civakîbûna mirov li ser bingehê "komînê" derdikeve holê. Derketina holê ya komînê di çarçoveya rewşeke fikirî û zêhnî de ye. Zêhn, mirov ji cureyên din cuda dike. Divê mirov civakîbûna insan weke klan û komînê bibîne.

Heqîqet 3: Dîrok şerê şaristaniya dewletperest û komînalîteyê ye. Civakîbûna jin-dayikê, bi berhevkariyê xwediyê wî karakterî ye ku civaka klanê pêk bîne. Cinsê mêr xwe cihê kir û vî cinsî bi vê cihêbûnê re civakîbûnek li ser bingehê nêçîrvaniyê bi pêş xist û vê yekê ew bi nasnameyeke hegemonîk gurçûpêç kiriye. Vê nasnameyê, civakîbûna xwe disipêre jin-dayikê, dagir kiriye, talan kiriye û kiriye kole. Tevahiya lêkolînên etîmolojîk, arkeolojîk û antropolojîk, rastî û heqîqetên derbarê mirov de, hemû darbeyeke bi vî awayî ango hebûna rûdana pirsgirêkeke bi vî awayî eşkere nîşan didin. Rûdana vê pirsgirêkê, klana xwe disipêre jin-dayikê yan jî komînbûnê, dike duşeq û bi vî awayî qelş li civakîbûna jin-dayikê dikeve.

Wexta ku ev qelşa mezin li civakê dikeve, pirsgirêka pêşî derdikeve holê ew e ku bi vê re çete yan jî klîkeke mêrên serdest çêdibe; em dikarin wê weke revdeya nêçîrvanan bi nav bikin, yan jî em dikarin bi pênasekirineke bêhtir civakî û zanistî jê re bibêjin, koma "kujerê kastîk", ev koma kujerê kastîk li hemberî civakîbûna jin-dayikê dibe xwedî helwest û pozîsyon. Ji wê rojê heta roja me ya îro, ev duşeqbûn mezin dibe û qelşa li civakîbûnê ketî kûr dibe. Li şeqekî serdest, koledar û mêhtinkar cih digirin; li şeqê din jî bindest, mexdûr, yên têne mêhtin û qirkirin hene. Ev rastî jî mirovatiyê ji qonaxekê derbasî qonaxeke din a cuda dike.

Li aliyekî bajar, çîn û dewletbûna xwe disipêre hêza serdest a mêran, û amûra bi navê dewletê ya ku li ser desteserkirina komînê misêwa mezin dibe, hene. Jixwe dewlet amûrek e ku xwe qral-xweda ragihandiye, îdeolojiya xwe çêkiriye, bêhtir giraniya xwe li bajêr nîşan dide, bûye çîn, bûye efendî û vê jî bi gelek awayan kamûfle dike, xwe dike ku kes negihîjiyê û kes pê nizanibe. Li aliyekî din jî beşekî bindest ê ku tê mêhtin û keda wî tê xwarin û bûye xelkê çolterê heye; ev beş ji bo xwe bisitirîne û bimîne, xwe li çol û çiyayan xistiye. Yanî pêkhateyeke civakî di karakterê komînê de heye ku ji hev hatiye parçekirin; li çol û çiyayan bi zor û zehmetî hebûna xwe diparêze, lê xisleta xwe ya komînê bi ti awayî ji dest nade. Heke ku em li ser bingehê binavkirineke temamker diyar bikin, em ê bibêjin, li aliyekî "şaristaniya dewletperest" heye û li hemberî wê jî rêxistineke civakî heye ku em ji wê re jî dibêjin,

“komînalîte”. Şaristaniya dewletperest û komînalîteyê dualîteyek pêk anîne û vê dualîteyê mirovatî bi duşeqbûn û qelşa li civakîbûnê xistî re rûbirû kir. Dîrok ne şerê çînan e, ji şerê şaristaniya dewletperest û komînalîteyê pêk tê. Mirov dîrokê bi vî awayî ango bi vê dualîteyê pênase bike û bide xuyakirin, jixwe tevahiya dîrokê di çarçoveya vê dualîteyê de meşiyaye, ev awa wê bêhtir heqîqetê û rastiyê pênase bike.

Me ji tevahiya zanistên dîrokê, ji antropolojiya wê, heta ji şiroveya wê ya sosyolojîk sûd wergirt û em gihiştin vê encamê. Di pêvajoyên bilindbûna îdeolojiyên komînalîst ên serdema mîhwerê de jî ev heqîqet bi awayekî zelal derdikeve holê. Vê têkoşînê, bi bilindbûna sosyalîzma pêkhatî yan jî sosyalîzma utopîk li dijî kapîtalîzmê bêhtir xwe berbiçav kiriye û di şerê navbera “hêzên komîn û komînalîteyê” û “hêzên şaristaniya dewletperest û modernîteya kapîtalîst” de xwe bêhtir nîşan daye.

Têgihiştina sosyalîst a xwe disipêre nakokiya çînî ne realîst bû û ji ber ku ne realîst bû, ji ber sedemên navxweyî hilweşiya. Li hemberî vê têgihiştina sosyalîst; heqîqetek heye, ya ku bêhtir realîst û meşa rast a dîrokê pênase bike; ev heqîqet weke duşeqbûna komînalîte û şaristaniya dewletperest heta roja me ya îro tê û roja me ya îro jî em wê weke hatina beramberî hev a modernîteya kapîtalîst û modernîteya demokratîk pênase dikin.

Heqîqet 4: Rastiya Kurdan û erdên wan ên li ser bi cih bûne, qonaxeke proto-modern afirandiye. Ev qonaxa ku em qala wê dikin, berhemê daneheva sedhezar salan e. Cureyê mirov ê ku li Efrîkayê bi gewde bû, li cîhanê belav bû; rawestgeha wî ya duyemîn a mezin hilala Toros-Zagrosê bû, li nava vê hilalê û derveyî wê, li qûntarên wê û deştên wê, bi kêmanî dîroka daneheveke 300 hezar salî çêbûye û qonaxa ku em qalê dikin ev e.

Li Efrîkayê bi mîlyonan salî li ser du piyan meşiyaye, hin deng derxistine û bi hin işaretan li hev kirine, lê ti carî xwe negihandine çandeke mayînde. Lê wexta ku ev cureyê mirov hatiye Mezopotamyayê, di çand û zimanê civaka dayikê de pêşketineke mezin çêbûye. Daneheva sêsed hezar salan li vir xurt û mayînde bûye, xwe gihandiye heta roja me ya îro.

Li nîvgirava Erebistanê û li bakurê Efrîkayê koma ziman a Samî, ji bakurê Asyayê heta bi Rojhilatê Ewrûpayê koma ziman-çand a Ûral-Altay bi pêş dikeve. Lê belê herdu jî hem di warê komînalîteyê de hem jî di warê şaristaniyê de nabin xwedî pêşketineke ciddî û berbiçav. Di navbera herduyan de afirînerê komînalîte û şaristanîbûna mezin Aryen derdikevin û bilind dibin; ew yan di bin bandora Aryenan de mane yan jî hin caran êrişî wan kirine û bi vî awayî xwestine ber li pêşketina wan bigirin.

Qurmê dara dîroka mirovatiyê li “Hilala Bibereket” bi gewde bûye. Şopên çanda li Hilala Bibereket hê jî hene. Xirbên li Girê Keçel û Girê Mirazan a Xirabreşkê derketine holê, bermahiyên wê çandê ne ku heta roja me ya îro mane. Jixwe wekî din tesbît bûye ku bi kêmanî dused cîhên din ên mîna Girê Mirazan hene. Ev erd û cografya ew cihûwar e ku cara pêşî lê gund û bajar ava bûne, û cara pêşî lê çand çêbûye. Hem komînalîteya di mîhwera jin-dayikê de, hem jî çanda mêrê serdest a ew xist bin zorê, li vir ango li ser van erdan reh û rîş berdane.

Komên ku em ji wan re proto-Kurd dibêjin, di navenda van bûyer û pêşketinan de ne, û cara pêşî wan çand çêkiriye. Dîroka vê, bi kêmanî xwe disipêre 15 hezar sal berê. Xebatên etîmolojîk, rewşa şêniyên bi xwe li vê cografyayê, rastiya qebîleyê ya hê didome, rastiya hilberînê, hebûna hêmanên çand û ziman vê nîşan didin. Heke ku ji bo Kurdan wê li dîrokeke pêş were pirsîn, divê mirov di vê rastiyê de lê bigere û bipirse. Heta bi dema dîroka nivîskî ya Sumeran daye destpêkirin, ev bi vî awayî ye. Di çavkaniyên nivîskî yê Sumeran de ku gihiştine heta roja me ya îro, şopên pêkhatina Proto-Kurdan xuya dikin. Heke ku em tenê peyvekê jî ji hev derxin têrê dike ku em heqîqetê pir zelal bibînin. “Nînhûrsag” serxwedawenda Sumeran

e, û reha vê peyvê Kurdî ye. Nînhûrsag, peyveke Proto-Kurdî ye. Peyva “nînê” tê maneya “jinê”. “Kur” jî tê maneya “çiyê”. “Sag” jî tê maneya “war-herêmê”. Yanî Nînhûrsag tê maneya xwedawenda herêmê. Hûrrî xwe disipêrin vê çandê, Ûrartû jî xwe disipêrinê. Û ev hemû vê cografyayê pênase dikin. Xuya ye ku Sumeran bi awayekî etîmolojîk ev Kurdên çiyayî esas girtine, belkî ew bi xwe bûne û em vê rastiyê, wexta ku peyvekê bi tenê jî tehlîl dikin dibînin.

Piştî Sumeran, Pers jî di nava heman hevkarîgeriyê de ne. Pers bi Proto-Kurdan re di nava têkiliyê de bûn û di warê çandî de jî bandora wan li hev du hebû; di encama vê danûstendinê de împaretoriya pêşî ya dunyayê derket holê. Çavkaniyên nivîskî jî hene, ev xwe li ser stûnên antîk ên Darayê (Darîûs) jî xwe nîşan didin. Şerê dawî yê Asûr û Medan, di tevahiya çavkaniyên dîrokî de heye û bi hûrgilî tê gotin, bi sed salan dewam kiriye.

Grek peyva “Kurdiyan” bi kar tînin. Têgîna “Kurdiyan” yan jî “Kurtî” reh û rîşa peyva Kurd e; di wêjeya Grek de têra xwe heye. Ji çaran sisiyê dîroka Herodot derbarê bûyerên li hilala Toros-Zagrosê de ye. Ha komên ku em ji wan re dibêjin, Proto-Kurd ew kes in ku di van vegotinan de navê wan tê hildan û qala wan tê kirin.

Wexta ku em tên serdema navîn, bi gavavêtina Îslamê re Kurd weke “Ekrad” derdikevin ser dika dîrokê. Di wêjeya Ereb a serdema navîn de eşkere qala wan tê kirin. Bi hatina Tirkan a Rojhilata Navîn re Selçûqî bi xwe têgîna “Kurdistanê” weke navê welatekî, navê eyaletekê bi kar tînin. Ji zimanê Aryen sûd werdigirin, hinek jî dibin Aryen, xwe disipêrin çand û zimanê Aryen û têgîna Kurdistanê bi kar tînin.

Di dema Osmaniyan de ev bêhtir bi awayekî berfireh weke eyaletan, parêzgehan, hikûmetan û ocaxan tê pênasekirin. Heqîqeteke Kurdistanê heye û ew jî ji peyva “Kur” tê. “Kur” tê maneya “welatê çiyê”. Di encamê de peyva Kurd di nava xwe de maneya “qewmê çiyê” dihewîne. Ji wê rojê ve di çiyê de bi awayê asêmayî hebûna xwe diparêzin. Şaristanî li deştan bi gewde dibin. Sumer jî li deştê bi gewde bûn û ji aliyê qral-xwedayan, paşê jî ji aliyê qasidên xwedê yên xwe weke şah, siltan û bi navên hwd. hêzên serdest ên mêran vesazkirin, misêwa ew tengavkirin û ji ber vê xwe li çiyayan girtin, li wir komînên xwe yên piçûk ava kirin û hewl dan xwe bi qebîleyan li ser piyan bigirin; rastiyeke dîrokê ya bi vî awayî heye. Ev rastî, heta roja me ya îro hebûna xwe dewam dike.

Dîroka mirovatiyê di mîhwera dualîteya şaristaniya dewletperest û komînalîteyê de bi pêş ketiye. Bingehê civakê komînal e. Mirov xwezaya duyemîn tenê weke komînalîte dikare pênase bike. Proto-Kurd jî li ser bingehê komîn, komînalîteyê bi gewde bûne. Rastiya qebîle û eşîrê komînalîteyê pênase dike. Kurd bi giranî civakeke komîn û qebîleyê ne. Yên ku bûn bajar û bûn çîn jî şaristaniyên dewletperest pênase dikin. Şaristaniyên dewletperest û komînan timî şerê hev kirine û ev rastiyek e. Heke ku mirov di vê çarçoveyê de bi dîroka Kurdan dakeve, mirov ê bêhtir li meseleyê serwext bibe û bêhtir rastiyê baş pênase bike. Me bi xetên giştî ev heqîqeta dîrokî danî holê û bi vî awayî pêdaketina wê, hem wê pirsgirêkên roja me ya îro rohnî bike, hem jî wê bike ku em derfetên çareseriyê jî bibînin.

Hakikat 5: PKK û heqîqetên têkildarî wê, heqîqeta pêncan a mezin pêk tînin. PKK, li ser bingehê rastiyeke Kurd a tine, lê divê were avakirin û li ser bingehê heyîkirina dîrokeke Kurd bi gewde bûye. PKK’ê, dema ku derket holê, hewl daye bi hin têgînên serdema modern ên weke “netewe”, “çîn”, “dewleta netewe” û “pergala sosyalîst” xwe pênase bike. Bi têgînên weke “mêhtingeh”, “antî-mêhtingeh, “emperyalîzm” û “neteweya bindest” bi rê ketiye. Di destpêkê de serwextbûna wê ya li dîrokê pir kêm e. Bingehê serwextbûna wê ya li dîrokê ji aliyê damezirînerê wê Abdullah Ocalan bi xwe ve bi têgîna “Kurdistana Mêhtingeh”hatiye danîn. Di vê têgînê de heqîqeteke veşartî heye ku ji bo jihevderxistinê têra xwe guncav e. Li

gorî dema xwe têgîna “mêhtingehê” û xwedîderketina li “Kurdistanê” têra xwe mirov berketî dikin û bi pêş dixin. Her ku têkoşîn bi pêş ket, nexasim her ku têkoşîna îdeolojîk xurt bû, şerê eskerî, polîtîk û îdeolojîk bi hêzên li beramber re jî zêde bû û vê jî pêdiviya serwextbûna li dîrokê ferztir kir.

Dîroka Proto-Kurd ku qonaxa yekemîn a dîroka Kurd e, li cografyayeke berfireh pêk tê û bi giştî di dîroka mirovatiyê de cihekî xwe yê giring heye. Qonaxa diduyan a dîroka Kurd “dîroka sergirtî” ye; di vê qonaxa dîrokê de li hemberî hêzên şaristaniyê ku mezin dibin, Kurd ji xweseriya xwe dibin û neçar dimînin li ber siya wan hebûna xwe dewam bikin. Ji Persan û vir ve, heta beriya wan jî dîrokeke sergirtî heye. Mirov dikare vê bigihîne heta bi Sumeran. Em li kîjan şaristaniya cîran bikolin, em ê dîrokeke Kurd a sergirtî bibînin. Em vê di mînaka Persan de bi awayekî berbiçav dibînin. Li cem Asûr, Babîl û Sumeran jî ev heye. Di dîroka Helenîstîk de hema bêje, bi awayekî fermî gotina “Kurdiyan” derketiye holê. Li cem Herodot ku weke bavê pêşî yê dîrokê tê hesibandin, ev têra xwe heye. Heke mirov dîroka Herodot bike bingeh, mirov ê karibe bi pîvanên zanistî dîroka Kurdan deyne holê. Lê ev jî wê dîsa têra xwe bibe dîrokeke sergirtî.

Di serdema navîn de jî girêdayî dîroka Ereb, di nava dîroka Îslamê de dîrokeke Kurd a sergirtî û pir berfireh, lê têra xwe sergirtî heye. Li aliyekî din, ji salên 1000’î ve bi dîroka Îslamê re di nava dîroka Tirkan de carinan di asta sereke de lê bi giranî sergirtî dîrokeke Kurd a xwe didomîne heye û ev jî heta bi sedsala 19’an tê.

Ji sedsala 19’an ve dîrokeke cuda derdikeve holê. Ev jî hevkarên dîroka sergirtî ne, li statuyên xwe yên berê digerin, lê bi sedema modernîteya kapîtalîst ew derfet ji destê wan çûye, isyan dikin ango ev ew dema isyanên bi pêşengiya mîr û şêxan e. Hemû jî bi felaketê bi encam dibin. Li Silêmaniyê, sala 1806’an, Babanzadeyan dest bi ceribandina hin isyanên pêşî kir û ev jî ber bi tinebûnê ve çûn û êdî Kurd ketin qonaxekê tê de bi temamî hatin înkarkirin. “Dîroka Sergirtî ya Kurd” diçe û dema “dîroka înkar û îmhayê” dest pê dike. Di tevahiya isyanên sedsala 19’an û 20’an de pêvajoya îmhayê didome.

Piştî şerê cîhanê yê diduyan demek tê hema bêje kirasê bêdengiya mirinê li xwe dike. Ji dema pêşî ya sedsala 20’an re mirov dikare bibêje, “dema îmhayê”, ji dema diduyan re jî ku bêdengiya mirinê lê serdest e, mirov dikare bibêje, “dema înkarê”. Êdî “Kurd û Kurdistan” tinene, li dîrokê hatine veşartin, hatine binaxkirin. “Ser wan hatiye betonkirin” ha ev gotin jî di wê demê de derketiye holê. Li her beşê Kurdistanê heman rewş qewimiye. Di dema diduyan a sedsala 20’an de PKK derketiye holê, di wê rewşa înkarê ya dijwar de bi sloganeke ji du peyvan hewl daye dîrokê biafirîne, rastiyekê çêke. Bi gotina, “Li vir rastiyeke millî heye, li vir neteweyek heye û hatiye pelixandin” xwedî li dîrokê derketiye. PKK’ê bi têkoşîna ji pêncî salî zêdetir meşandî, hebûna Kurd îsbat kiriye. PKK’ê got, “Kurd neteweyek e, û tevahiya dîrokê hebû. Heqên Kurdan ên bingehîn hatine desteserkirin û divê heqên wan bêne dayin.” Bi vê gotinê, dest bi stratejiya têkoşîna çekdarî kiriye. Herçiqasî xwe pir kêm gurçûpêç kiribû jî ketiye nava vî şerî û di encamê de ji hêzên dagirker, mêhtinger û qirker zêdetir ev têgihiştin bi Kurdan daye qebûlkirin. Derbên mezin li koletî û înkara bi rizadilî ya dijmin ferzkirî daye. Ev gelekî bi bandor bûye û her kes hejandiye. Di encamê de rastiya ku em jê re dibêjin, hebûna neteweyî ya Kurd hatiye qebûlkirin. Ha ji vê demê re jî em dikarin bibêjin, “Dema rastiya PKK’ê”. Heke ku dema înkar û îmhayê xwedî dîrokeke dused salî be; rastiya Kurd a PKK’ê jî xwedî dîrokeke pêncî salî ye. Ev jî demeke dîrokî ya giring e, û divê ciddî were dîtin.

Ji bo hebûna Kurdan weke realîteyekê were qebûlkirin, zemînê îdeolojîk ê ku PKK’ê xwe sipartibûyê, bi roleke giring rabûye. Heta li bereya wê ya paş a îdeolojîk, para rastiya sosyalîzma pêkhatî jî mirov nikare înkar bike. Hebûna Kurdan bi stratejiya şerê rizgariya

neteweyî hatiye realîzekirin. Lê wexta ku xwestiye ji vê wêdetir biçe, ango wexta ku xwestiye ber bi dewleteke netewe ve biçe, bi rewşeke asêmayî ya mezin re rûbirû bûye. Dema ku em li rastiya sosyalîzma pêkhatî jî dinêrin, em dibînin ku di vê rewşa asêmayî de sedemên navxweyî hene û rola van sedeman bi xwe di jihevdeketina sosyalîzma pêkhatî de heye. PKK jî ji rewşeke bi heman rengî rizgar nebûye. Nikarîbû xwe demokratîk bike û ji têgihiştina netewe ya bûrjûwayê rizgar bike. Herçiqasî gotibû, "neteweyeke yekbûyî ya serbixwe" jî bingehê vê yê dîrokî û civakî tinebû û jixwe konjonkturê jî destûra vê neda. Herçiqasî rewşa asêmayî û rewşa gelekî xwedubarekirî hatibe dîtin jî di warê xwerizgarkirina ji rewşê de pêşketin çênebû. Di vê çarçoveyê de hûrûkûr guftûgo hatin kirin û hewce hat dîtin ku hebûna PKK'ê were bidawîkirin. Hebûn temam bûye û êdî gavavêtina qonaxeke nû xwe ferz kiriye.

Heqîqet 6: Rêber Abdullah Ocalan 27'ê Sibata 2025'an bi "Bangawaziya Aştî û Civaka Demokratîk" kiriye armanc ku hem hebûna PKK'ê bi dawî bike, hem jî perspektîva têkildarî paşerojê bide û ev bi vê bangawaziyê ji tevahiya dunyayê re ragihandiye.

Ev bangawazî li partiya ku xwedî bernameyeke sosyalîst a pêkhatî û stratejiya şerê rizgariya neteweyî hatiye kirin. Di çarçoveya pêşbîniya vê bangawaziyê de hatiye xwestin ku PKK xwe fesix bike. Bi vî awayî deriyê dema PKK'ê hatiye asêkirin. Ev bangawazî yekalî ye, û nîşaneya niyetpakiyê ye. Ne tenê ragihandina vê, di heman demê de pêkanîna wê jî di asta dîrokî de pir giring e, divê mirov bi vê têgihiştinê pê re rabe û ev heqîqetek e ku wê paşeroja me rohnî bike.

Ev bangawazî, ne weke ku hinek dixwazin nîşan bidin, ne bi zora derve, ne bi zexta dewletê yan jî ne bi bandora wan kesan e ku dixwazin ji hundir ve rewşa asêbûyî kûr bikin, lê di encama însiyatîfeke dîrokî de pêk hatiye; Rêber Abdullah Ocalan bi xwe tehlîlên hûrûkûr û pêdaketineke xurt a sosyolojiya dîrokî kiriye. Di çarçoveya vê însiyatîfê de perspektîvên têkildarî paşerojê hatine pêkanîn.

Qonaxa ku Kurd bibin hebûn, temam bûye. Lê damezirîna wan a demokratîk û bisazîbûna wan kêm e. Pênaseya wan a siyasî û huqûqî tineye. Herçiqasî hin hewldanên niyetpak hebin jî bi wan mayîndebûn misoger nebûye. Bi qasî manûnemanê giring e ku ev rewşa ne zelal û heta kaotîk ji holê were rakirin. Lewma bi qasî manûnemanê guherîn û veguherîna demokratîk weke erkekê li ber me ye.

Heke ku em dixwazin bigihîjin encameke manedar, divê em çar qonaxên mezin ên dîrokê yên heta roja me ya îro li dawiyê bihêlin, dest bi pêvajoyeke nû ya dîrokî bikin, wê bi pêk bînin û wê bi pêş ve bibin. Ji nava hemûyan, ji nava xwe divê serdemekê bide destpêkirin. Bi vê serdemê re hema mirov bibêje, kulîlk dipişkivin, ber didin û maka jînê der dibe. Em li destpêka vê pêkhatinê ne û navê wê netewebûna demokratîk e. Kurd ê nebin weke her çi dewleteke netewe, lê wê bêyî netewe jî nemînin. Wê bibin netewe, lê wê bibin neteweya demokratîk.

Dîroka Proto-Kurdan, dîroka Kurdan a komînal, herçiqasî sergirtî be jî dîroka qebîle û eşîran, dîroka îmha û înkarê, û di taliya hemûyan de dîroka PKK'ê, li ser Kurdan netewebûna demokratîk ferz dike. Hilweşîna zêhniyeta neteweya dewletperest a sosyalîzma pêkhatî jî mijar bi lez kiriye û xistiye pêş. Xuya bûye û hatiye dîtin ku sosyalîzma pêkhatî tenê bi neteweya demokratîk dikare were nûkirin û gavavêtina xwe ya dîrokî dewam bike. Yek ji pêkhênerê li pêş ê vê yekê wê gelê Kurd be; di asta navneteweyî û global de yan jî di asta gerdûnî de wê bandora xwe çêbe.

Şer û pevçûnên mezhebperest û eşîrperestan ên xitimî yên li herêmê, bi têgihiştina neteweya demokratîk dikarin çareser bibin. Keşmekeşiya dewletên netewe afirandî, dused salên dawî Rojhilata Navîn kiriye sergo û zibale. Rêya derketinê ya ji nava vê zibaleyê wê

enternasyalîzma neteweya demokratîk be. Heta ku ev enternasyonalîzm bi pêş nekeve netewe û gelên Rojhilata Navîn wê nikaribin ji nava vê zibaleyê rizgar bibin. Pîvana pêşî ya heqîqeta mezin a şeşan li hemberî dewleta netewe ya kapîtalîzmê neteweya demokratîk e, pîvana diduyan jî ew rastî ye ku alternatîva kapîtalîzmê komînalîzm e, pîvana sisiyan jî alternatîva endustriyalîzmê eko-ekonomî ye.

Jinan li ser van erdan tevahiya dîrokê weke hêza pêşeng a civaka komînal rola xwe lîstine. Civaka dayikê ku hêmana damezirîner a civakê ye, li ser van erdan pişkiviye û xwe pêk aniye. Ji vê jinê ku hêza pêşeng a civaka komînal bû, tiştek nemaye, pirnisiye, bûye weke gincirê avêtinê. Navê wê heye, ew bi xwe tineye. Pirsgirêka azadiyê ya vê jinê heye. Pêvajoya înkar û îmhayê pirsgirêka jinê bi dijwarî heta roja me ya îro aniye. PKK'ê bi mîrasa afirandî, bi têkoşîna azadiya jinan, jin kirine hêza pêşeng. PKK'ya ku li ser heman erdan bi gewde bûyî, civaka jin-dayikê, ya kêm tişt jê mayî, vejand û têkoşîna azadiya jinan bi awayekî pir zêde balê bikişîne, gihand asta herêmî, neteweyî û navneteweyî. Jin hem di nava PKK'ê de, hem jî piştî wê di avakirina azadiyê de bûne hêza sereke û xwediyê rola pêşengiyê.

Têkilî wê bi dewletên netewe yên cîran re li gorî têgihiştina entegrasyona demokratîk bin. Divê tevahiya astengiyên li pêşiya siyaseta demokratîk bêne rakirin. Di çarçoveya siyaseta demokratîk a xwe disipêre komînê de divê bi ziman û çanda xwe perwerdeyê bike, ekonomiyeke pêdiviyên bingehîn tedarik dike, bi pêş bixe, ekonomiyeke eko-endustriyal bi xwe pêk bîne, dest bi xebatên ziman û dîrokê bike. Di dema nû de bernameya xwejinûveavakirinê wê li dora siyaseta demokratîk were vesazkirin.

Heqîqet 7: Ji bo çareseriya demokratîk muzakereyên demokratîk hewce dikin. Li pêşiya pêkanîna siyaseta demokratîk û civaka demokratîk pirsgirêka herî bingehîn domandina siyaseta îmhayê û di warê veguherînê de rika vê zêhniyetê ye. Ango siyaseta îmhayê rê li ber pêkhatina siyaseta demokratîk û civaka demokratîk digire û zêhniyeta vê siyasetê ji bo xwe veneguhere li ber xwe dide. Lewma bangawaziyên bi armanca niyetpakiyê balê dikişînin ser vê rewşê û pê re alternatîvên çareseriyê jî pêşkêş dikin. Dev ji şerê çekdarî hatiye berdan û şerê rizgariya neteweyî êdî weke rêya sereke ya çareseriyê nayê dîtin. Bi vî awayî, bang hatiye kirin ku xeta şer a dibêje, "têk biçe-têk biçe" bi dawî bike û li şûna wê stratejî û polîtîkaya çareseriya demokratîk bi perspektîva civaka demokratîk û li ser bingehê bi dewletên cîran re "bi ser bixe-bi ser bixe" esas hatiye girtin. Bi vê, di serî de Komara Tirkiyê, bi Komara Îslamî ya Îranê re, bi Komara Iraqê re û bi Komara Sûrî re lihevkirina demokratîk hatiye xwestin.

Ji bo lihevkirina demokratîk, entegrasyona demokratîk hewce dike. Heke ku em di çarçoveya Komara Tirkiyê de meseleyê pênase bikin, em ê bibêjin, divê komar xisletên xwe yên dewleta huqûqê ya demokratîk, dewleta sosyal û dewleta laîk ji rewşa muceredbûnê derxîne û bi awayekî wan berbiçav bike û li ser vê xetê bimeşe. Em ji vê re dibêjin, "Komara Demokratîk". Divê dewlet bi veguherîneke bi vî awayî derkeve pêşberî me. Ya giring ew e; Kurd li şûna kategoriyên federe, herêmî yan jî çandî, bi "kategoriya civaka demokratîk" entegreyî komara demokratîk bibin.

Yekîtiya navxweyî ya Kurdan jî yek ji wan pirsgirêkan e ku divê li ser bingehê neteweya demokratîk çareser bibe. Li aliyê din jî komeke hevkar a dîrokî ya pir xirab heye ku em jê re dibêjin, "koma judenrat" ji pozîsyona zirardana îmhaker bê derxistin. Li aliyekî din jî divê bi "komên milletperestên Kurd ên cûrbicûr" re ku bi kok bûrjûwaya piçûk in, li ser bingehê raza yekîtiya demokratîk bi wan re tifaqa civaka demokratîk were kirin. Mirov dikare vê ji bo tevahiya Kurdistanê bi navê **Yekîtiya Kurdistana Demokratîk** pêk bîne.

Bi awayekî ku tevahiya Kurdistanê bigire nava xwe, bipêşxistina **Yekîtiya Komînên Demokratîk** ên xwe disipêrin demokrasiyê wê helwesteke rast be. Piştî fesixkirina PKK'ê hêzên mayî divê ji nû ve berê xwe bidin yekîtiyeke îdeolojîk-polîtîk û li ser vî bingehî li her beşî û li her deverê Yekîtiya Komînên Demokratîk bi kar û xebateke zêde û di demeke diyar de pêkhatinên nû pêk bînin, û seyra dîrokê vê ferz dike.

Partiyên legal ên li beşên Kurdistanê hene jî divê xwe weke "Partiyên Komara Demokratîk" biguherin û xwe li gorî dema nû adabte bikin û hewce ye ku xwe ji nû ve vesaz bikin.

Me bi xwezaya yekemîn û duyemîn dest pê kir, bi perspektîveke ku xwezaya sêyemîn dike armanc da rê. Dema ku pênaseya tam a xwezaya yekemîn û pênaseya tam a xwezaya duyemîn digihîjin hev, weke xwezaya sêyemîn derdikevin pêşiya me. Em jî weke alternatîva serdema lîberalîzma mutleq a kapîtalîzmê û qonaxa komînîzmê ya sosyalîzma pêkhatî, xwezaya sêyemîn datînin holê û ev jî dikare bibe serdema komînalîzma tam pêkhatî. Ev jî serdema civaka demokratîk, ekolojîk û azadiya jinan e.

SOSYALÎZMA DEWLETA NETEWE BI BIN DIXE, SOSYALÎZMA CIVAKA DEMOKRATÎK BI SER DIXE!

HEBÛNA NETEWEYÎ HAT BISERXISTIN, DORA RIZGARIYA DEMOKRATÎK E!

Çile 2026